
*Ji Bexçê Dilan*

# NEFESÊN DAWÎN

Osman Nûri TOPBAŞ



WEŞANÊN ERQEM



*Ya Rebbî!*

*Me ji aqîbeta wan kesên ku xwe di dinyayê de noq kirine û di îstîkanek av de birine helakê, biparêze!*

*Ya Rebbê min ê ku dilovînê dilavanan î!.. Heyata me û mirina me bi bereket, nîmet û sipehîtîyên bilind û bi wuslata xwe mûzeyyen û mûkerrem bike!..*

*Ya Rebbî!*

*Bi nêrîna mehebbeta îlahî temaşekirina li kaînatê, seyrkirina wê bi şiûr, hest, girîzokên wijdanî û kelecanên îmanî û gihiştina qada ğufranê bi şebnem û xwîsîtîyên nedameta ku ji çavan dibarin û gihana hizûra te bi sipîtîya rû û rehetîya wijdanê bike nesîbê me tevan!*

© Weşanên Erqem 1437 H / 2016 M

# Ji Bexçê Dilan
# NEFESÊN DAWÎN

Osman Nûrî TOPBAŞ

| | |
|---|---|
| **Navê Resen:** | Gönül Bahçesinden Son Nefes |
| **Nivîser:** | Osman Nûrî Topbaş |
| **Wergêr:** | Mehmet Seyhan<br>[Mela Mûhemmedê Bêrkevanî] |
| **Rastker:** | Abdusselam Kartal<br>[Mela Ebdusselamê Bêcirmanî] |
| **Qordînator:** | Muhammed Davuthan Kılıç |
| **Grafiker:** | Ahmet Taha Bilgin |
| **ISBN:** | 978-9944-83-834-4 |
| **Navnîşan:** | Ikitelli Organize Sanayi Bölgesi Mah.<br>Atatürk Bulvarı, Haseyad 1. Kısım No:<br>60/3-C Başakşehir,<br>Istanbul, Turkey |
| **Tel:** | (+90-212) 671-0700 pbx |
| **Fax:** | (+90-212) 671-0748 |
| **E-mail:** | info@islamicpublishing.org |
| **Malpera We bê:** | www.islamicpublishing.org |
| **Sertifika çapê:** | Weşanên Erqem |
| **Language:** | Kurdish |

WEŞANÊN ERQEM

## Ji Bexçê Dilan

# NEFESÊN DAWÎN

Osman Nûrî TOPBAŞ

WEŞANÊN ERQEM

## Naverok

Pêşgotin ........ 7
Nefesa Dawîn -1- ........ 17
Nefesa Dawîn -2- ........ 37
Nefesa Dawîn -3- ........ 53
Li Kaînatê Zikrûllah û Seher ........ 69
Qur'an û Tefekkur -1- ........ 85
Qur'an û Tefekkur -2- ........ 99
Qur'an û Tefekkur -3- ........ 117
Tobe û Hêŝtirên Çavan ........ 137
Dûa ........ 153
Banga Ji Bo Heqî û Xêrê -1- ........ 167
Banga Ji Bo Heqî û Xêrê -2- ........ 183
Îsar ........ 199
Îŝtiğna ........ 215
Exlaqê Ticaretê ........ 235
Qerzê Hesenê ku Ji Xuda Re tê dayîn
[Deynê Sipehî-Înfaq] ........ 255
Di Mûnasebetên Îctîmaî
De Deyn û Deyndarbûn ........ 273
Doŝtanî ........ 301
Ax Wefayê!.. ........ 319
Bûna Şexsîyeteke Nimûneyî Ji Ehlê Îmanê ........ 343
Qeder û Esrarê [razên] Wê ........ 359
Ji Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve Mûsa Efendî [q.s] (1917-1999) ........ 377

Li Ser Berhema Bi Navê "Tesewwif Ji Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve"-1- Ev Dilopa Dilekî Ye... 389
Li Ser Berhema Bi Navê "Tesewwif Ji Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve"-2- Ma Bê Tesewwif Nabe? 403
Ferhengok 419

# Pêşgotin

Bizmillahirrrehmanirrrehim

Hemd û sena ji Xuda Teala yê Teqeddes re bin ku wî em bendeyên bêçare yên xwe bi geşbûn û rehetîya îmanê kirine merzûq!

Selat û selam li ser Fexrê Ebedîyê Kaînatê bin ku ew bûye wesîle ji bo însanîyet ji zulmetê xilas bibe û di nûrê de ğerq bibe!

Meqaleyên me yên ku di kovara me ya “Altınoluk”ê de hatibûn weşandin, bi lutfa Rebbê me, va ye me ew di kitêbekê de telîf û berhev kirine. Bi kurtî, em naveroka kitêbê wiha erz û eşkere dikin:

İnsan, dema ji vî dîyarê ğurbetê yê ku ji bo îmtîhanê hatibûyê, vediqete û koça xwe bar dike, ew di derîyê alemeke ebedî re dikeve hundir. Lêbelê du derîyên wê alemê hene; yek diçe cihê xusranê, yê din jî diçe cihê seadetê. Nefesên dawîn yên evdî ku ew xulaseya temen û emrê wî tevî ne, dîyar dikin ka evd dê di kîjan derî re bikeve hundir. Ji ber vê yekê, divê em her an û dema emrê xwe, bi sipehîtîya kelecan û metirsîya ku dibe ew nefesa dawîn be, kamil û derbas bikin û bask û perên xwe vekin ji bo karibin di wî derîyê ku diçe cihê seadetê de bikevin derîyê ebedîyetê. Ji bo vê yekê jî, divê em di heyata xwe ya dinyaya fanî de ji hêla manewî ve di şîyarbûn û alarmê de bin û di xusûsa **Nefesên Dawîn** de bidiqqet, riqqet, guhdîk û şîyar bin.

Di rastîyê de îşareta sade û pêşîna ku dide xuyakirin ka emê li axretê di çi rewş û halî de bibin, ew ji halê me yê li cem dana Nefesa Dawîn derdikeve holê. Ji bo mirov karibe xatiran

ji vê alema fanî bixwaze, zerûrî ye ku mirov wek evdekî qenc û dilpak hemû nefesên xwe yên bijimar û tixûbdar ji bo vê nefsa dawîn hazir bike. Yanî ji bo heyata axreteke mesûd, pirr lazim e ku heyata mirov a dinyayê li ser îstîqametê be, bi emelê salih mûzeyyen-kirî be, sipehî be, feyzdar û aram be. Heyat wek îstîkanek av e ku ji dilopan tije dibe. Berraqbûna ava di îstîkanê de bi berraqbûna dilopên avê pêbend e. Nefesa Dawîn jî her wekî dilopa dawî ye ku ji îstîkanê dirije.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîf de dibêje:

"*Însan li ser çi halî bijî, ew li ser wî halî dimre û ew li ser çi halî bimre jî ew li ser wî halî tê heşrkirin.*"[1]

Nefesa Dawîn, yanî perda dawîna sehne û dika heyatê, wekî eyneyeke berraq û hilmnegirtî ye ku ew aqîbeta her kesî jê re dide xuyakirin. Însan bi awayekî sade xwe di nefesa dawîn de nas dike. Çawa ku **Necîb Fazil** dibêje:

*"Di wê demê de perde radibin, perde peya dibin,*

*Huner di vê de ye ku mirov karibe ji Azraîl re bibêje: "Tu bi xêr hatî!*"..

Di wê demê de mûhasebeya temamê heyatekê, li pêşîya qelbê însên û çavên wî têne şanîdan. Ji ber vê sedemê, ji bo însên dîmen û menzereyeke ji dema mirinê bi îbrettir nîn e.

Di rastîya xwe de hemû nefesên ku em di heyata dinyaya dijîn de bi îbadet, mûamelat û exlaq re didin û distînin, ew ji bo nefesa dawîna me her wekî pûsûlayekê ne. Di eynî zemanî de em hîn li vê dinyayê ne, lê ew ji bo halê me yê li axretê tercuman e.

1. el-Mûnawî, Feyzûl Qedîr, Şerhû'l-Camîûs-Seğîr, V, 663

Heyata me ya qebrê ku ewê heta bi qiyametê berdewam bike, ewê li gorî wezîyet û emelên me yên li dinyayê pêkwerê. Ew ji bo wan însanên ku karibin mirinê ji xusranê xilas bikin û wê bikin serkeftin, wê nekin matem [şîn û xemgînî] lê wê bikin "şeva erûsê" û karin xwe hazir bikin ji bo biçin adresa ku piştî mirinê diçinê, kar û qezenc e.

Ev evd û bendeyên wiha, emr û temenê xwe di kaînatê de bi zikrûllah û bi taybetî di wextê seheran de bi awayekî bi berekettirîn de derbas dikin. Yanî ew li kaînatê di heleqa zikrûllah de beşdar dibin, bi taybetî di zemanê bifeyztirînê de wextan de wextê seherê îhya dikin. Ew baş zanin, ew kesên ku seherên xwe ji bo bi rojên xwe nakin modêla mînyatur û nimûneyeke biçûk û seherên xwe ji bo nivistin û xewê mehkûm dikin, ew dibin wekî barana avrêla [nîsana] ku li çolê, behr û zinarên asê dibare, ewê ji vê bereket û feyzê mehrûm bimînin.. Ev evdên xas, ji bo nekevin ğefleteke wiha ji şûv û hawîra Qur'an û Tefekkurê dûr namînin. Ew di wê şûv û hawîrê de hîn dibin ku sifetên îlahî yên Cenabê Heq Teala di vê alemê de bi maneya kamil li sê cihan tecellî dibin: *Însan, Qur'an, Kaînat....*

Ji van her sê tecellîyatan jî kaînat, berhema kitêbekê ye ku ew bi ayetên xwe cazîb e û ji sirr û tecellîyatan jî tije ye; ew tecellîyata kiryarî ya esmayên îlahî ye, her wekî Qur'aneke bêdeng e. Qur'an cîhaneke ku cil lê hatine kirin... Însan jî di gihanek û çaterêya herduyan de, nuqteya îfran û abîdeya tecellîyatê ye.

Arif bi vê hest û şiûrê dijîn û di şûv û hawîra **Qur'an** û **Tefekkur**ê de îdrak kirine ku Qur'an daîm li pêş e û îlm jî li pey wê dewam dike. Lewra Qur'an ne îlmê însanekî bêçare û nekar e; lê ew îlmê Rebbê alemê ye ku wî qaîde û usûlên hemû îlmên li vê dinyayê ji bo mirovan bexş kirine. Di eynî zemanî de wî hemû

îdrakên ku ji bo keşfa îlmî dibin wesîle jî aferandine. Ji vê hêlê ve, peyva ku mirov di bara **Qur'an** û **tefekkurê** de bibêje, ev e:

Tuxmê çînareke bi qasî zerreyekê çawa bi navgîna axeke berhemdar dibe dareke mezin û nehîtî û îhtîşameke mûezzem qezenc dike, eynî wilo di me de îstîdada texessus û tefekkurê jî di encama xwedîbûn û xurtbûna wê bi Qur'anê de ew heqîqetên ku em bigihinê jî ew qeder mûhteşem e.. Li ser vî esasî, heke ew feyz û îrşada bilinda Qur'anê ya ku naqede û hîç xilas nabe nebûya, qabilîyeta me ya tefekkur û texessusê jî dê bibûya wekî tuxmekî ziwa yê ku ji axa berhemdar mehrûm mabe. Naxwe ji bo me bendeyan nîmeteke ji bilindahîya îhsana îlahî û îdrak-kirina ezemeta bêdawîya wî ya ku bi xêra Qur'anê tehqîq dibe, mezintir nabe.

Ew dilên ku bi tefekkura di heqîqetên bilind de hatine stran, însan dikare di vê dinyaya fanî ya ku cihê îmtîhana îlahî ye û ew ji xetayên wî mişt û tije ye, bi tobe û hêstirên çavan derûna xwe û derveya xwe bişon. Şair çi xweş wesfê van bendeyên xas dide û wiha dibêje:

*Ew kurebav di fezaya dil de ne,*
*Di ezîyeta xwe kişkişandina bi axê ve ne.*
*Ew stêran bi tesbîh tesbîh dikişînin,*
*Di nimêjê de li dehma sefa paşîyê ne.*
*Ew her dema rojê tije dikin û her dem destpê dikin*
*Di îmza seneda ezelî de ne.*
*Heke anekê çavê wan bi ser yê bîyanî de bişemite,*
*Ew temenekî temam di cezayê hêstirên çavan de ne...*

Bi kurtî; ev welîyên Heq Teala berdewam di halê **dûa** de ne, yanî ew tim di îdraka vê daxuyanîya cenabê Heq Teala de dibin:

قُلْ مَا يَعْبَأُ بِكُمْ رَبِّي لَوْلَا دُعَاؤُكُمْ

**Bibêje: Heke ne ji dû'ayên we be, Xudayê min dê çima qîmet bide we?!**[2]

Ha di encama îdrakeke wiha ulwî de ew di wecda bûna çêtirîn ummet de dijîn. Ji bo vê, ew hemû hal û xesletên xwe yên sipehî bi zîneta bang-kirina ji bo **heqî** û **xêr**ê dixemilînin. Lewra rêya bûna ummeta çêtirîn di vir re derbas dibe.

Xuda Teala di ayeta pîroz de ferman dike, dibêje:

كُنْتُمْ خَيْرَ أُمَّةٍ أُخْرِجَتْ لِلنَّاسِ تَأْمُرُونَ بِالْمَعْرُوفِ وَتَنْهَوْنَ عَنْ الْمُنكَرِ وَتُؤْمِنُونَ بِاللَّهِ.

"**Hûn, ummeta çêtirîn in ku ji bo qencîya însanîyetê hatine derxistin; şîreta xêrê dikin, ji xirabîyê didin paşxistin û îmanê bi Xuda tînin..**." [3]

Ewên ku di nav ğeyreteke semîmî de ne ji bo karibin bi awayekî layiqê wê vê erk û wezîfa ulwî bînin cih, alema dilên xwe ji bo zerafet, nezaket û xweşikahîyên îslamê tezyîn dikin; bi halê xwe, qalê xwe û tevgerên xwe wek nimûneya îmtîsalê heqîyê teblîğ dikin û di teşwîqkirina xêrê de jî dibin nimûne..

Ew di çarçoveya sirrê ayeta:

ادْعُ إِلَى سَبِيلِ رَبِّكَ بِالْحِكْمَةِ وَالْمَوْعِظَةِ الْحَسَنَةِ وَجَادِلْهُمْ بِالَّتِي هِيَ أَحْسَنُ.

"[Ya Resûlê min!] **Tu, bi zanîn û bi şîreta sipehî doza rêya Xudayê xwe bike. Bi wan re bi rindtirîn awayî têbikoşe. Bi**

2. Furqan, 25/77
3. Alî Îmran, 3/110

**rastî Xudayê te, bi wî yê ku ji rêya wî ketiye bêhtir dizane û ew, bi yên ku hatine ser rêya rast jî bêhtir dizane**."[4] de dibin û bi wê erkê radibin.

Ha ev sipehîtî, dema di dil û heyata mûmînekî de xuya bibin, hingê halê wî û emelê wî bes ji sipehîtîyan tenê pêktê. Êdî ew mûmîn ji ehlê **îsar**ê ye. Yanî ew ji hêla maddî û manewî ve di zirweya comerdîyê de ye. Ew bi îstiğnayeke bilind di nav zengînîyeke bêdawîn de ye. **Exlaqê ticaretê** yê di wî de bi bereketa ticareta ku Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] kiribû têr û tije ye. Weremên xebîs ên wekî ribayê rêya xwe di qezenca helala wî de nabînin. Malê wî, **qerzê hesen e ku ji Xuda re hatiye dayîn**. Ji vê hêlê ve, ew di **mûnasebetên îctîmaî** de di xusûsa **deyn û deyndanê** de heta tu bibêjî bes ji bo pîvanên îlahî tîtîz û rîayetkar e. Lewra wî destê dostanîyê daye Xuda û Resûlê wî. Wî destê dostanîyê daye welîyan. Ev dostanî jî bi wefa'yê hatiye dabîn û sağlemkirin. Ew hîç nahêle ku ew dostên hêja û ezîz bibêjin; **hey wax wefadarî**yê tu li kuderê yî! û wan naêşîne. Bi vî awayî, ew bi her halê xwe û sifetê xwe di vî meqamî de ye; **bûye ehlekî îmanê yê nimûneyî**. Di vî meqamî de **qeder** û **sirrên** wê jê re faş [îzhar] bûne û her teqdîra îlahî rehetî û sefayê dide wî.

Xwendevanên berketî yên me!

Me di vê esera xwe ya ku bi navê **Nefesa Dawîn** de daye ber qelemê de bi kurtî ew xusûsên ku me hewldaye ji we re teqdîm bikin ji wan tiştên me gotî pêkhatiye. Me ji dostekî mezinê Heq Teala xeber daye, ewê ku bi rûyekî sipî gihaye Hezretê Heq Teala û wî ji bo nefesa dawîn rûhekî ulwî daye hazirkirin ku ew çavan diçîrisîne û eqlan heyirî dihêle. Me ev xusûs di bin navê "**ji îmanê derbasbûna ji bo îhsanê"** eşkere kir û me **Mûsa Efendî -**quddîse sirruh- bibîr anîye, ewê ku ji bo me nimûneyeke

4. Nehl, 16/125

baş pêktîne û hêja ye mirov bibe pêbend û peyrewê wî. Li alîyê din, me ew roportaja ku kovara “Altınoluk”ê di bara wê de bi me re kiribû jî bi paşîya vê kitêba xwe ve îlawe kir. Ew roportaja ku bi vê kitêba me ve hatiye îlawekirin navê wê “**Tesewwuf ji îmanê derbasbûna ji bo îhsanê**” ye. Ew dilopeke dilî ye, me têde bi qelemê behsa rêya tesewwufa mezin kiriye, ewa ku ev însanên mezin têde meşîne. Me têde sipehîtîya wê rê, mezinatî, mûkemmelîyet û tekûzîya wê daye xuyakirin. Me xwestiye îşaret bikin ku tesewwufa heqîqî di kûrahîya hesta kitêb û sunnetê de nesîbê xwe wergirtina ji sirr û hikmetan û wilo jîyan bûrandin e. Her hal, qal û tevgera ku li derveyî naverok û mûhtewa’ya Kitêb û Sunnetê be, batil û pûç e. Ji bo îfadekirina vê heqîqetê jî hatiye gotin; “lingê sabitê pergelê şerîet e.” Bi kurtî me got; “mislimantî bê tesewwuf dibe, lêbelê evê mislimanetîyeke ji qiwama îhsanê mehrûm be.. Yanî heyateke îslamî ya ji tesewwufa ku perwerdeyeke manewî ye, hatibe tecrîd û dûrkirin, ew însên nagihîne “qiwama evdînîya ku her wekî Xuda dibîne wilo jê re îbadet dike.”

Ewên ku negihabin vê qiwamê, di nefesa dawîn de tengasî û zehmetîyê dijîn. Yanî ji bo mirov karibe di nefesa dawîn de di derîyê seadetê re biçe alema ebedîyetê, zerûrî ye ku mirov heyateke îbadetê ya wisan bijî ku her wekî Xuda dibîne wilo jê re îbadet bike.

Divê em ji bîr nekin ku;

Însên di rastîyê de her şev û rojê haya wê jê hebe, yan jî haya wî jê nebe ew bê hijmar bi sebebên mirinê re rûbirû dimîne. Mirin her gav û demê di kemînê de li benda însên e. **Hezretê Mewlana** di *Mesnewî*’ya xwe de wiha ferman dike, dibêje:

“*Her demek di rastîyê de mirina perçekekî ji canê te ye. Her gav zemanê dana rûh e û her gav, emrê te xilas dibe*.”

Bêşiwar her roj, ma em însan rojekê ji vê heyata fanî dûr nabin û gavekê bêhtir ji qebrê nêzîk nabin? Ma her roja ku derbas dibe rûpelek ji teqwîma emrê me nakeve?

Her kevirekî qebrê yê ku bi bêdengîya mirinê hatiye pêçan bi lîsanê halê xwe şîretkarekî dijwar e, dipeyive. Tesîskirina qebristanan li nav bajaran, li kenarên rêyan û li hewşa mizgeftan bi awayekî tefekkura fiêlî ya mewtê ye. Yanî goristan li wan cihan hatine tesîskirin ji bo însan mirinê bifikre û heyata dinyaya xwe jî li gorî wê tenzîm bike. Milê zeîfê peyvan nikare xwe di bin giranîya bizdanerîya mirinê de bigre û wê tehemmul bike! Hemû îqtîdar li hemberî mirinê bi dawî dibin û dihelin û diçin nemanê.

Mirin, qiyameta xusûsî ya mirov e. Naxwe bila em berî qiyameta xwe şîyar bibin da ku em nebin ji kesên ku li nedametê qulibîne. Lewra bêşiwar e ku her candarê fanî wê di zeman û mekanekî mechûl de çav li Azraîl bike. Ti cihek nîn e ku mirov ji ber mirinê bireve û here xwe têde asê bike. Naxwe bila însan wextê xwe ji dest xwe nede, para xwe ji xîtaba "فَفِرُّوا إِلَى اللّٰهِ إِنِّي لَكُمْ مِنْهُ نَذِيرٌ مُبِينٌ" "**Naxwe bi ber Xuda ve bibezin; fermanên wî bînin cih. Lewra ez ji ezabê wî, ji bo we hişyarkerekî eşkere me**."[5] wergire û rehma îlahî tekane penahgeh û êwirgeh qebûl bike.

Ji bilî pêğemberan û yên ku wan mizgînî dabe wan ew ne têde ne, wekî din ti evdekî din di xusûsa îmanê de bi awayekî binbirr û qet'î ji tehlûka şemitîna lingê xwe di selametî û ewlehîyê de nabe. Ji ber vê sedemê, divê her mûmîn hewl bide ku bi awayekî layiq wê nîmeta emr û temen a ku jê re hatiye lutfkirin, binirxîne. Tekane çareya ku mirov ji lerz û girîzokên sar ên mirinê xilas bibe, divê mirov hewl bide ji bo emr û temenekî salîhane bijî. Lewra ewên ku xwe ji mirinê re hazir kiribin, ew ji mirinê natirsin û wê wek wesîleya wusleta ebedî werdigrin û qebûl

5. Zarîyat, 51/50

dikin. Van mirovan, “zanîne mirinê sipehî bikin” û ew însanên mesûd in, gihane hizûrê. Lêbelê ewên ku heyateke ğafîlane dijîn û axreta xwe mehû kirine, ew li hemberî cansojîya mirinê û gera tarîya wê ji hiskirina girîzokên sar ên wê xilas nabin.

**Hezretê Mewlana** çi xweş dibêje:

“*Kurê min, mirina her kesî di rengê wî de ye. Mirin, ji bo mirovên ku dijminahîya wê dikin, jê nefret dikin û nafikrin ku ew wesîle ye, wan digihîne Xuda Teala, wek dijminekî tirsnak dixuyê. Lêbelê mirin li hemberî mirovên ku dostanîya wê dikin û jê hez dikin jî wek dost derdikeve, xuya dibe*.”

Bi rastî nefesa dawîn, wekî eyneyeke bê hilm, bê girûzî û bê leke ye. Her însan di vê eynê de bi awayekî sade hemû sipehîtî û mekrohîyên emrê xwe temaşe dike. Ew dem, ti îtîraz û perda ğefletê li ber çav û guhan nayê kişandin. Berevajîyê vê, hemû perde radibin û her cure îtîraf; eql û wijdanê dixin qada poşmanîyê. Naxwe ew eyna ku em têde heyata xwe bi poşmanî temaşe bikin, bila ew nebe nefesa dawîn! Bila ev eyne, di dema ku em li gorî Qur’ana Pîroz û Sunneta Senîyye dijîn bikeve heyata me. Lewra bextiyarên heqîqî ew kes in ku berî mirinê nas bikin, pêşî wan xwe nas kiriye.

❁

Ez ji bo M. Alî Eşmelî û M. Akîf Gunay ên ku keda wan ketiye nav telîfa vê eserê, teşekkur dikim û nîyaz dikim ku xizmeta wan wek sedeqeyeke carîye li cem cenabê Heq Teala qebûl bibe.

**Rebbê me, nefesa dawîya me bixe pencereyeke ku em têde di alema ebedî de mûkafata xwe temaşe bikin...**

**Amîn!..**

# *Nefesa Dawîn*

*-1-*



*Însan di dirêjahîya emrê xwe de çendîn carên bêjimar ji bo mirinê rûbirû tê. Nexweşîyên ku însan wan dijî, surprîzên ku nayên hêvîkirin û felaketên ku têne meydanê, ew çendîn tehlûkên heyatê yên ku her dem mewcûd in; lêbelê bi sebeb ğeflet û eczîyeta însên pirr caran ji wan bêxeber e, di rastîyê de ma ew nîşan nade ku di navbera însên û mirinê de perdeyeke tenik heye?.*

## Nefesa Dawîn
## -1-

Cenabê Heq Teala sifetê Beqayê di vê alemê de ji bo xwe tenê texsîs kiriye. Ji ber vê, ji bilî zatê wî, her heyber û mexlûqên din fanî ne.

Çawa ku Xuda Teala di ayeta pîroz de dibêje:

“**Zindiyên ku li sererdê hene tev fanî ne**.”[6]

Tecellîyata vê jî ev e:

كُلُّ نَفْسٍ ذَائِقَةُ الْمَوْتِ وَنَبْلُوكُمْ بِالشَّرِّ
وَالْخَيْرِ فِتْنَةً وَإِلَيْنَا تُرْجَعُونَ.

“**Her zindî dê mirinê te‘m bike, emê we bi qenciyê û bi neqenciyê jî îmtîhan bikin. Hûnê, bes li me bêne vegerandin**.”[7] mirin ji bo her kesî heq e.

Li ser vî esasî, zerûrî ye ku însan her daîm vê heqîqetê bi tefekkurê bijî. Ji ber vê, di ayeteke din de jî wiha tê gotin:

وَجَاءَتْ سَكْرَةُ الْمَوْتِ بِالْحَقِّ ذَلِكَ مَا كُنْتَ مِنْهُ تَحِيدُ.

“**Serxweşiya mirinê, bi fermana heqîyê va ye hat, di sağkirina piştî mirinê de guman nîn e. Hey însan ha ev e, ya ku tu ji wê direviyayî!**”[8]

---

6. Rehman, 55/26
7. Enbiya, 21/35
8. Qaf, 50/19

Însan, ji bo îmtîhanê ji vê dinyaya fanî re hatiye şandin. Ji lewma divê mezintirîn ğaye û hedefa wî qezenckirina rizamendîya Cenabê Heq Teala be û divê ew ji bo çûna DarûsSelamê hewl bide, yanî divê ew hewl bide ji bo çûna wê Cenneta ku mala selametî û seadetê ye, qezenc bike.

Rêya vê jî ketina nav mûhtewa û naveroka vê heqîqetê ye:

يَوْمَ لا يَنْفَعُ مَالٌ وَلا بَنُونَ  إِلاَّ مَنْ أَتَى اللَّهَ بِقَلْبٍ سَلِيمٍ..

**"Ew roja ku mal û zaro feydê nadin ti kesî. Lêbelê yên ku bi dilekî pak bên bal Xuda, ew ne têde ne**. "[9]

Ev jî bi terbîya nefsê mûmkin e. Heqîqeta terbîya nefsê jî ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re teslîmbûn, pêbendbûn û îtaet e.. Yanî para xwe girtina ji 23 salên heyata nebewî ye, bi rastî ew jî pê zanîne ka mirov çawa bikare para xwe ji hawîra dilî ya Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bigre. Lewra Cenabê Heq Teala, Qur'ana Pîroz bi wasîta Cebraîl [silavên Xuda lê bin] anîye xwarê û xistiye qelbê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin]. Naxwe temamê îbadet, gotin, tevger û mûamelatên pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wek tefsîra Qur'ana Pîroz in. Di çarçoveya van heqîqetan de ji bo mirov karibe bi awayê layiq nesîbê xwe ji alema dilî ya pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wergire, şert e ku mirov ji canê xwe, malê xwe û ehl û eyalên xwe, welhasil ji her tiştî bêhtir ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hez bike.. Ev hezkirin jî, mirovî bi hezkirina Cenabê Heq Teala distire. Yanî hezkirina ji wî hezkirina ji Xuda ye, hezkirina ji Xuda jî hezkirina ji wî ye. Ha ji bo wusletê divê dilê te gihabe vê qiwam û astê.

9. Şû'era, 26/88-89

Ev hemû, ji bo hazirîya ji nefesa dawîn re gavên sipehîtirîn in. Çawa dilopa dawî ya ku dikeve qedehê, li gorî dilopên pêşî karekî cuda dibîne û dibe sebeb ku bi ser qedehê de birije, nefesên me jî wiha ne. Yanî nefesa dawî ya me, li gorî nefesên me yên pêşî netîcekekê hasil dike. Ji bo wê, hazirîya ji bo nefesa dawîn, bi van nefesên ku vêga em wan didin û distînin û em wan çawa bikartînin ve pêbend e.. Ew evdên xas ên ku temenê xwe bi eşqa Xuda û Resûllah derbas dikin û di vê îstîqametê de xwe bi emelên salih dixemilînin, ew demên dawîya xwe di nav hizûr û aramîyê de bi kelîma şehadetê re derbas dikin. Yanî ew digihin vê mizgînîya pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin]:

"*Kî, di nefesa dawîn de [bi qelbekî xalis] kelîma tewhîdê bibêje, ewê biçe Cennetê.*"[10]

Ewên ku emr û temenekî di hawîr û qada kelîma tewhîdê de dijîn, ew di demên dawîyê de jî pê bi ber Heq Teala ve rêwîtîyê dikin. Lewra wan di wextê wê de bi "**la**" ya di kelîma tewhîdê de hemû fanî, îzafî, pêvemanên nefsanî û pût ji dilên xwe xîç kirine û avêtine û bi "**îlla**" yê jî qelbê xwe ji hezkirina Cenabê Heq Teala tije kirine.

Divê were zanîn ku ev kaînat, bi destê qudretê hatiye avakirin û bi hezar û yek nexşan hatiye tezyînkirin îqametgeheke fanî ye. Li kaînatê tiştek bê ğaye nehatiye aferandin. Armanca heyata dinyayê ji bo însan, bidestxistina seadeta axretê ye. Ji ber vê, Rebbê me, me evdên xwe wiha îqaz dike, dibêje:

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا اتَّقُوا اللَّهَ حَقَّ تُقَاتِهِ
وَلا تَمُوتُنَّ إِلاَّ وَأَنْتُمْ مُسْلِمُونَ.

10. Hakim, el-Mûstedrek, I, 503

“**Gelî yên ku îman anîne! Çawa xwe parastin pêwîst be, wisa xwe ji Xuda biparêzin û hûn, her misliman bimrin.**”[11]

Mirina ku ewê di serê her xwedî-heyatî de her derbas bibe, ew dema weda û xatirxwestina mezina ji heyata fanî ye û ew qiyameteke xusûsî ye ku her zindî her dê wê di kesayetîya xwe de bijî.

Divê em ji bîr nekin ku insan, di rastîyê de her şev û rojê haya wê jê hebe, yan jî haya wî jê nebe ew bê hijmar bi sebebên mirinê re rûbirû dimîne. Mirin her gav û demê di kemînê de li benda însên e.

**Hezretê Mewlana** di *Mesnewî*’ya xwe de wiha ferman dike, dibêje:

“*Her demek di rastîyê de mirina perçekekî ji canê te ye. Her gav zemanê dana rûh e û her gav, emrê te xilas dibe*.”

Bêşiwar her roj, ma em însan rojekê ji vê heyata fanî dûr nabin û gavekê bêhtir ji qebrê nêzîk nabin? Ma her roja ku derbas dibe rûpelek ji teqwîma emrê me nakeve?

Dîsa **Hezretê Mewlana** vê îqazê dike, da ku însan wekî çemekî herkbar li hemberî herka heyatê ğafil nebe:

“*Ey însan! Li nexşa dawîya di eynê de meyzîne! Bi derewa di wê eynê de nexape! Ciwanî paşwexta wê yextiyarî ye û avahî jî paşwexta wê rojekê her dê wêranî be!.*.”

Nefesa dawîya me, di çarçoveya hezar û yek hikmetê de sirreke îlahî ye. Bûyera mirina ku heqîqeta qet‘î ye û em wê di paşwexta xwe de dizanin, zemanê bicih-hatina wê bi teqdîra îlahî ve pêbend e. Bi rastî însan di dirêjahîya emrê xwe de çendîn carên bêjimar ji bo mirinê rûbirû tê. Nexweşîyên ku însan wan

11. Alî Îmran, 3/102

dijî, surprîzên ku nayên hêvîkirin û felaketên ku têne meydanê, ew çendîn tehlûkên heyatê yên ku her dem mewcûd in; lêbelê bi sebeb ğeflet û eczîyeta însên pirr caran ji wan bêxeber e, di rastîyê de ma ew nîşan nade ku di navbera însên û mirinê de perdeyeke tenik heye?.

Cenabê Heq Teala hesret û nedameta ku însan dê di piştî mirina xwe de wan bibihîze radigihîne û van şîyarî û îqazan dike, dibêje:

“**Ji wî rizqê ku me daye we, hinekê înfaq bikin û li cem xwe nehêlin! Beriya ku mirin, were yekî ji we û ji nû ve bibêje: ‘Xudayê min! Çima heta demeke nêzîk te mirina min neda paş da ku min sedeqe bidaya û ez bibûma ji qencîkaran!’..**”[12]

Di ayeteke din de dibêje:

“**Ew li dojehê dikine feryad û dibêjin: “Xudayê me! Me** [ji vir] **derîne, emê ji bilî emelê ku me berê dikir, emelekî salih bikin!.”** [Xuda ji wan dipirse;] **“Ma me, temenekî wisan nedabû we ku kesê bixwaze bifikire têde karibe bifikire û di wî de şîret bigire? Ma** [pêğemberên] **hişyarker ji we re nehatibû? Naxwe de ezabê te‘m bikin! Ji zaliman re ti arîkar jî nîn in..**”[13]

Naxwe însan di jîyana xwe de çendîn carên bêjimar ji bo mirinê rûbirû tê. Bi nêrînekê ew mohlet û firsenda ku di axretê de jê re nayê dayîn, ew li vê dinyayê dubare dubare jê re tê dayîn. Digel vê jî divîyabû însan di nav şîyarî yeke mezin de bûna, mixabin ew di nav hezar û yek ğefletê de yeko yeko û dudu dudu jêketina pelên teqwîma emrê xwe, bi pirranî jî bi awayekî bêhis û hest temaşe dike. Rewşa wî dişibihe rewşa wê latê ku dilopên baranê li serê dibarin lêbelê ew behra xwe ji wan wernagire..

---

12. Mûnafîqûn, 63/10
13. Fatir, 3537

Di rastîyê de ji wê roja ku em ji dêya xwe dibin û pê de her roj perçeyek ji me dimre. Belkû haya me jê çênabe, lêbelê her roj em yekser ber bi mirinê ve rê qut dikin û jê nêzîk dibin. Her an û gava ku ji şerîda zemanî dikeve, me ji heqîqeta sibehê nêzîk dike.

Xuda Teala di ayeta pîroz de vê heqîqetê çi xweş îfade dike, dibêje:

وَمَنْ نُعَمِّرْهُ نُنَكِّسْهُ فِي الْخَلْقِ أَفَلَا يَعْقِلُونَ.

“**Em temenê kê dirêj bikin, em aferandina wî** [ciwanî, sipehîtî û qeweta wî dibin û pêkhatina wî] **xirab dikin, piştxûz dikin. Ma ew ji vê eql nagrin?”**[14]

Evdekî salih bi navê Qûs kurê Saîde hebûye, ew berî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jîyaye û mizgînîya hatina wî daye mirovên serdema xwe. Wekî ku ew vê ayeta li jorê bûrî îzah bike, di axaftineke xwe ya ku li bazar û pêşangeha Ûkazê kirî de serpêhatî û dîmena vê heyata fanî çi xweş xulase dike, dibêje:

“*Gelî mirovan!*

*Werin, guhdarî bikin, fehm bikin û îbret bigrin!*

*Kî bijî ewê bimre, kî bimre jî ewê tine bibe. Baran dibare, giya şîn dibe. Zarok ji dêya xwe dibin û dikevin şûna dê-bavên xwe. Paşê ew tev jî mehû dibin û diçin. Dawî li weqaetan nayê, tev hev û din teqîb dikin, dişopînin.. Çi li min qewimiye, ez însanan dibînin ew diçin û navegerin? Gelo ew ji cihê xwe razî bûne, vêca li wir mane, yan jî ew li wir hatine terk-kirin û ew li wir nivistine? Qesem bi Xuda ye, dînekî Xuda heye, ew ji wî dînê ku hûn li serê ne, bêhtir hez dike. Pêğemberek heye wextê hatina*

---

14. Yasîn, 36/68

*wî nêzîk bûye, siha wî xwe bi ser we de berdaye. Xwezîya me bi wan be ku îmanê pê bînin û bikevin ser hîdayetê! Xwelî li wan be ku li ber wî rabin û dijîtîya wî bikin! Xwelî li ğafilên ummetên bûrî û serdemên çûyî be!*

*Gelî însanan!*

*Kanî bav û kalên we li kuderê ne? Kanî Semûd û Ad li kuderê ne? Kanî Firewn û Şeddad li kuderê ne? Kanî ewên ku xanî ava kirine, ew şeh dane, xemilandine û mal û zaroyan ew ji rê derxistibûn li kuderê ne? Kanî ewê ku zulm kiribû, serxweve çûbû, mal kom kiribû û xerc nedikir û gotibû; ez Rebbê we yê raser im, li kuderê ye? Ma malê wan ji malê we ne zehftir bû, ma emrê wan ji emrê we ne dirêjtir bû, ma emelê wan ji emelê we ne dûrtir bû? Axê ew hêrdin û ew perçe perçe kirin! Ha wa ne, hestîyên wan rizîyane, malê wan wêran bûne û gur li wan mane! Hûn wekî wan nebin! Xuda yek mebûd e, ne jê re zaro hene, ne jî dê-bav hene!*"

Em jî nefesên bijimarên xwe yên ku Heq Teala ji me re lutf kirine, xerc dikin û roja ku nefesa dawîya xwe bidin jî, emê ji dinyayê û hemû têkilîyên xwe yên têde xatiran bixwazin, yan jî xatiran ji wan nexwazin û çav li mirinê bikevin. Lêbelê ev hevdîtin ji bo evdên evîndar û sadiqên Heq Teala belkû ne mirin e, ewê vejîneke mesûd û bextiyar be, ewê di rewşa "**şeva erûsê**" de were cih.

Ji bo vê divê em bigihine sirra:

"*Emê berî mirtinê bimrin.*"

**Hezretê Mewlana** vê sirrê bi peyva: "*Em ji bo vejînê dimrin!..*" îfade dike.

Çawa ku wekî **Hezretê Elî** -Xuda jê razî be - ferman dike, dibêje:

*"Însan di xew de ne, bi mirinê şîyar dibin..."*

Li ser vî esasî, bila em zanibin ku divê em li hemberî hestên nefsanî yên xwe û daxwazên dinyewî yên xwe meğlûb nebin, jîyana eslî, ne bi rûhê heywanî ye; lêbelê jîyana eslî ewa bi rûhê îlahî ye ku Cenabê Heq Teala ew di me de pif kiriye.

Naxwe cansojtirîn cureyê mirinê, ğafilbûna ji Heq Teala ye, windakirina rizamendîya wî ye.. Ji ber vê, divê her mûmîn îdrak bike û baş têbigihe ka divê ew çawa bijî, ew çawa bimre û divê biçe perwerde bibe, ji bo hîn bibe ka ewê çawa ji îmanê bigihîje îhsanê.. Lewra ji bilî pêğemberan wekî din ji bo ti kesî temînat û garantî nîn e ka ewê li ser çi halî bimre û ewê bi çi awayî ji nû ve sağ bibe. Ku rewş ev be, naxwe di vê xwe avêtina ber penaha Cenabê Heq Teala ya Yûsuf -silavên xuda lê bin- û lavlav jê-kirin ji bo me têde maneyeke kûr heye:

تَوَفَّنِي مُسْلِماً وَأَلْحِقْنِي بِالصَّالِحِينَ.

"**Min misliman bimrîne û min bigihîne salihan**."[15]

Bi vê nêrînê her bende, mecbûr e bibe xwedîyê qelbekî salih, ku ew di navbera hestên xewf û recayê de yanî tirs û hêvîyê de bijî. Naxwe ev haletê rûhîye, dê hişyariyeke manewî û riqqeteke qelbî pêkbîne û ewê bike ku bende tim û daîm emr û temenê xwe di nav vê metirsî û pêxavê de derbas bike; gelo ezê karibim nefesa dawîya xwe bi îmanê bidim û ewê her li ser vê fikr û guhdîkîyê raze û rabe..

Îşareta pêşî û net di bara 'ka halê me li axretê dê çawa bibe' di halê me yê nefesa dawîyê de derdikeve holê. Qur'ana Pîroza ku rêbera hîdayetê ye, di lewheyeke îbretê de ji me re şanî dide ka

15. Yûsuf, 12/101

qehremanên îmanê ji bo gihiştina rizgarîya ebedî di nefesa dawî de û ji bo bidestxistina mûkafata ku Xuda Teala dê wê ji bo wan bexş bike, çawa mûcadele dikirin.

Çawa ku **sêhrbazên Firewn** li hemberî mûcîzeya ku Hezretê Mûsa ji wan re nîşan da, gotibûn:

“**-Me îman bi Rebbê alemê, Rebbê Mûsa û Harûn anî!**” [16]derhal çûne sicûdê û bi nîmeta îmanê şerefmend bûn.

Lêbelê Firewnê ehmeq, hêrs bûbû û zen kiribû ku ew dikare bi seltenet û qeweta xwe hukm li ser dilan jî bike. Wî bi vê şaşezena xwe gef li wan xwaribû, ji wan re gotibû;

“**-Ma beriya ku ez destûra we bidim we îman pê anî ha! Hîç guman nîn e ku ev fendeke we li welatî plana wê danîye da ku hûn ehlê wê jê derînin. Lêbelê hûnê paşê bizanin! Sûnd be ku ezê dest û pêyên we ji çepûrast ve jêkim, piştre jî ezê we hemûyan daleqînim**.”[17]

Sêhrbazan jî bi celadeteke mezina îmanê helwesta xwe dîyar kiribû û gotibûn:

“**Zulma te zirarê nade me! Zirara te li dinyayê dibûre. Seadeta axretê jî ebedî ye**.”[18]

Çi helwesteke îbretengîz e, ew li hemberî vê zulma dijwar jî neketin derdê xwe xilaskirina ji vê zulmê, lêbelê ew ketin vê fikarê; divê em di nefesa dawîyê de zeiftîyekê nîşan nedin û wek misliman can bidin. Wan bi vî awayî, xwe avêt ber penaha cenabê Heq Teala:

16. Eraf, 7/121-122
17. Eraf, 7/123-124
18. Şûera, 26/50-51

“**Xudayê me! Sebrê bi ser me de birijîne û me misliman bimirîne**.”[19]

Di dawîyê de wan bedelê hîdayeta ku bidestxistibûn giran eda kir, ji terefê zordarê xwînmij ve bi awayê çepûrast dest û pêyên wan hatin jêkirin û ew bi şerefa şehîdbûn û welîtîyê çûn hizûra cenabê Heq Teala.

Zaliman **Eshabê Uxdûd** jî, îman-anîna wan bi Xuda sûc jimartibû û ew avêtibûn xendekên ku nava wan tije terafa êgir bû. Ew mûmînên sadiq, digel vê zulma giran jî ji bawerîya xwe venegerîyabûn. Ew di ber doza xwe de bêtirs çûbûne mirinê û bedelê îmana xwe di nav wecdeke bilinda evdînîyê de ji Xuda Teala re eda kiribûn. Lewra ewên ku bi awayekî layiq ji Heq Teala ditirsin, êdî ew ji ti tişteke din natirsin.

Ji Eshabê Qerye jî **Hebîbê Neccar** ji ber îman û îrşada xwe kevir lê hatibûn baran û ew wilo hatibû kuştin. Lêbelê çi dema di nefesa dawîya wî de panjûrên aîdê vê dinyayê hatibûn girtin û pencereyên aîdê alema ku ew diçûyê jê re hatibûn vekirin. Ew lutfên îlahî yên ku ewê bigihişta wan jî jê re hatibûn nîşandan, wî ji bo ğefleta qewmê xwe hest bi êş û elemê kiribû û wiha gotibû:

“**Xwezî qewmê min ev bizaniya!**”[20] Lewra li hemberî kevir barandina li wî li dinyaya fanî seadeteke bêdawî jê re hatibû bexşkirin.

Dîsa Romayî, Yewnanî û Pûtperest di serdema pêşîna belavbûna wê de li dijî Îsewîtîyê bûbûn yek û ehlê îmanê yên wê rojê li rast û meydanan diavêtin ber şêran û bi wan didan perçe perçe kirin. Wan mûmînan jî di nav diranên şêran de ne ji bo

19. Eraf, 7/126
20. Yasîn, 36/26

mana li heyatê mûcadele dikir, lêbelê ew têdikoşîyan ji bo îman xwe xilas bikin. Lewra wan li hemberî vê zulma giran sebr kiribû û mûkafata mezina li cem Xuda ji bo xwe tercîh kiribû..

Hîç şek û guman nîn e ku ev hemû rewş û halên sipehî û xweş, encama lutfkara vê hestê ye ku wan karîbûye pêşî emr û temenekî temam bi Xuda re bijî. Bi vê nêrînê, "karîna bi Xuda re bûn" bilindtirîn armanca evdînîyê û mezintirîn zerûreta wê ye.

Li gorî rîwayetê waizek hebûye li ser kursîyê weizê ehwalê axretê ji xelkê re vedigot. Di nav cemaetê de **Hezretê Şêx Şîblî** jî hebû. Waiz di nêzîkî dawîya sohbeta xwe de behsa sûalên ku cenabê Heq Teala li axretê ji mirovan dike, kir û wiha got:

"-Tê pirskirin; te îlmê xwe di çi de bikaranî? Tê pirskirin; te mal û milkê xwe ji kuderê qezenc kir û li çi xerc kir? Tê pirskirin; îbadetê te di çi rewşê de bûn? Tê pirskirin; te li helal û heram diqqet dikir?.."

Di piştî van de jî got; "ev jî tên pirskirin!.." Wî gellek mijarên zehf mûhîm jimartin û vegotin. Digel evqas îzahata bi tefsîlat jî ji ber ku wî bal nekişand ser kakil û rastîya mijarê, **Hezretê Şîblî** bi uslûbeke nerm ji waizî re got:

*"-Waiza hêja! Te pirseke zehf mûhîm ji bîr kir. Bi kurtî Xuda Teala dê vê pirsê bike; "ey evdê min! Ez bi te re bûm, ez ji şahraya te jî bêhtir ji te nêzîk bûm, lêbelê tu bi kê re bûyî?!"*

Naxwe mezintirîn destûr "bûna bi Heq Teala re ye û bi ğefletê zîyan nekirina nefesan e." Di vî kelamê kubar de ev rewş çi xweş hatiye îfadekirin:

*Her saeta me ya ku bêyî te derbas bûbe;*

*me fehm kir ku ew zayî bûye.*

Di mijara bang-kirina ji bo vê destûrê de pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi herdu milên **Îbnû-ûmer** - Xuda ji wanrazî be - girtibû û jê re gotibû:

"Li dinyayê bibe her wekî ku tu ğerîb bî, yan jî, rêwî bî!"[21]

Bi vê hisîyatê Îbnû-ûmer - Xuda İi wanrazî be - di sohbetên xwe de tim û daîm ev nesîhet li xelkê dikir:

*"Dema li te bibe êvar, tu çavnêrîya sibehê neke. Dema li te bibe sibeh jî tu çavnêrîya êvarê neke. Di sağlemîya xwe de ji bo nexweşîya xwe û di sağîya xwe de jî ji bo mirina xwe tedbîrê bigre."*[22]

Ev hevokên ciwan ji me re vedibêjin; derbasbûna heyatê wekî derbasbûna ewrê havînê zû pêktê, ew berê me dide ser heyata heqîqî. Çawa ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ev heqîqet di dûa û bergerîneke xwe ya ji Xuda Teala de jî wiha îfade kiriye:

"*Xudayê min! Heyat bes heyata axretê ye.*"[23]

Eshabê kîram bi awayekî sipehî ev sirr îdrak kiribûn, ji lewma heyata wan ji fezîletên bêjimar, hikmet û îbretan mişt û tije ye:

Ew **Xubeyb** -Xuda jê razi be - yê ku esîr ketibû destê mûşrikan û li ber kuştinê bû, berî şehîd-bûna xwe wî arzûyeke tenê hebû, ew jî ku "karibe silaveke tije mehebbet ji Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re bişîne".. Wî bi awayekî ğemgîn çavên xwe bi terefê asîman ve rakirin, wiha îltîca kir û got:

21. Buxarî, er-Rîqaq, 3
22. Buxarî, er-Rîqaq, 3
23. Buxarî, er-Rîqaq, 1

“-Xudayê min! Li vir ti kes nîn e ku silavên min bigihîne Resûlûllah -dirûd û silavên xude lê bim- Tu silavên min bigihîne wî!..”

Di wê esnayê de Resûlûllah -dirûd û silavên xude lê bim- li Medîna Mûnewwer bi sehabîyên xwe re rûniştîbû, ev hevoka ha:

“-*We eleyhisselam!*” ya ku bi maneya “bila silav li ser wî bin jî” got.

Eshabê kîram çi dema ev gotina wî bihîstin, bi heyret jê pirs kirin, jê re gotin;

“-Ya Resûlellah! Te bersiva silava kî da?”

Wî ji wan re got:

“*Min bersiva silava birayê xwe Xubeyb da.*”[24]

Ji bilî vê jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi “**mezinê şehîdan**” wesfê Hezretê Xubeyb daye û gotiye:

“*Ew li cennetê cîranê min e!*”

Nimûneyeke din jî ji bo vê eşq û şewqê ev e:

Di dawîya herba Uhudê de mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman kiribû, gotibû; şehîd û birîndaran seh û kontrol bikin. Bi taybetî wî serencama sehabîyekî meraq dikir, ew jî “**Se‘d bin Rebî** -Xuda jê razî be- bû.”

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] sehabîyekî xwe şandibû meydana cengê ji bo wî bibîne û rewşa wî hîn bibe. Ew sehabî çi qeder lê gerîya jî lê dîsa wî Se‘d -Xuda jê razî be- nedîtibû, çi qeder bang lê kiribû lêbelê ti bersiv nebihîstibû. Di

24. Li Buxarî, Meğazî, 10; Waqidî, Meğazî, rûpel, 280-281’ê binêrin.

dawîyê de wî bi umîdeke dawîn bi terefê şehîd û birîndaran ve bang kir û wiha got:

"-Hey Se'd! Resûlûllah ez şand im. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman li min kir, ji min re got; xeberê bide min ka ew di navbera şehîdan de ye, yan jî di navbera birîndaran de ye."

Di wê navberê de Se'd - Xuda jê razî be - demên xwe yên dawîn dijîya û mecala wî nemabû ku bersiva wî bide. Lêbelê çi dema wî xeber bihîst ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wî meraq dike, wî hemû hêz û qeweta xwe kom kir lê wî bes karî bi nalîneke weza bibêje;

*"-Ez, êdî di navbera mirîyan de me!"*

Xuyabû ku êdî wî bi wêdetir temaşe dikir.

Ew sehabî bilez çû cem Se'd - Xuda jê razî be Wî ew dît ku wa ye, wicûda wî bi derbên şûr qul û pil bûye. Ew ketibû wezîyeteke ku bedena wî her wekî bêjingê qul bûbû. Wî dengekî nizm bi pistênî ev hevoka dilxweşker jê bihîst:

**"-Qesem bi Xuda ye! Heta çavên we bilebitin mezinê me pêğemberê Xuda ji neyaran biparêzin û firsendê nedin ku mûsîbetek bigihîje wî, heke na, ji bo we li cem Xuda dê mezeretek nebe ku hûn wê ji xwe re bikin bihane!"**[25]

Ev peyvên Se'd bin Rebî - Xuda jê razî be ji bo ummetê wekî şîretekê bûn. Di eynî zemanî de ew peyv bûn peyvên xatirxwestina ji heyata fanî.

Ev bûyera ku **Hezretê Huzeyfe** vegotî, diqqetê dikişîne ser xwe ka eshabê kîram di nefesa dawîya xwe de jî çawa exlaqê ulwî û fezîlet şanî didan.

25. Li Îbnû Ebdûlbirr, Îstîab, c, II, rûpel, 590'an binêrin.

Em di Mûharebeya Yermûkê de bûn. Dijwarîya lihevdanê derbas bûbû, ew mislimanên ku bi derbên tîr û riman birîndar bûbûn jî êdî ketibûn ser sêliha germ û canê xwe didan. Di vê navê de min jî bi hezar û yek zehmetîyê xwe da hev û min destpê kir li kurmamê xwe **Haris** gerîyam. Birîndar jî demên xwe yên dawîyê dijîyan, ez jî biçekê li navbera wan gerîyam, di dawîyê de ez li tişta ku lê digerîyam, rast hatim. Lê çi çare, kurmamê min di nav goleke xwînê de gêrkirî bû, pirr zehmet karîbû heta bi îşaretên çavan jî biaxive. Min meterê avê yê ku berê hazir kiribû, jê re nîşan da û got:

“-Ma tu avê dixwazî?”

Xuyabû ku wî av dixwest, lewra lêvên wî ji germê diperitîn. Lêbelê wî mecal nebû bersiv bide. Her wekî ku wî bi îşaretên çavan rewşa êşdara xwe vedigot.

Min jî devê meter vekir û ber bi wî ve dirêj kir, ji navbera birîndarên biçekê bi wêdetir ev dengê Îkreme hate bihîstin:

“-Av! Av!.. Xuda ji we razî be dilopek av bidin min!..”

Çi dema kurmamê min Haris ev feryada wî bihîst, bi îşareta çavên xwe ji min xwest ku ez avê ji Îkreme re bibim.

Ez li ser sêliha kelîyayî bilezûbez di navbera şehîdan de çûm, min xwe gihand Îkreme û min meter jê re dirêj kir. Dema Îkreme dikir destê xwe bigihîne meter dengê nalîna Îyaş hate bihîstin, digot:

“-Ji kerema xwe dilopek av bidin! Ji bo rizaya Xuda dilopek av bidin!...”

Çi dema Îkreme ev feryad bihîst, destê xwe ji meterê avê kişand û bi îşaretkî ji min re got; avê ji Îyaş re bibe. Wî jî wekî Haris ji avê nevexwar.

Min jî rahişt meter û di navbera şehîdan de bilez gerîyam, dema ez giham Îyaş, min peyvên wî yên dawîyê dibihîstin, wî digot:

“-Ya îlahî! Me di ber doza îmanê de hîç xwe neda paş û canê xwe jî feda kir! Êdî merteba şehadetê ji me re zehf nebîne, wê bide me û xetayên me efû bike!”

Xuyabû ku êdî Îyaş şerbeta şehadetê vedixwar. Wî ew ava ku min jê re anîbû dît, lêbelê wextê wî nemabû ku wê vexwe.. Wî bes karîbû kelîma şehadetê temam bike.

Derhal ez vegerîyam, bilezûbez çûm cem Îkreme; dema min meter jê re dirêj kir, min dît ku wa ye Îkreme jî şehîd bûye!

Min ji xwe re got; naxwe bila ez bilez biçim bigihim kurmamê xwe Haris.

Ez bilezûbez çûm ji bo bigihim wî. Lê çi feyde! Ew jî li ser sêliha kelîyayî peritîbû û wilo rûhê xwe teslîm kiribû... Mixabin, meter di navbera sê şehîdan de tije av mabû li erdê.[26]

Huzeyfe - Xuda jê razî be - haletê rûhîyye yê xwe yê di wê gav û demê de wiha îfade dike:

“-Ez di heyata xwe de li gellek hadîse û bûyeran rast hatim. Lêbelê yekî ji wan jî ez evqas hestgerm nekiribûm û neanîbûm heyecanê. Digel ku di navbera wan de ti peywendîyeke lêzimtîyê nebû jî, min bi ğibte û heyran-mayîn li halê vanên ha ku ewqas ew ji hev re hevğem, fedakar û bi şefqet bûn [yanî nefesa dawîya xwe jî di nav fezîletê de didan wekî ku ew li heyatê jî wilo bûn. Ew bi hesta ayeta pîroza ku dibêje; “**bes wek misliman bimrin**” di nav hewl û ğeyretan de bûn ji bo xatiran ji heyatê bixwazin]

26. Li Hakim, Mûstedrek, III, 270’ êyan binêrin.

temaşe dikir û wê rewşa wan wek celadeteke mezina îmanê şopên kûr li ser hafîza min hiştin...”

**Cenabê Heq Teala nefesa dawîya me temaman bi husna xatîme bi encam bide. Bila nefesa dawîya me li dinyaya fanî bike nefesa pêşîna me li wusleta ebedî...**

**Amîn!..**

# Nefesa Dawîn
# -2-



*Ğaye'ya heyatê ew e ku mirov karibe wek evdekî baş bijî û wek evdekî baş can bide. Lewra hedef, ew e ku mirov karibe ji heyata nezîha Hezretê Pêğember -dirûd û silavên Xuda lê bin- ê ku Cenabê Heq ew ji beşerîyetê re kiriye xelat û ji tevna dilê wî para xwe wergire; û karibe bibe evdekî kûr, tenik, reqîq û hessas.*

## Nefesa Dawîn
## -2-

Ji bo mirov karibe wek evdekî sipehî xatiran ji vê alema fanî bixwaze, zerûrî ye ku mirov nefesên xwe yên bijimar ji bo nefesa dawîn hazir bike. Yanî ji bo heyateke mesûda axretê, heyateke dinyayê ya bi emelên salih mûzeyyen-kirî, bi feyz, bi hizûr û li ser îstîqametê elzem e. Lewra çawa ku hedîsa şerîf de hatiye gotin:

"*Însan li ser çi halî bijî, ew li ser wî halî dimre û ew li ser çi halî bimre jî ew li ser wî halî tê heşrkirin.*"[27]

Ji bo vê bêjimar nimûne hene. Yek ji van nimûneyên tije îbret û hikmet jî ev e:

Li Adapazarîyê mûezzinek hebû, di piştî nimêja nîvro de dema wezîfa xwe temam û îkmal dikir, ji bo sohbetê dihat cem bavê mûhteremê min Mûsa Efendî -quddîse sirrûh- ew li bîsîklêtê siwar dibû û di şewqa kesk de ji vî rexî derbasî rexê din dibû. Di vê navê de erebeyek bilezûbez tê, li ber şewqa sor jî nasekine û li mûezzin efendî dixe. Mûezzin ji ber şiddeta lêxistinê bi hewayê ve dipeke û li erdê dikeve. Dema ew li erdê dikeve jî di nefesa dawîya xwe de bi deng û bi îştiyaq diqêrîya, digot; *"ya Rebbî, ez têm cem te!.."* Ev wek îfadeya wî ya dawîyê ya aîdê vê dinyayê bû. Hem şifêrê ku erebe lê dabû, hem jî mirovên li wir hazir dengê mûezzin dibihîstin.

Ha hemû mesele ev e ku mirov karibe di dema dawîya emrê xwe de bi sirûr û hizûr biçe cem Xuda. Yanî mesele ev e ku her kes di wê dema tirsnaka xewna xwe de hest bi keyfxweşîyê bike

27. el-Mûnawî, Feyzûl Qedîr, Şerhû'l-Camîûs-Seğîr, V, 663

û bibêje; “ya Rebbê min, ez têm cem te!.” Cenabê Heq Teala vê bextiyarîyê bixe nesîbê me tevan! Amîn!..

Bi îfadeya mirovên berê:

*“Cêrê avê di rêya avê de dişike...”* Ev derbû-mesele, xuyabûn û tezahureke zehf manedara vî halî ye. Yanî dema dil li jîyanê bi çi tiştî ve zehf meşxûl bin, dema ew dimrin jî bi wî tiştî ve meşxûl dibin.

Helbet îstisnayên vê jî hene. Yanî ji bo evdek karibe nefesa dawîya xwe bi îmanê bide, heke çi qeder wî heyateke ji emelên Salih tije dewam kiribe jî divê bawerîya xwe bi emelê xwe neyêne û bi çavê qet‘î lê nemeyzîne ku ewê bigihîje rehma Xuda û ewê li ser îmanê bimre. Berevajîyê jî evdekî çi qeder ketibe gunehan jî bil ali heyata suflî ya xwe nemeyzîne û bi wê hêvîya xwe ji rehma Xuda qut neke. Lewra bi çi awayî bûna nefesa dawîn, sirreke îlahî ye.

Di Kitêba Pîroza me de evdên salih ên ku mûcadele dikin ji bo di nefesa dawîn de îmana xwe xilas bikin wek şexsîyetên nimûneyî tên şanîdan. Berevajîyê vê jî, ew serencam û aqîbeta wan evdên ku di demekê de emrekî salih dewam dikirin; lêbelê paşê ji nefsanîyeta xwe re ram bûne, ji bo kufrê dûçar bûne û wisan mirine jî wek lewheyeke îbret-girtinê şanî dide.

Çawa ku **Îblîs, Qarûn, Bel‘em bin Ba‘ûra** bi wî îlm û îrfana ku kesb kiribûn nefsa xwe pê tezyîn û paqij nekiribûn. Se‘lebe jî sehabî bû, ji bo dirav û serweta xwe ya dinyayî temakarî kir û nefsa xwe paqij nekir. Evên ha bariztirîn nimûneyên wan bûne.

Ji xwe malûm e ku **Îblîs** pêşî li cem Heq Teala xwediyê meqamekî bilind bû. Lêbelê wî di encama kibra xwe de fermana Cenabê Heq Teala, qudret, ezemet û heşmeta wî nedît û îddîa kir ku ew ji Hezretê Adem çêtir e. Ji ber ku wî di xwe de şeref

û hebûn wehm kir, wê jî ew ajote ser mûxalefeta Rebbê wî. Di netîcê de ew wek zebûnê kibr û înada xwe ebedîyen perîşan bû.

**Qarûn** jî berê mirovekî feqîr û salih bûye. Di piştî Hezretê Mûsa de wî ji her kesî zehftir û çaktir zanîbû Tewratê tefsîr û şîrove bike. Bi bereketa dûaya Hezretê Mûsa îlmê sîmya'yê jê re hatibû bexşkirin. Lêbelê paşê ew bi hewesa nefsa xwe û desîseyên Şeytên xapîya û dilê wî meyla dinyayê kir. Kilîlên xezîneyên wî ewqas mezin bûn ku heta komeke xurt zor karîbû wan hilgire. Ew bi vê hate xapandin û di gera zengînîya şemûs û serxweve-çûyî de xeniqî. Lêbelê çi dema Hezretê Mûsa jê xwestibû ku ew zekata malê xwe bide, ew kete cur'et û mekrohîyeke ewqas bêşerm û fehêtî ku jê re bibêje;

"-Ma te çavê xwe berda malê min? Min bi xwe ev qezenc kirin." Malê wî bû sersebebê serxwe-veçûn û helaka wî.

Bi vê gotina xwe re Qarûn, destpê kir êdî çavnebarî ji dereceya manewî ya Hezretê Mûsa û Hezretê Harûn kir. Qarûn di heseda xwe ya ji Hezretê Mûsa de ewqas zêde çû ku karibe bêbextîya namûsê bixe stûyê wî û ew di ekam û netîca wê de digel xezîneyên xwe yên ku pê xwe mezin dikir, bi hev re ketin binê erdê û ew çû helakê.

Jibîrkirina xwediyê milk ê heqîqî Cenabê Heq Teala; û dilê xwe dana dinyaya ku hîle û xapxapokên wê yên wekî mal, milk û meqam jî hene, dijwartirîn ğeflet e.

**Bel'am bin Baûra** jî, Xuda Teala îsmê azemê xwe bi wî dabû hînkirin, ew evdekî salih û xwedî keramet bûye. Ev zat, di nav kurên îsraîl de jî wek alim û welî dihate naskirin. Feqet di dawîyê de ji ber ku wî meyla hewes û arzûyên xwe yên nefsanî kir, wî wezîyeta manewî ya xwe jidestda, heta ew di paşîyê de

wek bê-îman jî mir. Ev hadîse û rûdan di Qur'ana Pîroz de wiha tê ragihandin:

"**Xebera wî yê ku me ayetên xwe dabûnê, ji wan re bixwîne; paşê ew ji wan derket, paşê şeytan bi dora wî ket, paşê jî ew bû ji rêşaşan. Heke me bixwestaya, me dê bi ayetên xwe mertebeya wî bilind bikiraya, lêbelê ew ma bi dinyayê ve û li pey hewesa xwe çû** [ew ji bo ehmeqtî û şaşbûnê dûçar bû]. **Meseleya wî wekî meseleya seg e; heke tu bi ser de biçî, ewê bike helkehelk, heke tu bi ser de neçî jî, dîsa ewê bike helkehelk! Ha ev e, rewşa wê civaka ku ayetên me diderewînin. Vê qisseyê bibêje, da ku ew tefekkur bikin**."[28]

Nimûneyek ji esrê seadetê jî, ji bo wan kesên ku pêşî heyateke xweşa evdînîyê dijîyan; lêbelê paşê ew bi dinyayê hatin xapandin, bedbext bûn û seadeta ebedî ya xwe bi sefaleteke ebedî guherandine jî hal û rewşa **Se'lebe** ye. Di serê pêşîn de Se'lebe xwe ji mizgeftê û ji sohbeta mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nedihişt. Lêbelê piştî ew bû xwedî mal û milk, hezkirina dinyayê kete dilê wî. Piştî demekê wî terka cemaetê kir, heta ew li ferza malê xwe zekatê jî îmtîna û asê bû û ew ji bo aqîbeteke hezîn û ğemnak dûçar bû.. Heke çi qeder ew di paşê de ji ber ku li şîreta pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] guhdarî nekiribû poşman bûbe jî, dema wî di nav perpitîneke bê feyde de can dida, ev îfadeyên pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin]:

"*-Ya Se'lebe! ew malê hindik ê ku tu karibî şukrê wî bikî, ji wî malê*

28. Eraf, 7/175-176

*zehf ê ku tu nikaribî şukrê wî bikî, çêtir e.*” çingênî ji guhên wî dianî.[29]

Ev rewş û halê şexsîyetê mezinê tarîxa Tesewwufê **Hezretê Sufyanê Sewrî** jî pirr bi îbret e:

Hezretê Sufyanê Sewrî di emrê ciwanîya xwe de piştxûz bûbû. Kî sebebê piştxûzbûna wî jê dipirsî, wî ev bersiv dida wan:

“-Xoceyekî min hebû, min îlm jê tehsîl dikir. Di ber mirina wî de heke çi qeder min kelîma tewhîdê jê re telqîn kiribe jî, lêbelê wî nekarî kelîma tewhîdê teleffuz bike. Dema min ev halê wî dît, wê ez piştxûz kirim.”

❀

Wekî ku hate dîtin aqîbet mechûl e. Wekî nimûneya sêhrbazên Firewn, hinek mirov hene ku li ser delaletê jîyane; lêbelê di axirê emrê xwe de gihane hîdayetê. Wekî nimûneya Qarûn û Bel‘am bin Baûra jî hinek mirov hene ku li ser hîdayetê meşîne; lêbelê di axirê de deftera xwe bi xusranê girtine. Naxwe însanek, di kîjan meqamê manewî, mertebe û çêtirbûnê de dibe bila bibe, nefs û şeytan tim û daîm li hemberî wî di kemînê de ne, ew kengê firsenda xwe lê bibînin, ew karin lingên wî ji ser sîrata mûsteqîm bişemitînin. Lewra wekî ku di Qur’ana Pîroz de hatiye ragihandin, Şeytan ji cenabê Heq Teala re got:

“**Ezê li ser sîrata mûsteqîm rûnim û li ber mirovan kemînê deynim da ku wan ji rê bixim!.**.”[30] û dubare heta roja vejînê mohlet jê xwest. Ji ber îmtîhanê jî Xuda Teala ew mohlet jê re daye.

---

29. Li Teberî, Tefsîr, XIV, 370-372; Îbnû Kesîr, Tefsîr, II, 388, binêrin.
30. El- ‘Eraf, 7/16.

Dîsa şeytên îtîraf kiriye ku evdên bi îxlas ên Xuda Teala ji vê teselluta wî hatine îstisna-kirin:

“**Îblîs got: Xudayê min! Naxwe heta roja ku însan dîsa bêne sağkirin mohletê bide min. Xuda jê re got: Bi rastî ew mohlet ji te re hatiye dayîn; heta roja dema pêzan! Îblîs got: Ez bi îzzeta te bikim; ezê wan tevan ji rê derxînim! Lêbelê ji navbera wan ew bendeyên te yên dilxalis na!** ” [31]

Ji bilî pêğemberan, wekî din ji ti mirovekî re garantî nîn e ku lingên wî dê ji ser sîrata mûsteqîmê neşemitin û ew ji wê xeterê di selamretîyê de ye. Ji ber vê sebebê divê her evdê mûmîn, di bara nirxandin û biha-pêdana nîmeta emrê ku jê re hatiye bexşkirin de bi awayekî layiq û ciddî ğeyret û cehdê bike. Dîsa çareya tekane ji bo xilasbûna ji ferfitîna sar a mirinê, ğeyret-kirina ji bo jîyîna emrekî salîhane ye. Lewra ew mirovên ku ji mirinê re hazir in, ew ji mirinê natirsin tam berevajîyê vê ew mirinê wek wesîleya wusleta ebedî werdigrin. Ev bendeyên mesûd ên Xuda gihane hizûra ku zanibin “mirinê xweşik bikin” lêbelê ewên ku heyateke ğafîlane dijîn û axreta xwe mehû dikin, ew ji cansojî û gera tarîya mirinê xilas nabin û ji hestpêkirina ferfitînên sar ên wê jî rizgar nabin.

**Hezretê Mewlana** çi xweş dibêje: “*Kurê min, mirina her kesî di rengê wî de ye. Mirin, ji bo mirovên ku dijminahîya wê dikin, jê nefret dikin û nafikrin ku ew wesîle ye, wan digihîne Xuda Teala, wek dijminekî tirsnak dixuyê. Lêbelê mirin li hemberî mirovên ku dostanîya wê dikin û jê hez dikin jî wek dost derdikeve, xuya dibe*.”

31. Sad, 38/79-83.

“*Ey canê ku ji mirinê ditirse û direve! Heke tu eslê kar û gotina rast dixwazî, di rastîyê de tu, ne ji mirinê ditirsî; lê tu ji xwe ditirsî.*”

“*Lewra ew tişta ku tu di eyneya mirinê de dibînî û jê dibizdihî, jê ditirsî ne çehreya mirinê ye, lê rûyê mekrohê te ye. Rûhê te dişibihe darekê. Mirin jî pelê wê darê ye. Her pel jî li gorî cinsê darê ye..*”

Ha evdek, dema di heyata dinyayê de ji ezperestîya xwe derbas bibe û di îstîqameta sifetên melekî yên di rûhê xwe de meknûz merheleyan qut bike, yanî heke ew bigihîje sirrê “*mirina berî mirinê*” hingê mirin, ji xeyalê bi wêdetir wek gava pêşîna mecbûrî ya wusleta Rebbê mûezzem û mûteal tê dîtin.. Bi vî awayî ew mirina ku di pirranîya mirovan de dibe sersebebê tirsê, ew di dilan de dibe heyecana gihiştina “Refîqê E‘la” yanî “dostê bilindtirîn”.

Çaxê dawîna **Resûlê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin], ew dema wusletê bû ku di zirweya vê heyecan û îştiyaqê de jîyabû. Ji ber ku wî di dirêjahîya emrê xwe de di her halûkarî de bi mehebbet îtaeta fermana Rebbê xwe kiribû, ew berî bimre miribû û wefata xwe ji xwe re kiribû **şeva erûsa** xwe. Çawa ku ji Hezreta Aîşe û ji Hezretê Elî -Xuda ji wan razî be- hatiye rîwayetkirin, gotine; berîya wefata Resûlûllah -dirûd û silavên xuda lê bin- bi sê rojan cenabê Heq her roj Cebraîl -silavên xuda lê bin- dişand cem Resûlê xwe. Bi vî awayî hal û xatirê wî pirsîbû. Dema bûbû roja dawîn vê carê Cebraîl -silavên xuda lê bin- bi melekê mirinê Azraîl -silavên xuda lê bin- re hatibû cemê.

Cebraîl -silavên xuda lê bin- jê re got:

“-Ey Resûlê Xuda! Melekê mirinê destûrê ji te dixwaze, ji bo were cem te! Hal-hal e berîya te wî destûr ji ti kesî nexwestiye

ji bo biçe cem wî! Di piştî te de jî ew destûrê ji ti kesî naxwaze ji bo biçe cem wî! Destûra wî bidin!"

Melekê mirinê çû hundur li pêşîya mezinê me Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin] sekinî û jê re got:

"-Ya Resûlellah! Xudayê mezin ez şandime cem te û ji min re gotiye ew çi fermanê li te bike, tu bi xebera wî bike! Heke tu bixwazî, ezê rûhê te bistînim! Heke tu bixwazî jî ezê rûhê te ji te re bihêlim! [Tu çi dibêjî?]"

Mezinê me Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê pirs kir, jê re got:

"*-Ey melekê mirinê! Ma bi rastî tu yê wiha bikî?*"

Azraîl -silavên xuda lê bin- jê re got:

"-Ferman ji me re hatiye dayîn ku di her xusûsê de tu çi emrî bikî, ez bi xebera te bikim!"

Cebraîl -silavên xuda lê bin- got:

*"-Ey Ehmed! Xuda bêrîya te dike!"*

Mezinê me Pêğember -dirûdû silavên xuda lê bin- jî got:

"*-Ya li cem Xuda çêtir û mayendetir e. Ey melekê mirinê! De heydê wê fermana ku ji te re hatiye dayîn bîne cih! Rûhê min û canê min bistîne!*"

Legeneke avê li cem mezinê me Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin] bû, wî du caran destê xwe di nav wê avê de noq kir, destên xwe şil kirin û ew bi rûyê xwe de birin û anîn ü got:

"*-La îlahe îllellah! Êş û dijwarîyên mirinê eql ji serê mirov dibin.*" Paşê wî destê xwe rakir, berê çavê xwe da qarçikê xênî û wiha got:

*“-Ey Xudayê m! Refîqê E‘la, Refîqê E‘la [dostê bilindtirîn, dostê bilindtirîn]!...”* Wî emrekî ji tezahur û xuyabûna çendîn xatira û bîranînên ulwî tije, li pey xwe hişt û ew bi îştiyaq û eşqa ji Rebbê xwe, ji vê alema fanî hicret kir û çû alema heqîqî[32]

Mûtesewwufê mezin **Hezretê Mewlana** jî piştî heyateke bi feyza evdînîyê jîyabû, wî nefesa dawîna xwe de jî bi heyecana wusletê jîyabû. Telebeyê wî **Husameddîn Çelebî** wext û dema xatirxwestina wî ji vê dinyayê wiha diguhêze, vedibêje:

Rojekê **Şêx Sedreddîn** bi giregirên derwêşan re hat Mewlana di nivîna nexweşîyê de zîyaret kirin. Wan halê Mewlana dîtin û pê ğemgîn bûn. Şêx Sedreddîn got:

“-Xuda şîfayên acîl bide! Ez hêvîdar im, tu bigihîjî sihheta xwe ya temam.”

Li ser vê gotina wî Mewlana jî got:

“-Êdî bila şîfa li we bimbarek be! Bi qasî para mûyekî mesafe di navbera aşiq û maşûq de maye. Ma tu naxwazî ku ew jî rabe û nûr tevlîhev bibin?”[33]

Mewlana ew mirina ku ji bo mirovan sebebê tirs û fikaran bû, wekî kabûsekê nedîtiye, berevajîyê vê wî ew xilasbûna ji ğurbetê û wek gihiştina Cenabê Heq Teala yê xwediyê Husna Mûtleq yanî sipehîtîyên bêdawî wergirtiye. Ew di çarmalikeke xwe de hesta xwe ya ji mirinê wiha îfade dike, vedibêje:

“*Dema ez bimrim ji min re nebêjin; mir. Lewra ez mirî bûm, bi mirinê sağ bûm. Dostê min rahişte min û ez birim...”*

---

32. Li Îbnû Se‘d, Tebeqat, II, 229,259; Belazûrî, Ensabû’l-Eşraf, I, 565; Ehmed bin Henbel, VI, 89.̓ Binêrin.
33. Li Ebûl-Hesen en-Nedwî, Tarîxa Lîderên Îslamê, cild, I, rûpel, 449’an binêrin.

Bi vê sebebê Hezretê Mewlana ji bo wê dema xatirxwestina ji vê dinyayê gotiye: “Şeva Erûsê” [Şeva Dîlanê].

❁

Bêşiwar heyata bi hizûra li dinyayê ya dostên Heq Teala û erbabên dil yên wekî Hezretê Mewlana, Yûnus Emre û Ezîz Mehmûd Hudayî, di alema qebrê de jî berdewam dike. Ev malikên li jêrê, hizûreke wiha terennum dikin:

*Mirin ji bo rindo welatê bihara asûde ye,*
*Dilê wî li her deverê bi salan wekî pixêrîyê dû derdixe...*
*Û di wê qebra di bin dara hînika serwê de razayî,*
*Her seherê gulek bel dibe, her şev bilbilek dixwîne...*

**Yehya Kemal**

Ji bo mirov karibe pêşwazîyê li mirineke bi vê sipehîtahîyê bike, divê mirov ji ezperestî û îhtîrasan xilas bibe, heyateke di îstîqameta fermanên îlahî de bijî û xwe ji bo nefesa dawîn hazir bike.

Rebbê me di ayeta pîroz de wiha ferman dike:

وَاعْبُدْ رَبَّكَ حَتَّى يَأْتِيَكَ الْيَقِينُ.

**“Heta yeqîn** [mirin] **were te; îbadetê her ji Xudayê xwe re bike!”**[34]

Ha ev destûr e ku heyata hemû dostên Heq Teala xulase dike!..

Her dilê arif û aşiq, wê heyata ku Heq Teala bi emanetî daye wan tim û daîm li ser sîrata mûsteqîm bi evdînî û îbadetê dixemilînin û tim di nav ğeyret û hewldanên de dibin ji bo xwe

34. Hicr, 15/99

biguhêzin dereceya “**qelbê selîm**” ewê ku ji cem Xuda Teala bedel û mûkafata îbadetê ye. Yanî ew xuyahîya îbadetê, ya ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di nefesa dawîya xwe de digot û terennum dikir; *“Refîqê E‘la, Refîqê E‘la/dostê bilindtirîn, dostê bilindtirîn…”* di wan arifên ku li ser rêç û şopa wî çûne de jî her berdewam kiriye.

Çawa ku yek ji van dostên Heq Teala jî Mehmûd Samî Efendî -quddîse siruhu- ye, ewê ku ğeyret kiriye û hewldaye temamê heyata xwe li ser rêç û sunneta Resûlûllah [dirûd û silavên Xuda lê bin] bijî, rewşa wî ya di nefesa dawîya wî de jî ji bo me çi nimûneyeke sipehî ye. Samî Efendî dostekî Heq Teala bû ku dilê wî ji evîn û hezkirina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] mişt û tije bû. Çawa ku mirovek di berfê de birêve diçe û li dûv wî şopa lingên wî çêdibin; paşê ew kesên ku li pey wî tên jî wan şope-pêyan taqîb dikin û rêya rast dibînin; ha Samî Efendî jî bi vî awayî şopa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] taqîb kiriye û emrê xwe derbas kiriye.. Wek xuyahîya vê jî wî nefesa dawîya xwe jî wekî ku di temamê heyata xwe de jî wilo bû, dîsa bi evîn û heyecana pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di cîrantîya wî de û di esnaya ku ezana teheccudan dihat xwendin de teslîm-kirina rûhê xwe jê re bû nesîb.. Ew mirovên ku di wê demê de li balê bûn dibihîstin ku ji zimanê wî bes ev lefzên ha dihatin bihîstin:

“Ellah, Ellah, Ellah!...”

Di rastîyê de ne zimanê wî tenê, lê temamê hucre/şaneyên wî jî bi cesedê wî û rûhê wî re daîm digotin; “Ellah”..

**Wel hasil** hemû mesele ev e ku mirov karibe wek evdekî baş bijî û wek evdekî baş jî canê xwe bide. Lewra tişta ku Cenabê Heq ji me arzû dike ev e; em karibin ji heyata nezîh û tevna dilê Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] para xwe

wergirin û em bibin evdekî zerîf, kûr, zirav, reqîq û hessas. Heke mirov karibe bi dengê ulwî yê xwe dilê xwe bide Heq Teala, hingê mirov dikare bibe mezher û xuyageh ji bo îltîfata Rebbê xwe ya ku dibêje; "**çi xweş evd e!**" Ev mehebbet û rûhanîyeta îlahî ji bo ğalib bibe, divê dilê mirov ji qirêj û zengarê paqij bibe ji bo tava nûra Heq Teala di wî dilî de rohnî bide... Di encama vê rewşê de jî -înşaellah- her nefesa ku em distînin ewê di mahîyeta hazirîya ji bo nefesa dawîn de bibe.

Li alîyê din, hemû windahî û zirarên manewî di encama jibîrkirina Xuda Teala çêdibin.

Xuda Teala di ayeta pîroz de ferman dike, dibêje:

وَلا تَكُونُوا كَالَّذِينَ نَسُوا اللَّهَ فَأَنْسَاهُمْ
أَنْفُسَهُمْ أُوْلَئِكَ هُمْ الْفَاسِقُونَ.

"**Hûn nebin wekî wan kesên ku Xuda ji bîr kirine, ji lewma Xuda jî nefsa wan bi wan daye jibîrkirin! Ha ew, fasiq bi xwe ne.**"[35]

Bi rastî hemû guneh, dema em Xuda ji bîr dikin, ew destpê dikin û dikevin dewrê. Lewra însanek, dema dibêje "Ellah" û haya wî ji heqîqeta mirinê hebe, ew bi haydarî li ser îbadet û hereketên xwe radiweste û ew bi hessasîyet hewl dide ji bo di jîyana xwe de ti canekî neêşîne. Yanî ew ne bi zimanê xwe, ne jî bi tevger û bizavên xwe strîyekî di mirovekî re dike...

**Hezretê Yûnus Emre** vê nezaketê çi xweş îfade dike:

*Dil textê Xuda ye,*
*Xuda li dil meyzand*

35. Heşr, 59/19

*Herdu cîhan bedbext bûn*
*Kî dil xirab bike jî*

Cenabê Heq Teala di Qur'ana Pîroz de gellek îqaz û şîyarîyan dide me û ji me re dide zanîn ka divê lêxistinên dilên me û nefesên me bi çi awayî bin da ku heyata me ji bo encameke ğemnak dûçar nebe. Ji vê hêlê ve hemû mesele ev e ku mirov karibe di çarçoveya naveroka vê ayetê de bijî:

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا اتَّقُوا اللَّهَ حَقَّ تُقَاتِهِ
وَلا تَمُوتُنَّ إِلاَّ وَأَنْتُمْ مُسْلِمُونَ.

"**Gelî yên ku îman anîne! Çawa xwe parastin pêwîst be, wisa xwe ji Xuda biparêzin û hûn, her misliman bimrin**." [36] Heke na, naxwe wekî din emr li vê dinyaya fanî çi dirêj be, çi kurt be, tiştekî îfade nake. Di encamê de hemû emr û temen ji bo tecellî û xuyabûna vê îzahata îlahî mûxateb û berpeyv in:

كَأَنَّهُمْ يَوْمَ يَرَوْنَهَا لَمْ يَلْبَثُوا إِلاَّ عَشِيَّةً أَوْ ضُحَاهَا.

"**Roja ku ew qiyametê dibînin, ew dibin her wekî ku ji êvarekê, yan jî ji danê sibeheke wê pê ve li dinyayê nemabin**." [37]

Ji ber vê, her tişta ku em bikin ev e; evdînîyek, îbadetek û taeteke bi qasî wextê êvarekê, yan jî danekê sibehê ye.. Di vê xusûsê de ev şîreta Hezretê Cuneydê Beğdadî çi îqazeke mezin e:

"*Saeteke dinyayê ji hezar salên qiyametê bi qîmettir e. Lewra li wir ti emelek nîn e ku mirovî bigihîne xilasîyê.*"

---

36. Alî Îmran, 3/102
37. Nazîat, 79/46

Ha her mewsima li pêşîya me, her roj û saet; ji bo evdînî, îbadet û taetê firsendeke mezin e. Bi taybetî ew heca[38] ku di van rojan de were îfakirin, ew bi serê xwe tenê telîmeke nefesa dawîn e.. Ew heca ku menzere û dîmena wê sehne û dika mehşerê ye... Ew îhramên ku mirov li wir li xwe dike, hewa û îklîma kefenî ye... Erefat; mekanê tobe û îltîcayê ye… Recma Şeytanan; di encama qutbûna ji peywendîyên dinyewî û nefsanî de gihiştina wê şiûr û pêhisê ye ka divê em çi qeder keviran li nefsa xwe bibarînin... Di dawîyê de em dibin wekî zarokekî ku nû ji dêya xwe bûyî wilo bê guneh, wilo wusleta Heq Teala di bîra xwe tînin.. Bi kurtî ew provayeke biçûk e ji bo her gav û qevzên ku em wan di nefesa dawîn de bavêjin. Cenabê Heq Teala heceke wiha ji bo me tevan îhsan bike!

**Ya Rebbî! Bûrandina emrekî wilo feyzdar bike qismetê me tevan ku em bi eşq û îştiyaqa gihiştina Cemala Îlahî nefesa dawîna xwe bidin!**

**Amîn!..**

❁

38. Ev nivîs, ji ber ku di wan mehên hec di wan de tê edakirin de hatiye weşandin, cih daye van îbare û çekuyan.

# *Nefesa Dawîn*

*-3-*



*Nefesa dawîn wekî eyneyeke bêhilm, şahîk û bê leke ye. Her însan, di vê eynê de sipehîtî û mekrohîyên temamê emrê xwe bi awayekî net û sade temaşe dike. Di wê anê de ti îtîraz û perdekeke ğefletê peya nabe, nayê ber çav û guhan. Tam berevajîyê vê, hemû perde radibin û her îtîraf; eql û wijdana mirovî dixe hewa û îklîma poşmanîyê. Naxwe bila ew eyna ku em têde bi poşmanî li heyata xwe temaşe dikin, nebe nefesa dawîn!..*

## Nefesa Dawîn
## -3-

Nefesa dawîn; wekî eyneyeke bêhilm û berraq e. Însan xwe bi awayekî tam net di nefesa dawîya xwe de nas dike. Mûhasebeya heyatê, li pêşîya qelbê wî û çavên wî tê şanîdan. Ji ber vê sebebê, ji bo însên menzereyeke ji dema mirinê bi îbrettir nîn e.

Wekî ku di Qur'ana Pîroz de hatiye ragihandin, ew **Firewn**ê ku heyata xwe li hemberî Xuda Teala bi îsyanê derbas kiribû, dema ew di behra sor de ji bo qehra îlahî dûçar bû, wî bi maneyeke rastîn xwe û emrê xwe yê ku ziyan kirî nas kir. Wî di nefesa dawîya xwe de fehm kir ku rûyê heqîqî yê selteneta nefsanîya wî ya li dinyayê di heqîqetê de ji sefalet û xusraneke mezin pê ve ne tişteke din e, û wî di dilê xwe de hest bi poşmanîyeke dehşetdar kir.

Xuda Teala di ayeta pîroz de ev rewş wiha daye zanîn:

"**Paşê, çi dema kete rewşa ku binav bibe, got: 'Bi rastî min jî îman anî ku ji bilî wî Xudayê ku zaroyên Îsraîl pê îman anîne ti îlah nîn in û ez jî, ji mislimanan im!..**"[39]

Lêbelê êdî tiştek nemabû ku were kirin... Dema Firewn di gera behra sor de li ber xeniqînê bû, mecbûr mabû ku xwe bi heleqeya îmanê bigre. Lêbelê Xuda Teala jî wiha bersiva wî da:

"**Ma niha** [tu hatî îmanê]**? Halev e ku berê** [di temamê emrê xwe de] **te guhdarî nedikir û tu ji xirabkaran bûyî**!"[40]

---

39. Yûnus, 10/90
40. Yûnus, 10/91

Ew kesên ku dema belayek tê serê wan eql digrin; lêbelê dema ew digihin selametiyê jî dîsa vedigerin ser harbûnî û serxweve-çûna xwe, encama îman-anîn, poşmanî û şîyarbûna wan a di nefesa dawî de ji xusraneke ebedî pê ve ne tiştek din e.. Ji vê cîhetê ve hiştina tobe û poşmanîyê ji bo nefesa dawîn, sebebekî mezin ê xwe xapandinê ye. Çi ğefleteke hezîn û ğemnak e! ku mirov di nav lihevketên surprîzên heyatê û med-cezîrên wê, yanî nizmbûn û rabûnên wê de li qêrîna kûr û bêdengîya mirinê guhdarî neke, mirov wilo ğafil bijî û hesab neke ku mirov bi xwe jî her dê rojekê di wî derî re derbas bibe..

Cenabê Heq Teala di gellek ayetên pîroz de eşkere dibêje: **"Me heyata dinyayê ji bo îmtîhanê aferandiye."**

Xuda Teala di vê ayeta pîroz de jî dibêje:

“**Her zindî dê mirinê t‘em bike, em we bi qenciyê û neqenciyê îmtîhan dikin. Hûnê, bes li me bêne vegerandin**.”[41]

“**Ew e, yê ku mirin û jiyan aferandine da ku we îmtîhan bike; ka karê kê ji we sipehîtir e**..”[42] Bi vî awayî ew, me şîyar dike da ku em xwe di ğefletê de noq nekin û ğaye û armanca aferandina heyata xwe ji bîr nekin.

Ji ber vê, ew hemû nefesên ku em bi îbadet, mûamelat û exlaq didin ji bo nefesa dawîya me di hukmê pûsûlayê de ne. Di eynî zemanî de ew hê li vê dinyayê ji bo halê me yê li axretê jî tercuman e.

**Îmam Ğezalî** -rehma xuda lê be- wiha dibêje:

“*Ewê ku li dinyayê negihabe zewqa merîfetê, ewê nikaribe li axretê jî zewqa mûşahedê biçêje. Ti kes, tiştekî ku li dinyayê*

41. Enbîya, 21/35
42. Mulk, 67/2

*qezenc nekiribe û bedelê wî nedabe, nikare li axretê bibe xwediyê wî. Li vir, her kesî çi çandibe, ewê li axretê wî biçine. Her kes çawa jîyabe, ewê wilo bimre. Ew çawa miribe jî ewê wilo dîsa sağ bibe. Ha em li dinyayê çi qeder ji bo merîfetê biser ketibin, yanî me çi qeder Heq Teala nas kiribe û bi mûcibê wê emel kiribe, li axretê jî emê ew qeder bigihîjin nîmetê wê.*"

Ji lewma her kes, bi nefesa ku dide û distîne di rastîyê de xwe ji bo ceza, yan jî mûkafata îlahî amade dike. Cenabê Heq Teala di vê ayeta pîroz de me evdên xwe, wiha hişyar dike, dibêje:

"**Gelî yên ku îman anîne! Xwe û malbata xwe ji agirekî biparêzin ku şewateka wî mirov û kevir in.**.."[43]

"**Dema cehennem were pêxistin û dadan, dema cennet ji bo ehlê wê were nêzîkkirin, dema ev hemû çêbibin, hingê her kes dizane wî çi xêr û şer ji bo xwe amade kiriye û bi xwe re aniye axretê**."[44]

"**Ku rewş ev e, naxwe hûn bi ku ve diçin?!**"[45]

Ji vî cîhetî ve her însan, mecbûr e bala xwe bide ser wezîyeta xwe û bide ser cihê ku xwe jê re hazir dike. Divê ew vê jî, ji bo nefesa dawî nehêle û di dirêjîya emrê xwe de bi wê hessasîyetê bijî. Lewra çawanîya kar û zirarê û qezenc û windakirinê xasê heyata dinyayê ye. Êdî di qebrê de ti qezenc û windakirin ne mewzû-behs û mijara axaftinê ye.

Ewên ku li ser axê bi surdarî, cazîbe û xapxapokên selteneta nefsanî, îzafî û fanî razî bibin û bi vî awayî wesfên rûhanî yên

43. Tehrîm, 66/6
44. Tekwîr, 81/12-14
45. Tekwîr, 81/26

xwe zeîf û qels bikin, bêşiwar ewê di bin axê de ji bo xusran û heqaretê dûçar bibin. Ji vê jî zêdetir, emrê me yê di bin axê de yanî heyata me ya qebrê jî mechûl e, ne pêzan e ka ewê çend caran bi qasî heyata me ya dinyayê bibe. Ji vê hêlê ve, wezîfa eslî ya mirovê ku xwedî eqlê selîm be, ev e; ew ji bo heyata dirêja qebrê û ji bo jîyana xwe ya di piştî wê de jî yanî ji bo alema bêdawîn hazirîyê bike.

Li rexê din, di dilên mûmîn de rûyê reş ê mirinê bi nûra îmanê digihîje ronahîyê, êdî ew ji tirseke lerzokî derketiye û bûye mizgînîya vejîneke ebedî. Ew qebristanên ku ji adresên dost û hevalan tije ne, ew ji bo ehlê îmanê ne warê tarîtîyan e; lêbelê ew cih û warê îrşad û îqazeke bêdeng e. Ji bo mûmînekî xwedî şiûr jîyan, heqîqetek e ku ew û mirin di nav hev de ne. Ji vî cîhetî ve mûmînê heqîqî, însanê bi mirinê re haşt û lihevhatî ye. Lewra ji ber ku ew jê re bi hazirî jîyaye, dilê wî, rehet û aram e. Bi kurtasî; ji bo nefesa dawîna me bibe sipehîtirîn an û dema me, divê em bi dilekî tije mehebbet bi Heq Teala ve pêbend û girêdayî bibin. Di rewşeke berevajîyê vê de, “heyateke ku bi hezkirina ji dinyayê û nefretkirina ji mirinê” bi dawî bibe, ewê bi zîyan û xusranê bi encam bibe.

Hazirîyeke kamil ji bo axretê, mûmkin e mirov wê wiha xulase bike; divê mirov xwe bixe çarçoveya wan “wesfên ku Rebbê me di Qur’ana Pîroz de gotiye; ez ji wan hez dikim” û mirov xwe di nav wan de bibîne. Ew jî ev in ku mirov di netîca teqwa, zuhd û îhsanê de xwe bi wesfên cemalî yên wekî merhemet, dilovanî, şefqet, diltenikî, xizmetkarî, efûkarî, fedakarî, cangorîtî û sebrdarîyê mûzeyyen bike û bibe evdekî ku Heq Teala jê hez dike. Li gorî vê divê mûmînek para xwe ji comerdîya Cenabê Heq Teala wergire û bibe xwediyê îkram û îhsanê. Divê ew teqwa û sedaqetê ji bo xwe bixe şîar. Li alîyê din jî, divê mirov xwe ji wan wesfên cehennemî yên ku Rebbê me ji wan

hez nake û hîçepîla wî ji wan diçe jî dûr bike. Ew jî ev in; ğurûr, kibr, îsraf, zulim, fitne, ğeybet, gotegot, îftîra, derew. Ev jî beşeke mûhîma hazirîya ji bo nefesa dawîn pêktîne.

Ji bo însan karibe nefesa dawîna xwe bi **hunsa xatîme** yanî li ser îmanê bide, pêşî divê ew qelbê xwe tezkîye bike. Yanî divê ew dilê xwe ji meylên mekroh û xirab paqij bike û wî bi xeslet û taybetmendîyên baş û bilind bixemilîne. Lewra bi vî awayî gihiştina qelb ji bo qiwama teqwayê, ew ji bo rêwengîya heyatê bi qîmettirîn çirağ û meş‘eleya hîdayetê ye. Ev îfadeyên **Hezretê Mewlana** jî her wekî ku vê mahîyeta tezkîyê îzah dikin:

“*Çêkirina gorê; ne bi keviran e, ne bi depan e, ne jî bi kulavan e. Divê tu di dilekî paqijê bêleke de, di alema paqijîya hundurê xwe de ji bo xwe gorekê bikolî û divê ji bo vê jî tu, li hemberî hebûna bilinda Xuda îddîa û ezperestîya xwe tine bikî..*”

Ji bo tezkîye bi maneya kamil çêbibe û qelb jî sewîye wergire, divê mirov ji hesta mehebbeta ji Xuda û Resûlê wî tije û mişt be. Mezintirîn elametê hezkirina ji Xuda jî îtaeta wî ye. Xwe xapandin jî ev e ku mirov li hemberî Xuda îsyan bike; lê bi serê zimanê xwe jî bibêje; ez jê hez dikim.

Cenabê Heq Teala di ayeta pîroz de wiha ferman dike, dibêje:

“[Ey Resûlê min! Ji wan re] **Bibêje: Heke bavên we, kurên we, birayên we, jinên we, xizm-eqrebayên we, ew malên ku we qezenc kiriye, ticareta ku hûn ji zerarkirina wê ditirsin û xaniyên ku hûn ji wan xweş in, ji we re, ji Xuda, pêğemberê wî û ji cîhada di rêya wî de hezkirîtir bin, êdî çavnêrîyê bikin heta Xuda fermana xwe bîne. Bêguman Xuda wê civaka fasiqan nayêne ser hîdayetê.**”[46]

46. Tewbe, 9/24

Ji bo vê jî, divê em mehebbeta qudsî ya xwe ya ji bo Xuda û Resûlê wî di ser her tiştî re bigrin û divê em heta bi nefesa dawîya xwe jî bi wecd li ser vî halê xwe berdewam bin. Di xusûsa hezkirina Xuda û Resûlê wî de sewîye wergirtina dilan, xwe di îfakirin û bicihanîna îbadet û emelan de nîşan didin. Ev wisa mûhîm e; lewra di navbera siwîye'ya wê evdînîya ku dilê bi sewdayên dinyayê ve mayî û ji hezkirina îlahî dûr îfa dike û wê evdîya ku dilê ji eşqa îlahî tije û mişt îfa dike de ferq û cudahîyeke mûdhiş û mezin heye.

Lewra ew mûmînê ku bi mehebbeta heqîqî bi Xuda û Resûlê wî ve hatibe girêdan, hal û hereketên wî, mûnasebetên beşerî yên wî û heyata wî ya îbadet û evdînîyê sewîye qezenc dike.

Yek ji wan xusûsên ku divê mûmîn di hazirîya ji bo nefesa dawîna xwe de zehf lê miqate be jî ev e ku ew karibe îbadetên xwe bi xuşûê eda bike. Lewra dema Cenabê Heq Teala di ayeta pîroz de wesfê wan mûmînên ku xwe ji agirê cehennemê xilas kirine, dijmêre, wiha dibêje:

قَدْ أَفْلَحَ الْمُؤْمِنُونَ; الَّذِينَ هُمْ فِي صَلاتِهِمْ خَاشِعُونَ.

“**Bi rastî mûmîn rizgar bûne; ewên ku di nimêja xwe de di nava tirsê de ne**.”[47]

فَوَيْلٌ لِلْمُصَلِّينَ; الَّذِينَ هُمْ عَنْ صَلاتِهِمْ سَاهُونَ.

“**Xwelî li wan nimêjkeran be ku ew nimêja xwe ciddî nagrin!**”[48]

47. Mûmînûn, 23/1-2
48. Maûn, 107/4-5

Wekî ku hate dîn, Cenabê Heq Teala ji bo evdên xwe mûrad kiriye ku ew di nav ahenga qelb û bedenê de heyateke îbadetê ya wisan durust bijîn ku ew ji bo wusletê bibe merhele û qûnağ. Ev mûrada îlahî jî, bêşiwar ne xasê bi nimêjê tenê ye; lêbelê ew ji bo rojî, hec, înfaq û hemû îbadetên dîtir jî zemîn û pêgehê pêktîne.

Ji vî cîhetî ve, divê îbadetê rojîyê, qedrê nîmetan bi me bide zanîn, kezeba me ji cihê matem û şînan nêzîk bike û li hemberî mirovên ku di nav kêferata tinetî û xizanîyan de ber fetlûba dibin jî kûratîya hestan û dilsohtinê bi me bide qezenckirin. Di eynî zemanî de ji ber ku rojî; di wextekî mûeyyen de me ji hinek helalîyan jî dide dûrkirin, ew telqîn û dan-hînkirineke dîtir e, ji bo bi me bide zanîn ka divê em xwe çi qederê ji tiştên bi şubhe û ji heramîyan dûr bixin. Hec jî hîçbûna evdî li hemberî ezemeta îlahî di bîra wî tîne û pê dide zanîn ku divê ew bikeve hewa û îklîma kefenî û di nav tefekkur û şiûrê de heyateke evdînîyê bijî. Ew mûmînê ku înfaqê dike jî divê di nav vê pêhis û şiûrê de be ku xwediyê heqîqî yê mal û milk Ellah Teala ye û ew bi xwe jî di cihê emanetdar de ye. Ji bilî vê jî ma ew mûmînê ku di hest û pêhisa înfaqê de be, yê çawa bi çavê xirab li malê dîgeran binêre?! Lêbelê pêhisa evdînîyê ya di bingeha îbadetan de bi qasî kûrahîya mehebbeta di dilan de dibe; ne jê zehftir û ne jê kêmntir. Dema dil ji gemar û jengarê paqij bibe, hingê îbadet jî digihin qiwama heqîqî ya xwe û li wir jî nûra tava Heq Teala diberiqîne.

Dîsa em bi awayê ciwantirîn di jîyana nimûneyî ya mezinê xwe pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û sehabîyên wî de mûşahede dikin ka emê îbadetên xwe çawa di nav tirs û xuşûê de eda bikin. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ti sefheyeke jîyana xwe ji rastîya axretê cuda mûtalaa nekiriye û tim bal kişandiye ser vê rastiyê; divê em xwe bixin haletê rûhî yê di nefesa dawîn de.

Çawa ku sehabîyek hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û jê re got;

“-Ya Resûlellah! Şîretan li min bike, lêbelê bila ew hindik û rindik be!” Vêca li ser vê daxwaza wî mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got:

“-*Nimêja xwe wekî nimêja wî kesê ku xatiran ji heyatê dixwaze, eda bike! Xebereke ku divê tu ji ber wê uzrê xwe bixwazî, nebêje! Hêvîya xwe ji tiştê di destê mirovan de jî qut bike!*”[49]

Ji vê hêlê ve, em wek mûmînekî ku di hewldana hazirîya ji bo mirinê de ne, em mecbûr in ku wekî heyata xwe ya îbadetê, di mûamelatên xwe û tevgerên xwe yên beşerî de jî em ji Sunneta Senîyye feyzê wergirin û wan pê xweşik bikin. Divê em bibin evdekî wisan bihavil ku ummet ji destê wan û zimanê wan îstîfade bikin. Divê em karibin tiştê ku ji xwe re dixwazin wan ji birayên xwe yên mûmîn re jî bixwazin û em bigihîjin dîgerbînîyê. Di netîcê de jî mehebbeta ku em ji bo Xuda û Resûlê wî his dikin, divê ew di dereceyeke wisan de be ku hemû mexlûqatan bixe ber xwe û ew bibe navgîn ji bo em karibin bi nêrîna Heq Teala li wan binêrin.

Yek ji xusûsên ku di hazirîya ji bo nefesa dawîn de mûhîm e jî ev e; em karibin hesta îhsanê di dilê xwe de sabit û cihgir bikin. Yanî em karibin her an û demê pevrebûna xwe bi cenabê Heq Teala re dabîn bikin û em tim xwe di bin çavdêrî û mûşahedeya îlahî de his bikin. Mezintirîn dilşadîya evdî ew e ku bi Rebbê xwe re bibe. Lêbelê ew eqlê ku bi qelbê xwe ve ne pêbend be û ji nefsa xwe re meğlûb bûbe, ew ji îdraka vê dûr e. Yanî ew ji dilşadîya mezintirîn ğafil û bêxeber e.

49. Îbnûmace, Zuhd, 15; Ehmed bin Henbel, Musned, V, 412

Dîsa divê mûmîn mûtewekkil û bisebr be. Divê ew li hemberî bahozên heyatê îtîdal û mûwazena xwe winda neke. Divê ew wan îmtîhanên giran ên ku di serê mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re derbas bûne bihizire. Digel ku wî di heyata xwe de ji heft zarokên xwe şeş winda kiribûn jî dîsa di haletê rûhî yê wî de ti lerze û şaşbûnek çênebûbû. Divê mûmîn vê “riza” ya wî ya sipehî ya bi qedera Xuda bîne bîra xwe û divê ew sebr û metaneta wî ya di dema şehîdkirina apê wî Hemza -Xuda jê razî be- û sehabîyê guzîde yê ku pirr jê hez dikir Mûseb -Xuda jê razî be- de ji bîr neke.

Pirr zerûrî ye ku rêwîyê heqîqetê di vê alema fanî de bela û mûsîbetan bi sebrê, jibîrkerîyê bi zikrê, nankorîyê bi şukrê, îsyankarîyê bi taetê, nemerdîyê bi comerdîyê, xwedbînîyê bi dîgerbînîyê, şubhekarîyê bi yeqînê, riyakarîyê bi îxlas û tewazûyê, îsyanê bi tobê û ğefletê bi tefekkurê berteref bike û bigihîje qiwama qelbî ya meqbûl..

Ji vê jî cuda, roj û şevên mûbarek bi taybetî jî ew wextên seherê ku bi zikrûllah tên îhya û sağkirin di vê alema fanî de ji bo nêzîkbûna ji Heq Teala an û midetên mûstesna ne ji bo firsendê. Tava seadeta axretê di reştarîya seheran de veşartî ye. Hemû dostên Heq Teala, yên ku hema bibêje wan mirin û heyat xistine nav hev û mezc kirine, wan di nava hestên mehebbet û xeşîyeta ji Xuda Teala di reştarîyên seheran de bi zikr û tefekkurê li rizamendîya Heq Teala gerîyane. Lewra ji bo aşiq û evîndarên Xuda seherên ku ji zikr û tefekkurê dûr derbas bûbin, ew bûne saetên hicranê.

Xusûseke mûhîma din jî înfaqa di rêya Xuda de ye. Xuda di ayetên pîroz de wiha ferman dike, dibêje:

وَأَنفِقُوا فِي سَبِيلِ اللَّهِ وَلا تُلْقُوا بِأَيْدِيكُمْ إِلَى التَّهْلُكَةِ
وَأَحْسِنُوا إِنَّ اللَّهَ يُحِبُّ الْمُحْسِنِينَ.

“**Malên xwe di rêya Xuda de înfaq bikin, xwe bi destên xwe navêjin xeterê û di her hal û karên xwe de qenciyê bikin, bi rastî Xuda, ji qencîkarên rast û durust hez dike**.”[50]

Mûfessiran **xeter**a ku di vê ayetê de hatiye îfadekirin wiha îzah kiriye:

“Bi sebeb tirsa ji feqîrtîyê, yan jî bi sebeb hezkirina ji dinyayê dûr rawestina ji fedakarîyê, ji înfaqê û ji cehd û ğeyreta ji bo xizmeta dînê xwe û ji bo bilindkirina dengê heqîyê ye.” Naxwe li gorî vê, divê her mûmîn, di her hal û karên xwe de di nav cehd û ğeyretê de be ji bo karibe di rêya Xuda de bi malê xwe û canê înfaqê bike. Lewra wekî vê heyatê her tiştên dinyayî yên din jî, her yek ji wan di stûyê me de emanetek e. Serfkirina van emanetan di cihê wan de dibe qezenca ebedîyetê û bi sebeb nemerdî û meyla rehetîyê jî berhevkirin û cemkirina wan ji nefsa xwe re jî dibe sersebebê xusrana axretê..

Divê her mûmîn, di xusûsa înfaqê de vê lewheya îbretê ji bîra xwe dernexe:

Piştî cenaze di qebra wî de tê danîn kurm jî xwe bi bedena wî ve digrin. Di vê navê de xizm û eqrebayê wî jî tezîya xwe xilas dikin. Piştre dema mîratxwerên wî destpê dikin malê wî li xwe parve dikin, ax jî destpê dike bedena wî perçe perçe û tine dike. Ev herdu faîlîyet jî bi vê nêrînê, di eynî zemanî de tên meşandin û xilaskirin. Li alîyekî bedena wî xilas û tine dibe, li alîyê dîtir jî serweta wî tê belavkirin. Rûhê wî bi heyret li vî halê wî seyr

50. Beqere, 2/195

dike, li gellek kirinên xwe poşman dibe, dixwaze destên xwe li kabên xwe bixe; lêbelê ne li meydanê dest mane, ne jî kab û çok mane!.. Lêbelê emel mûstesna ne… Lewra emelên salih û teqwaya ku însên li dinyayê qezenc kiriye, dibin çêtirîn sermayê heyata axreta me.

Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman dike, dibêje:

"*Qebr [li gorî emelan] yan bexçeyek ji bexçên Cennetê ye, yan jî kortek ji kortên Cehennemê ye.*"[51]

**Welhasil;** heyata me ya qebrê ku ewê heta bi qiyametê berdewam bike, ewê li gorî wezîyeta me û kirin û emelên me yên li dinyayê şekl û awa wergre.

Ha karê wan mirovên ku xwe ji bo mirinê hazir dikin û dizanin bimrin ev e ku mirinê ji xusranê xilas bikin, wê bi serkeftinê wergerînin û wê nexin matem; lê wê bixin "**Şeva Erûsê**". Zabitê mûzeffer ê bi navê Mehmetçîk jî yek ji wan bextiyaran e ku piştî heyateke feyzdara li ser vê îstîqametê û vê fikrê jîyayî gihaye Rebbê xwe, ew şexsîyeteke nimûneyî ye ku bîranîneke bêhempa ji tarîxa şandara me re hedîye kiriye:

Ev gêncê ku sîneya wî tije îman bû, wî di Herba Çanakkale'yê de bi wan ğeyretên mûstesna yên ku têde nîşan dane jî gellek feyde temîn kirine. Ew di piştî herba Çanakkale'yê jî ranewestaye, lê vê carê jî ew ji bo mûdafaa [parastina] ji welêt çûye enîya Rojhilat. Ew di esnaya levdaneke xwîndar de bi awayekî giran birîndar bûye. Wî li pey xwe, ji bo nifşên hêtên bîranîneke ulwî ya duduyan jî hişt û wî şerbeta şehadetê vexwar. Wiha ye:

51. Tirmizî, Qîyame, 26

Zabit Mûzeffer beg jî di xeta êgir de şerr kir û li ser wezîfa xwe şehîd bû. Wî di nefesa dawîya xwe de di wê hûredema ku êdî deng jê nedihat û çavên wî jî nikarîbûn tiştekî vebêjin de zerfek ji berîka xwe derxist; paşê ji erdê rahişt qirşikekî li nav xwîna ku ji birîna wî dihat xist û ev hevok pê nivîsî:

*"-Leşker! Qible, li kîjan terefî ye?!.."*

Leşkerên li hawîrdora wî jî berê wî Mûzeffer Begê ku dixwest berê xwe bide rexê Beytûllahê û wilo rûhê xwe ji Xuda re teslîm bike, dane rexê qiblê û arzûya wî anîne cih. Ev zabit, rûyê wî ji keyfxweşîya wusletê tije bû û wî rûhê xwe yê ezîz wek şehîd ji Rebbê xwe re teslîm kir.

Ha evd, di dirêjîya emr û temenê xwe de meslek û meşğûlîyeta wî kîjan dibe, bila bibe, heke ew ji îstîqamet û rasta qiblê cuda nebûbe, di dema dawîna wî de jî Cenabê Heq Teala bi wesîleyekê berdana rexê qiblê dixe nesîbê wî. Ew kesên ku di heyata xwe ya kar de, di hêlîna xwe ya malbatî de, di mûnasebet û têkilîyên xwe yên beşerî de û di heyata xwe ya evdînîyê de di naverok û mûhtewaya kelîma tewhîdê de bûbin, bi gelemperî ew di nefesa dawîna xwe de jî dikevin nav hewa û îklîma hizûrdara qiblê.. Tabîî ye ku ji qiblê jî meqsûd, heyateke wisan xweş e ku ew di îstîqameta Qur'an û Sunnetê de û di mûhtewaya kelîma tewhîdê de hatibe jîyandin. Ya giring ev e ku em karibin emrê xwe û van nefesên fanî yên xwe bi gihiştina sirrên ayeta: اهْدِنَا الصِّرَاطَ الْمُسْتَقِيمَ [**Rêya rast û durust ji me re nîşan bide**] yanî em karibin temenê xwe li ser sîrata mûsteqîm bibûrînin. Heke na, îhtîmaleke pirr xurt e ku emê bibin wekî gemîyeke ku rota'ya xwe winda kiribe û ne dîyar e ka ewê li kîjan zinarî bikeve û têde perçe bibe, emê jî wilo ji bo aqîbeteke tije xusran dûçar bibin. Cenabê Heq Teala me tevan ji felaketeke wiha mûhafeze bike.

Ewên ku gihabin sirrê hevoka: *“Em berî mirinê dimrin”* û heyata xwe jî her wekî ku di bîra mirinê de dijîn wisan emrê xwe dibûrînin, ew dostê Xuda, evdên wî yên arif in. Wade û peymaneke îlahî heye, dibêje; evdên wiha di qiyametê de ji tirs û ğemgînîyê salim dibin. Mirin, perdeyeke esrarengîz e ku alema ebedî di pişt xwe de vedişêre. Lêbelê ew ji bo wan evdên Xuda, yên ku heysîyeta xwe ya însanîyetê mûhafeze dikin û bi lutfa Xuda dizanin xwe ji bo nefesa dawîna xwe hazir bikin û têde mûweffeq jî dibin çi seadet û dilşadîyeke mezin e! Ji xwe merîfeta rastî jî ev e; mirov zanibe wî canê xwe yê ku emanet e, Xuda ji mirov re bexş kiriye, di nefesa dawîn de jî bi eynî safîyetê û wesfê selîm jê re îade bike.. Wekî ku şair dibêje:

*Ew dema ku têde perde radibin, perde tên kişandin;*

*Huner e ve; mirov zanibe ji Azraîl re bibêje; “Tu bi xêr hatî!”*

**Necîb Fazil Kisakurek**

Heqîqeten, nefesa dawîn her wekî eyneyeke bêhilm, şahîk û bêleke ye. Her însan di vê eynê de bi awayekî sade hemû sipehîtî û mekrohîyên emrê xwe temaşe dike. Ew dem, ti îtîraz û perda ğefletê li ber çav û guhan nayê kişandin. Berevajîyê vê, hemû perde radibin û her cure îtîraf; eql û wijdanê dixin qada poşmanîyê. Naxwe ew eyna ku em têde heyata xwe bi poşmanî temaşe bikin, bila ew nebe nefesa dawîn! Bila ev eyne, di dema ku em li gorî Qur’ana Pîroz û Sunneta Senîyye dijîn bikeve heyata me. Lewra bextiyarên heqîqî ew kes in ku berî mirinê nas bikin, pêşî wan xwe nas kiriye.

**Rebbê me, nefesa dawîya me bixe pencereyeke ku em di alema ebedî de têde mûkafata xwe temaşe bikin...**

**Amîn!..**

# Li Kaînatê Zikrûllah û Seher



*Bi berekettirîn wextê zikrê seher in. Cenabê Heq qîmetekî zêdetir dide zikrê ku di van deman de hatibe îfakirin ku ew heman qîmetî nade zikrê ku di demên dîtir de hatibe îfakirin. Îhyakirina seheran îfadeyeke xalîsane ya mehebbet û tezîmê ye ku evd li hemberî Rebbê xwe hest bi wan dike. Nimêja şevê û tesbîhatê wê, di mahîyeteke wiha de ye, her wekî ku mirov here yarê bilindê xwe bibîne û pê re sohbet bike. Naxwe divê mirov di nav wecdeke wisan de seheran îhya bike ku ew feyz û rûhanîyata xwe biguhêze temamê rojê.*

## Li Kaînatê Zikrûllah û Seher

Rebbê me bi tecellîya navê xwe "el-Hey" heyat ji bo hemû mexlûqatên xwe kiriye nesîb. Di esl û esasê xwe de li kaînatê hîç ti heyberek nîn e ku mirov karibe jê re "bêcan" bibêje. Heke çi qeder dema mirov candarên wekî giya, heywan û însan li ber çavan bigre û candarîtî ji bo wan tenê were dîtin jî lêbelê; heke em bi nêrîna mehebbeta îlahî li cumbuş û keyfxweşîya mad-deyên di nava atomê de temaşe bikin, em sergeşte û bi heyret bibînin ku di eslê xwe de ew maddeya ku bêcan dihat zenkirin jî candarîyeke wê ya dehşetdar heye û ew ne bêcan e.. Ev dehşet, bi berdewamî ji heyberên mîkro ber bi heyberên makro ve her ku diçe zêde û xuya dibe.

Cenabê Heq Teala xwe, bi hemû mexlûqatên xwe yên candar-bêcan yên ku wî ew aferandine daye naskirin û ew bi awayekî seraqetî û daîmî bi zikr-kirinê wezîfedar kirine. Bi vê sebebê hemû mexlûqat û heyber, bi lazimîya fitret û xulqîyeta xwe bi awayekî xasê hal û wezîyeta xwe Rebbê xwe nas dikin û jê re zikr dikin.

Cemadat, nebatat û heywanat, di heman demê de mezinê me Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û hemû pêğemberên din jî nas dikin. Ev rewş, bi berdewamî di mûcîzeyên nebewî de tê dîtin. Wan, dema wextê wê hatiye, bi lutf û destûra Xuda rûh ji bo keviran, kopalan û bêcanên wekî wan jî bexş kirine, dane wan. Bi vê sebebê ye ku kevirên di destê **Ebûcehl** de wek mûcîzeyeke **Pêğemberê** me bi ziman hatine, xeber dane, rastgotinîya wî tesdîq kirine û ji Heq Teala re zikr kirine. Ew esa û kopalê di destê **Hezretê Mûsa** de jî dîsa bi lutf û destûra Xuda bûye ejderha û xewf û tirs xistibûye dilê **Firewn**. Dîsa carekê Behra Sor xwe ji fermana Xuda re stûxwehr kiribû.

Ew ji bo Hezretê Mûsa û hevalbendên wî bûbû rê. Lê li hemberî vê jî dema dora Firewn û leşkerên wî hatibû, wê ew nas kiribûn û ew biribûn helakê. Ew darxurmê li Mizgefta Nebewî jî ji fîraq û hesreta Resûlûllah nalîya û girîbû. Ji van jî zêdetir, gellek heywanan gilehê xwediyên xwe yên ku zulm li wan kiribûn, ji wî Nûra Hebûnê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re kiribûn.

**Hezretê Mewlana** îtaetkirina cemadatan ji bo fermana îlahî çi xweş îfade dike, dibêje:

“*Ma tu nabînî? Ewr, Tav, Heyv û stêr hemû jî li ser nîzamekê tevdigerin. Her yek ji van stêrên bêjimar, di wextê xwe de dertê, wextê derhatina wan ne dereng dimîne, ne jî ew li pêşîya wextê derhatina xwe, dertê.*

*Ev heqîqet çawa çêbûn ku me ew ji mûcîzeyên pêğemberan nezanîn, fehm nekirin? Wan, kevir û kopal bieql kirin. Tu van bibîne û bêcanên din jî li kopal û perçeyên keviran qiyas bike.*

*Îtaetkirina perçeyên keviran ji bo Mezinê me Pêğemberê Ezîz û îtaetkirina asa jî ji bo Hezretê Mûsa, ew xeber didin ka ew heyberên ku em wan bêcan zen dikin çawa stûyê xwe ji fermana Heq Teala re xwehr dikin.*

*Ew dibêjin; "em Xuda nas dikin û em jê re îtaet dikin. Em ne tiştên pûç in ku bi rasthatinê hatibin aferandin. Em, hemû dişibihin Behra Sor. Digel ku ew behr e jî wê ew Firewnê ku dê noqav bikira û bixeniqanda û Kurên-îsraîl ji hev nas kirin û ew ji hev veqetandin."*

*Darek û kevirek li kuderê hebûye, dema wî Hezretê Mûstefa dîtibû, bi eşkerehî silav dabûyê. Ha wiha zanibe ku her tiştê te ew bêcan zanîbû jî candar e!..*”

Yanî ne tenê însan û cin, heywanat heta bi cemadatan û ev hemû heyber û mexlûqat jî bi sirreke îlahî mezinê me Fexrê kaînatê -dirûd û silavên xuda lê bin- yê ku ew ji bo xatirê wî hatine aferandin, nas dikin. Ew bi mehebbeteke bêdawî, bêqeyd û şert jê re îtaet dikin. Lêbelê ji ber sirra îmtîhanê li heyata dinyayê perdeya ğeybê li ber çavê însên hatiye danîn ji lewma ew di gellek caran de dibe asteng û nahêle ew vê rastîyê bibîne. Ev hedîsa Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ya ku me ji ğefletê şîyar dike, çi qeder bi îbret e:

“*Her çi tişta ku li navbera erd û asîmanî hebe her dizane ku ez pêğemberê Xuda me, lêbelê îsyankarên cin û însan netêde ne*.”[52]

Ev jî nîşan dide ku awayê naskirin û îtaet-kirina Xuda û Resûlê wî sade ne tiştekî xasê însên e. Tam berevajîyê vê, mirov dikare bibêje; di vê xusûsê de mexlûqatên din jî wek ğeyrê-îradî di asteke hê lipêştir de ne.

Cenabê Heq Teala di vê ayeta pîroz de xuyabûna vê heqîqetê di heybereke din de jî îzah dike, dibêje:

“**Me, ji Dawud re çiya û çûkên ku digel wî tesbîh didan stûxwehr kiribûn, em** [van] **dikin**.”[53]

Rebbê me di ayetên xwe de ğafilan şîyar dike û dide zanîn ku her tiştê wî aferandine, wî nas dikin û li derveyî îdraka me bi lîsanê halê xwe ji Xaliqê [aferînerê] xwe re zikr dikin. Bihîstina zikrê mexlûqatan jî bes di netîca îbadet, zikr, tesbîh û evdînîyeke semîmî de bi safîbûna dil, bi vî awayî bi rabûna perda ğefletê û bi waqifbûna ji alema heqîqetê mûmkin e. Sohbeta **Hezretê Yûnus Emre** bi çîçeka zer re jî ji vê mijarê ye. Ev qisseya dostê mezinê

52. Ehmed bin Henbel, Musned, III, 310
53. Enbîya, 21/79

Heq Teala **Hezretê Ezîz Mehmûd Hudayî** meşğûlbûna alema giyayan jî bi zikrûllah re çi xweş îfade dike:

Rojekê **Hezretê Uftade** bi mirîdên xwe re ji bo sohbeteke deştê ji mala xwe derketibû. Bi fermana wî hemû derwêş li sipehîtirînê deştê gerîyan û her yekî ji wan baqek çîçek ji xocê xwe re anîn. Lêbelê destîyê wê di destê Qadî Mehmûd Efendî de şikestibû, sade çîçekeke qermiçî hebû... Piştî wanê din bi keyfxweşî çîçekên di destê xwe de ji xocê xwe re pêşkêş kirin, Qadî Mehmûd stûyê xwe xwehr kir û ev çîçeka şikestî û qermiçî ji Hezretê Uftade re teqdîm kir. Hezretê Uftade di nav nêrînên bi meraq ê mirîdên din de pirs kir:

"-Kurê min, Mehmûd! Her kesî baq bi baq çîçek anîne lêbelê çima te çîçekeke destî-şikestî û qermiçî anîye?"

Qadî Mehmûd bi edeb serê xwe bi ber xwe ve tewand û cewab da:

"-Mezinê min! Ez çi jî ji te re teqdîm bikim hindik e. Lêbelê min destê xwe ji bo kîjan çîçekê dirêj kiribe ji bo ez wê biqurêfim, min ew di halekî wiha de dît ku wa ye "Ellah Ellah" dibêje û wilo ji Rebbê xwe re zikr dike. Dilê min razî nebû ku ez mena wan ji vî zikrê wan bikim. Ez jî bi awayekî bêçare mecbûr mam ku vê çîçeka nikare li ser zikrê xwe dewam bike, ji cenabê we re bînim.

**Hezretê Mewlana** dibêje:

"Siltanê çûkan legleg e. Ma tu dizanî "lek lek"ên wî çi ne? Ew dibêje:

Hemdû lek, şukru lek, mulku lek, ya Mûstean! "Hey Rebbê min ê ku arîkarî jê tê hêvîkirin! Hemd ji te re ye, şukr ji te re ye, mulk ji te re ye,"

**Mûhyîddîn Îbnû'l-Erebî** -quddîse sirrûh- jî di vê xusûsê de wiha dibêje:

"Hemû heyber bi awayekî xasê xwe ji Xuda re zikr dikin. Lêbelê di vê xusûsê de heyber di sewîyên cuda cuda de ne:

Di nav mexlûqatan de yên ji ğefletê dûrtirîn cemadat in. Lewra pêwîstîya wan bi îhtiyacên wekî xwarin-vexwarin û teneffusa hewayê nîn e.

Di piştî cemadatan de jî nebatat tên ku îhtiyac destpê dike. Lewra ew xureka xwe ji ax, av û tavê digrin bi teyîna îlahî terkîb dibin, çîçekên rengareng, pel û fêkîyan tînin wicûdê.

Piştre jî heywanat tên. Fonksîyonên heyatî yên van ji yên nebatatan mûtekamiltir in. Ji ber vê îhtiyacên wan zêde bûne. Nefsanîyet zêde bûne.

Îhtiyacên însên jî nizanin xilas bibin û dawî li wan were. Xeyalên ezperestîyê û îhtîrasên dinyewî wî daîmî diajoin ğefletê."

Xuda Teala di ayeta pîroz de dibêje:

يَا أَيُّهَا الإِنسَانُ مَا غَرَّكَ بِرَبِّكَ الْكَرِيمِ ; الَّذِي خَلَقَكَ فَسَوَّاكَ فَعَدَلَكَ ; فِي أَيِّ صُورَةٍ مَا شَاءَ رَكَّبَكَ.

**"Hey Mirov! Çi tiştê tu, li hemberî Xudayê te yê merd xapandî?; ew Xudayê ku bê kêmasî tu, durust, endam sağlem û mutedil aferandî; wî, di kîjan awayî de xwestibe, tu wisan di sûretê sipehîtirîn de berhevkirî û çêkirî.**"[54]

Ji bo mirov bizane bi awayekî rastîn maneya sirr û hikmetên ku di rûpelên kaînatê de hene wergire, ev keyfîyet bi kûrbûna di

54. Înfîtar, 82/6-8

alema dilî de pêbend e. Mûmînê ku bi nêrîna çavê dil li sererd û semayê binêre, ew jê agahdar bibe ku dilê wî bi hissîyateke zehf cuda tije bûye.. Qur'ana Pîroz îlan dike û dibêje; ji zerre'yê bigre heta bi kurre'yê her tiştên ku li erd û asîmanan hene ji Xaliqê [aferînerê] xwe re zikr û tesbîhan dikin. Dîsa ew radigihîne ku asîman, erd, çîya, dar, çîmen, tav, heyv, stêr, birûsk, heywan, kevirên ku digindirin û heta ew sihên ku bi rast û çepê ve dikevin erdê, her sibeh-êvaran diçûn sicûdê.

Xuda Teala di ayeta pîroz de vê rastîyê wiha îfade dike:

"**Ewên ku li erd û li asîmanan hene, bivên-nevên û sihên wan jî spêde û êvarê ji Xuda re her diçin sicûdê**."[55]

"**Ma ew berê xwe nadine tiştê ku Xuda ew aferandine, çawa siha wan ji rast û çep ve tê veguhastin, xwehr dibin û ji Xuda re diçin sicûdê?**"[56]

Ayetên pîroz heta tu bibêjî bes dîmeneke bi îhtîşam li pêşîya me radixin. Di vê dîmenê de secde bi beşdarbûna sihan jî dibin cot. Yanî secda yekê secda hebûnê ye, secda din jî di eynî zemanî de secda siha vê hebûnê ye.. Her zerreyeke kaînatê bi bawer-kirin, yan jî bi bawer-nekirin pevre ji bo îbadetê ji Rebbê xwe re diçin sicûdê û wan xwe li hizûra Xaliqê [aferînerê] xwe, daye bicihanîna wezîfa xwe... Naxwe dema hemû kaînat di sicûdê de be, heta dema hebûna munkir û ğafilan jî bê îradeya xwe ji îradeya Heq Teala re ram bûbe, heyhate, heyhate ku qelbê wan ğafilên di nav ğeflet û veciniqîna înkar û masîyetê de be, îbret bigre!..

Ew ğafilên ku ji bilî Xuda ji xwe re hinek îlahên din girtine, nizanin ku heta bi siha wan tiştên ku ji bo xwe kirine pût jî hemû

55. Re'd, 13/15
56. Nehl, 16/48

heyber di esl û esasê xwe de berê xwe dane wî Xudayê ku wan înkara wî kiriye û bi wê nîzama ku Rebbê te ew di hemû kaînatê de danîye ve pêbend in!. Ev çi xwe xapandin û zîyan e!

Dîsa di ayetan de sehne û dikek tê teswîrkirin ku ew ji sihan, tiştan, candaran û melaîketan hatiye pêkanîn. Tevek bi wecda îbadetê di nav xuşûê de wezîfa xwe îfa dikin. Bedbextîya reva ji îbadetê Xuda û mûxalefet-kirina ji fermana wî re jî ew wek keyfîyeteke xasê ğafilên veciniqî yên însên dimîne. Ayetên pîroz, stûxwehrbûna hemû mexlûqatan û heta bi siha wan jî ji Rebbê xwe re, her wekî tinaz û îstihza-kirina bi van ğafilan, li rûyên wan dixe.

Heqîqeten, heke em bi nezera îbretê li hawîrdora xwe binêrin, emê bibînin ku girtina asîmanan ya ku ber bi kûrahîya asoyan ve li ser erdê dirêj dibe û dirêjbûna çîyayan çi rewşeke guhêrbera sicûdê ye. Siha daran, çîçekan, çîmenan, heywanan û însanan ya ku ji rast û çepê ve li ser erdê dikevin, ew çi xweş wî halê sicûdê dide pêş. Her wekî ku ax, ji bo siha her heyberekî seccade ye. Bûyera baranê jî her wekî girîneke semawî ye, gurmîna asîmanan ya ku di piştî lêxistina birûskan de tê, feryadên eşkere ne, ku ji sîneya asîmanî vedirêjin.

Halê mexlûqatên li erd û asîmanan, ji bo kezebeke tenik û hestgerm çi îrşadeke pirr durust e. Niyazên ku ji dilê biçûkê wekî serê derzîyê yê kêzikekê bigre heta bi ireira heywanên mezin û cesîm tev tezahur û xuyahîyên cuda cuda yên herka qudreta îlahî ne.

Neğmeyên ğemgînê feryada ku ji kezeba wekî dilopikekê biçûka bilbil tên rêhtin, “hû, hû”yên ku ji qumrîyan [tivîlkan] diweşin û “lek lek”ên leglegan ji bo dilên bêrîkirî çi tesbîhên hestyar in.

Heq Teala di ayetê de wiha ferman dike, dibêje:

“**Ma tu nabînî ku yên li erdê hene û yên ku li asîmanan hene; Roj, heyv, stêr, çiya, dar, heywan û gellek ji mirovan jî, ji Xuda re diçin sicûdê. Ji gellekan re jî ezab heq bûye**.”[57]

Wekî ku hate dîtin hemû heyber heta cemadat jî, tev di halê tesbîhatan de ne. Lê mixabin ji ber ku hinek ji mirovan ji zikrê Xuda ğafil mane, ewê ji bo ezabê dûçar bibin. Heqîqeten zerreyên li cîhanê bigre heta bi kurreyan her tişt Xaliqê [aferînerê] xwe nas dike, heta bi çûkan jî îbadet û bergerînê xwe dizanin, çîya û rûbar li ser zikr û tesbîhan dewam dikin. Digel ku hal ev e jî, li hemberî program û bernameya mezin û mûkemmela zikr, tesbîh û îbadetê kaînatê şîyar nebûna însên, para xwe negirtina wî ji vê dîmena bi îbret û di halekî xêvik û ebûs de mehrûm mayîna wî ji zikrê Heq Teala çi windahîyeke tehl e ku ne layiqê heysîyeta însên e!...

Bêşiwar rêya unsîyeta îlahî ew e ku evd Rebbê xwe ji bîr neke. Mûmînên xwedî besîret li kîjan terefî binêrin, nûra zikrê wî li wir dibînin, guhên xwe bidin kuderê, li neğmeyên tesbîhên wî guhdarî dikin. Em jî li vê heyata dinyayê çi qeder ji Rebbê xwe re zikr bikin, emê sibê li uqbayê di wê sewiyê de bigihîjin wusleta îlahî.

Ji bo em bi wijdaneke temîz bijîn, li ser îmanê bimrin û bigihîjin sefa û hizûra ebedî divê em Rebbê xwe ji bîr nekin. Lewra emrê însanê ku Rebbê xwe ji bîr bike, di gera ğefletê de ziyan dibe û diçe. Ew bes bi mirinê ji wê ğefletê şîyar dibe. Lêbelê ew çax, her tişt xilas bûye û ew ketiye nava xusraneke mezin.

Xuda Teala di ayeta pîroz de wiha dibêje:

57. Hec, 22/18

“**Hûn nebin wekî wan kesên ku Xuda ji bîr kirine û ji lewma wî jî nefsa wan bi wan daye jibîrkirin! Ha ew, jirêderketî bi xwe ne**.”[58]

Çi dema yekî ji sehabîyan got:

“-Ya Resûlellah! Hukmên îslamî pirr bûne. Tiştekî wilo li min hîn bike ku ez pê bi hêsanî razîbûna Xuda û dilşadîya axretê qezenc bikim.” Mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got:

“*-Bila tim û daîm zimanê te ji tesbîhê zikrûllah ter be*.”[59]

Zikr-kirina Xuda, ne ev e ku mirov hema peyva navê Xuda bi zimanê xwe dubare bike. Lêbelê zikr, dema cihê xwe di qelb de bibîne ku ew merkeza îstîdada texessusê ye, hingê ew dibe sersebeb ku nîyet û emel bigihîje sewîya metlûb. Ha zikrekî bi vê keyfîyetê, bicihanîna wê peyman û ehdê ye ku bendeyî di “Bezma Elest” de: “**Erê! Ma ez ne Rebbê we me!**” bi Cenabê Heq Teala re kiribû û bi sedaqet ji bîrnekirina wî ji bo Rebbê wî ye.

Ji ber xetera mezina ğafil mayîna ji zikrûllahê ye ku Cenabê Heq Teala di vê xusûsê de gellek caran em evdên xwe şîyar kirine. Heta digel ku her yek ji **Hezretê Mûsa** û **Harûn** -silavên xuda li wan be- pêğember bûn jî dîsa dema Cenabê Heq Teala ew ji bo teblîğa peyama xwe şandin cem Firewn ji wan re got:

“**Tu û birayê xwe bi hev re ayetên min bibin, herin û di bîranîna min de sistiyê nekin**.”[60] Ew ji vê îqazê bider negirtine.

58. Heşr, 59/19
59. Tirmizî, Deawat, 4; Îbnû Mace, Edeb, 53
60. Taha, 20/42

Bi vî awayî, pirr mûhtemel e ku xwestiye ew ji bo me jî bibe nimûne û îbret.

Ji bo dilên mûmîn ji hişkbûna ğefletê xilas bibin û bigihin wê nezaket û hessasîyeta gihiştina rizamendîya îlahî jî, divê ew tim û daîm ji Xuda re zikr bikin. Lewra rêya vê di kirina zikrê daîmî re derbas dibe. Ev jî ne bi zikr-kirina di midetek û mewsimekê tenê de dibe; lê bi bi-xwe re hilgirtina hesta zikrûllahê di dirêjahîya emrekî tevî de û di her standin û dana nefesekê de mûmkin dibe ku bes bi saya vê hişyarîya manewî jî hasil dibe.

Cenabê Heq Teala di Qur'ana Pîroz de wiha dibêje:

أَلَمْ يَأْنِ لِلَّذِينَ آمَنُوا أَنْ تَخْشَعَ قُلُوبُهُمْ لِذِكْرِ اللَّهِ وَمَا نَزَلَ مِنْ الْحَقِّ وَلا يَكُونُوا كَالَّذِينَ أُوتُوا الْكِتَابَ مِنْ قَبْلُ فَطَالَ عَلَيْهِمُ الأَمَدُ فَقَسَتْ قُلُوبُهُمْ وَكَثِيرٌ مِنْهُمْ فَاسِقُونَ.

**"Ma ji bo yên ku îman anîne hê jî ew dem nehatiye ku dilên wan bi zikrê Xuda û wê Qur'ana ku ji wan re şandiye xwarê nerm bibin û bitirsin û ew nebin wekî yên ku berê kitêb ji wan re hatibûn? Di navbera wan û pêğemberên wan de demeke dirêj derbas bûbû û dilên wan hişk û hola bûbû. Gellek ji wan jî jirêderketî bûn."**[61]

Ev ayet, ji bo hinek ji wan sehabîyan şîyar bike nazil bûye ku digel ew li Mekkê di nav jan û tengasîyan de dijîyan jî lêbelê di piştî hicretê de çi dema ew gihane rizqê zehf û fereh û nîmet bi dest wan ketin ew sist bûbûn. Li ser vî esasî, divê em jî bikevin kêşûhewa'ya mehebbeteke bêdawî ji Rebbê xwe û divê em ji bo gihiştina zindîtîyeke manewî di nav hewldan û ğeyreteke wisan

61. Hedîd, 57/16

sağlem de bibin ku ti îhtîras û temakarîya dinyewî û menfîeteke fanî nikaribe wê bihejîne û zirarê bidiyê.

Lewra hezker, tim û daîm hezkirîyên xwe di dilên xwe de bi xwe re hildigrin, dibin û wan hîç ji bîra xwe dernaxin. Qelbê bê hezkirin wekî axeke xam e. Merîfet hezkirin e. Lewra sebebê hebûnê mehebbet e. Cenabê Heq Teala bi sebeb hezkirina ji zatê xwe, xwestiye ew were zanîn û wî ev alem aferandiye. Pîvana mezinbûna hezkirinê jî bi wê cangorî û fedakarîya ku hezker di ber hezkirîyê xwe de dike, tê zanîn. Ha şîyarbûna di seheran de û xwe avêtina ber penaha Heq Teala jî bariztirîn nimûneyeke vê rewşê ye.

❁

Digel ku divê mûmîn tim û daîm xwediyê hesta zikrûllah be jî, li rexê din jî bi berekettirîn wextê zikr, "seher" in. Cenabê Heq Teala qîmetekî zêdetir dide zikrê ku di van deman de hatibe îfakirin ku ew heman qîmetî nade zikrê ku di demên dîtir de hatibe îfakirin. Lewra di wextê seheran de meşğûlbûna bi zikr û îbadetê, ji meşğûlbûna bi zikr û îbadetê ya di wextên din de zortir e. Ji ber vê sedemê ye ku îhyakirina seheran îfadeyeke xalîsane ya mehebbet û tezîmê ye ku evd li hemberî Rebbê xwe hest bi wan dike.

Rebbê me, di bara wan mûmînên bextiyar ên ku ji wan razî bûye de wiha ferman dike, dibêje:

"**Bêguman mutteqî di nava baxçe û kehniyan de ne. Ew, nîmeta ku Xudayê wan daye wan, werdigrin. Lewra wan, berê jî hîn li dinyayê bi rast û durustî qencî dikir. Ew, bi şevê pirr hindik radizan û di zehfê wê de teheccud dikirin.**

**Di çaxê paşîvan de jî îstiğfar dikirin û lêborîna gunehên xwe dixwestin**."[62]

Dîsa Cenabê Heq Teala ferman dike, dibêje:

"**Ew Xudayê ku dema tu radibî nimêjê, te dibîne. Çûn û hatina te, ya di navbera secdebiran de jî dibîne**."[63]

Mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li ser nazilbûna vê ayetê, şevekê li nav malên sehabîyan gerîyabû, dîtibû ku wa ye wekî vizviza dengê mêşa hinguvîn wilo dengê tîlaweta Qur'anê, zikr û tesbîhatan ji malên wan tê.

Ha dijwarbûna eşq û mehebbeta îlahî di dilan de çi qeder be, bêşiwar reğbeta ji bo nimêja şevê û tesbîhatan jî di wê derecê de tezahur û xuya dibe. Ji vî cîhetî ve nimêja şevê û tesbîhatên wê, her wekî çûna hevdîtina yarê û sohbet-kirina pê re ye.

Cenabê Heq Teala di ayetên pîroz de wiha ferman dike, dibêje:

"**Di beşeke şevê de ji Xuda re here sicûdê; di beşa şevê ya dirêj de bi kirina nimêjên sunnet jî Rebbê xwe pak bidêre. Ev derewîndêrên han ji dinyaya ku xweş-zû dibuhure hez dikin û li pişt xwe jî emelkirina ji bo rojeke ezabê wê pirr giran, dihêlin**."[64]

"**Teniştên wan ji nivîngehên wan dûr dibe. Bi tirs û bi hêvî li ber Xudayê xwe digerin û ji rizqê ku me daye wan jî hinekê înfaq dikin**."[65]

---

62. Zarîyat, 51/15-18
63. Şûera, 26/218-219
64. Însan, 76/26-27
65. Secde, 32/16

Heqîqeten, ji bo mûmînên ku gihane kemalê şev, bi sebeb feyz û sikûneta ku di derûna wan de hene ğenîmeteke mûstesna ye. Ewên ku bi awayekî layiq xatir û qîmetê vê ğenîmetê dizanin, nexasim piştî nîvê şevê, yanî dema sikûneta kûr perên xwe bi ser cîhanê de berdidin, zemîneke feyzdar dibînin û berê xwe didin Rebbê xwe, ji bo qebûl-bûna dûa, îbadet û lavlavkirinên dilşewat ên ji bo Heq Teala. Çawa ku roj, ji bo temînkirina xureka bedenî wextê kar û şuğil be, di nêrîna wan de şev jî demên firsendê ne, ji bo xurekê bidin rûhê xwe û qelbê xwe bi Feyza îlahî rohnî bikin.

Telebên dostekî Heq Teala di bara meseleyeke ku hikmeteke wê fehm nekiribûn de jê dipirsin:

"Seydayê min, dema em li hawîrdorên xwe dinêrin, em dibînin ku va ye se û hinek heywanên din ji bo goştê wan nayên serjêkirin û ew bi ecelê xwe dimrin. Ji vê jî zêdetir hinek heywanên din jî hene, digel ku di zikekî xwe de gellek çêlîkan tînin jî dîsa hijmara wan zehf nabe.

Lêbelê însan bi qesda îbadetê bi pirranî mêşinan dixin qurban û xureka xwe jî ji goştê wan werdigrin. Mêşin digel ku evqas tên xerckirin jî bi giştî ew berxekî tenê tînin dinyayê lêbelê dîsa hijmara wan kêm nabe, heta berevajî vê hijmara wan her ku diçe zêde dibe. Gelo hikmeta bereketa di mêşinan de çi ye?"

Wî zatî piştî bi bevkenî û tebessum li vê pirsê guhdarî kir, ev cewaba bi hikmet dabû:

"Çi îbret e, ev rewşa ku hûn di heywanan de mûşahede dikin ji bo bereketa wextê seherê îşareteke bariz e. Lewra seher, ew wextên bereketê ne, ku di wan de rehm û feyz tavî bi tavî dibarin. Se di dirêjahîya şevê de direyîn û radiwestin. Lêbelê ew di wextê seherê de dikevin temara xewê. Mêşin jî di wextê seherê

de şîyar in. Ji ber vê yekê ew para xwe ji bereketa wextê seherê werdigrin."

Wekî ku hatiye dîtin, ewên ku seherên xwe ji bo xewê mehkûm dikin, ew ji vê bereket û feyzê mehrûm dibin. Çawa ku barana bi bereketa nîsanê li çol, derya û latên şahîk û hilû dibarin pûç diçin, heba dibin.

**Ya Rebbî! Me evdên xwe, nefeseke tenê jî ji xwe ğafil neke! Şev û rojên me bi bereketa zikrûllah rohnî bike! Dilên me, bi barana Feyza seheran îhya bike! Par-wergirtina ji heqîqeta mûhteşema zikrûllah bixe nesîbê me tevan! Mirovên ku ji îdraka ezemeta îlahî ya te mehrûm bûne jî hîdayet bike! Bi hurmeta mirovên ku di seheran de zikrê te dikin welatê me û milletê me ji şerrê şerîran mûhafeze bike!**

**Amîn!..**

# Qur'an û Tefekkur
## -1-



*Asîman çawa ku bi stêrên xwe ve wek tecellîyata seltenetmendîyeke bi qudret û ezemet heta bi Qîyametê dimîne, Qur'an jî, wê bi "ayet" stêrên xwe ve her wekî asîmanê îqbal û îstiqbala însanîyetê biberiqîne û ewê heta bi Qîyametê jî her bijî. Ji vî cîhetî ve, bi xêrtirîn û mesûdtirîn însanên cîhanê, ew mirov in ku di bin sîbera Qur'anê de kom bûne û xureka xwe ji nûra heyata wê wergirtine.*

## *Qur'an û Tefekkur*
## *-1-*

Sifetên îlahî ji bo Heq Teala bi maneyeke kamil di vê alemê de di sê mekanan de tecellî dibin:

**Însan, Qur'an û Kaînat...**

**Însan**, wek heybereke ku nesîbê xwe ji tecellîyatên hemû esma û navan wergirtî, kakil û cewhera alemê pêktîne. Her wiha ev esma û nav di halê kelamî de jî tecellî bûye, ew jî **Qur'an**ê îfade dike. Qur'an di vê xusûsê de ji însên mûfesseltir e. Lêbelê ji ber pevrebûna wan di kakil û cewherê de hatiye gotin;

"Însan û Qur'an, cêwî ne..."

Mekanê sisêyan ji bo tecellîyata esmayên [navên] îlahî **kaînat** e, ku ew jî ji bo Qur'anê her wekî tefsîrekê ye. Kaînat Qur'aneke bêdeng e, Qur'an jî kaînateke peyvdar û bi deng e. Însan jî bi cewhera xwe di nav van nûrên Qur'ana bideng û bêdeng de gihaye kemalê û ew di mewqîîyê siltanê tecellîyatekê de ye. Ji vî cîhetî ve "**însan, Qur'an û kaînat**" tam malbateke tewhîdê ne.

Asîman, çawa ku ewê bi stêrên xwe ve wek çêbûna qudreteke seltenetmend heta bi Qîyametê bimîne, Qur'an jî, wê bi "ayet" stêrên xwe ve her wekî asîmanê îqbal û îstiqbala însanîyetê biberiqîne û ewê heta bi Qîyametê jî her bijî. Ji vî cîhetî ve, bi xêrtirîn û mesûdtirîn însanên cîhanê, ew mirov in ku di bin sîbera Qur'anê de kom bûne û xureka xwe ji nûra heyata wê wergirtine.

Her sirr, hikmet û heqîqet di Qur'anê de veşartî ye, her seadet di îmanê de zahir e. Ev alema bêser û binî jî nîşan dide ku

cenabê Heq Teala bixwaze di zerreyê de ummanê û di ummanê de jî zerreyê vedişêre, yan jî eşkere dike.

**Hezretê Mewlana** jî pişta xwe dispêre van heqîqetan û wiha dibêje:

"*Rojekê di min de arzûyeke wiha şîyar bû, bila ez jî nûra Xuda Teala ya di însanan de bibînim. Her wekî ku min dixwest deryayê di dilopê de û tevê jî di zerreyê de bibînim....*"

Ji alîyekî ve, ev daxuyanîya ku rastîya arzû û îştiyaqa gihiştina heqîqetê derdixe holê û kûratîya di heqîqetê de îfade dike jî ev e; mezintirîn wasîteya însanî ya ku wî bibe zirweyan, **tefekkur-kirina** wî ji bo **heqîqetê** ye. Lewra wasîteya tekane ji bo gihiştina heqîqetê, heke tabîr caiz be şah raya wê, tefekkur û tecessus e.

Di tefekkur-kirina kaînatê ya bi dilî-qelbî de ğayeyên zirav û hikmetên nazenîn xuya dikin. Ji xwe li meydanê eşkere ye ku cîhan, di keş-hewa'ya îmtîhanê de dersxaneyeke îmanê ye. Di vê alema ku têde terbîye û îdareya îlahî di rewac û birêveçûnê de ye, ew însanên ku dibêjin têde cudahî û neyênî hene, wan [menfî û negatîfîyan] nîşan didin jî, ji alîyekî ve xuya dibe ku wan qîmetên xwe yên nefsî û şexsî bi heyat-derbas-kirineke li derveyî rizamendîya Xaliqê [aferînerê] xwe zîyan kirine û ji ber ku wan sermayê pêdivî ji bo ebedîyeta xwe dabîn û temîn nekirine, ew çi di nav gera xusraneke mezin de ne!.

Însan, divê zanibe bi heysîyet û şerefa evdbûna ji Heq Teala re bijî û pê bişkoka îstiqbala xwe veke, yanî mûemma'ya mirinê veke, wê di nav wehîyê de tefekkur bike û wê bi heqîqetê ve girêbide. Lewra ew mirina ku di halê gereke agirîn de dorê li her kesî digre, dema ew dibe dijwartirîn rastîya îstiqbalê ku bê-îstisna bi ser hemû beşeran de dikeve, hingê tefekkur-kirina wê,

heyat-derbaskirina bi mûcibê wê û gihiştina aramî û hizûrê di pêşîya emancên beşerî de tê.

Li ser vî esasî însan, îhtiyaca wî bi îrşad û rêşanîdana Qur'anê tenê heye ji bo kaînatê nas bike. Divê ew wesîle û navgîna rastîn jî bibîne, ji bo karibe bi awayekî durust li serê tefekkur bike û ji sirr û hikmetên îlahî yên di wê de jî agahdar û waqif bibe.

Lewra heke însan bê hebûna Qur'ana Pîroz bikarîya tefekkurê bi awayê kamil, eql, îz'an û îdrakek şanî bidaya, Xuda Teala ji evdên xwe re wek arîkarîyeke îlawe ne pêğember dişandin, ne jî Kitêba Pîroza xwe înzal dikir. Naxwe ji bo însan karibe bi awayekî layiq îstîdad û amadekarîya tecessus û tefekkura di xulqîyet û aferandinîya xwe de bikarbîne, îhtiyaca wî bi arîkarîyeke îlahî ya wiha jî heye. Heke însan ji bo Qur'anê nebûya mûxateb û peyvber, gelo ewê ji sifetên Xuda Teala yên wekî "**ehedîyet**" û "**semedîyet**"ê waqif bibûya? Mirov dikare bibêje ku Qur'an, bi rêya îrşad û îqazên xwe yên bêjimar berê sermayê fitrî dide awayê rasttirîn û sipehîtirîn ji bo însan karibe biherike ser deryaya heqîqetan tevan ku ew jî li cem însên ji bo tefekkur û tecessusê pêgeh û zemîn e.

Heke ew derîyê tefekkurê yê ku Qur'ana Pîroz ji me re vekiriye nebûya, emê ji îdrak-kirina çendîn heqîqetan û îfadekirina wan mehrûm bibûna. Li ser vî esasî, pirr zerûrî ye ku mirov hiş û mixê xwe li ser mûhtewa û naveroka bêdawîya Qur'anê biwestîne. Tabîî ye ku ev jî di nav pîvan û tixûbekî diyarkirî de bibe. Lewra Qur'ana Pîroz, li gorî beyan kiriye, "**çi tişta ter û hişk hebe**" tev têde hene, eynî wekî kaînatê gihiştina nîhayeta menzûmeya heqîqetên ku di wê de jî hene, ne mûmkin e.

Naxwe di xusûsa ku divê mirov çawa tefekkur bikarbîne de jî ufûq û asoyek heye ku Qur'anê ew bi îrşad û îqazên bêjimar ên

xwe xîşk kirine. Divê ev xusûs baş were fehmkirin û were îdrakkirin ka ew heta bi kîjan nuqteyan hene. Lewra eqlê ku ji me re hatiye bexşkirin di hecmê terazîya destekî de ye; lêbelê heqîqeta ku were kişandin jî di cesameta çîyayê Qaf de ye. Ji bo vê pirr zerûrî ye ku mirov di pota'ya wehîyê de bihele û mirov wê bi teslîmîyet mûzeyyen bike.

Ji vê hêlê ve ew mûfessirên ku nekarîna xwe îdrak kirine û heddê xwe zanîne, piştî her ayetekê bi maneya layiqa wê îzah kirine, wiha gotine: *"Xuda bêhtir dizane ka ya rast kîjan e..."* Wan beyan kiriye ku li cem cenabê Heq Teala heqîqet çawa be, lazim e mirov wê wisan bawer bike..

Lewra di mahîyeta ava li malekê di kûpekî de heyî de û ava di okyanûsê de ferq nîn e. Lêbelê di navbera hecm û kemîyeta bêsînora wan de ferq heye.

Li alîyê din jî heke ji mirovekî ku kor ji dêya xwe bûye re rengek were vegotin, bêşiwar ewê di zêhnê wî de şopekê bihêle. Lêbelê di navbera vê şopê û rastîya wî rengî de gelo çi qeder ferqeke mezina mahîyetê heye? Ev tam nayê pîvan.

Li ser vî esasî, divê mirov ji pencereya mentiqê ve nemeyzîne û mirov xwe ji vê îddîayê dûr bigre; ew maneya ku bi hewasên beşerî hatiye fehmkirin, ew maneya kamil e, ji bo hemû lefzên ku Qur'anê ew di nav xwe de hewandine.

**Welhasil** ev keyfîyet û sersebebên ku mirov dikare bi wesîleya îdraka însanî wan fehm bike, ku ew hemû jî mirovî digihînin heqîqetê, ew balê dikişînin ser sînordarîya tefekkurê. Vêga divê em hewl bidin ji bo çendîn baqan ji îrşad û îqazên Qur'anê ji dilan re pêşkêş bikin ji bo di vê rast û îstîqametê de pisporî û dîrayeta pêwîst tehqîq bibe:

Qur’ana Pîroz rêbereke bêhemta ya hîdayet û seadetê ye, di gellek ayetên pîroz ên xwe de bang li me dike ji bo em hikmetên ku di xulqîyeta însên de hene, nîzama xarîqûladeya di kaînatê de û bûna Qur’ana Pîroz jî wek mûcîzeyeke vegotin û beyanê, tefekkur bikin. Ew mirovên ku dixwazin bi awayekî layiqê heysîyeta însanîyetê bijîn, mecbûr in bikevin vê îstîqameta dinyaya tefekkura ku Qur’ana pîroz ew dîyar kiriye.

Hest û şiûra însanê ku li ser bûyerên kaînatê tefekkur dike, jê re wiha dibêje:

“Ev cîhan çi ye? Ez çima hatime aferandin? Heqîqet û mahîyeta rojên fanî çi ye? Rêya seadetê kîjan e?” Welhasil: “Ez çiyê kê me?.. Divê ez çawa bijîm? Divê ez çilo bifikrim?.. Divê ez çilo hazirîyê bikim ji bo xatiran ji vê alema fanî bixwazim?..” Ew li bersiva van pirsên ku her dirêj dibin û diçin, digere.

Di demeke ku kaînat hemû di nav herkên qudreteke hûr û hesabekî hessas de lihev dikeve de, ew însanê ku çêtirîn heyberê alemê û zîneta wê ye, gelo jê re rê heye ku ew bêhesab û bi rasthatinî ji bo nefsanîyeta xwe wek meğlûb, hereket bike?

Xuda Teala di ayeta pîroz de dibêje:

أَفَحَسِبْتُمْ أَنَّمَا خَلَقْنَاكُمْ عَبَثاً وَأَنَّكُمْ إِلَيْنَا لا تُرْجَعُونَ.

**“Ma we guman dikir ku me, hûn bes beredayî û wek leystik û keyfbûrandin aferandine û hûnê li me neyêne vegerandin?”**[66]

أَيَحْسَبُ الإِنسَانُ أَنْ يُتْرَكَ سُدًى.

66. Mûmînûn, 23/115

**"Ma ji însanî were ku ewê li dinyayê serberdayî were hiştin?!."**[67]

Dewra mesûmîyeta însên bi baliğbûnê re bi dawî dibe. Ji bo wan mûmînên ku hewl didin evdînîya xwe bi awayekî layiq bicih bînin jî di merheleya duduyan de dewra mes'ûlîyetê destpê dike. Di vê dewra kamilbûn û gihanê de ev jî li eql tê îlawekirin; divê ew bi çavê dil tefekkur bike ku cîhan; sirrên îlahî yên xwe, hikmetên qudsî yên xwe û rengên heqîqî yên xwe bes ji dilên bi-îman re vedike.

Xuda Teala di ayeta pîroz de wiha ferman dike, dibêje:

**"Ma ew li asîmanê ser xwe re nanêrin ku me ew çawa bêstûn ava kiriye, me ew bi stêran xemilandiye? Di wî de ti derz û terkek jî nîn e. Me, erd jî raxistiye, me têde çiyayên sabit durist kirine da ku neheje û me, li wê ji her çînîyên giyayê dîmen-sipehî, şîn kirine. Me ev tev kirine, da ku ji bo her bendeyê ku li Xuda vegere, bibin 'îbret, heq-dîtin û dibîranîn**."[68]

Ew mirovên ku temen û emrên xwe di ğeflet û nankorîyê de zayî dikin û di bara gera li çêkerê vê dinyayê û xwediyê rastî yê van nîmetan de tembelîyê dikin, ew nîmetên ku di bin wan asîmanên ku di wan de şev û roj dubare dibin û di wan de tav jî bêwestin derdikeve û diçe ava û ew bi xemla kewkeb û heyvê hatine tezyînkirin de bi zewq û sefa ji wan xweş îstîfade dikin.. Ev însanên ha, ev tenbîh û îrşad di bara wan de çi sipehî ne. Lewra Heq Teala di vê ayetê de di bara wan de ferman dike, dibêje:

---

67. Qîyame, 75/36
68. Qaf, 50/6-8

**“Me erd û asîman û yên ku di neqeba herduyan de hene jî, pûç neaferandine!”**[69]

**“Me, erd û asîman û mexlûqatên navbera herduyan jî bi leystikvanî û bêarmanc neaferandine! Me, ew herdu bes bi heqiyê aferandine; lêbelê pirranîya wan vê rastiyê nizanin**.”[70]

Cîhan, pêşangeheke ji bo şanîdana xarîqeya hunerê ezemeta îlahî. Di vî mekanê ciwan de her sîne’ya bi-îman bi şiûr û hest-germî digere û ew dibe xuyageh ji bo şîyarîyên fikrî, lerzeyên li hemberî herkên qudreta di kaînatê de û lezzetên manewî yên dehşetdar.

Xuda Teala di ayetên pîroz de wiha dibêje:

**“Ma tu nabînî ku bêguman Xuda, ji banî avekê dadixe xwarê, wê dixe kehniyên sererdê, piştre bi wê, çandiniyên rengên wan curbecur derdixe, hêşîn dike? Piştre ew hişk dibe, tu dibînî ku ew, zer dibe. Piştre wê dike qirşûqal. Bêşiwar di van de ji bo xwedî-eqlan dibîranînek heye**.”[71]

**“Bi rastî di xuliqandina erd û asîmanan de, di peyapey hatina kurtî û dirêjiya şev û rojê de, di keştiya ku tiştên ji bo feyda însanan di deryayê re dibe, diçe û tê de û di barana ku Xuda wê ji ewrên asîmanî dibarîne û bi wê erda ku berê ji bê-avî hişk bûyî bi hêşînahiyê vedijîne de û di her cureyên jîndaran de ku li rûyê erdê belav kiriye û di tevgera ba û ewrên fermanber yên di navbera erd û asîman de, helbet ji bo qewmekî bîrewer gellek delîl** [yên ku yekbûn û hebûna Xuda îsbat dikin] **hene**..”[72]

69. Sad, 38/27
70. Dûxan,44/38-39
71. Zumer, 39/21
72. Beqere, 2/164

Bi rastî ji bo çavên ku dibînin di rûyê asîmanî de nûra mehebbetê dibare, ji nav axê jî sewdayên zumrûdan vedirêjin. Her însanê xwedî tefekkura kûr, wekî erd û asîmanê ku bi çembera mehebbetê dor li wan hatine girtin, ewê ji zerûretê hestên xwe yên zahirî û derûnî bi mehebbeta îlahî berhev bike û ji rexê manewî ve jî tekamula xwe ji xwe re meslek bigre.

Xuda Teala ferman dike, dibêje:

"**Her ew e, yê ku erd raxistiye, têde çiyayên sabit û çemên ku diherikin aferandine û li wê derê ji her mêweyê du cot aferandine, ew bi şevê jî rojê dinixumîne. Bêguman di van de ji bo qewmekî ku tefekkur bikin, nîşan hene**."[73]

Ew mirovên ku evdbûna ji Rebbê xwe re û ummet-bûna ji Resûlê wî re seadet zanin di rabîta vê mehebbetê de sef digrin. Navê vî cebhê ulwî îman e. Îman jî hesteke qudsî ye ku ji nûra Heq a ku di dil de diberiqîne û ew ji mehebbeta îlahî ya ku kezebê tije dike pêkhatiye.. Ew mirovên ku bi dilekî feyzdar li kaînatê dinêrin, ew digihîjin hesteke wilo ku asîmanê di ser wan re dema bi kûrahî lê were meyzandin di nêrîna wan de her wekî ku mirov bi alîyê xwe ve dikişîne, dêhnê mirov dikişîne ser xwe û wekî komika sêwîyan avîzeyeke mûhteşema billûrê ji sirr û hikmetên îlahî pêşkêş dike; herçî rûyê erdê ye, her dar bi pelçimên xwe ve destên nîyazên xwe vekirine, bi lerizên geş li ber Rebbê xwe digerin.. Çîmen jî ji bo cemaeteke Mûhemmedî her wekî seccadê, li ser wê çîçekên bi sefa wek ummetekê bereba dibin...

Ew çîyayên ku nîşana qudretê ne, li hizûra Xuda di qîyamê de ne.. Ewr, wek serkehnîyeke gerok û seyyara feyz û bereketê her yek ji wan wekî behrekê li asîmanî digere.. Ba, nûçegihanê ğeybî yê îlhama îlahî ne.. Birûsk, çîkên tirs û hêvîyê ne. Beledî û

73. Re'd, 13/3

brusk, fermanên selteneta Qehhar û bombebaranên şîyarkirina ji ğefletê ne… Bi roj, xuyabûna nûra wî ne.. Bi şev, cumbuş û coşa sirr û hikmetan e… Bi kurtî cîhan, bi ayetên xwe yên tije cazîbe her wekî kitêbeke tecellîyat û sirran e; tecellîyata fiêlîya esmayên îlahî ye, her wekî Qur'aneke bê deng e… Qur'an jî cîhaneke bi deng û peyvdar e… Însan jî nuqteya eslîya îrfanê û abîdeya tecellîyatê ye ku di navbera herduyan de çaterêyek e..

Aîşe -xuda jê razî be- di bara riqqeta [tenikbûna] qelbê Resûlûllah -dirûd û silavên xuda lê bin- de dîmenekê wiha radixe ber çavan:

"Şevekê Resûlûllah -dirûd û silavên xuda lê bin- ji min re got:

"-*Ey Aîşe! Heke tu destûra min bidî, ezê şeva xwe bi îbadetê ji Rebbê xwe re derbas bikim.*" Min jî jê re got:

"-Wellahî, ez pirr hez dikim bi te re bibim; lêbelê tişta ku te keyfxweş dike, ez bêhtir jê hez dikim."

Paşê ew rabû ser xwe, desmêja xwe rind girt û rabû ser nimêjê. Ew ji xwe re digrî… Ew, ewqas girî heta ku ji hêstirên wî cilên wî, riha mûbareka wî û cihê sicûda wî jî şil bûn. Hê ew di vê wezîyetê de bû, Bîlal hat ji bo nimêjê bang da. Çi dema wî dît ku wa ye ew digrî, jê re got:

"-Ya Resûlellah! Çima tu digrî, ma ne ji xwe Xuda gunehên te yên ku bûrîne û yên ku bên tev jî efû nekirine?"

Vêca li ser vê gotina wî mezinê me Resûlûllah -dirûd û silavên xuda lê bin- jê re got:

"-*Ma bila ez nebim evdekî ku zehf ji Xuda re şukr dike? Wellahî îşev ayetên wilo ji min re hatine xwarê, xwelî li wan*

*kesan be ku wan bixwînin û li ser wan tefekkur nekin!*" û wî ev ayetên ha xwendin:

"**Bi rastî di aferandina erd û asîmanan de û di kurtkirin û dirêjkirina şev û rojê de ji bo xwedî hişan hemin nîşan hene** [ku yekbûna Xuda îsbat dikin]; **ha ew in, yên ku rabûyî û rûniştî û li ser teniştên xwe gêrkirî Xuda di bîra xwe tînin, navê wî her dibêjin û di aferandina erd û asîmanan de difikirin û dibêjin: Ya Rebbê me!. Te eva ha pûç neaferandiye! Tu ji nuqsanîyan pak û mûnezzeh î! Me ji ezabê êgir biparêze!**" [74]

Ev ayetên pîroz, wê şeva ku nazil bûn, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew qeder heta bi sibehê girîbû û kiribû ku dilê stêrên asîmanan bibijin girîyê wî. Bêşiwar bi lutf û kerema Xuda hêstirên çavên mûmînan jî zîneta şevên fanî, ronahîya tarîtîyên qebrê û li axretê jî dilopên şevnemên bexçên Cennetê ne.

Ji lutf û kerema cenabê Heq Teala hinek heyv, roj û şev hene ku demên firsenda gihiştina wusletê ne. Rebbê me, di wê teqwîma asîmanî ya ku wî bi xwe peyda kiriye û têde diwazdeh meh danîne de jî hinek meh ji hinek mehan çêtir kirine. Yek ji wan mehan jî Receb e ku jê re "**Şehrûllah**=Heyva Xuda" jî hatiye gotin.[75]

Di serdema cahilîyetê bi xwe de jî di vê mehê de xelkê wê serdemê şûrên xwe dixistin kalanê wan. Bi vî awayî, li pêşîya îhtîrasên xwîndarî jî perda sikûnet û aramîyê dihat kişandin. Çi dema Îslamîyet hat, dîsa vê hurmet û tazîma ku ji Recebê re dihat

74. Alî Îmran, 3/190-191 - Îbnû Hibban, II, 386
75. Ji ber ku ev nivîs di heyva "Receba Şerîf" de hatiye nivîsîn ku ew jî li serê sê-mehan rast tê, behsa vê mijarê kiriye.

şanîdan, berdewam kir. Ev heyva mûbarek, bi şeva îna pêşîn -bi zimanê melaîketan- bi "**Reğaîb**" û 27.ema "**Mîrac**"ê, yanî bi du şevên qendîlan hatiye şerefdar-kirin.

Naxwe divê mûhîmtirîn wezîfa me ev be ku em van şevan bi feyz û mehebbeta pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] mûzeyyen bikin. Lewra hezkirina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] sermayê seadeta qelbên me ye. Ew bextiyarên ku bi mehebbet îtaeta wî dikin û dilên xwe dane wî, ew rêwîyên ebedîyetê ne, ku digihîjin nîmetên Xuda û di nav qafîle û karwanê pêğemberan, siddîqan, şehîdan û salihan de beşdar dibin.

**Xuda Teala dilên me; ji feyz û bereketa van roj, şev û heyvên mûbarek ên ku em bi gihiştina wan mûşerref bûne, tije bike, dilê me ji nûra Resûlûllah rohnî bike û me bi mehebbeta wî bixemilîne. Me di mehşerê de di bin alaya mezinê me Resûlûllah -sellellahû eleyhî wesellem- de heşr bike û me bigihîne şefaeta wî.**

**Welatê me û temamê alema îslamê ji bo xêr, fitûhat û fiyûzatan bike mezher.**

**Ya Rebbî! Em ber bi ğurbeteka dirêj û mala bi tenêbûnê ve diçin. Bike ku li wir taveroja me îman be, dostên me pêğember û salih bin û bexçên seadeta me jî emelên salih bin!**

**Xudayê min! Me bike ji wan evdên xwe yên ku bi çavên dil li kaînat û bûyerên wê seyr dikin û xwediyê îdraka heqîqî ne! Ji kerema xwe, dilên me ji naveroka fermana celîla xwe ya "bixwîne" qismetmend bike!**

**Amîn!..**

# Qur'an û Tefekkur
# -2-




*Divê dilên me ji bo heqîqetên Qur'anî û Sunneta Senîyye ya Hezretê Pêğember -dirûd û silavên xuda lê bin- bi îştiyaq û mehebbet mişt û tije bibin. Lewra Qur'ana Pîroz û Pêğember -dirûd û silavên xuda lê bin- me ji bo rêya seadeta bêdawî û hîdayetê gazî dikin. Divê em ji bîr nekin ku Kitêb û Sunnet emanetên Pêğember in li cem me. Em bes bi mûhafezekirina wan û heyat-derbaskirina wekî naveroka wan dikarin xwedîtîyê li wan bikin.*

## Qur’an û Tefekkur
## -2-

Însan, ne heyberekî wilo ye ku tenê ji goşt û hestîyan pêktê. Ew mûcîzeyeke îcadê, yanî xarîqeyeke hunerê ye ku cenabê Heq Teala ji nav mexlûqatên xwe îstîdad û amadekarîya wusleta xwe ji bo wî kiriye nesîb. Însanê ku şeref û heysîyeta di xulqîyeta xwe de biparêze û bigihîje kemalê, qîmetekî mûezzem e ku ji feyzên îlahî re mezher e, ji tecellîyatên kewnî û îlmî re serkehnî ye û ji xêran re jî rûbar û çem e. Lewra Rebbê wî, ew gihandiye “**ehsenê teqwîm**” yanî ew gihandiye wesfê xulqîyeta sipehîtirîn..

Însanê ku gihaye lutfên wiha, zîyankirina wî ji bo hebûna fanî û emaneta xwe di gera şubhe û cehaletê de, bi îfadeyeke hê nettir, ji bo xwe dirûtina kefenê ezabê çi ğemnak e!

Însan, hedefên îmtîhanê ne, ku li hemberî tîrên nefsa xwe hatine danîn. Ji bo wê yekê divê însan, emr û temenê xwe di keş û hewa’ya şîyarîya qelbî de bijî û divê ew vê îhtîmalê ji bîr neke ku dibe bêhna wî di her qurtekê de biçike û ew di her luqmê de bixeniqe. Lewra emrê însên dişibihe teqwîmeke firsendê ku ew rojên bijimar ên heyateke fanî di nav xwe de dihewîne. Destekî ku nayê dîtin, her roj, pelekê ji vê teqwîmê dike û wê ji bayê ecel re dihêle.

Rojên me yên ku derbas bûne şahidên me ne, rojên di îstiqbalê [paşwextê] de jî mêhvanên me ne. Divê em xwe ji bo rojên mêhvantîya xwe baş amade bikin. Emr û temen dosyayên ebedîyetê ne. Melaîketên kîramen katibîn jî, bêyî ku îhtîmala xeta û şaşîyan hebe wan qeyd dikin. Rojekê ew dosya her dê derkevin pêşîya me û ewê ji me re bibêjin:

اقْرَأْ كِتَابَكَ كَفَى بِنَفْسِكَ الْيَوْمَ عَلَيْكَ حَسِيباً.

**"De kitêba xwe bixwîne! Îro, wek hesabpirs nefsa te besî te ye."**[76]

Ji bilî kitêba me, yanî deftera emelên me, ev sererda ku em li serê dijîn jî wek şahideke kirinên me, ewê li hizûra Heq Teala bi ziman were, biaxive.

Xuda Teala di ayeta pîroz de ferman dike, dibêje:

يَوْمَئِذٍ تُحَدِّثُ أَخْبَارَهَا.

**"Ha ew roj erd, dê hemû emel û xeberên xwe yên ku li ser wê hatibûne kirin, ragihîne û vebêje**."[77]

Înşaellah ew roj, em wek mûmîn rûyê me tevan wê sipî bibe. Ji bo vê yekê, Qur'ana Pîroz berê me dide vê rast û îstîqametê:

**"Teniştên wan ji nivîngehên wan dûr dibe. Bi tirsa ji ezabê Xuda û bi hêvîya rehma wî li ber Xudayê xwe digerin û ji rizqê ku me daye wan jî hinekê di rêyên xêrê de înfaq dikin**."[78]

**"Em vê qencîyê dikin, lewra em ji Xudayê xwe ditirsin da ku ew me di rojeke rûtirşker û tehlker de ji tirs û ezabê xwe ewle bike**."[79]

---

76. Îsra, 17/14
77. Zilzal, 99/4
78. Secde, 32/16
79. Însan, 76/10

“**Ew in ku ji ezabê Xudayê xwe ditirsin. Lewra ezabê Rebbê wan bênavber e**.”[80]

Qur’ana Pîroz radigihîne; ew kesên ku xwe ji ezabê Xuda di emnîyetê de dibînin, bêşiwar ha ew, ew mirov in ku zîyan kirine:

“**Ma ew ji ezabê Xuda piştrast bûne? Lêbelê ji civata ziyanker pê ve, ti kes ji mohlet-dana Xuda** [ya wiha] **xwe piştrast nadêre**.”[81]

Herçî ewên ku ji rehma Xuda bêhêvî bûne, Qur’ana Pîroz ji me re dide zanîn ku ew kafir bi xwe ne:

“**Hêviya xwe ji rehma Xuda qut nekin, bi rastî ji qewmê kafiran pê ve ti kes hêvîya xwe ji rehma Xuda qut nake**.”[82]

Qelbê mûmînî dê di navbera cemserên [qutbên] tirs û hêvîyê de bi heyecana evdînîyeke hevkêş bilerize. Ji vê miwazeneya hestên navbera tirs û hêvîyê re meqamê “**beynel-xewf werreca**”yê tê vegotin. Divê mûmîn tim û daîm di wezîyeta dûa, nekarîn û îltîcayê de bibe û heta yeqîn [mirin] were jî ewê di temîna vê miwazene û ahengê de bi tîtîzî hereket bike.

Xuda Teala di ayeta pîroz de dibêje:

“**Di piştî çaksazbûna erdê de tevdanê têde nekin.. Bi tirs û bi hêvî li ber Xudayê xwe bigerin, bi rastî rehma Xuda ji qencîkarên rast û durust nêzîk e**.”[83]

Naxwe divê mûmîn di nav tefekkureke wekî pênasî û terîfa di vê ayetê de bijîn. Çawa ku Xuda di ayetê de dibêje:

---

80. Mearîc, 70/27-28
81. Eraf 7/99
82. Yûsuf, 12/87
83. Eraf, 7/56

**“Ha ew mexlûqên ku ew li ber wan digerin, her ew bi xwe jî ji bo nêzîkbûna ji Xudayê xwe li wesîlê digerin, ka kîjan bêhtir dê ji wî nêzîk bibe, rehma wî hêvî dikin û ji ezabê wî ditirsin. Bêguman ezabê Xudayê te hêja ye ku jê were tirsîn**.”[84]

Ji bilî pêğemberan û yên ku wan dane zanîn wekî din ji bo ti kesekî din temînata xilasîya ebedî nîn e. Rebbê me ji bo teyîdkirina vê rewşê wiha dibêje:

**“Gelî yên ku îman anîne! Çawa xwe parastin pêwîst be, wisa xwe ji Xuda biparêzin û hûn, her misliman bimrin**.”[85]

Tirsa ji Xuda ronahîya seadeta dilan e. Qur’ana Pîroz ji gellek ayetên ezabê û xeberên dojehê tije ye. Digel vê jî hê jî hinek ğafil dibêjin:

“Xuda Ğefûr e; ew tê hezkirin, ji wî nayê tirsîn.” Qur’ana Pîroz jî li hemberî van îfadeyên wan, wan wiha şîyar dike, dibêje:

**“Gelî mirovan! Xwe ji Xudayê xwe biparêzin û ji rojeke wiha bitirsin ku ti bavek ji ber zarokê xwe ve ceza naxwe û ti zarokek ji ber bavê xwe ve ti cizayekî naxwe. Hemin peymana Xuda heq e. Zinhar bila jiyana dinyayê we nexapîne û bila şeytanê xapînok jî we bi rehma Xuda nexapîne ha!”**[86]

Dîsa hinek ğafil dibêjin:

“Bila gunehên te di stûyê min de bin!” Ew bi vê û îfadeyên wekî wê serî li bela-kirrîyê [çavnetirs-qebadayîtîyê] didin û bi

84. Îsra, 17/57
85. Alî Îmran, 3/102
86. Luqman, 31/33

bêşerefî û ehmeqî hewl didin bibin barhilgir û hemalê gunehan. Rewşa wan çi qeder ğemnak û hezîn e!

Însanê ğafil li dinyayê zêde keyfxweş dibe. Ew bi nîmetên dinyayê di zewq û sefayê de noq dibe. Herçî însanê salih û mûtefekkir e, ew jî heyata xwe ya dinyayê ji xwe re ğenîmet dizane; ew dikeve nav ğeyret û hewldanan ji bo bigihîje mertebeyên manewî û wilo dijî. Însanê ğafil bi qederê re yanî bi teqdîra îlahî re di wezîyeta lihevdan û îsyanê de ye. Ew di nav binbestîya [rêgirteka] pirsên wekî “çima” û “ji bo çi” de dimîne. Lêbelê ew kesê salih û mûtefekkir jî berê awira xwe dide ser hikmetê, hewl dide di heqîqetê de xwe kûr bike, ğeyret dike ji bo aramî û hizûra heqîqî bidestxîne û di wezîyeta razîbûnê de ye.

Hinek mirov jî wiha tevdigerin her wekî ku kûrahîyeke tesewwufî û tam cuda di wan de hebe. Ya rast, ew bi qelb û halê xwe negihane zirweya wan meqaman û ji esas û esrarên wan ne waqif in. Lêbelê ew bi awayekî ziwa û bêesas digel ku ew ne di meqamê **Mewlana**, **Yûnus** û emsalên wan de ne jî, dîsa ew bi serê zimanê xwe dibêjin; “ez ne Cennetê dixwazin, ne jî ji Cehennemê ditirsim.. Ez evîndarê Heq Teala me, ez bes ji wî hez dikim...” Bi vî awayî ew bi gotinên wiha, xwe mezin û di ser xelkê re dibînin, û wilo diaxivin û meczûbîyeteke sun‘î [çêkirî] radixin ber çavan. Ev helwesta wan bi ti awayan ne meqbûl e.

Ew şexsê ku xwe di Xuda de fena û tine kiribe, di qelbê xwe de hemû rêyên aîdê masîwa’yê wî digre. Ew bes rêyên ku digihin Xuda vedikirî dihêle. Ew di wî de digihîje kemala mehebbet û hezkirinê. Bi îfadeya **Ebdûlqadirê Geylanî** -quddîse sirrûh- Heq Teala ji bo evdê aşiqê ku were vê rewşê ewqas jê re hezkirî ye ku ji Erş bigre heta bigihîje ferş û binê erdê hezkirina hemû heyberan ji dilê wî derdixe. Hem jî wilo ji dilê wî derdixe ku ew evdê aşiq wilo dibe ku êdî ew ne dinyayê difikre, ne jî axretê. Heta ew

ji xwe bi xwe jî ditirse û dixwaze hedana xwe bi Rebbê xwe tenê bîne. Rewşa wî jî dibe wekî rewşa **Leyla** û **Mecnûn**.

Di wextê xwe de ew xortê [Qeys] ku bi hezkirina Leyla'yê mecnûn bûbû, ji navbera xelkê vediqete û destpê dike bi tena serê xwe dijî. Ew terka cih û warên memûr [ava] dike, li çol û beyaran dikeve nav heywanên wehşî. Ew ji bo xwe pesndan û dev-avêtina xelkê diavêje kenarekî û dibe ku ew van pesndan û dev-avêtinan nabihîze. Ew dikeve wezîyeteke wiha ku haya wî ji axaftin û huşbûna xelkê çênabe. Rojekê hinek jê re, yanî ji Mecnûn re dibêjin:

"-Tu kî yî?" Ew dibêje:

"-Ez Leyla me!"

Dîsa jê dipirsin:

"-Tu ji kuderê hatî?" Ew dibêje:

"-Ez ji Leyla'yê..."

Dîsa jê dipirsin:

"Tu diçî kuderê?" Ew dibêje:

"Ez diçim cem Leylayê..."

Çav û dilê Mecnûn ji ber dijwarîya evîna Leylayê ji alemê tevê re kor û nebîn bûbû. Guhên wî jî bûbûn ku ji Leyla'yê pê ve ti peyveke din nedibihîstin.[87]

Mûmîn dema bi evînê, Xuda -cellecelalehû- nas bike û di wî de fanî û tine bibe, hingê dilê wî ji hemû heyberan vala dibe. Êdî ew, bi wî tenê tije dibe. Arzû û reğbetên dinyewî û beşerî emr û temen xilas dikin. Dilê evîndar, di tenêbûn û qerebaliğan de

87. Ebdûlqadir Geylanî, Fethu'r-Rebbanî, rûpel, 284

unsîyet û hedana wî bi Rebbê wî tenê tê. Ew di nav vê fermana pîroz de: "**Wekî ku ferman li te hatiye kirin xwe rast û durust bike!..**"[88] yanî di îstîqametê de seadetê dibîne. Xuda Teala evdên xwe yên wiha li ser heqîqetên kûr waqif dike.

Cenabê Heq Teala Hezretê Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji beşerîyetê re wek "**şexsîyeta nimûneyî**" kiriye xelat. Mezinê me [dirûd û silavên Xuda lê bin] di her nuqteya pêvajo û qûnağên beşerî de ji mûmînî re nimûne ye.

Hatiye rîwayetkirin ku bi mûcibê ğalibbûna halê beşerî li ser **Hezretê pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin], wî li hemberî herdu nevîyên xwe Hesen û Huseyn hest bi hezkirineke ji lazimîyê zêdetir, kir. Vêca Cebraîl -silavên xuda lê bin- hate cemê û ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] pirs kir;

"-Tu zehf ji wan hez dikî?"

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got:

*"-Erê, ez ji wan hez dikim.*"

Ew çax, Cebraîl -silavên xuda lê bin- ev xeber dayê:

"-Yek ji wan wê jehrê bidinê û yê din jî wê were şehîdkirin…"

Di piştî vê hadîsê de pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di qelbê xwe de hevkêşîyek ji bo hezkirina nevîyên xwe yên ku bînahîya çavên wî bûn, bicih kir.[89]

Ev nîşan dide ku hezkirina ji Xuda ne têde ye, wekî din hezkirine ji tixûbê xwe zêdetir ji heyberekî din, li cem Xuda ne meqbûl e. Dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin]

88. Hûd, 11/112

89. Ebdûlqadir Geylanî, Fethû'r-Rebbanî, rûpel, 314

sersebebê hebûna alemê bû jî, ew jî heke -wekî ku di vê mîsalê de hatiye- negihaba îqaz û îrşada cenabê Heq Teala, hingê ewê bibûya ku wî zelleyek [ling şemitînek] kiribû. Naxwe divê em ji vê mîsalê fehm bikin ku di hezkirin û mehebbetê de îfrat-kirin ji hêla manewî ve zehf tehlûkedar e.. Naxwe dema em berê xwe bidin çi tiştî jî divê em hewl bidin hevkêşîya elaqeya qelbî ya xwe pêkbînin. Divê em wî ji xwe re nekin cure pût û senem. Lewra em wekî pêğemberan ne mehfûz in [parastî ne].

Di mehebbetê de hed-hidûd nas nekirin, dema berê wê sade li Xuda Teala be, caiz e. Heke hestên tirs û hêvîyê yên ji Xuda Teala di nava ahengekê de dewam bike, hingê dil dibin ewrên rehmê ji bo asîmanê îmanê. Lewra hezker, tim û daîm bi tirsa êşandina hezkirîyê xwe û bi endîşeya jidestdana mehebbeta wî, dil bi kutekut dijî.

Xuda Teala di ayeta pîroz de dibêje:

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا إِنْ تَنصُرُوا اللَّهَ يَنصُرْكُمْ وَيُثَبِّتْ أَقْدَامَكُمْ.

“**Gelî yên ku îman anîne! Heke hûn arîkariya** [dînê] **Xuda bikin. Ewê jî arîkariya we bike û nehêle ku lingên we bişemitin**.”[90]

Ji bo vê yekê, divê em di van dem û midetên keys û firsendê de bi hemû tezahur û xuyahîyên sipehîtîya îmana xwe defterên emelên xwe bikin pêşangeh ji bo emelê salih. Divê em mûmîn, ji bîra nekin ku em navîyên Adem -silavên xuda lê bin- in, ewê ku wek lutfeke xwe, Xuda Teala ferman li melaîket û ferîşteyên xwe kiribû ku ew jê re biçin sicûdê. Dîsa divê hîç ji bîra me neçe ku em xwendekarên mekteba esmayên îlahî ne. Em telebeyên der-sxaneya heqîqeta ledunnî ya Hezretê Mûhemmed Mûstefa [dirûd

90. Mûhemmed, 47/7

û silavên Xuda lê bin] ne. Em rêwîyên Sîratel Mûsteqîmê ne, ku ew heyata xwe ji Qur'ana Pîroz werdigre û pê dijî.

Naxwe divê dilê me, ji bêrîkirin, îştiyaq û hezkirina heqîqetên Qur'anê û Sunneta Senîyye'ya Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] tije û mişt bibin. Lewra Qur'ana Pîroz û Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] me ji bo rêya seadet û hîdayeta bêdawî gazî dikin. Rebbê me dide zanîn ku bes qelbê selîm digihîje wî. Li ser vî esasî, bêhest-bûn û bête-fekkur mayîna li hemberî vê banga wan, bes ğeflet û xusrana dilên kilîtkirî ye.

Xuda Teala di ayeta pîroz de dibêje:

أَفَلا يَتَدَبَّرُونَ الْقُرْآنَ أَمْ عَلَى قُلُوبٍ أَقْفَالُهَا.

**"Ma ew li şîretên Qur'anê nafikirin? Yan jî li ser hinek dilan kilîlên wan hene? "**[91]

Qur'ana Pîroz bang li mirovan dike ji bo li ser wê û ayetên wê yên bêmisl û nezîr tefekkur bikin:

أَفَلا يَتَدَبَّرُونَ الْقُرْآنَ وَلَوْ كَانَ مِنْ عِنْدِ
غَيْرِ اللَّهِ لَوَجَدُوا فِيهِ اخْتِلافاً كَثِيراً.

**"Ma ew hê jî li Qur'anê nafikirin? Heke ew, ji cem ğeyrê Ellah hatibûya, wan dê têde pirr îxtîlaf û nakokî bidîtana!"**[92]

Qur'ana Pîroz ji 14 sedsalan ve heye û ne mûmkin e mirov karibe ayeteke wê ya tenê jî nîşan bide ku ew bi îlm û fennê re nakokîyê bike. Tam berevajîyê vê keşf û îcadên ku di her sedsalê

91. Mûhemmed, 47/24

92. Nîsa, 4/82

de hatine kirin hêz û qeweta Qur'ana Pîroz zêde û xurt kirine. Qur'anê, berî 1400 salan tişta ku mirovekî bedewî lê digerîya û ew dixwest dabûye wî, rûhê wî tetmîn kiribûye û heyata wî bi awayekî sipehîtirîn tenzîm dikir. Îro jî ew dikare erbabên îlmê di asta jorîn de devqîç û heyirî bihêle, çi qeder wext derbas bibe, ew dike ku ew bi awayekî eşkere jê re stûxwehr û ram bibin! Lewra ewê heta qiyametê pêşîvanîyê ji bo pêşveçûnên îlmî yên ku çêbûne û yên ku hê çêbibin jî bike, û ew ji agahîyên tekûztirîn tije û mişt e.

Heta îro nêzîkbûna ji agahî û malûmatên mûcîzewî yên di Qur'anê de bi keşfên îlmî yên ku hatine kirin hê bêhtir mûmkin e. Ew peymaneke cenabê Heq Teala ye ku wek mûcîzeyekê di ayetan de hatiye ragihandin. Ev rewşên xarîqûlade di Qur'anê de û ev heqîqetên bilind, dema zemanê wan were, di çarçoveya peymana îlahî de têne cih.

Xuda Teala di ayeta pîroz de dibêje:

"**Emê hê ayetên xwe di asoyan de û di nefsa wan bi xwe de jî ji mirovan re nîşan bidin da ku ji wan re tam eşkere bibe ku ev Qur'an heq e. Ma ne bes e ku Xudayê te li ser her tiştê şahid e?**."[93]

Di rast û îstîqameta vê beyankirina îlahî de nimûne zehf in. Ha va ye, ji we re çend ayetên pîroz û çend heqîqetên îlmî.

Xuda Teala di ayeta pîroz de dibêje:

"**Gelî mirovan! Heke hûn ji "sağkirina piştî mirinê" bi guman bin, vê bizanin ku bêguman me hûn ji axê, piştre ji dilopek ava meniyê, piştre ji eleqê** [hêka fetrîmkirî], **piştre ji parçeyek goştê xulqiyeta wî diyar-nediyar aferandine. Da ku**

93. Fussîlet, 41/53

**em qudreta xwe ji we re eşkere bikin û yê ku em bixwazin jî heta demeke navlêkirî emê wî di malzarokan de bihêlin; piştre, emê we wek zarokan derînin. Piştre ji bo hûn bighîjin çaxê xortanîya xwe em we mezin dikin. Hinek ji we hene ku dê bimirin û hinek ji we hene ku dê li temenê dirêj bên vegerandin; heta piştî zanînê ew tiştekê nizanibe. Tu sererdê jî dibînî ku wa ye, ew hişk û hola ye; lêbelê dema em avê dadixin ser wê, ew dilebite, bilind dibe û ji her cure şînahiya** [yan jî ji cotan] **sipehî derdixe**."[94]

**"Sûnd be ku me mirov, ji encamekê, ji heriyê aferandiye. Piştre me ew, kiriye nutfe; dilopa ava meniyê û ew daniye malzarokê; cihekî ewle û sağlem.**

**Piştre me avedilopa meniyê aniye halê xwîneke hişk; peyre me xwîna hişk kiriye pişikek goşt; me ev pişika goştî kiriye hestî, me ew hestî bi goştî nixumandiye, paşê me ew wek mexlûqekî nû daye pêkanîn. Xuda pirr bilind e, sipehîtirînê aferîneran e!** "[95]

**Prof. Dr. Keith L. Moore** yê Kenedayî di berhema xwe ya ku di qada embîryolojîyê de nivîsandiye, piştî sefhe û pêvajoyên di rehma [malzaroka] însên de îzah dike, van agahîyan bi malûmatên ku di ayeta pîroz de hene re dide ber hev, û wî îtîraf kiriye ku îlm û Qur'an bi hev re ahengsaz in, heta Qur'an bi van mîsalan û pênasîyên ku eşkere kirine li pêşîya îlmê tibê ye..

Keith îfade dike ku îfadeyên nutfe, eleqe û mudğe yên ku di Qur'anê de hene, yanî xusûsîyeta van hersê sefhe û pêvajoyan jî bi heqîqetên îlmî re mûnasib û guncaw in, heta li pêşîya alema tibê çîkeke mezin digre û rêya wê rohnî dike. Ew sefhe û pêvajoya ku

94. Hec, 22/5

95. Mûmînûn, 23/12-14

bi rewşa **nutfê** hatiye îfade-kirin naveroka hemû lêgerînên îlmî dixe nava xwe. Sefha **eleqê** di wezîyeta xwîneke daleqandî û mat de ye. Hemû xusûsîyetên jîyana cenîn di vê xwîna di halê meyînê de hatine depokirin. **Mûdğe** jî goştê cûtî ye. Dema mirov li şeklê wî dinêre, tê dîtin ku ew her wekî di wezîyeta perçekek goştê cûtî de ye. Her wekî ku li serê şopa diranan heye. Di netîca van lêgerînan de Keith li biwara Qur'anê û Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hest bi jê re heyran mayînê dike û ew vê mûcîzeya Qur'anê ya berîya 1400 salan bi baweriyeke mezin tesdîq dike û ew bi îslamê şerefdar dibe.

Ev tesdîqa wî û yên wekî vê, Qur'ana Pîroz wek mûcîzewî wiha dide zanîn:

"[Hebîbê min!] **Bi rastî erbabên îlmê, ewê wê wehîya ku ji te re hatiye xwarê bibînin ku ew heq e û ew rêya Xudayê destbilindê pesnande nîşan dide**."[96]

Beşa zanista [îlmê] ku hûrkolînê li ser şopa telîyan dike jî derxistiye holê ku serê telîyan di dirêjahîya emr de hîç naguhere û eynî dimîne; serê telîya ti însanekî jî naşibihe serê telîya însanekî din. Ji ber vê sedemê di asayîş û hiqûqê de pêbawertirîn tesbîta nasnamê bi şopa serê telîyan tê kirin. Ev heqîqet, di dawîya sedsala 19'an de hatiye keşfkirin û ji hingê ve ji bo îstîfade-kirina jê destpê hatiye kirin.

Hal-hal e ku Qur'ana Pîroz berîya sedsalan bal kişandibû ser vê rastîyê û ew di vê xusûsê de wiha dibêje:

"**Ma ji însên were ku di piştî ji hev ketina wan de em nikarin hestiyên wî bicivînin? Erê, em wan dicivînin; em dikarin ser telîyên wan jî bi awayekî tekûz bînin rewşa wan**

96. Sebe, 34/6

**ya berê!**"[97] Bi vî awayî Qur'anê, berîya sedsalan bal kişandiye ser hessasîyeta serê telîyan.

Yanî Qur'an li pêşîyê, û îlm jî li pişt wê dewam dike. Xuda di ayeta pîroz de ferman dike, dibêje:

"**Bibêje: Sûnd be, heke însan û cîn bicivin da ku pirtûkeke mîna Qur'anê bînin holê çendî hinek ji wan ji hinekan re bibin arîkar jî, dîsa ewê nikaribin kitêbeke wekî wê bînin holê**."[98]

Lewra Qur'an, ne zanîna însanekî bêçare ye, lê ew zanîna Xuda ye, ewê ku li vê dinyayê qaîdeyên hemû îlm û zanînan ji însanan re lutf kirine. Di eynî zemanî de Heq Teala xwediyê vî kelamî ye û her ew e, yê ku ew îdrak aferandine ku navgîn û wasîteyên hemû keşfên îlmî ne.

Hemû enbîya û ewlîya, îlmên xwe ji heqîqetên Qur'anê werdigrin. Naxwe naveroka kitêbên pêşî yên îlahî jî di îstîqameta Qur'ana Pîroz de ye. Çawa ku însan, modeleke biçûka alemê ye, Qur'an jî di eynî awayî de kitêbeke îlahî ye ku ew hemû alemê dixe navbera xwe. Li ser vî esasî, ew îlmên ku wê di nav xwe de hewandine bêyî ku qeyda zeman û mekanî hebe, ew seraqetî ne. Naxwe wê hemû zeman di nav xwe de girtine.

Dostên Heq Teala bi vê îdrakê ji her peyvên wê, heta ji her herfeke wê bûne cih ji bo tecellîyatên sirrên curecurên wan. Dîsa dostên Heq Teala îfade kirine ku hemû îlmên wan û hemû berhem û eserên wan yên ku wan telîf kirine tecellîyek ji nûra Qur'anê ye.

❁

97. Qîyame, 75/3-4
98. Îsra, 17/88

Li vir, bi vê wesîlê em dixwazin vê jî bi kirp îfade bikin ku ev meha em têde ne, -înşaellah- emê bi hatina wê feyzdar bibin. Ew şeveke wekî Mîracê bi qîmet di nav xwe de dihewîne.[99]

“**Îsra**” berî hicretê bi sal û nîvekê di 27’ê meha Recebê de pêkhatibû. Yanî rêwîtîya mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji Mescida Herama li Mekkê ji bo Mescîdûl Eqsa’ya li Qudsê û “Mîrac” yanî hilgerîna bêdawîya wî ji bo asîmanan; tecellîyeke mezina îlahî ye ku ew li derveyî zeman û mekanî peyda bûye.

Xuda di ayeta pîroz de vê rêwîtîya qudsî wiha îfade dike, dibêje:

“**Ew Xudayê ku bendeyê xwe** [Mûhemmed] **bi şevê ji Mescîdul-Heramê biriye wê Mescîdul-Eqsa’ya ku me hawîrdora wê pîroz kiriye, da ku em hinek ayetên xwe ji wî re nîşan bidin, pak û munezzeh e! Bi rastî Xuda, bîser û bîner e**.”[100]

Xuda di ayeteke din de jî tecellîyatên bi hikmet ên vê rêwîtîya îlahî wiha îfade dike:

“**Di wê demê de feyzekê**[101] **sidre dipêça, çiqas ew dipêça her ew dipêça. Çavê pêğember neşemitî, şaş nebû û ji tixûb**

---

99. Tarîxa ku ev nivîs têde hatiye weşandin ji ber ku li wê şeva qendîla meha Recebê rast hatiye, wê behsa vê mijarê jî kiriye.
100. Îsra, 17/1
101. Hinek rîwayet hene dibêjin; ewa ku Sidre dipêça melaîket in, yan jî nûra Xuda ye.

**derbas nebû.**[102] **Wellahî wî dît, hem jî mezintirîn ayetên Rebbê xwe dîtin.**"[103]

**Bûyera Mîracê**, dema mirov bi hemû îhtîşam û ezemeta wê ve tefekkur bike, bi eşkerehî tê fehmkirin ku ev tecellîyata îlahî ya ku di an û demeke şevê de rûdaye, ew mûlaqateke "**Hebîb bi Mehbûb re**" ye, hatiye hazirkirin ji bo mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] qudret û ezemeta bêdawîya cenabê Heq Teala mûşahede bike. Hikmetên kûrên vê dawet û qebûla îlahî, nezaket û sipehîtîyên mûstesna yên wê, ji bo sînorê eqlê însên û tixûbê mentiqa beşerî pirr zehmet e ku karibe wê îzah bike û bi awayekî layiq wê îdrak û fehm bike. Ji vî cîhetî ve hikmetên derûnî yên vê rêwîtîya mûhteşem, ji bilî wan agahîyên sînordar ên ku hatine ragihandin, wekî din ew wek sirrekê di navbera Hebîb û Mehbûb de maye.

Divê em ji bîra xwe dernexin ku di vê şeva mûbarek de ew qendîlên ku di mînareyên me de diberiqînin; ew mînareyên ku wekî telîya şehdê bi asîmanî ve bilind dibin bîranînên qudsî ne, ku ji wê şevê mane û di roja me de xwe didin xuyakirin, ew ji me re nesîbên nûrdar û xelatên îlahî ne..

Ulwîtirîn bîranîna şeva Mîracê ji bo ummetê jî hîç guman nîn e ku nimêj e. Nimêj; sitûna dîn, ronahîya çavan, keyfxweşîya dilan, çavpêketina bi Xaliq re, welhasil mîraca dilên mûmîn e.. Naxwe bi rêjeya ku mirov ji Xuda re evd û ji Resûlê wî re ummet be, her yek ji me amade ye mîracên ferdî bijî. Elametên eşkere hene, didin zanîn ku mîraca jîyana evdînîyê bi awayekî

---

102. Ev îfadeyên di ayeta pîroz de bi vî awayî hatine tefsîrkirin:
"Hezretê Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew qeder berê xwe dabû Rebbê xwe ku hemû sipehîtîyên bêtixûb ên ku di melekûta asîmanî de temaşe dikir ew meşğûl nekir."

103. Necm, 53/16-18

taybetî bi nimêjê tê cih. Naxwe çawanîya nimêjên me jî pîvana asta mîracên me ye. Di rojê de ji bo çûna vê mîracê, yanî ji bo rêwîtîya wusleta ulwî di pênc wextan de ji me re bangname hene.

**Cenabê Heq Teala, vê şeva mûbarek ji bo temamê ummetê bike serkehnîya seadetê.**

**Xudayê me! Wê îstîqameta ku tu rehma xwe li me bibarînî, bike nesîbê me! Me ji xeniqîna di behra nefsanîya dinyayê de biparêze! Hey Rebbê me yê kerem zehf! Îdrak û têgihiştina heqîqetan bide me! Dilên me ji hezkirina xwe tije û mişt bike!**

**Xudayê me! Me bi îlmê Qur'anê bixemilîne! Di keş û hewa'ya tefekkura bêdawîya wê de û di gulşena mehebbeta Hezretê Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin] de dilên me sipûsağ bike; heta ku em karibin bi qelbê selîm werin hizûra te...**

**Amîn!...-**

# Qur'an û Tefekkur
# -3-



*Wekî wî tixumê çinarê yê wekî zerreyekê ku bi wasîteya axeke mûnbit dibe dareke nehîtî û îhtîşamê qezenc dike, tefekkur û hissîyata me jî di encama xwedîkirin û xurtkirina wê bi Qur'anê de heqîqet û hestên qelbî yên ku ewê bigihîje wan jî wê çi mûhteşem bin! Li ser vî esasî, heke ne ji feyza dawî-nehat û xilas-nebera Qur'anê û îrşada bilinda wê bûya, eynî wekî tixumekî ziwa tefekkur û hestên me jî ji axa mûnbit mehrûm diman.*

## Qur’an û Tefekkur
## -3-

Cenabê Heq Teala însan bi evdînîyê mûkellef û binbar kiriye û li erd û asîmanan çi hebin tev ji bo wî amade kirine.[104] Wî, însan bi hessasîyetên qelbî yên wekî îstîdad û amadekarîya tefekkurê xemilandiye da ku ew karibe vê evdînîyê bi kûrahîya hestan bijî. Dîsa wî di şiklê “**uswe’yê hesene**” yanî “sipehîtirîn nimûne û şexsîyetê rêzan” de bi şandina pêğemberan ji bo însên lutf û kerem keriye da ku însan di îmanê de kamil bibe û bigihîje wusletê.

Arîkarîya îlahî ji bo mirovan bi wasîteya pêğemberan hatiye cih, bi pêğemberê axir-zemanê û bi Qur’ana ku bi wasîteya wî hatiye teblîğkirin jî ew arîkarîya îlahî ji bo temamê beşerîyetê gihaye zirwê.

Ji ber vê sedemê ye ku bi îlawe li ser evqas nîmetên îlahî yên ku li ser me hene, hem ji ber ku em ji ummeta Mûhemmed in, hem jî ji ber ku Qur’an ji bo me bûye nesîb deynekî bêdawîyê me yê şukrê ji bo cenabê Heq Teala heye. Wekî wî tixumê çinarê yê wekî zerreyekê ku bi wasîteya axeke şinker dibe dareke nehîtî û îhtîşamê qezenc dike, tefekkur û hissîyata me jî di encama xwedîkirin û xurtkirina wê bi Qur’anê de heqîqet û hestên qelbî yên ku ewê bigihîje wan jî wê çi mûhteşem bin! Li ser vî esasî, heke ne ji feyza dawî-nehat û xilas-nebera Qur’anê û îrşada bilinda wê bûya, eynî wekî tixumekî ziwa tefekkur û hestên me jî ji axa şinker mehrûm diman. Naxwe ji bo me evdan ji îdrak-kirina ezemet û bilindbûna bêdawîya îkrama îlahî ya ku bi xêra Qur’anê hatiye cih nîmeteke mezintir çênabe. Di vê sedsala 21’ê

104. Li Sûretê Casîye, ayeta 13’an binêrin.

de ku serdema fezayî ye, bêsewîyetîya qewmên hoveberî yên ji teblîğa îlahî mehrûm ku di tefekkur û texessusa xwe de derxin holê jî bi awayekî bariztir vê rastîyê nîşan dide. Vêga hebûna bi mîlyonan mirovên ku ehlê dînên mûherref in, heta ew Bûdîstên ku Heykelê Bûda'yê ku ji keviran hatiye çêdikin, diperêsin, mûqeddes qebûlkirina Hindûyan ji bo heywana nekare çêlekê û hebûna bi mîlyonan mirovên ku heywanên wiha nekare ji bo xwe îlah qebûl dikin... ji bo em mezinbûna nîmeta Mûhemmedî ya li ser xwe fehm bikin, ew çi dîmen û menzereyên bi îbret in! Lêbelê tişta ji vê jî ğemnaktir ev e ku mirov ji nîmeta îmanê re bûbe mezher û bi hinek sebebên nefsanî û dinyewî yên ku ketine navberê li hemberê seda û dengê gur û xurtê heq û heqîqetê di nav kerrîtîyeke dehşetdar de bibe.

Xuda Teala di Qur'ana Pîroz de ji bo mirovên wiha ku di her çağ û serdemê de hebûne, wiha ferman dike, dibêje:

"**Ew kerr, lal û kor in...**"[105]

Li ser vî esasî, Cenabê Heq Teala dixwaze mûmîn li hemberî ayetên wî şîyar, bi feraset û xwedî kûratîya hestan bin.

Xuda Teala di ayeta pîroz de wiha ferman dike, dibêje:

وَالَّذِينَ إِذَا ذُكِّرُوا بِآيَاتِ رَبِّهِمْ لَمْ يَخِرُّوا عَلَيْهَا صُمّاً وَعُمْيَاناً.

"**Ew mûmîn in ku dema ayetên Xudayê wan di bîra wan têne-anîn, li biwara wan bi kerrîtî û korîtî tevnegerin**."[106]

Di serdemeke wiha de ji bo mûmînî du wezîfeyên zehf mûhîm hene:

105. Beqere, 2/18
106. Furqan, 25/73

Yek ji van, divê li cem me hestkirina bi şukrê nîmeta ku li ser me xuya dibe hebe, em qedr û qîmetê wê bilind û mezin zanibin û em bibin her wekî wan çîçekên nadîde yên ku di navbera qelşên zinaran de şensê şînbûn û geşbûnê bidest dixin..

Ya duduyan ew e ku mirovê bi vê dan, lutf û kerema îlahî mûşerref bûbe, ewê bi awayekî siriştî ğeyretkêş û hestgerm be da ku van heqîqetan bi hesta rehm, berketin û şefqetê ji bo mirovên ku ji wan mehrûm bin re teblîğ bike, ragihîne.

Xuda Teala di ayetên pîroz de wiha ferman dike, dibêje:

“**Bila ji we civakeke wiha pêkwere ku doza xêrê bike, şîreta qenciyê bike û men‘a neqenciyê bike. Ha ew in, yên ku rizgar bûne**.”[107]

“**Ma gotina kê ji ya wî kesê ku** [însanan] **gazî Xuda dike, emelê salih dike û dibêje; ez ji mislimanan im, sipehîtir e?!**”[108]

Heke were xwestin ku ğeyret û hewldanên vê teblîğê bi tebab û miqdarê metlûb û xwestî berhemdar be, şert e ku mirov ji her dem û wextekî din bêhtir bi mûhtewa û naveroka Qur’anê ve pêbend û hişliser be, mirov xwe li ser rêya Qur’ana pîroz rast û durust bike û exlaqê Qur’anê ji xwe re bike rewîşt û exlaq.. Maneya vê jî ev e; naverok û rûhanîyeta mezina Qur’ana Pîroz me mecbûr dike ku em bibin xwedî dîrayeteke qelbî û ğeyreteke ji dîrayet û ğeyreta zaniyarên xwezayê yên ku hûrkolînê li ser alema maddî dikin, zehftir be.

Li holê eşkere ye ku zanist û hîndekarîya hemû matery-alîstan ji biçûkxistina mirovan û hazirkirina sefalet û xizanîya wan pê ve ti encameke din hasil nekiriye. Sersebebê encama vê

107. Alî Îmran, 3/104

108. Fussîlet, 41/33

wehm û pûçezenê jî ev e ku heqîqeta însên bi eql tenê hatiye wezinandin. Qur'ana Pîroz jî eqlê ku bi wehyê qîmet wergirtiye destnîşan dike û li cem xîtaba şazdeh caran: [يآ اوُلِى اْلاَلْبَابِ] "**Gelî xwedî eqlan!**" di gellek carên dîtir de jî bi vê terzê, têde: "**Ma hûn eql nagirin, ma hûn nafikrin, ma hûn tênagihin?**" îqaz û tenbîhat hene.

Qur'ana Pîroz di pêşîya hemû zanist û îlman de diçe. Wê ev heqîqet derxistiye holê ku ew çi serkehnîya mezina ezemetê û jêdera feyzê ye! Her roja ku ber bi qiyametê ve derbas dibe, tefekkura beşerî jî bi keşfên nû, dîsa vê heqîqetê tescîl û tesdîq dike.

Em misliman, divê mes'ûlîyeta xwe bifikrin û bilerizin ji ber ku me mûkemmelîyeta Qur'anê ji însanîyetê re îzah nekiriye, me di xusûsa îqazkirina wan de têrê nekiriye û em nebûne nimûne. Ji vê jî zêdetir, heke em nikaribin heqîqetên Qur'anê yên ku ji berîya sedsalan ve bi hemû keşfên îlmî yên ku hatine kirin ve, bi mîlyonan car hatine teyîd û destek kirin, biweşînin û belav bikin. Digel hebûna îmkan û wasîteyên curecur ên ku serdema em têde dijîn ji me re dabîn dikin jî hingê ew mirovên ğafilên ku di çar alîyên cîhanê de yanî li ser vê stêrkê, li gerdûnê dijîn, ewê roja qiyametê li hizûra Xuda li dijî me bibin dawedar. Ev jî berpirsîya me zêde dike. Lewra gellek keşfên îlmî yên di roja me ya îroyîn de hêsankarîyên mezin ji me re temîn dikin ku di serdemên berê de ew tine bûn.

Li kaînatê hinek heqîqetan, bi awayekî wisan cihê xwe di Qur'ana Pîroz de wergirtiye ku bes dema sewîye û asta îlmî mûsaid be, ew tên fehmkirin. Yanî Qur'an, heta qiyametê li gorî sewîya îlmî ya her wext û serdemê û li gorî îdrak û têgihiştina mirovan heqîqetên xwe şanî dide. Bêşiwar ev keyfîyet jî, merhemeta îlahî wê îcab dike.

Lewra xusûsîyetên xarîqûlade yên ku di aferandinî û xulqîyeta însên de hene, keşfên mezin ên tibbî û çendîn heqîqetên wekî program û nîzama ku di xerîta erd û asîmanan de hene û zêhnê mirovî dixin heyret û dehşetê, heke berîya keşfa îlmîya wan bi awayekî eşkere di Qur'anê de hatibûna îfadekirin, hingê însanên wê serdemê li gorî sewîya eqlî û îlmî ya xwe ev qebûl û tesdîq nedikir, di encamê de jî ne mûmkin bû ew bi îmanê mûşerref bibûna..

Qur'ana Pîroz ji vê hêlê ve wekî axeke kevnar e ku çi qeder ew tê kolan, ewqas defîne jê dertên. Bes ev lazim e ku were kirin; divê wekî pêwîst em zêhnê xwe li ser naveroka fereha wê biwestînin û em karibin bi çavê dil jî wê bixwînin.

Bi kûrahîya hestan gihiştina kitêba kaînatê û mûşahedekirina sirr û hikmetên cîhanê bes bi xêra tefekkura ehlê dil mûmkin dibe. Rebbê me, di van ayetên pîroz ên li xwarê de hemû mirovan ji bo vê tefekkurê gazî dike, dibêje:

"[Resûlê min! Ewê ku li ber te radibin] **Ma ew, hîç li sererdê negeriyane? Lewra heke ew geriyabûna, hemin dê dilne wan yên ku bi wan têbighin û guhne wan, yên ku bi wan bibihîzin bibûna. Lêbelê rastî ev e, çav kor nabin; lêbelê ew dilên ku di nav singan de ne, kor dibin**."[109]

"**Li erdê parzemînên hevcîran, rezên tirî, cot, xurmeyên yek-kok û kok-cuda hene. Digel ku ev hemû bi yek-avê têne avdan.** [Digel rewş ev e jî] **di xwarina wan de emê hinan ji hinan çêtir bigrin. Ha di van de jî ji bo qewmekî ku têbigihe, îbret hene**."[110]

109. Hec, 22/46

110. Re'd, 13/4

Ji bo mirov karibe bibe mûmînekî heqîqî, bi tevgerkirina qelbî û bi hişyarkirina îştaha wî qelbî ji bo tefekkur û hezkirina Heq Teala destpê dike.

Tişta ku însanî dike însan, fonksîyonên mejî û qelb in. Dema mirov giringîyê bide mejî û alema dil jî îhmal bike, hingê dibe ku însan bibe mirovekî başê dinyayê. Lêbelê ji bo mirov karibe bibe mûmînekî nazik û dilovan, zerûrî ye ku dil jî wekî hevir nerm bibe, tenik bibe û kûrahîya hissîyatê li xwe bike. Ji bo mûmînekî ku dilê wî di vê qiwamê de kar dike, her tişt bi "**lîsanê hal**" diaxive. Însan ji xwe bi xwe destpê dike, çav-rûyê wî, ser û pêyê wî vîtrîna wî ne. Ji bo hemû heyber û mexlûqatan zimanekî wan heye ku jê re "lîsanê hal" tê gotin û her tişt bi vî zimanî di wezîyeta eşkerekirinê de ye.

Mirovekî ku ji dêya xwe kor dibe, heke ji nişka ve çavên wî vebin, ewê bibizdehe. Dema ew wiha; li behran, dar û devîyan û li çûkên ku difirin binêre, ewê heyirî bimîne. Lewra wî ew tişt hîç nedîtibûn, ewê bibêje; "Rebbê min, çi ew xweşik xuliqandine!" û ewê ji wan re heyran bimîne. Ew însanê ku her roj li hezaranê van sipehîtîyan rast tê, lê bi pirranî xebera wî ji wan çênabe, ew rêya xwe ji bo tefekkura kûr û texessusa tenik nabîne û ew jî wilo li wir dikeve ğefletê û diçe, mîsala wî dişibihe mîsala lat û zinareke dijwara ku barana bi-bereketa nîsanê lê dibare û li ser wê diherike û diçe jî lê ew nesîbê xwe jê wernagire..

Ayetên pîroz ên Qur'anê jî me ji bo şîyarîyeke çi sipehî gazî dikin û ji me re dibêjin:

**"Bêguman di peyapey anîn û guhertina şev û rojê de, di wî rizqê ku Xuda ew ji asîmanî anîye xwarê de û bi wê erdê, di piştî mirina wê de sağ û hêşîn dike de û di guherandin û**

**anîna bayê ya ji hemû aliyan de ji bo qewmekî ku fêhm dikin pirr ders hene!.**"[111]

"**Ji wan re delîlek jî şev e! Em ronahiya rojê jê vediqetînin û tavilê ew dikevin tarîtiyê. Roj e, ew jî di rêgeha xwe de digere. Ha ev, diyarkirin û teqdîra Xudayê destbilind û zana ye. Me ji bo heyvê jî hin rêgeh diyar kirine. Paşê ew, wekî çiqlê dara xurmeyê xwehr dibe û vedigere. Ne roj dikare bigihîje heyvê, ne jî şev dikare bikeve pêşiya rojê. Her yek ji wan di rêgeheke diyarkirî de sobeberiyê dike, diçe**."[112]

"**Ha em, van nimûneyan ji mirovan re tînin, eşkere dikin lêbelê; ji zanayan pê ve wan nahizirin û di wan nagihin**."[113]

Însan di dirêjahîya emr û temenê xwe de çi qeder di tefekkur û kûrahîya hestan de bilind bibe û dîrayetê qezenc bike, ew qeder di keş û hewaya mehebbeta îlahî de dikare qismetê xwe wergire û saedeta wî ji mirinê biwêdetir de bi qasî wê rêjeyê zêde dibe. Di dirêjahîya tarîxê de pêğemberan, ewlîyaûllah û salihên mûtefekkir, mîsalên zindî ne, ji bo dîrayeta di fehmkirina kaînatê de. Di fitreta însên de û di kûrahîya wijdanê de merîfetûllah, yanî îstîdada naskirina Xuda bi qelbê xwe, hesta Heqekî, bawerkirineke bi hêz û îhtiyaca hatin girêdanê sirreke veşartî ye.

Ew ğafilên ku dema serê wan dikeve belayê û ew rikdarên ku buhran û krîzên heyatê derbas dikin, di tenê mayîna tirsnaka ku têde bê hîmaye dimînin de, ew bi sewqa [ajotina] siriştî ya vê sermaya fitrî li Xuda vedigerin, hestpêkirina wan bi îhtiyaca arîkarî xwestina ji qudreta îlahî lazimîya armanca aferandina însên e.. Lêbelê ew mirovên ku ev îstîdad kor kirine, di vê alemê

111. Casîye, 45/5
112. Yasîn, 36/37-40
113. Enkebût, 29/43

de ji herkên qudreta îlahî û xarîqeyên hunerê dûr û bêgane mane, ewên ku di vê alema îbretan de abûs û ehmeq dijîn, ev leyistika çav-miçkirinê ya ku di vê dinyayê de dileyîzin, ewê di axretê de jî wê bidin dewamkirin.

Xuda Teala di ayeta pîroz de dibêje:

“**Lewra çav kor nabin; lêbelê ew dilên ku di singan de ne, kor dibin**.”[114]

“**Ew kesê ku li vê dinyayê dilkor be, ew li axretê jî kor e û ji cîhetê rê ve jirêketîtir e**. ”[115]

Zerûrî ye ku Qur’ana Pîroz ji mûellimên salih û salîhe yên ku qelbê wan ji mehebbeta îlahî têr û tije ye were hînkirin da ku ew mûellim ji wan qelbên feyzdar ên xwe halê xwe di wan de înîkas bikin, di wan de bidin xuyakirin û guhdarên xwe bajone ser tefekkurê û kûrahîya hestan..

Çawa ku dema mirovekî jê pirs kir:

“-Ji bo tîlaweta Qur’anê kîjan deng û qîraet sipehîtir e?” Mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bersiva wî da û jê re wiha got:

“*Deng û qîraetê wî kesê ku dema tu xwendina wî ji bo Qur’anê bibihîzî, tu hestpê dikî ku ew ji Xuda ditirse*.”[116]

Di rewşeke berevajî de eşkere ye; ew qîraetê ku xwe ji qirikê naberde qelb, ew însên nabe kûrahîya hestan û asoyên bêdawî yên tefekkura Qur’anê.

114. Hec, 22/46
115. Îsra, 17/72
116. Darimî, Fedaîlul Qur’an, 34

Di vê xusûsê de divê em guhên xwe bidin vê îqaza nebewî jî. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman dike, dibêje:

“*Di navbera we de komeke wilo wê derkeve ku hûnê nimêja xwe li cem nimêja wan, rojîya xwe li cem rojîya wan û emelê xwe yê dîger jî li cem emelê wan biçûk û kêm bibînin. Ew Qur’anê dixwînin, lêbelê ew xwendina wan xwe ji qirika wan naberde xwarê. Wekî ku tîr ji kevanî derdikeve ew jî wilo ji dîn derdikevin..*”[117]

Ha ji bo em ber bi felaketeke wiha ve neyên kişkişandin, dema em bi Qur’anê ve meşğûl bibin jî divê em ğeyret bikin û hewl bidin hîn bêhtir hessas û nazik tevbigerin, em xwe berdin dinyaya tefekkura wê, em maneyên ayetên wê di dilê xwe de hezm bikin û em lîbasê exlaqê Qur’anê li xwe bikin, em exlaqê wê ji xwe re bikin exlaq.. Lewra Qur’ana Pîroz bi her wesîle û navgînê tim û daîm mirovê mûmîn ji bo seferberbûna hizirîn û hestgermbûnê gazî dike.

Çawa ku Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“**Me beriya te bi pêğembertî bes zilam şandine, me wehî ji wan re şandiye. Vêca eger hûn nizanin, ji ehlê zanînê bipirsin. Me, pêğember bi mûcîze û pirtûkên pîroz şandine. Me ev Qur’ana ha ji te re jî aniye xwarê da ku tu peyama ku ji wan re hatiye xwarê, ji mirovan re eşkere bikî û da ku ew jî tefekkur û fehm bikin**.”[118]

Heqîqeten Xuda Teala di Qur’ana Pîroz de me evdên xwe gazî dike ji bo em hem delîlên hebûna bilinda wî, hem jî kûrahîya hikmeta di nîmetên ku wî bexş kirine de tefekkur bikin. Di

117. Buxarî, Fedaîlûl Qur’an, 36

118. Nehl, 16/43-44

navbera van de jî bal tê kişandin ku însan xwedî ziman û rengên curecur e.

Xuda di ayeta pîroz de ferman dike, dibêje:

“**Aferandina wî ji bo erd û asîmanan û cuda cudabûna zimanên we û rengên we ji delîlên hebûna wî ne. Bi rastî di van de ji bo zanayan ders û îbret hene**.”[119]

Bi rastî yekî tenê jî ji wan zimanên ku însan bi wan diaxive, ji terefê milletê ku bi wan dipeyive ve komîsyonên cuda cuda nehatine pêkanîn û ew ziman nehatine çêkirin. Ne rêzimana wan zimanan, ne jî qadroya peyvên wan, ne semere û fêkîyê xebateke hevbeş e. Hinek ziman hene ku di wan de cumle bi lêkerê [fiêlê] destpê dike. Lê hinek ziman jî hene ku di wan de cumle bi lêkerê destpê dike û ew bi lêkerê bi dawî jî dibe. Ev ne tercîhên bi hişmendî ne, lêbelê bizzat bexşîşeke cenabê Heq Teala ne. Li kêleka vê bexşîşa îlahî, cuda cudabûna rengên mirovan û di rewşa nijadên cuda cuda de aferandina wan jî menzûmeya hikmeteke cuda ye. Reng, netîceyeke ku coğrafîya û erdnîgarî wan bi xwe re tîne; nijad û îrq jî tecellîyeke xulqîyetê ye. Ev rewş, ji bo vê ye da ku însan hê hêsantir hev nas bikin û li hev werin. Heke na, tiştek bi navê nijadeke çêtir û nijadeke dîtira nehêja nîn e. Ji her nijadê hem mirovên temîz, hem jî mirovên xirab dertên. Ya mûhîm çêtirbûna bi teqwayê ye.

Xuda Teala vê heqîqetê wiha eşkere dike, dibêje:

“**Gelî mirovan! Bêguman me hûn ji mêr û jinekê aferandine. Me hûn kirine millet bi millet û êl bi êl da ku hûn** [hiqûqê] **hev nas bikin. Bêguman çêtirînê we li cem Xuda mutteqîtirînê we ne. Bêşiwar Xuda zana û agahdar e**.”[120]

---

119. Rûm, 30/22

120. Hucûrat, 49/13

Li rexê din, cenabê Heq Teala wehdanîyet daye xwe tenê û hemû heyber û mexlûqatên din jî cot aferandine ji bo hev û din temam bikin. Ew heyata malbatî ya ku di Cennetê de bi Hezretê Adem -silavên xuda lê bin- û bi Hezreta Hewwa destpê kiriye, Xuda Teala di bin qanûna îzdîwaca ku wî danîye de ew întîqal bûye, ji bo me zaroyên Adem jî hatiye û ew bi dînê îslamê jî tam gihaye kemala xwe.

Xuda Teala di vê xusûsê de ferman dike, wiha dibêje:

"**Ji nîşanên Xuda ye ku ji we re ji cinsê we bi xwe hevser aferandine da ku hûn ji hev re çavnas bibin û di navbera we de hezkirin û merhemet peyda kiriye. Bi rastî di vê de ji bo milletekî ku bifikirin îbret hene**."[121]

Cenabê Heq Teala nîkah ji bo ummeta Mûhemmed [dirûd û silavên Xuda lê bin] xistiye bereket; îzdîwaca di bin sîbera Kîtab û Sunnetê de jî li heyata dinyayê kiriye cenneteke seadetê.

Di zewacê de lihev-banîn û ji hev hezkirina du mirovên ğerîb bi awayekî heyretamîz têde ders û hikmetên ewqas hûr veşartî ne, ku eqlan dixe heyret û dehşetê. Du ciwan ji mala dê-bavên xwe vediqetin, bi wê mehebbet û dilovanîya ku Xuda ji bo navbera wan bexş kirine, dilên wan bi hev re girêdane, heta ew bi dereceyeke wisan semîmî di keş û hewayeke cazîbe û surdar de dijîn ku ew mala dê-bavên xwe ya ku jê veqetîne di sihê de bihêle, ev lihev-banîna wan çi tecellîyeke ulwî ye û çi derseke qudsî ye ku divê mirov li serê kûr kûr bisekine û bifikre.

Însan, bi mûcibê îmtîhana îlahî, ji ber ku xwedî xulqîyeteke wisan e ku mûcadelekar û di qebûlkirina heqîyê de mûtereddid û dudil e, ayetên Qur'ana Pîroz ji bo xwedî meslek û meşrebên curecur bi mîsalên texlît texlît hatine xemilandin; heta ku bi vî

121. Rûm, 30/21

awayî her kes li gorî rewş û halê xwe ji bo xwe nesîbê xwe ji wan bigre.. Ev heqîqet, di ayeta pîroz de wiha tê eşkerekirin:

**“Bi sûnd me, di vê Qur’anê de ji bo mirovan mîsalên curecur şanî dane û eşkere kirine. Lewra însan, di pirr xusûsan de mûcadelekar e.”**[122]

Qur’ana Pîroz balê dikişîne ser hûre qabilîyetên nazikên di pêkhatina însên de, ji lewma ji bo tefekkurê gazî li wî dikin.

Cenabê Heq Teala di xusûsa ku însan heyata xwe tefekkur bike de wiha ferman dike, dibêje:

وَمَنْ نُعَمِّرْهُ نُنَكِّسْهُ فِي الْخَلْقِ أَفَلا يَعْقِلُونَ.

**“Em temenê kê dirêj bikin, em aferandina wî berevajî werdigerînin. Ma ew ji vê eqil nagrin?”**[123]

Cenabê Heq Teala di ayeteke din de jî temayula ficûr û teqwaya di pêkhatina însên de destnîşan dike û wiha dibêje:

وَنَفْسٍ وَمَا سَوَّاهَا (7) فَأَلْهَمَهَا فُجُورَهَا وَتَقْوَاهَا (8) قَدْ أَفْلَحَ مَنْ زَكَّاهَا (9) وَقَدْ خَابَ مَنْ دَسَّاهَا.

**“Ez, bi nefsê û yê ku hinek qabilîyet dane wê, qencî û neqencîyên wê jê re îlham kirine, sûnd dixwim ku ewê nefsa xwe ji xirabîyan paqij bike, xilas bûye!; ewê ku nefsa xwe di xirabîyan de noq bike jî, wî ziyan kiriye!”**[124]

122. Kehf, 18/54
123. Yasîn, 36/68
124. Şems,91/7-10

Bi dubare vejînê qudreta bilinda Xuda, li hemberî wê jî nekarîna însên û rasteqîneya îlahî ya ku di paşwextê de li benda wî ye, tê şanîdan:

"**Ma însan nabîne ku me ew ji dilopek ava meniyê aferandiye? Vêca tu dinêrî ku va ye, ew bûye dijminekî eşkere, dijwar! Xulqbûna xwe ji bîr kiriye û li hemberî me nimûneyê eşkere dike, dibêje: Kî ye, ewê ku van hestiyên riziyayî sağ bike? Bibêje: Ewê ku cara pêşîn ew aferandine, ewê wan sağ jî bike. Lewra ew, aferandina bi her awayî, xweş dizane**."[125]

Ji bo mirovê ku bi dûv zemanî dikeve jî tê bibîrxistin ku zeman îzafî ye:

كَأَنَّهُمْ يَوْمَ يَرَوْنَهَا لَمْ يَلْبَثُوا إِلاَّ عَشِيَّةً أَوْ ضُحَاهَا.

"**Roja ku ew qiyametê dibînin, ew dibin her wekî ku ji êvarekê, yan jî ji danê sibeheke wê pê ve li dinyayê nemabin**."[126]

Ev hemû beyanatên ku tim û daîm însên ji bo tefekkurê gazî dikin jî, şanî didin ku failîyeteke zêhnî û qelbî ya wiha wezîfeyeke wilo giring e ku Xuda pê ferman kiriye. Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hê berîya hezar û çar sed salan, di hedîsa şerîfa xwe de gotiye:

*"Îbadetekî wekî tefekkurê nîn e."*[127] Bi vî awayî, eşkere kiriye ku wî tefekkur û di netîca wê de feyzdarbûna qelbî di asta îbadetê de dîtiye. Heta mirov dişê bibêje; wî îşaret pê daye ku ew di berîya îbadetê de lazimîyeke mewcûd e. Lewra fehmkirina

125. Yasîn, 36/77-79

126. Nazîat, 79/46

127. Elî el-Mûtteqî, Kenzû'l-Ummal, XVI, 121

ehemmîyet û mahîyeta xêrên dîtir jî wekî îbadetê bes bi tefekkurê mûmkin e.

Bêhijmar ayetên pîroz û hedîsên şerîf ji berîya hezar û çar sed salan ve îşaret bi ehemmîyeta tefekkurê dane. Bi nêrîna li van îzahatên li jorê, bêşiwar e ku di serdema me de ehemmîyeta wê hê bêhtir zêde bûye. Di vê nuqtê de ji bo mirov bi awayekî tam heqî ji mes'ûlîyetê bêrî û dûr be, naxwe di xusûsa ku divê em di bara teblîğa heqîyê û teşwîqkirina xêrê de xwedî ğeyret û cehd bin de em çi jî bibêjin hê kêm e, têrê nake.

❁

Înşaellah, ew şeva Beratê ya ku 14'ê meha Şabanê bi 15'ê wê ve girêdide, ewa ku emê bi hatina wê mûşerref bibin, ew her sal ji terefê mûmînên salih ve di nav wecdeke mezina îmanê de tê îhya û sağkirin.[128]

Ev şev, şeva hukm û teqsîmatê ye. Lewra di vê şevê de "di nava salekê de ewê ku ji dêya xwe bibin û ewê ku bimrin têne nivîsîn, rizq têne parvekirin û emel jî ji bo hizûra îlahî têne bil-indkirin."

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîf de ferman dike, dibêje:

"Dema bibe şeva nîvê şabanê bi şeva wê rabin nimêjê û bi roja wê jî rojî bigrin. Lewra Xuda Teala bi rojava ve çûna tavê re bi nûra rehma xwe li asîmanê dinyayê tecellî dibe, heta fecr vede bi evdên xwe re wiha diaxive, dibêje:

"-*Ma yek nîn e ku efûyê ji min bixwaze, vêca ez jî gunehê wî efû bikin? Ma yek nîn e ku rizq ji min bixwaze, vêca ez jî rizq*

---

128. Ji ber ku weşandina vê nivîsê li meha Şabanê ya berî Remezana şerîf rast hatiye, bi kurtî behsa xusûsîyetên vê mehê hatiye kirin.

*bidimê? Ma yekî mûsîbetzede nîn e ku dûa ji min bike, vêca ez jî efîyetê bidimê? Ma yekî halo û yekî wilo nîn e?...*"[129]

Naxwe rast e ku Xuda Teala, di vê şevê de heta bi sibehê bi awayekî xusûsî derîyên rehm, îhsan û îcabetê heta bi paşîyê li ber evdên xwe vekirî dihêle.

Çi peyman û mizgînîyeke sipehî ya pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye îhyakirina şeva Beratê bi şevê bi nimêjê û bi rojê jî bi rojîyê, qîmetekî mûstesna bi mûmînan dide qezenckirin. Divê em hewl bidin û ğeyret bikin ku bi îlawekirina li ser nimêjan, em vê şevê bi xwendina Qur'anê, zikr, tesbîh, selewatên şerîf û sohbetên manewî jî îhya û sağ bikin.

Divê mirov ji bo şev rojên piştî şeva Beratê jî giringîyê nîşan bide ku ew jî ji bo wê Remezana şerîfa serkehnîya nûrê, wekî dawetîye û bangnameyên mûqeddes in. Divê heyecana dilî ya me bi keyfxweşîya Remezanê bi rûhanî bibe, xêr û hesenatên me zehf bibin û mehebbeta îmanî ya me û dilsozî û sedaqeta me ji Heq Teala re zêde bibe.

Bi taybetî jî divê nimêjên me, di nav ahenga qelb û bedenê de û di keş û hewayeke wecdê de werin edakirin. Lewra nimêj, mûlaqateke ulwî ya Rebb û evdê wî ye.

Çawa ku kesek hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û jê re got:

"-Ya Resûlellah! Peyveke bihavil û kurt li min hîn bike." Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re wiha got:

"*Dema tu rabî ser nimêjê, bibe wekî wî kesê ku xatiran ji dinyayê dixwaze! Xebereke ku tu ji ber wê uzr bixwazî, hîç*

129. Îbnûmace, Îqametus-Selat, 191

*nebêje! Hêvîya xwe ji malê dinyayê yê di dest mirovan de qut bike û li ser vê bi ezm be!*"[130]

Divê em hewl bidin hemû ecr û fezîleta nimêja ku eda dikin qezenc bikin û divê em xwe ji zayî-kirina vê nîmeta îlahî dûr bigrin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîseke şerîfa dîtira xwe de wiha ferman dike, dibêje:

"*Mirovek nimêj dike lêbelê ji wê nimêja wî bes nîvê wê, yan sêyeka wê, yan çaryeka wê, yan pêncyeka wê, yan şeşyeka wê, yan heftyeka wê, yan heştyeka wê, yan nehyeka wê, heta bes dehyeka wê jê re tê nivîsîn.*"[131]

**Welhasil**; siha rehm û bereketa Remezana şerîf bi ser me de xwe berdaye û hatiye, bi vê mûnasebetê divê em vê jî bibêjin; Qur'ana Pîroza ku di Remezanê de hatiye xwarê, ew nazil bûye ji bo heyateke dirêja Remezan-warî ya heta qiyametê bi mûmînan bide jîyandin. Remezan û Qur'an terbîya emelî û heyatî ya emr û temenekî ye.

Xuda Teala di ayeta pîroz de ferman dike, dibêje:

"**Meha Remezanê, ew meh e ku têde Qur'an hatiye xwarê; ewa ku ayetên wê ji bo mirovan rêber in û ji bo cuda-kirina heqîyê ji batilî delîlên eşkere ne. Naxwe kî ji we di wê mehê de hazir bibe, bila rojîya wê bigre.**.."[132]

Cenabê Heq Teala dide zanîn ku Qur'ana Pîroz rêbereke wilo bi nûr e ku ji delîlên hîdayetê û pîvanên hikmetê tije û mişt e. Paşê jî ew beyan dike ku her kesê digihîje vê heyva mûbarek, ew mûkellef û binbar e ku di bin terbîya Qur'anê de rojî bigre.

---

130. Îbnûmace, Zuhd, 15
131. Ebûdawud, Selat, 123, 124
132. Beqere, 2/185

Divê em ji bîr nekin ku têrê nake em sade li seda û dengê Qur'anê guhdarî bikin û em xerîta heqîqetên wê di ber çavan re derbas bikin. Lêbelê îcab dike ku em bi wecda dil îtaeta fermanên mûbarekên wê jî bikin; ew fermanên wê yên ku ebedîyetê yanî rêyên xilaskirina heyata axretê, nîşan didin jî. Lewra mûmîn ew kes e ku bi rûhanîyeta Qur'anê li hemberî tearrûzên nefsanîyeta xwe dikeve cenga çetîna nefsê.

**Ya Rebbî! Bi nesîbê me bike ku em di vê heyva mûbarek de bi kûrahîya hestan di keş û hewaya cenneta Qur'anê de bijîn! Ji bo me îman û Qur'anê bike huccet, rojîyên me bike rehm, paşîvên me bike bereket û îftarên me jî bike demên wusletê.**

**Amîn!..**

# Tobe û Hêstirên Çavan



*"Bi dilekî ji agirê poşmanîyê tije û bi çavên hêstirbar dûa û tobe bike! Lewra çîçek li deverên ber tavê û li cihên rewa û şil bel dibin!"*
*[Hezretê Mewlana]*

## *Tobe û Hêstirên Çavan*

Rojekê terzîyekî ji zatekî salih pirs kir;

Tu, di bara vê hedîsa şerîfa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de ku dibêje:

"*Xuda Teala toba evdê xwe qebûl dike, heta ku rûhê wî neyê qirikê*." de çi dibêjî?

Wî zatî jî pirs ji wî kir;

“-Erê, wilo ye. Lêbelê pîşeyê te çi ye?” Wî jê re got:

“-Ez terzî me, cilan didirûm.” Wî zatî jê re got:

“-Di terzîtîyê de hêsantirîn tişt çi ye?” Wî jê re got:

“- Bi meqes girtin û qumaş qutkirin e.” Wî zatî jê re got;

“-Ji çend salan ve tu vî karî dikî?” Wî jê re got:

“-Ev sih sal in ez vî karî dikim.” Wî zatî jê re got:

“- Baş e, dema rûhê te were qirika te tu yê karibî qumaş rast qut bikî?” Wî jê re got:

“- Na, hingê ez nikarim wî rast qut bikim.” Wî zatî jê re got:

“-Ey terzî! Karekî ku te midetekî zehmetî pê re dîtî tu hîn bûyî û ev sih sal in jî tu bi hêsanî wî dikî, lê ew zeman tu nikarî bikî, vêca ew tobeya ku te hîç nekiriye, di wê wextê de tu yê çawa wê bikî? Îro ku li ser xwe yî, bi qewet î, tobe bike! Heke na, dibe ku di nefesa dawîn de îstiğfar û husna xatîme ji te re nebe nesîb… Ma te hîç ev peyv nebihîstiye ku dibêje: "Berî mirin

were lezê li tobê bike!"?[133] Vêca ew terzî bi îxlas bezî tobekirinê û bû ji salihan.

Wekî ku di vê qisseyê de jî tê dîtin, li pêşîya mirovan hezar û yek texlît koncalên dinya û nefsanîyetê hene ku ya ji van tevan bi tehlûketir jî tim û daîm texîrkirin û derengxistina toba semîmî ye. Hal-hal e ku xwe girtina bi tobê ji bo tevaya emrekî kemerbenda xilasîyê ye. Çawa ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji eshabê kîramê xwe re eşkere kiribû, gotibû: "*Mezintirîn derd derdê guneha ye, dermanê wan jî îstiğfara di tarîtîyê de ye.*"[134]

Lewra ji bo îstiğfaran, di berê xwe dana alîyê Xuda de û di qezenckirina qelb de ji bo sewîyekeke ulwî jî cihekî mûhîm heye û ew dîsa tekane wasîte ye ji bo paqijbûna ji qirêj û gemarên manewî jî. Tobekeke meqbûl asteng û perdan ji navbera bende û Rebb radike ku ev hal, ji bo emelê salih heta tu bibêjî bes, giring û mûhîm e.. Lewra divê mirov xusûsên ku li ber gihiştina hedefê asteng in ji holê rake û bi vî awayî mirov, dil bîne ser halekî wilo ku ji bo ğaye û armanca eslî ya xwe mûsaid û amade be. Ji ber vê ye ku ji bo tekamula rûhî û giyanî pêkwere di hemû terîqet û rêyên tesewwufê de di werdên seheran de bi îstiğfarê tê destpêkirin.

Toba yekê bi pêğemberê yekem Adem [silavên Xuda lê bin] re destpê kiriye. Wî, di toba xwe de nîyaz kiribû û wiha gotibû:

قَالا رَبَّنَا ظَلَمْنَا أَنفُسَنَا وَإِنْ لَمْ تَغْفِرْ لَنَا
وَتَرْحَمْنَا لَنَكُونَنَّ مِنْ الْخَاسِرِينَ

133. Menawî, Feyzû'l-Qedîr, V, 65.
134. Li Mûsneda Deylemî, I, 136'an binêrin.

“**Herduyan got: Xudayê me! Me neheqî li xwe kir, heke tu li me nebûrî û rehmê li me nekî, hemin emê ji ziyankeran bibin**.”[135] Ev dûa, ji bo zaroyên wî yên ku heta qîyametê di piştî wî de bên jî bûye nimûneyeke îstiğfarê.

Ehlûlllah tobê dixin sê qism:

1- Toba **ewama** ye: Ev ji gunehên xwe tobe dikin.

2- Toba **xewasa** -yanî evdên bijarte- ye: Ev ji ğafilbûna xwe tobe dikin.

3- Toba **xasûl-xewasa** -bijartetirîn evda- ye: Ev jî ji bo karibin ji xwe re nêzîkbûneke bêhtir ji Xuda peyda bikin, tobe dikin.

Lêbelê wekî ku di emelê salih de wilo ye, di tobê de jî şertê semîmîyet û îxlasê heye. Her wiha gellek ji ehlûllahî’yan ji toba xwe bi xwe jî bûne tobedar. Yanî zerûret heye ku mirov xwe ji wê toba ku îhtiyaca wê bi xwe bi tobê heye bavêje ber penaha Xuda, da ku bi vî awayî mirov bigihîje sirrê wê toba sağlema ku wekî di ayetê de jî hatiye gotin “**tewbeten nesûhe**”[tobeyeke şîretkar û sağlem] . Lewra dema nefs û şeytan rê ji xwe re nebînin ku zîtirk û refesan bavêjin dil, vêca ji bo ew ji sûretê heq [nîyetpak û durust] werin dîtin, xwe dikin xoce û seyda ji bo sipehîtî û qencîyan ji mirov re vebêjin. Ew bi vî awayî, evdî dixin kemînê û toba wan bereba dikin. Hal-hal e ku bê rawestan vegera ji tobê afeteke wilo ye ku heyata axretê reş û mehû dike.

Xuda Teala ferman dike, dibêje:

عَسَى رَبُّكُمْ أَنْ يَرْحَمَكُمْ وَإِنْ عُدْتُمْ عُدْنَا
وَجَعَلْنَا جَهَنَّمَ لِلْكَافِرِينَ حَصِيراً.

135. E‘raf, 7/23

**“Dibe ku Xudayê we li we were rehmê, lêbelê; heke dîsa hûn li fesadîyê vegerin, emê jî li cezakirinê vegerin. Me, dojeh, ji bo wan kafiran kiriye girtîgeh**.”[136]

Lewra ew kesê ku bê rawestan toba xwe xirab dike, naxwe êdî ew bûye rûpiş û maskeya şeytên. Êdî ew kengê tobe bike, dema şeytan, yan jî ew ğafilên ku bûne şeytan carekê jê re bibêjin; “tif li te, xwelî li te be!” dîsa ew derhal toba xwe xirab dike. Ji bo wê yekê, Xuda Teala di ayeta pîroz de wiha dibêje:

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا تُوبُوا إِلَى اللَّهِ تَوْبَةً نَصُوحاً.

**“Gelî yên ku îman anîne! Tam bi sidq û îxlas tobe bikin û li Xuda vegerin.**”[137]

Şair vê rastîyê îşaret dike û dilên ku berê xwe didin tobê wiha îqaz dike, dibêje:

*Dema ziman bi çend peyvan îstiğfar bike,*

*Heke dil ğafil be, nefs di hezar û yek delhîzê de noq dibe* Seyrî*!*..

Di mijara tobê de ev xusûs jî balê dikişîne:

Di kitêba hedîsê ya bi navê “**Camîû’s-Seğîr**”ê de wiha hatiye gotin: "*Ji navbera melaîketên ku emelên mirovan dinivîsin, ewê ku gunehên wan qeyd dike, dema guneh tê kirin ew disekine û piştî şeş saetan ji nû wî gunehî dinivîse. Ew di vê mohletê de çavnêrî dike, dibêje, belku ew tobe bike. Ji ber vê sedemê, divê mirov nebêje: Ez nikarim li ser toba xwe bimînin, ez dîsa gunehan dikim ji lewma ez tobe nakim!"* û divê mirov tim û daîm îstiğfarên xwe bîne. Lewra Xuda lutf dike û dibe ku careke din

136. Îsra, 17/8
137. Tehrim, 66/8

ew tobe xirab nabe. Lêbelê divê were zanîn ku tobe, ji ber ku efûxwestin e, di xusûsa bicih-hatina poşmanîya semîmî û ew gunehê ku ji bo wî efû tê xwestin de jî divê ji mirovî ezmeke binbirr û qet'î hebe ku mirov wê careke din li wî venegere. Ji bo vê cenabê Heq Teala mirovan şîyar û îqaz dike û wiha dibêje:

"**Bila şeytanê xapînok bawerîya we bi rehma Xuda neyîne û we wilo nexapîne ha!**"[138]

Ji xwe hedîsa şerîfa ku dibêje:

"*Toba ji gunehan, nedamet û îstiğfar e.*"[139] jî wê toba ku careke din dubare xwediyê xwe naxe gunehan, îşaret dike.

Di eynî zemanî de ev hedîsa şerîf eşkere dike ku zerûrî ye tobe bi poşmanîyê destpê bike. Maneya vê jî dibe ev; gemara gunehan bi hêstirên çavan yên semîmî paqij dibin.

Hatiye rîwayetkirin:

"Gunehkarek hebû di nav tobe û poşmanîyê de bû, dema ew di halê şîyarîyê de bû, lîsteya gunehên wî jê re hate dayîn û jê re hate gotin: "**Vê bixwîne!**" Ew gunehkar li hemberî vî halê xwe ew qeder girî ku wî ji ber hêstirên ji çavên wî barîn, gunehên di wê lîsteyê de nedîtin. Di paşîyê de van hêstirên semîmî, temamê wan gunehan şûştin û ew temîz kirin. Bi vî awayî, ew gunehkar jî hate efûkirin."

Li ser vî esasî, carina ji bo efûya gunehekî hezar hêstirên çavan dixwaze; carinan jî dilopeke hêstirên çavan gunehekî temîz dike.

Lewra **hêstirên çavan**, ji bo mirovên ku biçin nav bexçê mehebbeta îlahî, kehnîya tobê ye. Ew gunehan dişon û paqij

138. Luqman, 31/33
139. Ehmed, bin Henbel, VI, 264

dikin. Ew li hemberî Rebb, îfadeyeke şukranê ye. Hêstirên çavan, dergehê hêvîyê yên cenabê Heq Teala ne. Di demeke ku temamê hêvîyan tên qutkirin de, ewên ku karibin li ber pêpelinga vî dergehî bigrîn, ew bextiyarên heqîqî ne.

Ji bo mirovên ku bi hêstirên çavan ên semîmî alemê seyr dikin, her dilopek ji wan hêstiran wekî mirêk û eyneyekê ye ku di pêsîra xwe de hezar û yek okyanûsan şanî didin ku di her zerreyekê de sirrên îlahî eşkere û eyan in. Çendîn rûpelên nexwendî yên hikmetê bi wan têne xwendin. Lewra hêstirên çavan zimanekî wilo ye ku maneyên peyv nikaribin wan hilgirin li wan hatine barkirin û ew mane bi wan têne derbirîn û îfadekirin. Însan bi hêstirên çavên xwe wan tiştên ku ew bi xwe jî nikare xeyal bike, ji Rebbê xwe dixwaze... Ji ber wê yekê evîn û sewda, li ser kehnîya hêstirên çavan tesellî dibin. Ğerîb jî li perav û kenarê wan bêhna xwe berdidin.

Ev qisseya ha, çi sipehî qîmetê dilopên hêstirên çavan yên ku ji bo Xuda têne barandin, îfade dike:

Rojekê, dema **Cuneydê Beğdadî** -quddîse sirûh- birêve diçû dît her wekî ku melaîket ji asîmanî têne xwarê û ew tiştekî ji erdê werdigrin. Ji yekî ji wan pirs kir, jê re got:

“-Ew çi bû, te rahiştiyê?”

Melaîketî cewaba wî da:

“Dema dostekî Xuda di vir de derbas dibû bi îştiyaq “ax!”înek ji kezaba xwe kişandibû û çend hêstir ji çavên wî barîbûn. Bi vê wesîlê, em jî radijin wan dilopan ji bo em bigihîjin rehm û meğfîreta cenabê Heq Teala.”

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîf de dibêje:

“*Du çav hene, agirê cehennemê nagihîje wan: Ew çavê ku ji tirsa Xuda girîbe û ew çavê ku di rêya Xuda de nobet girtibe û wilo şîyar lê bûbe sibeh.*”[140]

**Hezretê Mewlana** ji bo çawa paqijbûna gunehan bi tobe û hêstirên çavan jî ev nimûne anîye; av dilewite, paşê dibe buxar û dubare wek rehmeke berraq li erdê vedigere. Ew vê jî wiha îzah dike, dibêje:

“*Dema zelalî û paqijîya wê nemîne, yanî dema ew dibe herî û şîlo dibe, av jî wekî me ji ber ku lewitîye reht û bê hizûr dibe, şaşo-maşo û sergêj dimîne... Ew destpê dike, ji hundurê xwe ve bi feryad li ber Heq Teala digere. Li ser van feryad û lavlavan cenabê Heq Teala wê dixe buxar û hildide asîmanî. Ew li wir, wê li rêyên texlît texlît dixe û wê tertemîz dike. Paşê jî ew carina wê dixe baran, carina wê dixe berf, carina jî wê dixe teyrok û li erdê dibarîne. Di dawîyê de jî wê digihîne behreke fereha bê perav.*”

Bêşiwar ev sembol, wê merhemet û hezkirina ku cenabê Heq Teala li hemberî wan evdên gunehkarên ku dixwaze wan xilas bike, nîşan dide, îfade dikin. Çawa ew kesên ku qelbê wan bi herîya gunehan lewitîne, heke di wan de ava tobê û tava poşmanîyê werin cem hev, hingê cenabê Heq Teala yê wan dilan hilde asîmanî. Ewê wan ji tozê, ji axê û ji hemû qirêjên nefsanî paqij bike. Dubare ewê wan wek şerefmendtirînê heyberan yanî di halê rehmê de wan ji bo erdê îhsan bike. Tecellîya vê rewşê jî di maneya ferehtirîn de di nimêjan de bicih tê. Ji vê hêlê ve ew nimêjên ku mirov karibe bi rast û durustî wan eda bike, ji wan re “**mîraca mûmînî**” hatiye gotin.

140. Tirmizî, Fedaîlûl Cîhad, 12/1639

Lêbelê însan dibe ku di pirranîya deman de vê heqîqetê fehm neke, di dinyayê de noq bibe, ji ber ku di şûna ew bigrî de di qehqehan de dixeniqe, cenabê Heq Teala gotiye:

وَتَضْحَكُونَ وَلا تَبْكُونَ. وَأَنْتُمْ سَامِدُونَ.

“**Hûn dikenin! Hûn nagrîn! Hûn bi bêhay têne meşğûlkirin!**”[141] Ew di ayeteke pîroza din de jî xwe dûrkirina ji ğefletê wiha ferman kiriye, gotiye:

فَلْيَضْحَكُوا قَلِيلاً وَلْيَبْكُوا كَثِيراً جَزَاءً بِمَا كَانُوا يَكْسِبُونَ.

“**Êdî wek cizayê, ya ku qezenc dikin, bila ew hindik bikenin û pirr bigirîn?**”[142]

Yanî Xuda Teala ji evdê xwe dixwaze ku ew gunehên xwe bi tobe û hêstirên çavan paqij bike.

Di vê mijarê de **Hezretê Mewlana** giringîya hêstirên çavan wiha vedibêje:

“*Dema mûm digrî û hêstirên çavan dibarîne, ew rewşeke ronakbîrtir werdigre. Çiqilên daran jî ji bereketa ewrên girînbar û ji herareta [germahîya] tavê şîn dibe, taze dibe. Yanî ji bo gihana [çêbûna] fêkîyekî heraret û av lazim e.*”

“*Eynî wekî van ji bo qebûla tobeyan jî ewr û birûsk yanî hêstirên çavan û şewata dil gerek e.*”

“*Heke birûska dil lênexe, û ewrên çavan jî baranê nebarîne, hingê agirê hêrsa nefsê û pêtên gunehan dê çawa bimevirin? Feyza wusletê, yanî di dil de ronakîya nûra tecellîya îlahî wê*

141. Necm, 53/60-61
142. Tewbe, 9/82

*çawa xuya bibe? Serkehnîyên maneyan wê çawa bicoşin û biherikin? Heke baran nebare, bexçê gulan wê çawa sirran ji keskahîyê re bibêje? Binefş wê çawa bi yasemînê re bibe hevpeyman?*"

"*Dev ji tebîetê berde bila ew bi îske-îsk bigrî. Ev ax, dema ji avê cuda dibin şoravk dibin. Avên ku ji çeman, ji rûbaran cuda dimînin, dûr dikevin jî zer dibin, bêhn bi wan dikeve, şîlo dibin û ripûreş dibin.*"

"*Dema ew bağ û bostanên kipkesk ên wekî cennetê ji avê cuda dikevin, zer dibin, diqermiçin, pelên wan hişk dibin, diweşin û ew dibe warê nexweşîyê. [Însan jî wiha ye...]*"

Ji bo parastina ji vê rewşê ye ku çavên **Şûeyb** -silavên xuda lê bin- ji girî nebîn bûbûn. **Hezretê pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî gotiye:

"*Heke we, tiştên ku ez dizanim zanîbûya, hûnê hindik kenîbûna û hûnê zehf girîbûna, xwarin û vexwarin wê di ber we de neçûbana xwarê...*"[143]

Lewra ehlên dil, ewên ku ji ber gunehên wan di dilên wan de birîn çêbûne, ew dixwazin ku di dirêjahîya emrê xwe de bi hêstirên çavên xwe, xwe bişûn û temîz bibin, ha ew dilên evîndar in ku dişên bikevin cenneta efû û lêborînê. Ji ber wê ye ku di serî de jî pêğember, hemû welî, salih û siddîq; di tengasî û ferehîyê de, di keder û dilşadîyê de tim û daîm xwe avêtine ber penaha cenabê Heq Teala û ew ketine wezîyeta dilşewatî û lavlavan. Lewra pêğember bi xwe jî ji ber ku bê îradeya wan ew "zelle"yên ku bi xeta tên îfadekirin ji wan çêdibin, naxwe mirov nikare tesewwir bike ku ti mirovekî ji tobe û îstiğfarê mûsteğnî hebe. Tobe û îstiğfar di mahîyeta rastîya xwe de bi sebeb ku poşmanîyeke

143. Suyutî, Camîûs-Seğîr, c. II, rûpel, 10

derûnî û xwe dan ber penahê ye, naxwe ji bo nêzîkbûna ji Xuda ew bi bandortirîn wasîte ne.

Li rexê din, cenabê Heq Teala bi wan îzdîrab û çîleyên ku dide evdên xwe, tobe û hêstirên çavan ji wan dixwaze ku ew jî tev danûstaneke ebedîyetê ye. Hem jî ew danûstaneke wilo bi qezenc û kar e ku mirovê ji wan haydar be, ew ji ti mûsîbetekê gazindan nake û ew qezenceke bêdawî bidestdixe. Yek ji van jî **Hezretê Mewlana** ye, ew çi xweş dibêje:

"*Heq Teala, li vê dinyayê çend dilop ji hêstirên çavan ji te werdigre, lêbelê ew di hemberî wan de çendîn kewserên cennetê dide te. Ew, ax û feryadên tije sewda û îzdîrab ji te werdigre; ew di hemberî her axîn û her feryadekê de bi sedan cihên bilind û meqamên pênegiha dide.*"

Lêbelê divê were zanîn ku her girî ne yek e. Di navbera wan de gellek ferq hene. Çawa ku gellek nalîn hene, sar in, sexte ne, derewîn in ku ew ji ğeflet û xapandinê pêktên.

**Sufyanê Sewrî** -quddîse dirûh- dibêje:

"*Girîn deh qism in. Neh ji van riyakarî ne. Lêbelê yek ji wan tenê ji bo Xuda ye. Ha ev girîyê ji bo Xuda, -heke di salê de careke tenê be jî- înşaellah ewê bibe wesîle ji bo însan ji Cehennemê xilas bibe.*"

Li gorî rîwayetê, jineke ku bi mêrê xwe re pevçûyî girîbû û hatibû gilehê derdê xwe anîbû ber destê **Qadî Şûreyh**. Di vê navê de **Şe'bî** jî li wir bû, jê re got:

"-Ez bawer in ev jin mezlûm e. Ma tu nabînî ew çawa digrî!"

Vêca Qadî Şûreyh jê re got:

“-Ey Şe‘bî! Birayên Yûsuf digel ku zalim bûn jî lê dîsa ew girîbûn û wilo hatibûn cem bavê xwe. Ne rast e ku mirov li van girîyan meyzîne û li gorî wan hukm bide!”

Helbet rondikên wiha merdûd in. Girîyekî menfûrê din jî ew girî ye ku miskîntî û zilletê îfade dike. Ev rondikên pûç û nafîle yê wan kesan e ku di wextê xwe de ji ber enîya wan xwêhdan nedaye, axînê xusranê dikişînin.

Merhûm Akîf di bara yên wiha de van şîyarîyan dide, dibêje:

*Yawo, dev ji matemê berdin! Dev ji feryadê berdin;*

*Heke girî feyde dabûya, wê bavê min ji qebrê rabûba ser xwe!*

*We çi ji hêstirên çavên xwe derxistiye? We çima xwêhdan nedaye?!.*

Ew girîyê ku em behsa wî dikin û Xuda jî ew xwestiye, ne ew hêstirên çavan e ku halê me li hemberî dost-dijminan biçûk bixe; berevajî vê ew gerî ye ku mîracê bi dil bide jîyandin. Çawa ku deryayên fereh çendîn qirş û qalan li ser xwe hildigrin û wan ji ketina binavê diparêzin, hêstirên çavên me jî me ji xeniqînê diparêzin, divê eynî wilo ew jî me li ser xwe hilgrin û bibin ji avên ku me bigihînin meqsûdê bin. Ev ji wan dilopan pêktên ku ew ji çavan zêdetir ji dilan diherikin, ew ne ji xelkê re lê; ew ji Heq Teala re têne erzkirin..

Di mijara hêstirên çavan de meseleyeke mûhîma din jî divê ev gerî, ne girîyê gileh û şîkayetekê be. Lewra di gileh û şîkayetê de wezîyeta razî nebûnê heye ku ew hîç ne meqbûl e. Lewra gileh, însanan heta bi îsyanê dibin û hemû serwet û sermayeyên di destê wan de tine dikin. Ev jî ğezeba Heq Teala dikişînin ser xwe. Girîyê ku em qesd dikin, ne ji bo celbkirin û kişandina

ğezebê ye, lêbelê ew girî ye ku mirov karibe Dostê Heqîqî ji xwe memnûn bike û karibe ji qirêja gunehan paqij bibe.

Welhasil dema mirin were, mirovên razayî tev şîyar dibin, yanî ewê çavên xwe vekin û heqîqetê bibînin. Lêbelê di nefesa dawîn de dîtina heqîqetê êdî hîç ti feyda wê çênabe; çawa ku feyda wê ji bo Firewn jî çênebûye...

**Hezretê Mewlana** çi sipehî dibêje:

"*Kesên eqilmend pêşî digrîn; nezan jî di dawîyê de ku li serê wan dikeve, mixabinîya xwe tînin zimên. Tu di destpêka kar de dawînekê bibîne û di roja qiyametê de poşman nebe!*"

*"Di vê xusûsê de bila halê vî teyrî ji te re bibe îbret ku dema ew genim di faqa nêçîrvan de dibîne ji xwe diçe, û dibe ku ew eqlê xwe bikar nayîne. Bi vî awayî, wî bê îradeya xwe genim xwar, lêbelê ew kete faqê û wilo ma. Vê carê ji bo serê xwe ji derdan xilas bike, wî çi qeder Yasîn xwend, çi qeder Enam xwend. Lêbelê çi feyde ye!.. Piştî ku bela hat û li mirov ket, girîn, feryad kirin, ax û wax kirin bi kêrî çi tê. Ev ax û feryad, divê berî ketina faqê bûne...*"

Çawa ku dema **Îbrahîm** -silavên xuda lê bin- bihîst ku qewmê Lût bi sebeb harbûnî û serxweveçûna xwe helak kişandine ser xwe, ji ber ku wî tam nizanîbû ew di nav îsyaneke dehşetdar de ne, çi dema wî xwest bi merhemet dûa ji wan re bike, melaîketan jê re gotibû:

"-Êdî wextê dûa derbas bû!..."

Li ser mirada cenabê Heq Teala, ne diyar e ka mirin wê li kuderê, kengê û çawa were me. Ji lewma zerûrî ye ku dil bi sirrê: "*Em berî mirinê dimrin!*" werin stran û her an û demê ji bo gihiştina Rebbê xwe hazir bin. Di rewşeke berevajî de nefesa

dawîn; wê bibe dema xusraneke tije feryada ku dibêjin: "*Hey wax em halo bi ku ve diçin*!"

Xuda Teala di ayeta pîroz de ferman dike, dibêje:

وَجَاءَتْ سَكْرَةُ الْمَوْتِ بِالْحَقِّ ذَلِكَ مَا كُنْتَ مِنْهُ تَحِيدُ.

"**Serxweşiya mirinê, bi fermana heqîyê va ye hat. Tê gotin: Hey însan ha ev e, ya ku tu ji wê direviyayî!**"[144]

Naxwe mûhîmtirîn meseleya mirovan, tezkîya nefsê û tesfîya qelb e. Tobe û hêstirên çavan yên ku heta bi vir me vegotin, ji bo gihiştina vê rewşê bes di mesabeya derî de ne. Piştî mirov ji vî derî ve here hundur, tişta ku were kirin helbet zerûrî ye ku mirov temamê emelê salih îfa bike. Piştî mirov ferz, wacib û sunnetan li gorî edebên wan eda bike, bi taybetî divê mirov xwedîyê wan sipehîtîyan be ku karibe ji heqê evdan, heqê dê-bavan, înfaqa ji bo Xuda, merhemet û şefqet li hemû mexlûqatan û efûyê, nêzîk bibe. Mesela, ewên ku karibin bi mezîyeta van sipehîtîyan werin efûkirin, ewê bêhtir ji bo efûya îlahî bibin layiq. Ewên ku dilên xwe nadin feryadên: "*Li me werin rehmê!*" ewên ji mehebbet û merhemetê mehrûm jî, ew rêwîyên şaşomaşo û ğafil in.

Ji bo wê ye ku divê dil, di keş û hewaya tobe û hêstirên çavan de bizav û hereketên sipehî bidestbixin û berê xwe bidin Rebbê xwe. Divê ev berê xwe dan jî bê şiwar her an û dema emr di nav xwe de bigre. Digel vê jî hinek demên mûstesna hene, ew ji bo mirovan demsalên cipcuda yên qezencê ne. Her wekî biha û sipehîtîya demsala biharê di navbera demsalên din de.. Hinek biharên wilo hene ji mirovan re hatine bexşkirin ku ya ji van tevan giranbihatir jî meha **Remezana şerîf** e[145] ewa ku

144. Qaf, 50/19
145. Ev gotar di Remezana şerîf de hatiye weşandin.

**Şeva Qedrê** têde ye. Şeva Qedrê ji hezar mehan bi qîmettir e. Lewra cenabê Heq Teala di wê şevê de Qur'ana pîroz ji Lewhû'l-Mehfûzê ji bo asîmanê dinyayê peya kiriye, anîye xwarê û pê însan û cîhan di nûrê de ğerq kiriye.

Ev heyva mûbarek û mûstesna ya ku me îdrak kiriye, ew bedreke mûnîr e [heyva çardeh şevî] ku dilên wekî şevê reştarî bûne, bi nûra xwe rohnî dike. Ew pencereyeke ku ji asîmanî ji erdê re ji bo mîracê vedibe. Ji vê hêlê ve, divê mûmîn dilê xwe şîyar bike û ew temamê emr û temenê xwe bi feyz û bereketa keş û hewayeke wiha mûstesna ya ku ji hessasîyeta meha Remezana şerîf digre, tije û derbas bike. Lewra qiyamet, ji bo dilên salih û bi jîyaneke wiha xemilandî, ne roja poşmanî û nedametê ye, lêbelê ew jê re dibe sibeh û beyanîya cejn û îdê.

**Rebbê me, sibeha cejneke wiha ji bo me tevan bike nesîb! Me bi eşq, xweşî û hêstirên çavan yên semîmî bigihîne rehm û meğfîreta îlahî!**

**Amîn!..**

# Dûa



*Dûa çi qeder werin dubarekirin ew qeder wek hestên derûnî li ser rûh û canê mûmînî têne nexşkirin, tevlî şexsîyeta wî dibin û ji wî re dibin xusûsîyet û taybetmendî. Ji ber vê sedemê ye ku rûhên bilind û gîyanên bala tim û daîm di rewşa dûa de dijîn.*

## Dûa

Hemû pêğemberên ku wek rehm ji mirovan re hatine şandin û dostên Heq Teala; di tengasî û ferehîyê de, di şîn û şahîyê de tim û daîm berê dilê xwe dane alîyê Heq Teala û di keş û hewaya nîyazê de jîyane. Ew rêzanên ebedîyetê ne, bi hal û hereketên xwe li me dane hînkirin ku divê em jî di her hal û karî de di wezîyeta dûa de bibin û her û her rica û lavlavan jê bikin, û zarzaran jê bikin.

Xwe avêtin ber penaha Xuda, qanûneke xulqîyetê û lazimîyeke evdînîyê ye. Li erd û asîmanan çi hebin, di wezîyeteke ji teqdîra îlahî re ram bûyî, bi zimanê halê xwe ji wî xwediyê qudreta bêdawîn re zikr dikin û lavlav û zarzaran jê dikin. Ji xwe perwerde û terbîyekeke rastîna dînî jî ji xwe re kiriye hedef ku halê dûa di rûhê mûmînî de bixe rewşeke seraqetî û daîmî. Lewra dûa, di qelb de kilîla bilindtirîn derî ye ku ji Xuda re vedibe.

Dûa çi qeder werin dubarekirin ew qeder wek hestên derûnî li ser rûh û canê mûmînî têne nexşkirin, tevlî şexsîyeta wî dibin û ji wî re dibin xusûsîyet û taybetmendî. Ji ber vê sedemê ye ku rûhên bilind û gîyanên bala tim û daîm di rewşa dûa de dijîn. Lewra qelbên wan, li hemberî wê tenbîh û îqaza îlahî ya ku ayeta pîroz di bara giringîya berdewamî û dirêjepêdana dûa bi wê hatiye de di wezîyeta lerz û tirsê de ne.

Cenabê Heq Teala ferman dike, wiha dibêje:

قُلْ مَا يَعْبَأُ بِكُمْ رَبِّي لَوْلا دُعَاؤُكُمْ
فَقَدْ كَذَّبْتُمْ فَسَوْفَ يَكُونُ لِزَاماً.

“[Resûlê min!] **Bibêje: Heke ne ji dû‘ayên we be, Xudayê min dê çima qîmet bide we? Bêşiwar we ew derewandiye, ji lewma hemin hûnê ezabê bibînin!**”[146]

Ha di rûh û gîyanê mûmînî de, bi berdewamîbûna hestên dûa û lavlavkirinê ji Rebbê xwe, têkilîyeke manewî di navbera Xuda û evdê wî de tesîs dike. Dûayên di wezîyeta wecdê de jî, dem û midehên hevhemêzkirina dil û rehma îlahî ne.

Di dûa de tişta ku tê xwestin, rehm û merhemeta îlahî ye. Li ser vî esasî, divê îfadeya pêşî ku di dûa de ji dilan derkeve û ber bi dergehê îlahî ve bilind bibe; mirov gunehkarî, qelsî û nekarîna xwe îtîraf bike. Dûa, mirov bi awayekî ku di nekarîna xwe digihe berê xwe bide alîyê cenabê Heq Teala yê ku xwediyê qudreta bêdawî ye û li hizûra wî bi teslîmîyet û sikûnet stûyê xwe jê re xwehr bike. Heqîqeten, di dûayan de destpêkirin bi îtîrafkirina nekarîna xwe û qebûlkirina kêmasîyên xwe, ew ji bo bangkirina merhemeta îlahî, ji bo wê jî di qebûlbûna dûayan de xwedî bandor û tesîreke mezin e. Çawa ku Hezretê **Adem** û **Hewwa** -silavên xuda li wan bin- wekî ku di ayeta pîroz de hatiye eşkerekirin; wan di dûaya xwe de li ber Xuda gerîyabûn û wiha gotibûn:

“[Adem û hevjîna xwe] **Herduyan gotin; ey Rebbê me! Me zulim li xwe kir. Heke tu me efû nekî û li me neyî rehmê, bêşiwar emê ji ziyankaran bibin.**”[147]

Di ayeteke din de jî bergerîna **Yûnus** -silavên xuda lê bin- li ber cenabê Heq Teala wiha tê beyankirin:

“**Zennûn** [Yûnus] **jî di bîra wan bîne ku ew bi hêrs çûbû; ji wî were ku emê hîç wî nexin tengiyê. Paşê di navbera tarîti-**

146. Furqan, 25/77

147. Eraf, 7/23

**yan de wiha gazî kir, got: "Ji te pê ve ti îlah nîn in. Ez te pak didêrim. Bi rastî ez ji zaliman bûme!"**[148]

Ev dûaya Cîhangîr **Sultan Mûrad Xanê yekem** li pêşberî Kosovayê, ji bo bereketa dûaya ku bi îtîrafa nekarîna xwe hatiye kirin çi nimûneyeke mûhteşem e:

"*Ya Îlahî! Milk jî, ev kole jî, yên te ne. Ez koleekkî nekare me. Tu yî, yê ku ji her kesî bêhtir bi nîyeta min û sirrên min dizanî ku meqseda min ne mal û milk e. Ez rizamendîya te tenê dixwazim…*

*Ya Îlahî! Vî leşkerê mûmîn di destê kuffaran de meğlûb û helak neke!.. Zefereke wilo ji wan re lutf bike ku hemû misliman wê ji bo xwe bikin cejn! Heke tu bixwazî bila di wê roja cejnê de ev evdê te Mûrad bibe qurban!..*"

Çawa ku li pey vê dûaya semîmî, ew bagera ku heta wê demê meydan tevlîhev dikir sekinî, leşkerê wî li hemberî artêşeke ku du caran, sê caran ji wan qelebaliğtir bûn, di piştî cengeke xwînrêjane ya ku heşt saetan berdewam kirî de, di dawîyê de serkeftin jê re mûyesser bû..

Sultan Mûrad Xan di piştî cengê de çû serdana ğazîyan, di dema ew bi hewcedarîyên wan re elaqedar dibû de leşkerekî birîndarê Sirban bi awayekî sinsî xencer lê da û kir ku wî şerbeta şehadetê vexwar. Bi vî awayî, dûaya wî bi temamî qebûl bû.

❀

Lîsanê rûhên bilind û çavên sipehîtirîn ku dûayên semîmî ne, ji nûr û sewdayê dizên. Ew heyatê dide bêhêvîyan û dilên şikestî tesellî dike. Ew dûayên ku bi îxlas, semîmîyet û hêstirên çavan tên kirin, ji bo tezahur û xuyabûna rehma îlahî bangek e.

148. Enbîya, 21/87

Di dûa de teslîmîyeta ji Rebb re veşartî ye, ew Rebbê ku hizûrê ji dil re bexş dike.

Mezinê me **Hezretê Pêğember** [dirûd û silavên Xuda lê bin] sipehîtirîn seyda ye ku bi jîyana xwe dûa li me dane hînkirin. Wî di nav hêstirên çavan de heta ku lingên wî diwerimîn nimêj dikir, bi îlawe li ser wan jî di wan dûayên ku dikirin de, di nav hestên nekarînê de xwe diavêt ber penaha cenabê Heq Teala û zehf caran wiha digot:

"*Xudayê min! Ez xwe ji ğezeba te diavêjim ber rizamendîya te. Ez xwe ji ezabê te diavêjim ber efûya te û ez xwe ji te jî dîsa diavêjim ber penaha te! Ez nekar im, bi awayê ku tu layiq î, neşêm ji te re medh û sena bikim! Te çawa medh û sena ji xwe re dabin, tu wilo yî!*"[149]

Ji bilî vê jî wî ehemmîyeta dûayan wiha îfade dikir, digot:

"*Dûa îbadet e. Kakil û mixê îbadetê ye. Li cem Xuda, tiştek ji dûa-kirina ji wî, bi qîmettir çênabe. Xuda, wî kesê ku tiştekî jê nexwaze [yê ku li xwe nanihe dûa jê bike], dixe ezabê. Ew kesê ku bixwaze di dema tengasî û zehmetîyê de dûaya wî were qebûlkirin, bila di dema ferehî û rehetîyê de jî zehf dûa bike. Rebbê we sağ û merd e; dema însanek destê xwe li berê veke, wî vala nahêle. Derîyên dûa ji kî re hatibin vekirin, naxwe derîyên hikmetê ji wî re hatine vekirin. Dûa, kilîla derîyên rehmê, çeka mûmînî, sitûna dîn û nûra erd û asîmanî ye.*"[150]

❀

Ev rastîyeke xuya ye; dûaya mirovê ku zulimê li xelkê dike, zeîfan biçûk dibîne, wan diperçiqîne û heyateke ğafîlane berde-

---

149. Muslim, Selat, 222

150. Rûdanî, Cem'û'l-Fewaîd, 9219-20-21-22-25

wam dike, qebûl nabe; dûaya wî kesê ku karibe rûyê yetîmê di nav bêhêvîyan de dinale, bikenîne û hizûr û aramîyê bide însanên derdmend, qebûl dibe. Heqîqetan dûayên mûtekebbirên ku xwe bêguneh dibînin qebûl nabin, dûayên evîndarên Heq Teala qebûl dibin; ewên ku ji bo efûya gunehên xwe ji çavên xwe ji bo dilên xwe bêrawestan hêstiran dibarînin.

**Hezretê Mewlana** -quddîse sirûh- di bara temînkirina qebûla dûayan de wiha dibêje:

“*Bi dilekî ji agirê nedametê tije û bi çavên hêstirbar dûa û tobe bike! Lewra çîçek li deverên ber tavê û li cihên rewa û şil bel dibin!”*

Naxwe ji bo qebûla dûa bes îfadekirina bi peyvan tenê jî têrê nake. Divê mirov ğeyret bike ku dûayên xwe bi hestên “xewf û ricayê” yanî tirs û hêvîyê bike. Divê qelb, bi arzûyên wan maneyên ku dûa lê bar dikin, bilerize. Ji bilî vê jî heke dûa di rasta efûkirina gunehan de be, divê ezm û qerardarîyeke qet‘î hebe ku ewê careke din dubare wî gunehî neke.

Hatiye rîwayetkirin: **Hezretê Mûsa** -silavên xuda lê bin- li zilamekî rast hat ku wî di wezîyeteke perîşanî de dûa dikir, wî li vê rewşa zahirîya wî meyzand û ji dil arzû kir ku dûaya wî qebûl bibe. Di wê navê de ji Xuda Teala wehîyeke wiha ji Mûsa -silavên xuda lê bin- re hat:

“**Ez ji wî evdê xwe re ji te bi merhemettir im. Ew bi zimanê xwe dûa ji min dike; lêbelê dilê wî li ser kerîyê mêşinên wî ye**.”

Çi dema Mûsa -silavên xuda lê bin- ev rewş jê re da zanîn, wî zilamî derhal xwe da hev û bi dilekî xalis berê xwe da Xuda Teala.

Li rexê din, dûayeke ku birayekî misliman di nehazirîya wî de ji birayekî din ê misliman re bike jî bi lezgînî megbûl e. **Mezinê me pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye:

"*Wekî ku dûaya mûmînekî ji bo mûmînekî din di nehazirîya wî de bilez tê qebûlkirin, ti dûayeke din wilo bilez qebûl nabe.*"[151]

Însan, ji kesê ku bawer dike dûayên wî qebûl dibin, teleb dike, jê re dibêje; bi xêra xwe ji bo min dûa bike. Sebebê eslî yê ku qebûlbûna dûayan temîn dike, îxlas û semîmîyet e.. Maneya wê ev e; dûaya ku mirovê gunehkar jî ji dilekî semîmî ji bo birayê xwe yê mûmîn bike, li cem Xuda ji dûaya bê dilê xwe ya wî mirovê ku meqamê wî ji yê wî çêtir tê zenkirin, bi xêrtir e..

Çawa ku **Hezretê Mewlana** oqyanûseke şefqet û merhemetê ye, ev feryada ku ji singa wî hildibe, bilind dibe, pirr manedar e:

"*Ey Rebbê min! Heke lazim be ku salih tenê rehma te hêvî bikin, bila gunehkar herin xwe bavêjin ber penaha kê?..*"

"*Ey Xudayê raserê min! Heke tu evdên xasê xwe tenê qebûl dikî, naxwe bila gunehkar herin lavlavê jê kê bikin?*"

❀

Bi rastî evdek, heke gunehkar be jî ev hal, nayê wê maneyê ku cenabê Heq Teala ew terk kiriye. Bi vê sebebê şexsek, bes Xuda Teala tenê dizane ka ewê bi hurmeta dûayên kê bigihîje mirada xwe. Li ser vî esasî, kî dibe bila bibe, divê qîmetê standina dûayên qelbî yên evdekî salih ji evdên Xuda îdrak bike.

Rojekê **Hezretê Marûfê Kerxî** di çarçîyê de li seqayekî [avgerekî] rast hat.

151. Tirmizî, Birr, 50

Avgerî bang dikir, digot:

“-Ji bo riza Xuda ji ava min vexwin.”

Hezretê Marûfê Kerxî digel rojîya nafîle girtibû jî bi nîyeta ku dûaya wî avgerê ku digot: “Ji bo riza Xuda” wergire, ji wê avê digre û vedixwe.

Piştî Marûfê Kerxî wefat kir, zatek ji ewlîya ew di xewna xwe de di mewq îkî sipehî de dibîne û jê dipirse, jê re dibêje:

“-Cenabê Heq Teala bi sebeb kîjan emelê te ev îkram daye te?” Wî jê re got:

“-Bi wê dûaya ku avgerî rizaya Xuda teleb dikir.”

Bi qasî girtina dûaya mûmînê mezlûm û dilşikestî, xwe parastina ji bed-dûaya wan jî di eynî derecê de meseleyeke mûhîm e.

Çawa ku dema sultanê Selçûqî **Elaeddîn Keyqûbad** keleha bajêr temam kir, ji bavê Hezretê Mewlana **Behaûddîn Weled** rica dike ku were ji bo teberrukê kelehê bibîne û di bara wê de rey û ramana xwe eşkere bike. Hezretê Behaûddîn Weled diçe tiştên ku hatine kirin dibîne û wiha dibêje:

“Keleha we ji bo pêşî-girtina li felaketên lehîyê û êrîşên dijminan fewqelade sipehî û xurt tê dîtin. Lêbelê te li hemberî tîrên bed-dûayên mezlûm û însanên bindestên di bin rêvebirîya xwe de kîjan tedbîr wergirtiye? Lewra tîrên bed-dûayên wan, ne keleheke wekî keleha te tenê, lê ewê bircê sed kelehan qul bikin, derbas bikin û dinyayê wêran bikin.

Ya baş tu, kelehên ji edalet û qencîyê çêke û hewl bide ku ji salihan leşkerên dûayên xêrê damezirîne. Evên wiha wê ji bo te, ji sûrhên te ewletir bin. Lewra ewlekarî û aramîya gel û dinyayê bi dûaya wan leşkeran tê temînkirin.”

Bi rastî her naîlîyet, mûweffeqîyet û zeferên mûmînan, li tenişta wan hewldan û ğeyretên ku têne şanîdan, bereketa dûayên bi îxlas e jî.

Bi qasî ku em bijîn û hestpê bikin ji bo me ew Qur'ana Pîroza ku rêzana seadeta ebedî ye, mezintirîn talîmên dûayan di nav xwe de îhtîwa dike, dihewîne. Rebbê bilindê me, di xusûsa dûayan de di ayetên pîroz de wiha ferman dike, dibêje:

"**Bibêje; de ka ji min re bibêjin; heke ezabê Xuda bi ser we de were, yan jî ji nişka ve qiyamet li we rabe, ma hûnê ji bilî Xuda li ber yekî din bigerin? Heke bera hûn rastgo ne** [de ka bibêjin]. **Na! Belku hûnê sade li ber Xuda bigerin. Vêca heke ew bixwaze, wê belaya ku hûn dixwazin ji ser we rabe, ewê wê rake û hûn wan pûtên ku we jê re dikirin hevpar, ji bîr dikin.** "[152]

"**Bi dizî û bi zarezar û lakelak, li ber Xudayê xwe bigerin, bi rastî ew, ji sînorbuhêran hez nake**."[153]

Xwestina mirinê li ser husna xatîme, yek ji mûhîmtirîn dûayan e ku divê em di vê heyata dinyaya fanî de ji bîra xwe dernexin û dîsa ew yekane sermayê me ye ku em li axretê pê xilas bibin. Rebbê me di ayetên pîroz de ferman dike, wıha dibêje:

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا اتَّقُوا اللَّهَ حَقَّ تُقَاتِهِ
وَلا تَمُوتُنَّ إِلاَّ وَأَنْتُمْ مُسْلِمُونَ.

152. Enam, 6/40-41
153. Eraf, 7/55

**“Gelî yên ku îman anîne! Çawa xwe parastin pêwîst be, wisa xwe ji Xuda biparêzin û hûn, her wek misliman bimrin**.”[154]

Ğeyretên ku her mûmîn di dirêjahîya emrê xwe de nîşan dide, ji bo di nefesa dawîn de bi awayekî sipehî li ser îmanê gihiştina seadetê ye. Lewra ji bilî pêğemberan ti kesî din di xusûsa xilaskirina îmanê de, ne di bin temînatê de ye. Heta ewlîyaûllah jî tim û daîm ji bo nefesa dawîn ketine fikaran.

Heke çi qeder halê ku însan wê li serê bimre mechûl be jî, rastîyeke xuya ye ku bi giştî her kes li ser çi halî bijî ew li ser wî halî dimre jî. Bi vê sebebê ji bo em karibin nefesa dawîna xwe li ser îmanê bidin, divê em li ser sîrata mûsteqîm bin û divê em tim û daîm li ser halê dûa û îstiğfarên ji cenabê Heq Teala bijîn. Li gorî ayetên pîroz didin zanîn, **Yûsuf** -silavên xuda lê bin- wiha dûa dikir, digot:

تَوَفَّنِي مُسْلِماً وَأَلْحِقْنِي بِالصَّالِحِينَ.

“[Xudayê min!] **Min misliman bimrîne û min bigihîne salihan**.”[155]

Xuda Teala bi “xwediyê eqlê selîm” pesnê evdên salihên xwe dide û di ayetê de dûayên wan jî wiha dide eşkerekirin, dibêje:

رَبَّنَا وَآتِنَا مَا وَعَدْتَنَا عَلَى رُسُلِكَ وَلا تُخْزِنَا
يَوْمَ الْقِيَامَةِ إِنَّكَ لا تُخْلِفُ الْمِيعَادَ.

154. Alî Îmran, 3/102

155. Yûsuf, 12/101

“...**Ey Rebbê me! Li gunehên me bibûre, xerabiyên me veşêre û me digel qencan bimirîne**.”[156]

Ew sêhrbazên ku hê ji nû li hemberî mûcîzeyên Mûsa -silavên xuda lê bin- îman anîbûn û misliman bûbûn, guhên xwe nedane tehdîdên Firewn, ê ku bi kuştinê gef li wan dixwarin. Ji bo me çi îqaz û îbreteke mezin e ku wan di nîyazên xwe yên canxiraş ên li ber cenabê Heq Teala de, ne xilasbûna xwe ji zulmê dixwestin; lêbelê wan dixwest ku bê zeîftîyek li îmana wan bikeve, ew karibin wek misliman rûhên xwe teslîm bikin.

❁

Li rexê din, di dûayan de ewê ku digihîje lutfa îlahî, sade ne ew cumle û hevokên berraq in ku bi dengê bilind û bi edaya şanîdan û zerqekarîyê bi rîyakarane, sextekarane ku qelb di wan de pişkdar nabe, têne vegotin û ne ew qîrewîrên bi dengên bilind in ku her wekî kezeban bidirrînin û ne ew peyvên bi nimûyîş in jî.. Heke wiha bûye, naxwe lazimî xwe dikir ku dûayên dijberî van, ya wî bêhalê ku ji nalînê biwêdetir deng dernaxe, yan ew nexweşê ku jandarê ku bi hêstirên çavan yên wekî xwînê laklakan dike, yan jî dûayê wan ğerîbên ku ew qeder lawaz in heta nikarin xebera xwe di nefsa xwe de bidin derbaskirin qebûl nebûbana.. Heke mirov xwediyê hizr û fikreke wiha be, naxwe mirov lîsanê hal nizane û ji xwe wî tine hesab dike.

Di dûayan de hebûna vê ji xwe re bi adetkirinê di esl û esasê xwe de kakil û mixê dûa, rûhanîyet û qudsîyeta wan lawaz dike. Mezinê me **Hezretê pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] di bara mirovên ku wiha dûa dikirin de wiha ferman dike, dibêje:

156. Alî Îmran, 3/193

“**Zumrekek wê were, ewê di dûakirinê de sînorê xwe derbas bike..**.”[157] Wî bi vê gotina xwe mirov ji ketina vê rewşê îqaz û şîyar kirine.

Wî di hedîseke şerîfa din de jî gotiye:

“*Hûn dûa ji yekî kerr nakin. Hûn dûa ji Xuda dikin ku ew bîser û ji we zehf nêzîk e.*”[158]

Cenabê Heq Teala dûayên semîmî bi şûn de venagerîne. Lêbelê digel hemû semîmîyeta wan jî ew ji bo hinek daxwazên ku ji Qadirê Mûtleq re miwafiq nayên jî, îcabet nake. Ji bo vê, ewê ku dûa dike, divê hîç ti zemanekî zêvirîyê şanî nede û li ser dûayan berdewam bike. Lewra di rewşên wiha de naxwe hemberê dûayan ji bo axretê hatiye hewale-kirin.

Qelbê ku xwe di wecda dûayan de noq kiribe, divê ew têbigihe ku wî xwe avêtiye ber derîyê bilindtirîn. Ew dilên ku bi hêvîya teweccuhê û vebûnê li ber derîyê dûa çavnêrî dikin, heke ew temen û emrekî temam li ber vê derîzana rehmê çavnêrî bikin jî zêvir nabin û nawestin. Lewra ji ber ku di alema wan de dûa û hêstirên çavan ji rehma îlahî peyda dibin, ew dişibihe îksîreke seadetê ku tesellî û hizûrê didin dilên mehzûn û ew wekî kewsereke şîrîn e ku kezebên bi evîndarî û sewdaya Heq Teala şewitî çi qeder jê vedixwin her pê fereh û keyfxweş dibin..

Divê em ji bîr nekin ku bi efûbûna hemû gunehên xwe emê bigihine şeref û heysîyeta însanbûna heqîqî. Ewên ku dixwazin bi mirinê re bigihîjin sirrê efûya ebedî û lutfên bêdawîyê Heq Teala te‘m bikin, divê pêşî ew di nav hewl û cehda vê de bin ku di halê wecdê de bi dûa û nîyazan bêhnê ji gulên mewcûd di bexçên dilan de derxînin. Em nîyaz dikin ku Rebbê me, yê xwediyê

157. Ebûdawud, Witr, 23

158. Buxarî, Cîhad, 131

qudret û merhemeta bêdawîn li me were rehmê û lutfên efûya xwe bi ser me de bibarîne.

**Ya Rebbî! Lutfa xwe li me bike ku em karibin bi eşq, wecd û hêstirên semîmî yên çavan nesîbê xwe ji rehm û meğfîreta îlahî wergirin! Dilên me bike xezîna rehmê li ser mexlûqatên te, bi umîda naîlîyeta rizaya îlahî! bi hurmeta dûayên feyzdarên evdên îxlasdarên xwe, ji bo welatê pîrozê me seadet û jîndarîyê û ji bo milletê me jî di heq û xêrê de yekîtîyê îhsan bike!**

**Amîn!..**

# Banga Ji Bo Heq û Xêrê

## -1-




*Divê em, wê têkoşîna canxiraşane ya ku mezinê me Resûlê Ekrem -dirûd û silavên xuda lê bin- daye ji bo karibe banga xilasîya ebedî bigihîne însanîyetê, ji bîr nekin ku em bi xwe gihiştine bextiyarîya şerefa ummetbûnê ji bo wî. Divê em bênavber zehf zêde mûhasebe bikin ka me wek ummeta wî çi qeder karîye vê sunneta wî bijîye û me çi qeder kariye bibe babet û layiq ji bo wesfê “**şahidên Xuda li sererdê**”..*

# Banga Ji Bo Heqî û Xêrê
# -1-

Her însanê ku sermayên fitrî yên wî her wekî eql, îdrak û îz'anê xirab nebûbin, dema ew bi çavên dil li heyata ku têde dijî û kaînatê seyr bike, bêyî ku ew zehmetîyê pê re bibîne, ewê bi hêsanî fehm bike ku ew pûç, bêğaye û bêhikmet nehatiye aferandin.. Li meydanê eşkere ye ku însan, ji bo hikmetên kûr û amancên ciddî hatiye aferandin û ew li vê dinyaya mirok û fanî jî ne serberedayî û pûç e.

Lewra Xuda di ayeta pîroz de ferman dike, wiha dibêje:

أَيَحْسَبُ الإِنسَانُ أَنْ يُتْرَكَ سُدًى.

**“Ma însan zen dike ku ewê serberedayî were hiştin?”**[159]

أَفَحَسِبْتُمْ أَنَّمَا خَلَقْنَاكُمْ عَبَثاً وَأَنَّكُمْ إِلَيْنَا لا تُرْجَعُونَ.

**“Ma we guman dikir ku me, hûn bes beredayî aferandine û hûnê li me neyêne vegerandin?”**[160]

Divê her însan herka heyata bi navê “**emr**” a ku li para wî ketiye; yanî peywendîya di navbera însan û kaînatê de û mûnasebeta di navbera dergûş û tabûtê de fehm bike.

Nîzama îlahî û herkên qudretê yên ku li ser kaînatê zal û hakim in, xwediyên eql û wijdanê diajon ser qebûlkirina aferînerê xwediyê hikmetê, yanî wan diajon ser “**îman**”anînê. Lêbelê Xuda Teala ji bo îmana însanan di maneya kamil de tehqîq bibe,

159. Qiyame, 75/36
160. Mûmînûn, 23/115

bi îlawe li ser wan lutfên din, bi awayê ku rêberên hîdayetê pêğember ji wan re şandine lutfeke din jî li wan kiriye.

Ew nîmeta "**îman**"ê ya ku bi van lutfan tê bidestxistin yek ji mûhîmtirîn xesletên ku bi însanî dide qezenckirin jî bêşiwar "merhemet" e. Merhemet, wekî agir e ku ew hîç di qelbê mûmînî de namevire. Ew cewhereke îlahî ye ku me ji Rebbê me nêzîk dike. Merhemet, fêkîyekî lutfa îmanê ye ku însanî ji xwedbînîyê diajoyê ser dîgerbînîyê. Lewra nîmeta îmanê çi qeder di dil de bigihîje kemalê, hissa dilê xwe şewitandina bi mirovên ji îmanê mehrûm ew qeder zêde dibe û ğeyret û hewldana ku ji bo wan were kirin jî hîn zêdetir dibe. Ji bo vê, rûhê mûmînekî kamil, dema li hawîrdorên wî mirovên ji bo banga hîdayetê hewcedar hebin, ew xwe bi îmana xwe tenê tesellî nabe.

Bêşiwar însan, rêwîyekî fanî ye ku ji bo rêwîtîya axretê derketiye ser rê. Înkarkirina vê, bi qasî ku mirov çavên xwe miç bike û hebûna taverojê înkar bike, keyfîyeteke ew qeder ji eql, mentiq û wijdanê re ğerîb û dij e. Naxwe tenzîmkirina heyatê di îstîqamet û rasta vê heqîqetê de jî zerûreteke eqlî, mentiqî û wijdanî ye. Di rêwîtîya vê heyatê de divê mûmîn nîmet û îmkanên di dest xwe de, ne ji bo feyda nefsa xwe tenê xerc bike; lêbelê yek ji mûhîmtirîn wezîfa dînî û wijdanîya wî ev e ku wan di ğeyret û hewldana îrşada mirovên ku pêdivêya wan bi îrşada wî heye de xerc bike.. Lewra bangkirina mirovan ji bo heqî, xêr, fezîlet, îman û emelê salih û ji vê cîhetê ve ji bo seadeta ebedî; arîkarbûn e, ji bo ew ji xirabîyan dûr bikevin; ğeyret şanîdan û hewldana ji bo ew li zeîftîyên exlaqê nekevin û nekevin koncala rezalet û hetîketîyan û nekevin reştarîyên kufrê, hem li dinyayê, hem jî li axretê ji erk û wezîfeyên çêtirîn û sewab-mezintirîn in..

Çawa ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîfa xwe de ferman kiriye û wiha gotiye:

*"Kesê ku mirovan ji bo rêya rast bang dike, bi qasî sewaba mirovên ku li pey wî tên sewabê werdigre. Ev, tabî tiştekî ji sewaba wan jî kêm nake!*

*Kesê ku mirovan ji bo rêyeke xirab jî bang dike, ew bi qasî gunehên mirovên ku li pey wî tên gunehan werdigre. Ev jî, tabî tiştekî ji gunehên wan jî kêm nake!..*"[161]

Wekî ku di vê hedîsa şerîf de jî hate dîtin, çi mizgînîyeke mezina nebewî di bara fezîlet û bereketa wezîfa teblîğa ji bo heqî û xêrê de heye! Li rexê din, hedîs dide zanîn ku ewê mirovan ji bo xirabîyan bang dikin jî, çawa gogeke berfê her ku diğindire û li hev totlanî dibe, ew mezin dibe û bi aşîtê werdigere, ew jî wilo guneh û webalê wan li ser hev sitûr û pehn dibin. Ev jî têrê dike ku ehemmîyeta wezîfe û mûkellefîyeta bangkirina ji bo heqî û xêrê û dûrkirina ji xirabîyan îfade bike.

Li rexê din, her mûmînê ku wezîfa teblîğê bike, divê pêşî ew şexsîyeta xwe îkmal bike. Lewra bi tesîrtirîn wasîte ji bo îrşadkirin û rêşanîdana mirovan ji bo heqî û xêrê, ew e ku mirov xwe bi xwe bike timsal û nimûneyeke nêreber û zindî ji bo heqî, xêr, fezîlet û rast û durustîyê. Bi vê nêrînê, şert e ku pêşî dozdarê hîdayetê bi xwe li ser "sîrata mûsteqîm" be. Bi maneya kamil kartêkerbûna teblîğê jî, bi "**qelbekî ku gihabe îtmî'nanê**" mûmkin e. Lewra ew zatên ku gihane vê ast û qiwama manewî, ji ber ku ew di nav wecda bêdawîn de dijîn, di nêrîna wan de çêj û lezzetên fanî surdarî û cazîbeya xwe winda kirine. Ji ber vê ew wezîfa teblîğê, ne ji bo hêvîkirina ti menfîetekê, yan jî derxistina parekê ji bo nefsa xwe, lêbelê ew sirf ji bo rizaya Xuda, yanî bi îxlas vê erkê bicih tînin. Ev keyfîyet, di heman demê de xusûsîy-eteke exlaqê enbîya û pêğemberan e.

161. Muslim, Îlm, 16; Ebûdawud, Sunnet, 6; Tirmizî, Îlm, 15

Çawa ku di Qur'ana Pîroz de di bara teblîğê de wiha tê gotin:

"**Ez ji bo vê ragihandina xwe ji we re ti heqzimanekî ji we naxwazim. Bes Rebbê aleman dê xelata min bide**."[162] Gellek ayetên pîroz hene ku vî exlaqê nebewî îşaret dikin.

❀

Di dînê me de ji wezîfa bangkirina ji bo xêrê û menkirina xirabîyan "**emrê bil-merûf û nehya enil-mûnker**" tê gotin. Fermana îlahî di vê xusûsê de di ayeta pîroz de wiha tê beyankirin:

وَلْتَكُنْ مِنْكُمْ أُمَّةٌ يَدْعُونَ إِلَى الْخَيْرِ وَيَأْمُرُونَ بِالْمَعْرُوفِ
وَيَنْهَوْنَ عَنْ الْمُنْكَرِ وَأُوْلَئِكَ هُمْ الْمُفْلِحُونَ.

"**Bila ji we civakeke wiha pêkwere ku banga ji bo xêrê bike, şîreta qenciyê bike û men'a ji neqenciyê bike. Ha ew in, yên ku rizgar bûne**."[163]

Ji bo mirov heqîyê ji batil, xêrê ji şerrê, fezîletê ji rezaletê û gihanê ji xamtîyê veqetîne qistasa yekane; dengê dîn e, yanî ferman û tewsîyên Xuda û Resûlê wî ne. Bilindkirina vî dengî jî yek ji wezîfên pêşîn ên her mûmînî ye.

Cenabê Heq Teala di ayeteke pîroz de bi vî awayî eşkere dike ku wezîfa teblîğê cîhadeke mezin e:

"[Resûlê min!] **Vêca serê xwe ji kafiran re hîç netewîne û bi vê Qur'anê li hemberî wan cîhadeke mezin bike!**"[164]

---

162. Şûera, 27/180
163. Alî Îmran, 3/104
164. Furqan, 25/52

Bi rastî hatina fermana “mûcaheda mezin” di werçerxa Mekkê de ku hê hêza mûmînan nebû ku pê karibin bi mûşrikan re mûcadele bikin. Yanî ew di serdemeke wilo de hatiye ku cehalet li ser hev sitûr û pehn bûbû, rêşaşî dîn û har bûbû, fesad û anarşî [berdîberdan-xwazî] xurt bûbû û kufr û îlhadê jî ji bo xwe seltenet û otorîte damezirandibûn, ev yek ji mûhîmtirîn maneyên cîhadê derdixe holê ku ev jî teblîğa Qur’ana Pîroz bû.. Lewra di wê çerxê de ne hêza mûmînan ew qeder hebû ku pê karibin li dijî zalim û dijminên xwe şerr bikin, ne jî di destê wan de ew qeder alav û techîzatên leşkerî hebûn. Ji kelamê Xuda pê ve tiştekî din di destê wan de nebû. Naxwe dixuyê ku tekane rê ji bo vê mûcadela mezin û ğeyreta ku di ayeta pîroz de hatiye ragihandin, teblîğa Qur’ana Pîroz bû.

❁

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîseke şerîfa xwe de ferman dike, wiha dibêje:

“*Bes ğibte ji van herdu kesan tê kirin: Kesê ku Xuda Qur’an daye wî, ew jî bi şev û roj pê re meşğûl dibe [bi wê dijî û wê teblîğ dike], ewê din jî, Xuda mal daye wî, ew jî bi şev û rojê wî malî di rêya wî de înfaq dike..*”[165]

Bi fezîlettirîn awayê meşğûlbûna bi Qur’anê, hînbûna wê, dan hînkirina wê, exlaqê wê ji xwe re kirina bi exlaq e, jîyanbûrandina di îstîqameta emr û nehyên wê de, bi zerafeta îmanê û bi lîsanekî nerm û xweş teblîğkirina wê ye. Ji bo teblîğa Qur’anê di dereceyeke ku jê tê arzûkirin de kartêkirin û tesîreke sipehî bihêle jî, divê şuğl û karê mûmînî di meşğûlîyeta bi Qur’anê de gihiştina vê kûrahîya hestan be.

165. Buxarî, Îlm, 15; Muslim, Mûsafirîn, 266

Çawa ku **Hezretê Ûmer** -xuda jê razî be- bi nîyeteke xiraba menfûra wekî kuştina mezinê me **Hezretê Resûlê Ekrem** -dirûd û silavên xuda lê bin- ji malê derketibû rê, ew bûyera ku ji bo hîdayeta wî bûye wesîle jî; bi îlawe li ser bereketa dûaya ku Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re kiribû, ew teblîğa Qur'anê bûye ku li mala xweha wî bi kûrahîya qelbî hatibû xwendin û jîyandin..

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û eshabê kîramên wî bi her hêz û taqeta xwe di rêya teblîğkirina Qur'ana pîroz de, naxwe di rêya teblîğkirina dînê Xuda de ğeyret serf kiribûn û di vê oğirê de malê xwe û canê xwe û her cure derfet û qeweta xwe seferber kiribûn.. Ew sehabîyê ku mektûb û nameyên pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] yên ku ji bo hîdayetê bang dikirin li pêşberî celladan [serbirran] li ber qral û milûkan bêtirs û perwa dixwendin û di ber bicihanîna wezîfa xwe de xwe ji dana canê xwe jî nedidan paş. Kêm-zêde ji 120 hezar sehabîyên ku li xutba xatirxwestinê ya meşhûra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] guhdarî kiribûn, heke mirov bihizre ku bes bi qasî 20 hezaran ji wan qebra wan li Mekke û Medînê medfûn e, hingê mirov dê baş fehm bike ka sehabî ji bo banga teblîğê çawa bi heyecan bûn û wan çawa di rêya wê de sînor derbas kirine.. Çawa ku sehabe çûbine kuderê ji Çînê bigre heta bi Îstanbûlê, ji Afrîqayê bigre heta bi Qefqasyayê li her cih û deveran fetrîmkirina hîdayet û rehmê kirine û ew di qedera îslamê de ji bo qezenckirina meqamekî şerefmend biserketibûn. Bi vî awayî, ew dawet û banga hîdayetê ya ku ji Mekkê destpê kiribû, wan cehd kiribû û hewldabû ku wê bigihînin hemû zeman û mekanan.

Bi taybetî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di rêya teblîğa peyama îlahî ya ku ji bo hîdayetê bang li însanîyetê dikir de mûcadele û ğeyreteke wilo serf kiriye ku ew di ser taqeta

beşeran re ye. Ji alîyekî ve ev ğeyret û hewldan ezemet û ehemmîyeta wezîfa teblîğê û mes'ûlîyeta wê datîne holê, li alîyê din jî dide hînkirin ka divê mûmîn di vê xusûsê de çawa di nav coş, xuroş û heyecana îmanê de bijîn.

Mezinê me Resûlê Ekrem -dirûd û silavên xuda lê bin- ku cenabê Heq Teala ew ji bo me evdên xwe wek mûkemmeltirîn şexsîyeta nimûneyî şandî jî, wî heyata xwe ji bo wezîfa teblîğê weqf kiribû. Dema wî teklîf û pêşnîyarên dinyewî û nefsanî yên mûşrikan, ewên ku heta tu bibêjî bes cazib bûn, red kirin, rûbirû mayîna wî li hemberî ezîyet, tinaz, heqaret û neheqîyên wan yên ku hîn zêde bûne jî nekarîn wî ji ğeyret û hewldana di rêya hezkirî û sewdaya wî de asteng bikin.. Ew di vê rê de ew qeder bi biryar bû ku lerzeke biçûktirîn jî qebûl neke û di nav wecdeke mezina îmanê de bû. Hê di zeîftirîn zemanê ku wezîfa teblîğê destpê kirî de jî, ev cewaba tarîxî ya ku wî li hemberî wan teklîfên cazibên ku mûşrikan jê re anîbûn ji bo karibin wî ji doza wî vegerînin jî vê rastîya me gotî derdixist holê:

"*Wellahî, heke ew rojê bixin destê rastê min û heyvê jî bixin destê çepê min ji bo ez ji teblîğkirina dînê Xuda vegerim, dîsa ez ji vê dozê venagerim! Yan Xudayê raser, yê wê li temamê cîhanê belav bike [bi vî awayî] wezîfa min yê temam bibe; yan jî ezê di vê rê de bimrim û herim!*"[166]

Bi rastî mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo teblîğa îslamê ew qeder ezîyet û zehmetî tehemmul kirine ku taqeta ti beşerekî nikare xwe li ber wan bigre. Wî, her firsend nirxandiye. Wî hemû rê tetbîq kirine da ku karibe tuxmên hîdayetê di dilên mirovan de bireşîne û biçîne. Bi vî awayî, ew ji bo ummeta xwe bûye çêtirîn û sipehîtirîn nimûne.

166. Li Îbnûl Esîr, el-Kamil fît-Tarîx, II, 64'an binêrin.

Çawa ku di salên pêşîn ên pêğembertîyê de di zemanê ku mûşrik ji bo hecê dihatin Mekkê de ew bi xwe li nav hemû hoz û êlan digerîya û zehf caran îslam ji wan re vedigot. Ew bê raw-estan li cihên kombûna xelkê û li dîwanên sohbeta wan digerîya. Ew li kê rast dihat; çi azad, çi kole, çi lawaz, çi xurt, çi zengîn û çi feqîr her bê ferq û cudahî wî ji bo bawerî anîna bi yekbûna Xuda Teala bang li wan dikir.

**Cabir** -xuda jê razî be- wiha dibêje:

“Resûlûllah -dirûd û silavên xuda lê bin- di werçerxa cahilîyetê de di demsal û mewsimeke hecê de li cihê wiqûfê doza xwe ji hacîyan re erz dikir û ji wan re wiha digot:

“-*Ma kesek nîn e ku min bibe nav qewmê xwe? Qureyşî nahêlin ku ez kelamê Rebbê xwe teblîğ bikim*.”[167]

Ji bilî vê, li Mekkê bazar û pêşangehên wekî Ûkaz, Mecenne û Zulmecazê dihatin sazkirin. Ew bi xwe diçû nav wargehên êlan û xwe ji wan re dida naskirin. Wî, ew ji bo iqrarkirina bi yekbûna Xuda Teala û îbadetkirina bes ji wî tenê re bang dikirin.

Digel wê heqaret [biçûkxistin] û ezîyeta ku bi taybetî li Taîfê jê re rûbirû mabû jî dîsa wî ji bo wan ji Xuda xilasî û rizgarî dixwest. Ji wê Taîfa nehîtî bes heqînasî û hîdayetbûna koleyekî bi navê **Eddas** tenê jî kîfayet û têrê dikir ku ferah û şahîyê ji bo dilê ğemgînê wî bexş bike. Digel zulim û heqareta ku li wî hatibû kirin jî dîsa hêrsa wî nedifûrî û bi sebeb ğalib hatina ef û mer-hemetê di dilê wî de wî her ji bo hîdayeta wan dûa dikir.

Digel ku dilê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo zulma ku xelkê Taîfê lê kiribû ğemgîn bûbû jî, esil xusûsa ku ew dixist fikar û mitala, ev bû ku ew di wezîfa teblîğ û

167. Ebûdawud, Sunnet, 19-20

mes’ûlîyeta wê de bikeve zeîftî û nuqsanîyê. Çawa ku wî di bin wan şert û mercan de jî bi vî awayî îltîca dikir û xwe diavêt ber penaha cenabê Heq Teala:

“*Xudayê min! Ez zeîfbûna qeweta xwe û bêçaretîya xwe ji te re erz dikim ku di nêrîna xelkê de dibe sebeb ku ew min nehêja û heqîr bibînin. Ey merhemetmendtirînê merhemetmendan! Heke tu ji min ne ğeyidî bî, dîsa êş û belayên ku hatine serê min ji min re ne ğem in! Îlahî! Qewmê min bîne ser hîdayetê; lewra ew nizanin. Îlahî, heta tu ji min razî bibî, ez efûya te her dixwazim..*” [168]

Ji bo mirov karibe çêj û zewqa bêdawî ji vê heyata fanî wergire, ev yek, wekî ku mezinê me Resûlê Ekrem -dirûd û silavên xuda lê bin- wilo kirî, bi derxistina bêhna ef û merhemetê ji dilistana bexçê gulan mûmkin e.. Zerûrî ye ku em merhemetê bilind bikin û derxin ser hemû hezkirî û sewdayên din. Bila em merhemetê bikin ji bo em, ji merhemet-lêkirinê re bibin layiq û babet û ji bo ji sifetê “Rehman” ê Heq Teala tecellîyek bibe nesîbê me jî.

Rehma Heq Teala deryayeke wilo ye ku bes dilopeke tenê ji wê têrê dike ku dilê me jê têr û tije bibe. Mideta ku ew dilop bikeve dil û lezzeta xwe pê bide te‘mkirin û çêjandin, hingê ew dil, gihaye deryayê. Ew dilên ku her yek ji wan dibe deryayeke rehmê, bi îltîca, dûa û teblîğê digihîjin qiwam û asta heqîqî. Dilên wiha êdî, bi lîsanê halê xwe feryad dikin û dibêjin; “li me werin rehmê” û ew dikevin rewş û wezîyeteke wilo ku feryadê bêpêjn, bêhis û kirr ên ğafilên ku ji ğaye û emanca xulqîyeta xwe bêxeber in jî, dibihîzin. Ew li kêleka wan matem û şînan dibin. Ha Taîf mûşexxestirîn û nêrebertirîn nimûneya vê rewşê ye. Çawa ji bo taverojê ne mûmkin e ku ew germ neke û rohnî neke, ji bo rûh

168. Îbnû-Hîşam, II, 30

û gîyanên kamil jî berneketin û rehm-nekirin, yanî ji teblîğkirina Heqî û xêrê bêgane man jî eynî wilo ne mûmkin e.

Bêşiwar e ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî hatiye şandin da ku ew ji alemê re bibe rehm. Heke çi qeder hinek însanan di hinek wext û zemanan de biha û qîmetê wî nezanîbin, ew teqdîr nekiribin û înkar kiribin, her cure heqaret ji bo wî rewa dîtibin jî, van cure serxweveçûn, serserîtî û bêtoretîya wan jî nekarîne bikin û nehêlin ku di mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de merhemeta wî li hemberî ğezeba wî ğalib bibe.. Tam berevajî vê, gellek rûh û gîyanên êşdarên ku sefaleta ketibûnê seadet zen dikirin di keş û hewaya dilê nebewî yê wekî deryayeke fereha şefqetê, mûsameha, ef û merhemetê de gihabûne şerefa îmanê.

Çawa ku ev îfadeyên mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di wezîfa teblîğê de haletê rûhîyê wî datînin holê:

"*Rewşa min û we dişibihe vê: Zilamek agir pêdixe. Dema agir hawîrdorên xwe rohnî dike, perperîk û hinek heywanên ku ji ronahîyê hez dikin, destpê dikin, xwe diavêjin nav vî agirî. Ew zilam destpê dike, hewl dide ku ji wan re bibe asteng. Lêbelê ew heywan ğalib tên û pirranîya wan dikevin nav êgir. Ez bi berstika we digrim ji bo hûn nekevin nav êgir, lêbelê hûn jî lezê dikin ji bo xwe bavêjin nav êgir!*"[169]

❀

Cenabê Heq Teala di Qur'ana Pîroz de ferman dike, wiha dibêje:

169. Buxarî, Rîqaq, 26

كُنْتُمْ خَيْرَ أُمَّةٍ أُخْرِجَتْ لِلنَّاسِ تَأْمُرُونَ بِالْمَعْرُوفِ وَتَنْهَوْنَ عَنِ الْمُنكَرِ وَتُؤْمِنُونَ بِاللَّهِ.

"**Hûn ummeta qenctirîn in ku ji bo mirovan hatine deranîn; hûn şîreta qenciyê dikin, men'a neqenciyê dikin û bi Xuda îmanê tînin**."[170]

Ha ji bo em karibin bikevin nav naveroka beyanata ayeta pîroza ku gotiye; "**hûn ummeta çêtirîn in**" divê em jî wekî mezinê xwe pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] **merûf**ê yanî qencî, fezîlet û xêrê bijîn û şîreta wê bikin, divê em li derveya **mûnker**ê, yanî xirabî û şerrê bimînin û em nehyê jê bikin..

Xuda Teala di ayeteke pîroza din de wiha dibêje:

"**Ma gotina kê ji ya wî kesî sipehîtir e ku gazî bal dînê Ellah dike, 'emelê salih dike û dibêje; ez ji mislimanan im?!**"[171] Bi vî awayî Heq Teala li cem xwe biha û qîmetê ulwîyê vê wezîfê eşkere dike.

Divê em, wê têkoşîna canxiraşane ya ku mezinê me Resûlê Ekrem [dirûd û silavên Xuda lê bin] daye ji bo karibe banga xilasîya ebedî bigihîne însanîyetê, ji bîr nekin ku em bi xwe jî gihiştine bextiyarîya şerefa ummetbûnê ji bo wî. Divê em bênavber zehf zêde mûhasebe bikin ka me wek ummeta wî çi qeder karîye vê sunneta wî bijîye. Lewra mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di temamê dirêjahîya emr û temenê xwe de ev wezîfe anîye cih û ji ummeta xwe jî xwestiye ku ew di her hal û karî de wê bidin berdewamkirin. Wî, di her

170. Alî Îmran, 3/110

171. Fussîlet, 41/33

fersendê de wezîfe û berpirsîya teblîğê di bîra ummeta xwe anîye û ew teşwîq kiriye.

Çawa ku ew di hedîseke şerîfa xwe de ferman dike, wiha dibêje:

"*Heke ayetek be jî wê ji min bigihînin însanan.*"[172]

Wî di hedîseke şerîfa dîtir de gotiye:

"*Xuda rûyê wî kesî rohnî û sipî bike ku ew tiştekî ji me bibihîze, eynî wekî ku bihîstiye wê wilo bigihîne dîgeran. Lewra çendîn mirov hene, ji mirovên ku ew wê ji wan re digihîne, ew wê agahîyê ji yê ku wî bi xwe ew bihîstiye bêhtir fehm û tetbîq dikin.*" [173] Bi vî awayî wî ummeta xwe ji bo teblîğê teşwîq kiriye.

Ji bilî vê jî, ev beyana nebewî ya ku di bîra me dixe ku ev hemû erk û wezîfên teblîğ û îqazan ku ew însanan ji xirabî û şerran dûr dikin û wan ji bo sipehîtî û xêran jî bang dikin jî zehf îbretamîz e!. Lewra ew her wekî cure kevirê mîhengê [şehînê] ne, ku sewîya îmana me dipîvin:

"*Kî, ji we xirabîyekê bibîne, bila wê bi destê xwe biguherîne û rast bike; heke ew nikaribe bi destê xwe wê biguherîne û rast bike; bila ew bi zimanê xwe wê biguherîne û rast bike; heke ew nikaribe bi zimanê xwe jî wê biguherîne û rast bike; naxwe bila ew bi qelbê xwe buğzê jê bike ku ev jî, zeîftirîn halê îmanê ye..*"[174]

Mezinê me Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîseke şerîfa dîtir de jî ferman dike, wiha dibêje:

"*Ez bi wî Xudayî sûnd dixwim ku heyat ji min re bexş kiriye; hûnê, yan şîreta qencîyan bikin, men'a neqencîyan bikin, yan jî*

172. Buxarî, Enbîya, 50

173. Tirmizî, Îlm, 7

174. Muslim, Îman, 78

*Xuda wê ji cem xwe ezabekî bi ser we de bişîne! Ew çax hûnê dûa bikin, lêbelê dûayên we qebûl nabin.*”[175]

**Ya Rebbî! Em xwe, ji netîce û encamên xirab ên ku ji îhmalkirina wezîfa Emr bi'l-Merûf û nehy eni'l-munker dizên, diavêjin ber penaha te.**

**Ya Rebbî! Me bike ji wan kesên ku para xwe ji exlaqê sipehî yê Resûlê te werdigrin; ew Resûlê ku te ew ji bo beşerîyetê wek sipehîtirîn şexsîyeta nimûneyî kiriye xelat, û bike ku em karibin bi awayekî layiq wezîfa banga ji bo heqî û xêrê bînin cih û lutfê li me evdên bêçareyên xwe bike da ku em bigihîjin şefaeta bilinda Resûlê te!.**

**Amîn!..**

175. Tirmizî, Fîten, 9

# Banga Ji Bo Heqî û Xêrê

# -2-



*Bextiyartirînê mirovan ew kes in ku qelbên xwe di keş û hewaya Qur'ana Pîroz û Sunneta Senîyye de kirine dergehekî manewî û karîne mexlûqatan di nav wî de bihewînin. Qîmet û heysîyeta esasî ji bo însên ew e ku mirov qelbê xwe ji feyzê tije bike, wilo bijî û bi wê ast û qiwama qelbî teblîğê bike. Dema qelb ji kelem û strîyên manewî tije be, hingê kirina teblîğê, xwe westandineke pûç û lawazîyeke mezin e.*

# Banga Ji Bo Heqî û Xêrê
# -2-

Ji bo em karibin Kitêba Xuda û Sunneta Resûlûllah dirûd û silavên xuda lê bin di heyata xwe de tetbîq bikin, zerûrî ye ku em erk û wezîfa teblîğa heqîyê û xizmeta xelkê di dilê xwe de bikin evîn û sewda. Lewra divê heyata mûmînî, heyata xizmet û teblîğê be.

Hîç şubhe nîn e ku yek ji mûhîmtirîn wan wesfên ku mûmînê heqîqî ji însanên din vediqetînin, dilovantir û merhemet-mendtirbûna wî ye. Teblîğ, di eynî zemanî de ber û mehsûleke merhemetê ye. Banga ji bo heqîyê û teşwîqa xêrê yek ji awayê tezahur û xuyabûna merhemetê ye ku şert e, mûmîn pêşî wê di nefsa xwe de tehqîq bike.

Ji bo banga heqîyê û teşwîqa xêrê jî pêşî lazim e, ku em bi awayekî sağlem di bara mahîyeta heqî û xêrê de waqif û agahdar bin. Lewra teblîğa cahilî, sade ne bi uslûb tenê, belkû bi mûhtewa û naverokê jî ne mûmkin e, ew ji şaşîyan bêrî û dûr be. Naxwe di vê rê de lazimîya pêşîn **sermayê îlmî û qelbî** ye. Lewra heyata îman û evdînîyê, ji bo mirov karibe di hevkêşî û mûwazena eql û qelb de bijî, îhtiyac bi van herdu sermayeyan heye.

Li alîyê din, li ser esasê "**zerûretên dînî**" zanîna meseleyên dînî ji ber ku bi awayekî îlmî li ser her mislimanî ferz bûne, naxwe bi kêmasî divê her mûmîn van esasên bingehîn zanibe. Bila ewên ku wan nizanibin jî ji tirsa vê biwêja ku dibêje"**dema birhan çêkin çavan derxînin**" [dema dixwazin kar çaksaz bikin ji nezanîna xwe wî xirab dikin] hewl bidin ku bilezûbez kêmasîyên îlmî û qelbî yên xwe temam bikin û tiştên ku hîn dibin jî di heyata xwe de tetbîq bikin.. Bi vî awayî ğeyret bikin ku

îlmên xwe bixin îrfan.. Lewra tesîr û kartêkirina banga ji bo heqî û xêrê bi kûrahîya asoya dilê me ve pêbend e ku ew jî bi tijebûna dinyaya navxweyî ya me ji feyz û rûhanîyetê mûmkin e..

Wekî ku **Hezretê Mewlana** dibêje:

"*Dema mirov hewl dide kîsekî tije bike, divê mirov wî ji qula di binî de vala neke*."

Di rastîya xwe de teblîğeke ku mirov bi xwe wê nejî, ew bi nezanî, bi usûla "**hema çawa lê were**", ji eşq-şewqê mehrûm, bi îfadeyên serhişkî û hovane û bi uslûbeke amîyane were kirin, çawa ku ji wê teblîğê çavnêrîkirina hasilbûna feyda ku jê tê xwestin bê feyde û bêmane ye, ev, di heman demê de webalekî giran jî lazim dike..

Bi vê sebebê divê mûmîn, alema dilî ya xwe bi zerafet, nezaket û sipehîtahîyên îslamê bixemilîne; bi halê xwe, bi gotinên xwe û bi tevgerên xwe wek nimûneya îmtîsalê ew di teblîğa heqîyê û teşwîqa xêrê de mînakê teşkîl bike. Lewra heqîqeta wezîfa banga ji bo heqîyê, di "bi evîndarî berê xwe dana Rebbê 'alî" de veşartî ye. Çawa ku ev evîndarîya ulwî ya ku **Hezretê pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] pêşî wehîya pêşîn di şikefta Hîrayê de pêşwazî kiribû, wê rûhê wî ji feyz û heyecana teblîğê tije kiribû û di Mîracê de ew ji bo hizûra îlahî bilind kiribû.

Cenabê Heq Teala di ayetên pîroz de ferman dike, wiha dibêje:

"**Mêrên bawermend û jinên bawermend hinek ji wan piştevan û arîkarên hinekan e. ew şîreta qencîyê dikin, men'a neqencîyê dikin, nimêja xwe eda dikin, zekatê didin û bi xebera Xuda û pêğemberê wî dikin. Ha Xuda, wê rehmê li wan bike. Bi rastî Xuda destbilind û xudan hukm û hikmet**

**e. Bêşiwar Xuda, ji mêrên bawermend û jinên bawermend re peymana hinek bihiştan û wargehên xweş; li bihiştên ‘Ednê daye ku di bin wan de çem diherikin. Ewê heta hetayê li wan bimînin û ya ji van hemûyan jî mezintir rizamendîya Xuda ye. Ha ev e, ew serfirazî ya mezin.**”[176]

Bextiyartirînê mirovan ew kes in ku qelbên xwe di keş û hewaya Qur’ana Pîroz û Sunneta Senîyye de kirine dergehekî manewî û karîne mexlûqatan di nav wî de bihewînin. Dîsa ew kes in ku karîne nesîbê xwe ji kûrahîya Qur’anê wergirin, heyateke îmanîya rastîn bijîn û heta bi nefesa dawîna xwe jî qelbê xwe ji wesweseyên eqlekî ku ji nefsanîyetê re ram û teslîm bûye, biparêzin. Lewra qîmet û heysîyeta esasî ji bo însên ew e ku qelbê xwe ji feyzê tije bike, wilo bijî û bi wê ast û qiwama qelbî teblîğê bike. Dema qelb ji kelem û strîyên manewî tije be, hingê kirina teblîğê, xwe westandineke pûç û lawazîyeke mezin e. Dînê me, “**îddîa û îtham**”a ku wekî pençeşêra rûh e, red dike; tewazû, mehebbet û merhemetê li dilan dide hînkirin. Divê alema dilîya mûmînî wekî bexçekekî çîçekan be ku têde her sûret û çehreya tirş û ebûs û dilên ğemgîn aramîyê dibîne û tebessum û bevkenîyê dike. Ji ber vê xwediyê wê hesta ku qelb û bedena wî her wekî kelem û strî be, zerûrî ye ku ew xwe ji hizr û tevgerên wekî strîyan paqij bike û xwe bixe wê rewşa ku karibe bi zerafet, nezaket û ciwanîya îslamê teblîğa heq û heqîqetê bike.

Heke çi qeder tarîxê **Heccacê Zalim** bi zulimkarîya wî meşhûr kiribe jî, ew însanekî tebîet fîlozof bû. Rojekê xutbexwên wî di nimêja înê de dibîne, vê fermana “*tevgera ku Xuda zehf jê hez dike ew e ku mirov neheqîya rêvebirê zalim di rûyê wî de biqêre û jê re bibêje, tu zalim î.*” li ber çavan girt, di xutba xwe

176. Tewbe, 9/71-72

de bi uslûbeke dijwar û hişk peyvên tund û neşîrîn jê re vegotin. Heccacê Zalim bi sikûnet lê guhdarî kir.

Wî di piştî nimêjê de ji bo hatina cem xwe gazî xutbexwên kir û jê pirs kir:

“- Ka bibêje, te di xutbê de tiştê çawa gotin?!”

Xutbexwên bi hizra ku serê wî her dê were jêkirin, gav bi şûn de neavêt û peyvên xwe yên di xutbê de dîsa bi uslûbeke dijwar jê re dubare kirin.

Heccac jê re got:

“-Ev tişteke ğerîb e. Tu dişibihî mirovekî alim. Lêbelê xebera te ji metodên doz û daweta îslamî nîn e. Ma tu hîç Qur’anê naxwînî? Ma cenabê Heq Teala dema **Mûsa** -silavên xuda lê bin- ku bêşiwar ew ji te çêtir û fezîletmendtir e, ji Firewn re şandibû ku ew ji min hemin qusûrmendtir e, ji vê jî zêdetir ew ji ehlê kufrê ye, ferman lê kiribû, jê re negotibû: Gotineke“**leyyîn**” yanî lîsanekî wekî herka avê nerm bikarbîne?!

Xutbexwên şaşîya xwe fehm kiribû. Wî uzrê xwe xwest û bi xêra ef û mûsamehekarîya Heccacî serê xwe ji dana ber destê cellad xilas kir.

Bes ne ev hadîse û bûyera ku li hemberî Mûsa -silavên xuda lê bin- rûdaye tenê ye, ew beyana îlahî ya ku metoda doz û teblîğê li me hîn dike. Gellek ayetên pîroz hene, eşkere dikin ku divê teblîğa heqîyê bi peyvên nerm û hekîmane û bêyî rencîdekirina mûxateb û berpeyvî, were kirin.

Çawa ku cenabê Heq Teala di ayeteke pîroza din de ferman dike, wiha dibêje:

ادْعُ إِلَى سَبِيلِ رَبِّكَ بِالْحِكْمَةِ وَالْمَوْعِظَةِ الْحَسَنَةِ وَجَادِلْهُمْ بِالَّتِي هِيَ أَحْسَنُ إِنَّ رَبَّكَ هُوَ أَعْلَمُ بِمَنْ ضَلَّ عَنْ سَبِيلِهِ وَهُوَ أَعْلَمُ بِالْمُهْتَدِينَ.

"[Resûlê min!] **Tu, bi hikmet û bi şîreta sipehî ji bo rêya Rebbê xwe bang bike. Bi wan re bi rindtirîn awayî têbikoşe, mûcadele bike. Bi rastî Rebbê te, bi wî yê ku ji rêya wî ketiye bêhtir dizane û ew, bi yên ku hatine ser rêya rast jî bêhtir dizane.**"[177] Bi vî awayî edebên doz û dawetê beyan kirine. Bi vê sedemê, divê em para xwe ji şexsîyeta nimûneyî ya pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wergirin ku sîyer û jînenîgarîya wî bi xwe Qur'aneke zindî bûye û divê em usûl û edebên teblîğê yên ku wî danîne holê jî rîayet bikin û wan li ber çavan bigrin..

Bi vê nêrînê divê mûmîn, pêşî alema navxweyî û derveyî-ya xwe bi sipehîtîyên îslamê bixemilîne, bi exlaqê xweşê xwe û bi tevgerên xwe yên çak pêbawerî û îtîmadê li hawîrdorên xwe bide hînkirin û bibe xwedî şexsîyeteke baş û rewîştekî çak. Çawa ku dema ayeta pîroza: "**Tu pêşî 'eşîra xwe ya nêzîktirîn** [ji ezabê Xuda] **hişyar bike.**"[178] ji mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re nazil bû, wî qebîleya Qureyşîyan ji bo girê Sefayê bang kiribû, ew hilgerîyabû ser zinarekî mezin û wiha gazî wan kiribû:

"*-Gelî koma Qureyşîyan! Heke ez ji we re bibêjin; li qûntara vî çîyayî, yan jî di vê newalê de siwarîyên dijminan hene, der-*

177. Nehl, 16/125

178. Şûera, 26/214

*hal ewê êrîşê bînin ser we, ewê malê we ğesb bikin, hûnê ji min bawer bikin?*"

Wan jî bê tereddud jê re gotibûn:

"-Erê, emê bawer bikin! Lewra me heta îro tu her wek rastgo dîtî. Me hîç nebihîstiye ku te derew kiribe!"

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi vî awayî berî teblîğê, xwe bi wan dabû qebûlkirin û tesdîqkirin ku ew hîç derewan nake, ew mirovekî pêbawer, emîn û sadiq e. Yanî wî xwe bi hawîrdorên xwe dabû tescîlkirin ku ew şexsîyeteke kamil, gihayî û durust e. Ew mirovek ew qeder durust bû ku heta dijminê yeman û harê îslamê **Ebûcehl** bi xwe jî di bara mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de hîç nedigot; ew derewan dike, lê wî bi van peyvan îtîraz lê dikir:

"-Ya Mûhemmed! Em ji te re nabêjin tu derewîn î. Xelkê Mekkê, yanî me sifetê "el-Emîn" daye te. Tu derewan nakî. Lêbelê dibe ku ew melekê vê wezîfê ji te re radigihîne, te dixapîne."

Cenabê Heq Teala di ayeta pîroz de vê keyfîyetê wiha beyan dike, dibêje:

"**Bêşiwar em dizanin ku gotina wan te ğemgîn dike; bi rastî, ew ne ku te diderewînin; lêbelê ew zalim bi eşkerehî ayetên Xuda înkar dikin**."[179]

Wekî ku hatiye dîtin, mezintirîn dijminê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] heta bi Ebûcehl jî qebûl û tesdîq dikir ku ew însanekî mûstesna û cihêwaz e. Heta hinek mirov hebûn dema wan mezinê me Resûlê Ekrem [dirûd û silavên Xuda lê bin] didît, sirf di bin bandora lîsanê halê wî de diman, digotin;

179. En'am, 6/33

“ev rû derew nake” û bi îmanê şerefmend dibûn.. Ha mirov nikare înkar bike ku di fetha dilan de heta tu bibêjî bes îhtiyaca me bi vê keyfîyetê jî heye.

Çawa ku **Fatîh Sultan Mehmed Xan**ê ku di tarîxa me de yek ji şexsîyetên cihêwaz û mûstesna ye, pêşî Îstanbûl fetih kiribû û deh salan di piştî wê de jî Bosna fetih kiribû. Lêbelê fetha eslî, yanî fetha dilan, piştî ew şûrê ku kilîlên zahirî vekirin bi şûn de vegerîya, hatibû cih. Lewra leşkerên dilan yên ku di pêsîra Anadolê de gihabûn, malbatên tertemîz li wir hatibûn bicihkirin, bi vî awayî seferberîya “**teblîğa bi hal û exlaqê xweş**” hatibû destpêkirin. Di netîce û encama vê de hê demeke dirêj bi ser de derbas nebûyî Boşnaq bi îslamê şerefmend bûbûn.

Bi rastî çek û sîlah, ji bo berterefkirina zulmê tê bikaranîn. Lêbelê fetha eslî ya ku divê were qezenckirin, fetha dila ye. Ev jî, heke mirov bibe şexsîyeteke wilo ku bi exlaqê îslamê û nezaketa wê bijî, mûmkin dibe. Lewra tesîr û kartêkirina teblîğ û dawetê, heta tu bibêjî bes bi jîyana dozdarî û heyata qelbîya wî re têkildar e. Bi vê nêrînê, ji bo teblîğkarekî heqîqî, tênegihiştina hikmeta nîzama îlahî ya di kaînatê de û fehm nekirina ji lîsanê halê mexlûqatan, ji nuqsanîya qiwama qelbî ye. Cubbeyekî ziwa yê ku di navê de dilekî hessas nebe, ew bi ti awayan nikare aramî, keyfxweşî û sipehîtîyê bide hawîrdorên xwe.

Ji ber vê herba ku pêşî qezenckirina wê zerûrî ye, herba alema navxweyî-ya însên e. Cenabê Heq Teala di xusûsa îzahkirina herba alema navxweyî-ya însên de behsa mûcadela “**ficûr û teqwa**”yê dike. Ji bo qelb karibe ji ficûrê xilas bibe û bi teqwayê bixemile, ew sermayê seadeta heqîqî û xilasîya ebedîya însên e. Ha ewên ku tesîrê li qelban bikin û bikarin fetrîmkirina xilasîya ebedî bikin jî, bes ew kes in ku mûcadela alema navxweyî-ya

xwe qezenc kirine û bi teslîmîyeteke tam ji Heq Teala re ram bûne.

Li alîyê din, xusûseke dina ku divê di teblîğê de were diqqetkirin, qîmet-dana bi berpeyv û mûxatebî ye. Lewra divê em bi ti awayan ji bîra xwe dûr nexin ku berpeyvê teblîğê însan e, însan jî heybereke şerefmend e ku Xuda Teala ew mûkerrem xuliqandiye. Heke lazim be ku ji îmanê dest bi teblîğê bike, digel vê mehrûmîyeta mûxatebî jî divê mirov qîmetê eslî yê di aferandina wî de li ber çavan bigre û biha pê bide. Maneya vê, di şûna hêrs û dijwarîyê de mûamele-kirina bi umîd, mûsamehe û merhemetê ye. Di esasê xwe de wiha hereket-kirin, ji bo vê dîtin-nêrîna bingehîna di însên de guncawtir û mûnasibtir e.

Şair Namiq Kemal ji bo îfadekirina vê maneya hûr gotiye:

"*Bi ketina ser erdê gewher ji qedr û qîmetê xwe nakeve*."

Di hemû ayetên Qur'ana Pîroza ku însên şerefmend dikin jî, biha bi vê mahîyeta eslî ya wî didin.

Çawa ku Xuda Teala di ayeta pîroz de ferman dike, wiha dibêje:

وَلَقَدْ كَرَّمْنَا بَنِي آدَمَ.

"**Me, bi rastî zaroyên Adem kirine xwediyê rûmetê**."[180] Bi rastî di Qur'ana pîroz de sirf ji bo heysîyeta însanbûna wî ew wek xelîfê cenabê Heq Teala tê teqdîmkirin.

Îman û emelên salih ên ku di piştî wê de tên, mûqtezaya [lazimîya] vê şerefa eslî ye. Mehrûmîyeta ji îmanê û emelên salih jî, bicih-neanîna îcaba vê şerefa eslî, yanî heysîyeta însanbûnê ye ku ew jî çi mehrûmîyeteke dehşetamîz û kêm-xistin e. Ewên

180. Îsra, 17/70

ku ji hêla emelê xwe ve qusûrmend bin jî, heke çi qeder ne bi qasî mehrûmên ji îmanê bin jî dîsa ji bo berketin û merhemetê layiq in.. Ewên ku ji bo mehrûmîyeteke wiha rûbirû mabin, dibe ku însanên jirêzê ji wan hêrs bûbin, qeherîbin. Lêbelê ewên ku gihabin wecd, lezzet û kemala îmanê, divê ber wan mehrûman bikevin û li wan jî werin rehmê. Lewra ev helwest ji wê lîyaqetê tê hêvîkirin. Ev hesta berketinê jî arîkarîyê îcab dike. Arîkarîya mezintirîn jî bi banga seadeta ebedî, yanî bi teblîğê tê cih.

Teblîğkarekî heqîqî, ew şexsîyeta rêzan e ku karibe ji bo rûh û gîyanan heyat û nîzamê fetrîm bike. Ewê ku zanibe di her qad û rastê de teblîğa xwe bi evîndarî, hezkirin û dilovanîyê bike, ew însanê dil e ku ew jî serkehnîya îmanê ye. Ew kesên rêzan in ku bi peyva xwe, nivîsa xwe û bizavên zerîfên xwe yên nimûneyî ji însanan re rêya seadet û aramîyê nîşan bidin, ew li kêleka her matem û şînê, li ber serê bêkesan û li ber serê jankêşan dibin. Ji ber ku ew di sîne û dilê xwe de îzdîraba sefaleta li hawîrdorên xwe û berpirsîya xwe di vê xusûsê de his dikin, tim û daîm bi hawara çavenêrên çîka hîdayetê ve diçin..

Dîsa ew însanan wek emanetê Xuda qebûl dikin. Ew rûh û gîyanekî wilo qezenc dikin ku ew bi evîndarî û dilovanîyê ji hemû mexlûqatan nêzîk dibin. Ew hesta mes'ûlîyetê ku ji tuxmê merhemeta di dilên wan de zîğ dide, bi vî awayî wan ji nav ewamê mirovan û ji însanên jirêzê derdixe û wan dike rêwîyên wusleta ebedî. Ewên ku di nav ğeyreta wusletê de ji çîle û janan re ram bûne û xwe ji bo xizmet, teblîğ û îrşadê weqf kirine, bi vî awayî ew digihin vî karwanê heqîqetê û qelbên xwe ji bo ebedîyetê hilgirtine; ew ji bo **Hudayî**, **Yûnus** û mirovên evîndarên Heqîyê yên wekî wan dibin birayên rasteqîne..

❁

Wa‘de û peymaneke îlahî ye ku cenabê Heq Teala dê nûra xwe her temam bike û îslamîyet wê heta bi qiyametê berdewam bike. Lêbelê divê em ji bîra xwe dûrnexin ku wezîfa teblîğê keyfîyeteke wilo ye ku ji bo berdewamîya dîn wesîle û navgîn e. Ew dînê ku divê em bi awayekî mûnasib heqîqeta Xuda nas bikin û em bi îbadetên jê re jî xwe mûkerrem û mûşerref bikin. Lewra sersebebê hebûna kaînatê ev e ku heqîqeta Xuda bi awayekî çak were zanîn û îbadet jê re were edakirin.

Heke di zeman û mekanekî de were dîtin ku wa ye heyata dînî zeîf û lawaz bûye û însan şeqitîne, çûne ser macerayeke şaş, li wir failîyeta teblîğê di piştî îmanê de wek peywir û erkeke pêşîn û giringtirîn xuya dibe. Heta mirov di xusûsa teblîğkirina heqî û xêrê de destkeftinekê bidestnexin, hingê gellek îş û karên meşrû û rewa jî, meşrûîyeta wan berze û winda dibe. Mesela dêyeke ku şîr bide zarokê xwe yê di wextê şîrmêhtinê de çi qeder failîyeteke mûezzez û mûbarek e.. Feqet dêyeke ku dibîne wa ye agir bi mala wê ketiye û ew dişewite, heke ew di wê rewşê de jî li ser şîrdana zarokê xwe berdewam be, ew mes’ûl û berpirs dibe. Lewra kirina tiştekî li hemberî şewatê di wê an û midetê de ji şîrdana zarokê wê bi ehemmîyet û acîltir e. Ha di plana temsîla dîn de jî di zemanekî ku ew meğlûb be heta zumre û cemaetek nebe ku heqî û xêrê vebêje û teblîğê bike, meşğûlîyeta bi karên din ve, webalê wê ji yên zemanên din mezintir û girantir e.

Divê em vê jî ji bîr nekin ku ev nîmeta îslamê ji berî 1400 salan ve bi hezar û yek çîle û janan hatiye û gihaye me. Divê em jî karibin bi heman hessasîyetê vî emanetî ji bo nifşên piştî xwe biguhêzin û bigihînin wan. Di vê xusûsê de zemanê me zemanekî wilo ye ku ji bo ğalib-bûna heqî û xêrê, ğeyret û cehdeke bi awayekî fedakarane lazim dike. Di esasê xwe de ev heqîqeteke mentiqî ye. Lewra dema çerx û tekerê erebeyekê bikeve herîyê ked û emekê mirovê ku wê tehf dide, bi ked û emekê wî mirovê

ku dema erebe li ser rêya rast be rabe wê tehf bide re nayê mûqayesekirin. Li vir hûrîtî û tenikîtîyeke din jî heye. Ew jî ev e ku ereba tê tehfdan ji bo tekerê wê ji herîyê xilas bibin di demeke hessasa ku îhtiyac bi qasî qeweta zendê zarokekê hebe, ew failîyeta biçûçika mil-danê ehemmîyeteke mezintir erz dike. Li hemberî vê, curm û gunehê wî kesê ku di wî zemanê nazik de li kenarê radiweste, lê seyr dike û wezîfa xwe nake jî, girantir e. Di roja me ya îroyîn de ku îman zeîf bûye, xort û ciwan bi ber gellek bizav û herekên menfî û neyênî ketine, însanîyet bi pirranî ji hêz û qewetê re ram bûye û di sulteya nefsê de dijî, hingê divê em bi nezaketa zemanê xwe tevbigerin û bihizirin ku di rewşeke wiha kambax de ji bo ğeyret û cehdeke hindik sewabeke mezin û ji bo ğemsarî û îhmaleke hindik jî webalekî mezin tertîb dibe.

❀

Di xizmeta dîn, îman, welat û millet de mûweffeq bûn, helbet ji bo her mirovekî şadmanî û bextiyarîyeke mezin e. Feqet mesela eslî di wezîfa teblîğê de, ne mûweffeqîyet, yan jî meğlûbîyet e. Ya mûhîm, bi umîda gihiştina rizamendîya Xuda bi qasî taqeta xwe di vê rê de ğeyret nîşandan e.. Serîlêdana li sebebên pêwîst û paşê jî hêvîkirina ku teblîğa hatî kirin, ewê netîceyên mûsbet bide. Lêbelê dema ew tehqîq nebe jî hêvîya xwe windakirin, ketina keder û mitalan û xwe kerixandin û perixandin ne rast e. Lewra hîdayet di destê Xuda de ye, her ew e, yê ku hîdayetê dide mirovan. Naxwe tişta ku dikeve ser milê însên ev e ku çavtirs nebe, dest ji dozê bernede, hêvîya xwe winda neke, xwe bi dest rexawet û rehetîyê ve bernede, li ser teblîğê berdewam bibe, encama wê jî li hêvîya Xuda bihêle û xwe bispêre wî. Çawa ku mezinê me **pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin], ewê ku hatibû şandin ji bo ji alemê re bibe rehm, dema wî bi dereceyeke zêde xwe dida zehmetîyê ji bo karibe "însanekî ji êgir xilas bike" Xuda ev îxtarname û pêşe-agahî jê re şandine:

“**Ji ber ku ew îmanê nayênin tu dikî xwe bikujî! Heke em bixwazin, emê ji wan re ji asîmanî mucîzeyekê bînin, vêca misoger ewê jê re stûxwar jî bibin**.”[181]

“[Resûlê min!] **Bi rastî tu nikarî yê ku jê hez bikî, bînî ser hîdayetê, lêbelê; Xuda kê bivê, wî tîne ser hîdayetê û ew çêtir dizane dê kî bigihîn hîdayetê.**”[182]

Ji ber vê, divê jibîr nebe ku heke teblîğ ji terefê mûxateban ve qebûlê nebîne jî, ji hindikahî ve ewê leza xirabîyê sist bike, belkû di mideta dirêj de ewê feyda bide û ji bo çaksazî û îslahê bibe wesîle. Ji bilî vê jî divê teblîğkar, heke ti netîcekekê bidestnexe jî, ew ji berpirsîya vê mûkellefîyet û binbarîyê xilas dibe. Lewra însan ji wê mûcadela ku di rêya Xuda de beşdar bûbe û qezenc nekiribe, mes’ûl nabe; lêbelê bêşiwar e ku heke însan karibe di mûcadelê de beşdar bibe û ğeyretê nîşan bide, hingê ewê ji wê beşdar nebûna xwe û ji ğeyret nîşan nedana xwe mes’ûl û berpirs bibe.. Tişta ku di mîzana îlahî de were nirxandin jî ev e, gelo di vê xusûsê de tişta ketî ser stûyê me, me ew kiriye, bicih anîye, yan jî nekiriye, bicih neanîye?

Çawa hinek zemanên wilo çêbûne ku pêğemberek hatiye, qelebaliğ û elêlatên mezin li pey wî çûne û bi wî gihane hîdayetê; dîsa zemanên wilo çêbûne ku pêğemberek hatiye, lêbelê tecellîyatên hîdayetê ji bo cemaeteke hindik bûye nesîb. Yanî hîdayet ji cem Xuda ye. Lêbelê di serî de pêğember û hemû ummet mecbûr e, îslamê bijî û wê ji mirovan re jî teblîğ bike.

**Welhasil;** zerûrî ye ku mirov ji zaro û malbata xwe dest bi teblîğê bike û ew ji bo mislimanî bibi tebîetê eslî yê wî. Her mûmîn, divê di her hal û karî de ji bo teblîğê rêya mûmkin lêkolîn

---

181. Şûera, 26/3-4
182. Qeses, 28/56

bike, bi qasî hêz û qeweta xwe, asta zanîn û kultura xwe, gihan û kemala qelbîya xwe û meqamê civakî yê xwe, bi qasî wezîfa ku dikeve ser milê wî, ew ji bicihanîna erk û peywira dawetê û ji ğeyretkirin û hewldana ji bo şîyarkirin û hestdarkirina mirovan berpirs û mes’ûl e.. Lewra wekî ku di Qur’ana Pîroz de hatiye beyankirin, cenabê Heq Teala ji taqeta evdên xwe bêhtir tiştek ji wan nexwestiye. Lêbelê wî, bi qasî qewet û taqeta wan ew ji bicihanîna wezîfên xwe berpirs û mes’ûl girtine.

❁

Di mijara bangdana ji bo heqî û xêrê de bilindtirîn û mûmtaztirîn nimûne, bêşiwar pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye; di piştî wî de jî ehlûllah in ku ew jî malpêma û warisên wê heybera bilind in. Her hal û rewşa wan di xwe de sipehîtî, ciwanî, ziravî, tenikî, nezaket, kûratî û bilindahîyeke cihêwaz îhtîwa dike, di xwe de digre.. Çawa ku yek ji van evdên xas ê ku em ji bo îrşada wî bûne mezher, **Mûsa Efendî** -quddîse sirrûh-ye. Emr û temenê wî ji xesletên mîsal û nimûneyî lebaleb û tije bûne. Wî bi her wesîle û navgînê îşaret û îrşadên xwe ji me re şanî dane da ku berê me bide ser heqî û xêrê..

Mûsa Efendî -quddîse sirrûh- di wê nexweşîya xwe ya ku bi wefata wî bi encam bûyî de jî bi îştiyaq û hesret digot: “*Ax, xwezî qeweta min hebûya, ez bajar bi bajar û qeza bi qeza bigerama, min ğeyret bikira ji bo ez ji tengasîyên maddî û manewî yên birayê xwe re bibûma merhem!...*”

Lewra wî, ji bo xwe kiribû destûra mezintirîn ku ew, heyata xwe ya bedenî, malî-darayî û qelbî bi hesta evdînîyê bijî. Wî, bi qasî taqeta xwe, geh bi destê xwe, geh jî bi dilê xwe, wî her dilê birîndarê ku digihayê, heta hemû mexlûqat hemêz dikirin. Dema yekem cara ku derîyên Asya-ya Navîn hatin vekirin, emr û temenê wî zehf yextiyar bûbû û çûna wan welatan ji wî nedihat

hêvîkirin jî lêbelê; dîsa wî bi candarî, zindîtî û kelecan bazdabû, çûbû wirê. Li rexê din jî ew çûbû heta bi Afrîka-ya Başûr û Ewrûpayê jî, wî ğeyret kiribû û hewl dabû ku bi xwe re sipehî-tahîyên manewî, îctîmaî-civakî û qelbî-dilî bibe wan deveran..

Bi kurtasî wî, hemû heyata xwe bi hessasîyet û ğeyret jîyaye ji bo karibe bibe evdekî xwedî xesletên ciwan ên ku bûne mûsteheq ji bo wê medh û senaya ku li ser zimanê Heq Teala di Qur'ana Pîroz de hatiye gotin: "**Ew çi xweş bende bû!**" "نِعْمَ الْعَبْدُ"[183] Bi vî awayî, di vê qubbe û kûmbeta fanî de deng û sedayeke xweş maye ku ewê ebedî berdewam bibe. Li dûv wî, wefadarîyeke ciwan, sexaweteke sipehî, dilekî xweş, mûnacateke xweş, exlaqekî xweş û ji vî serî heta bi wî serî heyateke ji sipehî-tahîyan têr û tije û nimûneyî maye...

**Rebbê me, ji feyzên ulwî yên di dilê wî de îstîfadeyan ji bo me îhsan bike!**

**Rebbê me, nezaketa zemanê me, naxwe banga ji bo heqî û xêrê bi qasî ku li ser me tertîb bike, ji me re bexş bike, di hizûra îlahî de beraeta ji gunehan û xilasîyê ji bo me tevan bike nesîb!**

**Xudayê me! Ev dinyaya ku em têde rêwîyên ebedîyetê ne, dilên me ji ğefleta meyl dana wê mûhafeze bike. Dema em pêl axa di bin xwe de dikin hikmet û îrfana kûra ku emê jî rojekê bibin ax û bêne pêlê-kirin ji bo dilên me îhsan bike! Bila nûra îslamê xureka me, rûhanîyeta Mûhemmedî keş û hewaya teneffusa me, mehebbeta bilinda te û rizaya şerîfa te jî bihişta seadeta me be!**

**Amîn!..**

183. Li sûretê Sad, 37/30-44, binêrin.

# *Îsar*



*Merhemet, di dilê mislimanekî de agireke ku ew hîç namevire. Merhemet, li vê alemê bi qîmettirîn cewhera însanîyeta me ye ku bi rêya dil berê me dide ser rasta wusleta Heq Teala. Mûmînê dilovan; comerd, mûtewazî û ehlê xizmetê ye. Di eynî zemanî de ew doktorekî dil e ku di rûh û gîyanan de nîzam û heyatê fetrîm dike.*

# Îsar

**Ebdûllah kurê Cafer** -xuda jê razî be- di nav seyahetekê de, çû nav bexçekekî xurmeyan. Çakarê [xizmetkarê] bexçeyî koleyekî zencî bûye. Sê heb nan ji koleyî re anîbûn. Di vê navê de seyek hat. Kole, nanek ji wan avête ber wî seyî. Sê ew nan xwar. Wî nanekî din jê re avêt, wî ew jî xwar. Wî nanê sisêyan jî jê re avêt, wî ew jî xwar.

Li ser vê, axaftineke wiha di navbera Ebdûllah kurê Cafer -xuda jê razî be- û kole de çêbû:

"-Heqdesta te çend e?"

Koleyê zencî jê re got:

"-Wekî ku te dîtî ev sê nan in."

Wî jê re got:

"-Te çima hersê nan dane sê?"

Kole jê re got:

"-Li van deveran hîç se nebûn. Ev se ji devereke dûr hatiye. Dilê min xweş nebû ku ew birçî bisekine."

Ebdûllah -xuda jê razî be- jê re got:

"-Baş e, tu yê îro çi bixwî?"

Kole jê re got:

"-Ezê sebr bikim, min îro heqê xwe da vî mexlûqê Rebbê xwe."

Ebdûllah -xuda jê razî be- jê re got:

“-Subhanellah! Hê ji min re dibêjin, tu mirovekî zehf comerd î. Ev kole, ji min jî comerdtir e!”

Piştre wî ew kole û ew bexçe jî herdu kirrîn, ew kole azad kir û ew xurme jî bi xêra xwe dane wî.[184]

Îslamê şexsîyetên wiha şefqetmend, dilovan û hestkûr perwerde kirine, zekat jî ferz kiriye ji bo di nîzama civakî de xusûmet û hesûdîya di navbera feqîr û zengînî de ji holê rake, hevkêşîyê mûhafeze bike û hevhezî û mehebbetê jî temîn bike. Îslamê ji bo biratîyê di asteke pêşketîtir de bicih bike û ji bo her mûmînî bike “xwedî dilekî ğenî” ew înfaqa ku mecbûrîyeta wijdanî ye, teşwîq kiriye û ew bi “îsar”ê bi lûtke û zirwe kiriye. Lewra amanca eslîya dîn, di piştî dan tesdîqkirina yekbûna Xuda Teala de wî bi awayê perwerdekirina însanê baş, însanê zerîf û însanê hest-kûr, aramî, sikûnet li nav cemîyet û civakê hakim, serwer û zal kiriye.

Ev gihan û kamilbûn, ew e ku tu karibî îmkan û derfetên xwe bi dîgeran re parve bikî; lê ne ku tu hesta şefqet û dilovanîya ku di dil tenê de xuya dibe, bi wan re parve bikî. Belkû ew e ku tu heman derfetan wekî sipehîtirîn xuyahîyek ji xuyahîyên wê şefqetê û dîgerbînîyê bi dîgeran re parve bikî. Heta ku em karibin bigihîjin vê fezîlet û asta ku ji vê jî bi wêdetir e, heta ew bi ser vê jî dikeve; yanî heta mirov bigihîje wê helwesta camêrane ya ku bi “îsar”ê tê îfadekirin. **Îsar** ev e ku digel îhtiyaca mirov bi wan nîmet û derfetên xwe hebe jî, dîsa mirov wan nîmet û derfetên di dest xwe de ji bo temînkirina îhtîyacên mirovên din înfaq û seferber bike.

Merhemet, di dilê mislimanekî de agireke ku ew hîç namevire. Merhemet, li vê alemê bi qîmettirîn cewhera însanîyeta me ye ku bi rêya dil berê me dide ser rasta wusleta Heq Teala. Mûmînê

184. Kîmya’us-Seadet, rûp. 440

dilovan; comerd, mûtewazî û ehlê xizmetê ye. Di eynî zemanî de ew doktorekî dil e ku di rûh û gîyanan de nîzam û heyatê fetrîm dike. Dîsa mûmînê dilovan, dizane xizmeta xwe ya di her qad û meydanê de bi hezkirin û şefqetê bike, ew serkehnîya umîd û îmanê ye. Ew di sefa pêşîna her ğeyretê de dibe ku ew ji bo rûh û gîyanan hizûr û aramîyê bexş dike. Dîsa ew, bi peyva xwe, bi nivîsa xwe, bi halê xwe cihê xwe li cem her sefalet, çîle, jan û îzdîraban digre. Ew cihê xwe li ber serê derdmendan, jankêşan, bêxwedîyan û bêhêvîyan digre. Lewra di mûmînekî rasteqîne de yekem fêkîyê îmanê rehm û merhemet e. Exlaq û rewîştê însanîyetê jî bi Qur'anê hatiye temamkirin. Çawa ku dema em Qur'ana Kerîm vedikin, yekem sifetê îlahîyê ku derdikeve pêşberî me "Rehman" û "Rehîm" e. Rebbê me, zatê bilindê xwe wek "merhemetmendtirînê merhemetmendan" dide naskirin û ji evdê xwe re dibêje; exlaqê min ji xwe re bike exlaq. Naxwe mûmînekî ku dilê wî ji mehebbeta Heq Teala mişt û tije be, îcab dike ku ew hemû mexlûqatên Rebbê xwe bixe ber şefqet û merhemeta xwe û wan hemêz bike. Elametê hezkirina Rebb, bi mehebbet û merhemetê berê xwe dana mexlûqatên wî ye. Hezker, bi qasî hezkirina xwe ji hezkirîyê xwe di ber hezkirina wî de fedakarîkirinê wek zewq û wezîfekekê werdigre. Naxwe înfaq-kirina li ser mexlûqatên Xuda, mehebbet û hezkirina ji Xuda bi xwe ye.

Bi rastî hemû tiştên ku ji bo Xuda têne dayîn navê giştîyê wan sedeqe û înfaq e, ew jî gellek texlît û cureyên wan hene. Wekî me gotî zirweya van jî îsar e. Ev jî ew fezîlet û bêhnpakî ye ku mirov îhtiyacên dîgerên xwe li ser îhtiyacên xwe tercîh bike. Her mûmînê gihayî û kamil, bi wijdana xwe mûkellef û binbar e ku ew bi xwe, di deq û nuqteya bilindtirîn de ji bo dîgerbînî û hessasîyetê xuyageh û timsalek be. Çawa ku ji **Mûhemmed Hakimê Tirmizî** -quddîse sirrûh- pirs kirine, jê re gotine:

"-Dayîn çi ye?" Hezret di cewaba wê pirsê de wiha got:

“-Dayîn, bi keyfxweşîya dîgeran, hizûr dîtin e.”

Ketina nav keş û hewaya feyzdara îsarê, ew bes karê qelbên tenik û gîyanên zirav e. Lewra îsara eslî, bê tirsa ji feqîrtiyê dayîn e. Ev hal, di awayê sipehîtirîn û mûkemmeltirîn de di heyata pêğemberan û ehlûllah de hatiye şanîdan. Helbet xerca [înfaqa] her kesî wî ji bo zirweyeke wiha, bilind nake û wî nagihîne wan stêrên bilind. Li ser esasê heqîqeta ku em çi qeder karibin ji wan asoyan nêzîk bibin, emê nesîbên bihadar bidestxînin, di xusûsa îsarê de gaveke biçûktirîn jî ji bo me karekî ebedî yê jêneger e.

Li gorî rîwayeta **Ebûhûreyre** -xuda jê razî be- zilamek hate cem mezinê me **Hezretê pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin], jê re got:

“-Ya Resûlê Xuda! Ez birçî me.”

Mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji yekê ji xanimên xwe re xeber şand û jê xwest ew hinek tiştên xwarinê jê re bişîne. Lêbelê wê dêya mûmînan got:

“-Ez bi wî Xudayî sûnd dixwim ku tu, wek pêğember şandî, ji avê pê ve tiştek li malê nîn e!.”

Ji ber ku xanimên wî yên din jî di heman wezîyetê de bûn, **Hezretê pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] berê xwe da sehabîyên xwe, ji wan pirs kir, ji wan re got:

*“-Kî dixwaze îşev vî kesî li cem xwe bike mêhvan?”*

Mirovekî ji Ensarîyan jê re got:

“-Ya Resûlê Xuda! Bila ew mêhvanê min be.” Wî ev feqîr bi xwe re bire malê. Dema ew çû malê ji kulfeta xwe pirs kir:

“-Ti xwarinek li malê heye?” Kulfeta wî jê re got:

“-Na, bi qasî xwarina zarokên min tenê heye.” Sehabî jê re got:

“-Naxwe tu zarokan mijûl bike. Heke ew bixwazin werin ser sifrê, wan bi xew ve bibe. Dema mêhvan bikeve hundur jî lempê bimevirîne. Emê jî li ser sifrê wilo bikin her wekî ku xwarinê dixwin.”

Ew li ser sifrê rûniştin. Mêhvanî zikê xwe têr kir; ew û kulfeta xwe jî birçî razîyan.

Dema li wan bû sibeh, ew sehabî çû cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin]. Dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew dît, jê re wiha got:

“-*Ji bo îkrama ku we îşev ji mêhvanê xwe re kirî, Xuda Teala zêde zêde jê razî bûye.*”[185]

❁

**Hezretê Mehmûd Samî Remezanoğlû** ku yek ji dostên Heq Teala ye, digel ku tehsîla hiqûqê kiribû jî, ji tirsa ku dibe mafên mirovan bi ser wî de biçe, wî xwe bi vî pîşeyî ve meşğûl nekir, ji bo xwe tercîh kiribû ku ew li semta Texteqaleyê deftera mûhaseba kargehekê ji xwe re bigre. Hezret bi vapûrê derbas dibû, diçû Qarakoyê ji bo çûna kar. Ji Qarakoyê heta bi Texteqale’yê jî di şûna ku ew li mînîbûsê siwar bibe, ew bi peyatî birêve diçû û ji vê îhtiyaca xwe fedakarî dikir, wî heqdesta xwe ji bo mînîbûsê jî înfaq dikir. Ev exlaq û halê bilindê mezinan, ji bo me çi nimûneyeke xweşik e!

Bi rastî heke çendan bi fedakarîyeke biçûk be jî, bila her kes ji rehetî û konfora şexsîya xwe û ji xerckirinên mala xwe cangorî-

185. Buxarî, Menaqîb’ûl-Ensar, 10; Muslim, Eşrîbe, 172

tîyê bike û hewl bide ku bi qasî para gihabe wî, ew ji nesîbê xwe ji vî exlaqê bilind wergire.

**Îsar**, zirweya comerdîyê ye. Lewra comerdî, dana malê ji mirovî re ne lazim û ji îhtiyaca mirovî zêdetir e. Îsar jî, ew e ku digel îhtiyaca mirovî pê hebe jî dîsa ew ji îhtiyaca xwe fedakarîyê bike û îhtiyaca dîgerên xwe pê temîn bike. Mûkafata manewîya îsarê jî, bi qasî fedakarîya însên e. Cenabê Heq Teala medhê wan ensarîyên ku îmkanên xwe ji bo mûhacirên Mekkê dewr kiribûn û temînkirina îhtiyacên wan jî li ser îhtiyacên xwe tercîh kiribûn, wiha dide, dibêje:

“**...Çendî pêdiviya wan bi wî malî hebe jî, dîsa ew îhtiyaca wan li ser îhtiyaca xwe tercîh** [îsar] **dikin. Kî, nefsa xwe ji bexîltiya wê biparêze, ha ew, digihin xilasîyê**.”[186]

❀

Di cenga Yermûkê de sê mûcahidên birîndar hebûn, li ber mirinê bûn. Mislimanekî av ji wan re anîbû ji bo cuda cuda wê bide wan. Wî av ji kîjanî re anîbe, wî ew venedixwar û ji hevalên xwe re hewale dikir. Jê re digot; wê ji hevalê min re bibe, ew ji min tîtir e! Di encamê de berî wefata xwe av negiha yekî ji wan. Di nefesa dawîya wan her sêyan de jî av di dilê wan de bû hesret û ew wilo şehîd bûn.

Li gorî rîwayeta **Îbnû Ûmer** -xuda jê razî be- ji sehabîyekî re serê mêşinekê hatibû şandin. Wî zatî gotibû:

“-Filan kes ji min birçîtir e, wê ji wî re bibin.” Wî zatê din jî eynî tişt got. Bi vî awayî, serê mêşinê li ser heft kesan gerîya û paşê dîsa hate ji mirovê pêşî re. Lewra ew ji tevan birçîtir bû.[187]

186. Heşr, 59/9
187. Ğezalî, Îhyau Ûlûmûddîn, c. III, rûp. 571

Dîsa dema **Hezretê Ûmer** -xuda jê razî be- diçû Şamê, ji ber ku dora koleyê wî hatibû ji bo ew li hêştirê siwar bibe, digel ku ew gihabû ber derîyê bajêr jî, lêbelê wî bi israr dixwest koleyê wî li hêştirê siwar bibe û ew jî wilo bi peyatî biçe nav bajêr.. Ev helwesta Ûmer xuyahîyeke înfaqê ye ku ti kes nikare xwe bigihîne gwîzeka wî. Bi vê nêrînê înfaq, her wextî bi mal tenê çênabe. Helwestên wiha jî cure înfaqek in.

Bilindtirîn ast û pileya înfaqê jî îsar e. Îsar, ew bûyer e ku mirov ji xwe kêm dike û dide biradînê xwe. Ew keyfîyet û awayekî înfaqê yê di asta bala de ye ku ew cure înfaqa pêğember, sehabî, ewlîyaûllah û evdên salih e.

Ev rewşa **Hezretê Elî** -xuda zatê wi pak bike- û **Hezreta Fatima** -xuda jê razî be- heqîqeta îsarê çi xweş îfade dike:

Li gorî **Îbnû Ebbas** -xuda jê razî be- daye zanîn; **Hezretê Elî** û hevsera tahîre ya wî **Hezreta Fatima** -xuda ji wan razî be- ji ber ku zarokên wan **Hezretê Hesen** û **Hezretê Hûseyn** ji nexweşîyê şîfa bûbûn, wan sê rojan rojîya nezrê digirt. Wan roja pêşî ji bo fitara xwe xwarinek ji ardê cehî çêkiribû. Dema ew li ber fitarê bûn, yekî li derîyê wan da. Ewê ku hatî mirovekî birçî û feqîr bû. Malbata mûbarek, bi dilê xwe ji bo rizaya Xuda ew xwarina di dest xwe de ji bo wî feqîrî îkram kir û wan jî îftara xwe bi avê kir. Roja duduyan jî dema wextê fitarê hat, vê carê jî sêwîyek hatibû ber derîyê wan. Wan xwarina xwe ya wê rojê jî dane wî sêwîyî û dîsa îftara xwe bi avê kirin. Roja sisêyan jî di wexta îftarê de, êsîrek hatibû ber derîyê wan ji bo arîkarîyê ji wan bixwaze. Wan nimûneyeke mezina sebr û dîgerbînîyê şanî da û îftara xwe jî ji bo wî êsîrî bexş kir.

Ev comerdîya ku ti kes nişê bigihîje gwîzeka wê, tercîhkirina dîgeran li ser xwe û ev exlaqê bilind, bi ayeta pîroza ku hatibû şandin, ew ji bo te'yîd û tebrîka îlahî bûbû mezher û xuyageh.

Xuda Teala ferman dike, dibêje:

“**Ew, digel ku pêdiviya wan pê heye û jê hez dikin jî dîsa xwarinê didin xizan, sêwî û êsîran û ji wan re dibêjin: «Em bes ji bo rizamendîya Xuda xwarinê didin we; em ji we ti perûyekê û ti spasiyekê jî naxwazin. Em vê qencîyê dikin, lewra em ji Xudayê xwe ditirsin da ku ew me di rojeke dijwar û bi bela de ji tirs û ezabê xwe ewle bike.' Ha ji ber vê Xuda, wan ji ezabê neqenciya wê rojê diparêze, rûsipehîtî û dilşadiyê dide wan**.”[188]

Menzere û dîmeneke dina îsarê ji esrê seadetê jî ev e:

Di piştî Herba Bedrê de êsîr, du-du û sê-sê di navbera eshabê kîram de hatibûne teqsîmkirin û pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî ji wan re gotibû; qedr û qîmetê van êsîran rind bigrin û dilên wan xweş bikin.

Di wê wextê de birayê **Mûs‘eb** kurê **Ûmeyr Ebû Ûzeyr** jî di navbera wan êsîran de bû, ew dibêje:

“Ew mala Ensarî ya ku ez li dev wan êsîr bûm, dema wextê xwarinê dihat, wan bi xurmeyan îdare dikir û nan û pêxwarina xwe jî didane min. Min ji vê wezîyetê şerm dikir û min ew xwarin li wan teklîf dikir. Lêbelê wan ew qebûl nedikir. Lewra Resûlê Xuda ferman li wan kiribû; *rind li êsîran meyzînin!*”[189]

❁

Hîç ti mexlûqek, dikare di sexawet, înfaq û îsarê de bi Resûlê Ekrem -dirûd û silavên xuda lê bin- re were qîyaskirin. Ew, di her cureya comerdîyê de di asta bilinda wê de bû.

188. Însan, 76/8-11

189. Mehmûd Samî Remezanoğlû, Bedr Gazvesi, rûp. 93

Di rêya Xuda de, xesletên wekî eşkerekirina dînê wî, berê mirovan dana ser îstîqameta rêya rast û durust, têrkirina birçîyan, şîretkirina li cahilan, temînkirina pêwîstîyên hewcedaran û tehemmulkirina êş û ezîyeta wan, îlm, mal û comerdîya nefsê tev di wî de hebûn..

**Sefwan kurê Umeyye** ku yek ji ekabirên [giregir û mezinên] mûşrikên Qureyşîyan bûye, digel ku ew ne misliman bûye jî, lê di ğezwên Hûneyn û Taîfê de, wî cihê xwe li cem mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] girtibû.

Dema mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li nav malên ğenîmê yên ku ji Cî'ranê hatibûne komkirin de digerîya, dîtibû ku wa ye Sefwan bi heyran û dilbijênî li wan dimeyzîne, vêca jê pirs kiribû û jê re gotibû:

"-*Ma ew zehf li xweşîya te çûn?*" Dema cewaba

"-Erê." jê wergirt, jê re gotibû:

"-*Raje wan, bila ew tev ji te re bin!*"

Li hemberî vê helwesta wî Sefwan xwe hew girt û got:

"-Ji qelbê pêğember pê ve qelbekî din nikare di vê derecê de comerd be." Bi vî awayî wî şehda xwe anî û bi îmanê şerefmend bûye."[190]

Bi rastî jî îsar, îkrama mûhteşemtirîn e. Divê were hizirîn ku bi wesîleya îkrama wiha ya Resûlûllah, sehabe û evdên salih çendîn însanên ku di kufrê de înad dikirin hatine însafê, çendîn dijmin bûne dost, hatine ser hîdayetê û çendîn mûmîn hezkirina wan ji biradînên wan zêde bûye.

190. Waqidî, Meğazî, II, 854-855

Resûlê Xuda hîç ti zemanekî telebeke ku jê hatibe xwestin û wî karîbe wê bike bi şûn de venegerand. Carekê not hezar dirhem li para wî ketibûn. Wî ew rijand ser hesîrekê. Kîjan mûhtac dihate cemê wî ew her li wan înfaq dikir heta ku wî ew tev xilas kir.

❁

**Birr**

Di Qur'ana Pîroz de bi navê "**Birr**"ê tê îfadekirin. Birr ew fezîlet e ku "mirov ji wî malê xwe yê ku jê hez dike înfaq bike" ew jî eynî wekî îsarê, di asteke bilind de keyfîyet û awayekî înfaqê ye.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hemû fezîletê exlaqî de nimûneyeke îdeal e, hîç şubhe nîn e ku ew di vê xusûsê de şexsîyeteke zirweyî ye ku ti kes nikare xwe bigihîne gwîzeka wî. Nimûneyek ji hessasîyeta wî di xusûsa ku wî di tişteke biçûçik de jî îhtiyaca birayê mûmînê xwe li ser îhtiyaca xwe tercîh dikir, wiha ye:

Rojekê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji dara mîswakê du mîswak çêkirin. Mîswakek ji wan xwehr bû, mîswaka din jî rast û sipehî bû. Mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew mîswaka rast û sipehî da wî sehabîyê li cem xwe û ewa xwehr jî ji bo xwe hişt. Çi dema wî sehabî jê re got;

"-Ya Resûlellah! Ev mîswaka sipehî li te tê." Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got:

"*Heke mirovekî saeteke tenê jî bi kesekî re hevaltî kiribe, ji wî tê pirskirin ka wî heqê hevaltîyê anîye cih, yan jî neanîye cih.*" Jê re da zanîn ku ev heq jî bi têgihiştina îsar û birrê, yanî bi

tercîhkirina îhtiyaca birayê xwe yê misliman li ser îhtiyaca xwe û bi înfaqkirina malê xwe yê ku mirov jê hez dike, tê edakirin.[191]

Ev qisseya li jêrê jî ji bo fezîleta înfaqeke di vê keyfîyetê de çi nimûneyeke sipehî ye:

Rojekê eshabê kîram, li **Mescida Nebewî** kom bûbûn û li sohbeta feyzdara Resûlûllah guhdarî dikirin. Mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ev ayeta ha xwend:

لَنْ تَنَالُوا الْبِرَّ حَتَّى تُنْفِقُوا مِمَّا تُحِبُّونَ
وَمَا تُنْفِقُوا مِنْ شَيْءٍ فَإِنَّ اللَّهَ بِهِ عَلِيمٌ.

“**Hûnê negihîjin birrê [xêra qenctirîn] heta hûn ji malê xwe yê ku jê hez dikin înfaq nekin! Hûn çi jî înfaq bikin, bêguman Xuda, her pê zana ye**.”[192]

Eshabê kîram di wecdeke kûr de li Resûlûllah guhdarî dikirin, wan ev ayeta pîroz di kûrahîya dinyaya derûnîya xwe de his dikir û wan xwe di mûhtewa û naveroka vê dawet û bangewazîya nebewî de noq kiribû, û ew ji bo înfaqkirina hemû tiştên di dest xwe de ketibûne mûhasebê.. Hate dîtin ku ji nişka ve sehabîyek rabû ser xwe. Ev sehabîyê mûbarekê ku di rûyê wî de nûra îlahî diberiqand **Ebûtelhe** -xuda jê razî be- bû. Li nêzîkî mizgefta seadetê bexçekekî bi qîmetê Ebûtelhe hebû, di navê de şeş sed darxurme hebûn û wî zehf ji vî bexçeyî hez dikir. Wî gellek caran pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gazî dikir, jê re îkram dikir û pê bereket dixist bexçê xwe.

Ebûtelhe -xuda jê razî be- wiha got:

191. Ğezalî, Îhyaû Ûlûmûddîn, c. II, rûp. 435
192. Alî Îmran, 3/92

"-Ya Resûlellah! Li dev min bi qîmettirîn û hezkirîtirîn serweta min bexçê min ê bi navê **Beyrûha** ye ku ew li nav vî bajarî ye. Ji vêga û pê de ez wî didim Xuda û Resûlê wî. Ez hêvîdar im ku ji bo vê Rebbê min min bigihîne birrê [xêra qenctirîn] û wî ji bo min bike zadê axretê. Ya Resûlellah! Vî bexçeyî di îstîqameta ku Xuda bi te bide dîtin de serf bike."[193]

Ha ev exlaqê hemîde yê ku ev fedakarî bi Ebûtelhe daye kirin, heke ew koka xwe di rûhê mirovan de tam berde, hingê ew xweşikahîya ku derkeve holê, heke ew di nav însanîyetê de rewacê bibîne, hîç ne zor e ku mirov texmîn bike ka wê li dinyayê keş û hewayeke çawa ya esrê seadetê pêkwere.

❀

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew kesê ku hîç tişteke wî nebû jî ji bo înfaqê teşwîq dikir. Mesela **Ebûzer**, digel ku ji navbera eshabê kîram sehabîyê feqîrtirîn bû jî, Resûlê Ekrem ew jî ji bo înfaqê bang dikir û jê re wiha digot:

"-*Ya Ebûzer! Dema tu şorbê çêkî, ava wê zêde bike û hesabê cîranê xwe jî bike!*"[194]

Divê mûmîn, wekî mehtava şeveke reştarî bi nûr, hest-kûr, hessas, reqîq, dîgerbîn, comerd, dilovan, xwedî-şefqet û ji heyecana înfaqê têr û tije be.

Di roja me ya îroyîn de jî bi qasî derfet û îmkanan îhtiyac bi seferberîyeke ciddî ya înfaq û îsarê heye. Divê em ji bîr nekin ku dibû em jî di şûna însanên jandar û hewcedar de bûne. Bi vê sedemê, înfaq û îsara me li ser nexweş, jandar, ğerîb, bêkes, hewcedar û birçîyan, li hemberî Rebbê me deynê me yê şukrê ye. Bila em derfet û nîmetên di dest xwe de bi hewcedaran re parve

193. Li Buxarî, Wesaya, 17'an binêrin.

194. Muslim, Birr, 142

bikin da ku ev dilên me ew memnûn û mesrûr kirine, li dinyayê rûhanîyeta me, li axretê îmdada me û li cennetê jî seadeta me bin.

**Ya Rebbî! Bila hemû xuyahîyên dilovanî û merhemeta te, xezîneya nexilasa heyata dilê me be! Rebbê me! Heyata tije îsara mezinê aleman û mezinên îslamê yên ku li pey rêç û şopa wî çûne, ji bo me jî bike nesîb!**

**Amîn!**

# Îstiğna



*Îstiğna, wesfekî qelbî yê salih û sadiqa ye ku xilasbûna ji nasnameya xam û gihiştina kemalê ye. Bi zengînîya dil, qenaet-anîna bi malê di dest xwe de û tenezzul-nekirina ji bo malê zêdetir e. Bi mûcibê hedîsa şerîfa ku dibêje: "Qenaet, xezînekeke bêdawî û xilasneber e." qelb ji hêla maneyê ve zengîn dibe û digihîje aramîyê.*

# Îstiğna

Dema eshabê kîram her tiştê xwe li Mekkê hiştin û ji bo Medînê hicret kirin, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di navbera **Ebdûrrehman bin Ewf** ê mûhacir û **Se‘d bin Reb‘î** -xuda ji wan razî be- yê ensarî de biratî saz kiribû. Se‘d bin Reb‘î, ji Ebdûrrehman bin Ewf re gotibû:

“Ez bi malê xwe zengînê ensarîya me. Min nîvê malê xwe ji te re veqetandiye. Ha va ye malê min ji te re, kerem bike.”

Ebdûrreham bin Ewf -xuda jê razî be- bi tewr û helwesteke ji van tevan mûsteğnî jê re got:

“-Birayê min, Xuda malê te û îmkanên te ji te re bi xêr û mûbarek bike. Îhtiyaca min bi van nîn e. Tu rêya çarçîyê ji min re şanî bide, kafî ye...”

Ebdûrrehman bin Ewf -xuda jê razî be- çû çarçîyê û dest bi ticaretê kir. Hê mideheke dirêj bi ser de neçûyî wî qezenceke zehf bidestxist û ew kete nav zumreya **eğnîyayê şakirîn** [zengînên şukrdar].

Di vê navberê de sal û zeman bûrîn û mûmînan serdema mûezzem û bi qeweta îslamê îdrak kir. Rojekê di wextê îftarê de, dema kurê wî çend texlît xwarin li ber Ebdûrreham bin Ewf danîn, ew ji vê destferehîyê wek ğemgîn jê re wiha got:

“-Dema **Mûs‘eb bin Ûmeyr** -xuda jê razî be- şehîd bû, kefenek peyda nebû ji bo em cesedê wî pê binixumînin. Kefenê ku me ew xistibû navê kurt bû; dema me serê wî pê dinixumand pêyê wî rût, dema me pêyê wî pê dinixumand serê wî vekirî dima. Di dawîyê de me kefenê wî kişand ser serê wî û me lingên wî jî bi giyayekî bêhnxweş nixumandin! Dema **Hezretê Hemza**

-xuda jê razî be- jî şehîd bûbû, me ew bi xirqeyeke kevna ku jinên yextiyar li xwe dikir, nixumandibû.

Lê cenabê Heq Teala li dinyayê ev qeder nîmetan dide min gelo ewê li uqbayê para min kêm bike? Gelo ez heqê xwe yê axretê li dinyayê xilas dikim? Gelo sibê li hizûra Xuda, ezê hesabê van nîmetan çawa bidim?!" û bi çavên hêstirbarên wî sifre terk kir û rabû ser xwe.

Her wiha rewşa zuhd û îstiğnayê li cem mezinên mislimanan çi sipehî bû; wan di rêya Heq Teala de bi qelbê xwe evdînîyeke baş nîşan daye û ew, exlaq û têkilîya wan li hemberî dinyayê jî dide xuyakirin. Lewra **zuhd,** di alema wan de hezkirina ji Xuda û tirsa ji wî tenê hebû, ji bilî wî, her tiştê din qîmetê xwe jidest dida û di dil de jî ti nirxek îfade nedikir; **îstiğna** jî wek asta jj zuhdê bi wêdetir, di qelb de dihate jîyandin.

Bi vê nêrînê îstiğna, wesfekî qelbî yê salih û sadiqa ye ku xilasbûna ji nasnameya xam û gihiştina kemalê ye. Bi zengînîya dil, qenaet-anîna bi malê di dest xwe de û tenezzul-nekirina ji bo malê zêdetir û ji bo malê di dest dîgeran de ye.

Dîsa îstiğna;

Bi mûcibê hedîsa şerîfa ku dibêje: "*Qenaet, xezînekeke bêdawî û xilasneber e.*"[195] di netîca nêzîkbûna qelb ji Heq Teala de, ji hêla maneyê ve qelb zengîn dibe û digihîje aramîyê. Lewra qelbê ku bi qenaetê zengîn dibe, ji fikar û tirsên dinyayî rizgar dibe. Rûh bêdawîtîyê îdrak dike û bi vî awayî cazîbe û surdarîya çêjên fanî, di mûmînî de emrê xwe xilas dike.

195. Deylemî, Mûsned, 4699

Heyata dostên Heq Teala ku ev rewş bi mûkemmelîyeteke ciwantirîn jîyane û bi qelbê xwe jî bûne zirwe, ji bo nimûneyên îstiğnayê têr û tije ye:

Di zemanê xelîfetîya **Hezretê Ûmer** -xuda jê razî be- de welatên wekî Sûrîye, Filîstîn û Misrê hatin fetihkirin û axa Îranê jî ji vî serî heta bi wî serî ket nav sînorên dewleta Îslamê. Xezîne û gencîneyên zengînên Bîzans û Îranê bi ser Medîna Mûnewwer ve şeqitîn, herikîn û hatin ku ew dem, ew navenda alema îslamê bû. Sewîya refaha mûmînan zêde bû. Lêbelê xelîfê mûmînan Hezretê Ûmer -xuda jê razî be- ew di zirweya dilekî pak de li hemberî vê sewîya refahê mûsteğnî ma, digel îhtîşam û mezinbûna dewletê û zengînbûna beytû'l-malê jî dîsa wî bi cilên pînekirî xutbe dixwend. Ew carina deyndar dibû, heyata xwe di nav tengasî û derdan de dida dewamkirin. Lewra wî, ji xezînê terxanek û texsîsateke bi qasî miqdarê kîfayet û têrêkirinê tercîh dikir û wî bi vî miqdarî jî zehmet derbas dikir.

Giregirên sehabîyan li hemberî vê rewşa wî hew xwe girtin û bîr birin ku meaş û nefeqê xelîfe zêde bikin. Lêbelê ji ber ku wan cesaret nedikir vê teklîfê jê re bibin. Ji lewma wan ev teklîfa xwe li keça Hezretê Ûmer **Hezreta Hefsa** -xuda jê razî be- erz kir ku ew di heman demê de jî hevsera pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bû. Wan jê xwest ku ew navê wan jê re eşkere neke û vê pêşnîyaza wan li bavê xwe erz bike. Hefsa -xuda jê razî be- ev pêşnîyaza sehabîyan ji bavê xwe re eşkere kir. Hezretê Ûmer -xuda jê razî be- gellek caran bi çavê serê xwe bûbû şahid ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] zehf rojan ji sibehê heta êvarê birçî dima û ji bo zikê xwe pê têr bike jî xurmekeke tenê jî bi dest wî nediket. Ji lewma Hezretê

Ûmer -xuda jê razî be- [196]ji keça xwe Hefsa -xuda jê razî be- pirs kir, jê re got:

“-Keça min! Xwarin, vexwarin û lixwe-kirina Resûlûllah çawa bûye?” Dema wê jê re got:

“-Bi qasî miqdarê kîfayetê [bes bi qasî miqdarê têrê-kirinê] bû.” Hezretê Ûmer jê re wiha got:

“-Herdu hevdost [Hezretê Pêğember û Ebûbekr] û ez, dişibihin sê rêwîyên ku bi eynî rêyê ve diçin. Yekemê me [Hezretê Pêğember] giha meqamê xwe. Yê din [Ebûbekr] bi eynî rêyê ve çû û gihişt rêwîyê yekem. Ez wek rêwîyê sisêyan jî dixwazim bigihîjim hevalên xwe. Heke ez bi barekî zêdetir herim, ez nagihim wan! Yan jî ma tu naxwazî ku ez di vê rêyê de bibim yê sisêyan?”[197]

Bêşiwar ev helwesta Hezretê Ûmer -xuda jê razî be-, berhema hesteke bilinda qelbî bûye. Ew Hezretê Ûmer -xuda jê razî be- ê ku bi awayekî fiêlî heq û hiqûq dijîya û edalet li alemê bicih dikir, menqîbeyên wî yên bêjimarên fezîletê ji nimûneyên bijarte ne, ku ew di talîm û perwerdeya manewî de mîsal û mînak werin girtin.

Bi rastî însan, sen‘etkar û dahîyan teqdîr dikin. Lêbelê reftar û bizavên şexsî yên wan teqlîd nakin. Ewên ku têne teqlîdkirin jî şexsîyetên rewîşt sağlem, weqûr û mûsteğnî ne. Lêbelê şexsîyetên wiha bala û zirwe di piştî heyata wan de jî wek pêşangeheke îbretê ji bo ummetê û wek talîmeke fezîletê têne guhastin û neqilkirin.

196. Li Muslim, Zuhd, 36’an binêrin.
197. Ehmed Hilmî Şehbenderzade, Tarîh-î Îslam, c. I, rûp. 367.

Eshabê kîram ji şexsîyeta pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re heyran diman û li pey rêç û şopa wî diçûn. Wê nûra hebûnê jî tim ji wan re wiha digot:

"*Xwezîya me bi wî kesî be ku gihabe Îslamê û bi rizqekî ku têra wî dike, kîfayet bike!*"[198] wan jî îdrak dikir ku heta ew vê terza nêrîna wî li dinyayê di jîyana xwe de nekin hakim û serwer ewê negihîjin vî karwanê ulwî. Ji ber ku ew bi terbîya nebewî hatibûne perwerdekirin, ew bûne însanên wilo rêber û rêzan ku ji bo ummetê pîvan û endaza fezîletê şanî dane. Dîsa wan ev fezîlet li însanîyetê daye hînkirin: Digel ku yek ji wan hewcedar bû jî lê dema wî bira-dînekî xwe yê hewcedarê din didît, wî ji nefsa xwe ferağet dikir û birayê xwe ji bo wê nîmetê layiqtir û lipêştir didît û îmkanê xwe ji wî re dewr dikirin..

Çawa ku dêya me **Hezreta Aîşe** -xuda jê razî be- ferman dike, wiha dibêje:

"Me ti caran li mala Resûlûllah heta têr bibin, nedixwar. Heke me bixwesta, me dikarîbû têr bixwe. Lêbelê Hezretê Mûhemmed -dirûd û silavên xuda lê bin- îsar dikir, ummeta xwe li ser xwe tercîh dikir."[199]

**Hezretê Cabir** -xuda jê razî be- jî di berîya cenga Xendekê de, ew bîranîneke xwe ya di wî zemanê zor de ku wan ew xendekên mezin dikolan de wiha vedibêje:

"Dema me xendek dikola em li zinarekî zehf dijwar rast hatin. Dema sehabî hatin rewş ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re erz kirin, Resûlê Ekrem bizzat xwe berda nav xendekê, dema wî rahişt tevr û daket navê ji bo bikole, ew zinarê dijwar her wekî sêlhê [qûm] belav bû. Dema ev mûcîze

198. Tirmizî, Zuhd, 35

199. Li Beyheqî, Şûeb, III, 61/1396'an binêrin

xuya bû me dît ku wa ye, Resûlê Xuda ji nêza [birçîbûnî] kevir bi ser zikê xwe ve girêdaye. Lewra sê rojên ku em li wir mabûn me hîç tiştek nexwaribû. Vêca min jê re got:

"-Ya Resûlellah! Destûra min bide, ezê heta bi malê biçim." Wî destûr da min. Ez çûme malê û min ji hevsera xwe re got:

"-Ez nikarim xwe li hemberî rewşa Resûlê Ekrem bigrim. Ma tiştekî xwarinê li malê nîn e." Hevsera min got:

"-Biçek ceh û kehrek heye."

Min ew kehr serjêkir û hevsera min jî ew ceh hêrd û kir nan. Me goşt jî xist beroşê. Dema nan li ber pehtinê bû û beroş jî li ser tifikê dikelîya, ez çûme cem mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], min rica jê kir û jê re got:

"-Biçek xwarina me heye. Tu digel kesek -du kesan kerem bikin, werin ser xwarinê."

Mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] pirs ji min kir, ji min re got:

*"-Çi qeder xwarina we heye?"* Min jî tiştê ku hebû, jê re got.

Wî ji min re got:

*"-Hem zehf e, hem jî baş e! Tenbîhê li malbata xwe bike, jê re bibêje; heta ez werim, bila ew beroşê ji ser tifikê nedeyne xwarê û bila nan jî ji firnê dernexe!"* Wî ji sehabîyên xwe re jî got: *"Rabin ser xwe, em herin!"* Mûhacir û ensarî tev bi hev re rabûn ser xwe.

Vêca ez jî hatim ji bo xeberê bidim malbata xwe [di wê anê de bi endîşeya ku xwarin hindik e û ewê têra wan neke, ez şaşo-maşo bûm, min nizanîbû ez çi bikim] min ji hevsera xwe re got:

“-Ha va ye pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], mûhacir, ensarî û hinek mirov dîtir ku gihane wan, tev tên mala me.”

Hevsera min ji min re got:

“-Ma pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji te pirs nekir ka hazirîya me çi qeder e?”

Min jê re got:

“Erê wî ji min pirs kir.”

Wê ji min re got:

“-Naxwe rehet be, ğem nake.”

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji mêhvanên hatî re digot:

*“-Herin hundur û cih li hev teng nekin.”* Wî bi destê xwe nan qet dikir, goşt li serê didanî û ava goşt jî bi ser de dirijand. Di dawîyê de sehabîyan tevan jê têr xwar. Tebabek xwarin jî hê ji ber wan ma. Resûlûllah bi hevsera min re axivî û jê re wiha got:

“-*Vê bixwe û ji cîranê xwe re jî îkram bike. Lewra birçîbûnîyê her der daye ber xwe*.”[200]

Wekî ku di vê hedîsa şerîf de jî hatiye îfadekirin, Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û çend hevalên wî ji bo xwarinê hatibûne bang-kirin, lêbelê dilê wî bi vê rewşê razî nebû, wî hevalên xwe yên din jî bi xwe re anîn. Bi vî awayî dilê xwe yê ji rehm û şefqetê tije, sifetê xwe yê îsar û dîgerbînîyê şanî da û sirrê *“ummetî, ummetî [ez ummeta xwe divêm, ez ummeta xwe divêm] tezahur û xuya kiriye..”* Ji bilî vê jî dema ew gihane mala banga ji bo zîyafetê, helbet digel ku hemû sehabîyên wî

200. Îmam Newewî, Hedîslerle îslam rûp. 363

arzû dikirin ku ew pêşî xwarinê bixwe, lêbelê Resûlûllah xwarin pêşî ji bo sehabîyên xwe îkram kir û wî bi wan re têr xwarin xwar, ji vê jî bi wêdetir wî xizmet ji bo wan dikir û piştî hemû sehabîyên wî têr xwarin, ji xelkê malê xwest ku ew vê xwarina ji ber wan mayî li ser cîranan belav bikin, yek ji wan tezahur û xuyahîyên bêjimarên merhemet û şefqeta fereha di dilên wî de ye ku di vê xusûsê de ti kes nikare xwe bigihîne gwîzeka wî.. Em jî bi ber vê şefqet û dilovanîya wî dikevin û jê re dibêjin; "şefaet ya Resûlellah!" [Em şefaet û mehdera te dixwazin, ya pêğemberê Xuda!]

Ew mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] yê ku hatibû şandin ji bo ji aleman re bibe rehm, wî bi wê heyata zuhd û teqwaya xwe ya ku dijîya, wekî ku di desttengîyê de wilo bû, wî di destferehîyê de jî bi malê hindik qenaeta xwe dianî.. Wî xwe her diavêt ber penaha Xuda û wiha digot:

*"Xudayê min! Zadê binemala Mûhemmed bi miqdarekî kîfaf [bi qasî têr-kirinê] bike."*[201]

Dîsa li gorî vegotina Hezreta Aîşe -xuda jê razî be- jineke ensarî hatibû serdana wê, çi dema wê doşeka Resûlûllah dîtibû ku wa ye şilteyeke [binraxeke] lihev-tewandî ye, ew bilez çûbû mala xwe û doşekeke şilta wê ji hirîyê tije-kirî jê re anîbû. Dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dît ku wa ye doşeka wî guherîye, wî da zanîn ku ev rewş, li xweşîya wî neçûye û ji Aîşe re wiha gotibû:

*"-Ya Aîşe! Wê doşekê bi şûn de bide xwediya wê. Ez bi Xuda sûnd dixwim ku heke min xwestiba, Xuda wê çîyayên zêr*

201. Buxarî, Rîqaq, 17

*û zîv bi min re dabana meşandin û ew bixistana ber fermana min.”*[202]

Ewên ku li hemberî heyat û bûyeran ev uslûba nebewî ecibandine şîar û remza wan “**zuhd**” û “**teqwa**” ye; lê ew jî carina şaş tê fehmkirin. Tê zenkirin ku ev zuhd û teqwa, bi temamî dest û zend kişandina ji nîmet û zengînîyên dinyayê ye. Haleveku hinek îbadetên malî hene, ew bes bi hebûna mal û serwetê têne bicihanîn û ev jî li cem Heq Teala pirr bi biha ye. Di Qur’ana Pîroz de di du-sed cihan de peyva înfaqê dibûre. Ji her pênc esasên îslamê zekat û hec in. Îfa û edakirina herduyan jî bi wê hebûna malê dinyayê mûmkin e ku bi dîtina dînî ew biçûktirîn pîvana zengînîyê tê hesabê. Ew jî miqdarê nîsabê ye. Ji bilî vê jî qaîdeyekî îslamê yê wiha heye, dibêje: “**Destê danê ji destê standinê**” çêtir e. Ev qaîde jî keyfîyet û hêmaneke din e ku însên teşwîq dike ji bo ew bibe xwediyê nîsabê da ku bi edakirina van herdu îbadetan rabe. Naxwe zuhd, çênabe ew ji bo xusûseke ku dînê îslamê teşwîq kiribe, dijber be.

Rastîyeke eyan û beyan e ku ji tirsa kirina gunehan û ketina ğefletê li hemberî nîmetên dinyayî bi dilekî mûsteğnî tevgerîn îcaba zuhd û teqwayê ye. Lêbelê ev **îstiğna qelbî ye; ne fiêlî û zahirî** ye. Yanî zuhd û îstiğna digel meşğûlbûna bi nîmetên dinyayî re jî bicih nekirina wan di qelb de ye. Li ser vî esasî zuhd, ne xizanî ye; bizaveke qelbî ye ku ew ji bo her mûmînî; çi feqîr be, çi jî zengîn be, lazim e.

Di encama teqdîra îlahî de ew kesê ku bi zahirê xwe di nav feqr û zerûretê de dijî, heke ew bi qelbê xwe bi dûv arzûyên dinyayî bikeve, ew ji ehlê zuhd û îstiğnayê nayê hesabkirin. Lewra zuhd û îstiğna, ne ji ber ajotina qederê ji neçarî qenaet-anîna bi

202. Ehmed bin Henbel, Kîtabû’z-Zuhd, rûp. 30

malê hindik e; lêbelê ew bi îradeyî mûhafezekirina qelb ji êsîrbûna ji bo dinyayê ye.

Çawa ku ev qisse jî vê destûrê çi sipehî îzah dike:

Welîyê mezin **Hezretê Mûhemmed Parsa**'yê ku **Hezretê Şahê Neqşebend** ew perwerde kiribû, dema ew diçe hecê, ji ber ku ew li ser rêya wî bû, diçe bajarê Beğdayê û li wir li serrafekî rast tê. Ew zen dike ku ev ciwan bê navber û rawestan bi gellek mûşterî û kirryaran re meşğûl dibe û zemanê xwe tevî sirf bi meşğûlîyetên dinyayî ve derbas dike, ji lewma ew ğemgîn dibe û di dilê xwe de wiha dibêje:

"- Ğebînetê! Ev ciwan tam di wextê ku bi awayekî ciwantirîn îbadetê ji Heq Teala re bike de, xwe bi dest meşğûlîyetên dinyayê ve berdaye!.." Lêbelê dema ew mûraqebe dike û li qelbê ciwên dinêre, bi heyret dibîne ku wa ye, azayên wî bi meşğûlîyetên dinyayî ve lebikîne; lêbelê qelbê wî jî bi Rebbê wî re di halê zikr de ye.

Ev car, Hezret wî ciwanî teqdîr dike û wiha dibêje:

"-Maşaellah! Destê wî di kar de ye û dilê wî jî di yar de ye!.."

Dema ew digihîje Hicazê, li pîremêrekî rast tê ku wî xwe bi perda Ke'bê ve girtibû û kûr kûr digirîya. Pêşî wî li menzere û dîmena zahirîya wî meyzand ku ew lavlavan ji cenabê Heq Teala dike û xwezîya xwe bi wî anî, di dilê xwe de wiha got:

"-Xwezî min jî karîba wekî vî pîremêrî bigirîya û xwe biavêta ber penaha Heq Teala." Bi vî awayî wî bi ğibte li wî kalemêrî meyzand û xwezîya xwe bi wî anî.

Paşê dema wî li dilê wî kalemêrî jî nezer kir, dît ku wa ye ev hemû dûa û girîyên wî ji bo bidestxistina malê dinyaya fanî ye. Ji lewma dilê reqîqê wî mehzûn dibe.

Wekî ku ji vê qissê jî tê fehmkirin ya mûhîm; mirov, bê îhmalkirina axretê, berdewamkirina li ser meşğûlîyetên dinyayê ye.

**Hezretê Mewlana** -quddîse sirrûh- jî însanî di heyata dinyayê de bi gemîyeke ku di deryaya hebûna malê dinyayê de sobaberîyê dike teşbîh dike û wiha dibêje:

“*Heke derya, di bin gemîyê de be, ewê jê re bibe îstînadgeh. Feqet dema pêl dest pê bikin û bikevin nava gemîyê, wê dibin helakê.*”

Bi rastî di xusûsa tehlûka manewîya ku ‘nîmetên dinyayî qelb ji zikrê Xuda meşğûl dikin û bi wî bi xwe ve girêdidin’ de heqîqeteke wilo ye ku mirov neşê wê înkar bike. Di esasê xwe de her mûmîn, di Qur’ana pîroz de bi îfadeya “**fitne**”ya ku ji bo “**mal**” û “**ewladan**” dibêje, hatiye îqazkirin. Bi vê nêrînê, dema mirov bi dinyayê ve meşğûl bibe, divê mirov qelbê xwe ji ğefletê biparêze. Heke qelb ji hezkirina dinyayê neyê parastin, hingê zerreya dinyayê jî merdûd e.

Mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman kiriye, gotiye:

*“Lezzetên dinyayê [yên ku bi nefsanîyetê tije ne], êş û janên axretê ne. Êş û janên dinyayê [ku di mahîyeta îmtîhanê de ne] jî, lezzetên axretê ne.”*[203]

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîseke din de jî wiha gotiye:

203. Hakim, Mûstedrek, c. IV, rûp. 345

*"Dinya şîrîn e û dîmena wê xweş e. Bêşiwar Xuda, yê îdareya dinyayê bide we û ewê binêre ka hûnê têde çawa bizav bikin û hûnê karê çawa bikin. Naxwe xwe ji dinyayê biparêzin..."*[204]

❁

Rojekê min dikir ji bo nimêja sibehê ji malê derkevim, min li derve feryadên canxiraş ên du kitikan bihîstin. Min meraq kir, dema ez derketim, çûm nav bexçe, min bala xwe da wan. Min dît ku herdu kitik li hemberî hev rawestane û her yek ji wan her wekî pilingekî biçûk ji bo êrîşbirina li ser hev hazir in, xirexirê ji xwe dertînin, hîç xwe tevnadin û bi awirên tûj û tund li hev dimeyzandin. Pirça wan her wekî strî gij bûbû. Di pêngava vê de bûn ku her yek ji wan di xwe têwerkirinekê de ya din perçe perçe bike. Dema ez dihizirîm ka sebebê ev qeder edû-dînîya wan û dijminahîya wan ji hev re çi ye, min dît ku wa ye, di neqebeyna wan de mişkek heye, hem jî mişkekî biçûkê mirî ye. Meger kitik ji bo bidestxistina kelaşê mirîyê mişk ev qeder ketibûn nav têkoşîn û berberîyê. Meger sebebê zirara ku her yekî ji wan ji bo xwe raçav kiribû, bigihîne ya din, heta wê ji holê rake û tine bike jî, bes kelaşê biçûkê mişkekî bûye!..

Ev tablo û dîmen di eslê xwe de îbreteke mezin şanî dida. Mûsteğnî nemana ji kelaşekî jî ew netîceyên xirab ên ku mirov ji bonê dûçar bûbû û yê mirovî ji bo kirina wan dûçar bike dida xuyakirin. Ji vê hêlê ve, ewên ku dinyayê dixwazin û ji bo îhtîrasên pûçên xwe yên dinyayî jî xisareta axreta xwe tercîh dikin, ev halê wan herdu kitikan karvedan e ji bo halê mirovên ku bi dinyayê girtine û axret berdane, dide xuyakirin. Ew ji mirovan re vedibêje; gellek erbabên ğefletê hene, ew hewesên fanî yên ku bi neperûşkan xwe bi wan digrin, ew arzû, daxwaz û meylên wan yên wekî meqamên berwext, mewqî û dozên rîyasetê ji kelaşekî

204. Muslim, Zikr, 99

pêktên. Dîsa ew çîroka wan herdu pisîkan îşaret pê dide ku ev arzû û îhtîras ne hêja ne, mirov di ber wan de selteneteke ebedî jidest xwe bide û axreta xwe mehû bike..

Ha di bingeha vê berehewa-kirinê de şaş û çewt berê xwedana evdî ji bo îstiğna û reğbetê heye. Cenabê Heq Teala di bara mirovên wiha de ferman dike, wiha dibêje:

كَلاَّ إِنَّ الإِنسَانَ لَيَطْغَى. أَنْ رَآهُ اسْتَغْنَى.
إِنَّ إِلَى رَبِّكَ الرُّجْعَى.

"***Rast e, însan, xwe mûstexnî dijmêre û har û çavsor dibe.*** *[Haleveku ey însan!]* ***Bêguman veger, her bi bal Xudayê te ve ye***."[205]

Însanê ku ji hêla maneyî ve xam be, bi hirs û çikûsî li dûv menfîetên dinyayê dikeve. Dema ew tiştekî bidest dixe, di serxweşîya ğefletê de noq dibe. Lêbelê heke ew tiştekî bidest nexe jî ev car di kul û kederan de ğerq dibe. Ew mirovê ku ji pêwîstîyê bêhtir ji bo mal, meqam û mewqî mitala û fikar bike, ew qelbê xwe ji dinyayê re ram dike û ji dinyayê re dibe bende û kole.

Di bara vê xusûsê de ev beyana nebewî çi îqazeke mezin e:

"*Kî ğemên xwe tevan bike yek ğem, yanî wê jî bike ğema axretê, Xuda yê di ğemên wî yên dinyayê de bibe kefîlê wî. Kî jî li hemberî karûbarên dinyayê ğem û kulên xwe zehf bike, Xuda, qîmet bi wî nade ka ewê di kîjan newalê de helak bibe.*"[206]

205. Eleq, 96/6-8
206. Îbnû-mace, Zuhd, 2

Ha dinya, dema di neqebeyna bende û Rebbê wî de bibe perde, ewê ji hêla maneyî ve evdî bibe helakê. Heta ku ev ğeflet berdewam bike, evd wê bikeve rewşeke wilo ku bi zahirê xwe îfade neke jî, di heqîqetê de ew ber bi naveroka hukmê vê hedîsa şerîfa ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye:

"... *Şerefa wan serweta wan e, dînê wan diravên wan e, qibleya wan jî jinên wan e. Ew şerrtirînê mexlûqatan e. Li cem Heq Teala ti nesîbekî wan jî nîn e.*"[207] ve tê kişkişandin. Rebbê me, me tevan ji vê rewşa kambax mûhafeze bike!

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji sehabîyên xwe re got:

"... *Ez bi Xuda sûnd dixwim ku ji bo we, ez ji feqîrtîyê natirsim. Lêbelê ez ji bo we ditirsim ku dinya ji we re were raxistin çawa ku ew ji ummetên berî we re jî hatibû raxistin. Vêca hûn jî ji bo dinyayê bi hev re bikevin pêşbirkê çawa ku ew jî ji bo dinyayê bi hev re ketibûne pêşbirkê. Ew, we jî bibe helakê çawa ku wê ew jî biribûne helakê..*"[208]

Bi vê sedemê, divê mirov bi qasî ku dinyaya fanî layiq be, ew qeder ehemmîyetê pê bide û mirov qelbê xwe ji zêde meşğûlbûna pê ve jî dûr bike.

Dinya tev, dilopek ji milkê Rebbê alemê ye. Dema mirov wê bi axretê re qiyas bike heyata dinyayî -bi vegotina nebewî- ne bi qasî wê avê ye ku bi telîya wî ve dimîne, dema yek telîya xwe di deryayê de noq dike û jê derdixe.[209] Rebbê mezinê me ferman dike, dibêje:

207. Elî el-Mûtteqî, Kenzû'l-Ûmmal, c. XI, rûp. 192
208. Buxarî, Rîqaq, 7
209. Li Muslim, Cennet, 55'an binêrin.

وَمَا هَذِهِ الْحَيَاةُ الدُّنْيَا إِلاَّ لَهْوٌ وَلَعِبٌ وَإِنَّ الدَّارَ الآخِرَةَ لَهِيَ الْحَيَوَانُ لَوْ كَانُوا يَعْلَمُونَ.

**"Ev jiyana dinyayê ji keyf û lîstikê pê ve ne tiştekî din e. Bi rastî mala axretê, her ew e, jiyana rasteqîne. Heke wan ev bizaniya!"**[210]

Bi rastî ewên ku vê zanibin di çavê dilê wan de dinya ji hîçê pêktê. Tekane arzûya wan rizamendîya Xuda ye. **Hezretê Yûnus Emre** çi xweş îfade dike:

Ne ez bi hebûnê keyfxweş dibim
Ne ez bi tinebûnê ğemgîn dibim
Ez hedana xwe bi evîna te tînim
Ji bo min tu lazim î, tu lazim î

Di rastîya xwe de pere, dirav, nav, şohret û şehwetên dinyayî, evên ku çavê însanên ğafil fereh dikin û zehfê caran jî wan ji rêya rast dixin, ew ji bo mirovên xwedî qelbê selîm ti qîmetekî îfade nakin. Ewlîyaûllah û mûmînên salih, tim û daîm rizamendîya Xuda li ber çavên xwe digrin û bi qasî zerreyekê jî ji îstîqameta xwe venaqetin. Ew li hemberî xapxapokên dinyayê tim û daîm li xwe miqate û şîyar in.

**Yehya bin Mûaz** -rehma xuda lê be- wiha dibêje:

"*Arif, axretê dixe destê rastê xwe, dinyayê dixe destê çepê xwe, berê dilê xwe jî vegerandiye alîyê Heq Teala. Êdî hîç tiştek nikare wî ji Heq Teala, bi dîgerên wî ve meşğûl bike*."

**Hezretê Mewlana** di Mesnewîya xwe de wiha dibêje:

210. Enkebût, 29/64

"*Dinya, ji Xuda ğafilbûn e. Heke na, ne xwedî-bûna pere, kumaş, jin û ewlada ye. Çi tişt te ji Heq Teala ğafil bike, dinyaya te ew e.*"

Yanî îstiğna, sade ne li hemberî mal û milk û serwetê ye. Xwe dûr-kirina ji hemû heyber û meşğûlîyetên ku evdî ji Rebbê wî ğafil dikin îcab dike.

Yek ji xurttirîn tesîrkerên ku qelban ji Rebbê wan ğafil dihêlin jî "**hubba rîyasetê**, yanî arzûya lîdertî, serek-bûn û seltenetê" ye. Tarîxa dinyayê ji wan kesên ku bi hirs û çikûsî dixwazin bibin xwediyê seltenetê, yan jî ji wan zalimên ku ji bo mewqîyê lîdertîyê biparêzin çendîn zulman dikin tije û mişt e. Lêbelê di tarîxa îslamê de şexsîyetên abîdeyî yên wisan hene ku dilê wan bi Heq Teala ve pêbend bûye, ji arzûya seltenetê re êsîr nebûne, ew gihane wê mûkemmelîyetê ku dema lazim bûye jî karîne bi arzû û îradeya xwe wê hêz û otorîteya di dest xwe de ji bo dîgerên xwe dewr bikin. Nexasim di tarîxê de sê şexs hene ku ev hersê ji bo yekîtîya îslamê nimûneya ferağeteke wisan şanî dane ku ti kes nikare xwe bigihîne gwîzeka wan û wan li dûv xwe ji serên xwe heta bi pêyên xwe bîranên xêr û fezîletê hiştine.

Ji van hersêyan mirovên yekem jî nevîyê pêğember **Hezretê Hesen** -xuda jê razî be- e. Piştî wî şeş mehan wezîfa xelîfetîyê bicih anî, ji bo dewlet dabeş nebe, wî ev xelîfetîya xwe bi gihaneke mezina qelbî ji bo Mûawîye dewr kir, pêşî li pevketinên sîyasî girt û nehişt ku girseyên mezin li hev bixin û xwîna birayan wekî lehîyê were rêhtin..

Mirovê duduyan jî **Hezretê Îdrîsê Bedlîsî** ye ku wî Parêzgehên Rojhilatî di rewşa hezkirineke mezina wekî lehîyê de bêyî bikaranîna şûr bi Osmanîyan ve girêdane.

Mirovê sisêyan jî **Barbaros Xeyreddîn Paşa** ye ku digel ew siltanê Cezaîra nehîtî û çendîn deverên din jî bû, wî ji bo yekîtî û pevrebûna ummetê memleketên di dest xwe de kirin eyaleteke peyrew ji bo siltanê Osmanîyan û ew bi xwe jî ji bo xwe memûrbûna vê dewletê li ser hukmdarîya dewleteke din tercîh kiriye..

**Hezretê Suleyman** -silavên xuda lê bin- ji bo ku hezkirina mal û milk û seltenetê ji dilê xwe derxist û avêtibû, wî xwe ji feqîran dijmart. Dema ew sibehê radibû, diçû cem feqîr û ğerîban, bi tewazûyeke mezin bi wan re rûdinişt û digot:

"*Feqîr babet e, li cem feqîran be*."

Bi kurtî, kar kirin ji bo mirov li dinyayê bi ti kesî hewce nebe û ji helalîyê mal û milk bidestxistin ne kêmasî ye. Tam berevajîyê vê; bi mûcibê hedîsa şerîfa ku dibêje:

"*Heke yek ji we raje werîsê xwe, here çîyê piştîyek êzing hilde ser pişta xwe û wî ji xwe re bifiroşe û bi vê sedemê Xuda şerefa wî biparêze, jê re çêtir e ku ew here ji mirovan parsekîyê bike; vêca çi ew bidinê, yan jî çi ew nedinê*."[211] kar kirin mezîyetek e. Lewra mûmînekî dewlemend û xurt bêhtir înfaqê dike û bêhtir ji bo însanan îmkanên kar û xebatê temîn dike, ew bêhtir baz dide, diçe karên xêr û qencîyê dike û di encamê de jî ew dibe mezher û xuyageh ji bo hedîsa şerîfa ku dibêje:

"*Çêtirîn însan ew e ku bêhtir feyda wî li însanan dibe*."[212]

Tişta şaş; ne xebeta ji bo wergirtina nesîbê xwe ji dinyayê ye; lêbelê tişta şaş dilê xwe bi dest wê ve berdan, îhmalkirina wezîfên dînî û wijdanî, nemerdî-kirin û êsîrbûna ji bo dinyayê ye. Divê neyê jibîrkirin ku cihê pereyan qase û cûzdan e, ne dil e!

---

211. Buxarî, Zekat, 50-53; Nesaî, Zekat, 85
212. Suyûtî, el-Camîus-Seğîr, II, 8

Naxwe di vê xusûsê de divê pîvana ku em wê li ber çavan bigrin, ev be:

"*Dilê xwe bi dinyayê ve girênede da ku Heq Teala ji te hez bike; li destê mirovan jî nemeyzîne da ku xelk ji te hez bikin.*"[213]

**Cenabê Heq Teala ji me tevan hez bike û me ji hezkirîyên xwe bike!**


**Li hemberî Masîwa, yanî li hemberî ğeyrê zatê bilindê xwe ji bo dilê me halê îstiğnayeke nebewî îhsan bike, kirina texsîskirina hemû reğbet, têkilî û pêbendîya me ji bo hezkirina bilinda xwe û ji bo emr û fermana xwe ji bo me tevan bi nesîb û hêsan bike!**

**Amîn!...**



213. Îbnû-mace, Zuhd, 1

# Exlaqê Ticaretê




*Em mûkellef in ku mal ji rêyên rewa qezenc bikin û mecbûr in ku wî li cihên rewa jî serf bikin. Tacirekî arîf, dema ticareta dinyayî bide dewamkirin jî, ew qezenca axreta ku hê ji wê mezintir e, yanî* **ticareten len tebûr** *jî îhmal nake, ew seadeta ebedî dihizire û ji rêya îlahî venaqete.*

# Exlaqê Ticaretê

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li zilamekî rast hat ku wî genim difirot. Ji wî genim-firoşî pirs kir, jê re got:

"-*Tu çawa difiroşî?*"

Wî zilamî jî wekî zanîna xwe jê re vegot. Di wê esnayê de wehî [ilham] ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re hat, jê re got:

"-*Destê xwe di nav [genimê] wî de noq bike!*"

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî destê xwe di nav genimê wî de noq kir, dît ku wa ye genimê wî şil e. Jê re got:

"-*Bila te ew qismê şil danîba serê ji bo mirovan ew dîtibana! Yê ku bixapîne ne ji me ye.*"[214]

Wekî ku di vê hedîsa şerîf de hatiye îfadekirin, sîstema îqtîsada îslamî, bingeha ticaretê li ser têgihiştina xizmeta ji bo takekes û civakê bi rastî û durustîyê hatiye damezirandin.

Failîyeta ticarî, ya ku mûmkin e, em bi guhastina mal ji hilberînerî ji bo xerckerî bi nav bikin; ewa ku hewldanê dixwaze ji bo zêdekirina sermaye, di pirranîya caran de têde egera karkirin û zirarkirinê jî heye. Failîyeta ticarî ji cîhetê ku feyda malê zêde dike hatiye helakirin û heta hatiye teşwîqkirin jî. Dema mirov bihizire ku ev xusûs li ser zimanê mûbarekê Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hatiye îfadekirin; "*ji deh parên qezencê neh di ticaretê de ne..*"[215] dereceya vê teşwîqê hê

214. Muslim, Îman, 164

215. Li Suyûtî, el-Camîus-Seğcîr, I, 113'an binêrin.

hêsantir tê fehmkirin. Li rexê din, pênc bingehên bawerîyê yên ku îslam pişta xwe bi wan dispêre her wekî "**hec**" û "**zekat**"ê ji wan jî herduyên mûhîmtirîn bi awayekî xusûsî li ser mûmînên zengîn hatine ferzkirin ku ev jî di heman demê de zengînbûna ji rêyên helal teşwîq dike. Ev rastîya ku di hedîsa şerîf de hatiye îfadekirin jî:

"*Destê danê ji destê standinê çêtir e.*"[216] mirov dikare di vê îstîqametê de binirxîne ku ev jî hukmê danê teşwîq dike.

Digel vê jî di ticaretê de ku ew mûhîmtirîn wasîteya bidestxistina mal û serwetê ye jî vê hedîsa şerîf ji eqlê xwe dernexin;

"*Fitneyeke her ummetê heye. Fitneya ummeta min jî mal e.*"[217]

Lewra di ticaretê de hirsa qezenckirina pere û diravan, yek ji tirsnaktirîn astengan e ku nefsê lawaz dike. Însanê hirskar dişibihe çêrekî; heke zikê wî were tijekirin jî devê wî nayê girtin. Haleveku tu rabî ser xwe ji bo deryayan di çêr de vala bikî, ma ew ji çarçoveya zikê xwe zêdetir dikare di xwe de bigre? Dîsa însanê hirskar, wekî tifik, yan jî sobeyekê ye ku ji bo wê çi qeder tîştên wekî êzing û rijîyê bêne anîn û li ser hev komkirin jî, ew ji wan têr nabe û namevire; tam berevajîyê vê gurî û germîya wê hîn zêde dibin.

Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] rewşa însanê hirskar wiha îfade dike, dibêje:

"*Heke ji bo kurê Adem du newalên tije mal hebin, ewê newaleke siseyan jî bixwaze. Ji axê pê ve tiştekî din zikê kurê Adem tije nake.*"[218]

216. Buxarî, Zekat, 18
217. Îbnû Henbel, IV, 160
218. Buxarî, Rîqaq, 10; Muslim, Zekat, 116

Bi sebeb vê hirsdarîya dijwara însên ji bo bidestxistina mal, ji bo hîle û dûzenbazîyên ku wî di ticaretê de kirine û dike hedd û hesab nîn e. Ji ber vê yekê, çendîn qewm hilweşîyane. Dîsa jî ev dinya, ji çendîn rêwîyên ğefletê yên ku eql nagirin tije û mişt e. Bi sebeb zengînîyên bêsînorên xwe divîyabû wan malên xwe li ser înfaq, zekat û xêr û hesenatên cuda cuda xerc bikira û wan bi înfaqên xwe jî feqîr, ğerîb, bêkes, jinebî, sêwî û hewcedar li ber çavan bigirta. Lêbelê di dirêjahîya tarîxê de mirovên ku heqê van xwedî heqan bi dilbijênîyeke wekî îştaha pîrhevokê ğesb kirine, hîç kêm nebûye...

Dîn, ne di wê îddîayê de ye ku ji bo wê bedena ku ji rûh re wekî barekî ye, seadet û rehetîyê bîne. Berevajîyê vê dîn, di vê îddîayê de ye ku rûh, li ser alîyê bedenî û nefsanîya însên bike hakim û serwer. Ticaret, di piştî pêvajoyekê de divê liğabê li nefsa me û hirsên me bide da ku em bı serxwe ve neçin û nebin bedbextê dinya û axretê... Di cemîyet û komelekekê de ku ji çînî û sinifa tacirên hîlebaz û organên kontrolê yên diz û bertîl-xweran mije û tije be, lêgerîna hizûr û aramîyê xewn û xeyaleke pûç e..

Cenabê Heq Teala di Qur’ana Pîroz de dide zanîn ku wî xelkê Medyen û Eyke’yê, yanî qewmê nebî **Şûeyb** -silavên xuda lê bin- bi sebebê zehf zêde xirab-bûna exlaqê bazirganîyê wan ew birine helakê. Bi vî awayî da ku heta qiyametê jî ew ji bo ummet û milletên ku hêtên bibin ders û îbret. Ji ber wê di ticaretê de sextekarî-kirin, xwarina heramîyê, perçiqandina lawaz û zeîfan sûc û curmekî ew qeder giran e ku dibe sersebebê helak û jinavbi-rina qewm û milletan.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman dike, wiha dibêje:

“Bila koleyê pereyên zêr û zîv û cilên kibr û serxweveçûnê biçe helakê!.. Ew kesê ku hirskarê menfîetê ye, heke mal jê re were dayîn memnûn dibe, lê heke jê re neyê dayîn jî razî nabe [li hemberî teqsîmat û teqdîra îlahî radibe].”[219]

Dema mirovekî li cem **Hezretê Ûmer** -xuda jê razî be- medhê yekî dida, **Hezretê Ûmer** -xuda jê razî be- sê pirs jê dikirin, yanî ev jê re digotin:

“-*Te pê re hîç cîrantî kiriye?*”

Wî jê re got:

“-Na, min pê re cîrantî nekiriye.”

Ûmer jê re got:

“-*Tu pê re çûyî rêwîtîyê?*”

Wî jê re got:

“-Na, ez pê re neçûme rêwîtîyê.”

Ûmer jê re got:

“-*Te pê re ticaret kiriye?*”

Wî jê re got:

“-Na min pê re ticaret jî nekiriye.”

Dema mûxatebê wî jê re got, ne xêr, min ev hersê jî pê re nekirine. Vêca Ûmer jê re got:

“-Ez dibê qey te ew li mizgeftê dîtiye ku wî Qur’an dixwend û di ber de jî serê xwe dihejand!”

Wî mirovî jî jê re got:

219. Buxarî, Rîqaq, 10; Îbnûmace, Zuhd, 8

“-Erê, ya Ûmer! Min ew wilo dîtibû.”

Vêca **Hezretê Ûmer** -xuda jê razî be- jê re got:

“-Ew çax medhê wî neke! Lewra îxlas ne li ser stûyê însên e.”

Di vê navê de ew pîvana ku **Hezretê Ûmer** -xuda jê razî be- daye, dide zanîn ku divê mirov bi zahirê dîgeran nexape, mirov di bara kesan de bi kirinê wan û mûnasebetên beşerî yên wan bibe xwedî qenaet. Ev jî tehlûka tezkîya wî kesê ku di menfîetên xwe de ketibe îmtîhanê lê notê derbas bû, bidest nexistibe, destnîşan dike.

Wekî ku hate dîtin ticaret, dinyaya navxweyîya takekesî derdixe derve. Yanî alema navxweyîya takekesî çawa be, ticareta wî jî wilo ye.

Bi nêrîna îslamê; kirryar û firoşer, dema malekî bikirre divê bi qesd zema wî neke, dema difiroşe jî bila îfadeyên ku wî ji nirxên wî bêhtir şanî didin jî bikar neyêne. Divê mirov ji nezanîn û ğeşîmîya mûxatebê xwe îstîfade neke û di nirxan de ji teamulê [standardîya biha] zêdetir dernexe. Divê mirov ğebna fahîş [xapandinê] neke, bazara reş, ribaxwerî û di kişandin û pîvanê de hîlebazîyan neke, xwe ji sûndxwarinê vede û malê heramê ku zirarê dide civakê jî nekirre û nefiroşe.

**Pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] qaide û rêz û rêçên ticaretê çi xweş danîne, wiha dibêje:

*“Gelî koma taciran! Bêşiwar şeytan û guneh tevlî kirrîn-firotinê dibin. [Ji bo sûndên ku hatine xwarin, xeberên ne lazim wek kefaret] ticareta xwe tevlî sedeqeyan bikin [û bi wan temîz bikin]!*

*Tacir, roja qiyametê wek facir [gunehkar] têne vejandin. Lêbelê tacirên ku li hemberî Xuda xwedî teqwa bin û ewên ku qencî, durustî û rastîyê dikin ji wan tacirên xirab cuda ne...*”[220]

“*Heke di dema firotinê de sûnd rewacê bide mal jî lê bereketê ji pereyan dibe.*”[221]

Ew firoşerê ku nirxê malê xwe nizanibe, divê mirov bi durustî nirxê malê wî jê re bide zanîn. Îstîfadekirina ji nezanîn, bêtecrûbetî û ğerîbantîya wî ğebn [xapandin] e. Ewên ku di dilên wan de tirsa ji Xuda û arzûya rizamendîya wî hebin, bila di vê xusûsê de heta tu bibêjî bes, titîz û hessas bin.

**Hezretê Îmamê Ezem Ebûhenîfe Nûman**, dema jinekê jê re cileke ji hevrîşm çêkirî jê re anîbû ji bo ew wî ji wê bikirre. Wî bihayê wê cilê jê pirs kir; ev bi çendan e? Wê jinê jê re got:

“-Ya Îmam! Bihayê wê sed dirhem e.” Îmam îtîraz lê kir û jê re got:

“-Na, ev hê bêhtir pere dike…”

Ew jin şaşomaşo ma û sed dirhemên din bihayê wê cilê giran kir. Îmam Ezem dîsa ew biha qebûl nekir. Wê jinê sed dirhemên din jî li bihayê xwe zêde kir, piştre sed dirhemên din jî lê zêde kirin… Dema Îmam Ezem jê re got:

“- Na, ev ji çar sed dirheman bêhtir dike…” Wê jinê hew xwe girt û jê re got:

“Ya Îmam! Tu tinazên xwe li min dikî?”

Vêca Îmam gazî mirovekî pispor kir ji bo bihayê rasteqîneyê wê cilê ji wan re bibêje. Ew kesê ku hatî bihayê wê cilê

220. Tirmizî, Bûyû‘, 4

221. Buxarî, Bûyû’ 26

wek pênsed dirhem dîyar kir û Îmam Ezem jî ew cil bi pênsed dirheman kirrî.

Lewra wî zanîbû ku cudabûna ji rastîyê, veşartina eyb û kêmasîyên mal, bi taybetî jî diqqet nekirina di pîvan û kişandinê de wê însên ji bo netîceyên hezîn û ğemnak dûçar bike.

Civaka Osmanî jî di nav vî exlaqî de hatibûye stran û hizûr û seadeta cemîyeteke wiha di dereceyeke wisan de hatibû temînkirin ku ehlê kufrê jî ji xwe re heyran hiştibû. Piştî ku Fatîh Îstanbûl fetih kir, du papaz li çarçîyê digerîyan ji bo esnaf û dikandarên Osmanî tedqîq bikin, ev bûyera ku jîyabûn, vê rewşê çi xweş dide xuyakirin:

Papaz sibehê di saeteke zû de diçin dikana beqqalekî ji bo hinek kelûpelan ji xwe re wergirin. Beqqal ji wan re dibêje:

"-Min siftah kiriye. Cîranê min siftah nekiriye, herin ji wî bikirrin!"

Vêca ew jî diçin wî beqqalî, ew jî eynî wisan ji wan re dibêje:

"-Min siftah kiriye. Cîranê min siftah nekiriye, herin ji wî bikirrin!"

Vêca papaz diçin wê beqqalîya dîtir. Lêbelê cewaba ku wergirtin eynî wekî ya berê bû. Di paşîyê de ew kirrîn-firotina xwe ji beqqalê pêşî dikin.

Ha ecdadê me, di zemîneke exlaqîya wiha de însan perwerde kiribûn ku wê ew dîgerbîn û fedakar dikirin. Ev zemîna ha ji exlaqê îslamê ye ku têde hizrkirina hev û din heye. Bêşiwar hîlekarî ji bo mislimanekî sûcekî giran e. Mislimanek derew nake û naxapîne. Hatin xapandin jî elametekî ehmeqtîyê ye. Ew jî li mislimanekî nayê. Ew pêğemberên ku wek rêzan û mûrşid

ji însanîyetê re hatine hinartin, du wesfên esasî yên wan hene, ew jî “**sidq**” yanî rastgoyî û “**fetanet**” e, yanî eqlmendîtî ye. Mislimanekî ku li ser rêç û şopa wan diçe jî mecbûr e, eqlmend û jîr be. Cenabê Heq Teala di xusûsa nexapîna bi xapîneran de me evdên xwe wiha şîyar dike, dibêje:

“**Malê xwe yê ku Xuda ji we re kiriye sermayê palpişta jîyanê, nedin kêmhişan**.”[222]

Herçî xapîner in, ew jî ji bo tehdîd û gefa di vê hedîsa şerîf de mûxateb in. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman dike, wiha dibêje:

“*Sê kes hene, roja qiyametê Xuda bi wan re naaxive, li wan nameyzîne û wan dernaxe temîzê û ji wan re ezabekî dijwar jî heye*.” Ebûzer -xuda jê razî be- dema jê bihîst ku wî ev îfadeyên xwe sê caran dubare kirin, jê pirs kir, jê re got:

“-Ya Resûellah! Mera navên wan ğerq bibin, mera ew negihin miradên xwe û mera li xisarê bikevin! Ev kî ne?”

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got:

“*Ew kes e ku [ji ber kibr û serxweveçûna xwe] cilên xwe dikişîne û tê, ew kes e ku malê dayî dixe minnet û ew kes e ku bi sûnda derewîn pertalên xwe difiroşe!*”[223]

Li alîyê din, di nîzama îqtîsada îslamê de îhtîkar, yanî ew kesên ku ji bo dan û standin-kirina bi bazara reş, mal depo dikin û çavnêrî dikin nafiroşin heta bihayê wan giran bibe, ev bazarareş-gerî mezmûm e. Ew kedxwarîya maddîya civakê ye. **Hezretê pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] nifir li bazarareş-geran kirine. Ew di hedîsa şerîf de wiha dibêje:

222. Nîsa, 4/5

223. Muslim, Îman, 171

“*Tacirê cesûrê ku malê xwe ji bo firotinê erz dike, merzûq e [rizqê wî hatiye dayîn], tacirê mûhtekir [yanî ewê ku malê xwe li ser hev kom dike ji bo bi bihayekî girantir bifiroşe] jî mel‘ûn e.*”[224]

Rêz û rêçên îslamê di bara ticaretê de xwe di failîyetên qezenckirin û serfkirina wê de şanî didin:

Qur’ana Pîroz, failîyeta ticarî ya ku bi razîbûna dilê herdu terefan were kirin helal didêre. Ew hemû mûamelatên li derveyê vê ticaretê heram didêre, dijmêre û ew wiha dibêje:

“**Gelî yên ku îman anîne! Ji bazirganiyeke ku bi dilê we be pê ve, di navbera xwe de, malên hev bi neheqîyê** [bi dan û santina bi rêyên heram] **nexwin û nefsên xwe nekujin! Bi rastî Xuda, hemin ji bo we dilovîn e**.”[225]

Îfadeya “**nefsên xwe nekujin!**” maneyeke mûhîm, zirav, hûr û kûr di xwe de dihewîne. Li vir îqazek heye, dibêje; xwe ji wan hereketên ku heyata rûhî mehû dikin û we dikin ji ehlê cehennemê, biparêzin. Li rexê din jî balê dikişîne ser vê heqîqetê ku hinek pevçûn û cînayet ji hirsa bi neheqî qezenckirin û xwarina mal têne kirin. Xwe parastina ji vê xeterê jî bi mayîna di nav tixûbê wan rêz û rêçên ticaretê yên ku îslamîyetê ew teyîn kirine de, mûmkin dibe. Nemaze reva ji ribayê. Ew di vê xusûsê de giringtirîn mesele ye.

Riba, ji ber ku risk û ğeyret têde nîn e, xuyahîyeke kedxwarîyê ye ku sermaye wê bikartîne. Ew dibe sersebeb ku sade zengîn hîn bêhtir xurt bibe û hewcedar jî hîn bêhtir biperçiqe û lawaztir bibe. Gellek hedîsên tirsnakên Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hene. Resûlê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di xutba xatirxwestinê de wiha dibêje:

224. Îbnûmace, Ticaret, 6
225. Nîsa, 4/29

"*Her cureyeke ribayê di bin pêyê min de ye*." Wî bi vê her texlît û celebên ribayê heram kirine.

Di ayeta pîroz de gefa îlahî di vê xusûsê de wiha tê îfadekirin:

"**Ewên ku ribayê dixwin, eynî mîna yên ku ji lêdana şeytên dîn bûbin radibin ew jî wisan** [roja qiyametê ji tirbên xwe] **radibin. Ev halê wan ji ber vê ye ku dibêjin; kirrîn-firotin jî her wekî ribayê ye! Haleveku Xuda, kirrîn-firotin helal kiriye û riba jî heram kiriye. Ji vêga û pê de ji kê re, ji cem Xudayê wî şîretek were û ew dest ji ribayê berde, tiştên ku berê bûne her jê re ne** [ya berî heram bibe jê nayê standin] **û karê wî ji Xuda re hatiye hiştin. Kî dîsa li ribayê vegere, ha ew xelkê êgir in û ewê heta hetayê têde jî bimînin.**

**Xuda,** [malê ku] **riba** [tevlî wî bûbe] **dibe helakê** [bereketê jê dibe] **û** [malê ku sedeqe ji navê hatibin dayîn, yanî] **sedeqeyan jî pirr dike** [bi wesîleya sedeqeyan belaya dahatû û paşwextê jê def dike]**. Xuda, ji her kesê** [ku di kufr û gunehan de] **israr dike, hez nake**."[226]

Nexasim ew gefa di vê ayetê de ku dibêje; bi sebeb ribayê qehra îlahî wê tecellî bike, çi dehşetamîz û tirsnak e:

"**Gelî yên ku îman anîne! Ji Xuda bitirsin! Heke bera hûn mûmîn bin, dest ji wê ribaya mewcûda ku hûnê wergirin, berdin! Heke hûn dest ji ribayê bernedin, bizanin ku ji aliyê Xuda û pêğemberê wî ve li hemberî we** [ribaxweran] **şerrekî dijwar heye! Heke hûn tobe bikin, jê vegerin, sermiyanê we her ji we re ye; ne hûn zulmê bikin û ne jî bila zulm li we were kirin**."[227]

---

226. Beqere, 2/275-276
227. Beqere, 2/278-279

Ma ew kî ye ku li hemberî xaliq û aferînerê kaînatê Heq Teala û li hemberî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] yê ku Xuda ji bo xatirê şerefa wî ev kaînat aferandiye, şerr bike û di vî şerrî de jî ğalib û serkeftî bibe?!

Heke mûmînek bi ribayê îştîğal bike, yan ewê malê xwe berze û jidest bixe, yan jî îmana wî yê zeîf bibe. Lêbelê heke însanê fasiq bi ribayê îştîğal bike û bikeve rêyên wiha şaş û çewt, ji bo ew ji cezayê mûsteheqê xwe re hîn bêhtir mûsteheq bibe, malê wî zêdetir dibe. Yanî ew rê, li vê dinyayê jê re dibe rêya kar û qezencê. Lewra cenabê Heq Teala, îhmal nake, îmhal dike [mohlet dide]. Ew mirovên wiha heta bi wê dema ku ewê ji cezayê xwe re rûbirû bimînin mohlet ji wan re hatiye dayîn. Naxwe divê mirov zehf bala xwe bide ser wê gefa îlahî. Heke na, rewş pirr kambax û lewitiye

**Cabir** -xuda jê razî be- dibêje:

“Resûlûllah -dirûd û silavên xuda lê bin- li kesê ku ribayê dixwe, yê ku ribayê dide xwarin, yê ku katibê ribayê ye û yê ku şahidê ribayê ye, le‘net anî û got:

«*Ew hemû wekhev in...*»”[228]

Rewşa Hezretê Ebûhenîfe çi sipehî ye. Ew Îmamê Mezin, ji bo rewşeke wekî ribayê çênebe, ji siha dara deyndarê xwe jî îstîfade nekiriye.

Helbet gellek sebeb û hikmetên qedeğebûna ribayê hene. Di serê van sebeb û hikmetan de jî ev xusûs tên. Lewra ew bêkarîyê zêde dike. Ew rê xweş dike ji bo bi awayekî çêkirî û sexte biha giran bibin. Ew van mezîyetên exlaqî û însanî yên wekî hevkarî, palpiştî, hezkirin, merhemet û şefqetê zeîf dike. Ew ezperestîyê

228. Muslim, Mûsaqat, 106

teşwîq û gur dike. Ew hirs û çikûsîya ji bo bidestxistina pere û nifûzê xurt û geş dike.

Îslamê ji bo çendîn hikmetên wekî van ribaxwerî qedeğe kiriye. Wê li hemberî qedeğekirina ribayê “bi qasî îmkanên xwe ji bo Xuda dana deynan” ku jê re **qerzê hesen** tê gotin, teşwîq kiriye. Îslamê dana deynan ji bo mirovê di tengasîyê de ji dana sedeqê bi fezîlettir jimartiye.

Digel van rewşan jî ew esnaf û tacirên ku durust, pêbawer û bi namûs kar dikin, di civakê de ji hêla hijmarê ve her zeman hindikahî dimînin. Belkû ji ber vê ye ku **Hezretê pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo tacirên durust mizgînîya mûkafatên mezin daye. Ew di hedîsa şerîf de ferman dike, wiha dibêje:

“*Mislimanê tacirê rastgo, durust û pêbawer, roja qiyametê bi nebîyan, siddîqan û şehîdan re ne*.”[229]

**Hezretê Ebûhenîfe**, kesekî wisan bû ku debara xwe bi ticaretê dikir, xwedî serweteke zehf û ew pirr zengîn bû. Lêbelê ji ber ku ew bi îlmê re meşğûl dibû, karên ticarî yên xwe bi wasîteya wekîlê xwe dida meşandin û wî jî ticareta xwe kontrol dikir ka ew di çarçoveya helalîyê de ye, yan jî na. Ew, di vê xusûsê de ew qeder hessas bû ku wî carekî şirîk û hevpişkê xwe **Hefs bin Ebdûrrehman** ji bo firotina qumaş şandibû û jê re gotibû:

“-Ey Hefs! Di mal de ev û ew uzr hene. Ji bo wê, van ji kirryaran re bibêje û ev qeder erzan bifiroşe!”

Hefs jî, ew mal bi bihayê ku Îmam diyar kiribû, firotibû; lêbelê ji kirryarî re vegotina wî uzrî jibîr kiribû. Hezretê Ebûhenîfe vê rewşê hîn dibe, ji Hefs dipirse, jê re wiha dibêje:

229. Tirmizî, Buyû‘ 4; Îbnûmace, Ticaret, 1

“-Tu kirryarê ku ew qumaş wergirtî nas dikî?”

Dema Hefs got; ez kirryarî nas nakim, hingê Îmam ew mal tev wek sedeqe belav kir. Lewra wî bi her halê xwe ew heqîqeta ku **pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji **Hezretê Emr** re gotibû:

“*Ey Emr! Malê salih ji bo mirovê salih çi sipehî ye!*” dijîya û di xusûsa helal û heramîyê de bi pîvan û endazên teqwayê hereket dikir. Lewra diqqetkirina li helalî û heramîyê ji bo temîzîya malê ku ji me re hatiye emanetkirin û li axretê jî ji bo dana hesabê wî mecbûrîyeteke zehf mûhîm e.

Bavê rehmetî yê min **Mûsa Efendî**, ehemmîyet û bereketa luqma helal di vê xusûsê de li hemberî heramîya di ticaretê de bi vê bûyera ha vedigot:

“Me cîranekî Ermenî hebû, misliman bûbû. Rojekê, dema min sebebê hîdayetbûn û mislimanbûna wî jê pirs kir, wî ev gotin:

“-Ez bi wesîleya exlaqê xweşê cîranê xwe yê zevîyê li Acibademê Rebî Molla misliman bûm. Rebî Molla zatek bû ku şîr difirot û wilo debara xwe temîn dikir. Wextekî êvarê hate cem mala me û got:

“-Kerem bikin, bila ev şîr ji we re be!”

Ez şaş mam, min jê re got:

“-Çawa dibe? Min şîr ji we nexwestibû!”

Wî însanê hessas û zerîf got:

“Bê xebera min jê çêbibe, min dît ku wa ye heywanek ji yên min ketiye nav bexçê we û lê çêrîye. Ji ber wê bila ev şîr ji we re be. Ji bilî vê jî heta dewreya tehewwulata [zaîlbûna giyayên ku

wê xwariye ji wicûda wê here] heywanê xilas bibe, ezê şîrê wê ji we re bînim…”

Heke çi qeder min jê re got jî:

“-Cîran, eyb e, em behsa wê bikin? Ma wê ne giya xwariye? Ez li we helal dikim!..” Molla Rebî got:

“-Na, na, wisan nabe! Şîrê wê heqê we ye!...” Heta dewreya tehewwulata heywanê xilas bû, wî şîrê wê her ji me re anî.

Ha vê bizava wî însanê mûbarek zêde zêde tesîr li min kir. Di encamê de wî perdeyên ğefletê yên li ber çavên min rakirin û tava hîdayetê di hinavê min de derket. Min ji xwe bi xwe re got:

“-Dînê însanekî wiha exlaq bilind, bêşiwar ew çêtirîn û bilindtirîn dîn e. Di heq-bûnîya dînekî ku însanên wiha zerîf, heqnas, mûkemmel û temîz perwerde dike de şubhe nayê kirin! Min kelîma şehadetê anî û ez misliman bûm.”

Di civakeke misliman de li kêleka van sipehîtahîyan hebûn û jîyîna ğefletên ku di vê hedîsa şerîf de hatine vegotin:

“*Zemanekî wilo bi ser mirovan de tê ku ğema wê naxwe ka wî malê xwe ji helalîyê qezenc kiriye, yan jî ji heramîyê*!”[230] çi rewşeke hezîn û ğemnak e!

Haleveku ew cezayên ji binpêkirina qaîdeyên ku dîn danîne dizên, digel ku takekesî ne û bi pirranî jî ew li axretê ne jî, ew belaya ku ji bidestxistina malê heram dizê, wan nifşên hêtên jî dixe ber xwe ku di qezenckirina wî malî de ti desttêwerdana wan nîn e!. Ji vê jî zêdetir, bêşiwar tehlîya vî karî hê li vê din-yayê digihîje însanan û ew heta axretê jî namîne. Gel hest bi vê hûrenuqtê kiriye û gotiye; *“kalê wî harsim xwariye, diranê nevîyê wî disîqire!”* Ev ji xwe re kirine derbû-mesel. Heqîqeteke

230. Buxarî, Bûyû‘ 7, 23

eyan e ku ewên ji serweta heram mîrasê werdigrin bi pirranî di rêya rast de naçin. Lewra di pereyan de sirrek heye; ew ji kîjan rêyê hatibin di wê rê de diçin jî. Malekî ku ji rêya heram hatibe, mîratxwerê xwe dixe pey xwe û diajoyê ser rêyên xirab. Malekî wiha dişibihe mar. Mar çawa ji qula ku jê derketî bi wê ve diçe, cihê serfkirina mal jî bi wesfê qezenckirina wî ve pêbend e.

Malekî ku di rasta îman û teqwayê de nayê bikaranîn, ew ber bi fisq û kufrê ve tê kişkişandin. Ev jî di ayeta pîroz de li ser zimanê Mûsa -silavên xuda lê bin- çi xweş hatiye îfadekirin, hatiye gotin:

"**Mûsa got: Xudayê me! Bi rastî te li jiyana dinyayê xişrek û malekî pirr daye Firewn û giregirên civata wî. Xudayê me, ma ji bo ew mirovan ji rêya te vegerînin? Xudayê me! Malê wan ji navê bibe, dilên wan bi dijwarî mohr bike; lewra ew heta ezabê cansoj nebînin, îmanê nayênin**."[231]

Çi ğerîb e ku meyla hinek mirovan şanî dide, dîbêje; dema mirov bi durustî ticaretê bike, qezenc hasil nabe! Ev laqerdîyeke ğefletê, çav-korbûneke ji heqîqetê û înkara programa teqsîmata îlahî ye. Bi nêrîna mirovên ku ketine vê şaşîyê, Hezretê Ebûbekr -xuda jê razî be- ê ku çendîn caran serweta xwe di rêya Xuda û Resûlê wî de serf kiriye û ti caran ji ticareta durust cuda nebûye, divîyabû ew ji feqîrtirînê sehabîyan bûya. Lakin bi tarîxê jî sabit e ku ew bi berdewamî ji dewlemendtirînê sehabîyan bûye. Digel ku wî çendîn caran malê xwe û her tiştê xwe ji bo Xuda û Resûlê wî înfaq kiriye jî, bi naîlîyeta çendîn bereketên îlahî tekrar ew bûye xwediyê mal û serwetê.

Li ser vî esasî, em mûkellef in ku malê xwe ji rêyên rewa qezenc bikin û mecbûr in ku malê xwe li cihên rewa jî serf

231. Yûnus, 10/88

bikin. Tacirekî arîf, dema ticareta dinyayî bide dewamkirin jî, ew qezenca axreta ku hê ji wê mezintir e, yanî **ticareten len-tebûr** jî îhmal nake, ew seadeta ebedî dihizire û ji rêya îlahî venaqete. Ev ayeta pîroz, heyata qelbî ya mirovên wiha çi xweş dide xuyakirin:

رِجَالٌ لا تُلْهِيهِمْ تِجَارَةٌ وَلا بَيْعٌ عَنْ ذِكْرِ اللَّهِ وَإِقَامِ الصَّلاةِ وَإِيتَاءِ الزَّكَاةِ يَخَافُونَ يَوْماً تَتَقَلَّبُ فِيهِ الْقُلُوبُ وَالأَبْصَارُ.

“**Di wan de hinek zilamên wisa hene ku ne bazirganî, ne jî danûstandin wan ji bîranîna Xuda, ji kirina nimêjê û ji dana zekatê meşğûl dike. Ew ji rojeke wisa ditirsin ku têde dil û çav dilivin, diqulibin**.”[232]

Ew mirovên ku bi vî awayî ehlê ticaretê bin, ew ticareta ku di ayeteke pîroza din de jî wiha tê îfadekirin: “**Tîcareten len tebûr**” [qezenceke ku hîç zirar nake] ha ew sirrê wê dijîn, yanî wan para xwe ji ticareteke rastîn wergirtiye. Çawa ku Ellah Teala ticareta heqîqî wiha beyan dike, dibêje:

“**Bêguman ewên ku kitêba Xuda dixwînin, nimêjê bi rastî û durustî eda dikin û ji rizqê ku me daye wan jî bi dizî û eşkerehî [di rêya Xuda de] înfaq dikin, ha ew hêviya ticareten len tebûr** [qezenceke ku hîç zirar nake] **dikin. Lewra Xuda, dê xelata wan tam bide wan û ewê ji camêriya xwe hê bêhtir jî bide wan. Bêguman ew, zehf efûkar e û hemberê şukrê jî zehf zehf dide.**”[233]

**Cenabê Heq Teala me di nav sirrên van ayetên pîroz de bide jîyandin. Xwendina kitêba îlahî bi çavên dil, secde-birina ji wî re bi xuşû‘eke ku me ji bo Mîracê bide bilindkirin,**

232. Nûr, 24/37
233. Fatir, 35/29-30

**qezenckirina ji helalîyê, xerckirina bê îsrafkirin û înfaqkirina nîmetên ku wî dane jî di rêyên ku ewê pê razî bibe de, bike nesîbê me!**

**Ya Rebbî! Birayên me yên ehlê ticaretê bike ji wan mirovên ku mûmîn ji destên wan û zimanên wan di selametiyê de ne û însan ji wan îstîfade dikin, û wan ji bo welat û millet jî bike însanên xêrxwaz! Wan ji bo kirina wî emelê salih mûweffeq bike ku ew di herdu cîhanan de dibe wesîleya rehm û bereketê!**

**Amîn!**

# Qerzê Hesenê ku Ji Xuda Re tê dayîn

[Deynê Sipehî-Înfaq]



*Ev beden bi emanetî ji me re hatiye dayîn, can û mal ebedî di dest me de namînin. Bêşiwar emê rojekê ji nişka ve xatiran ji van tevan bixwazin û her tişt wê ji xwediyê heqîqî yê mal re bimîne ku ew jî Xuda ye, yanî ewê li wî vegerin. Naxwe bila em di vê nîmeta heyata ku ji me re hatiye lutfkirin de, van emanetan di rêya Xuda de ji bo cihê wan teslîm bikin da ku em ji bo mûkafata ebedî naîl bibin, bigihîjinê.*

## Qerzê Hesenê ku Ji Xuda Re tê dayîn
## [Deynê Sipehî-Înfaq]

Ev kaînat, îqametgeheke umûmî û fanî ye, ew bi destê qudretê hatiye avakirin û bi hezar û yek nexşan jî hatiye xemilandin û tezyînkirin. Ev dinyaya ku alema îmtîhanê ye, ew rojên ku emê têde derbas bikin, ji me rûhekî tenik, îdrakeke kûr û tefekkureke ciddî dixwazin. Lewra ji bo me esl nîmetên mayende, ew sipehîtahî ne ku em karibin wan bi xwe re bibin îqametgeha mayende, yanî em karibin wan bi xwe re bibin heyata bêdawî. Cenabê Heq Teala arzû dike ku evdên wî bi sipehîtahîyên wiha ebedî werin hizûra wî. Ew nirx û bihayê ku wî li cem xwe ji bo wan emelên salihên ku di îstîqameta mûkafata bilind û rizamendîya wî de werin kirin, daye jî di Qur'ana Pîroz de zehf caran beyan dike û vedibêje.

Xuda Teala bi taybetî û bi israr sedeqe û înfaq teşwîq kirine ku ew mezherek ji xuyahîyên sifetên bilind ên evdên wî yên mûmîn in, her wekî lutf, kerem, comerdî û îhsanê. Di vê meydanê de Heq Teala bi awayekî qet'î û binbirr li wan xwedî serwetên ku hal û wextê wan li cih be ferman kiriye ku ew îbadetên malî yên her wekî zekat, ûşr û qurbanê bidin. Li tenişta van arîkarîyên mecbûrî fezîlet jî hene ku ew bi merwet û heyecana îmanê ve pêbend in û yek ji van fezîletan jî **qerzê hesen** e, yanî **deynê sipehî** ye.

Cenabê Heq Teala her sedeqa ku ji bo rizamendîya bilinda wî were dayîn û her înfaqa ku ji bo rizaya balaya wî werin kirin wek deynekî [**qerzê hesenê**] ku ji wî bi xwe re hatibe dayîn, qebûl dike û soz dide ku ewê hemberê wî jî qat bi qat zêde bide. Xuda Teala di ayeta pîroz de ferman dike, wiha dibêje:

مَنْ ذَا الَّذِي يُقْرِضُ اللَّهَ قَرْضاً
حَسَناً فَيُضَاعِفَهُ لَهُ وَلَهُ أَجْرٌ كَرِيمٌ.

“**Kî ye ku deynekî sipehî bide Xuda? Êdî Xuda jî vê ji wî re qat bi qat zêde bike. Ji bo wî padaşeke giranbiha û bi rûmet** [kerîm] **heye.** ”[234]

Bi vê nêrînê, sedeqeyên me bi qasî ku mirovê hewcedar keyfxweş dikin, ew li hemberî mirina ku rojekê wê ji nişka ve derkeve pêşberî me jî dibe temînata nefesa dawîyê. Bi vê hizr û bîrewerîyê divê em di xusûsa sedeqeyan de hê bêhtir bi ğeyret û hewldar bibin.

Divê em zanibin ku li vê dinyayê diltengî, yan jî keyfxweşî bi teqdîra Xuda ve girêdayî ne. Ew ğafilên ku Xuda çi qeder nîmetan dide wan jî, ew xwe li kibr û mezinatîyê datînin û serxweve diçin û wan nîmetên ku Xuda ji wan re lutf kirine jî ji bo rizamendîya wî serf nekin, nikarin bibin ji mûmînên kamil. Lewra mûmînên kamil, qerzê hesen bi herdu maneyên wê ve îdrak dikin û tetbîq jî dikin.

Yanî:

1. Hem deynan didin însanên hewcedar,

2. Hem jî bi awayê înfaq-kirinê deynan didin Xuda jî..

Erê maneyeke **qerzê hesen** jî bi awayê ku di Qur’ana Pîroz de hatiye behskirin deyn dana ji bo Xuda ye. Ev jî bi awayê înfaq-kirina li ser xwedî îhtiyacan û destekbûna ji bo ğeyret û xizmetên di rêya Xuda de çêdibe. Xuda Teala di mijara beyanki-rina terwîc û teşwîqa vî emelî de îfadeya **“deynê ku ji wî bi xwe**

234. Hedîd, 57/11

**re hatiye dayîn”** bikartîne. Yanî cenabê Heq Teala bi xwe înfaqê wek deyn ji evdên xwe dixwaze.

Xuda di ayeta pîroz de ferman dike, wiha dibêje:

“**Nimêj bikin, zekatê bidin û bi înfaqkirina di rêya wî de deynekî sipehî** [qerzê hesen] **bidin Xuda. Hûn li dinyayê ji bo xwe, çi xêrê li pêşiya xwe bişînin axretê. Hûnê, li cem Xuda xêr û sewaba wê, ji ya malê ku we li dinyayê hiştî çêtir û mezintir bibînin. Lêborîna xwe ji Xuda bixwazin, lewra; Xuda gunehbexş û dilovîn e**.”[235]

Cenabê Heq, înfaqa ku însan di îstîqamet û rasta rizamendîya balaya wî de dike wek **qerzê hesen** [deynê sipehî] qebûl dike, bi vê qebûlkirinê jî lutfeke cihêwaz û mûstesna li însên kiriye. Tabîî, bi şertê ku ev înfaq bi nîyeta xalis, bê çavnêrîkirina li ti menfîeteke dinyayî û bê qesda rîyakarî û şohretê hatibe dayîn... Ji bo vê di piştî danê de divê mirov teşekkurê hêvî neke û malê xwe sirf ji bo rizamendîya Xuda serf bike. Divê mirov wê destûra ku di bara înfaqa **Hezretê Elî** û **Hezreta Fatima** -xuda ji wan razî be- de di Qur’ana Pîroz de hatiye fermankirin li ber çavan bigre û lê miqate be.

Ew ayeta pîroz jî wiha dibêje:

“**Ew, digel ku pêdiviya wan pê heye û jê hez dikin jî dîsa xwarinê didin xizan, sêwî û yexsîran. Ji wan re dibêjin: "Em bes ji bo rizamendîya Xuda xwarinê didin we; em ji we ti perûyekê û ti spasiyekê jî naxwazin. Em vê qencîyê dikin, lewra em ji Xudayê xwe ditirsin da ku ew me di rojeke rûtirşker û tehlker de ji tirs û ezabê xwe ewle bike." Ha ji ber**

235. Mûzzemmil, 73/20

**vê Xuda, wan ji ezabê neqenciya wê rojê diparêze, rûsipehîtî û dilşadiyê dide wan**."[236]

Di vê ayeta pîroz de di bara înfaqê de ji van hûre-nuqteyan behs dike:

1. Mûmîn îhtiyaca birayê xwe li ser îhtiyaca xwe tercîh dike. Yanî mûmîn ehlê îsarê ye.

2. Mûmîn malê xwe, ne ji bo emanc û ğayeyên dinyaya fanî; lêbelê sirf ji bo rizamendîya Xuda înfaq dike.

3. Mûmîn bi înfaqê xwe ji dijwarîyên qiyametê diparêze.

4. Înfaqa ku bi îxlas hatibe kirin li cem Heq Teala meqbûl dibe û ew rûyê xwediyê xwe sipî dike.

5. Cenabê Heq Teala van cure emelên salih [karên bikêrhatî] ji me evdên xwe dixwaze.

Ha ji bo qerzê ku bi vî awayî ji Xuda re hatibe dayîn cenabê Heq Teala hemberê wê înfaqê qat bi qat zêdetir bexş dike. Dîsa di ayeteke pîroz de Heq Teala fezîleta deynekî ku bi vî awayî hatibe dayîn wiha eşkere dike, dibêje:

"**Heke hûn bi rast û durustî nimêjê bikin, zekatê bidin û îmanê bi pêğemberên min bînin, hûnê arîkariya wan bikin û hûnê bi deynekî sipehî Ellah deyndar bikin; sûnd be! Ezê gunehên we efû bikim û ezê we bixim bihiştên wisan ku di bin wan de çem diherikin...**"[237]

Li gorî rîwayeta **Îbnû-mesûd** -xuda jê razî be- **Ebû-dehdahê Ensarî**, dema ayet di bara dana deynên sipehî ji bo Xuda de nazil

236. Însan, 76/8-11
237. Maîde, 5/12

bûn, ew hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê pirs kir, jê re got:

"-Ya Resûlellah! Ma Xuda deynan ji me dixwaze?"

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bersiva wî da, jê re got:

"-*Erê, ya Ebû-dehdah, Xuda deynan dixwaze!*"

Ebû-dehdah ji Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] xwest ew destê xwe jê re dirêj bike û wî bi destê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] girt û jê re got:

"-Ez bexçê xwe wek deyn [qerzê hesen] didim Xuda!"

Îbnû-mesûd -xuda jê razî be- dibêje; Di nav bexçê Ebû-dehdah de 600 darqesb [dar-xurme] hebûn û ew û malbata xwe di mala xwe ya li nav bexçê xwe de rûdinişt, îqamet dikir.

Di piştî vê înfaqê de, yanî di piştî soza xwe ya deyn-dana ji Xuda re Ebû-dehdah çû mala xwe û ji xanima xwe re got:

"-Ey Ummû-dehdah! Ji vê malê û ji nav vî bexçeyî derkevin herin. Lewra min ev bexçe bi deyn daye Xuda ye…"

Xanima wî jî bersiva wî da û jê re wiha got:

"-Ya Ebû-dehdah! Te bazareke zehf bi qezenc kiriye!"

Paştir wan rahişt tiştên xwe û zarokên xwe û mala xwe ya li nav bexçe vala kirin.[238]

Ha di her werçerxa ku ev şiûr û fezîlet di zirwê de bûbe civaka mûmînan tim û daîm di nav aramî û bextîyarîyê de jîyaye, hem dinyaya xwe, hem jî axreta xwe parastiye. Ev bûyer jî tezahur û xuyahîyeke çav-qurmînera vê heqîqetê ye.

238. Teberî, Tefsîr, II, 803; Hakim, Mûstedrek, II, 24

**Eliye Kedourie** di pêvekeka kitêba xwe ya ku di bara sîyaseta Îngîltere li Rojhilata Navîn ya di paşedewra Osmanîyan de li qelem dayî de vedibêje; di dawîya sedsala 19'an de li Rojhilata Anadolê tinetî û ğelayeke dehşetdar rabûbû. Li ser vê bûyerê Îngîltere casûsek şand wê deverê ji bo tesbît bike ka ji bo ğelayê serhildanek wê li dijî Osmanîyan rûbide, yan jî rûnede. Di encama lêgerîna ku wî casûsî kirî de, rastîya ku wî mûşahede kirî, heta tu bibêjî bes îbretamîz bûye. Di raporê de tê gotin:

*"Li vir ğela heye, lêbelê birçîbûnî nîn e! Her kes li hev û din miqate ye û arîkarîya hev dike. Ji ber vê jî ğela, cihê xwe nade birçîbûnîyê. Wek encam, di nav pêkhatineke civakî ya wiha xurt de ji ber ğelayê hilberandina serhildanekê bê îmkan e!.."*

Hîç şubhe nîn e ku ev sewîya bilind, ji bo kesên ku karîne di midetên ku îhtîyac û xizanî gihabe sefheya [pêvajoya] tixûbê de û di zemanên zor û zehmet de di nav mûhtewa û naveroka vê ayeta pîroza ku balê dikişîne ser qîmetê înfaqê de bijîn, mûkafateke dinyewî û bereket e.. Cenabê Heq Teala di vê xusûsê de me bendeyên xwe şîyar dike ji bo em sistahî û ğefletê şanî nedin.

Xuda Teala ferman dike, wiha dibêje:

"**Çi ji we bûye ku hûn** [malê xwe] **di rêya Xuda de înfaq nakin?! Haleveku mîrasa erd û asîmanan ya Xuda ye. Hemin ji navbera we, ewê ku beriya fethê [**malê xwe**] înfaq kiribe û şerr kiribe,** [bi yên ku piştre malê xwe înfaq bikin û şerr bikin re] **wekhev nabin! Ha** [ewê ku berî fethê înfaq kiribin û şerr kiribin] **mertebeya wan, ji mertebeya yên ku piştre malê xwe înfaq bikin û şerr bikin hemin mezintir e. Digel vê jî Xuda peymana mûkafata sipehîtirîn daye herdu beşan jî. Bêguman Xuda ji karê ku hûn dikin, agahdar e**."[239]

239. Hedîd, 57/10

Yanî cenabê Heq Teala, nexasim di zemanên zor û zehmet ên Îslamê û mislimanan de cangorî û fedakarîyê ji evdên xwe dixwaze. Di Qur'ana Pîroz de ji bo vê fedakarîya evdan jî «**qerzê hesen**» hatiye gotin. Çawa ku dema di Cengên Çanaqqale û Îstiqlalê de ji evdan fedakarî di rewşa «**qerzê hesen**» de tecellî û xuya bûn, cenabê Heq Teala, ji wan re wek hemberê vê fedakarîya wan jî ğalibîyet û serkeftin îhsan kir.

Divê em jibîr nekin ku ev beden, wek emanet ji me re hatiye bexşkirin, can û mal, ebedî di dest me de namînin. Bêşiwar emê rojekê ji nişka ve xatiran ji van tevan bixwazin û her tişt wê ji xwediyê heqîqî yê mal re bimîne ku ew jî Xuda ye, yanî ewê li wî vegerin. Naxwe bila em di vê nîmeta heyata ku ji me re hatiye lutfkirin de, van emanetan di rêya Xuda de ji bo cihê wan teslîm bikin da ku em ji bo mûkafata ebedî naîl bibin, bigihîjinê. Heke em wan teslîm nekin jî, cenabê Heq Teala ku xwediyê wan e, di wexta xatir-xwestina me ji dinyayê de jixwe ewê wan bi şûn de ji me bistîne. Lêbelê ferqeke mezin wê di navberê de çêbibe. Di şeklê yekê de, yanî heke em malê xwe înfaq bikin, digel ku xezîneyên erd û asîmanan yên zatê bilindê Xuda Teala ne jî, dîsa ewê lutf bike û ewê vê înfaqê ji me wek deynekî ku ji wî bi xwe re hatiye dayîn, qebûl bike û ewê hemberê wê jî qat bi qat zêdetir îhsan bike. Di şeklê duduyan de, yanî heke em malê xwe înfaq nekin jî tiştek wê nekeve destê me, lêbelê mes'ûlîyeta wî malî wê li ser me were barkirin.

**Hezretê pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] wan mirovên ku temen û emrê xwe ji înfaqê dûr dibûrînin wiha şîyar dike, ji wan re dibêje:

"*Kurê Adem hema dibêje "malê min û hey malê min" Hey kurê Adem! Ma ji bilî malê ku te xwaribe û xilas kiribe, yan te li xwe kiribe û kevin kiribe, yan jî te wek sedeqe dabe, li pêşîya*

*xwe şandibe ji bo tu sewaba wî qezenc bike, qey te malekî din heye?!*”[240]

**Hezretê Mewlana** di Mesnewîya xwe de çi xweş dibêje:

“*Dema melaîketê mirinê guhê zengînekî ğafil bikişîne [yanî bi standina canê wî] wî ji xewna heyatê şîyar bike, ji bo malekî ku di heqîqetê de ew bi xwe jî ne xwediyê wî bû, ew tirsa ji zayîbûna wî malî ya ku dema zengîn li heyatê bû, dê kenê wî bi xwe jî bi wî bîne..*”

Li gorî rîwayeta **Hezreta Aîşe** -xuda jê razî be- malbata **Resûlê Ekrem** -dirûd û silavên xuda lê bin- mêşinek serjê kiribû. Piştî wî goştê wê li ser gellek kesan înfaq kir, Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] pirs kir; “*ji mêşinê çi maye?*”

Dema Hezreta Aîşe -xuda jê razî be- bersiva wî da û jê re got:

“-Hestîyekî piştmil tenê maye.”

Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got:

“-*Naxwe bibêje; ji bilî hestîyekî piştmil tenê hemû ji me re maye!*”[241]

Bi rastî sermayê esasî yê însên, ew mal e ku wî ji bo xwe li xêr-hesenatan înfaq kiribe û ji xwe re ji bo heyata ebedî kom kiribe.

Ji bo mirov karibe xwe ji têkilîyên fanî û nefsanî û ji malê dinyayê yê ku di rewşa mûsîbetekê de xuya dibe û ahenga dil xirab dike, dûr bike û xwe tevlî wî neke, mirov dikare xwe bi

240. Muslim, Zuhd, 3-4; Tirmizî, Zuhd, 34
241. Tirmizî, Sifatû’l-Qîyame, 35

Feyza comerdî û dîgerbînîyê xwe ji wan xeter û mûsîbetan dûr bigre..

Cenabê Heq Teala bi awayekî taybetî di nav wan îbadetên ku însan di wextê xatir-xwestina ji dinyayê de hesreta wan dikişîne de behsa sedeqê dike û wî haletê rûhî yê ku mirovên ew îhmal kiribin di bûregeha mirinê de dijîn jî wiha eşkere dike, dibêje:

وَأَنْفِقُوا مِنْ مَا رَزَقْنَاكُمْ مِنْ قَبْلِ أَنْ يَأْتِيَ أَحَدَكُمْ الْمَوْتُ فَيَقُولَ رَبِّ لَوْلا أَخَّرْتَنِي إِلَى أَجَلٍ قَرِيبٍ فَأَصَّدَّقَ وَأَكُنْ مِنْ الصَّالِحِينَ.

"**Ji wî rizqê ku me daye we, hinekê înfaq bikin û li cem xwe nehêlin! Beriya ku mirin, were yekî ji we û ji nû ve bibêje: «Xudayê min! Çima te heta demeke nêzîk mirina min neda paş da ku min sedeqe bidaya û ez bibûma ji qencîkaran!»**"[242]

Ji ber vê însan, bi sebeb nemerdî û hezkirina ji dinyayê xwe ji înfaqkirina di rêya Xuda de dûr dike. Naxwe rojekê, dema em hemû serweta xwe ji însanên li dûv xwe re bihêlin, bila em nebin mûflisên axretê ku hesab û ezabê wan tevan li ser xwe bar dikin!..

Lewra xusûsa ka însên mal ji kuderê qezenc kiriye û li kuderê xerc kiriye, li axretê ji bo hesabê mezin ew sûalên pêşî ne. Çawa ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman dike, dibêje:

"*Hîç ti bendeyek, nikare roja qiyametê ji cihê xwe rabe, tevbigere, heta pirs jê neyê kirin ka wî emrê xwe di çi de bûrandiye, wî bi îlmê xwe çi cure kar kirine, wî malê xwe ji kuderê qezenc*

242. Mûnafîqûn, 63/10

*kiriye û ew li kuderê xerc kiriye û wî bedena xwe di çi de perixandiye, yextiyar kiriye..*”[243]

Ha ecdadên me ev hemû heqîqet bi awayekî zehf sipehî îdrak kirine, bi wan ğeyret û failîyetên bilind ên ku di xusûsa înfaqê de şanî dane ji bo tarîxê “**medenîyeteke mezina weqfan**” hedîye kirine. Ew bi hev re ketine pêşbirka karên xêr û hesenatan û di vê pêşbirkê de jî mûessese û weqf damezirandine ku bi wan bersiva her cure îhtiyacên hemû mexlûqat û heyberan bidin. Li kêleka weqf û mûesseseyên xêrxwazîyê li hinek semtên Îstanbûlê **kevirên sedeqan** jî zehf meşhûr in ku wan ev kiribûn ji bo dilê wan kesên ku ji îffet û heya’ya xwe tiştek ji ti kesî nedixwestin, rencîde nekin û wan ji bo parsekî û gerhokîyê mecbûr nekin.

Ji van kevirên sedeqan, bes ew kevirê sedeqan ê li hemberî Daîreya Nîkahê li ser peyarêya li duriyana Caddeya Doğancilara Uskudarê maye. Ew kêm-zêde metreyekê bilind û sih santîmetreyan jî fereh e. Mixabin ji wî pê ve, îro ew bîranînên din ê tarîxî ne li cihê xwe ne.

Hal-hal e ku ev kevirên sedeqan, zemanekî ji bo pêşbirka çi xizmet û xêreke mezin bûbûne şahid. Vêca ewên ku hal û wextê wan di cih de bû ji bo karibin vê cure înfaqê bikin; “*ya ku destê rastê bide, bila destê çepê wê nebîne*” di reş-tarîya şevê de diçûn sedeqên xwe dixistin koncala di patika serê van keviran de.

Piştre feqîrên fezîletmend û bêhnpakên semtê jî diçûn bi qasî îhtiyacên xwe pere ji wir werdigirtin û ji îhtiyaca xwe zêdetir destê xwe nedidan yên din jî. Nexasim ew feqîrên ku digel îhtiyaca wan pê hebû jî li xwe nedinihan persekîyê bikin, di saetên derengên şevê de dihatin cem kêvir û bi qasî îhtiyaca xwe ji wir dirav û pere werdigirtin. Seyyahekî Fransiz ê ku Îstanbûla

243. Tirmizî, Qiyame, 1

sedsala 17'an vedibêje, vê dinivîse; min tam hefteyekê çavdêrî li kevirekî kir, pere li serê hebûn. Lêbelê min ti kes nedît ku hatibe ji wir sedeqe wergirtibe.

Li gorî rîwayetê, li çar alîyên Îstanbûlê kevirê sedeqan hebûn: Li hewşa **Mizgefta Gulfem Xatûn** a Uskudarê, dîsa li **Doğancilar**a Uskudarê, li **Qaracaehmed**ê û li **Qocamûstefapaşa**'yê...

Jixwe melûm e ka Bapîrên Navdarên me çima xizmeteke wiha kirine... Lêbelê di nav her civakê de û di her dewrê de tim û daîm wê ketî û mûhtac hebin. Naxwe divê em vê destûra ha:"**Di malê zengînî de heqê feqîrî heye**."[244] ku di ayetê de hatiye vegotin ji bo dilê xwe bixin şîar û em pêşbirka xêrê ya ku *"ji kevirê sedeqan heta bi weqfan"* dirêj dibe, bidin dewamkirin da ku em heysîyeta hewcedarên bi-îffet biparêzin. Divê em *destên semîmî û bi-îxlasên ku doh geh ji bo danê, geh jî ji bo wergirtinê ji bo kevirê sedeqan dirêj dibûn îro jî mûhafeze bikin... Divê dilê me bi xwe bibe kevirê sedeqan...* Divê hewcedar karibe me wekî hemêza dêyekê germ his bike û ji me nêzîk bibe. Divê em jî wek bendeyekî Rebbê xwe yê ku bi lutf û kerema xwe *"Rezzaq"* e, secda şukrê bibin. Bila endaza dinyewî û uxrewî ya me:

Bi beyana "*Kî ji mirovan re bifeydetir be, ew qenctirînê mirovan e.*"[245]

Xuda Teala ferman kiriye: "**Bibêje: Xudayê min, ji evdên xwe kê bivê, rizqê wî fereh dike û kê bivê jî rizqê wî teng dike. Hûn çi înfaqê bikin. Ewê di şûna wê de ya hê çêtir bide. Lewra ew, çêtirînê rizqdaran e**."[246]

---

244. Li Zarîyat, 51/19; Mearic, 70/24-25'an binêrin.

245. Suyûtî, el-Camîûs-Seğîr, II, 8

246. Sebe, 34/39

Di encamê de ew îbadet û bizavên sipehî yên ku çi di şeklê înfaqê de çi jî di şeklê qerzê hesen de têne kirin di eslê xwe de dîsa mirov dikare bi xêra wan nîmetên ku cenabê Heq Teala ji me re lutf û bexş kirine, bi wan rabe û wan bike. Yanî Ellah Teala wan xêr û hesenatên ku emê bi wan nîmetên ku wî ji bo me lutf û bexş kirine, bikin, ji bo xwe wek deyn û qerzê hesen werdigre. Naxwe ev tecellî ji hêleke din ve, cenabê Heq Teala wan nîmetên ku ji bo me bexş kirine, dîsa bi nîmetên xwe tacdar dike.

Yanî di heqîqetê de Xuda nîmetên bêjimar dane û dide û evdên wî jî wan werdigrin û ji wan îstîfade dikin. Bi vê nêrînê, terefê deyndarê eslî, însan e û yê ku deynê xwe wergire jî cenabê Heq Teala ye.

**Hezretê Mewlana** ferman dike, dibêje:

"*Yên ku li erd û asîmanan hene, her tiştî ji Wî dixwazin. Lewra hemû hebûnên xwe ji Wî re deyndar in*."

Di vê meydanê de nemaze însan; li hemberî çendîn îkram û îhsanên îlahî yên bêjimar ku Xuda jê re bexş kirine, ji cenabê Heq Teala re deyndar e. Lewra ew bi kerema Xuda gihaye sifetê eşrefê mexlûqatan, dîsa ew ji bo nîmeta îman û îslamê bûye mezher, ew gihaye lutf û kerema ku ew ji bo Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bûye ummet. Ji bilî vê jî, her dil, ji Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re deyndar e, ji ber ku ew wesîleya aferandina wî û di rêyên ebedîyetê de jî tekane rêzanê hîdayetê ye. Însan ji eshabê kîram û hemû mezinên îslamê re deyndar e. Lewra wan wekî stêran ew îbadet, mûamelat, mûkemmelîyeta bizavan û sipehîtahîyên zahirî û batinî yên ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji însanîyetê re hedîye kirine, eshabê wî ew hemû ji bo dilan dane xuyakirin. Însan ji dê-bavên xwe re deyndar e, ji malbata xwe re jî qerzdar e.

Edakirina van deynan jî, bi vê mûmkin e; em bijîn her wekî ku Qur'aneke zindî bin, ew jî ji rêya ku em sifetên Ellah [celle celalûhû] û exlaqê Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji xwe re bikin exlaq û em gav bavêjin alema wusletê her wekî guleke ku di keş û hewaya Sunneta Senîyye de şîn dibe. Ji bilî vê jî şukr-kirina ji Xuda re jî di stûyê her evdekî de deyn e.

Divê were zanîn ku li hemberî ev qeder nîmet, lutf û îhsanên bêjimarên cenabê Heq Teala jî, heke dil li derveyê rizamendîya wî, yanî di xefk û kemînên nefsanî û fanî de werin zîyankirin, însanîyet wê destpê bike şeref û heysîyeta xwe jidest bide. Ew mirovên ku li derveyê pîvan û endazên îlahî yên wiha dijîn û sipehîtahîyên berwext di çavên xwe de mezin dikin, ewê tim û daîm ji nizmahî û ketinan re teslîm û ram bibin. Bi vê nêrînê, ew sirra "**ehsenê teqwîm** [xulqîyeta sipehîtirîn]"a di rasteqîneya xwe de jibîr dikin, dikevin rewşa wan rebenên ku ji heyber û mexlûqatên ji xwe nizmtir, feqîrtir, mûhtactir û nekartir deynan dixwazin. Di netîcê de ew, cewhera xwe ya ku haya wan jê nîn e, dibin helak û nemanê. **Hezretê Mewlana** -quddîse sirûh- heta tu bibêjî bes, li halê mirovên wiha şaş dimîne û di bara wan de wiha dibêje:

"*Ev çi tişteke ku mirov lê heyirî bimîne lo? Ma taveroj, ji zerreyekê deyn dixwaze? Ma stêra Zuhre, ji kûpekî biçûçik şeraba sor dixwaze?*"

"*Tu rûhek î ku nayê zanîn ka ew çi ye, tu cinsek î ku bi maneya tam sifetê wî nayê zanîn. Tu ji bo alema keyfîyet û sifetan hatî hebskirin. Tu taverojek î, lê te xwe bi benekî girtiye û wilo mayî; ğebîneta te!...*"

Hezretê Mewlana, di van malik û beytan de însên dişibihîne taverojeke manewî. Alem jî dişibihîne zerreyan ku ew bi ronahîya wê taverojê diberiqînin, xuya dibin û dilerizin. Naxwe ku însan,

wergirtina feyzê ji Xuda nehizire, li dinyayê bi dûv zewqên fanî bikeve û li şadmanîyê bigere, ji vê cîhetê ve, deyn-xwestina taverojê ji zerreyan temsîl dike. Çawa çêdibe ku taveroj ji zerreyan re hewcedar be?

Rûhê însên jî, bi îfadeyeke Qur'anî ya ku cenabê Heq Teala ferman kirî "**min ji rûhê xwe têde pif kiriye**"[247] nûreke rebbanî ye. Feqet pirranîya mirovan bilindahî û qîmetê rûh nizanin û ji heqîqeta wî bê xeber dijîn. Evên ha, nîmeta ezîz û mûqeddesa ku ji wan re hatiye bexşkirin û wî emanetê îlahî, ji bo zewqên maddî û fanî feda dikin û sade jîyana di plana çerm û ten de ji bo wan sewda ye. Ew ketine dehlîz û gerîneka ğezeb, şehwet, şohret û zewqên cismanî. Ew ji bo xurekên nefsê û keyf û şahîyan bûne meftûn. Her wekî ku taveroja maneyê, li pey bûyereke semawî çûbe û bi "uqdeya zenb" [benê gunehan] ve hatibe girêdan, hatibe girtin û êdî nikaribe şewq û ronahîya xwe biweşîne.

Her evdê di vê rewşê de be; divê merteba xwe bizane! Ji nîmetên bêjimarên ku Xuda jê re lutf kirine, bi taybetî ji sirra "**ehsenê teqwîm**" xeberdar be! Divê ew ji zewqên berwext û bi ti awayan nayên tetmînkirin re êsîr nebe! Divê ew di arzûyên nefsanî û yarên fanî de li keyfxweşîyê negere! Divê ew di xwe de, di dilê xwe de li her tiştî bigere!

**Welhasil**, berîya ku em bi awayekî cebrî [bi zorê] ji dinyayê werin deranîn, divê em bi lutfa Rebbê xwe, bi selametîya îmanê û bi îradeya xwe di hazirîya derketina ji bo rêwîtîya uqbayê [axretê] de bin..

**Ya Rebbî! Ji deryaya kerema xwe ya ku perava wê nîn e, parekê bide qelbê me! Bi fezîleta qerzê hesen û îbadetê înfaqê yê ku te ew ji bo xwe û zatê bilindê xwe teleb kiriye, keremê**

247. Li Sad, 72; Hicr, 29'an binêrin.

**li me bike! Ji bo me tevan, edakirina berpirsîyên me û edakirina hemû qerzên maddî û manewî yên li ser me, hêsan bike! Ji bo me guhekî ku karibe feryad û fîğanên bêdengên sêwî, hewcedar û biteneyan seh bike û dilekî ku hest bi wan bike, îhsan bike!**

**Amîn!..**

# Di Mûnasebetên Îctîmaî De Deyn û Deyndarbûn



*Wekî fezîletên îslamî yên dîtir, em mecbûr in îbadetê deyn-danê jî bidin jîyandin. Sibê, dema em ji bo îqametgeha baqî werin guhastin, ne firsendeke wiha di dest zengînî de, ne jî di dest mûhtacî de îhtiyaceke wiha dimîne. Naxwe ewên ku rewşa wan mûsaid be, bila bi hinek behaneyan terka îbadetê deyn-danê nekin, li hemberî vê jî bila ew kesên ku deynan werdigirin jî desttengîyên curecur ji xwe re nekin behane û edakirina deynên xwe îhmal nekin, bila ew xwe ji xirabkirina vî îbadetê bi-fezîletê îctîmaî, biparêzin..*

# Di Mûnasebetên Îctîmaî De Deyn û Deyndarbûn

Kîjan emelê sipehî dibe bila bibe, sipehîtîya eslî ya wî emelî, li cem tetbîq-kirina wî ya di netîca îxlas, mûkemmelîyet û gihanê de xuya dibe. Ji ber vê ye ku Xuda Teala di ayeta pîroz de dibêje:

وَأَحْسِنُوا إِنَّ اللَّهَ يُحِبُّ الْمُحْسِنِينَ.

"... [Di her hal û karên xwe de] **Bi awayê sipehîtirîn bikin! Hîç şubhe nîn e ku Xuda, ji mûhsinan hez dike**."[248]

Naxwe her kirina sipehî, bizav, peyv, îbadet û her wiha ne yên din jî ku têne pêşnîyarkirin û li meydanê têne danîn, divê di nav pîvan û endazên bilindahî û mûkemmelîyeta ku sipehîtahîya di wan tevan de heye di heyatê de bide xuyakirin û divê ew tev jî bes ji dil sadir bibin.. Heke na, bizav û îbadetên ku sipehîtirîn dihatin zenkirin jî, dibe ku di ger û dehlîzên nefsê de perîşan bibin û bi zirar û xisarê bi encam bibin.

Hîç şubhe nîn e ku endazên hûr û hessas di bara **deyn** û **deyndarbûn**ê de yek ji mûhîmtirîn wan karûbaran û meseleyan e ku heta tu bibêjî bes, rîayetkirin û li ber çavan girtina vê heqîqetê zerûrî ye. Lewra berdewamîya îbadetê deyn-danê bi rîayetki-rin û li ber çavan girtina prensîpên mecbûrî yên ku ji bo herdu terefên deyndan û deyn-wergirtinê pêbend e ku ev jî, kehnîyên fezîletê yên di rûh û gîyanên wan de dicoşînin û çendîn dilên hişk di deryaya mehebbet, dîgerbînî û comerdîyê de kom dikin.. Her wiha em digihin menzûmeya bizavên ku ji bo qezenckirina rizamendîya cenabê Heq Teala dibin wesîle. Bi kurtasî ew me

248. Beqere, 2/195

digihînin exlaqê bilindê ku heta dilê melaîketan jî dibijîyê û ew pê şad dibin. Ji bo dan xuyakirina vê heqîqetê, ev hedîsa şerîfa ku Ebûhûreyre -xuda jê razî be- ew rîwayet-kirî zehf îbretamîz e:

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] behsa kesekî dike. Wî di zemanê Benû-îsraîlîyan de ji kesekî hezar dînar deyn xwestibû. Ew kesê ku deyn jê hatibû xwestin jî jê re gotibû:

"-Şahidên xwe ji min re bîne, ezê di hizûra wan de bidim te, bila ew bibin şahid!"

Ewê ku deyn xwestibû jî jê re gotibû:

"-Wek şahid Xuda bes e!"

Ewê ku deyn dide jî jê re gotibû;

"-Naxwe ji bo vê kefîl bîne!"

Ewê ku deyn xwestibû jê re gotibû:

"-Wek kefîl Xuda bes e!"

Ewê ku deyn dide jê re gotibû:

"-Te rast got!" û ji bo wadeyeke diyarkirî pere dane wî.

Ew zilam ji bo rêwengîya behrê derket û îhtiyaca xwe temîn kir. Paşê ew li gemîyekê gerîya ji bo deynê xwe di wê wadeya ku li hev kiribûn de bi şûn de bide xwediyê deyn, lêbelê wî gemî peyda nekir. Vêca wî di nav bêçaretîyê de rahişt perçekek êzing û nava wî neqirand û qul kir. Wî hezar dînar û mektûbek bi hev re xistin nav devera niqirandî. Wî têde bi xwediyê deynan re xîtab dikir û rewşa xwe jê îzah dikir. Paşê devê qula wê girt û rast kir. Paşê jî ew hate ber peravên behrê û wiha got:

"-Ey Xudayê min! Tu dizanî ku min ji filan kesî hezar dînar deyn sitandibû. Dema wî şahid ji min xwestibû, min jê re gotibû: "Wek şahid Xuda bes e!" Ew jî bi şahid girtina te razî bûbû.

Dema wî kefîl ji min xwestibû, min jê re gotibû: "Wek kefîl Xuda bes e!" Ew jî bi kefîltîya te razî bûbû. Ez jî vêga ji bo gemîyekê bibînim ğeyret dikim lêbelê min gemî peyda nekir. "Ez wê ji te re dikim emanet!" û ew perçê êzing avêt nav behrê. Ew êzing jî di behrê de avjenî kir û çû heta ji ber çavan nependî û winda bû.

Ev zilam, piştre ji wir çû û bi berdewamî li gemîyekê gerîya ji bo wî ji wir bibe.

Di vê navberê de ew kesê ku deyn dabûyê jî, çavnêrî li rêya gemîya ku dê pereyên wî jê re bîne, dikir. Gemî nehatibû, lêbelê wî ew perçê êzingê ku pereyên wî di qula wî de bûn, dît. Wî rahişt wî perçê êzingan ji bo bibe malê û wî bişewitîne. Dema wî ew bi birrekê perçe kir, bi pere û mektûbê re rûbirû bû.

Piştî mideteke ew zilamê ku deyn sitandibû jî [gemîyek dît û] hate welatê xwe. [Li ser îhtîmala ku dibe xwediyê deynan hîn deynê xwe wernegirtibe derhal] rahişt hezar dînaran û hate cem xwediyê deynan û jê re got:

"-Ez bênavber li gemîyê gerîyam ji bo pereyên te ji te re bînim. Lêbelê min berî vê gemîya ku ez vêga pê hatime, gemîyeke din peyda nekir."

Deynxwaz jê pirs kir, jê re got:

"-Ma te tiştin ji min re şandibûn?

Deyndar jê re got:

"-Min berê ji te re gotibû; min gemî peyda nekir."

Deynxwaz jê re got:

"Hezretê Ellah Teala ji ber te ve di qula perçekekî êzing de pere ji min re şandine [yanî li hemberî îxlasa te cenabê Heq Teala wek kefîlê te pere gihandine min. Naxwe ev hezar dînarên ku te

vêga anîne ji te re man. Bi vê wesîlê di nav hizûr û aramîyê de] tu gihayî pereyên xwe û vegere here.” [Buxarî, Kefalet, 1; Buyû‘, 10]

Di vê hedîsa şerîf de vê heqîqetê şanî dide ku çawa ew soza ku li ser navê Xuda hatiye dayîn û ew semîmîyeta mûdhîşa di ğeyret û hewla bicih-anîna wê de ji terefê cenabê Heq Teala ve meqbûl û mehfûz e. Ev jî şanî dide ku di mesela werdigre-dide de divê mirov di nav têgihiştin, îxlas û hevkêşîyeke dualî de bin. Heta ku sûaîstîmal [bikaranîna xirab] nekeve nav kar, Xuda bi rehma xwe bi herdu alîyan re mûamele dike. Ev qisseya tije hikmeta ku vê heqîqetê dide xuyakirin jî çi îbretamîz e:

Wextê îftarê nêzîk bûbû. Zatekî ku esilzadetî ji sîmayê wî ve dixuya, xweşdivî, ezmûndar û bextiyar hate ber derê firinekê. Ew ji firinê nêzîk bû. Piştî qerebaliğ û elêlat ji hev belav bû çû, wî ji firinçî re got:

“-Ewladê min, min îro nefeqê xwe temîn nekir. Tu çaryeka nanekî didî min ku heke ecel neyê min ezê sibê heqê wî bidim te?”

Dengê wî hejîyabû û çehreya wî jî sipûsor bûbû. Firinçî jê re got:

“-Bavo, ev çi gotin e; çaryeka nanekî çi ye, ezê nanekî temam bidim te. Ji te re helal be, pere jî ne hewce ne.”

Lêbelê dîsa jî wî şexsê ğerîb jê re got:

“-Na kurê min, çaryeka nanekî têra min dike... Belkû sê feqîrên din jî werin. Hem jî ez bes dikarim bi qasî çaryekekê ava rûyê xwe biqetînim. Ez neşêm jê bêhtir tehemmul bikim. Ji bo wergirtina çaryekê jî şertê min ev e, ezê sibê deynê xwe bînim ji te re pêşkêş bikim.”

Firinçî bi awayekî heyirî çaryekek nan dayê. Wî zilamî nan maç kir û rahiştiyê, bi gavên hêdî hêdî û bêpêjin ji wir cuda bû û çû. Ji wir biwêdetir, li serê goşê kûçikek derket pêşîya wî. Bi çavên lavlavkirinê wekî ku birçîbûnîya xwe jê re vebêje li yextiyarî dimeyzand. Wî zilamê mûbarekê nûranî ji xwe re got:

"Qey nîvê wî nesîbê te bû!" nîvê çaryek-nanê xwe da wî seyî. Paşê jî ber bi mizgeftê ve meşî. Wî bi luqmekek nanê bi xwe re mayî û bi çend qurt avên bi xwe re îftara xwe kir. Wî ji bo Xudayê ku ev nîmet jê re bexş kiribûn, şukr kir.

Roja piştre dikandarekî jê re got:

"Bavo, meşkên me ji vê çeşma hemberî me tije bike, piştre jî van tiştên ku nû hatine bikişîne hundur!" û di hemberî vî karê wî de jî yek lîra dayê.

Ew zilamê ğerîb, derhal bilezûbez çû firinê û heqê çaryeka nên 25 qurûş ji xwediyê wê re pêşkêş kirin. Heke çi qeder firinçî nexwestibe raje wan jî li hemberî tika û ricaya wî zatê nûranî hew xwe girt; bi çavên kelegirî mecbûr bû ku heqê çaryeka nên qebûl bike.

Ha wekî ku di vê mîsalê de jî wisan e, kesê ku bi semîmîyet deyn wergirtibe û nîyeta dana deynê xwe jî bike dilê xwe, Xuda Teala edakirina deynê wî jê re hêsan dike. Heke deyndar li hemberî desttengîyan sebr bike, nekeve sûaîstîmalê û bi îxlas ğeyret bike ku deynê xwe ji stûyê xwe eda bike, Xuda Teala bi qasî rêjeya vê ğeyreta wî rêyeke hêsankirin û ji navê derketinê jê re îhsan dike.

Di vê meydanê de kesê ku li ber destê wî mal hebe, wî nefiroşe û deynê xwe nede berpirs û mes'ûl dibe. Yanî heke deyndar ti çareyekê nebîne, bila îmkan û emlakên zehf ne heyatî yên xwe bifiroşe û bi wan jî deynê xwe bide. Heke mirovek hem

deyndar be, hem jî jîyana xwe di nav luks û îsrafê de jî berdewam bike, di encamê de jî nikaribe deynê xwe bide, ev hal û rewş, berpirsî û binpêkirina heq evd têde heye, naxwe ew jê mes'ûl e. Divê deyndar di xerckirinên xwe de hinek tiştan ji xwe kêm bike, bi taybetî jî xwe ji mesrefên zehf biparêze û heta deynê xwe bide jî, ji diranên xwe û neynokên xwe zêde bike û ji bo heqê deynxwazê xwe rîayet bike.. Heke ew wiha nebe û karên nefsanî jî tevlî wî îşî bibin, rehma îlahî ji navberê radibe û heqê evd li serê tertîb û carî dibe ku ev jî xusûseke wisan e ku cenabê Heq Teala wê efû nake. Yanî wekî ku ev ayeta ha: "**Bêşiwar Xuda tobê qebûl dike..**"[249] jî îşaret dike, cenabê Heq Teala xwediyê efûkirinê ye, heqê evdan li derveyê vê efûyê dihêle. Li alîyê din, ewê ku deynê xwe dereng dixe û di wadeyê wê de nade, naxwe wî heramî tevlî xureka xwe kiriye. Vêca jixwe bi nîyeta nedanê ketina bin deynan, felaketeke mezina axretê ye. Ewê ku gunehekî wiha kiribin, dikevin ber wê xetera ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa xwe de wiha beyan kiriye, gotiye:

"*Kî bi qesda nedanê bikeve bin deynan, ew wek diz tê hizûra Xuda*."[250]

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîseke din de jî giringîya vê mijarê li cem Heq Teala bi awayekî zehf bariz û eşkere wiha îfade dike, dibêje:

"*Kî bi nîyeta danê malekî ji însanan wergire jî Xuda yê deynê wî bide [dana deynê wî jê re hêsan bike]. Kî jî bi nîyeta telefkirinê malê xelkê wergire, Xuda hê li dinyayê malê wî telef dike*."[251]

---

249. Li Şûra, 25; li Tewbe, 104'an binêrin.
250. Îbnûmace, Sedeqat, 11/2410
251. Buxarî, Îstiqraz, 2

Di xusûsa deynan de ev tewsîye û tetbîqata Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] çi nimûneyeke sipehî ye:

Dema **Mezinê me** [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji Ğezwa Zaturrîqaê vedigerîya, bi **Hezretê Cabir** -xuda jê razî be- re sohbet dikir. Dema jê hîn bû ku ew hê nû zewiciye û deynên wî jî zehf in, jê pirs kir; te çi mal heye?. Wî jî jê re got; min hêştirek tenê heye. Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo wî ji deynên wî xilas bike, ji Cabir xwest ku ew wê hêştira xwe bifiroşe wî. Bazara wê hate kirin. Dema mezinê me giha Medînê heqê wê dayê û hêştira Hezretê Cabir jê kirrî. Dema ew hatin gihan Medînê jî Hezretê Cabir -xuda jê razî be- hêştira xwe jê re anî û pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî ew heqê ku hatibû tesbîtkirin dayê. Piştî girêbesta kirrîn-firotinê xilas bû, Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew hêştir ji Hezretê Cabir re hedîye kir. Vê zerafet û vî exlaqê bilindê ku ti kes nikare xwe bigihîne gwîzeka wî, ew qeder misliman hestgerm kirin ku ew rabûn ji wê şeva ku ev hadîse têde çêbûbû re gotin; “**leyletû’l-be‘îr**” [şeva hêştirê]. Di wê şevê de ji bilî vê jî Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo Hezretê Cabir tam bîst û pênc caran îstiğfar kir.[252]

Hezretê Cabir -xuda jê razî be- dibêje:

“Ez di rê de li cihûyekî rast hatim. Min ev hadîse jê re vegot. Ew jê şaş û metel ma û destpê kir ji min re got: Ma wî hêştira te ji te kirrî, piştre perê wê dan; paştir jî dîsa ew ji te re hîbe kir? Min jî jê re got: Erê, eynî wilo.”[253]

252. Riyadûs-Salihîn, c. I, rûp. 104-105

253. Îbnû-hecer, Fethû’l-Barî, 5/317

**Hasilê kelam**; di çarçoveya vî exlaqê xweş û bilind de divê em van hûrenuqteyan fehm bikin:

1. Divê deyndar mal û îmkanên di dest xwe de mewcûd bifiroşe û di firsenda pêşîn de deynê xwe eda bike.

2. Ewên ku rewşa wan mûsaid be, bila arîkarîya deyndarî bikin.

3. Bila ji bo deyndarî îstiğfar û dûa werin kirin.

❁

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîf de dibêje:

"*Heke Xuda nîmetekê bide evdekî xwe û wê bi awayê sipehîtirîn jê re temam bike, piştre îhtiyacên însanan ji wî re hewale bike, ew jî ji vê reht [nerehet] bibe, ew dibe ku wî bi xwe ew nîmeta xwe ji bo zewalê avêtiye...*"[254]

Rojekê, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji eshabê kîram pirs kir, ji wan re got:

"-*Hûn zanin ka mûflis kî ye*?"

Çi dema eshabê kîram gotin:

"*Mûflis, di nav me de ew kes e ku perê wî nîn in û malê wî jî nîn e.*" Vêca pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] [di bersiva wê şiteğalîya wan de] axaftina xwe wiha berdewam kir, got:

*"Ji nav ummeta min mûflis ew kes e ku roja qiyametê bi sewaba nimêj, rojî û zekatê tê; [lêbelê li cem van sewaban di deftera emelê wî de van jî dinivîse, dibêje;] wî sixêf kirine vî, wî*

254. Mûnzirî, et-Terğîb, 4/170

*bêbextiya zinayê xistiye stûyê vî, wî malê vî xwariye, wî xwîna vî rijandiye û wî li vî daye.. Ji sewaba hesenatên wî ji bo van û wan [xwedî heqan] tê dayîn. Heke berî deynên wî werin dayîn sewaba îbadet û qencîyên wî xilas bibe, ji gunehê xwedî heqan tên wergirtin û li ser wî têne barkirin. Piştre ew [bi gunehên wan re] di Cehennemê de tê werkirin û avêtin.*"[255]

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîseke dîtir de jî wiha dibêje:

"*Ew kesê ku dînarek, yan jî bi qasî dirhemekê deyn lê be û bimre, deynê wî ji xêr û hesenatên wî têne edakirin. Li wir [li meydana mehşerê], ne dînar hene, ne jî dirhem..*"[256]

Ji vê hêlê ve pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman kiriye, gotiye; çi kesê ku di serî de jî deyn lê hebin, yan jî heqê evdan lê hebe, bila ew û mûxatebê xwe hê li dinyayê li hev helak bikin.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di vê xusûsê de ferman dike, wiha dibêje:

"*Çi kesê ku li hemberî birayê xwe bi sebeb irzê, yan jî tiştekî din heq li serê hebe, berî ew roj [qiyamet û hesab ji hev-pirsînê] were ku têde dînar û dirhem nîn in, bila hê li vir, li hev helal bikin. Heke na, ew roj heke emelekî salih ê wî hebe, bi qasî wê zulimê jê tê standin. Heke hesenatê wî nebin, ji gunehê hevalê wî tên wergirtin û li wî têne barkirin.*"[257]

Tabîî ev li hev helalkirin, di cewhera xwe de li ber çavan girtina û rîayetkirina heq û hiqûqê deynxwazan, deyn nehiştina

---

255. Muslim, Birr, 59; Ehmed bin Henbel, II, 303, 324, 372
256. Îbnûmace, Sedeqat, 12/2414
257. Buxarî, Mezalim, 10, Rîqaq 48; Tirmizî, Qiyame 2

axretê û edakirina wî hê li vê dinyayê ye. Tetbîqata Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî wiha ye. Dema cenazeyekî deyndar dianîn pêşîya wî ji bo ew li serê nimêj bike, wî li ser wî cenazeyî nimêj nedikir. Lêbelê heke deynê wî bihata dayîn, ew ji bo îmametê diçû pêş.

**Ebûqetade** -xuda jê razî be- vedibêje:

Cenazeyê zilamekî ji Resûlûllah dirûd û silavên xuda lê bin re anîn ji bo li serê nimêj bike. Lêbelê Mezinê me -dirûd û silavên xuda lê bin- got:

"*-Deyn li wî hene, hûn nimêja hevalê xwe bikin!*"

Min got:

"-Ya Resûlellah! Bila deynê wî li min bin."

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got:

"*-Ma bi sedaqet?*"

Min got:

"-Bi sedaqet!"

Vêca pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li ser wî cenazeyî nimêj kir.[258]

Ha pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di nav hessasîyeta van endazan de ferman kir, got:

"*Di nêrîna Ellah Teala de di piştî wan gunehên mezinên ku wî qedeğe kirine de yek ji gunehên mezintirînê ku evd dikare bi xwe re bîne, ew e ku ew deyndar bimre û bi qasî edakirina wî tiştekî jî li pey xwe nehêle.*"[259]

258. Tirmizî, Cenaiz, 69; Nesaî, Cenaiz 67

259. Ebûdawud, Buyû‘, 9

Heke em bi kurtî wan xusûsên ku mirovên deyn werdigrin û yên deyn didin jî lê diqqet bikin, emê wiha bibêjin:

Kesê ku deynan dide, bila li van xusûsan miqate be:

1. Divê ew sirf ji bo rizamendîya Xuda, rakirina tengasîyê ji ser birayê xwe yê mûmîn ji xwe re bike ğaye.

Di hedîsa şerîf de hatiye gotin:

"*Kî îhtiyaca mûminekî xwe bide temînkirin, Xuda jî yê îhtiyaca wî bide temînkirin [yê arîkarîya wî bike]. Kî ji derd û kedera mislimanekî re bibe çare [wî bigihîne keyfxweşîyê], Xuda jî bi wê sebebê, yê diltengîyekê ji diltengîyên qiyametê ji ser wî bibe [yê wî bigihîne keyfxweşîyê.]*"[260]

2. Divê ew ti menfîeteke dinyewî û nefsanî tevlî deyn neke.

3. Divê heta ji dest wî were hêsankarîyê nîşan bide; bi taybetî jî dema deyndar bi awayekî jidil û semîmî hewl bide deynê xwe bide; lêbelê ew di vê xusûsê de biser nekeve, hingê bila ew mohletê bidiyê.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîfa xwe de ferman dike, wiha dibêje:

"*Kî mohletê bide deyndarekî, ji bo her rojê sewaba sedeqekekê qezenc dike. Kî piştî ku wadeya deynê wî were [ji deyndarê xwe re] texîr bike, heta ku ew texîr bike, ji bo her roja ku dibûre [bi qasî malê xwe yê ku wê wergire],sedeqe qezenc dike.*"[261]

"Melek hatibû cem yekî ji yên ku berî we jîyane da ku qebda rûhê bike. Melek jê pirs kir:

"-Ma te ti xêrek kiriye?"

---

260. Buxarî, Mezalim, 3; Muslim, Birr, 58

261. Îbnûmace, Sedeqat, 14/2418

Wî bersiva wî da, jê re got:

“-Ez nizanim.”

Jê re hate gotin:

“-De ka bifikre [belkû were bîra te].”

Wî zilamî got:

“-Tiştek nayê bîra min, lêbelê dema ez li dinyayê bûm, min bi însanan re kirrîn-firotin dikir. Min di van mûamelên xwe de ji bo mirovê zengîn mûddetê deyndanê dirêj dikir û ji bo mirovên feqîr jî [di karê deyndanê de mûsameha û bi awayê lêborîna li hinek kêmasîyên wî] hêsankarî nîşan dida.”

Xuda [bi sebeb vê qencîya wî] ew xiste Cenneta xwe.”[262]

4. Heke hal û wextê wî di cih de be, li hemberî vê mûxatebê wî jî zehf feqîr û ğerîban be, bila deynê ku dayîyê di cihê sedeqê de bijimêre.

5. Divê deyndarê xwe rencîde neke. Bila bi mûcibê destûra di vê hedîsa şerîf de:

“*Mirovê li hemberî wî çi bide çi jî nede, kesê ku heqê xwe bixwaze, bila di nav tixûbên îffetê de heqê xwe bixwaze.*”[263] bizaveke sipehî û camêrane nîşan bide.

Çawa ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîseke şerîfa dîtira xwe de jî ferman dike, wiha dibêje:

“*Xuda bi rehma xwe, bi yekî ji yên ku berîya we jîyane re mûamele kir. Lewra vî zilamî, dema difirot û dema dikirrî hêsan-*

262. Buxarî, Buyû‘, 17-18; Muslim, Mûsaqat, 26-31

263. Îbnûmace, Sedeqat, 15

*karî nîşan dida, dema deynê xwe dixwest jî [ne bi hovîtî, lê bi têgihiştin] hêsankarî nîşan dida.*"[264]

Li hemberî van şîretan jî divê deyn-wergir jî li van hûrenuqteyên jêrê diqqet bike:

1. Heta ku zehf ne zerûrî be, bila nekeve bin deynan.

2. Lêbelê bila ew li hemberî zerûretên heyatî û bi qasî miqdarê kîfayetê deynan bike.

3. Bila mesrefên luks û îsrafê neke.

4. Bila ew di nîyeta deyn-edakirinê, ğeyret û hewldana xwe de jidil û semîmî be.

5. Bila deyndar nîyeta baş û bizava sipehîya deynxwazî sûaîstîmal neke. Lewra ewên ku wiha tevdigerin, ji bo hewcedarên rastîn jî dibin asteng, nahêlin ew jî karibin deyn ji xwe re peyda bikin, bi vî awayî ew zirarê didin dîgerên xwe.

6. Bila ew miqdarekî wilo deyn wernegire ku ew bibe sebeb ji bo deyn qîmetê xwe winda bike. Nexasim di deynên wade dirêj de bila ew bi awayekî wilo deyn bike ku ew qîmetê xwe winda neke. [Lêbelê heke ew kesê ku deyn dide wî mûsamehaya xusûsîya wî hebe, hingê ğem nake].

7. Bila ew di deyn-danê de wextê xwe texîr neke. Nexasim dema kesê deyndar îmkanên wî hebin û karibe deynê xwe eda bike, hingê bila tam di wextê xwe de deynê xwe eda bike. Heke îmkanên wî ne mûsaid bin jî, hingê bila uzrê xwe ji deynxwazê xwe re beyan bike û mohletê jê bixwaze.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa xwe de ferman dike, wiha dibêje:

264. Tirmizî, Buyû‘, 75

"*Kesê zengîn ê ku karibe deynê xwe bide û deyn-dana xwe texîr bike, zulm e.*"[265]

8. Bila ew bi ti awayan, deynê xwe nehêle axretê.

Lêbelê digel ku ew li van hemû endazan diqqet dike jî, heke dîsa ji bo sebebên zerûrî deynê xwe nede û wilo întîqal bibe, here alema axretê. Di van her sê rewşan de cenabê Heq Teala bi xwe bûye kefîl ku ji ber wî ve deynê wî eda bike.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîfa xwe de ferman dike, dibêje:

"*Bêşiwar dema xwediyê deyn dimre, deynê wî roja qiyametê jê tê standin. Lêbelê ew kesê ku ji ber van her sê sebeban ketibe bin deynan li derveyê vî hukmî ye:*

*1. Ew zilamê ku qeweta wî di rêya Xuda de [di cengê de] zeîf bibe, ew jî deynan dike ji bo li hemberî dijminên Xuda û dijminê xwe bi qewet bibe.*

*2. Ew zilamê ku mislimanek li cemê dimre, perê wî nîn in ku wî kefen bike û defin bike, vêca ew bi vê meqsedê deyn dike.*

*3. Zilamek bi sebeb ezebtîyê li hemberî Xuda ji nefsa xwe hest bi tirsê dike. Bi endîşeya ku zirar wê ji dînê wî re were [deyn dike û] dizewice.*

*Ha Xuda Teala bi xwe roja qiyametê, deynê van kesan ji ber wan ve dide.*"[266]

Hîç şubhe nîn e ku ji terefê cenabê Heq Teala bi xwe ve roja qiyametê edakirina van deynan, ew qatbiqat bi zêdekirina sewabê ji bo xwediyê deyn dibe, hem jî bi comerdîya axretê, ev

265. Buxarî, Îstiqraz, 12, Hewalat 1-2; Muslim, Mûsaqat 33
266. Îbnûmace, Sedeqat, 21

heqdesteke ku hîç zayî nabe û qezenceke ebedî ye... Hemberîyeke wiha jî bêşiwar ew ji bo xwediyê deynan mûkafateke ji xezînan jî bi qîmettir e.

Lêbelê helbet ketina deynxwazî, yan jî neketina wî di nav van wesfên ku di hedîsa şerîf de hatine jimartin, di vê xusûsê de wê mûhîmtirîn faktor û amil be. Heke di deyn de ti sûaîstîmal bibe, ku şexs wan di rêya Xuda de, yan ji bo mislimanekî birayê xwe yê din, yan jî ji bo zirar neyê ser dînê wî, wê ji bo nîyeta zewacê jî xerc bike, dîsa ew jê berpirs e û ku roja qiyametê be jî ewê her deynê xwe bide..

Ji ber vê, bi çi sebebê dibe bila bibe, ewê ku deyn wergirtibe, divê ew bi deynê ku têra wî dike bes bike û divê ew her di nav ğeyret û hewldanê de be ji bo deynê xwe ji stûyê xwe eda bike. Bila xwediyê deyn jî wekî ku li fezîleta deyn-danê fezîleteke din jî îlawe dike, li hemberî deyndarê xwe di nav bêhnferehî û mûsamehayê de bibe..

Di xusûsa deyn de, divê mirov wilo bifikre ku hem rewşa xwediyê deyn, hem jî rewşa deyndarî raçav û hêsan bike. Lewra parastina heqê xwediyê deyn, mûhîmtirîn kartêker e ku berdewam-kirina vê bizava sipehî temîn bike. Heke na, di cemîyetê de wê berdewamîya fezîleta deynan ne mûmkin be.

Di xusûsa raçavkirin û parastina rewşa xwediyê deyn de ev hedîsa şerîfa ha, zehf îbretnak e:

“Zilamek hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], deynê xwe jê xwest. Dema wî ev kir jî hinek peyvên hovane û ne layiq ê ku bi nezaketê re nabin, serf kirin û gotin. Ji ber helwesta bêedebane ya zilamî li hemberî Resûlûllah, eshabê kîram xwestin heddê wî jê re bidin zanîn. Feqet pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji wan re destûr neda û ji wan re got:

"-*Dev jê berdin! Lewra xwediyê deyn, heta heqê xwe wergire, ji bo wî heqê peyvê li ser deyndarî heye*."[267]

**Ebûseîd el-Xudrî** -xuda jê razî be- jî mîsaleke dîtira vê bûyerê wiha vedibêje:

"Bedewîyek hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] deynê xwe ji Mezinê me xwest û dema wî ev kir jî ew tund tevgerîya. Heta got:

"Heta tu deynê xwe nedî, ezê her berdewam te aciz bikim."

Eshabê kîram li erza wî bedewîyî dan û jê re gotin:

"-Xwelî li te be! Di her hal û karî de tu nizanî ka tu bi kê re diaxivî!"

Zilamî got:

"-Ez heqê xwe teleb dikim."

Resûlê Ekrem [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji eshabê xwe re got:

"-*Hûn çima ne li alîyê xwediyê heq in?*" Piştre ew zilam şand cem Xewle bint Qeys -xuda jê razî be- û jê re got:

"-*Heke xurmên hişk li dev te hebin, bi deyn bide, deynê me bide, dema xurmeyên me werin, emê deynê xwe ji te re eda bikin*."

Xewle'yê jî got:

"-Ser seran û ser çavan! Bila bavê min bi gorî te be, ya Resûlellah!"

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] deynê xwe ji bo wî yê bedewî eda kir. Ji bilî vê, xwarin jî jê re îkram kir. Ewê

267. Buxarî, Îstiqraz, 7; Muslim, Mûsaqat, 118-122/1600-1601

bedewî [ji vê helwestê memnûn bû] memnûnîyeta xwe îfade kir û wiha got:

"-Te, deynê xwe sipehî eda kir. Bila Xuda jî mûkafata te tam bide!"

Vêca mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got:

"*-Ha ev [ên ku deynê xwe tam bi heqî eda dikin] qencên însanan e. Cemîyeteke ku têde zeîf, bê êşandin nikaribin heqê xwe wergirin, îflah nabe...*"[268]

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] tim û daîm di lehê xwediyê deynan de hereket kiriye çendan wan berî hatina wadeya wan were, deynê xwe xwestibin jî. Wî fezîleteke heqhiqûqê ya wilo şanî daye ku di tarîxa însanîyetê de hîç ti lîderek nikare wê xeyal jî bike. Wî eshabê xwe yê ku terefê wî girtibûn îqaz kirin û ji wan re got:

"Hûn çima ne li alîyê xwediyê heq in?" Ev derseke mafên mirovan a wilo berraq e ku bi rastî ji keyfxweşîyê hêstirên çavan bibarîne û di dilan de çendîn zîğên edaletê şîn bike. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di vê xusûsê de ji ber hikmeta wan çendîn mîsal şanî dane da ku ew ji ummeta xwe re nimûneyekê teşkîl bike. Dibe ku ji ber vê bû, lewra ev rewş, wê bibe yek ji mezintirîn asteng û kelem ji bo mirovên ku di piştî wî de werin.

Çawa ku yek ji alimên cihûyan **Zeyd Îbnû Sa'ne** lêkolîn dikir ka di bara taybetmendîyên Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de ew agahîyên ku di Tewratê de nivîsayî ne, di mezinê me Resûlê Ekrem de hene, yan nîn in. Rojekê

268. Îbnûmace, Sedeqat, 17

Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û Hezretê ‘Elî -xuda jê razî be- jî pê re bû ji malê derket, wî ew dît û li pey wî çû. Di wê navberê de zilamekî bedewî ji Resûlûllah nêzîk bû û jê re got:

“-Ya resûlellah! Min ji xelkê filan qebîlê re gotibû; heke hûn misliman bibin wê Xuda rizqê we fereh bike. Ew jî misliman bûn. Lê mixabin, di nav qebîla wan de tinetîyê serî hilda. Ew însan, di rewşeke zor de ne. Ev însanên ku bi umîda malê dinyayê misliman bûn, umîda wan bicih nehat, vêca ez ditirsim ku ew dîsa li ola xwe ya berê vegerin. Heke tu bixwazî ji bo arîkarîya wan tiştinan bişînî, ez karim ji wan re bibim.”

Dema **Zeyd Îbnû Sa‘ne** li vê axaftinê guhdarî kir, hizirî ku ji bo pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] biceribîne, firsendeke mûnasib ketiye destê wî û wî jî dest bi peyvê kir, got:

“-Ya Mûhemmed! Heke tu arîkarîya wan însanan bihizirî, bi peymaneke ku em bi hev re bikin, ez karim deyn bidim te.”

Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî heştê dînar ji wî deyn kir û ji bo arîkarîya pêwîst ji wan re bibe, dema ew didan wî sebîyê xwe, jê re got:

“*-Bilezûbez here cem wan û bi hawara wan ve bigihe!*”

Rojeke din jî mezinê me Fexrê kaînatê, Hezretê Ebûbekr, Hezretê Ûmer û hinek sehabîyên din jî pê re bûn, cenazeyek dibirin Goristana Beqîê. Dema mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nimêja cenaze kir, Zeyd ji wî nêzîk bû û bi her hêza xwe cubbeyê li ser pişta mûbareka wî kişkişand. Hê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] fehm nekiribû ka ew çima wisa dike, cubbe kete erdê. Dema wî bi heyret li sûretê tirşkirîyê Zeyd dimeyzand, Zeyd bi şeklê ku berê plana wê danîbû dest bi axaftinê kir, jê re got:

“-Ya Mûhemmed, ma tu yê deynê xwe eda nekî!? Jixwe hûn kurên Ebdûlmûttelib deynê xwe her texîr dikin!”

Haleveku hê wadeya deynê ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji Zeyd wergirtibûn, nehatibû.

Zeyd wê bûyerê wiha vedibêje:

Di vê navberê de ez fetilîm, min li Ûmer meyzand. Dema min dît ku herdu çavên wî fereh bûne û bi awirên tûj li min dimeyzîne, kezeba min jê qetîya, wî bi qêrîn ji min re got:

“-Hey neyarê Xuda! Ma tu van xeberê xwe ji Resûlê Xuda re dibêjî ne wilo? Tu, hem li cemê sîyaneta wî nagrî, hem jî tu bi bêedebî pê re diaxivî ha! Ez bi wî kim ku ew bi pêğembertî şandiye, heke Resûlûllah ji te re ne deyndar bûye, minê şûr li serê te kişandiba û jêkiriba!..”

Hezretê Ûmer -xuda jê razî be- hew karîbû xwe bigre ku li dev wî cihûyek rabe, heqaretê li pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bike, wî dikir ku ji hêrsê biteqe. Mezinê me bi levkenî û tebessum lê meyzand û jê re got:

“*Ûmer, bêhna xwe fereh bike! Vêga hem ez, hem jî ev zat, helwesteke cihêwaz ji te hêvî dikin. Bila tu şîret li min bikî ji bo ez deynê xwe bi awayekî sipehî eda bikim, bila tu şîret li wî jî bikî ji bo ew bi zimanekî mûnasibtir deynê xwe bixwaze. Gerçî hê wadeya deynê wî nehatiye, sê roj mane, lêbelê heydê tu rabe, deynê wî bide. Ji bo te ew tirsand miqdarekî zêde jî bidiyê!*”

Zeyd, piştî deynê xwe zêdetir jî tehsîl kir, wî ji Hezretê Ûmer re ev îtîraf kir, got:

“Ya Ûmer, binêre! Ez kengê li rûyê Resûlûllah binêrim, ez temamê elametên pêğembertiyê têde dibînim. Feqet du taybetmendî hebûn divîyabû ew jî têde hebûna, lê heta îro jî min

fehm nekiribû ka ew jî têde hene, yan nîn in. Gelo wî, yên ku li hemberî wî hovîtîyê dikin efû dike? Gelo çi qeder hovîtî li hemberî wî zêde bibe, bêhnferehî û mûsamehakarîya wî jî ew qeder zêde dibe? Ha îro min, ew jî ceribandin û min fehm kir ku ew "**pêğemberê dawîn** ew bi xwe ye. Tu şahid be ku ez, Xuda Reb, Îslamê dîn û Mûhemmed jî wek pêğember qebûl dikim û ez nîvê malê xwe jî wek sedeqe didim ummeta Mûhemmed."

Hezretê Ûmer -xuda jê razî be- bi mislimanbûna Zeyd keyfxweş bû û ew îqaz kir, jê re got:

*"-Tu nikarî malê xwe bigihînî hemû mislimanan. Naxwe bibêje, min ew ji hinek misliman re bexş kiriye."*

Zeyd peyva xwe serrast kir û jê re got:

"-Tu heqdar î, ez nîvê malê xwe ji bo hinek misliman dibexşînim."[269]

Ev hedîsên şerîf, her yek ji wan mîsal û nimûneyeke nebewî ye ku sipehîtahî û bereketa îlahî didin xuyakirin. Ew jî di encama hessasîyeta dilî ya ku deyn-wergir ji bo Xuda şanî dide û bi titîzî heqê xwediyê deyn li ber çavan digre de derdikevin meydanê. Yek ji hikmeta ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] car caran deyn wergertine jî ev e ku li hemberî xwediyê deyn bizaveke sipehî şanî bide û ew di vê xusûsê de ji ummeta xwe re bibe nimûne.

Wekî ku ji van hemû mîsal û nimûneyan tê fehmkirin; mesela deyn-wergirtin û deyn-danê mijar û mewzûyeke hessas e.. Ji lewma ew kesên ku mûameleyeke wiha di navbera wan de hebe, ji bo ji feyz û bereketa vî îbadetê ku kirine û dikin, mehrûm nebin, şert e ku ew li hinek pîvan û endazan miqate bin.

269. Hakim, Mûstedrek, III, 700/6447

Mixabin, îro her ku diçe kêmbûna îbadetekî fezîletmend ê wekî deyn-danê, dîtina deyn-danê ji bo kesê ku deyn dide her wekî ku zirarek, yan jî jidestdanek be û nêzîk-nebûna gellek kesan ji vî îbadetê xêrê, serkehnîya van tevan ji rîayet nekirina wan endaz û pîvanên ku me li jorê jimartibûn, tê.. Yanî ji holê rabûna emîntîyê di kirrîn-firotinê de, belavbûna derewan û bêwefatîya li hemberî soz û ehdan, normalbûna bêwefatîyên wekî nedana deynê xwe di wî wextê ku têde soz hatibûye dayîn, hema bibêje ev tev neyînî, dikin ku ev îbadetê sipehî were jibîrkirin. Lêbelê dema mirov li prensîp û rêz û rêçên vê meselê dinêre, dibîne ku divê mirov ji van astengan derbas bibe. Yanî ew kesên ku rewşa wan mûsaid be, divê bi hinek uzr û behaneyan îbadetê deyn-danê terk nekin. Li hemberî vê, ewên ku deyn werdigrin jî buhran, qeyran û desttengîyên curecur nexin behane û edakirina deynê xwe îhmal nekin. Di encamê de divê mirov xwe ji zirarpêgihandina vî îbadetê bifezîlet û îctîmaî dûr bigrin. Heke na, di vê rewşê de zengîn, dibe ku şukrê wan nîmetên ku cenabê Heq Teala wek emanet dane wî îfa nekiriye, hewcedar jî wê bibe ku ji ber endaz û pîvanên ku li wan miqate nebûye deyn ji xwe re peyda neke û heke îhtiyaca wî zehf dijwar be, ewê xwe ji ketina bêçaretîya ku xwe ji bo wergirtina ribayê mecbûr his bike, xilas neke..

Haleveku bi gellek ayetên pîroz û çendîn hedîsên şerîf sabit e ku deyn-dan çi fezîleteke mezin e. Ewên ku bi sebeb tevgerên şaş û rîayet nekirina edebên wan ji bo jîyîna vê fezîleta mezin dibin asteng, dibin ku webalekî mezin dikeve ser stûyê wan. Lewra ew deynên ku bi rîayetkirina usûl û edebên wan têne dayîn, ji bo mûmînî dibin sermayekekî axretê.

**Enes bin Malik** -xuda jê razî be- vedibêje:

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got:

*“Min di şeva Mîracê de dît ku li ser derîyê Cennetê ev çekû hatibûye nivîsîn: Mûkafata sedeqê bi deh caran wekî wê tê dayîn. [Mûkafata] deyn jî bi hijdeh caran bi qasî wî tê dayîn..”*

Min pirs kir, min got:

*“-Ya Cibraîl! Çima tiştê bi deyn hatî dayîn ji sedeqê çêtir dibe?”*

Cebraîl -silavên xuda lê bin- bersiva min wiha da:

“-Lewra parsek [bi pirranî] digel ku pere pê re hene jî sedeqe dixwaze. Ewê ku deyn dixwaze jî, ji ber hewcedarîya xwe teleb dike.”[270]

Hîç şubhe nîn e ku di dînê me de îbadetê sedeqe-danê hatiye teşwîqkirin. Lêbelê di halê ku zirarê bigihîne nefs-ezîzîya hewcedarî û êşandina wî de hingê di şûna sedeqe-danê de deyn-dan meqbûltir hatiye jimartin.

Çawa ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa xwe de ferman dike, dibêje:

“*Bi deyn dana tiştekî ji wek sedeqe dana wî çêtir e*.”[271]

Bi mûcibê teşwîqên îlahî û nebewî yên di vê xusûsê de hinek mûmînên salih, deynên ku dabûne, dema bi şûn de werdigirtin, destê xwe hîç nedidan wan pereyan. Lê dema hewcedaran careke din deyn ji wan dixwestin, wan bi xweşîya dilê xwe careke din jî ew pere bi deyn didane wan hewcedaran. Yanî wan ji bo xwe bi awayekî taybetî “**sindoqa qerzê hesen**” tesîs kiribûn.

Çawa ku **Qeys bin Rûmî -**rehma xuda lê be- wiha vedibêje:

270. Îbnûmace, Sedeqat, 19/2431
271. el-Ezîzî, es-Sîracû’l- Mûnîr, III, 57

**Suleyman bin Uzunan** bi deynê ku heta pereyên wî jê re werin, hezar dirhem bi deyn dabû **Elqeme bin Qeys** ê telebe’yê sehabîyê navdar Îbnû Mesûd -xuda jê razî be-. Dema pere ji Elqeme re hatin, wî deynê xwe jê xwestin û heta li hemberî wî tund jî tevgerîya. Heke çi qeder Elqeme deynê xwe derhal dabe jî, lêbelê ji bo vê bizava tunda wî, dilê wî ji Suleyman mabû. Di piştî çend heyvan de careke din Elqeme mecbûr mabû ku dîsa hezar dirhem bi deyn ji Suleyman bixwaze. Suleyman jê re got:

“-Baş e, bi memnûnîyet!” û berê xwe da malbata xwe, gazî wê kir, jê re got:

“-Ey Ummû Utbe! Wî kîsikê mohrkirî yê li cem wê derê ji min re bîne!” Jina wî ew kîsik anî. Suleyman ji Elqeme re got:

“Wellahî ha va ne, ew dirhemên ku te edakiribûn! Min dirhemeke tenê jî hîç ji wan ji cihê wan nelebitandiye!” Vêca Elqeme jê re got:

“-Xuda ji bavê te razî be! Naxwe ji bo tehsîla deynê xwe, sebebê wê bizava tunda te li hemberî min çi bû?”

Suleyman bersiva wî da, jê re got:

“-Hedîsên ku min ji te bihîstin!” Dema Elqeme bi meraq jê pirs kir, jê re got:

“-Te çi ji min bihîstibû?” Suleyman jê re got:

“-Te ji Îbnû Mesûd -xuda jê razî be- neql kiribû ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wiha gotiye:

“*Hîç mislimanek nîn e ku tiştek du caran wek qerz bide mislimanekî ku ev bizava wî [bi îlawe li ser sewaba qerzê hesenê wî], wekî ku wî ew tişt carekê sedeqe dabe wilo jî sewab qezenc dike.*”

Vêca Elqeme jê re got:

“-Erê, Îbnû Mesûd -radîyellahû enh- wiha xeber dabû min!” û wî jî ew teyîd kir.[272]

Ha ev exlaqê xweş, bavê min ê mûhterem **Mûsa Efendî** -quddîse sirrûh- jî ku bi halê mezinê Îslamê hevhal bûbû, wî bi awayekî zerîfane ew di heyata xwe de tetbîq dikir. Butçeyeke taybetî ya wî jî ji bo qerzê hesen hebû. Wî ji vir deyn ji bo hewcedaran pêşkêş dikirin. Ewên ku rewşa wan nebaş bû û nedikarîn bi şûn de deynê xwe eda bikin û lê vegerînin jî, wî ew deynê xwe yê li wan ji wan re sedeqe dijimart. Ew miqdarê ku bi şûn de jê re dihat jî li terefekî din didanî û ji bo heman emancê bikar dianî. Wî ev deynê sipehî yê ku ji bo Xuda dida, tim wiha dewr û daîm dikir. Ev cure emelên salih, tezahur û xuyahîyên cihêwaz û mûstesna yên bizav û tevgerên exlaqê îslamê ne.

Deyn, wekî ku ji bo deynbexş fezîleteke giranbiha ye, ew xusûseke wilo ye ku ji bo deynwergir jî hatiye teşwîqkirin. Di rewşa berevajî de, ew hewcedarê ku nikaribe ji nû ve deyn wergire, heke bikeve tengasîyeke zehf dijwar, hingê eger û îhtîmal zêde dibe ku ew bikeve rêyên çewt û gunehan. Çawa ku îro di civaka me de xwedî îhtiyacên ku di desttengîyê de mane û bê xwestina xwe ketina avzêm û teqana wekî ribayê ne hindik in. Ha mezinê me, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] însanên wiha teşwîq dike ku ew berê xwe nedin ser rêyên çewt û gunehan û ew ji bo xwe rêya peydakirina deynan tercîh bikin. Ew di vê mijarê de ferman dike, wiha dibêje:

“*Xuda Teala, bi deyndarî re ye heta ku ew deynê xwe eda bike, heta ku deyn ne li ser tiştekî be ku Xuda jê ne xweş be.*”[273]

---

272. Îbnûmace, Sedeqat, 19/2430

273. Îbnûmace, Sedeqat, 10

**Hasilê kelam**; wekî ku di fezîletên dîtirên îslamê de wilo ye, di roja me ya îroyîn de jî em mecbûr in ku li hemû hessasîyetan diqqet bikin û vî îbadetê deyn-danê jî bidin jîyandin. Ji bo berdewamîya vê ciwanî û sipehîtîya îslamî bi awayekî zindî jî, şert e ku em bi awayekî kûr û hûr pîvan û prensîpên wê îdrak bikin û di heyata xwe de tetbîq bikin. Bila em jibîr nekin ku dema em sibê ji bo îqametgeha ebedî ya xwe bên guhastin, ji bo tetbîqkirina vê fezîleta sipehî, ne di dest zengînî de firsendek dimîne, ne jî di dest hewcedarî de îhtiyacek dimîne.

**Bi kurtasî**; ev alema fanî ya ku em hatinê, alema firsendan û cih û warê kirina emelên sipehî ye. Nexasim Remezana Şerîfa[274] ku tên îdrak-kirin û rojên cejnê, an û midehên lutfa mûstesna ya Rebbê me ne û an û midetên firsendê ne, ji bo em jidestdanên xwe telafî bikin û kefaretê şaşîyên xwe ji stûyê xwe eda bikin.

Hikmet û sirra ku rojên fanî dixe Remezan û cejn, di vê de veşartiye ku em karibin îman û kelecana wê bijîn. Bi taybetî jî îbadet, zikr û hevkarîyên civakî; karibin wan dilên ku ji bo ğerîb, bêkes û sêwîyan têne dirêrkirin, bixemilînin. Ev jî, ji bo rojên keyfxweşîyê yên ku di piştî mirinê de werin meşele û çirayeke rehmê ye.

Nemaze ku mirov karibe ji mesîyet û gunehan efû bibe, bi taybetî jî bi efûbûnê ji Remezanê bigihîje îdê, ew pîrozbahîya zefer û serkeftineke manewî ye. Pevre jîyîna qezenceke îlahî û keyfxweşîyeke civakî ye.

Li rexê din, divê em vê heyata dinyayê her wekî mewsimeke kurta Remezanî îdrak bikin; divê em hestên bilindên Remezana Şerîf biguhêzin nav heyata xwe tevî. Lewra ev roj, di nav temen û emrê fanî yê me de mûhîmtirîn dem û wextên firsendê ne.

274. Ev nivîs, di meha Remezanê de hatiye weşandin.

Heke ev demên firsendê, bi bereket û rûhanîyeta Remezana şerîf hatibin nirxandin, hingê hîç şubhe nîn e ku sibê di roja qiyametê de wê ji bo me bibe sibeh û beyanîya cejneke ebedî ya heqîqî ku helbet wê ciwantirîn û sipehîtirîn cejn û îd jî ev be.

**Hezretê Behlûl Dana** çi sipehî dibêje:

"*Cejn, ne ji bo wan e ku cilên xweşik û nû lixwe dikin, lê ji bo wan e ku ji ezabê îlahî emîn dibin û ji xusrana ebedî xilas dibin. Dîsa cejn, ne ji bo wan e ku li merkebên sipehî sipehî siwar dibin, lê ew ji bo wan e ku karîne xeta û kêmasîyên xwe terk bikin û bibin evdekî salih...*"

**Ya Rebbî! Me bi asoyeke dilî û sipehîtîyeka wiha bigihîne cejnên li vê dinyayê û yên li alema ebedî! Di vê meydanê de ew firsend û îmkanên îlahî yên ku te di vê alema fanî de ji me re bexş kirine, nirxandina wan di rasta rizaya şerîfa xwe de jî ji me re îhsan bike! Me bixe nav koma wan bextiyarên ku tengasî û kederên birayên mûmînên xwe îzale dikin û ew jî ji tengasî û kederên axretê xilas dikin!**

**Amîn!**

# Dostanî



*"Hey rêwîyê heqîqetê, berî ew roj were, hê qiyamet nerabûyî bi [Rebbê xwe] padîşahê heqîqetê re dostanîyê durust bike da ku ew di roja wê felaketê de bi destê te bigre. Lewra ew roj, bê destûra wî kes nîn e ku bi destê te bigre. Ew roj însan, ji birayê xwe, dêya xwe, bavê xwe, ehlê xwe û kurên xwe direve. Naxwe dostanîya bi Heq re baş fehm bike û zanibe ku dostanî, tovê nefesa dawî ye."*
*[Hezretê Mewlana]*

# Dostanî

Li gorî rîwayetê, rojekê Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nexweş ketibû. Dema evîndarê Pêğember, Ebûbekr -xuda jê razî be- ev bihîst, ji bo hal û xatirê mûbarekê wî bipirse derhal bazda hate serdana Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin]. Lêbelê dema wî mezinê aleman di rewşeke reht [nerehet] de dît, hew xwe girt û dema vegerîya mala xwe jî ji bandora wê kete nav nivînê.

Piştî çend rojan mezinê me [dirûd û silavên Xuda lê bin] gihate sihheta xwe, bihîst ku Ebûbekr -xuda jê razî be- jî nexweş ketiye. Vêca ew çû serdana wî. Ji Hezretê Ebûbekr re gotin:

"-Resûlûllah tê serdana te!"

Ew evîndarê Pêğember derhal ji nav nivîna xwe pekî; bi zindîtîyeke mezin û keyfxweşîyeke bêterîf bezî ber derî. Ew ji nexweşîya xwe xilas bûbû. Wî li ber derî pêşwazî li mezinê aleman kir û jê re got; kerem bike, were hundur. Dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew di nav sihhet û efîyeteke wiha keyfxweş de dît, bi heyret jê re got:

"-*Ya Ebûbekr, ji min re gotibûn tu nexweş î!*"

Ebûbekr -xuda jê razî be- di evîn û hezkirina Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de ji her kesî bêhtir nesîbdar bû, ew di rewşeke ji serdana Resûlûllah -dirûd û silavên xuda lê bin- mest de ev bersiva wî da:

"-Ya Resûlellah! Dostê min nexweş ket; ez jî ji bandora wî nexweş ketim! Ew giha sihheta xwe, ez jî gihame sihheta xwe!.."

Bi tezahur û xuyahîya dostanî û hezkirineke wiha Ebûbekr -xuda jê razî be- gihaye wê şerefa ku di Qur'ana Pîroz de di bara wî de hatiye gotin: "**Duduyê duduyan**". Ji bo vê, hemû mesele ev e ku em têkilîyên dilî yên xwe bi semîmîtirîn peywendîyên wê dostanîyê xurt bikin ku ew dike cenabê Heq Teala ji me razî dibe û me dixe ser rêya rast û mûsteqîma wî. Bi vî awayî, ewê derfetê bide me ku em karibin para xwe ji keyfxweşî û coşa evîna îlahî wergirin. Lewra dostanîyên wiha tenê, karin bi maneya heqîqî para xwe ji hezkirin û evînê wergirin.

**Îmam Elîyyûr-Riza** çi xweş dibêje:

"*Cenabê Heq Teala şerbeteke wî ya manewî heye, wê ji dostên xwe re pêşkêş dike ku ew ji vê şerbetê vedixdwin ji xwe diçin, dema ew ji xwe diçin jî dicoşin, dema ew dicoşin tertemîz dibin, dema ew tertemîz jî dibin dihelin û diçin, dema ew dihelin û diçin jî êdî ew digihin îxlasê, dema ew digihin îxlasê jî êdî ew gihane dostên xwe, dema ew gihan jî êdî di navbera wan û hezkirîyê wan de cudabûn namîne*."

Ev hal, halê fena û tinebûna di dostanîyê de ye. Ha nexweşketina Hezretê Ebûbekrê ku ev hal dijîya, ji ber ku halê dostê wî parve dikir ji sihhetê zêdetir memnûnîyet dabûyê. Lewra bi dostan re di eynîbûnê [neğeyrbûn] de tehltirîn xwarin jî şîrîn dibe. Bi vegotin û îfadeya Hezretê Mewlana:

"*Kesê ku bi dostan re rûniştibe, çendan ew di nav pêtên êtûnê de be jî, ew xwe zen dike ku di nav bexçê gulan de rûniştiye*."

"*Gelî dostan! Heke hûn ji şekl, ji sûretî bibûrin herin, heke hûn bikevine nav alema maneyan, hûnê bibînin ku ew der di nav cennet û bexçê gulan de gulistaneke hê mûzeyyentir e*."

Dostanî, serkehnîya wê hevbeşbûna di sifetên mûsbet û menfî de ye. Dostanîya rastîn jî di rûhên semîmî tenê de diêwire.

Mirov di bilindtirîn mertebeyên şexsîyeta însên de li vê wesfê rast tê. Dostanî bi vê tê jîyandin ku dema du kes li hemberî her bûyer û weqaetê, xwedîyê eyn his û hestan bin. Dostanîya rastîn, di navbera du dilan de xeta cereyanê ye. Bi vê cereyanê, yanî di netîca herka hezkirinê de her halê yê ku tê hezkirin sîrayet dike û dikeve yê ku jê hez dike jî. Hingê Deryayên evînê yên di dil de destpê dikin dicoşin û taverojên hezkirin û sewdayê pêdikevin, rohnî didin.

Çawa ku dema **Hezretê Mewlana** -quddîse sirrûh- di Medreseya Selçûqîyan de sermûderris bû, Bi nêrîna derwêşê meczûbê dil tije evîn ê bi navê **Şems** Mewlana çîkek ji Feyza nûra wî wergirt û pêket şewitî. Di encamê de kitêbên zahirî emrê xwe di wî de xilas kirin û ew êdî bû kitêbeke kaînatê.. Di piştî wê de *Mesnewî* hatiye meydanê ku ew feryadname ye ji bo şerh û îzahata sirrên di kaînat û Qur'anê de. Ha ku mirov karibe vî halî ji xwe re bike hal û bibe dostekî Heq Teala, lêbelê ew jî bes bi qasî wê amadekarîya eşq û evînê çêdibe ku di cewhera mûmînî de heye û heke mirov berê wê jî bide ser îstîqamet û rasta rizaya îlahî, hingê mirovê karibe bigihe wê dostanîya Heq Teala.

Di rewşeke berevajî de heke bi zahirê xwe evd, di nav gulşen û gulistanê de be jî, bi sebeb dûrbûna wî ji dost, ew di batinê xwe de di nav agir û pêtan de ye. Li ser vî esasî, naxwe ewên ku di his û hestan de ne hevbeş û şirîk bin, ti elaqe di navbera hezkirin û wan nêzîkahîyên zahirî yên wekî eqrebatî û biratîyê de nîn e.. Lewra digel ku **Ebûleheb** apê **Hezretê pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] bû jî, yek ji mirovên dûrtirînê ji wî bûye.

Dinyaya rûh, sirr, asêpirs û mûemmayên wê xilas nabin. Ev, nakevin qalibê beden û civakê. Dostanî îlham û mizgînîyeke wisan e ku ji kûrahîyên tûh tê. Ew evîn û dostanîya îlahî ya di Hezretê Pêğember de ku li Şikefta Hîrayê pêşwazî li wehîya pêşî

kir û ew wergirt, paşê wê di mîraca mehbûbî de ew derxet û rakir, bire aramî û hizûra bilind.

Dostanîya ku însên ji tenêbûnê rizgar dike, lutf û keremeke îlahî ye. Bavê me **Adem** -silavên xuda lê bin û dêya me **Hewwa** piştî hatin peyakirin ji bo dinyayê, heta çil salan ew li deverên cuda cuda yên dinyayê bi tena serê xwe ji hev dûr û cuda jîyane. Bi vî awayî, hesreta hezkirin û dostanîyê bi herduyan hatiye tamkirin û çêjandin. Her wekî ku dostanî, ew halê bi nîvî-kirina rûhekî ye ku her yek ji hebîb û mehbûb nîvê xwe li alîyê din dibîne.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîfa xwe de ferman dike, dibêje:

"*Însan li ser dînê dostê xwe ye. Bi vê sebebê bila her kes baş binêre ka ew bi kê re hevaltiyê dike.*"[275]

Ji bilî vê, wî di hedîseke din de jî beyan kiriye, gotiye:

"*Însan bi hezkirîyê xwe re ye.*"[276]

Ev, têra îzahkirina vê rastîyê dike; di dostanîyê de tesîr û kartêkerî heta di rûhan de jî diçe û tesîrê li wan jî dike. Li terefê din ev hedîsên şerîf, vê xusûsê jî eşkere dikin:

Maneya ku însan bi hezkirîyê xwe re ye, ev e; ew di peyvê de, di cewherê de û di bizav û reftarê de di halê eynî hestê, eynî hizrê, eynî hisê û eynî jîyînê de ye. Yanî têde ew eynîbûn û pevrebûn heye ku tam hezkirîyê xwe bide xuyakirin û şanîdan. Heke na, ew kesê ku cewhera wî, peyva wî, bizav û reftara wî û hisîyata wî bi strîyan re be, heke ew îddîa bike ku ji gulê hez dike jî, gelo ev îddîaya wî çi qeder rast e? Eynî wekî vê, ew kesên

275. Ehmed bin Henbel, II, 303û 334

276. Buxarî, Edeb, 96

ku bi hestên xwe, bi hizr û fikrên xwe û bi kar û emelên xwe, ne bi Ellah -celle celalûhû- û Resûlê hezkirîyê wî re bin, ew ji ehlê mehebbeta rastîn nayêne jimartin.

Ha bila carekê ji vî alîyî ve jî, "bi hezkirîyê xwe re bûn" were nirxandin û bila neyê zenkirin ku ewê heyateke ğafilane dibûrîne û bi peyveke ziwa tenê hema dibêje "ez ji Xuda û Resûlê wî hez dikim" bigihîje wê mizgînîya ku di hedîsa şerîf de hatiye dayîn. Divê were zanîn ku bes dema pevrebûna halî bicih were, hingê pevrebûna hezkirinê jî bicih tê. Cenabê Heq Teala di dilê dostên wiha de bağ û bexçên manewî dide şînkirin. **Ebûbekr** -xuda jê razî be- di serê wan mirovan tê ku gihane vê lutfê, halê wî ji çendîn hikmetan mişt û tije ye:

Di dostanî û sohbeta Resûlûllah de halekî wecdê yê wilo ji wî re çêdibû ku li wî cihê divîyabû mehebbet û hesreta wî teskîn û aram bibe, ew hê zêdetir dibû. Rojekê Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] peyvên tije îltîfat ji Ebûbekr re gotibûn. Hem jî ew Ebûbekrê ku hemû serweta xwe di rêya Xuda de bexş kiribû. Lêbelê Ebûbekr -xuda jê razî be- ew qeder ji enanîyet û ezperestîya xwe çûbû û di Resûlûllah de fanî û tine bûbû ku ev xîtab-kirin heke çi qeder mûxateb-girtina wî di şeklê îltîfatê de bûbe jî, ew ketibû hissa cuda dîtina wî û pê ğemgîr bûbû. Wî bi vê hissê di kûrahîya rûhê xwe de hest bi îzdîrabeke dilşewata wekî agirê firqetê, kir. Wî di nav fikar û endîşeya ku ew ğeyrê wî [yanî perçekek ji ğeyrê pêğember] hatibe wergirtin de got:

"-Ya Resûlellah! Ma malê min û canê min bes ne yên te tenê ne!?"[277]

**Hezretê Mewlana**, ji bo têgihiştin û îdraka heqîqeta rûhên wiha bilind dibêje:

277. Îbnûmace, Mûqeddîme, 11

“*Ew kesê ku dixwaze hedana xwe bi Xuda bîne û pêre bibe, bila di hizûra dostên Xuda, welîyan de rûne.*

*Lewra dema dost bi dostê xwe re rûne, bi sed hezaran lewheyên sirran têne vekirin û xwendin!*”

Şairek jî wiha dibêje:

“*Heke çend kes, çendan ji bo demeke hindik be jî werin cihekî û ji Heq û heqîqetê behs bikin, asîman li wî cihê wan, diçûne secdê!..*”

**Şêx Se‘dî** ji bo tecellîya îlahî bûye xuyageh û mezher, wî bi temamê maneya kelîmê, xwe ji daxwazên dinyayî mûcerred û xwerû kiriye û ji bo dost jî ev nivîsandine:

“*Dîtina rûyê dostan, ji bo ehlê dilan ên ku xwîna taze ji birîna wan tê wekî merhemê ye.*”

Cenabê Heq Teala dostên xwe yên din av vê zumreyê de wiha dide zanîn:

إِنَّمَا وَلِيُّكُمْ اللَّهُ وَرَسُولُهُ وَالَّذِينَ آمَنُوا الَّذِينَ يُقِيمُونَ الصَّلاةَ وَيُؤْتُونَ الزَّكَاةَ وَهُمْ رَاكِعُونَ.

“**Bes dostê we Xuda ye, pêğemberê wî ye û ew mûmîn in ku nimêjê dikin, zekatê didin û ji Xuda re her diçin rik‘ûê**.” [278]

Xwezîya min bi wî kesî be ku xwe ji xefk û kemînên dost û yarên fanî û nefsanî xilas bûbe, hê ew li vê dinyayê dostê ebedî û hezkirîyê rastîn Ellah Teala ji xwe re dîtibe, ji dil û can bi Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ve hatibe girêdan û bi ehlê îmanê re mûemmer û îhya bûbe..

278. Maîde, 5/55

**Hezretê Mewlana** ji bo dilên mehrûm ên ji sirra di vê dostanîyê de wiha dibêje:

“*Tu vê baş zanibe ku dostên fanî û derewîn li vê dinyayê, hezkirîyên sexte ne, di paşîyê de wê ew hemû ji te re bibin dijmin. Hem jî ewê ji te re bibin dijminên serbirr.*”

“*Haleveku tu yê, di mezarê xwe de di nav feryadan de bibêjî;* “*ya Rebbî, min bi tenê nehêle!*” *û wilo li ber Xuda bigerî.*”

Sewîye bidestxistina nêrîn û dîtinan, bi maneya rastîn fehmkirina esrar û hikmetên di rûpelên kaînatê, bes ew karê qehremanên wecd û evîna îlahî ye; ewên ku karîne di alema dil de kûr bûbin û karîne dostanîyeke heqîqî bijîn û di vê de jî biserketine.

**Îbrahîm Xelîl -**silavên xuda lê bin- yanî ji ber ku dost bû, digel ku ew di rewşeke zehf zor de bû jî, wek şertê dostanîyê ew di nav teslîmîyet û tewekkuleke mezin de bû; di dilê wî de biçûktirîn tirs û endîşeyek jî nebû. Dema ewê di êgir de bihata avêtin jî, wî ji melaîketê ku arîkarî jê re teklîf kirin re got:

“-Nekevin navbera dost û dost! Rebbê min çi bixwaze, ez pê razî me; heke ew min xilas bike ev ji lutfa wî ye, heke ew min bişewitîne ev ji kêmasîya min e. Xuda hez bike, ezê sebr bikim...” Piştî wî bi vî awayî hemberîya wan kir û bersiva wan da, wî, bi berdewamî ev pirs kir, ji wan re got:

“-Ew rewşa min dizane! De ka bibêjin; ma agir bi fermana kî dişewitîne. Ma şewitandin karê kî ye?”

Paşîkê ji wî dostê mezin, yanî bi fermana Xuda, agir ji Îbrahîm -eleyhisselam- re hînik û bi selamet bû. Bi vî awayî, îhtîşama dostanîya îlahî hate şanîdan. Cenabê Heq Teala bi sebeb vê dilsijî û sedaqeta wî Îbrahîm -eleyhisselam- di ayeta pîroz de bi van îfadeyan teqdîr [biha pê daye] û tekrîm [rûmet û şeref pê daye] kiriye:

وَإِبْرَاهِيمَ الَّذِي وَفَّى.

"**Îbrahîm** [ji bo ehd û peymanên xwe] **zehf wefadar**.."[279]

Ha ev wefa û sedaqet, xwe di her kes û her tiştî de didin xuyakirin. Rîayet-kirina însanan li hemberî hev ji bo endaz û pîvanên dostanîyê jî bi vê rewşê vê girêdayî ye. Ew şexsîyetên ku bi qelbê xwe gihabin sifetên dostanîyê, hem ji hêla dînî ve, hem jî ji hêla tarîxî ve bûne çehre û sîmayên mûmtaz û cihêwazên însanîyetê. Wekî ku di kitêbên tarîxê de jî hatiye vegotin, ew **Şehzade Qorkut**ê ku bi sebeb îsyana wî hatiye kuştin bi navê **Pîyale** heta tu bibêjî bes zilamekî sadiqê wî hebûye. **Yavûz Sultan Selîm Xan** ji vê xusûsîyeta wî xeberdar bû û ew ji bo hatina cem xwe gazî kir û ev teklîf lê kir:

"-Wek mûkafata sedaqeta te, tu kîjan meqamî bixwazî, ezê te ji bo wî teyîn bikim. Heke tu bixwazî, ji bo min bibe wezîr!"

Ew jî fikirî û sedaqeta xwe nexist navê, wiha got:

"-*Sultanê min, ji niha û pê de wezîfa min ji bo* Şehzade Qorkut *turberdarî ye!...*"

Ev rewşa Pîyale beg, zirweya têgihiştina dostanîyê teşkîl dike! Ew telîmeke nêrebera edeba dostanîyê ye. Ew ji hêla hikmetê ve ji bo hemû dost û dostanîyan her wekî nîşaneke îbretê ye.

**Hezretê Ebû Osman Hîrî** dibêje:

"*Dostanîya bi Ellah Teala re bi edeba sipehî û mûraqeba berdewam, yanî her an û wextê xwe hiskirina di bin mûşaheda îlahî de çêdibe. Dostanîya bi Resûlûllah -dirûd û silavên xuda lê bin- re, bi tabî-bûna sunneta wî û bi jê re îtaet-kirin û teslîmîyeta tije mehebbet tê hûnandin. Dostanîya bi ewlîya re bi hurmet û*

279. Necm, 53/37

*xizmetê çêdibe. Dostanîya bi ehbaba re bi şertê ne di gunehê de be bi berdewamî rûkenî şanîdanê çêdibe. Dostanîya bi malbatê re bi xuyên xweş çêdibe. Dostanîya bi cahilan re bi dûakirina ji wan re û bi daxwazkirina ji wan re ji bo ew bigihîjin rehma Xuda, çêdibe*."

Her dostanî û sohbet, hal û uslûbeke taybetîya wan heye ku heke ev li ber çavan were girtin û rîayetkirin ew dostanî û sohbet wê dewam bike û seraya mehebbeta di dilan de jî naheje. Lêbelê heke edeba dostanî û sohbetê li ber çavan neyê girtin û rîayetkirin, her cure girêbenda hezkirinê bi bişkoka dijminahîyê werdigere. Ji vê hêlê ve dema mirov bi dostan re biaxive, divê mirov zehf bi diqqet û îhtiyat bizav bike. Lewra peyv heye ku wekî şûrê tûj e; dostanîyê dibirre, dikuje. Di qelb de birînên wilo vedike ku tedawîya wan bê îmkan e. Çîçekên hezkirinê yên di qelb de hişk dike û dikuje. Peyvek jî heye ku wekî barana biharê her teref û alîyî xweşik dike; feydên bêjimar temîn dike.

Berevajîyê vê jî ew nêzîkatîyên laûbalîbûyîyên ku dostanî hatine zenkirin, yan jî derbaskirina heyata xwe bi şeklê laûbalî, vêca mûtalaa-kirina wê jî wek dostanî û mehebbeteke rastîn heta tu bibêjî bes çewt û şaş e.. Lewra laûbalî û dostanîya ku bi masîwa hatibe şîlokirin, dişibihe tayekî weza ku ew bi devê kêreke tûj ve hatibe hekandin ku ew bi zehftirîn bes dişê xwe sê-pênc caran li ber devê wê bigre, di dawîyê de ewê biqete û here.. Bêşiwar dostanîyên wiha, ne li vê dinyayê, ne jî li alema axretê feyda wan heye. Berevajî vê, li herdu cîhanan jî ew zirar li ser zirarê ji xwediyên xwe re tînin. Ji bo wê bi qasî ku mirov karibe bi mirovên layiq re bibe dost jî, şert e ku mirov karibe vê dostanîyê mûhafeze bike.

Di çarçoveya vê mûhtewa û naverokê de heke mehebbeta di dilan de hemû mexlûqatan bide ber xwe, ew xwediyê xwe dike

mûmînekî kamil, bi tebîreke din wî dike evîndarekî heqîqî yanî wî dike dostê Heq Teala. Evîn, heke çi qeder wekî çîçekeke ku zîğ dide bi hezkirinên fanî yên mûeyyen û bi meclûbîyetan destpê kiribe jî, dema ew bigihîje sewîyekeke ku ji bo aferandina aferînerî hemû aferînde û mexlûqatan bide ber xwe û li ser wan şamil were, hingê ew berê xwe dide wî alîyî ku ew bibe **evîna îlahî**..

Lêbelê ew kesên ku bi astenga masîwa [ğeyrên Xuda] ve hatibin daleqandin û wilo mabin nagihin vê rewşê. Lewra evd, heke ji astenga masîwa derbas bibe, ewê bikare bi çêj û şîranîya mehebbet û dostanîyê bijî. Berevajî vê, ev yek ne mûmkin e. Çawa ku **Hezretê Nexşebî** hîkayeteke wiha vedibêje, ji bo ew ji mirovên ku bi van astengan ve hatibin daleqandin re bibe mîsal:

“Xortek hatibû ber derîyê keça padîşah û gotibû; dilê min ketiye wê. Dema xeber ji keça padîşah re hatibû gotin, sultana xanim hatibû ber derî û ji wî xortî re gotibû:

*“-Raje van hezar dirheman û careke din tiştê wiha ku wê zirarê bidin min û wê zirarê bidin te jî nebêje!”*

Dema wî xortî bela xwe jê venekir, wê ev teklîf li wî xortî kir, jê re got:

*“Naxwe raje du hezar dirheman!”*

Paşê dema bazara wan giha diwazdeh hezar dirheman, wî xortî ew qebûl kir. Keça padîşah ev rewş dît, jê re got:

“Tu çawa ji min hez dikî ku çavên te bi pere û pûlan kwîr bû û bû ku ez nedîtim? Ma tu zanî cezayê yên ku dîgerên min li ser min tercîh dikin çi ye? Birrîna stûyê wî ye!” û bi sebeb evîndarîya sexte ya wî ew ji xwe dûr kir.

Arifekî ku ev rewş bihîstî ket erdê û ji xwe çû. Dema ew bi xwe hat, wiha got:

"-*Gelî însanan! Binêrin, li vê dinyayê çi tê serê hezkirîyên heqîqî! Yan jî ma ewê ku dibêje; xebero ez ji Heq Teala hez dikim û berê hezkirina xwe didin ğeyrê wî, ma li axretê çi nayê serê wan!..*"

Mezinbûna hezkirinê, bi vê tê zanîn; dema îcab bike bi wê fedakarîya ku di ber hezkirîyê xwe de tê kirin û wê riska ku mirov dikevîyê tê pîvan. Ewê ku zehf hez dike, dema îcab bike ji bo dostê xwe canê xwe dide û hissa ku wî fedakarî kiriye jî nakeve bîra wî. Ew kesê ku evîn û dostanîyê nas nake û para xwe ji hezkirin û dostanîyê wernegirtiye, naxwe ew neketiye ser rêya gihiştina kemalê û bi nefsa xwe re dijî. Hem jî dilê mirovê ku hezkirinê nas nake wekî axê ye. Marîfet hezkirin e. Lewra sebebê hebûnê hezkirin e. Çawa bi nêrîn li wê rîwayeta ku di hedîsa qudsîya meşhûr de hatiye îfadekirin, cenabê Heq Teala di hedîsa qudsî de ferman dike, dibêje:

"*Ez xezînekeke veşartî bûm, min ji marîfeta xwe hez kir [min arzû kir werim zanîn] û min heyber aferandin.*"[280]

Li gorî vê tecellîya esrarên îlahî jî, keyfîyet û awayek e ku bi dostanî û mehebbetê taybet e. Ji bo wê, ewên ku gihane dostanîya Heq Teala rûyê dostanîyê ne di însên tenê de lê di halê heyata ku li dinyayê hatiye reşandin de; di temamê nebatat û heywanatan de jî mûşahede dike.

Bavê min **Mûsa Efendî** di xusûsa dostbûna digel mexlûqatan de bûyereke ku di serê wî de bûrîbû wiha vegotibû:

"Bi texmînî berî çil salan min û rêzdar **Seyda Samî Efendî -**quddîse sirrûh- li Medîna Mûnewwer xanîyek kirê kiribû. Li gorî şertên zemanî xanîyên wî çaxî ji kerpîçan bûn. Dema wî ji bo odeya ku min ji bo xwe hazir kiribû teşrîf kir, min li goşê marekî

280. Li Eclûnî Keşfû'l-Xefa, II, 132; li Bûrsewî, Kenz-î Mexfî binêrin.

lev-badayî dît û bê îxtîyarî min heyecan girt. Lêbelê wî di nav hizûr û aramîyê de ji min re got:

“Vî mexlûqê Xuda ji halê wî re bihêlin û destê xwe lê nexin.” Paşîkê, piştî mûddetekê heywanê reben ji holê winda bû.

Ev jî nîşan dide ku ewên di Xuda û Resûlê wî de gihabin serkehnîya dostanîyê, ji bo hemû mexlûqatan dibin dost û yar. Mehebbeta **Yûnus Emre** ji çîçeka zer yek ji şaheserên vê dostanîyê ye.

Ew dilên ku nikaribin rûyê dostê xwe yê ku di tebîetê de veşartî bibînin, nebîn û kor in. Ew rûhê însên ê ku nikaribe bi tebîetê re biaxive lal û bê ziman e. Ew dilên ku li dost digerin, heke wî di însanekî de jî nebînin, yê wî di tebîet û siriştê de bibînin. Çem û rûbar, mêrg û kehnî, keskî û şînahî, çîya û daristan, çîçek û gulistan, çendîn şi‘êrên dostanîyê bi dizîkahî ji qelbê wî mirovî re dibêjin, ewê ku ji bo xwe li dost digere. Ew dilên ku bi van terennuman hatine stran, ew bi xarîqe û çêkirinên hunerê hunermendê îlahî hestgerm dibin û bi lîsanê halê xwe bi wan re sohbet dikin. Ha çendîn raz û sirrên îlahî li ber kûrahîya dilên ku bi hissîyata dostanîya wiha tije bûne, keşf û vedibin û di dawîyê de ew wuslet û pevgihana bala eşkere dibe. Bi vî awayî, ji bo nesağîya ğurbet û ğerîbîyê şîfa tê hêvîkirin. Hesret û dilêşa di alema hinavî de tê dermankirin. Dostbûna digel van herk, sirr û mûemmayên qudreta îlahî yên di tebîetê de, hestan tenik û zirav dike, êdî zemînê dostbûna feyzdar û bereketdara ji Xuda re di dil de pêktê. Lewra hezar û yek texlît nexşên di sirişt û mexlûqatan de, merdîwan û pêpeling e, ji bo gihiştina wî dostê dostan, Dostê mezin, yanî ji bo gihiştina Xaliq û aferînerê hemû sipehîtî û xweşikahîyan. Ewên ku di vê pêpelingê de derkevin, ji bo sohbeta Rebbê xwe bilind dibin. Êdî ew mûmînê di vî meqamî

de be di her cih û deverê de bi Wî re ye. Tim û daîm ev nûra îlahî ya pevrebûnê di rûyê wî de çîk dide, diberiqîne.

Ha ev sîmayên wiha nûrdar û bextiyar in ku her yek ji wan, ji bo ummet û alemê dibin serkehnîya rehm û bereketa maddî û manewî.

**Malik bin Dînar** -rehma xuda lê be- vedibêje:

Dema **Ûmer bin Ebdûlezîz** derket meqamê xîlafetê, şivanên li ser çîyan gotin:

“-Mirovekî salih birêvebirina mirovan hildaye ser milê xwe.”

Ji wan hate pirs kirin, ji wan re hate gotin:

“-Hûn ji kuderê vê dizanin?”

Wan jî got:

“-Heta heywan bi xwe jî di nav hizûr û aramîyê de ne.”

**Mûhemmed bin Ûyeyne** -rehma xuda lê be- jî wiha dibêje:

“Dema Ûmer bin Ebdûlezîz xelîfe bû, min li Kirmanê şivantîya mêşinan dikir. Ji ber rûhanîyet û edaleta xelîfeyî ji min re xuya dibû her wekî ku mêşin û gur bi hev re digerin. Şevekê, min ji nişka ve dît ku wa ye gur êrîş dibe ser mêşinan. Ez heyirî mam; her wekî ku dinya hemû hizûr û aramîya xwe berze dike, jidest dide. Min di dilê xwe de got:

“Ez dibê hema, vêga ew xelîfê adil, dostê Heq Teala miriye!” Min lêkolîn kir, ez hîn bûm ku wê şevê Ûmer bin Ebdûlezîz wefat kiribû.”

Ew însanê ku jê re zerûrî ye ew dinyaya qelbîya xwe bi şexsîyetên nimûneyî yên wiha îdeal yên ku rûpelên kemalata beşerîyetê tije kirine, bistre, divê ew bi çavên besîretê yên dostên

Heq Teala ku di dilan de tên vekirin bi îbret û ders-wergirtin li wê taverojê binêre, ewa ku asoyan tije dike û di wextên şefeqê de jî winda dibe. Dema em li tabloyên curecur û rengo rengo yên ku Heq Teala ew li asîmanan xîşk kirine, temaşe bikin, emê ji tabloya wî hunermendê pispor û mahir re heyram bimînin. Em bi qasî miqdarê qudreta fanîya xwe ji bo teswîrên ku wî li holê danîne elaqê şanî didin û hunera wî tebrîk dikin. Ha dema em bi vê hessasîyetê temaşe bikin, ew nexş û sûretên rengo rengo û firçeyên qudretê yên ku li pêş çavên me li ser tabloyên kaînatê yên ku wênegir û sûretbexşê mûtleq Heq Teala ew xîjk dane û ew menzere û dîmenên ku li kaînatê hene hemû çi qeder îbretamîz in. De ka li gulekê, yan jî li binefşekê binêrin.. Gelo axa reş ev rengên wan ji kuderê anîne? Di vê alemê de çendîn hûrahî, ziravî, ciwanî, sipehîtahî, herkên qudretê û xarîqeyên hunerê hene ku bi hijmaran nayên zanîn û hesabkirin… Kaînat, ji bo mirovên ku karibin bi çavê dil wê bibînin, pêşangeha xarîqa ye. Lewra ev sipehîtahî hemû, her yek ji wan eks û xuyahîyek e ku ji sipehîtîya cemala cenabê Heq Teala dipale. Ji bo wê, **ew çav û dilên ku derketine ji bo bi nêrîna îbretê li vê kaînatê seyr û temaşe bikin, bi nêrîna heyirî-manê bi şûn de vedigerin!**

Lê mixabin, eql û mentiq, di pirranîya zemanî de di pêşîyan van xarîqeyan de û bi ser wan de dibûrin eynî wekî wan dilopên baranê yên ku li lat û zinarên dijwar dikevin û li hev totlanî dibin û ew lat û zinar nesîbê xwe ji wan nagirin, ew eql û mentiq jî wilo nesîbê xwe ji wan hunerên xarîqe wernagirin û îbret nastînin..

Rebbê me, kûrahîya tefekkur û hestan di tecellîyatên qudret û ezemeta hunerê îlahî yê di vê kaînatê de ji bo dilê me îhsan bike.

Dema em di rewşa xwe de bi şeklekî ciddî tefekkur bikin û nefsa xwe bi awayekî jidilane mûhasebe bikin, emê bibînin ku

herkên qudretê di kaînatê de digel ku wê her an û wextê me dorpêç kirine jî, ji ber ku dil bi astenga nefsê perdekirî ne, ew ji evîn û dostanîya îlahî mehrûm û bêpar in.. Ewên ku ji vê mehrûmîyetê ne agahdar in jî şair wan wiha îqaz dike, ji wan re dibêje:

*Heke tu ji vê ğerîbîyê nebêjî "dost" û tu neçî axretê,*

*Ew roja wusletê wê bi ğerîbîyeke duduyan wergere!...*

**Seyrî**

**Hezretê Mewlana** jî di vê xusûsê de wiha dibêje:

"*Hey rêwîyê heqîqetê, berî ew roj were, hê qiyamet nerabûyî bi [Rebbê xwe] padîşahê heqîqetê re dostanîyê durust bike da ku ew di roja wê felaketê de bi destê te bigre. Lewra ew roj, bê destûra wî kes nîn e ku bi destê te bigre. Ew roj însan, ji birayê xwe, dêya xwe, bavê xwe, ehlê xwe û kurên xwe direve.*"

"*Naxwe dostanîya bi Heq re baş fehm bike û zanibe ku dostanî, tovê nefesa dawî ye. Yanî ew ji bo roja axretê ye, ji bo rizaya Xuda ye.*"

**Hezretê Yûnus Emre** jî di temamîya emr û temenê xwe de bi vê sirra mehebbetê jîyaye, ew bi feryada evîneke dilşewat ji bo dilan axiviye û ew ji bo "Dostê bilindtirîn" bang kirine:

*Werin em herin hê can ranewestîyan,*
*Berî terka sûretî hêvî bikin,*
*Berî dijmin bikeve navberê,*
*Were dilo, em herin cem dost!*

*Em li vê dinyayê namînin,*
*Fanî ye, em pê nexapin,*
*Dema em yek bin, em jê veneqetin,*

*Were dilo, em herin cem dost!*

*Em ji vê cîhanê koç bikin,*
*Em bifirin, herin warê dostê mezin*
*Em ji arzû û hewayê bibûrin,*
*Were dilo, em herin cem dost!*

*Berî xebera mirinê were,*
*Berî ecel bi berstika me bigre,*
*Berî Ezraîl bi hemla xwe rabe,*
*Were dilo, em herin cem dost!*

Ev bang, di heqîqeta xwe de eks û xuyahîyeke evîn û hezkirinê ye, ji wê îfadeya ku di dema wefata wî de ji zimanê mûbarekê mezinê me Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dihate rêhtin:

"*Ey Xudayê min! Refîqê E'la, Refîqê E'la [dostê bilindtirîn, dostê bilindtirîn]*."

Ew dilên ku bi awayekî pêwîst par û nesîbê xwe ji vê eks û xuyahîyê wergirtine, ew digihin zirweya dostanîya îlahî û di rêwîtîya ebedîyetê de jî ji bo sirra vê wadeya îlahî dibin mezher û xuyageh:

أَلا إِنَّ أَوْلِيَاءَ اللَّهِ لا خَوْفٌ عَلَيْهِمْ وَلا هُمْ يَحْزَنُونَ.

"**Bila haya we jê hebe ku bêşiwar weliyên Xuda, ne tirs ji wan re heye û ne jî ew ğemgîn dibin**."[281]

**Ya Rebbî! Dilê me bi dostanîyeke wilo mûemmer û sağ bike ku ew me bigihîne rizaya bilinda te! Xudayê min! Ji me hez bike, me bide hezkirin û me bide keyfxweşkirin!..**

**Amîn!..**

281. Yûnus, 10/62

# Ax Wefayê!..



*Wefadarîya ji bo Heq Teala bes û bes bi rîayetkirina fermanên wî tê cih. Ev wefadarî zirweya hest û kirinên bi Wî ve girêdayî ne. Lewra ew tekane heyber e ku diaferîne, dide jîyandin û her wext û anê jî îhtiyac bi wî çêdibe. Heyata me jî û mirina me jî di dest wî de ye. Ji vî cîhetî ve hezkirina ji wî û di her nefesê de bi wî re bendbûn, bilindtirîn asoya evdînîyê û mezintirîn deynê wefadarîya evdî ye.*

## Ax Wefayê!..

**Mehmed Akif**ê rehmetî ji bo eqda nîkaha keça xwe yek ji ehbabên xwe yên ku zehf jê hez dikir **'Elî Şewqî Efendî** yê Bosnayî jî gazî kiribû. Ev Xoce Efendîyê navser piçekê dereng hatibû vê dawetê û gotibû; sebebê dereng hatina min jî ez di kaşê Wefayê de derketim hatim. Akifê rehmetî jî ev mazereta di cihê xwe de bi heqîqeteke di cihê xwe de mezc kir û bi awayekî devkenî, mûtebessim û manedar wiha got:

"Xoce Efendî, tu ji kîjan kaşê wefayê behs dikî? Nesla hazir [nifşê vêga] ji zû ve ew kaş pehn û dûz kirine..."

Ew rastîya ku rehmetî bi ğemgînî anî zimên û her wekî ku bibêje "ax wefayê" îfade kirî, xesleteke wilo mûhîm e ku însan ji her tiştî bêhtir îhtiyaca wî pê heye û ew hîç nikare dev jê berde. Akifê rehmetî di xusûsa zor û zehmetîya bicihanîna vê xesletê de ji peyva zorbûna derketina di kaşê Wefayê de îstîfade kir, di ber de avêt û îşaret pê da ku nesla vêga dev ji wefadarîyê berdaye. Heke wî civaka me ya îro dîtiba, gelo wî yê çawa feryad kiriba... Îro, însan qencîyên ku şopên wan winda bûne nayênin bîra xwe, her wekî ku peyva "**wefa**"yê bes li Îstanbûlê wek navê semtekê tenê maye û hew.

Haleveku **wefa**, yek ji şîarên îslamê ye, heta belkû ew esas-dartirîna wan e. Gerçî di nêrîna Îslamê de esasa esasan îman e. Lêbelê bêşiwar e ku di eynî zemanî de wefadarî, xuyahîyeke îmanê ye. Lewra wefa, rîayeta ehdê ye, yanî mana li ser soza xwe ye. Îman jî li dinyayê sedaqet şanîdana ji bo wê soza tesdîqkirin û iqrar-kirina Rebb e ku ew di alema rûhan de hatibû dayîn. Yanî îman jî di netîcê de wefadarî ye.

Digel vê jî wefa, sade ne rîayetkirina ehdê ye, yanî ne keyfîyeta mana li ser soza xwe tenê ye. Lêbelê ew semîmîyeta li hemberî Heq Teala û neguherandina rewşa qelbê xwe ye. Ew bi awayekî sağlem û asêgirane bicihanîna peywendîya qelbî û ew minnetbarî ye ku me mecbûr dike ji bo em elaqeyeke sipehî û ciwan hem bi awayekî kiryarî, hem jî bi awayekî hissî tesîs bikin ku ew dirêj dibe digihîje temamê wan kesên ku di îman-anîna me de xizmeta wan çêbûye; ji lêzimên dûr ên me bigre heta digihîje lêzimên nêzîk ên me, ji biradînên me bigre heta bigihîje dê-bavên, ji alim û salihan bigre heta bi pêğemberên ku temamê emr û temenê xwe di cîhad û xebatê de bûrandine ji bo nîmeta îmanê bigihînin me. Ev rewş jî ne halekî demsalî ye; lêbelê divê ew -di roja baş û roja xirab de- di temamê dirêjahîya temenê me de her berdewam bibe.

Peyva wefayê, di temamê wesfên wekî minnetbarî, sedaqet û îstîqametê de heye û ew bûna wekî rûyekî ji herdu rûyên qumaşekî ye ku îfadeya pevrebûnê heta carina jî eynîbûnê di xwe de dihewîne. Ji hêla vê nêrîna esasî ve, her reftar û bizava ku îman wan îcab dike, di eynî zemanî de çawa ku îfadeya wefadarîyê têde heye, eynî wilo berevajîya van reftar û bizavan jî wek **bêwefatî** tê qebûlkirin.

**Wefa**, wek wesfeke xusûsî ya pêğember, welî û kesên xwedî fezîlet, ew sifetekî manewî ye ku di sewîye û asteke bilindtirîn de heyata beşerî tacdar dike. Li ser vî esasî, hinek mûfessiran îslam wiha tarîf kirine; iqrarkirina bi zimanî, tesdîq-kirina bi qelbî, teslîmîyeta ji Xuda Teala re û di qeza û qedera wî de wefadarîya ji wî re ye.

Ewên ku dilên xwe ji serkehnîya wefadarîyê nesîbdar kirine, wan nefsên xwe yên wekî êgir jî kirine her wekî bexçê gulan. Wan nefsa xwe kiriye gulistaneke wisan ku têde gulên zikr,

bilbilên tesbîhan, çîmenên îman û îrfanê, çîçekên lutfa îlahî û çem û rûbarên emelê salih hene. Xelata dilekî wiha jî ji halê wî re guncaw û babet dibe ku ev jî, Cenneta E'la û Cemalûllah e. Li pêşberî dilên wiha agir jî wesfê xwe diguherîne û bi gulistanê werdigere. Çawa ku **Îbrahîm** -silavên xuda lê bin- dema ew ji terefê Nemrûd ve di agirê ku pêtên wî wekî çîyan bûn de hate avêtin û werkirin, bi vê fermana cenabê Heq Teala:

قُلْنَا يَا نَارُ كُونِي بَرْداً وَسَلاماً عَلَى إِبْرَاهِيمَ.

"**Me got: Hey agiro! Ji bo Îbrahîm hênik û bi selametî bibe!**"[282] wan pêtan rewşa gulistanê wergirtibû. Lewra Îbrahîm -silavên xuda lê bin- berî di nav êgir de were avêtin, wî pêtên nefsa xwe bi avên wefadarîyê mevirandibûn û ew pêğemberekî wisan bû ku di her hal û karê xwe de sedaqeta xwe ji cenabê Heq Teala re dabû xuyakirin.

**Mezinê** me **Fexrê Kaînatê** -dirûd û silavên xuda lê bin- jî heyata wî ji serî heta bi binî usweya hesene ye, yanî sipehîtirîn nimûneya îmtîsalê ye, ew her wekî ku pêşangeheke wefadarîyê ye. Ew Nûra Hebûnê di piştî fethê de li Mekkê pazdeh rojan mabû. Ji lewma hinek ji Ensarîyan ketibûn nav metirsî û fikaran, destpê kiribûn bi ğemgînî hizrîbûn; gelo Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wê neqleke din vegere Medînê, yan jî ewê venegere wê. Lewra Ellah Teala fetha wî bajarê mûbarek û mûqeddes ê ku ew lê hatibû dinyayê û lê mezin bûbû, jê re kiribû nesîb. Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi vê têdergînîya [mitalee û fikara] Ensarê kîram hesîyabû, ji lewma ew çûbû dev wan, ji wan pirs kiribû, ji wan re gotibû:

"*-Hûn çi dibêjin?*"

---

282. Enbîya, 21/69

Piştî ew fikar û metirsîyên wan hîn bû jî wî nimûneyeke mezina wefadarîyê şanî da û ji wan re wiha got:

"-*Gelî Ensarîyan! Ez ji kirina tiştekî wisan xwe diavêjim ber penaha Xuda. Min ji bo memleketê we hicret kir. Jîyana min jîyana we ye. Mirina min jî wê li cem we be.*"[283]

Resûlûllah -dirûd û silavên xuda lê bin- di nexweşîya xwe ya ku bi wefata wî bi encambûyî de cara dawîn çû ser minberê û ji Mûhaciran re got:

"*Wesîyeta min li we; bi Ensarîyan re xweş mûamele bikin. Ew cemaeta min, hevsirrên min û pêbawerên min in. Wan wezîfên ku katibûne ser milên wan bi heqî anîne cih. Hemberê xizmeta wan jî hê tam nehatiye edakirin. [Ewê li axretê hê zêdetir jî ji wan re were edakirin.] Bi vê sebebê, bi qencên Ensarîyan re qenc mûamele bikin û neqencên wan jî efû bikin.*"[284] Wî bi vî awayî, ev wefa, di demên dawîya xwe de jî tekrar kir.

Mirov dikare bibêje; hemû pêğember ew rêzan in ku di asta bilindtirîn de maneya wefadarîyê li beşerîyetê dane hînkirin. Ji bo mirov karibe bibe evdekî ku bigihîje hezkirina Xuda jî zerûret heye ku em di xusûsa wefadarîyê de şîret û destûrên rêberê xwe yê hîdayetê Hezretê Mûhemmed Mûstefa -dirûd û silavên xuda lê bin- bikin pîvanên cihêwaz û mûstesna yên dilê xwe û wan di jîyana xwe de jî bijîn. Bi kurtasî, em karin wan wiha rêz bikin:

1. **Wefadarîya ji bo Xudayê Rebbê Alema ye**:

Unsîyeta pêşî û wefa jî ku encama wê ye, ji bo Ellah -celle celalûhû- ye. Lewra cenabê Heq ji ezel de ji bo rûhên ku wî aferandibûn re gotiye:

---

283. Muslim, Cîhad, 86; Ehmed bin Henbel, Mûsned, II, 538
284. Buxarî, Menaqîbû'l-Ensar, 11

وَإِذْ أَخَذَ رَبُّكَ مِنْ بَنِي آدَمَ مِنْ ظُهُورِهِمْ ذُرِّيَّتَهُمْ وَأَشْهَدَهُمْ عَلَى أَنفُسِهِمْ أَلَسْتُ بِرَبِّكُمْ قَالُوا بَلَى شَهِدْنَا أَنْ تَقُولُوا يَوْمَ الْقِيَامَةِ إِنَّا كُنَّا عَنْ هَذَا غَافِلِينَ.

“**Di bîra wan bîne dema Xudayê te ji pişta Ademîyan zurriyeta wan girt û ew xwe bi xwe li ser hev kirin şahid ji wan re got: Ma ez ne Rebbê we me? Hemûyan got: Belê, em şehde didin** [Tu Rebbê me yî]. **Ev şehdeyî ji bo vê ye da ku hûn roja qiyametê nebêjin: Em ji vê ğafil bûn**.”[285] Bi vî awayî wan Rebbîtîya wî iqrar kir.

Xusûsa vê iqrarê, peymanbesteke ku qebûlkirina ulûhîyeta cenabê Heq Teala û evdînîya însanan îfade dike. Naxwe ew kesê ku vê ehd û peymanbestê qebûl dike û di iqrar-kirina xwe de jî sedaqetê şanî dide û ew, bi awayê ciwantirîn bi dan dewamkirina wê di dirêjahîya heyata xwe de jî vê vedibêje; ez li ser ehd û peymana xwe mame û ez ji soza xwe re wefadar im.. Lewra ji bo vê wefadarîyê sade iqrarkirin tenê ne kafî ye. Ji vê qebûlkirinê jî hinek binbarî û mûkellefîyetên eqlî û wijdanî tên meydanê. Ev jî rîayetkirina [li ber çavê xwe girtina] emrên Xuda û xwe dûrkirina ji nehiyên wî ye.

Naxwe wefadarîya ji bo Heq Teala bes û bes bi rîayetkirina fermanên wî tê cih. Ev wefadarî zirweya hest û kirinên bi Wî ve girêdayî ne. Lewra ew tekane heyber e ku diaferîne, dide jîyandin û her wext û anê jî îhtiyac bi wî çêdibe. Heyata me jî û mirina me jî di dest wî de ye. Ji vî cîhetî ve hezkirina ji wî û di her nefesê de bi wî re bendbûn, bilindtirîn asoya evdînîyê û mezintirîn deynê wefadarîya evdî ye. Ew sêhrbazên ku ji ber îman anîbûn ji terefê

285. E‘raf, 7/172

Firewn ve bi zulmeke mezin dest û pêyên wan çepûrast bi darxurmeyan ve hatibûn daleqandin jî li hemberî vê rewşê negotibûn:

"Ya Rebbî, me ji vê belayê xilas bike û me bigihîne rehetîyê!" Lêbelê wan wiha niyaz ji Xuda kiribû û gotibûn:

رَبَّنَا أَفْرِغْ عَلَيْنَا صَبْراً وَتَوَفَّنَا مُسْلِمِينَ.

"**Xudayê me! Sebrê bi ser me de birijîne û me misliman bimirîne**."[286] Ev niyaz û bergerîna wan jî ji bo evdînîyê çi wefadarîyeke mezin e.

Cenabê Heq Teala di bara evdên xwe yên ku ji bo wefayek û sedaqeteke wiha nimûne ne, di ayeta pîroz de ferman dike, wiha dibêje:

لِيَجْزِيَ اللَّهُ الصَّادِقِينَ بِصِدْقِهِمْ.

"**Xuda, mirovên ku sedaqet şanî dane bi sebeba wê sedaqeta wan, wan xelat dike**."[287]

Cenabê Heq Teala di ayeteke pîroza dîtir de jî di bara mûmînên ehlê wefayê de ferman dike, wiha dibêje:

مِنَ الْمُؤْمِنِينَ رِجَالٌ صَدَقُوا مَا عَاهَدُوا اللَّهَ عَلَيْهِ فَمِنْهُمْ مَنْ قَضَى نَحْبَهُ وَمِنْهُمْ مَنْ يَنْتَظِرُ وَمَا بَدَّلُوا تَبْدِيلاً.

"**Ji bawermendan çendîn zilam hene; li ser peymana ku dabûne Xuda rast mane. Hinekan ji wan peymana xwe anîye cih; canê xwe feda kirine. Hinek ji wan jî çavnêriyê**

286. E'raf, 7/126
287. Ehzab, 33/24

[şehîdbûnê] **dikin. Lêbelê wan bi ti awayan soz û peymana xwe hîç neguherandiye**."[288]

**Hezretê Mewlana** jî li ser vê heqîqetê, di bara îmtîhana li vê alema fanî, sebra li hemberî îbtîla [bela bi ser de hatinê] û wefadarîya ji bo Heq Teala de ji rêwîyên îrfanê re bi rêya mecazî wiha dibêje:

*"Ey bilbil! Tu yê heta çi wextî li hemberî zivistana reş bikî feryad! Ey bilbil! Ma rewa ye ku tu bê rawestin her ji cefayê behs bikî? Heke dilê te bera bi yara te ve bend e, çavê xwe veke û şukr bike; ji wefayê behs bike! Dev ji strîyan berde, ji gulê behs bike! Ji sifetên qurm û koka gulê bibûre; li zatê wê binêre! Çima tu ev qeder bi vê alema fanî re mijûl î; yan jî ma cihê ku tu dixwazî bigihiyê, ne wêdetira biwêdetira ye?"*

Ha wekî ku Hezretê Mewlana jî îfade kiriye, esl cihê ku mirov bigihiyê hedefa ebedî ye, di netîca ketina pey hezkirin û sewdayên fanî û demî bêwefatîya jibîrkirina emanca eslî, xusraneke mezin e. Cenabê Heq Teala di xusûsa şîyarkirina evdên xwe ji ketina vê ğefletê de wiha dibêje:

"**Hûn nebin wekî yên ku Xuda ji bîr kirine , ji lewma Wî jî nefsa wan bi wan daye jibîrkirin! Ha ew, jirêderketî bi xwe ne**."[289]

"**Kî jî, berê xwe ji bîranîna min vegerîne, bêguman jê re jiyaneke bi tengî heye û emê wî roja qiyametê kor heşir bikin. Ew dibêje: Xudayê min! Çima te ez wek kor heşir kirim? Haleveku bi rastî ez, li dinyayê bi çav bûm! Xuda jê re dibêje:**

---

288. Ehzab, 33/23

289. Heşr, 59/19

**Rewş wisa ye! Lewra ayetên me ji te re hatin; lêbelê te ew ji bîr kirin. Îro eynî wisa tu jî têyî jibîrkirin!**"[290]

Ha ew kesê ku li vê dinyaya fanî ji Rebbê alemê, Xuda Teala re wefadarîyê şanî bide, ewê jî li axretê wefayê bibîne. Lewra wefaya bilindtirîn, ya Xuda Teala bi xwe ye;

"**Ma kî heye ku ji Xuda bêhtir peymana xwe bîne cih?**"[291]

Ev xîtaba îlahî jî vê beyan dike.

Digel ku divê rewş wiha be jî, dijê vê ew însanê ku li dinyayê xwe di ğefletê de noq dike, di wê roja qiyameta dehşetdara ku însan ji bo qencîyeke biçûçik jî hewce dibe de, ewê bedela vê bêwefatîya xwe bi awayekî ğemnak bide. Lewra wefa, di serî de jî di evdînîyê de, di dostanî û hemû xusûsan de wesfeke wilo ye ku tê arzûkirin û lê gerîn û hemberê wê jî bes wefa ye. Hezretê Mewlana vê hûrenuqtê çi xweş îzah dike, dibêje:

*"Hemû xusûsên wekî evîn, hezkirin û dostanîyê bi wefayê ve bend in û ew li însanê wefadar digerin. Ew bi ti awayan ji însanê bêwefa nêzîk nabin."*

*"Qelemê nivîsandiye û gotiye: "Hemberê wefayê wefa ye; hemberê cefayê cefa ye." û hibra wê jî hişk bûye."*

*"Padîşahek, kesekî ku xaîntî lê bike kurê çi kesî be jî, ew serê wî ji laşê wî bike û dipekîne. Lêbelê heke koleyekî Hindistanî wefadarîyê ji padîşah re şanî bide, ewê wî koleyî bi gotina "**her bijî!**" pêşwazî bike û jê re li çapkan bide... Îtîbara ku ew dibîne bi sedan wezîr wê nabînin."*

*"Kole jî çi ye ku; heke li ber derîyekî sekek jî hebe, di dilê xwediyê wî seyî de li hemberî wî bi sedan hestên razîbûnîyê, bi*

290. Taha, 20/124-126

291. Tewbe, 9/

*sedan hestên memnûnîyetîyê şîn û geş dibin. Xwediyê wî, wî seyî bi mehebbet miz bide, bifirkîne..."*

**2. Wefadarîya Ji Bo Hezretê Pêğember -dirûd û silavên xuda lê bin-**

Di piştî wefadarîya ji bo Xuda de wefadarîya bilindtirîn û lazimtirîn ew wefadarî ye ku berê wê li xundê aleman Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] be. Ev wefadarî ye ku ji Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re be, ewê ku li ber cenabê Heq Teala digerîya û digot: *"Ummeta min ummeta min"* bi vî awayî lavlav ji Xuda dikir û teleba wî ji bo ummeta wî bûye.

Ev wefadarî, bi kûrbûna di hurmet û hezkirina ji Pêğember de, destpê dike, ew bi perwanebûna li hawîrdora Sunneta Senîyya wî mûmkin e.

Ew pêğemberê mezinê ku me dibe cem Xuda, wî di xusûsa heyat û mirinê de rê şanî me daye û ew tekane qendîla me ye ku rêyên seadeta ebedî ji me re rohnî kirine. Ev hadîse û weqaetên ku wefadarîya ji bo wî û hemberî-dana wî ji bo vê wefadarîyê vedibêjin çi qeder îbretamîz in.

Di sefheya [pêvajoya] ku Herba Uhudê li dijî mûmînan wergerîbû de mûşrikan bi her qewet û şîyana xwe ve êrîş dikirin da ku Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bikujin. Ew qas êrîş kirin heta ku diranê mûbarekê Serwerê alemê şehîd kirin. Di wê hengava dehşetdar de wefadarî û fedakarîya eshabê kîram ên li cem Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di halê qehremanîyên destanî de bicih dihatin ku di vê xusûsê de ti kes nikare xwe bigihîne gwîzeka wan. Hinekan ji wan xwe di ber wî de dikir sîper, hinekan ji wan jî xwe li hemberî tîrên ku dihatinê dikir mertal, hinekan ji

wan tîr û xedeng diavêtin dijminan û hewl dida ku wilo wan ji hev belav bike û têkbişikîne. **Se'd bin Ebûweqqas** -xuda jê razî be- rîwayet dike; di wê rojê de ji cem Resûlûllah-dirûd û silavên xuda lê bin- bi qasî deh hezar tîr li mûşrikan hatine barandin. Eshabê kîram wilo di nav hewl û ğeyretên cansîperane de bûn ku li hemberî vê rewşa wefadarî û fedakarîya wan Xundê aleman memnûnîyeta xwe wiha dianî zimên:

"*Dêya min û bavê min bi gorî te bin, ey Se'd!*"

Hezretê 'Elî -xuda jê razî be- wiha dibêje:

"Min ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nebihîstiye ku wî ji ğeyrî Se'd bin Ebûweqqas bi kesekî din re xîtab kiribe û jê re gotibe; dêya min û bavê min bi gorî te bin."[292]

Nimûneyeke din jî ev e:

Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] roja Hudeybîyê **Hezretê Osman** -xuda jê razî be- wek qasid şandibû Mekkê. Hezretê Osman -xuda jê razî be- ji mûşrikan re gotibû; niyeta me umre ye, emê umra xwe eda bikin û vegerin. Lêbelê mûşrikan ji bo wê salê destûr neda. Ji Hezretê Osman re gotibû:

"-Heke tu dixwazî, tu vêga karî tewafê bikî!..."

Lêbelê Hezretê Osman -xuda jê razî be- ji ber ku yek ji wan kesan bûye ku xwe ji bo Xuda û Resûlê wî weqf û nezr kiribû, wî ji wan re got:

"-Heta ku Hezretê Pêğember Ka'bê tewaf neke, ez jî nakim! Ez Beytûllahê bes li pey wî zîyaret dikim. Cihê ku ew lê qebûl nebe, ez jî li wir nîn im!.." Wî bi vî awayî sedaqeta xwe ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re da zanîn.

292. Buxarî, Cîhad, 80; Muslim, Fedaîlûs-Sehabe, 41/1876

Di wê navberê de Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî li hemberî hadîse û bûyerên ku egera rûdana wan hebû bey'et û peyman ji eshabê xwe qebûl dikir. Ji ber ku Hezretê Osman -xuda jê razî be- li wir hazir nebû, di dawîyê de pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi destekî xwe destê xwe yê din girt û bi vî awayî bey'et û peyman ji ber Hezretê Osman -xuda jê razî be- ve qebûl kir û got:

"*-Xudayê min! Ev jî bey'eta Osman e!*"[293]

Hezretê Osman -xuda jê razî be- ji bo vê îltîfata Pêğemberî bûye mezher. Bi şertê ku mirov xwe bi wê wefa û sedaqetê bigre, hemû ummet dikeve ber wê îltîfatê. Em jî dikarin bi wefadarîya di dilê xwe de bi qelbê xwe di nav koma sehabîyên li Bey'etûr-Ridwanê de beşdar bibin û bigihin wê mizgînîya ku di vê ayeta pîroz de hatiye ragihandin:

"**Bêşiwar ewên ku bî'etê didin te, bes ew bî'etê didin Xuda. Destê [qudreta] Xuda di ser destên wan re ye. Kî, peymana xwe bişikîne, webalê peyman-şikandina wî bes ji wî re ye. Kî ji bo wê peymana ku li ser bicihanîna wê soz daye Xuda wefadarîyê şanî bide jî, Xuda, dê xelateke mezin bide wî.**"[294]

Rêya ku mirov karibe bi awayekî layiq ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hez bike, di vê ayetê de hatiye îfadekirin:

النَّبِيُّ أَوْلَى بِالْمُؤْمِنِينَ مِنْ أَنْفُسِهِمْ.

293. Buxarî, Eshabûn-Nebî, 7; Tirmizî, Menaqib, 18

294. Fetih, 48/10

**"Pêğember, ji bo bawermendan ji nefsa wan bi xwe jî çêtir û li pêştir e.**"[295]

Di çarçova vê, û çendîn îfadeyên pêbendî û wefadarîyê yên din de evîndarên Fexrê Kaînatê -dirûd û silavên xuda lê bin- ji pora mûbareka wî bigre, heta bi riha şerîfa wî û şopa qedemê pakê wî û heta temamê emanetên wî ji bo serê xwe kirine sertac. Ji xirqeya wî bigre heta bigihîje kopalê wî, ji şûrê wî bigre heta bigihîje tîrên wî û mohra şerîfa wî hemû emanetên wî yên ku heta bi roja me ya îro hatine, ha hemû bi vê hissîyatê dewam kirine û her tiştên wî wek emanetekî mûqeddes hatine wergirtin û qebûlkirin.. Di vê meydanê de nemaze îtîna, hurmet û wefadarîya ku Osmanîyan şanî daye, destan û çîroka li ser zimana ye. Mezherbûna Osmanîyan ji bo emr û temenekî mûhteşemê şes-sed û çend salan ev qeder dirêj, bi îlawe li ser îttîba-bûna wê ji bo Qur'an û Sunnetê bi xuyahîyên wan rêz û hurmetên çav-kwîrker bend e ku wan ji bo emanetên mûqeddes şanî dabûye. Ew emanetên pîroz ên ku her yek ji wan ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wek bîranîneke ulwî ji ummetê re maye.

### 3. Wefadarîya Ji Bo Mezinên Îslamê

Her mûmîn mecbûr e ku ji hissîyata wefadarîya li hemberî mezinan jî mişt û tije be. Mezinên îslamê, emr û nehiyên pêğemberê Xuda, exlaqê xweşê wî û qendîlên ulwî yên ku herdu cîhanên me rohnî dikin, gihandine me. Cemîyet û komel bi îrşad û talîmatên wan îstîqameta xwe rast dikin, alemên manewî yên xwe tezyîn dikin û ber bi îstiqbal û paşerojê ve diçin. Ji bo vê yekê hatiye gotin:

"*Mirina aliman wekî mirina alema ye*."

Li terefê din jî cenabê Heq Teala di ayetê de dibêje:

295. Ehzab, 33/6

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا اتَّقُوا اللَّهَ وَكُونُوا مَعَ الصَّادِقِينَ.

“**Gelî yên ku îman anîne! Xwe ji Xuda biparêzin û her digel sadiqan bibin**.”[296]

Hinek mûfessiran di beyana ayetê de peyva **sadiqan** bi ehlê sedaqetê, yanî bi xwediyê wefadarîyê mane kirine û ew ayet wiha îzah kirine:

“Di rêya Îman û Îslamê de bi ehlê wefadarîyê re bibin, hûn jî bibin ehlê wefadarîyê da ku hûn li dinya û axretê bigihin xilasîyê!”

**4. Wefadarîya Ji Bo Dê-bavan û Xizm-lêziman:**

Heqê dê-bavan yek ji wan xusûsan e ku divê mirov zehf bi giringî li serê raweste. Ji bo ewladên wan nexasim di wextê yextiyarbûna wan de xizmeta ji dê-bavan re, ji wan re gotina xebera xweş û îkram-kirin mezintirîn deynê wefadarîyê ye. Di Qur’ana Pîroz de di piştî îbadetê ji Xuda re hezkirin û xizmeta ji dê-bavan re tê telqîn û şîret-kirin.

Cenabê Heq Teala ferman dike, dibêje:

“**Xudayê te emr kiriye, gotiye; hûn bes îbadetê ji min re bikin û qenciyê li dê-bavên xwe bikin. Heke ji wan yek, yan jî herdu li cem te pîr û kal bibin, ji wan re “Of!” jî nebêje, li erza wan nede; wan neêşîne û ji herduyan re jî xebereke xweş bibêje. Ji herduyan re perên xwe yên merhemetê nizm bike û dûa bike, bibêje: Xudayê min! Çawa ku dema ez biçûk bûm wan rehm li min kir û ez xwedî kirime, tu jî wisan rehmê li wan bike**!”[297]

296. Tewbe, 9/119
297. Îsra, 17/23-24

Jîyana pîroza **mezinê** me **pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji çendîn nimûneyên wefadarîyê tije ye:

Dema dêya Hezretê Elî **Fatima bint Esed** -xuda jê wan razî be- wefat kir, wê di serdema ciwanîya wî de wekî ku dêya wî be, wilo xizmet ji Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re kiribû. Dema vê jina salîhe wefat kir, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hatibû dev cenazê wê, li ber serê wê rûniştibû, ji bo xizmetên fedakarane yên wê li cem Heq Teala jê re şahidî kiribû û wiha gotibû:

"*Ey dêya min! Rehma Xuda li te be. Tu di piştî dêya rastîya min de dêya min bûyî. Tu birçî dimayî û te ez têr dikirim, te cil li xwe nedikirin, te cil li min dikirin, te xwarinên xweş nedixwarin û ew bi min didan xwarin û wextê ku te ev dikirin jî, te rizaya Xuda û mala axretê arzû dikir*."

Piştre pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got; cenazê wê sê caran bişon. Dema dor hate wê ava ku têde kafûr û bêhna xweş jî heye, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi destê xwe ev av bi ser wê de kir. Piştre wî gomlekê xwe ji xwe kir û li wê kir. Cenaze li ser vî gomlekê wî hate kefen-kirin.

Dema qebra wê hate vekirin û dor hate kolana lehdê [bergorê], pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi destê xwe bergora wê kola û axa wê jî bi destê xwe jê derxist. Piştî wî ev kar xilas kir, li wir xwe li ser teniştê gêr kir û wiha got:

"*Xuda ye, yê ku hem sağ dike, hem jî dimirîne. Ew sağ e, hîç namire. [Xudayê min!] Dêya min Fatima keça Esedê ef û meğfîret bike. Hucceta wê [kelîma tewhîdê] bi wê bide gotin û cihê ku ew çûyê [qebra wê] jî jê re fereh bike. Bi heqê Pêğemberê xwe û pêğemberên berîya min jî [dûaya min qebûl bike]. Şubhe nîn e ku Tu, dilovîntirînê dilovînan î....*"

Piştre pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo cenaze çar tekbîr dan, li pey wan jî wî bi xwe, bi Ebbas û Ebûbekr -xuda ji wan razî be- re cenaze xist qebrê."[298]

Di jîyana nimûneyî ya pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de bi hissa wefadarîya wiha şîn û geş bûne çendîn mîsalên din jî hene ku her yek ji wan di hukmê derseke bêhemta ya fezîletê de ne. Ew heta bi qiyametê ji bo temamê însanîyetê hatine dayîn.

Çawa ku di piştî weqaeta Huneynê de heyetek ji qebîla Hewezan hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], mislimanbûna xwe ragihandibûn û jê xwestibû ku êsîrên wan serbest berde. Yekî ji nav wan jî pê re axivîbû û wiha gotibû:

"-Şîremak û mûrebbîyên Te di nav me de hene!"

Vêca pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi hissa wefadarîyeke mezin got:

*"-Êsîrên ku li para min û kurên Ebdûlmuttelib katibin, bi şûn de didim we.*"

Eshabê kîram jî ji bo karibin nesîbê xwe ji heman fezîletê wergirin, bi xweşîya dilê xwe gotin:

"Me jî êsîrên xwe ji bo pêğemberê Xuda bexş kir!"

Bi vî awayî ew roj, şeş hezar êsîr bê wergirtina ti hemberîyeke dinyayî serbest hatin berdan. Di encama vê fezîleta bêhemta de hemû hewezanîyan pêk ve Îslamîyet qebûl kirin.

❁

Di piştî dê-bavan de jî mehebbeta ji xizm û lêziman û wefadarîya ji bo wan tê. Xizmtî du texlît e. Yek ji wan bi maneya

298. Teberanî, Mû'cemû'l-Kebîr, XXIV, 351-2

umûmî, nêzîkatîya Îman û fezîletê ye. Ya din jî nêzîkatîya xusûsî ye, nêzîkatîya lêzimtîyê ye. Bi îfadeya Îslamî ji lêzimtîyê re "***ulul-erham***" û ji serdana lêziman re jî "***sile rehmê***" tê gotin. Têkilî qutkirina ji lêziman; bizaveke xirab, mekroh û guneh e. Li ser vî esasî hatiye gotin;

"Ew kesê ku unsîyeta xwe ji lêzimên xwe qut kiribe, li kîjan dîwanê bibe, rehm li wê nabare."

Di dînê me de rîayetkirina heqê eqrebayan hatiye emrkirin, hatiye gotin; divê hûn lêzimekî tenê ji qencî û nêzîkatîyê dûr nekin; divê hûn li gorî rêza nêzîkatîya wan, pêşî ji yên zehf nêzîk destpê bikin heta ku dor bigihîje yên dûr. Dînê me ev qencîya li lêziman jî wek wezîfekeke heyatî li ser pişta me bar kiriye..

Mûessesa malbatê û xuyahîyên lêzimtiyê yek ji tecellîyatên ecêb û ğerîb ên Ellah -celle celalûhû- ne. Yek ji lutf û îhsana Rebbê me ye ku ew ğerîban di siha nîkahê de ji hev re dike canceger, wan di şeklê lêzimtîyê de di nav pêbendî û cilweyên xizmtîyê de wekî çiqilên mehebbetê di nav hev re derbas dike û bi hev û din ve girêdide. Qutkirina benên xizmtîyê, bêwefatîyeke zehf mekroh e. Dûrahîyên zahirî, di îzdîwaca însanîyetê ya Hezretê Adem û Hezreta Hewwa de dibin yek. Bêşiwar keyfxweşîya teqwayê digel hesta wefa û fezîletên wan di ser wergirtinên eqrebatî û bavikîtîyê de ne.

Seadeta dinyayê bi benê malbat û lêzimtîyeke îslamî xurt dibe. Semîmîyeta li dinyayê û hesta wedadarîyê ku berdewamîya wê ye, seadeta axretê ye jî.

Ewên ku lazim e wefadarîyê şanî bidin, sade ne evên ku me şanî dane tenê ne. Nexasim divê em wefadarîya ji bo dost û biradînên xwe jî di dilê xwe de bicih bikin. Li alîyê din wefadarîya ji bo bav û kalan, wefadarîya ji bo zindî û mirîyên

me, wefadarîya ji bo welêt û wefadarîya ji bo sipare û emanetên di hemû civakê de ji sifetê şexsîyetên rewîşt sağlem e.

Divê em zanibin ku di însên de hissa teqwayê û hesta wefadarîyê razî nabe ku sînorên îlahî werin binpêkirin û kelehên hezkirinê jî werin ruxandin û wêrankirin. Di rewşeke berevajî vê de nefs, wê di çendîn rêyên nîfaq û ğefletê de bigere û dilê xwe ji kendalekî xeterê dikişîne kendalekî xeterê yê din. Çawa ku çendîn qewmên ji bo helakê dûçar bûne jî sersebebê helaka wan ev bûye ku çi soz dabûne Heq Teala, li serê nemabûn. Wefadarîya ji bo ehd û peymanê digel ku deyn û lazimîyeke însanîyetê ye jî, ew bi ber vê ve nehatibûn. Bi vî awayî, ew ji îlm, îdrak, marîfet û îz'anê mehrûm bûn û çûne helakê. Halê wan ji bo mirovên ku ew dîtin û ji bo mirovên ku piştî wan hatin jî bûye wesîla ders û îbret-girtinê û halê wan ji bo mûtteqîyan jî bûye wesîla şîretê.

Xuda di ayeta pîroz de ferman dike, wiha dibêje:

"**Me, di pirranîya wan de tiştekî wekî mana li ser sozê** [wefadarîya ji bo ehdê] **nedît**."[299]

Ev qisseya **Hezretê Ferîduddînê 'Ettar** halê wan kesên ku nîmetên Xuda daye wan jibîr kirine û wek meyleke nehêjaya nefsanî bêwefatî şanî dane, çi xweş dide xuyakirin:

Seyekî nêçîrê yê padîşahekî hebû, wî zehf ji seyê xwe hez dikir. Ew se di nêçîrê de mahir û pispor bû. Padîşah, heta tu bibêjî bes qîmet dida seyê xwe û ew çi demê derketa nêçîrê, ew her bi xwe re dibir. Stûbend û toqa wî bi gewheran xemilandibû, xirxal û bazinên ji zêr û zîv jê re çêkiribûn û ew xistibûn pêşepê û paşepêyên wî. Pişta wî jî bi cileke atlasîya bisîm nixumandîbû.

299. E'raf, 7/102

Rojekê, padîşêh dîsa ew bi xwe re biribû û digel erkanê seraya xwe çûbû nêçîrê. Siltan li hespê xwe siwar bûbû, benê ermûşî yê toqa seyê wî di dest wî de bû û ew bi awayekî weqûrane bipêşve diçû, heta tu bibêjî bes, ew keyfxweş û şad bû. Lêbelê tiştek bi ber çavê wî ket ku keyfxweşîya wî xirab kir. Ew seyê ku padîşahî zehf jê hez dikir, padîşahê xwe jibîr kiribû û bi tiştekî din re dileyist. Padîşah, heke çi qeder pêşî wek mehzûn benê ermûşî yê di dest xwe de kişandibe jî se lê asê bû, li ber xwe da; li ser kojtina perçê hestîyê li pêşîya xwe dewam kir. Padîşah, li hemberî vê rewşê di navbera hestên heyret û ğezebê de qêrîya û got:

“-Tu bi min re, min jibîr dikî û bi tiştekî din ve mijûl dibî! Ev çawa dibe?!”

Ew zehf ğemgîn bû. Ev nankorî û bêwefatîya seyî zehf li zora wî çûbû. Heke çi qeder ev se be jî, dîsa dilê wî pê xweş nebû ku wî mezûr bibîne û lê bibûre. Digel ev qeder îzzet, îhsan û emekên ku wî li seyî dabûn, li hemberî van qencîyên wî jî di an û demekê jibîrkirina se ji bo wan hemû qencîyên wî hem jî bi perçekekî hestî, wek helwesteke dil birînker û wefa-xirabker, ne xusûseke wilo bû ku were efûkirin. Padîşah bi ğezeb jê re got:

“- De rê bidin vî bêedeb î!”

Seyî maneya vê ğezeb û hiddetê fehm kiribû, lêbelê kar ji destê wî derketibû û êdî nikarîbû tiştekî bike. Dema mirovên li hawîrdora wî ji padîşahî re gotin:

“-Siltanê me, em rajin gewher, zêr û zîvên pê ve û wî wilo berdin!” Padîşahî ji wan re got:

“Na! Wî berdin, bila wilo here!”

Paşê wî ev jî îlawe kir, got:

“-Wî berdin bila wilo here! Bila wilo here, da ku li çolên bêkes û bêkûs, virtûvala û xirbe, ğerîb, birçî, tî û bêav bimîne; bila li wan gewher, zêr û zîvan binêre û bi berdewamî êşa îkram û lutfên ku jidest dane, bijî!..”

Ev hîkayeta ku rewşa wan kesên bêwefa, yên ku qedrê nîmetên bêjimar ên cenabê Heq Teala nezanîne, bi dûv menfîetên fanî û suflî ketine û wilo çûne helakê, dide xuyakirin çi qeder îbretamîz e! Ew kesê ku bikeve vî halî, di dawîyê de ewê bibîne ku ev pêveman [takinti] virtûvala ne, lêbelê ew dem her tişt wê xilas bûbe û ji dest wî çûbe.

**Hezretê Mewlana** dibêje:

*“Bêwefatî, digel ku ji bo seyan jî leke û eyb e, naxwe çawa dibe ku tu wek însan bêwefatîyê şanî didî?”*

Li ser vî esasî mezinan wiha gazî rêwîyên Heq Teala kirine, gotine;

“Bi awayekî layiq ji halê ğafil û salihan îbret bigre û li xwe binêre ji bo tu ji Xuda re bibî evdekî wefadar!”

**Erê hemû mesele ev e: Tu karibî bibî evdekî wefadar.**

Şukrê bê dawî ji cenabê Heq Teala re be ku gihana şeref û bereketa mana li zehf nêzîkî evdekî wiha hem jî bi salan kiriye nesîbê me. Ev şexsîyetê mûstesna, bavê mûhteremê min **Mûsa Efendî** -quddîse sirrûh- ye ku me ew di Tîrmeha sala 1999’an de siparte rehma Heq Teala û me ew li goristana Sehra’ya Cedîd jî defn kiriye.

Bavê me û seydayê me wek meşreb nûnêrekî kamilê Hezretê Ebûbekrê Siddîq -xuda jê razî be- yê zemanê me bû, ew di navbera hezkirîyên xwe de jî wek “**sahîbû’l-wefa**” marûf bûbû. Ev tabîr, ji bo wî zatê mezin bêşiwar, ne bêsebeb hatiye

bikaranîn. Lewra wî dostê Heq Teala, temamê temenê mûstesna yê xwe di rewşa abîdeyeke wefadarî û sedaqetê de bi asoya dilî jîyaye, ew taveroja bi rojên me û hîlala bi şevên me bûye. Ew cemser û qutbê îstîqametê û siltanê arifan bûye.

Wî, heta bi vir hemû xuyahîyên wefadarîyê yên ku me vegotine di xwe de kom kiribû. Ew ğunçeyekî wusletê bû, hema ji bo vê tenê be jî heq dike ku ew bi sifetê "**sahîbû'l-wefa**" were naskirin û bibîranîn. Digel ku ev qeder zeman bi ser wefata wî de bûriye jî birînên ku fîraqa wî di dilê me de vekirine hê jî nehatine pêçan û bi hev û din ve neaxivîne. Berevajî vê, ew hê kultir û xirabtir bûne. Lewra hewşa dilîya wî ya ku bi wefadarîyeke bêtarîf hatibû xemilandin, tim û daîm ji bo me talîmgeheke cihêwaza sedaqet, peyrewbûn, hezkirin û evînê bûye.

Ellah -celle celalûhû- dema ji bo evdekî xwe xizmeteke şerefmend teqdîr bike, lîyaqeta vî karî jî jê re lutf dike. Ha dema em ji vê hêlê ve binêrin, kemalata zahirî û batinî ya di şexsîyeta Mûsa Efendî de ji her alîyî ve dihate temaşe û mûşahedekirin. Wî, bûyer û qewimînên zehf zor û zehmet heta bi teferruatên hûr ên wan jî bi feraseteke kûr, têgihiştin û hessasîyet tesbît dikir.

Ew gulên nadîde, qeranfîl, nêrgiz û sinbilên ku wî di hewşa wefadarîya xwe de şanî dane, sipehîtahîyên neqermiçber in ku dilistan û bexçê gulên me şîn û geş dikin. Di wî de sedaqeta ji bo Heq Teala, pêbendûna wî ji bo Kîtab û Sunnetê, bi înfaqên ku kirine xwedîtî-kirina wî li emanetê ecdadan, elaqe û mûamela ku ji nêzîk ve wî ji bo lêziman, dostan, heta dostê dostan şanî daye, ğeyretên wî di xizmeta weqfan û yên wekî van de, halên bi hezar û yek letafetan e; ew di bara soza ku di "bezma elest" de ji bo Rebb hatiye dayîn de sipehîtirîn nimûne ye ji bo şanî me bide ka ew soz çawa tê bicihanîn.

Em karin ji çendîn hestên wefadarîyê yên Mûsa Efendî çend heban wiha rêz bikin:

Ew li hemberî kesên yextiyar û ğerîbên ku di cemîyetê de bi bêwefatî ji bo tenêbûnê hatine terk-kirin û bi êş û janên wan re rûbirû hatibûn hiştin zehf hestgerm dibû û digot:

“Bi rastî divê em van ğerîban di nav malên xwe de bihewînin. Lêbelê qeweta me ji vê re nîn e. Naxwe em mecbûr in ku ji bo wan hizûrgeh û aramîxaneyekê ava bikin. Wî bi çend nêzîkên xwe re ev fikra ciwan xistibû failîyetê. Wî zeman zeman jî ğerîban zîyaret dikirin û ji nêzîk ve bi îhtiyacên wan re elaqedar dibû.

Dilê wî dirêj û fereh dibû ji bo têra kitikên nav bexçe jî bike. Wî bi sifetên wan nav li wan kitikan dikir. Wî li gorî sedaqet û merhemeta wan li çêlîkên wan bi her yekî ji wan re cuda cuda mûamele dikir.

Ez bi xwe jî dema di temenê şîr mêhtinê de bûme, di piştî mideteke pêncih û pênc salan de kir ku ez li wê hemşîreya ku hingê xizmeta min kiribû, bigerim, ew bi min dabû peydakirin û îzzet û îkram jê re bexşkiribûn.

Lêbelê wefadarîya wî ji bo seydayê wî **Hezretê Samî Efendî**, destana li ser zimana bû. Di rojên cejnan de yekem cihê ku wî zîyaret dikir, mala Samî Efendî bûye. Dîsa qurbanên xwe yên pêşî ji bo wî serjê dikirin. Nemaze ew dibû wesîle ji bo xetim ji rûhê mûezzezê wî re werin xwendin. Her sal ji terefê hez-kirîyên wî ve, bi deh hezaran xetmê şerîf ji bo seydayê wî dihatin tîlawetkirin. Wan jî zêde zêde dilê wefadarê wî memnûn dikir.

**Welhasil**; ew jî wekî Ebûbekr -xuda jê razî be- ji bo me sey-dayê evîn, hezkirin û mehebbetê bû. Wî bi reftar û bizavên xwe

yên ku hemû temenê wî pêça bûn û dabûne ber xwe, ev xusûs bi me dida hînkirin: “Wefadarîya hezkirîyan divê çi be, û çawa be”

Vêga divê temamê mirovên ku xwe bi ehlê mehebbetê ve girêdane, hewl bidin ku karibin di axa wefadarîya ku wî şahê hezkirin û evînê şînkirî de bibin ğunçeyeke pêğemberî..

**Cenabê Heq, îhsanê li me tevan bike!**

**Xudayê me! Ji halê sipehî yê wî “sahîbû’l-wefa” ji bo dilê me îhsan bike, me bixe nav zumra salihan! Sedaqet û semîmîyetê ji bo emelên me lutf bike, me tevan bike warisên Cenneta Neîmê! Ji neslên me û kinêsên me ewladên wilo qenc îhsan bike ku ew ji bo mûtteqîyan bibin sertac, bibin ronahîya çavan û keyfxweşîya dilan! Me hemûyan ji bo Xwe, ji bo Resûlê xwe, ji bo dê-bavên me, ji bo lêzimên me, ji bo hemû ehlê îmanê, ji bo welat, ji bo millet û ji bo emanetên din bike wefadar! Me di herdu cîhanan de jî di hewşa rizaya şerîfa xwe de bide jîyandin!**

**Amîn!...**

# Bûna Şexsîyeteke Nimûneyî Ji Ehlê Îmanê



*Ji bo dostên Heq Teala di bin tecellîyata evîn û hezkirina cenabê Heq Teala de ne, wekî şewitîna kağezeke di bin mercekê de demeylên nefsanî temenê xwe di wan de xilas kirine. Bi vî awayî, ji ber ku ew bûne merkeza cazîbeyeke nûranî, însanên din jî wek ğeyrê îradî bi rexê sipehîtîyên nûranî yên wan ve têne kişandin.*

## Bûna Şexsîyeteke Nimûneyî Ji Ehlê Îmanê

Ellah -celle celalûhû- ji bo evdên xwe bîne ser hîdayetê, ji navbera wan bi xwe însanên salih, xwedî şexsîyet û rewîşt, aferandin cihêwaz û fitret paqij wek rêzan wezîfedar kirine, bi vî awayî arîkarîya evdên xwe kiriye ji bo ew bigihîjin seadetê.

Însan, bi xulqîyeta xwe ji bo rewîşt û şexsîyetê heyran e. Yanî îhtiyaca însên bi nimûneyeke fiêlî û kiryarî heye da ku berê wî bide ser heq û heqîqetê û bandorê li ser terbîya rûhanî ya wî û li ser qelb û eqlê wî bike. Ji bo vê cenabê Heq Teala sade ne kitêb nazil kirine, lêbelê wî ji bo îrşada beşerîyetê kesên xwedî şexsîyet û rewîştê bilind, yanî pêğember şandine da ku ji her alîyan ve şop û tesîrên kûr li ser wan bihêlin û ji bo beşerîyetê welî jî îhsan kirine ku ew jî li ser rêç û şopa wan pêğemberan diçin.

Nebî û welî şexsîyetên wilo bêhnpak in ku wesfekî ji bo wan ne sipehî be, ew ji bo dijminên xwe jî babet û layiq nabînin. Bi saya wan çendîn însan, ji heq û heqîqetê re çavnas bûne û bi îmanê şerefmend bûne.

Çawa ku eshabê kîram jî, ji bo rewîşt û şexsîyeta cihêwaza pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ya ku wek Qur'aneke zindî bû, bûbûne heyran, îman pê anîbûn û ew li hawîrdora wî bûbûn perwane. Ew însanên nîv-wehşî yên ku keç biçûkên xwe bi sağî binax dikirin, helîyabûn, tine bûbûn, di şûna wan de jî di tarîxa Îslamê de şexsîyetên abîdeyî yên di zirwê de xuya bûne...

Li ser vî esasî îman, ji bo ehlê îmanê yên ku di rêya îxlas û teqwayê de birêve û bipêşve diçin mûhîmtirîn wesf, bûna şexsîyeteke wisan e ku ji bo pêğemberê xwe bibe layiq û babet. Ew mûmînên ku xwedî xeslet û xusûsîyeteke wiha bin, normal e

ku her yek ji wan dibe miğnatîsa hîdayetê. Ewên ku ji vê mehrûm bin jî, bi awayekî ğafilane û bê agahîya xwe rolekî wilo dixin stûyê xwe ku mirovên li ser hîdayetê jî aciz û zêvir dikin û wan jirê derdixin.

**Hezretê Mewlana** vê rastîyê wiha vedibêje:

“Di zemanê Hezretê Bayezîdê Bistamî de, mirovekî agirperest hebû. Rojekê, mirovekî bi-îman jê re got:

*“-Çi baş dibe ku tu misliman bibî û bigihîjî selametiyê; tu yê şeref û mezinatîyê bidestxînî...”*

Wî mirovê agirperest jî wiha bersiva wî da:

*“-Hey kesê ku tu xilasbûna min dixwazî! Heke çi qeder di devê min de mohreke sağlem hebe jî, yanî ez nikarim bi eşkerehî îmana xwe bibêjim jî, ez bi awayekî nehanî û bi dizîkahî bawer dikim ku Bayezîd îman anîye. Lewra di wî de kûrahîyek û sipehîtahîyeke cihêwaz heye. Min hê bi awayekî temam dilê xwe nedaye dîn û îmanê, lêbelê ez ji bo bilindahîya di îmana wî de heyran im. Ew, însanekî nimûne ye, ji her kesî cuda, zerîf, rûh-tenik, letîf û bi-nûr e.*

*Na, heke ew îmana ku tu min ji bo wê gazî dikî, îmana we be, ez di wê îmanê de nîn im... Lewra meyla min û dilxwazîya min jî di wê îmana di we de nîn e.. Lewra heke di dilê kesekî de bi sedan meyl ji bo îmanê hebin û ew bixwaze were îmanê jî, ji ber dijwarî û serhişkîya we, ewê hişkûhola bibe û sar bibe. Êdî di wî de meyla îman-anînê jî wê bi ber zeîftîyê bikeve. Lewra ew, di we de wilo dibe her ku bi navê Îslamê, navekî bêmane û markayeke ziwa dîtiye. Ev hal; ew qeder ecêb, bi sosret û bêmane ye her wekî ku bi çavê xwe li çoleke bêav binêre ji bo axeke berhemdar bibîne da ku têde gul û meywe-sebzeyan biçîne, û xwedî bike...*

*Bi qasî ku ez dikarim bibînim hemû cazîbe û nûranîyeta îmanê di îmana Bayezîd de heye. Zerreyeke îmana wî, yan jî dilopek ji wê, dibe ummanek.*

*Herçî îmana we ye, ji ber ku ew di qalikê de maye ji rîyakarî û şanîsazîyê re bûye yexsîr. Bawerîyeke bêkok û berwext wekî mûezzinekî deng-nexweş û bêrûh e ku divîyabû wî keyfxweş bikira; lê dide dûrkirin. Yanî îmana we, heke here nav bexçê gulan, wê ji gulan re bibe strî û wan ziwa bike.*

*Lêbelê taveroja îmana Hezretê Bayezîd ji feyza asîmanê rûhê wî mûbarekî dize û di vê alemê de diberiqîne, ev dinyaya nehêja, heta bi binê erdê jî dibe zumrud, dibe cennet; dinyaya dilî ya mûmînî jî dibe serkehnîya feyzê. Ji bo wê îman û sidqa Bayezîd, di dilê min û canê min de li hemberî îmanê arzûyeke bêtarîf, îştiyaq û hesret da şîyarkirin...*"

Her wiha şexsîyeta bilinda Bayezîdê Bistamî ku heta tesîr û bandor li agirperestekî jî kiriye, ew ji bo kesên ku dîn li xelkê didin hînkirin tabloyeke îbretê ye!..

Wî dostê mezinê Xuda, gelo ev şexsîyeta xwe çawa ava kir? Hîç şubhe nîn e ku wî şexsîyeta xwe bi hezkirin û pêbendîya Xuda û Resûlê wî ava kir... Teher û terza nêrîna Xaliq li mexlûqatan, yanî wî bi bûna mezher ji bo tecellîyata "**şefqet lî-xelqillah**"[şefqetkirina li mexlûqatên Xuda] şexsîyeta bilinda xwe ava kiriye...

Ev mîsal jî, ji bo dinyaya dilî ya dostê Heq Teala Bayezîdê Bistamî bidin xuyakirin zehf bi îbret in:

Bayezîdê Bistamî -quddîse sirûh- di navbera rêwengîyeke xwe de li bin darekê piçekê îstîrahet kiribû, paşê rêwîtîya xwe berdewam kiribû.

Di rê de li wî cihê ku wî bêhna xwe lê vedabû de dît ku wa ye, çend mîro çûne ser torbên wî û li ser wan digerin û ji cih û warê xwe dûr ketine, bi wî re hatine. Ew, ew qeder rê bi şûn de vegerîya, hate cihê ku lê bêhna xwe vekiribû û mîro jî ji bo cihê berê yê wan hiştin, ji bo wan mîroyan ji cih û warê wan mehrûm neke û heyata ğurbetê bi wan nede jîyandin.

Di rastîyê de Bayezîdê Bistamî dem dihat ew qeder, ew ji mehebbeta îlahî hessas û tenik dibû ku ji bo xatirê xaliqê zûlcelal îzdîrab û jana her yek ji wan mexlûqatên wî di sîne û singa xwe de his dikir.

Rojekê li pêşîya wî wisan li merkebekê dan ku ji pişt heywanê xwîn rûdibû, dirijîya. Di wê anê de xwînê destpê kir ji çîpên Hezretê Bayezîdê Bistamî jî rêz bû, hat...

Ev rewş, în‘îkas û xuyabûna vî exlaqê hemîd ê Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye:

Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li Medînê ji bo îstîrahet û tefekkura di navbera bostanê xurman de li nav bexçê zatekî Ensarî bû mêhvan. Hêştireke li wir, dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dît, nalîya û bi awayê girîyê însên hêstir ji çavên wê barîn. Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî ji hêştirê nêzîk bû, hêstirên wê paqij kirin, ew firkand û wilo hedana wê heywanê anî. Piştre xwediyê hêştirê bi van peyvên xwe îqaz kir û jê re got:

“*Ma tu di bara vê hêştira ku Xuda ew ji te re kiriye milk de, ji Xuda natirsî? Binêre, wê li cem min gileh kir. Tu vê birçî dikî, wê zehf didî xebatê û wê diwestînî.*”[300]

300. Ebûdawud, Cîhad, 44

Ji ber ku zatên wekî Bayezîdê Bistamî bi tezahur û xuyahîyên vî exlaqê Pêğember û exlaqê dîtirê wî yên wekî vî hatine stran, ew gihane qelbê selîm. Ji ber ku ew dilên bilind in, ew di her hal û karê xwe de li pey rêç û şopa Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dimeşin, diçin. Her yek ji wan bi her hal û reftara xwe nimûneyek ji ehlê îmanê ye. Bevkenî û tebessumên wan her wekî demsala biharê keyfxweşî û aramîyê didin dilan. Nezer û awira wan ji bo rûh û gîyanan dibe nesîm û sirwe. Ew bi sîmayên bi-nûrên xwe tim û daîm Xuda tînin bîra mirovan. Lewra ew tim û daîm ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] feyz û xuyahîya ji wî, werdigrin. Ev mîsal, vê feyz û eksê çi xweş îfade dike:

Mirîda **Hezretê Mewlana Gurcu Xatûn** mêrê wê paşa bû, ew ji bo Qeyserîyê hatibû teyînkirin. Gurcu Xatûn, ressam "**Eynûd-dewle**" ew ressam û xettatê meşhûrê Seraya Selçûqîyan şand cem Hezretê Mewlana ji bo bi awayekî nehanî û xefî resimê wî çêke û jê re bîne. Ressam ğafilane derket, çû hizûra wî û rewş ji **Hezretê Mewlana** re vegot. Wî jî bi awayekî bevkenî û mutebessim got:

"-Fermana ku li te hatiye kirin bi awayê ku tu arzû dikî, bîne cih!"

Ressam jî destpê dike resmê wî xîjk dike. Lêbelê di encamê de pê hesîya ku resmê wî xîjk-kirî ti elaqeya wî bi sîmayê li hemberî wî re nîn e, mûhtewayeke din li wî hatiye kirin, ji nû ve ew destpê dike wî xîjk dike. Bi vî awayî, dema wî resmê Hezretê Mewlana xîjk dikir, dibe şahid ku bîst caran şeklê wî hatiye guhertin. Ew nekarîna xwe fehm dike û mecbûr dibe ku dest ji vî karî berde. Lewra hunera wî, di nav xetên ku wî xîjk kirin de berze û winda bûbû.

Ev hadîse û rûdan dilê resmkêşî şîyar dike; ew di nav heyret, dehşet û lerzê de di hizên kûr de noq dibe û ev rewş wî dike seyyahekî alema enfûsî. Ressam di vî halî de ji xwe bi xwe re dibêje:

*"Heke welîyê vî dînî wiha bibe, kî dizane ka nebîyê wî çawa dibe?"* Êdî ew xwe ditewîne ji bo destê Hezretê Mewlana maç bike.

Mîsaleke din jî:

Em bi merhûm **Hezretê Samî Efendî** û digel merhûm bavê min **Mûsa Efendî** -quddîse sirrûh- ji Bûrsa'yê vedigerîyan dihatin Îstanbûlê. Li Yalova'yê ji bo em li vapûra erebeyan siwar bibin, em digel navgîn û wasîteyên xwe ketin ber dora xwe. Serğulamek ji ewaman li wir bû ji bo xirecir û teşqele çênebe, wesayît dixistin rêz û dorê û bi tertîbkirina erebeyan têkildar bû. Dema wî ji bo ereba me jî rê şanî dida, çavê wî bi Samî Efendî û Mûsa Efendî ket ku ew jî di palkursîyên paş de rûniştîbûn. Ew bi awayekî şaşo-maşo sekinî. Paşê nêzîk bû. Di cama erebê de hê ji nêzîk ve bi diqqettir li hundurê wê meyzand; bi dilekî kul wiha got:

*"Ellah Ellah, çi dinya ğerîb e! Têde hinek rû hene wekî melaîketan e!... Hinek rû jî hene, wekî Nemrûd in..."*

Ev hal, hîç şubhe nîn e ku bi awayekî bêherf û bêpeyv jî sade bi sîma tenê jî be ji bo doza Xuda sipehîtirîn xuyahî ye.

Her yek ji me wek mûmîn tişta ku dikeve ser milê me, divê em ji dinyaya dilî û qelbî ya evdên salih û bextiyarên wiha par û feyzê wergirin û em karibin şexsîyeta xwe îmar û avasaz bikin. Bi taybetî jî ew kesên ku li pêşîya civakan dimeşin û lîdertîyê ji wan re dikin, zerûrî ye ku li vê xusûsê miqate bin, yanî ew bala xwe bidin ser reftar û şexsîyeta bilinda ku karibe ji bo hîdayetê

bibe meğnatîs. Lewra wekî taqîbkirina tekerên paşên erebê ji bo tekerên pêşên wê însan jî, wilo li gorî nimûneyên ku li pêşîya xwe dibînin şeklê xwe digrin û wekî wan dijîn.

Berdewamîya nîzama cîhanî û qiwama pêkhatîya exlaqî, bes bi îrfanê yanî bi kûrbûnîya dilî mûmkin e. Kesên salih, di asoya seadet û aramîya memleketekî de tavên rehmê ne. Kesên ğafil jî, koncalên tarîtî û şevkorîyê ne. Ev îzahata **Ehmed Cewdet Paşa**, vê rastîyê bi awayekî zehf bariz dide xuyakirin:

“Ji Xelîfên Emewîyan **Welîd bin Ebdûlmelik** di mereqa avahîyên ku nû dihatin çêkirin û bağ û cotgehan de bû. Însan jî ketin mereqa avahî û cotgehan. Êdî bû ku di civîn û dîwanên wan de her behsa înşaat û cotgehan dihatkirin. **Suleyman bin Ebdûlmelik** jî, ji bo sefehatê meyldar, ji bo heyata herem [bi jinan re] û xwarinê heyran bû. Di zemanê wî de jî zînethezî, debdebehezî, zîyafetên mezin, sefehat û hewa û hewesan rêya xwe dîtin û çûn. Keyf û zewqperestî bûn modaya wê dewrê. Çi dema **Ûmer bin Ebdûlezîz** hat, ev xelîfê mezin, mirovekî abid û zahid bû. Di zemanê wî de xelk ketin rêya îbadet û îtaetê. Di dîwanên xwe de bû ku hesabê halên wekî van ji hev re digotin:

“Îşev, wirdên te çi bûn; te çend ayet ji Qur’ana Pîroz jiber kirin; Te vê mehê çend rojan rojî girt? [Tu çûyî ber serê çend ğerîb û bêkesan, te xwarina çend muhtacan û te çend ji wan hewandin?]...”[301]

Bêşiwar tesîra mûsbeta şexsîyetên kamilên wiha li ser însanan ji ber vê ye ku ew jî wekî perperîkan li hawîrdora ronahîyê digerin ji mehebbeta Mewla mişt û tije ne. Li ser vî esasî Mewla, ew çavê wan e, ê ku dibîne û ew guhê wan e, ê ku dibihîze.

301. Qisesû’l-Enbîya We Tarîxû’l-Xulefa, c. I, rûpel, 717

Yanî ji bo dostên Heq Teala di bin tecellîyata evîn û hezkirina cenabê Heq Teala de ne, wekî şewitîna kağezeke di bin mercekê de meylên nefsanî temenê xwe di wan de xilas kirine. Bi vî awayî, ji ber ku ew bûne merkeza cazîbeyeke nûranî, însanên din jî wek ğeyrê îradî bi rexê sipehîtîyên nûranî yên wan ve têne kişandin. Lêbelê ji ber ku wan xwe ji neperûşkên îltîfat û elaqeyên fanî xilas kiriye, ew di nav cehd û ğeyreta neketina avzêm û gera sifetên mezmûmên wekî serxweveçûn, xwe mezinkirin û xwedbînîyê de dijîn.

Hemû ğaye û hedefa wan rizaya Xuda ye. Li ser vî esasî bi nêrîna wan di navbera hindikî û gellekîyê, sarî û germîyê û zengînî û xizanîyê de yanî di navbera rutbeyên fanî û şertên îzafî de ferq nîn e. Lewra her yek ji wan ji zilla zewalê [siha berzewal] pêktê.

Ew bextiyar, nefsa xwe dixin halê tesbîh û îstiğfaran tim û daîm xwe di bin mûraqebê de digrin. Ew xwe ji kêmasî û qusûrên dîgerên xwe re jî kor û nebîn dikin.

Ew dilê xwe nadin zînetên berzewalên dinyayê û bi derbaskirina heyateke mûsteğnî heke çi qeder ji terefê dîgeran ve hinek caran werin şermezarkirin jî, rewşa wan wekî van sifetan e ku di ayetê de hatiye gotin:

وَعِبَادُ الرَّحْمَنِ الَّذِينَ يَمْشُونَ عَلَى الأَرْضِ هَوْناً وَإِذَا خَاطَبَهُمْ الْجَاهِلُونَ قَالُوا سَلاماً.

“**Evdên Rehmanî ew in ku li sererdê bi nefsbiçûkî birêve diçin û dema mirovên nezan bi wan re** [bi tiştên li xweşîya

wan neçe] **dipeyivin jî dibêjin: Silav li we be**! [û wilo derbas dibin]. ”[302]

Dinya ji bo evdên wiha xizmet dike û fermana ram-bûna ji bo wan jê re hatiye.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîf de dibêje:

“*Derdê kî axret be, Xuda zengînîya wî dixe dilê wî, karê wî ji bela-welabûnê xilas dike û dinya dixwaze jê re stûxwehr bibe. Derdê kê jî dinya be Xuda, xizanîya wî dixe pêşîya çavên wî, koma wî ji hev belav dike û ji dinyayê jî çi jê re hatibe teqdîrkirin, bes ew jê re tê*.”[303]

Şexsîyetên mezin, bûne xwedî tebîet û exlaqekî ew qeder bilind ku -kesê ji bo Xuda be, ew netêde ne- wekî din ti kesî naêşîne û ew ji ti kesî jî naêşin. Ew sirrê beyana îlahî jîyane:

الَّذِينَ يُنْفِقُونَ فِي السَّرَّاءِ وَالضَّرَّاءِ وَالْكَاظِمِينَ الْغَيْظَ وَالْعَافِينَ عَنْ النَّاسِ وَاللَّهُ يُحِبُّ الْمُحْسِنِينَ.

“**Ew in ku malên xwe di ferehî û tengasiyê de [di rêya Xuda de] înfaq dikin; hêrsa xwe diqurpînin û li mirovan dibûrin. Xuda ji qencîkarên [di îbadet û hemû halên xwe de] rast û durust hez dike**.”[304]

**Hezretê Caferê Sadiq**, xizmetkarê wî xwarin bi ser wî de rijandibû, ew jî şimûlîya vê ayetê jîyabû û ew efû kiribû, heta ew azad kiribû û îhsan û qencî lê kiribû. **Hezretê Hesenê Besrî**

302. Furqan, 25/63
303. Tirmizî, Sifetû’l-qiyame, 30
304. Alî-Îmran, 3/134

jî mirovên ku ğeybeta wî dikirin efû dikirin, hedîye ji wan re dişandin, bi vî awayî îhsan li wan dikir û ew terbîye dikirin.

**Hezretê Yûnus Emre**'yê ku halê xwe ji halê sipehî yê van mezinên Îslamê wergirtiye, çi xweş dibêje:

*Bi Rojî, Nimêj û Hecê*
*Zen neke ku xilas dibe îşê zahidîyê*
*Ji bo bûna însanê kamil*
*Ya lazim îrfan bûye!*

**Welhasil**; evdên salih, ji bo hemû însanîyetê nimûneyek ji ehlê îmanê ne, di her halê wan de şefqet, xêr û qencîya ji bo mexlûqatan heye û ji bo Xaliq jî di îbadetekî mexfî û veşartî de ne. Nefesên wan tesbîh in. Ewên ku bi wan re hesabê hal û têkil dibin, bi saya lezzet û şîranîya îlahî ya ku t'em dikin di nav wecdê de dijîn. Lewra dilê wan evdên xas, ji ber ku ji keyfxweşîya Mûhemmedî têr û tije ne, bi qasî amadekarîya mûxateban, çendîn nesîb û feyzên manewî teqdîm dikin.

Li ser vî esasî, ji bo îstîfade-kirina ji dostên Heq Teala divê mirov li dinyayê bi wan re be. Her wiha dema ew ji bo alema ebedî koç bikin jî divê dîsa mirov bi wan re be. Di xusûsa bûna bi wan re de pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wiha dibêje:

"*Mirîyên xwe di navbera însanên salih de defin bikin.*"[305]

Ew evdê salih in ku cenabê Heq Teala ji ber şexsîyet û fezîletên wan di piştî wefata wan de cesedên wan bi erdê nade xwarin. **Cabir bin Ebdûllah** -xuda ji wan razî be- vedibêje:

305. Deylemî, Mûsned, I, 102

“Şeva berî Herba Uhudê bavê min gazî min kir û ji min re got:

“-Ez zen dikim ku ji sehabîyên pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] yekem kesê ku şehîd bikeve wê ez bim. Ji bilî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wekî din bi qîmettirîn kesê ku ez li pey xwe bihêlim tu yî. Deynê min hene, tu wan eda bike. Tim û daîm ji birayên xwe re jî qenc be!..”

Sibehê li Uhudê yekem kesê ku şehîd ketî bavê min bû. Bi sebeb zerûretê min ew bi şehîdekî din re di qebrekê de defin kir. Piştre nefsa min pê xweş nebû ku ez wî bi yekî din re di eynî qebrê de bihêlim. Piştî şeş mehan min ew ji qebrê derxist. Min ew dît ku wa ye ji bilî hinek ji guhê wî wekî din min roja ew xistibû qebrê çawa bû eynî wilo mabû. Min ew bi tena serê wî di qebrekê de defin kir.”[306]

Ha halekî bilind û nimûneyî yê salihekî ji ehlê îmanê ev e!

Ji bo vê rewşê, mîsalek ji tarîxa nêzîk jî, ehlê îstîqametê, mûezzinekî hafiz ê Adanalî bû. Yek ji dostên Xuda **Mehmûd Samî Remezanoğlû** -quddîse sirrûh- li Edenê wek şahidekî bûyerê hadîsê ji me re diguhêze, vedibêje:

Piştî wefata vî mûezzinî bi sih salan bi sebeb derbasbûna caddê zerûret hasil bû ji bo qebra wî vekin. Dema qebra wî vekirin, dîtin ku wa ye, ew çawa defin kiribûn bedena wî wilo mabû, xirab nebûbû û kefenê wî jî têr rohnî û hê sippî bû.

Di tarîxa Îslamê de zehf zêde mirov li rîwayet û mûşahedeyên wekî vê rast tê. Ev tecellîyatên îstisnaî yên cenabê Heq Teala ne li ser hinek evdên Salih ên wî, ew ji bo îbret, îrşad û îqazê ne. Heke na însanên salih jî wekî her însanê ku wefat dikin wê bedena wan

306. Buxarî, Cenaiz, 78

bibe ax. Lutfên îlahî yên wekî xirab-nebûna cesedê hinek salihan di piştî wefata wan de jî keyfîyeteke xasê hikmet û îradeya Xuda Teala ye.

Ya mûhîm qezenca ebedîyeta me ye ku ew jî bi vê hasil dibe; li alîyekî divê em hewl bidin ji bo bibin mirovên wekî van şexsîyetên bilind, li alîyê din jî divê em hewl bidin ji bo karibin ewladên xwe wek mirovên salih perwerde û xwedî bikin.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîf de ferman dike, dibêje:

*"Ellah Teala li Cennetê dereceya evdê salihê xwe bilind dike lê evdê wî dikeve heyretê, dipirse, dibêje: "Ya Rebbî, ev terfî bi çi sebebê ji min re hate dayîn?" Ellah Teala jî dibêje: «Bi sebeb dûa û îstiğfarên ku zarokê te ji te re kiribûn..."*

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi vê xusûsê re têkildar di hedîseke şerîfa din de jî dibêje:

"*Dema însan dimre sewaba emelên wî tê birrîn. Lêbelê ev hersê tişt cuda ne: Sedeqa carîye, îlmê ku jê tê îstîfadekirin û* ewladê salihê ku di piştî wî de jê re dûa dike.."[307]

Emrê ku bi dilekî rûhanî tê jîyandin, sererdê dixe cennet. Rehm û lutfa Xuda li ser mutteqîya ye, ew ji bo wan wek mûkafatê ye. Zirweya seadeta heyata dinyayî û destpêka seadeta ebedî ev e ku em karibin bi mehebbeta Mûhemmedî di demsala bihara Mûhemmedî de bijîn. Di dirêjahîya emrê me de divê wezîfa me ev be: Divê em li pey rêç û şopa Wî herin. Divê em mirovên ku li pey rêç û şopa wî çûne jî taqîb bikin ji bo em karibin heysîyeta ummet bûna ji bo wî biparêzin.

307. Muslim, Wesîyet, 14; Tirmizî, Ehkam, 36

**Cenabê Heq, me bi îfakirin û bicihanîna vê wezîfê lutfdar bike. Wê kerema xwe li me bike ku em di dirêjahîya emrê xwe de wek nimûneyekê ji ehlê îmanê yên wekî Ûmer bin Ebdûlezîz, Bayezîdê Bistamî, Mehmûd Samî Efendî û yên dîtirê wekî wan bijîn. Me tevan bixe nav zumra wan bextiyarên ku ji bo ummetê bûne merkeza cazîbê!**

**Amîn!..**

# Qeder û Esrarê [razên] Wê



*Taqeta çavan ji bo dîtinê û taqeta guhan ji bo bihîstinê heta bi mesafekeke dîyar e. Dîtin û bihîstina tiştê ji wê mesafê dûr, bê îmkan e. Eynî wekî vê, bi awayekî layiq îdrak-kirina qeza û qederê jî li derveyê taqeta beşerî ye. Lewra em hewl didin hadîse û bûyeran bi sebeb û behane-yan bizanin û wan vewejêrin, çareser bikin. Em, bi zehfî hikmeta di pişt wan de îdrak nakin.*

## Qeder û Esrarê [razên] Wê

Di kaînatê de; ji zerreyê bigre heta bi kurre'yê, ji daneyê [libê] bigre heta bi qubbeyê, ji "mîkro"yê bigre heta bi "makro"yê û heta bi alema "normo"ya ku di paşerojê de diqewime jî, ew qedera ku ji temamê hadîse û bûyeran re zeman, mekan, şekl û sebeb têne dîyarkirin heta bi hûrtirîn kitekiteyên wê jî û ew programa qeza'yê ku dema wextê wê tê, tê îcrakirin, bi ezemeteke layiqê îhtîşama îlahî hukmê xwe dide dewamkirin.

Ellah Teala heyber û mexlûqan bi qederekê diaferîne û bi wê qederê wan birêve dibe. Şopa hadîse û bûyeran di rêyên heyatê de di heqîqetê de xet û xîjkên qederê ne. Roj, heyv, stêr, gîya, însan, heywan û her wiha ne yên din jî, rêveçûna hemû heyberan di naveroka program û bernameya vê qederê de ye. Heta peleke ku ji çiqilê xwe dikeve jî, ne li derveyê vê programê ye. Heke heyber ji bo programa qederê ne peyrew bûne, li kaînatê anarşîyeke [berdîberdaneke] mezin dihat meydanê.

Her esereke hunerê, li gorî şîyan û derfeta hunermendê xwe tê meydanê. Mesela ressamek tabloya xwe, xettatek berhema destxeta xwe li gorî vîyan û qabilîyeta xwe pêktîne. Ellah -celle celalûhû- jî ji aferandina kaînatê heta bi tinebûna wê herkên qudretê yên ku ewê wan li wê derê şanî bide, sirr û hikmetên di însanî de ku xarîqa hunerekê ne, ji zayîna zindîyên din heta bi mirina wan taybetmendîyên ku ewê ji wan re bibin xwedî, tev bi îradeya îlahî ya xwe ew ji ezelê de teqdîr û tesbît kirine..

Ha **qeder**, navê keyfîyeta vê tenzîmê ye ku ew mehsûl û berê îradeya îlahî ye. Cenabê Heq Teala vê heqîqetê di ayetên pîroz de wiha dibêje:

إِنَّا كُلَّ شَيْءٍ خَلَقْنَاهُ بِقَدَرٍ.

“**Bêşiwar me her tişt bi pîvanekê [qederekê] aferandiye**.”[308]

مَا أَصَابَ مِنْ مُصِيبَةٍ فِي الأَرْضِ وَلا فِي أَنْفُسِكُمْ إِلاَّ فِي كِتَابٍ مِنْ قَبْلِ أَنْ نَبْرَأَهَا إِنَّ ذَلِكَ عَلَى اللَّهِ يَسِيرٌ.

“**Çi mûsîbeta ku li erdê biqewime û çi jî were serê we jî, beriya ku em wê bixuliqînin her ew di kitêbekê de hatiye nivîsîn. Bêşiwar ev, li ber Xuda hêsan e**.”[309]

Bi kurtî; **qeder**, ji pêşî de tertîbkirina Xuda Teala ji bo wan hadîse û bûyerên ku hê ew çênebûne û tesbît û dabînkirina wan di lewha mehfûzê de ye. **Qeza**, dan bicihkirina wan tiştan e ku wî ew di lewha mehfûzê de tesbît kirine, bi wî şekl û awayê ku wî plan ji wan re danîye, çi qas dora rûdana wan were.

Zanîna cenabê Heq Teala bi sifetê “**îlm**”ê xwe ji bo rûdan û hadîseyên ku hê nehatine meydanê mûqteza û lazimîya ulûhîyeta wî ye. Ji cîhetê mûnezzeh-bûna Ellah ji zeman û mekanî, zehf tebîî ye ku ew ji van malûmatan agahdar be. Lewra ji bo me ew şertên ku têgihiştina qeder û qeza’yê zor û zehmet dikin, ew ji bo Ellah Teala ne mewzû-behs in.

Bawer-kirina ku li kaînatê her tişt li gorî xîjk û xeta qelemeke îlahî hatiye meydanê zerûrî ye. Qeder, digel ku ji her şeş esasên îmanê ya xwerûtirîn e jî, di eslê xwe de rastîyeke wisan e ku her kes bi îttîfaq wê qebûl dike. Di vê xusûsê de însanên bêbawerî jî, bi vê gotina xwe “**nivîsa li ser enîya min**” tesîra

308. Qemer, 54/49
309. Hedîd, 57/22

qudretekê di ser qeweta xwe de bi bê-îtîraz qebûl dikin. Heta înkarçî bi xwe jî, bi awayê van îfadeyên xwe "**şensê min lê hat**" yan jî "**şensê min ji min ğeyidiye**" şanî didin ku her însan, heke ne rasterast be jî di bin-hesta xwe rastîya qederê tesdîq dike.

Ev komik û cumleyên ku ji şanoyeke **Necîb Fazil** hatine girtin, ew bi awayekî zehf ciwan çi xweş dide îfadekirin ku qedera mechûl, rastîya xwe bi însanê ku tefekkur dike, dide qebûlkirin. Ew wiha dibêje:

"... Mesela rojekê li meydana Emînonûyê otomobîlek, pê li zilamekî dike. Em herin deh deqîqeyên berî rûdanê. Zilam, mesela li pêşîya parka Gulxanê ye. Em bibêjin, otomobîl jî ji Teqsîmê tê. Hûn dîmenê dibînin? Otomobîlek ji nav hezar otomobîlan û zilamek ji nav sed hezar zilaman tê! Ne ew zilam dizane otomobîl wê pê li wî bike; ne jî otomobîl dizane ku ewê pê li wî bike... Herdu jî bi çendîn tesaduf û rasthatinîyan (!) bê zanîn bi rasta hev û din ve ji hev nêzîk dibin. Mesela, zilam li pêşîya dikanekê radiweste. Li vîtrînekê temaşe dike. Qotîyek qiştik [kîbrît] dikirre. Gavekê du gavan diavêje. Bi hevalekî xwe re diaxive. Vîtrînekê temaşe dike. Ev hereketên bêguneh jî piştî çend hûredeman pişkên wî di felaketa ku rûdide de, hene. Ev rûdan tev, bi awayekî esrarengîz û razdar dikevin nav hev û tevre derbas dibin, di dawîyê de wextê wê felaketê diwelidînin. Ew an û dem, heta tu bibêjî bes, pala xwe dispêre sebebekî besîtê dawîyê. Bêhişîyek, nezanînek, ew, ev... Kî dizane ku ev tesaduf û rasthatînî (!) çawa û ji kuderê têne birêvebirin, heta tu bibêjî bes ew tevlîhev in û hesabekî wan heye ku mirov nikare ji nav wî derkeve."[310]

Ha însanekî ku karibe bi awayekî layiq vê rûdanê û hadîseyên wekî wê di heyatê de tefekkur bike, ewê her bawer bike ku ev

310. Bir Adem Yaratmak, rûp. 43

senaryoyên bêdawî, yên ku di qada kaînatê de têne şanîdan, di îstîqamet û rasta xîjk û xeta qelemeke îlahî de xuya dibin, têne wicûdê.

Lêbelê çawa ji bo mirovekî ku nabîne reng nayêne tarîfkirin, eynî wilo ew însanê ku bi întîbayên ji alema dinyayê girtin dihizire, bi îdraka beşerî ya ku bi qeyda zeman û mekanî ve bend e, nikare bi awayekî layiq û mûnasib bigihîje sirra keyfîyet û mahîyetên bilind ên wekî qeza û qederê.. Ev rewş, li ser hikmeteke wiha hatiye avakirin, ji bo însan nekevin wê qeleq û bê-aramîya bi sebeb waqifbûna wan li ser hinek raz û esrarên ku nikarin tehemmul bikin û xwe li berê bigrin.

Bi rastî cenabê Heq Teala qeder, ji bo temamê mexlûqatên xwe kiriye mechûl û zanîna wê jî berîya ew bibe qeza û pêkwere, bê îmkan kiriye. Di vê qadê de cenabê Heq Teala ew kesên ku piçek **îlmê ledunî** dabe wan, bes nesîbê wan jê çêdibe.

Merhemeta bêdawîya Ellah Teala lazimî xwe dike ku qeder, ji mirovan re mechûl bimîne, ew neyê zanîn, tesewwir û mûtefekkireya însên nikaribe ji wî dîwarê bilindê bi navê ğeybê derbas bibe. Lêbelê dîsa jî bi saya lutfa Heq Teala hinek rewşên cihêwaz û mûstesna hene ku ev asteng tê derbaskirin û pişt dîwar tê temaşekirin. Yek ji van rewşên mûstesna jî xewnên rast in. Bi rastî xewnên ku kesên salih di bara xeberên paşerojê de dîtine jî rastgoyîtîya wan zehf hatiye dîtin. Ev xewn, şewqek ji "lewha mehfûzê" ye, xwe di qelbê wan de dide xuyakirin.

❀

"**Îradeya cuz'î**" ew şîyana însên e ku di bara kirina tiştên mûsbet, yan menfî, xêr, yan şerrê de selahîyeta xwe bikartîne. "**Îradeya kullî**" jî, ew bes di dest Xuda Teala tenê de ye. Bi vê sebebê ji bo bendeyî, azadîya mûtleq bê îmkan e. Ev karûbarên

ku însan nikare destê xwe bixe nav wan, her wekî zayînê, mirinê, mûddetê emr, cinsîyet, millîyet û qabilîyetê, di nav mûhtewayê qedera mûtleq de ne. Însan, ji van kirin û fiêlên ku ji neçarîya xwe tabî‘ê wan e, ne berpirs û mes’ûl e.

Cenabê Heq Teala, bi qasî îmkanên ku dane evdê xwe, wî berpirs digre. Ji lewma di fiêlên ku li derveyê îradeya wî têne meydanê de ji însanî re ne mûkafat heye, ne jî mûcazat. Çawa ku mirovekî bi rojî, dema li derveyê îradeya xwe bi sebeb jibîrkirinê bixwe, yan vexwe, rojîya wî naşike û ji ber vê kirina wî jê re ti ceza jî nîn e.

Cenabê Heq Teala di ayeta pîroz de bi awayê ku dibêje: “**Xuda her kesî bes bi qasî taqeta wî, wî mûkellef dike...**”[311] ji taqeta însên bêhtir bar lê nekiriye. Lêbelê wî her kes jî bi qasî taqeta wî kiriye mes’ûl û berpirs. Digel ku taqeta wî heye jî bicihneanîna îcaba wê û sûcê xwe xistina stûyê qederê, berhema ğeflet û cehaleta wî kesî ye.

Ellah Teala, bi sebeb ku însan bi îmtîhanê bend e û heyberekî berpirs e, esasên fisq û teqwayê xistine nefsa wî; di xusûsa ku ew dikare îradeya xwe bi serbestî ji bo herdu terefan jî bikarbîne de heqê tercîhê jê re hatiye dayîn. Yanî li vê dinyaya fanî di nav hinek sînorên dîyarkirî de serbestîyek ji însên re hatiye dayîn. Ev eynî wekî vê rewşê ye ku zarokek xercîyekê ji bavê xwe wergire û ew ji bo serfkirina wê di xêrê yan jî di şerrê de hatibe mûxeyyerkirin û pê sipartin. Ha ev mûxeyyertî, ji bo seadeta ebedî, yan jî felaketê mûhîmtirîn sermaye ye.

Li kaînatê heta pelek jî nikare bê îradeya Xuda bilebite. Yanî digel ku di her pêkhatinekê de îradeya cenabê Heq Teala heye, lêbelê rizaya wî sade ji bo xêrê tenê heye. Ğaye’ya xoceyekî jî,

311. Beqere, 2/286

serkeftî-bûna telebê wî û sinif derbaskirina wî ye. Heke telebe nexebite, xoce bi xwe nikare tiştekî jê re bike. Dîsa wezîfa doktorekî jî, bi şîfayê gihandina nexweşê wî ye. Lêbelê heke nexweş bi xwe receteya ku jê re hatî dayîn tetbîq neke, ew ji netîca menfî ya ku çêdibe, berpirs e. Ti kes nikare sûc bixe stûyê doktorê wî.

Ji ber vê, gotina şexsekî ku ketibe rêyeke xirab; "ma ez çi bikim, qedera min halo bûye!" ew bes mûqteza û lazimîya ğefleta wî ye. Kesekî ku bixwaze nimêj bike, cenabê Heq Teala sebebên nimêj-kirinê jê re îhsan dike; ewê ku naxwazin nimêj bikin ji wan re jî sebebên astengker dide wan û nedan-kirina wê tecellî dike. Ji lewma bûhtan û bêbextî-kirina însanî li qederê û xwestina wî ji bo xwe mazûr şanî bide, ew neheqîyeke ku li dijî heq û heqîqetê hatiye kirin.

Cenabê Heq Teala di ayeta pîroz de wiha dibêje:

إِنَّ اللَّهَ لا يَظْلِمُ مِثْقَالَ ذَرَّةٍ.

"**Bêşiwar Xuda, bi qasî giraniya zerreyekê jî li ti kesî neheqiyê nake**."[312]

وَمَا أَصَابَكُمْ مِنْ مُصِيبَةٍ فَبِمَا كَسَبَتْ أَيْدِيكُمْ وَيَعْفُو عَنْ كَثِيرٍ.

"**Çi belaya ku were serê we, ew bi sedema wan gunehan e ku we bi destên xwe kirine. Digel vê jî Xuda, li gellekan** [ji gunehên we] **dibûre jî.**"[313]

**Hezretê Mewlana** -quddîse sirrûh- jî, her wekî ku di siha tefsîra van ayetan de dibêje; însan bi qasî îradeya cûz'î ya xwe

312. Nîsa, 4/40
313. Şûra, 42/30

mes'ûl e, û divê ew sûc nexe stûyê qederê. Ew di *Mesnewî* ya xwe de vê rastîyê wiha îfade dike:

"*Heke strîyek di te re here, zanibe ku te ew strî çandiye! Heke tu di nav qumaşekî nerm û letîf de bî, ew qumaş jî te tevinandiye!*"

Taqeta çavan ji bo dîtinê û taqeta guhan ji bo bihîstinê heta bi mesafekeke dîyar e. Dîtin û bihîstina tiştê ji wê mesafê dûr, bê îmkan e. Eynî wekî vê, bi awayekî layiq îdrak-kirina qeza û qederê jî li derveyê taqeta beşerî ye. Lewra em hewl didin hadîse û bûyeran bi sebeb û behaneyan bizanin û wan vewejêrin, çareser bikin. Em, bi zehfî hikmeta di pişt wan de îdrak nakin. Çawa ku dema yekî pirsa qeza û qederê jê kir, **Hezretê Elî** -xuda jê razî be- jê re got:

"*Ew mijar, deryayeke kûr e!*"

Ewên ku bi zekaweta xwe bawer bûne û hewl dane di wê deryayê de avjenîyê bikin pirranîya wan, bûne "**ceberî**" ku dibêjin; hîç ti îradeyek ji evdî re nîn e, yan jî bûne "**qederî**" ku dibêjin; evd di her xusûsê de xwedî îrade ye, yanî ew di gerên batil de her digerin û wilo têde dimînin.. Di dawîyê de jî ew di wê deryaya bêbinî û bêsahil de dixeniqin û diçin.

Ji ber vê sedemê, heta em bi awayekî durust tixûbên îradê diyar û tesbît nekin ku ew serkehnîya berpirsîya însên teşkîl dike, em nikarin xwe ji ketina şaşîyan rizgar bikin. Di rastîyê de dîtina evdî wek xaliqê kirina xwe û bi pûtkirina îrade û qudreta tercîha wî, yan jî înkarkirina îradeya cûz'î û qebûlkirina însan wek heybereke otomat jî keyfîyeteke ji hizr û qaîdeyên bingehîn ên dînê me re dijber e. Ya rast, însan xwedî îradeyek û tercîh e, lêbelê ev jî ji terefê cenabê Heq Teala ve jê re hatiye bexşkirin.

Di mijareke wiha zor de ku eql û îdrak têde heyirî û bêçare mane, heke çi qeder mûmkin be ku mirov bi teslîmîyetê di alema dil de miqdarek mesafe qut bike jî, lêbelê ne mûmkin e ku mirov bi maneya mûtleq sirrê vî karî çareser bike. Ev, fehm-kirin, heddê xwe zanîn û kotekî nekirin ji bo derbasbûna ji vê biwêdetir îcaba evdînîyeke kamil e.

❀

**Hezretê Mewlana** dibêje; îdraka sirrên qederê û îzahkirina wan bi eql ne mûmkin e, ev nehênî [û ne zanîna sirrên qederê] jî di eslê xwe de nîmeteke mezin e. Ew di *Mesnewî* ya xwe de vê rastîyê jî bi vê qissetê çi xweş îfade dike, dibêje:

“Zilamek hate cem Mûsa -silavên xuda lê bin- û jê re got:

“-Ey Kelîmûllah! Zimanê heywanan li min hîn bike! Da ku ez peyvên wan fehm bikin û ji halê wan îbret bigrim; da ku ez ezemeta îlahî îdrak bikim!...”

Hezretê Mûsa jê re got:

“-Tu dev ji vê hewesê berde; dev ji hînbûna tiştê ji qeweta xwe zêdetir berde! Heke mîrokek rabe ji golê,ji hecmê xwe zêdetir avê vexwe, ewê bixeniqe û biçe helakê. Yanî tu kotekîyê neke ji bo ji zanîna ku ji te re hatiye dayîn, derbas bibî! Lewra gellek xeterên vê hene! Tu li kaînatê ji selteneta îlahî ya ku eqlê te têrê dike, lê binêre îbret jê bigre! Berê dilê xwe bide Xuda! Zanibe ku sirrên tecellîyatên îlahî ji qelbekî selîm re eşkere dibin!”

Vêca wî zilamî jê re got:

“-Naxwe heke hîç nebe jî zimanê seyê ku li ber derîyan dimeğele û pasevanîyê li malê dike û zimanê heywanên qinikan li min hîn bike!”

Mûsa -silavên xuda lê bin- fehm kir ku ew çi jî bike, ewê nikaribe wî ji daxwazîya wî vegerîne, vêca teleba dawîya wî qebûl kir. Lêbelê ew îqaz kir û jê re wiha got:

"-Eqlê xwe bide serê xwe; di vê oqyanûsa sirran de noqav nebe!"

Ew zilam sibehê li ber pêpelinga derî radiweste û li berê çavnêrî dike ji bo xwe biceribîne dibêje: "Ka ez binêrim bera ez zimanê van heywanan hîn bûme?"

Di wê navê de dema jina xizmetkar sifre diweşand, qetek nanê hişk kete erdê.

Dîk li wir bû derhal xwe çend kir wî qetê nan û ew ji xwe re girt. Se jê re got:

"-Te zulm li me kir! Lewra tu dikarî libên genim jî bixwî. Haleveku ez nikarim wan bixwim! Tu çima vî qetê nanê nesîbê min ji ber min digrî û dibî?"

Dîk jî ji se re got:

"-Ji xwe re nexe derd! Sibê hespê xwediyê malê dimre, tu jî dê têr têr goşt bixwî!"

Xwediyê malê zen kiribû ku dîk ji ğeybê xeber daye, dema ev peyv bihîstin, derhal hespê xwe firot. Dîk jî li hemberî seyî mehcûb û şermezar bû.

Ev pevketina dîk û se ji bo menfîetê li wir tam sê rojan berdewam kir. Xwediyê malê ji dîk hîn bû ku roja yekê hespê wî, roja duduyan hêstira wî, roja siseyan jî wê koleyê wî bimre, wekî ku wî berî mirina wî hespê xwe firot, zen kir ku wî jîrîtî kiriye ew ji dest xwe derxistin, rabû hêstira xwe û koleyê xwe jî firotin û wilo ew ji dest xwe derxistin.. Bi vî awayî se, ji yekê ji wan jî ew menfîeta ku hêvî dikir, pê negiha. Êdî dîkî di her carê de se

xapand. Dîk li hemberî tişta bûyî sê caran şermezar bû, paşê wî di roja çaran de ji se re got:

“-Rastî ev e ku wî malxweyê çav-vekirî qaşo malê xwe revand. Lêbelê wî bi vê bizava xwe, xwe kuşt. Êdî sibê ewê bimre! Mîratxwerên wî jî wê bikin feryad û fiğan. Gayek wê were serjêkirin, her kes wê jê îstîfade bikin; em jî û tu jî!..

Mirina hesp, hêstir û kole ji bo bela û qezayên xirabên ku wê hatibana serê vî zilamê negihayî sîper û mertal bûn. Lêbelê wî ji derdê ziyankirina malê xwe û li zirarê ketina wî bazda û wî xwe kuşt.”

Zilamê ehmeq, dema guhê xwe da vê peyva dîk. Li hemberî heqîqeta ku bihîstî çavê wî şaqis bûn û rengê wî zer bû. Pêteke dehşetdar kete hinavê wî. Wî bilezûbez bazda, hate cem Hezretê Mûsa û bi bergerîn û lavlav jê re got:

“-Ey Kelîmûllah! Bi hawara min ve were û çarekekê ji êşa min re bibîne!”

Mûsa -silavên xuda lê bin- jê re got:

“-Te telîya xwe kire nav îşê ji qama xwe mezintir. Vêga jî tu bingirteyan de diçî û têyî. Ma te zen dikir ku tu yê bi firotina wan heywanan bi qezenc bî? Min bi israr ji te re gotibû kotekîyê neke ji bo tu sirrên qeza û qederê hîn bibî. Ji bo kesê eqilmend, tişta ku paşê jê ew were dîtin, ew pêşîyê jê re tê dîtin; ya mirovê ehmeq jî di paşîyê de jê re tê dîtin!.. Lêbelê hingê êdî bûye ku kar xilas bûye. Ma tu di nav ticaret û firotinê de bûyî hotsa; de vêga jî canê xwe bifiroşe û xilas bibe!”

Lêbelê ji ber ku ew bi poşmanîyeke mezin lavlav jê kir, Hezretê Mûsa -silavên xuda lê bin- jê re got:

“-Êdî tîr ji kevên hatiye berdan! Êdî îmkan nîn e,  ew bi şûn de hîç venagere. Lêbelê ez ji xwediyê lutfê ji Heq Teala dixwazim ku dema tu bimrî, tu li ser îmanê bimrî!”

Mûsa -silavên xuda lê bin- xwe avêt ber penaha cenabê Heq Teala. Bi vî awayî, bi saya bereketa dûaya Kelîmûllah di hemberî canê wî zilamî de ew li ser îmanê çû. Ji bilî vê jî dema Ellah Teala ji Hezretê Mûsa re got:

“-Ya Mûsa! Heke tu bixwazî, ezê wî sağ bikim...” Hezretê Mûsa got:

“-Ya Rebbî! Hemd û senayên bêdawî ji te re bin! Tu li dinyaya wîyalî, di wê alema rewşen û bilind de wî vejîne! Lewra ew der ebedî ye, esrarên qeza û qederê li wir dertên holê!”

Wekî ku ji vê hîkayê hatiye fehmkirin însan, carina bi israr û çikûsî tiştên ku ji wî bi xwe re ne xêr in jî dixwaze û her dixwaze. Haleveku tişta ew arzû dike, belkû yê wî jî bibe helakê. Çawa ku însanê katibe encameke wiha, digel ku ji ber ğefleta xwe wî ew bi israr xwestiye jî dîsa ew nikare xwe ji poşmanîyê rizgar bike, dike gazî û hawar, feryad û fîğan. Bi sebeb vê ye ku li dinyayê ji bo aramîya dil û li axretê ji bo seadeta ebedî ya mûnasibtir ev e ku mirov vê ezemeta îlahî îdrak bike û karibe tewekkul û teslîmîyetê şanî bide. Lêbelê ev jî ne karê her kesî ye. Sermayê bêdawî yê însanî ev e ku ew karibe hîçbûna xwe fehm bike. Yanî tekane çare li hemberî qeza û qederê, teslîmbûna ji Heq Teala re ye. Lewra tewekkul û teslîmîyet, derîyekî rehmê ye ku qederê dixe halê sefa û ronahîyê.

Çawa ku mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye:

"*Bawerî-anîna bi qederê, her cure kul û kederan dibe.*"[314]

Lêbelê wergirtina riza, teslîmîyet û tewekkulê, wek pasîfî û tenbelîyeke wilo ku mirov hîç tedbîrekê wernegire û ji bo astengkirina belayên ku dê werin jî ti ğeyretekê şanî nede, têgihiştineke zehf şaş e.. Tewekkul ev e; mirov ji bo celba xêrê û defaa şerrê her cure tedbîran wergire paşê jî di bara encaman wan de jî ji cenabê Heq Teala re teslîm bibe û xwe bispêre penaha wî. Heke na, bêyî serlêdana li sedeman tewekkuleke ziwa ne meqbûl e. Hem jî ev rewş, keyfîyeteke wilo ye ku ji bo rûhê tewekkuleke rastîn dijber e.

Çawa ku **Hezretê Ûmer** -xuda jê razî be- dema di rêwîtîyekê de bû, li ser çûna Şamê bû, xeber jê re hat ku li wir nexweşîya şewbê rûdaye. Di netîca raw-şêwrê de ji bo neçûna Şamê qerar da. Di eslê xwe de ev îhtiyat û tedbîr ji bo fermana Heq Teala û pêğemberê wî mûwafiqtir bû, lê dîsa jî li hemberî vê yek ji sehabîyan **Ebû-ûbeyde bin Cerrah** -xuda jê razî be- ji Hezretê Ûmer -xuda jê razî be- pirs kir, jê re got:

"-Ma tu ji ber qedera Xuda direvî?" Hezretê Ûmer -xuda jê razî be- jî ji ber ku Hezretê Ûmer pirseke wiha ji sehabîyekî wiha alim û fazil hêvî nedikir, bi van peyvên xwe bersiva wî da, jê re got:

"-*Ya Ebû-ûbeyde! Xwezî ne te, lê yekî dî ev gotiba. Erê, em ji ber qedera Xuda direvin û dîsa diçin ber qedera Xuda. Ma tu çi dibêjî, heke hêştirên te hebin, ew dagerin herine newalekê ku terefekî wê berhemdar be û terefê din ê wê jî şorik be, ma heke tu wan li terefê berhemdar biçêrînî; yan jî tu wan li terefê şorik biçêrînî, te ew ne bi qedera Xuda çêrandine?*"

314. Suyûtî, Camîûs-Seğîr, I, 107

Wekî ku hate dîtin, mirov neşê derkeve derveyê qederê. Ji ber vê, tişta ku dikeve ser milê însên, bila tedbîra xwe bigre û ji bo wergirtina netîca baştir jî hewl bide. Paşê jî Xuda kîjan netîcê teqdîr bike, bila mirov her pê razî bibe.

Nehanîtî/nependîtîya di qederê de û keyfîyeta ku evd neşê bi awayê layiq wê îdrak bike, ji bo mirovên ku di pencera hikmetê de lê dinêrin, ne sedemê qehrê ye, tam berevajî vê heta tu bibêjî bes ev wesîla lutf û keremekê ye. Lewra heke însan qederê zanibe, ev heqîqeteke wisan eşkere ye ku hîç ti kes nikare vê înkar bike;  ewê bikeve gellek xeter û felaketên ku mirov nikare xwe ji nav wan derxîne û xwe ji wan xilas bike.

Mesela bi saya mechûlîyeta qederê, ew însanê ku bi nexweşîyekê dikeve ku qet dermanê wê nîn e û ewê her bimre, heta wê dema can bide jî ji fikar û endîşeyan dûr dimîne. Lêbelê heke ti kesekî zemanê mirina xwe zanîba, salên ku mirina wî nêzîk bûyî, wê ji kul û kederan dest û lingên wî şeht bûbana, ewê bikêrî tiştekî nehatibana, ewê ne careke tenê lê bi sed caran her roj carekê miribana û dîsa sağ bûbana. Dêyeke ku zanibe ewladê wê yê berîya wê bimre jî, ewê berî mirina wî bi salan ketibana rewşa matemînî û şîna wî kişandibana. Di encamê de vê rewşê, wê bi lazimîya ahengîya di heyatê de nakokî teşkîl kiribana û hingê hevkêşî û mûwazene jî winda dibû.

Di zemanên dawîyê de stres, diltengî û xwekujî yên ku her zêde dibin encameke ğemnak e ku mehrûmîyeta ji manewîyatê wan bi xwe re tîne meydanê. Lewra dilekî ji perwerda manewî dûr, zehf tebîî ye ku ew ji arzû û îhtîrasên nefsanî re êsîr bibe. Jîyîna rewşa teslîmîyeteke ku karibe surprîzên heyatê bi metanet û sikûnetê pêşwazî bikin, ew bi saya wê îmana bi qederê mûmkin e ku berê însên her dide ser “ğeyb”ê.

Qaîdeyê şaşneberê seadetê; peyrewkirina eql ji bo wehyê, xemilandina qelb bi exlaqê xweş û bi vê yekê jî şanîdana rizamendîyê li hemberî surprîz û hêvî-nekirîyên heyatê ye. Dîsa seadeta rastîn, qebûlkirina med-cizîrên heyatê, tehemmulkirina meşeqqetên wê, dîtina alîyê sipehî di her tiştî de û teslîmbûna ji Rebbê alemê re ye.

Cenabê Heq Teala dikare carina lutfa xwe bi zahirî di sûretê qehrê de û qehreke xwe jî di sûretê lutfê de bide tecellî-kirin. Serkehnîya mechûlkirina van hemû keyfîyetan ji însên re, ji ber vê ye ku ev dinya warê îmtîhan û ezmûnê ye.

Xuda Teala ferman dike, dibêje:

وَعَسى أَنْ تَكْرَهُوا شَيْئاً وَهُوَ خَيْرٌ لَكُمْ وَعَسَى أَنْ تُحِبُّوا شَيْئاً وَهُوَ شَرٌّ لَكُمْ وَاللَّهُ يَعْلَمُ وَأَنْتُمْ لا تَعْلَمُونَ.

**“Tiştekî ku li we ne xweş be dibe ku ew ji we re bi xêrtir be. Dîsa tiştekî ku li we xweş be jî dibe ku di bara we de xirab be! Xuda dizane, hûn nizanin.”**[315]

Xuda di ayeteke din de jî dibêje:

قُلْ لَنْ يُصِيبَنَا إِلاَّ مَا كَتَبَ اللَّهُ لَنَا هُوَ مَوْلانَا وَعَلَى اللَّهِ فَلْيَتَوَكَّلْ الْمُؤْمِنُونَ.

“[Ey Resûlê min!] **Bibêje: Ji bilî ya ku Xuda ji bo me nivîsîbe, hîç tiştekî din wê li me bikeve! Ew arîkar û piştevanê me ye, bi vê sedemê bila bawermend xwe bispêrin Xuda tenê**.”[316]

---

315. Beqere, 2/216

316. Tewbe, 9/51

Bi rastî ji hêla heyata dinyayî ve mesela korbûn, wekî windahîyeke mezin tê dîtin. Tê hizirîn ku ti nîmetek cihê çavekî ku dibîne, nagire. Lêbelê ew însanê ku kor hatibe dinyayê, bi astengkirina vê mazereta wî, ew dişê ji ketina avzêma gunehan salim û paqij bimîne. Ev halê ku di zahirê xwe de wesîlekeke kul û kederê tê dîtin, lê di heqîqetê de ewê bi keyfxweşî û sirûrê wergere. Zengînî û feqîrtî jî wiha ne. Heke feqîrek gileh û gazindê ji halê xwe neke û ji teqdîra Xuda re razîbûnê şanî bide, belkû evê jê re bibe wesîla zengînîya ebedîyetê. Haleveku ew feqîr, li vê dinyayê zengîn be jî eger û îhtîmal heye ku ew bi îmkanên di dest xwe de ezparêzîya xwe texrîb bike, di nefsa wî de wehma şîyanê biwelide û dîsa belkû di nav ğefletê de di sefehat û rexawetê de noq bibe û seadeta ebedî ya xwe jî berehewa bike.. Tebîî dijber û ziddê vê jî mûmkin e.

**Welhasil;** divê mûmîn, her halê xwe sipehî bibîne, ji teqdîr û tenzîma îlahî wek memnûn û razî, wê ji bo qezenca ebedîyetê keys û firsendek zanibe; bila hewl bide û ğeyret bike ji bo li ser sebr, şukr û teslîmîyetê bijî.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîf de ferman dike, dibêje:

"*Rewşa mûmînî bi rastî hêja ye ku mirov wê ğibte bike û jê re heyran bimîne. Lewra her halê wî ji bo wî wesîla xêrê ye. Xesleteke wiha sade di mûmînî de heye; heke mûmîn keyfxweş bibe û şukr bike; ev jê re dibe xêr. Heke belayek were serê wî û ew sebr bike; ev jî ji bo wî dibe xêr.*"[317]

Esasên bingehîn ên ku di bara qederê de heta bi vir hatine zikrkirin, heke mirov di wan de kûrtir bibe, mirovê bi ew qeder meselan re rûbirû were ku ewê ji bo nîqaşên îlmê kelamî bibe ser-

317. Muslim, Zuhd, 64

maye û jê bi wêdetir naçe. Bi vê sedemê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; bi îmana bi qederê îktîfa bikin û di vê xusûsê de mena me ji nîqaşên ne di cih de kiriye. Ew qeder men jê kiriye ku dema li mirovên di bara qederê de nîqaş dikirin rast dihat, ji wan re digot

"*Ma ev ji we re dihate gotin? Ma ez ji bo vê ji we re hatime şandin? Ewên berîya we ji ber ku di vê meselê de mûnazere kirin, çûne helakê. Zinhar vê meselê nîqaş nekin ha!*"[318]

Şair **Zîya Paşa** jî, di bara heqîqetên ku taqeta beşerî nagihîje wan de wiha dibêje:

*Îdraka mealîyan bi vî eqlê biçûk çênabe.*

*Lewra ev terazî ev qeder giranîyê nakişîne!*

**Ey Rebbê me! Me bike ji evdên xwe yên ku di maneya rastî de ji ehlê tewekkulê ne û me ji bo kirina emelên ku tu jê razî bibî jî mûweffeq bike! Gihiştina sefaya rizamendîya bi qeza û qederê ji bo me tevan hêsan bike!**

**Amîn!..**

❁

318. Tirmizî, Qeder,1

# Ji Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve Mûsa Efendî [q.s]

(1917-1999)



*“Mezintirîn nîmeta cenabê Heq Teala li ser evdekî wî ev e ku ecz û nekarîna wî evdê xwe jê re bide zanîn. Belkû mezintirîn nîmeta ku min qezenckirî, di rêya vê manewîyatê de dîtina min ji bo xeta û şaşîyên min e. Min mûflistîya xwe li hemberî Rebbê xwe îdrak kir. Bi vî awayî, min hêz û taqet nema ku bi dîtina xeta û şaşîyên kesekî din ve mijûl bibim. Hemd ji Xuda re be, ez di nav şukrê van tevan de me...”*

*(Mûsa Efendî -rehmetûllahî eleyh-)*

## Ji Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve Mûsa Efendî [q.s]
## (1917-1999)

**Îhsan** ev e; mûmîn têbigihe ku ew tim û daîm di bin çavdêrî û mûşaheda îlahî de ye û ev hal jî, di qelbê wî de sabit û cihgîr bibe. Di heman demê de jî her kar, reftar û bizava wî jî di nav endaz û pîvanên tekûztirîn de îfa û bicih were.

Me **Hezretê Mûsa Efendî** -quddîse sirrûh- di 16'ê Tîrmeha 1999'an de bi rehma îlahî sipart. Teher û uslûba heyata wî, ji hêla reftar û mûnasebetên beşerî yên wî ve ji nimûneyên ji hev û din cihêwaztir û mûstesnatir yên nezaket, zerafet û letafetê mişt û tije bû. Yanî bi kurtî heyata wî di qiwama "îhsan" de bû.

Rewşa wî gihabû vê derecê ku dema wî letîfe û tinaz dikirin jî ew di nav hewldan û ğeyretê de bû ji bo qelsî û zeîftî li îdrak û bala wî nekeve û ew her hestpê bike ku di bin mûşaheda Xuda de ye. Ev rewşa sipehî ya wî, hesta îhsanê dixiste bîra mirovên li hawîrdora wî.

Ew zatê mezin, bi ezm û biryar bû ku uslûb û reftara xwe ya "**ji îmanê ber bi îhsanê ve**" di her bizav û peyvên xwe de bi awayekî kamil û tekûz bîne cih. Heyata nezîh û paqija wî, ev mûkemmelîyet û zerafeta bizav û reftara wî, yek ji mûkemmeltirîn nimûneyên di zemanê me de bû. Wî, tim û daîm bi halê xwe û meqalê xwe ronahîya vê feyz û bereketa wê dan hînkirinê li hawîrdorên xwe diweşand, rewşa wî her wekî taverojê bû ku ew bênavber ronahî û germîya xwe belav dike.

Her kesê ku hindik-zêde mûnasebeteke wijdanî, yan jî ğiyabî, yanî ji nêzîk ve, yan jî ji dûr ve têkilîya wan pê re hebû, pê dizanîbû ku dilê wî dostê Heq Teala ji xirab-bûna ahenga ku di kaînatê de heye û lazimîya nîzama îlahî ye, bêzar û dilteng

dibû. Di xusûsa jinavbirina xetayê û temamkirina kêmasîya ku wî didît de bi hessasîyet û baldarîyeke kûr û hûr tevdigerîya. Wek nimûne, em ji ya besît destpê bikin; ew ji lewheyeke xwehra bi dîwarî ve daleqandî, yan jî ji raxistina seccadeya bi rasthatinî jî reht û bêzar dibû. Ya wî, ev bi mirovekî dî dida rastkirin, yan jî wî bi xwe ew sererast dikir. Li dîwanxaneyekê, yan jî di sohbetekê de bêtertîb-bûna odê, yan jî jixwere-mere rûniştina yên ku hati-bûn, yan jî li ber pêpelingê kombûna wan, ev rewş ji ber diqqeta wî winda nebû û vê jî zewqa selîma wî reht û bêzar dikir.

Ev ayetên pîroz çi qeder mûkemmelîyet û zerafeta bizav û reftarên dostên Heq Teala xweş û ciwan şanî didin:

وَعِبَادُ الرَّحْمَنِ الَّذِينَ يَمْشُونَ عَلَى الأَرْضِ
هَوْناً وَإِذَا خَاطَبَهُمْ الْجَاهِلُونَ قَالُوا سَلاماً
وَالَّذِينَ يَبِيتُونَ لِرَبِّهِمْ سُجَّداً وَقِيَاماً.

“**Evdên** [xas û taybetî yên Xudayê] **Rehman ew in ku li sererdê bi nefsbiçûkîyê birêve diçin û dema mirovên nezan bi wan re dipeyivin jî** [ew pê naêşin û ti kesî jî naêşînin sade] **dibêjin: Silav li we be!** [wilo bêteşqele derbas dibin û diçin]; **ew in ku ji Xudayê xwe re bi şevê li piyan in û secde dibin**.”[319]

Di van ayetên pîroz de û di ayetên pîrozên dîtir ên ku li pey wan tên de jî cenabê Heq Teala taybetmendîyên mûmînên salih [bikêrhatî] di heşt sifetan de kurt û xulase dike:

1. Li sererdê rêveçûna evdên xas ê Xudayê Rehman û terzê bizav û tevgerên wan mûlayîm e; ew ji xwedbînî û kubartîyê dûr e, bi tewazû, nefsbiçûkî, weqûr û sergiranî ye. Heke cahil, nezan,

319. Furqan, 25/63-64

kêmeql û fehmkor dev bavêjin wan jî ew peyvên wisan xweş û nazik ji wan re dibêjin ku ew lihev-rast-hatin jî bi selametî û bê pevçûn bi encam bibe. Ew ji bo mirovên li hawîrdorên xwe wek kesên dilovan, merhemetdar, mûsamehakar û xweşbîn, îtîmad, pêbawerî û aramîyê dibexşin û didin.[320]

2. Ew şevên xwe bi taet û îbadetê derbas dikin. Razana wan û ji xew şîyarbûna wan jî her ji bo Xuda dibe.[321]

3. Ew wiha dûa dikin: “Ey Rebbê me! Ezabê Cehennemê ji ser me bide alî! Lewra ezabê wê ne tiştekî berwext û demî ye.”[322]

4. Dema ew malê xwe înfaq dikin, ne îsrafê dikin, ne jî nemerdîyê dikin; ew di navbera van herduyan de ji bo xwe rêyeke navîn digrin.[323]

5. Ew ji Xuda pê ve li ber îlahekî din nagerin. Ew, wî canê ku Xuda kuştina wî heram kiriye bi neheqî qîm nakin û wî nakujin û ew zinayê jî nakin.[324]

6. Ew şahidîya bi derewî nakin; dema ew li tiştekî kelevajî û pûç rast tên jî bi sergiranî û weqûrane jê derbas dibin.[325]

7. Dema ayetên Rebbê wan di bîra wan têne anîn, ew kor û kerr di ser wan de nabûrin, yanî bi bêhestî tevnagerin[326]

8. Ew niyazê ji cenabê Heq Teala dikin û wiha dibêjin: “Ey Rebbê me! Hevjîn û zarûzêçên wisan ji me re îhsan bike ku ew

320. Li ayeta 63’êyan ya sûretê Furqan binêrin.
321. Li ayeta 64’an ya sûretê Furqan binêrin.
322. Li ayeta 65’an ya sûretê Furqan binêrin.
323. Li ayeta 67’an ya sûretê Furqan binêrin.
324. Li ayeta 68’an ya sûretê Furqan binêrin.
325. Li ayeta 72’an ya sûretê Furqan binêrin.
326. Li ayeta 73’êyan ya sûretê Furqan binêrin.

çavên me rohnî bikin û me ji bo ehlê teqwayê jî bike rêber!" Ew ji bo jîyana malbatî û nesl û kinêsên xwe îman, îrfan û exlaqekî wisan li dinya û axretê dixwazin ku rûyan sipî bike, ew li ser îman, îrfan, exlaqê xweş û fezîletê werin terbîyekirin û tam bigihin kemalê. Arzûya wan ji bo wan bixwe jî ev e, ew di teqwayê de bibin rêzan û li pêş bin.[327]

Cenabê Heq Teala netîca ebedî ya ku ev ebdên salih bigihinê jî wiha dide zanîn:

"**Ha ewê, di hemberê sebra xwe de, bi meqamê bilindtirînê bihiştê bêne xelatkirin û ewê têde bi xêrhatin û silavê bêne pêşwazîkirin**."[328]

Qelb, bi îlawe li ser hinek mûcahede û temrînên beşerî û tesewwifî dema bi lutf û kerema Xuda bi vê terz û teherê were safî û paqijkirin, ew di dawîya rê de digihîje rewşeke wisan ku digel xwediyê di sûretê beşerî de dihêle jî, di sîret û jîyanê de her wekî ku wî ji bo dereca melekîyetê bilind dike.. Hinek ji wan zatên di vê rewşê de, wekî her stêreke li fezayê di alema xwe de û li hemberî derve jî tam di nav mexfîyetekê [nehanîyekê] de dijîn. Ewê wiha ji terefê dîgeran ve nayêne zanîn. Çawa ku di hedîsa qudsî de bi beyankirineke wiha di bara hinek mirovan de hatiye rîwayetkirin:

"*Welîyên min di bin qubbeyên min de ne; ji bilî min ti kesî din bi wan nizane*."[329]

Hinek dostên Heq Teala jî bi sedem wezîfa îrşada ku bi wan hatiye sipartin -di endazeke dîyar de- têne zanîn û ew di zemanên xwe de ber bi paşerojê ve wek çirayeke hîdayetê di heyata beşerî

327. Li ayeta 74'an ya sûretê Furqan binêrin.
328. Furqan, 25/75
329. Ebdûrrehman Camî, Mefatîhû'l-Ûns, rûp. 45

de xizmetên xwe didin dewamkirin û nesîbê xwe ji sirra beqayê werdigrin. Ew sirr, hikmet û mirada îlahî ya di pişt hadîse û bûyeran de fehm dikin. Ji lewma ew di nav aramî û hizûra waqifbûna ji hikmetê de dijîn. Ew ji lawazîyên beşerî yên wekî metirsî û fikaran hatine parastin.

Ji bo wan êdî "ebes" û "pûçî" nîn e. Ew di tereqqî û pêşveçûna manewî de bi endaza "*ji bo Aferînerî, aferîndeyan xweş dibîne*" destpê dikin, ew bi çavên biha û îtîbar-dana bi hikmetê yên ji hestên îbret, hezkirin û heyretê tije jî, dest bi seyr û temaşekirina temamê alemê dikin..

Ha xuyabûna nezaket, zerafet û mûkemmelîyetê di reftar û bizavên Mûsa Efendî de, ew sifet û rewşên bilind û ciwanên ku me di dirêjahîya emr û temenê wî de temaşe kirin tev di herka heyata rojane ya wî de jî bicih hatine û tetbîq bûne. Lewra wî bi çavê rehm, hezkirin û şefqetê li hemû mexlûqat û aferîndeyên Rebbê me temaşe dikir û li wan dimeyzand.. Ew di vê rewşê de gihabû vê mertebê ku wî par û nesîbek ji vê rehma fereha xwe li kitikên li derdorên wî êwirîbûn jî dikir. Heta ew kevokên ku di ser dehl û bostanên wî re difirîn jî para xwe ji dilovanî, camêrî, îkram û îhsana wî werdigirtin.

Divê em ji cure-mîsala: "**Ji nîmeta Rebbê xwe biaxive**"[330] di bîra xwe bînin ku tesîra fikrî û kiryarîya rastîna nîmetên vî dostê Heq Teala li ser me zehf hene. Ew mefhûmê tesewwifê "**ji îmanê ber bi îhsanê ve**" uslûb û reftara li ser jîyana wî dostê Heq Teala serwer û hakim bû. Ji lewma me ew têgihaya tesewwifê li serlewheya berhema xwe ya dawîyê bicih kir û me navê "**Tesewwif ji îmanê ber bi îhsanê ve**" lê kir.

330. Dûha, 92/11

Bi vê wesîlê, em wek hezker û şagirtên wî dostê Xuda, li vir bi rêz, hurmet û mehebbeta kûrtirîn, bi minnetbarî û dûayên qelbî hest bi vê îhtiyacên dikin ku em wî bibîr bînin.

Em ji xwendevanên xweşdivî yên xwe îstirham dikin ku fatîhayên şerîf jê re lutf û îhsan bikin.

**Baqek Ji Şîretên Wî**

Em baqek ji şîret û nesîhetên merhûm **Mûsa Efendî** ku wî di name û mektûbên xwe de ji şagirtên xwe re nivîsîbûn, pêşkêş dikin.

“Kemala mûmînekî û alema dilîya wî, di reftar û bizavên wî de tê şanîdan. Ji van sipehîtahîyan jî çendekên ku di serî de tên wiha ne:

Divê ew tim û daîm nefsbiçûk be. Divê ew qîmetê zemanê xwe û nefesên xwe zanibe û wan îsraf neke. Divê ew ji evdên Xuda hez bike û bi wan re rikeberîyê neke. Divê ew bi qasî ast û sewîya dînî ya berpeyv û mûxatebên xwe bi wan re mûamele bike. Divê ew qebahetên xelkê veşêre. Divê ew li helal û heramî miqate be. Divê ew guneh û masîyetên ku her kes wan biçûk dibîne jî zehf mezin bibîne. Lewra ewê ku gunehê xwe biçûk dibîne, naxwe haşa wî ferman û qedeğeyên cenabê Heq Teala jî biçûk dîtine.

Divê em di rêya rizamendîya Mewlayê xwe de jixwe nexasim wextên seheran bi nimêj, zikr û dûa bixemilînin. Di serî de jî divê em di xizmeta takekes û ferdên malbata xwe de bin, bi taybetî jî di xizmeta mezinên xwe de bin. Divê em ulfeta xwe ji dinyaparêzan, yanî ji mirovên ku xwe di ğefletê de noq kirine, kêm bikin û em bi salih û qencan re rabin û rûnin. Divê em di xizmeta xizm û lêzimên xwe yên dîger de bin û divê em her di xizmeta hewcedaran de bin. Heke pêwîst bike, divê em hem bi

zimanê xwe, hem jî bi mal û maddîyata xwe arîkarîya wan bikin. Ya ji van tevan jî mûhîmtir ev e; bila em ji bo helalî û heramîyê titîz û baldarîyê şanî bidin. Ji bilî van jî bila em di karên çarçî û bazarê de jî bi diqqet hereket bikin, bi vî awayî da ku em tiştekî ji evdînîya xwe kêm nekin û fîre [têçûnî û kêmbûnîyê] nedin.

Evdek, bi qasî rêjeya merhemet û exlaqê xwe ji Rebbê xwe nêzîk e. Evdekî ji Rebbê xwe nêzîk jî dibêje:

أدبنى ربى فاحسن تادبى

"*Rebbê min ez terbîye kirim û wî terbîya min jî çi xweş kir!*" [331] Bi vî awayî ji bo vê sirrê hedîsa şerîf dibe mezher û ew têde xuya dibe. Yanî ew exlaqê cenabê Heq Teala ji xwe re dixe exlaq. Êdî ji xwe tiştekî ji vê bi şereftir û bi fezîlettir nabe.

Hemû xeta, nîsyan [jibîrkirin], şemitîn; di wextên ku em ji zikr ğafil dibin de, yanî di dema em Rebbê xwe jibîr dikin de hasil dibin û tên wicûdê. Ewên ku rewşa manewîya zikr didin dewamkirin jî, ji kul û kederên dinyayê, ji huzn, şîn û ğemgînîyên wê xilas dibin. Heta ew ji lizûmîya wê bêhtir ji coş û xuroşa dinyewî jî zewqê nabînin. Lewra sikûnet û aramîya berdewam, sexawet û şefqet-kirina li mexlûqatan, cihê wê valahîyê tije dike. Hezretê Ellah Teala, kîjan evdê wî jê hez dike, wî di deryaya hezkirin û mehebbetê de noq dike. Êdî ew kes, bes ji wan mirovan hez dike ku bi qasî hezkirina xwe ji cenabê Heq Teala, ji bo xwe mehebbet û hezkirinê heq dikin.

Kesê eqilmend, çi qeder mezinatî û ezemeta Cenabê Heq Teala û ajar û nîmetên dinyewî û uxrewî yên ku jê re lutf kirine, dihizire, nefsbiçûkî û tewazûya wî zêdetir dibe. Ew ji her kesî, bi

331. Suyûtî, Camîû's-Seğîr, I, 12

qasî mertebe û pileya wan, hez dike. Heke çi qeder ew heqdar be jî bi ti kesî re nakeve nîqaş û pevçûnê.

Li rexê din, kesê eqilmend dizane ku heyat miweqqet e, yanî demî û berwext e. Bi vî awayî, ew memnûnîyet û rizamendîya Mewlayê xwe dihizire. Naxwe hê ew li dinyayê, hal û rewşên zulmet û tengasîyan di qelbê wî de cihê xwe bi aramî û keyfxweşîyê diguhêzin. Bi kurtî, ew hê li dinyayê ketiye heyata Cennetê.

Divê her însan, ji bo rizamendîya Xudayê xwe, ji xwe bi bihatirîn û çêtirîn wezîfe xizmeta ji bo civaka xwe zanibe, ew civaka ku ew bi xwe jî têde endamek e. Ew kesê ku ji bo jîyana civakekê, ji bo întîzama wê û ji bo xweşbûrîn û refaha wê xizmet bike, naxwe ew di nav wê civakê de xwediyê heybereke zehf bi qîmet e.. Li ser vî esasî perû û mûkafata wî jî bi qasî wê xizmeta wî mezin e.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şerîfa xwe de dibêje:

"*Kesê ku ji bo qewmekî xizmet dike, ew [bi nisbet gihiştina wî ji bo ecr û mûkafatê] mezintirînê wan e.*"[332]

Çendîn însan hene digel ku berê xwe dane ser îbadet û taetê jî, ew giringîyê bi xesletê "**settarû'l-uyûb**" yanî ewê ku eyban diveşêre û qusûran efû dike, nadin û ew xesletê ku sifetek ji sifetên cenabê Heq Teala ye. Bi vê sedemê, ew bi awayekî tam û şeklê ku tê xwestin bipêşve naçin û di dîndarîya xwe de tereqqî nakin. Haleveku lêbûrîn, bexşandin û qusûr veşartin, yek ji mûhîtirîn exlaqê xweş e. Xuda Teala çawa ji bo me evdên xwe qusûr û xetayên bêjimar vedişêre û efû dike, divê em jî wilo eyb û xetayên hev veşêrin û efû bikin. Lewra Xuda dizane mirovên

332. Deylemî, Mûsned, II, 324

ku jê hez dikin, efû bike. Bila em însanan efû bikin, ji bo em jî bi ber efûya Rebbê xwe bikevin.

Tekane kilîla rehetî û refahê teslîmîyet e. Yanî ev e ku mirov ji teqsîmat û parvekirina îlahî razî bibe û li helal û heramî jî miqate be.

Salik [ewên ku bi rêya terîqet û heqîqetê ve diçin] qism bi qism in. Qismek ji wan wekî ku ji xwe re kirine adet ewradên xwe dikin û bêşiwar di hemberî wirdên wan de mûkafat ji wan re tê dayîn. Qismekî din jî digel ku ewradên xwe dikin, ew tim û daîm têdigihin ku ew li hizûra îlahî ya cenabê Heq Teala ne. Ew ji bo ehkamê Qur'anê rîayetkar dibin û ew li hemberî hukmên qeza û qederê jî ji Heq Teala re teslîmîyetê şanî didin. Her bizava wan ji rizamendîya Heq Teala re miwafiq tê. Alema qelbî û rûhê van li gorî van bizavên wan têne nirxandin. Lê çi heye, ev zumre kêm e, heta kêma kêma ye.

Hemû huner ev e; mirov di nav qare-wara vê dinyayê de û di nav hezar û yek meşğûlîyetên wê de bi Heq Teala re bibe û jê veneqete. Ev halekî wilo xweş e ku hedîgareke bilinda cenabê Heq Teala ye, ew wê ji bo evdê xwe hedîye dike. Heke em zanibin bi vê wezîfa zehf ulwî û bilind re bidin û bistînin, bêşiwar emê ji xapîna bi leystok û pertalên berzewal ên dinyayê jî xilas û rizgar bibin.

Mezintirîn nîmeta cenabê Heq Teala li ser evdekî wî ev e ku ecz û nekarîna wî evdê xwe jê re bide zanîn. Belkû mezintirîn nîmeta ku min qezenckirî, di rêya vê manewîyatê de dîtina min ji bo xeta û şaşîyên min e. Min mûflistîya xwe li hemberî Rebbê xwe îdrak kir. Bi vî awayî, min hêz û taqet nema ku bi dîtina xeta û şaşîyên kesekî din ve mijûl bibim. Hemd ji Xuda re be, ez di nav şukrê van tevan de me..."

Ev hemû îqaz û nesîhetên wî yên ji mehebbet, merhemet û îstîqametê mişt û tije, dilopikên feyzê ne, ku ji jîyana wî ya di qiwama "**îhsan**"ê de ji me re hatine xuyakirin û şanîdan.

**Rehmetûllahî eleyh.**

## Li Ser Berhema Bi Navê "Tesewwuf Ji Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve"-1-*

# Ev Dilopa Dilekî Ye...



**Tesewwuf**, *ev e; mirov karibe li gorî naveroka Kîtab û Sunnetê, bi hestên mûraqebe û îhsanê û bi awayê sipehîtirîn evdînîya xwe bijî. Naxwe tesewwuf, bes ev tişt e; ew astengên ku li ber evdînîyê kelem bin, ji holê radike û îmkanên ku ji bo kirina evdînîyê jî wesîle bin, temîn û dabîn dike.*

**Ev nivîs, mûlaqateke ku Kovara Altinolukê bi mûellifî re kiribû.*

## Li Ser Berhema Bi Navê
## “*Tesewwuf Ji Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve*” -1-
## Ev Dilopa Dilekî Ye...

**Altinoluk**: *Ez benî, we bi navê “**Tesewwuf Ji Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve**” kitêbek hazir kir. Heta îro di bara tesewwufê de çendîn kitêb hatine nivîsîn, ji bo nivîsandina kitêbeke din, we çi lizûm his kir?*

-Rast e. Di bara tesewwufê de gellek kitêb hatine nivîsîn. Lêbelê med-cezîrên di nav herka heyatê de ku ew dînamîk û lebatok e, yanî di çerx û dewrên ku civak ji maddê re ram û teslîm dibe û hizûr û aramîya civakî xirab dibe de her roj hinek îhtiyacên nû derdikevin pêşberî mirovan. Digel ku cewher û rasteqîneya meselê eynî ye jî bi zemanî re dîtin-nêrîn û daxwazên nû û taze dertên holê. Ji bo nirxandina van û ji bo pêşwazîkirina van îhtiyacan jî wekî ku di kitêbên şer‘î û kitêbên di bara tarîxê de wisan e, di meselên tesewwufî de jî di her çerx û dewrê de li gorî îcab û îhtiyaca wan wek zerûretekê perwerda rûhî ji nû ve lazimî bi nivîsandina wan îhtiyacan heye.. Yanî zerûreteke zehf mûhîm e ku mirov di her wext û zemanî de heqîqet û rastîyên tesewwufî bi awayekî rast û durust bîne zemên û wan îfade bike û mirov fehm û têgihiştinên şaş û zêdegavîyan sererast bike. Helbet ne bi vê zerûretê tenê, lêbelê sipehîtahîyên kûr ên ku tesewwuf wan di nav xwe de dihewîne jî divê mirov wan li gorî şertên zeman û mekanî ji hemû dilan re teqdîm bike. Meydana tesewwufê ew qeder fereh e, her wekî deryayeke berhem û esera ye.

Ha me jî xebat kir, ji bo em di nav heman ğaye û emancan de dilopeke dilî ya nekarane ji bo vê deryayê teqdîm û pêşkêş bikin. Me xwest dilopekê pêşkêş bikin, lewra tesewwuf ji “**qal**”ê [peyvê] zêdetir “**hal**” e. Heke esera me di berê-dana dilan de ji bo

aramîya bilind karibe wezîfa pirekê îfa bike, emê xwe bextiyar bijimêrin. Yanî esera me bi îddîaya ku ewê ji kitêbên heta vêga hatine nivîsîn tevan derbas bibe, qelem lê nehatiye kişandin û ew nehatiye nivîsandin. Em ji halekî wiha edeb dikin. Tişta ku me kirî ji vê pêktê; me heta roja me berhemên tesewwufî yên ku hatine berhevkirin û jîyîna feyzdara dostên Heq Teala esas girtiye. Em ji nû ve tesewwifê li gorî şertên zemanê xwe, bi xetên giştî yên wê û bi terzeke ku ji bo meslehetê mûnasib be, ji bo rojevê diguhêzin. Di esasê xwe de ev eser, sewîlek ev e ku ji mîrasa tesewwufî ya dostên Heq Teala zenzilîye, palîyaye û ew ji bo însanên roja me hatiye pêşkêşkirin.

Ew dostên Heq Teala ku li roja derketî û li tabloya tevlîheva rengo rengoya ku kombenda rohnîyê li cem çûna ava resmê wan çêdike bi awayekî wisan di heyret û dehşetê de ğerq bûyî dinêrin û bi her wesîlê perên xwe li asoyên Marîfetûllahê diweşînin. Ji ber ku ew bi çavê tije mehebbet li mar jî dinêrin, ew ji bo xetên di kalan û çermê wî de û ji bo lezûbeza di bizavên wî de digel ku bêdest û pê ye jî, dibin meftûn û heyran. Lêbelê dîgerên wan ji mêr kezeb-qetandî dibin. Yanî ev evdên xas, bi nezera hikmet û mehebbetê li hemû mexlûqatan dinêrin.

Dîsa ev eser, ji bo vê ğaye û emancê hatiye nivîsîn; ji bo nerastî û çewtîya wê têgihiştina ku tesewwifê wek dîsîplîn û uslûbeke ji bilî Îslamê dibîne, derxe holê û dîsa ji bo bi awayekî eşkere bide zanîn ku divê mirov dînê îslamê bi zahir û batinê wî ve yekparçe zanibe û lazim e ku mirov di nav feyz û hizûrê de wî di heyata xwe bijî û tetbîq bike.. Ji bo em vê ğayê, wek serlewhe îfade bikin jî me navê “**Tesewwuf Ji Îmanê Ber Bi Îhsan Ve**” li vê kitêbê kiriye.

Ğayeya nivîsandina vê berhemê ev e; îman û îslam bi “îhsan”ê tacdar bibin, yanî hesta ez di bin mûşaheda Xuda de me di qelb de wek şiûr û pêhis sabit û cihgîr bibe.

Lewra tesewwufa rastî ev e; mirov di nav hesta kûra kîtab û sunnetê de para xwe ji sirr û hikmetên wijdanî bigre û wilo bijî. Her **hal, qal, reftar û bizava ku ji naveroka kîtab û sunnetê birije derve û nakokîyê bi wan re bike, batil** e. Ji bo îfadekirina vê heqîqetê jî hatiye gotin: “*Şerîet lingê sabitê pergarê ye*.”

**Hezretê Mewlana** dibêje:

“*Em wekî pergarê ne. Pêyê sabitê me di şerîetê de ye, em bi pêyê din ê xwe jî li nav heftê û du milletan digerin*.”

“*Şerîet dişibihe mûmekî, çîkê digre û rê şanî dide. Bi destê xwe girtina mûmî nabe ku rê hatiye derbaskirin. Lêbelê bêyî bi destê xwe girtina wî jî mirov nakeve ser rê. Heke tu bi rohnîya şerîetê bikevî ser rê û destpê bikî birêve biçî, ha ev rêveçûna te tesewwif e*.”

Li rexê din ew **îhsan**a ku wiha tê îfadekirin; evd, her an û demê wekî ku Rebbê xwe dibîne wilo xwe bi rêkûpêk dike, li ser wê minwalê heyata xwe dirêse û tenzîm dike, mûşaheda îlahî di qelbê xwe de sabit dike, û wê ji xwe re dixe halekî şiûrî û hişyarane, ha ev mîraca rûhîya evdên ji Xuda nêzîk e; ew heqîqeteke manewî, gîyanî/rûhî, sirrî/nehanî û îlahî ye.. Hedefa mûtesewwufan gihiştina vê heqîqetê ye. Ev jî wê rabîte û peywendîya rûhî û derûnîya ku bi Xuda re hatî tesîskirin, îfade dike. Ew kesê ku ev rabîte û peywendî bi awayekî tendurust û sağlem tesîs kiribe, êdî ew dibe welî û koleyê Rebbê xwe. Bi vî awayî ew bûye ku exlaqê îlahî ji xwe kiriye exlaq.

Ev hal jî, bi awayê sipehîtirîn evdînîya ji Xuda re ye û hazirîyeke ciddî ji bo alema ebedî ye. Yanî **tesewwuf** ew e; mirov

bi awayê sipehîtirîn evdînîyê bijî. Lewra cenabê Heq Teala însan aferandiye ji bo evdînîyê ji wî re bike. Naxwe tesewwuf, bes ev tişt e; ew wan astengên ku li ber evdînîyê kelem bin, ji holê radike û wan îmkanên ku ji bo kirina evdînîyê jî wesîle bin, temîn û dabîn dike. Naxwe ew, çendîn birînan dipêçe, derman dike, çendîn axên hişk û ziwa dixe gulistaneke berhemdar û keskeşîn û gellek dilên wêran jî dixe serayeke ava.

Bi kurtî tesewwuf, rêyeke nûrdar e ku evdan li cem Xaliqê wan dike layiq ji bo teltîf û rutbeya « نِعْمَ الْعَبْدُ » "**çi xweş evd e**!"[333] dema ew ji vê alema ğurbetê diçin alema wusleta bêdawî. Ev jî, hîç guman nîn e ku bi gihana îmanê ji bo qiwama îhsanê, mûmkin e.

**Altinoluk**: Di her hal û karî de gotinên te di eynî zemanî de naveroka kîtab û sunnetê û çarçoveya wê jî didin xuyakirin. Li hawîrdora cîhetê vê nêrînê di kitêba we de bi giştî behsa çi tê kirin? Bi taybetî çi hatiye rojevê?

-Di esera xwe de piştî ku me bi awayekî giştî naveroka tesewwufê daye ravekirin, me ğeyret kiriye û zehf hewl daye, em mijara esasî ya ku tesewwufê pêktîne her wekî marîfetûllahê, mehebbetûllahê, tezkîya nefsê, tesfîya qelbî, uslûbê tesewwufî û xusûsên wekî van îzah bikin. Me hewl daye ku di serî de mîsal û nimûneyan ji reftar û bizavên Pêğember -dirûd û silavên xuda lê bin- û mezinên îslamê ku ew bi xwe jî malpêma û warisên wî şexsîyetê mûbarek in, pêşkêş bikin. Cih bi cih jî me ew malûmat û agahî eşkere kirine ku ew bersiva hinek tereddud û fikr û nêrînên dijber didin ku ew di bara ziravî û tenikîya tesewwufê de têne îddîakirin. Lêbelê ev jî bes ji cîhetê fikrî ve bersiva wan hatiye dayîn û me ti şexsîyet û kes nekirine hedef û nîşan.

333. Li Sad 38/30,44 binêrin.

Ji bilî vê jî me di esera xwe de behsa mijara wan tetbîqatên kulek, têreneker û nedicihde kiriye ku hinek mirovên ji terbîya manewîya ku tesewwuf arzû dike dûr, ya bi nîyeta pak, lêbelê bi cahîlane, ya jî ji ğefleta xwe pê radibin, kiriye û me daye zanîn ku ti peywendîya wan bi vê rêya mûbarek re nîn e.. Lewra hedefa tesewwufê, wekî ku bi awayekî taybetî di Qur'ana Pîroz û hedîsên şerîf de hatiye îfadekirin; tezkîya nefsê dike, însanî kamil dike û bi vî awayî wî digihîne seadeta ebedî. Ev xusûs, heqîqeteke wilo ye ku cenabê Heq Teala bi çend caran li ser hev pê sûnd xwariye û bi vî awayî bal kişandiye serê.

Xuda di sûretê Şems de dibêje:

**"Ez ji bo heqê zatê ulûhîyeta xwe; bi rojê û ronahiya wê ya di danê sibehê de, bi heyvê dema li pey rojê diçe, bi naverojê dema tavê dide xuyakirin, bi şevê dema tavê dinixumîne û dipêçe, bi asîmanî û yê ku ew ava kiriye, bi erdê û yê ku ew ji bo jîyanê raxistiye, bi nefsê û yê ku awa daye wê û hinek qabilîyet dane wê, piştre neqencî û xweparastina wê** [ficûr û teqwaya] **jê re îlham kiriye sûnd dixwim ku; bêşiwar ewê nefsa xwe ji xirabîyan** [ji qirêjên maddî û manewî] **paqij bike, xilas û serfiraz bûye!. Bêşiwar ewê ku nefsa xwe di xirabîyan de noq bike jî, wî ziyan û xisar kiriye!"**[334]

Ew heyberên ku cenabê Heq Teala bi wan sûnd xwariye, digel ku ew sûnd-xwarina wî bi wan şeref û qîmetê wan dide zanîn jî, lêbelê di eslê xwe de ew di piştî wê yemînê de ji bo vê ye, da ku bilindahî, ezemet, mezinatî, ehemmîyet û giringîya wê mirad û ğayeya îlahî ya ku hatiye îfadekirin, şanî bide.

Cenabê Heq Teala di van ayetan de tam heft caran li ser hev sûnd dixwe, di piştî wan de jî ji bo maneyê tam xurt bike, daçeka/

334. Şems, 91/1-10

edata « قَد»ê [bêşiwar] bikartîne û di piştî van tekîd û te’yyîdan de jî dide zanîn:

“**Bêşiwar ewê ku nefsa xwe ji xirabîyan** [ji qirêjên maddî û manewî] **paqij bike, xilas û serfiraz bûye! Bêşiwar ewê ku nefsa xwe di xirabîyan de noq bike jî, wî ziyan û xisar kiriye!**”

Zehf balkêş e ku cenabê Heq Teala di Qur’ana Pîroz de ji bilî tezkîya nefsê di ti xusûseke din de heft neqlan li ser hev wiha sûnd naxwe. Ev heqîqet têrê dike ku îfade bike ka tezkîya nefsê ji bo xilasîya însanî çi derece mûhîm û zerûrî ye.

Ha esera me ya ku me bi navê “**Tesewwuf Ji Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve**” li qelemê daye, me pê ev heqîqeta dostên Heq Teala, yanî tezkîya nefsê; sipehîtîya peyv, hal, reftar û bizavên wan îzah kiriye.

**Altinoluk**: Ev hemû, bêşiwar bersiv in ji bo pirsa bi vî awayê ku dibêje; “tesewwufeke çawa?” Li gorî vê, divê em tesewwufê bi tarîfeke çawa bidin naskirin ku ew ji bo efradê xwe camî be û ji bo eğyarê xwe manî be? Em dikarin vê pirsa bi vî awayî ji zatê ‘alîyê we “tarîfa tesewwufê, yan tarîfên wê, yan jî nirxandinên we di vê meyanê de” bihizirin.

-Tesewwuf, ji ber ku îlmekî wisa ye, çi qeder mirov wî bijî, mirov çêj û şîranîya wî te‘m dike û wî îdrak dike, her kesî, bi giştî di bara wî de alî û xusûsên ku ji wî te‘m kiribe û îdrak kiribe, rahijtiye dest û ew nivîsandiye. Di netîca vê de zehf tebîî ye ku gellek tarîf derkevin holê. Em karin bibêjin; pêşîvanên vê rê, her yek ji wan ji bo xwe ew rê girtiye û daye ber xwe ku wekî krîstalekê ji perçên cuda cuda çîk û ronahî di wan de xuya dibin, ew jî bes wî qismê di wan de xuya dibin, eşkere û îzah dikin.

Dostên Heq Teala li gorî tecellîyatên rûhanî yên ku ew gihanê gellek tarîfên bêjimar ji tesewwufê re kirine. Hinek ji wan wiha ne:

-*Tesewwuf*, exlaqê xweş û edeb e.

-*Tesewwuf*, tezkîya nefsê û tesfîya qelb e.

-*Tesewwuf*, cengeke manewî ye ku sulha wê nîn e.

-*Tesewwuf*, îxlas e.

-*Tesewwuf*, îstîqamet e.

-*Tesewwuf*, riza û teslîmîyet e.

-*Tesewwuf*, yar bûne, ne bar-bûn e. Yanî kişandina barê her kesî ye û li hemberî vê jî ne bar-bûna ji bo ti kesî ye.

Li ser esasê alîyên curecurên van tarîfan em dikarin bibêjin **tesewwuf îlmekî wisa ye ku alema navxweyî ya mûmînan sererast dike, ji alîyê maneyî ve wan kamil dike, evdî digihîne exlaqê hemîde û wî ji Heq Teala nêzîk dike, bi vî sûretî wan digihîne marîfetûllahê**.

"**Tesewwuf menzûmesî**"ya meşhûra **Şêx Îbrahîm Efendî** ya şêxê Dergehê Olanlara li taxa Aqsarayê ji serî heta bi dawîyê ji gellek tarîfên sipehî yên tesewwufê tije ye. Ha va ye, çend tarîf ji wan:

*Di bîdayetê de tesewwuf, ji bêcan bûna sofî re dibêjin*

*Di nîhayetê de di textê dil de ji sultan bûnê re dibêjin*

"*Destpêka tesewwufê ew e; mirov bibe sofîyekî wilo ku xwe ji hebûna maddîya xwe bixeritîne, di xwe de heyberekê nebîne û bi kurtî îradeya xwe ji Heq Teala re teslîm bike. Dawîya wê jî ev e; mirov hemû sipehîtahîyên îlahî qezenc bike û bibe sultanê dil.*"

*Tesewwuf bi can kişandina barê urwetû'l-wusqa ye*

*Tesewwuf ji bûna mezherê ayatê ğufran re dibêjin*

"*Tesewwuf, eve; mirov wî emanetê îlahî yê ku Heq Teala li însanî bar kiriye ku Qur'ana Pîroz e û ew berpirsîya ku wê anîye bi dil û can hilgire û bikişîne. Tesewwif ji vê re tê gotin; mirov bibe mezher û xuyageh ji bo ayetên ku mizgînîya meğfîreta îlahî didin.*"

*Tesewwuf, bi îsmê ezem teserrufkirina bi kaînatê tevî re ye*

*Tesewwuf, bûna cam'î ji ehkamê Qur'anê re dibêjin*

"*Tesewwuf, bi «îsmê ezem» tesrrufkirina bi hemû kaînatê re ye. Dîsa tesewwuf, cemkirin û komkirina hukmê Qur'anê di dil de ye, yanî bûna Qur'aneke zindî ye.*"

Di ronahîya van îfadeyan de tesewwuf; ew ğeyret û hewldan e ku dil ji qirêjên maddî-manewî temîz bike, exlaqê xweş û wesfên wî qezenc bike, karibe bi awayekî ji bo cewhera dîn guncav û mûnasib, bi îxlas û feyz bijî. Li ser vî esasî tesewwuf, gihiştina dîtin-nêrîneke kamila ku dorê li sirr, hikmet û nehanî û mûemmayên bilind digre, ewên ku di bûyer û hadîseyên maddî û manewî de hene ku eql bi tena serê xwe têra çareserkirina wan nake. Ew ğeyret û berterefkirina astenga nefsê ye ku li ber meftûnbûna dil ji şîranîyên rûhanî yên bêdawî re kelem û sênceke asê ye. Yanî tesewwuf, pêşî derbasbûna ji meyl û arzûyên nefsanî yên bedenê ye ku rûh jî têde hatiye hebskirin. Piştre jî ew, hinek agahî, halên manewî, hissên qelbî, sinûhat û tecellîyat in ku bi uslûbeke arîfane temaşekirina heqîqetên sirrî dabîn dikin, ewên ku di cewhera hemû hadîseyan de hene û ew sefheyên îbret û hikmetê ne ku di pişt wan heqîqetan de cereyan dikin..

Li ser vî esasî tesewwuf, ew e mirov bi zahir û batinê xwe bi heyata mûbareka mezinê me pêğemberê Xuda [dirûd û silavên

Xuda lê bin] re bi yek bibe û bi mehebbeteke fereh pêve bibe. Lewra ew, **tecellîyatên derveyî, navxweyî, batinî û zahirî ya Resûlûllah** -dirûd û silavên xuda lê bin- **yanî halê wî** ye. Ji bo vê ye ku mirov karibe ji rûhanîyeta Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] para xwe wergire û mirov karibe bi rûhê xwe bi wî re mezc û bi yek bibe.

Bi vegotineke din **tesewwuf**, **evîna ku bi îmanê re bi yek bûye, îbadetê ku bi wecdê tê îfakirin û sipehîtîya reftar û bizavê** ye.

**Welhasil** tesewwif, nesîbekî bilind e ku bi "pifkirina rûh" di Adem -silavên xuda lê bin- de destpê kiriye, xuyahîya kemalê ye ku di Nebîyê axirzeman de heye û ew şevnemên feyzê ne ku tije-mehebbet di qelb de xuya dibin.

**Altinoluk**: *Em karin bihizirin ku di dirêjahîya tarîxê de ew elaqeya zehfa ku ji bo qada tesewwufê hatiye cih, bi sebeb wê heyata îman û îrfanê ye ku bi awayekî semîmî li dora wan tarîfên we kirî hatiye jîyandin? Heqîqeten tesewwuf meydaneke îslamî ya wisan e ku wekî doh wisan bû, îro jî dem bi dem kar tê kirin ji bo bi qesd tohmet werin ser wê, yanî ew ji çavan were xistin û bêqîmetkirin, lêbelê her roja ku diçe bêhtir elaqe jê re tê şanîdan. Gerek di navbera mislimanan de, gerek jî di nav derdorên ne îslamî de elaqeyeke zehf tê çavdêrîkirin ku mirov kare jê re "emanca manewî ya îslamî" bibêje. Gelo dibe ku sebebê vê elaqê çi be?*

-Tesewwuf, berê însanî dide ser rûh. Ew, bi qasî îstîdad û amadekarîya ferdîya wî rêya tetmîna manewî li ber rûh vedike. Ji lewma ew bi xusûsekê re elaqedar dibe ku ew hem nefsa însanî, hem jî rûhê wî elaqedar dike. Yanî ew bi xusûsên bêjimarên wekî van tevan re elaqedar dibe. Ew bi Hemû mesafeyên ku evd di rêwîtîya xwe de qut dike, bi hemû alemên ku ew bi wan re di

halê îrtîbatê de ye, bi hezar û yek ehwalê ku ew dijî, di dawîyê de bi karîna dîtina Ellahê Rebbê alemê, bi qelbê xwe karîna naskirina wî û di hemberî vê de jî bi qiwama dil kirina evdînîyê re jî elaqedar dibe..

Ji ber ku tesewwuf wiha ye, ew dikare bi hemû beşên civakê re xîtab bike. Li alîyekî din ew di zemanên rehetîya îqtîsadî û îctîmaî de rexawet û sistahîya manewî asteng dike wê zindîtîya manewî daye dewamkirin. Li alîyê din jî ew di werçerxên zorên wekî îstîla, dagirkerî û tije zulm de û di nav teşqele û buhranan de ji dilên ku tengav bûne re pencereyan vedike û wê nefesên feyzdarên bi tesellî daye girtin; ew ji bo dilên birîndar bûye merhem, ji bo mejîyên kerixî û rûhên ziwa bûye ava heyatê.. Wê ji alîyekî ve ew ji bo mirovên ku di îbadetê de bûne zirwe exlaqê xweş, tewazû û mehwîyetê dide hînkirin û wê mûhafezekirina ji serxweveçûn, kibr û xwe ecibandinê temîn kiriye. Li alîyê din ew ji bo evdên ku di koncala gunehan de xeniqîne, kemerbenda xilasîyê yên wekî efûya fereh, mûsemeha, merhemet û rehmê dirêj kiriye. Di vê mijarê de yek ji heqîqetên tarîxî ye ku di piştî dagirkerî û îstîlayên Moğolan de ew teşqeleya ku Anadolû tev dabû ber xwe û ew bêaramî û bêhizûrîya ku wê derxistibû holê, li hemberî wan kambaxî û malwêranîyan di wê werçerxê de wek teskînker û tesellîkar herk û bizavên tesewwufê hêz û qewet bidest xistine û hijmareke mezin û ciddî ji mûtesewwifan di wê werçerxê de xuya bûne..

Lewra tesewwuf, di meselên ku eql têrê nake de qelb dixe dewrê û bi teslîmîyetê rêya xwe dewam dike. Ew meseleyan, bi keşf, îlham û tecellîyatên qelbî yên bi Qur'an û Sunnetê re mûtabiq û ahengsaz digihîne îzahê. Bi vî awayî ew ferdî, digihîne tetmîna nîhaî. Bi rastî ev îfadeyên **Mûhemmed Hemîdûllah**ê ku yek ji giregirên alimên îslamê yên sedsala bûrî, zehf manedar û îbretdar e:

*"Terzê perwerdebûna min eqlparêzî ye. Xebat û hûrkolînên hiqûqî, her tiştê ku bi awayekî îqnaker nayên tarîfkirin û îsbatkirin bi min daye redkirin. Bêşiwar ez, wezîfên xwe yên wekî nimêj, rojî û yên din ne bi sebebên tesewwufî tênim cih, lêbelê bi sebebên hiqûqî wan tênim cih. Ez ji xwe bi xwe re dibêjim:*

*"Ellah Rebbê min e, xwediyê min e. Wî, bi kirina wan ferman li min kiriye. Naxwe divê ez wan bikim. Ji bilî van jî heq û wezîfe bi hev re bend in. Ellah ferman li min kiriye ji bo ez ji van îstîfade bikim; naxwe ez bi şukrkirina ji wî re hatime wezîfedarkirin."*

*Ji dema min destpê kirî ku ez di nav civaka rojavayî de li devereke wekî Parîsê dijîm de, ez bi heyret dibînim ku tişta krîstîyanan ji bo qebûlkirina îslamê diajoyê pêş ne dîtin-nêrînên alimên fiqh û kelamî ne, lêbelê sofîyên wekî Îbnû Erebî û Mewlana ne. Di vê babetê de çavdêrî û mûşahedeyên min ê şexsî jî çêbûne. Dema di mijareke îslamî de îzahetek ji min tê xwestin, cewaba ku min ew dispart delîlên eqlî û min ew dida, wê pirsker tetmîn nedikir; lêbelê îzaha tesewwufî di dana fêkîyê xwe de dereng nedima. Di vê babetê de her ku diçe ez hêza kartêkera xwe winda dikim. Ez vêga bawer dikim ku di piştî îstîla û dagirkerîyên Hûlagû yên ku bûne sersebebê malwêranî û agirpêketinan, wekî ku di zemanê Gazan Xan de jî wilo bû, îro jî, ji hindikahî ve li Ewrûpa û Afrîkayê tişta ku xizmetê ji bo îslamê bike, ne şûr e, ne jî eql e, lêbelê dil e, yanî tesewwuf e..*

*Di piştî vê çavdêrî û mûşahedê de, min destpê kir hinek berhemên ku di bara tesewwufê de hatine nivîsîn, hûrkolîn li ser wan kir. Vê hûrkolîna min, çavê dilê min vekir. Min fehm kir ku rêya tesewwufê di zemanê Hezretê Pêğember de û rêya mezinên mutesewwifên îslamê, ne mijûlbûna bi kelamî ye, ne jî mijûlbûna bi tiştên bêmane ye; lêbelê di navbera însan û Xuda de rêveçûna*

*di rêya kurttirîn de ye, gerîna li rêya pêşvebirin û geşkirina şexsîyetê ye.*

*Însan li sebebên ku wezîfe li wî hatine barkirin, digre. Îzahatên maddî ji bo qada manewî me ji hedef û emancê dûr dike; lêbelê îzahatên manewî însanî tetmîn dikin.*"[335]

Ev îfade jî şanî didin ku bi hilgerîna pîşesazîya giran û pêşveçûna fennî ji bo zirweyan re, li alîyekî qeyrana îctîmaî û îqtîsadî zêde bûye, li alîyê din jî di serdema me de ku însan bûye wekî diranê makîneyekê, tesewwuf giringî û ehemmîyeteke zehf mezin erz dike.


❀

335. M. Azîz Lahbabî, Îslam Şahsîyetçiliği, terc. Î. Hakki AKIN, rûp. 114-115, dîpnot 8. Îst. 1972. Ev jêrenot, metina mektûba Mûhemmed Hemîdûllah e ku di 27 Rêzbera 1967'an de ji wergêrî re nivîsandibû. -Mûstafa Kara, Metinleriyle Günümüz Tasavvuf Hareketlerı, rûp. 542-543'an hatiye guhastin.)

Li Ser Berhema Bi Navê "Tesewwif Ji

Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve" -2-

# Ma Bê Tesewwuf Nabe?



*Nelazim dîtina tesewwufê; ne lazim dîtina îxlas, teqwa, îrfan, tezkîya nefsê, tesfîya qelbî ye. Welhasil; ne lazim dîtina kirina evdînîyeke di meqamê îhsanê de ji bo Xuda ye.*

## Li Ser Berhema Bi Navê
## “*Tesewwuf Ji Îmanê Ber Bi Îhsanê Ve*” -2-
## Ma Bê Tesewwuf Nabe?

***Altinoluk:*** *Ji van gotinên we eşkere tê fehmkirin ka uslûba tesewwufî di teblîğa îslamê de çi qeder giring e. Naxwe heke em bipirsin; di dehma vê de, gelo sirr û hikmeta ku uslûba tesewwufî di teblîğa îslamê de fêkîyê xwe dide û netîcên mûsbet dide; însanan digihîne hîdayetê û exlaqê wan kamil dike, çi ye?*

-Alîyekî din ê giringîya tesewwufê di roja me de, ew metod û uslûb e k udi mijara îslahkirina însanan de dişopîne, taqîb dike. Ehkamê zahirî yên şerîeta şerîf, ğayeya wê ev e ku bi mûkafat û mûcazata hem dinyayî, hem jî axretî însanan li ser îstîqametê rast sabit û cihgîr bike. Ew tesewwufa ku em karin jê re ehkamê batinî jî bibêjin, bi îlawe li ser van, hezkirin, şefqet û mehebbetê bikartîne.

Însan di zemanê me de, bi pirranî ji nefsanîyetê re wek ram û teslîm bûyî di nav qeyran û buhrana rûhî ya ji dîn dûrbûn û kirina gunehên giran de ne. Hîç ti kes nikare înkar bike ku pêşkêşkirina îmkanên îslah û xilasîyê ji bo mirovên wiha bi rêya ef, mûsameha û şefqetê hêsantir û hê zêdetir mûmkin e.. Ji vê hêlê ve zemanê me, serdemeke wilo ye ku bi qasî heqîqetên tesewwufî giring in, qaîdeyên wê yên di bara usûl û uslûbê wê de jî ehemmîyeteke mezin hildigrin. Çawa ewên ku bi ef, mûsameha û şefqetê li gunehkar û nezanan dimeyzînin tê çavdêrî û mûşahedekirin ku bi qasî ew li welatê me li ser kirina fitûhata manewî qudretmend in, ew li alema rojava jî ji bo fitûhateke manewî hê bêhtir baladest, qudretmend û serkeftî ne.

Ji bo rûhên ku di bin zext û sulteya eql û nefsê de bêzar bûne û ketine qeyran û buhranê, her zeman metod û rêbaza feyzdar ev e; mirov îslamê ji wan re wek bêhn-xweşîya tesellîyeke îlahî pêşkêş bike; di şûna ku mirov bi nîyeta ceza û sezadana wan bi hêrs ji wan nêzîk bibe, bila mirov ji wan re reftar û bizavên tije şefqet û merhemet nîşan bide..

Lewra însan, çi qeder ji ğaye û emanca eslîya xwe dûr bibe, bila dûr bibe, ew bi heysîyeta "însan" bûna xwe dîsa xwediyê şerefeke bilind e.. Bêxeber-bûna wî ji qîmet û bilindahîya di cewhera wî de û ketina wî di nav teqana gunehan de [tiştekî ji însanbûna wî kêm nake] rewşa wî dibe eynî wekî rewşa wî Hecerûl Eswedê di dîwarê Ka'beya Mûezzem de ku ew ji wir ketiye erdê û di nav toz û axê de maye. Hîç mirov nikare tesewwir bike ku wijdana ti mûmînekî wê li hemberî vê rewşê nefûre û ewê bêqeyd û bê helwest bimîne. Di vê rewşê de jî mûmîn nikarin hurmetê ji Hecerê Eswed re negrin. Ketina Hecerê Eswed di rewşeke wiha xirab de jî di nêrîna mûmînan de tiştek ji biha û qîmetê wî kêm nabe. Berevajî vê mûmîn wê bi hev re bikevin pêşbirkê ji bo derhal wî ji nav toz û axê rakin, wî bi hêstirên çavên xwe temîz bikin û bi rêzgirtin û hurmet wî dîsa li cihê bilind û şerefnakê wî deynin. Ewê bihizirin ku ew ji Cennetê hatiye û îtîbarê bidin vî nirx û qîmetê bilindê di cewhera wî de. Haleveku însan, cenabê Heq Teala "**ji rûhê xwe pif kiriye wî**"yanî ew heybereke wilo ye ku ji qudreta bilinda Xuda Teala çendîn sirran hildigre û bi vî awayî ew bînahîya çavê mexlûqata ye. Li ser vî esasî qedr û qîmetê wî çi qeder ji ber gunehên ku wî kirine, ketibin bila ketibin, qîmetê di cewhera wî de baqî û mayende ye.

Wekî ku **Hezretê Mewlana** gotî rûhê însanî, wekî aveke berraq û zelal e. Lêbelê dema ew bi karên xirab û gunehan şîlo dibe tiştek têde nayê dîtin. Di vê rewşê de ji bo mirov karibe dûr-

rên manewîyatê û nûrên heqîqetê bibîne, divê mirov wê avê paqij û zelal bike. Naxwe ğaye û emanca tesewwufê, hestên ezperestî û nefsanî terbîye bike, ferd û takekesan û di netîcê de ji civakan bigihîne sulh [aştî], aramî û dilşadîyê. Li ser vî esasî, hîç ti însanek çi qeder di kufr, şirk û gunehan de pêşve çûbe, bila pêşve çûbe, divê ew ji mûxateb-bûna ji bo bang û daweta hîdayetê neyê mehrûmkirin. Yek ji nimûneyên bêjimar ên esrê seadetê wiha ye:

Wehşî apê **pêğemberê Xuda** [dirûd û silavên Xuda lê bin] Hezretê Hemza şehîd kiribû. Bi vî awayî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di ğemgînî û tesîreke kûr de ğerq kiribû. Wî sihabîyekî xwe şand cem Wehşî da ku wî ji bo mislimanbûnê bang bike. Wehşî wek bersiv ji Resûlûllah re gotibû:

“-Ya **Mûhemmed!** Te ev hukmê Xuda beyan kiriye: “**Ewê ku kesek kuştibe, yan şirîk ji Xuda re çêkiribe, yan jî zina kiribe, ewê roja qiyametê du qatan bikeve ezabê û ewê wek şerpeze û heqîr heta hetayê di Cehennemê de bimîne..**”[336] Vêca tu çawa dikarî min ji bo îslamê bang bikî? Haleveku min ev tiştên mekroh tev kirine. Ma ji bo min wê rêya xilasîyê çawa hebe?”

Vêca Xuda Teala, wek bersiva pirsa wî ev ayeta ha nazil kir:

قُلْ يَا عِبَادِيَ الَّذِينَ أَسْرَفُوا عَلَى أَنْفُسِهِمْ لا تَقْنَطُوا مِنْ رَحْمَةِ اللَّهِ إِنَّ اللَّهَ يَغْفِرُ الذُّنُوبَ جَمِيعاً إِنَّهُ هُوَ الْغَفُورُ الرَّحِيمُ.

“**Bibêje; Xuda dibêje: Gelî bendeyên min, ên ku li dijî xwe sînor derbas kirine! Hêviya xwe ji rehma Xuda nebirrin!**

336. Furqan, 25/68-69

**Lewra Xuda li hemû gunehan dibûre. Bêşiwar her ew e, gunehbexş û dilovîn**."[337]

Di dawîyê de Wehşî bi mizgînîya di vê ayeta pîroz de dilşad bû û wiha got:

"**-Ey Rebbê min, rehma te çi qeder mezin e!**" wî toba nesûh kir û digel hevalê xwe misliman bû.

Uslûba tesewwufî ji vê heqîqetê û yên wekî wê îlham girtiye. Mûhîmtirîn taybetmendîya tesewwufî teher û terzê nêrîna wê li însanî ye. Li gorî vê însan, bi amadekarî û îstîdadeke wilo mûkemmel hatiye aferandin ku ji bo xîtaba îlahî bibe mezher û xuyageh, ew bigihe tecellîyatên kamil ên sifetê îlahî û ew ji bo Rebbê xwe bibe xelîfe. Ji vê hêlê ve, ew wek **zubde'yê alemê** [bînahîya çavên kaînatê] sirrekê ji Rebbê xwe hildigre. Naxwe wekî ku me berî vêga jî îfade kir, bi sebeb gunehên ku wî kirine çi qeder ji qedr û qîmetê wî ketibe bila ketibe, nirx û bihayê di cewhera wî de baqî û mayende ye. Lêbelê dema tesewwuf vê dibêje jî, helbet ne bê endaz û pîvan e. Tişta ku tesewwuf dike, bi kurtî wiha ye:

*"Dema ew bi gunehkarî re mûsameha dike, ne ji bo wî bixe nav guneha ye, dema ew dijminahîya gunehan dike jî, dijminahîya gunehkaran nake."*

Tesewwuf bi vî alîyê xwe, di roja me de ji bo teblîxa îslamê berhemdartirîn wasîtê pêktîne. Lewra însan tim û daîm bêrîya hemêza mehebbetê ya dostên Heq Teala yên wekî Ebdûlqadirê Geylanî, Ezîz Mehmûd Hûdayî, Yûnus Emre, Behaûddîn Naqşebend û Mewlana, dikin.

337. Zumer, 39/53

*Altinoluk: Bi van agahîyên ku we dan, we îfade kir ka tesewwifê çawa însan ji nasnameyeke xav gihandiye nasnameyeke kamil. Li ser esasê vê heqîqetê, divê cihê tesewwufê di heyata mislimanekî de çi be? Bi vegotineke din, ma bê tesewwuf jî nabe?*

-We sûaleke pirr mûhîm pirs kir.

Tesewwuf, bi pêkhatina derûnîyeke fereh û naveroka xwe di destê ehlê îmanê de nîmeteke feyzdar û kamila wilo ye ku tecellîyeke îslamî ya jêneger e. Ji vê nêrînê ve ew, ehemmîyeteke zehf mezin erz dike; ew dikare bibe wesîle hem ji bo misliman bigihe kemalê, hem jî ğeyrê mislim jî werin ser hîdayetê û îslamê ji bo wan bi awayekî rast û durust bide xuyakirin..

Lewra hemû agahîyên kitêbî, di heqîqetê de dişibihin tuxmekî. Çawa ku tuxm di zevîyê de neyê çandin ew sade di embarê de bimîne, heke zehf sal û zeman bi ser de derbas bibin jî dîsa ew ji tuxm pê ve nabin tiştekî dî, agahîyên kitêbî jî dema di setrên kitêban de, yan jî di refan de bimînin rewş eynî wilo ye.. Li hemberî vê, ew tuxmên ku di zevîyê de hatibin çandin jî li gorî wesfên xwe mezin dibin, li erdê têne reşandin, hinek ji wan jî dibin wekî çinareke nehîtî. Eynî wiha ye ew tuxmên îlmê yên ku bi vî awayî di axa dil de jî hatibin çandin. Her yek ji wan, qelban dikin wekî bağ û bostanekî manewîyatê, vêca ew sirr û hikmetên ku fêkîyên rasteqîneyên îlm û îrfanê ne, ew zeman têne qezenckirin û bidestxistin.

Ji vî rexî ve alîyê dîn yê fetwayê, wekî sitûnên bingehîn ên avahîyê ne;  alîyê wî yê teqwayê jî, qismên temamker ên li hawîrdora wan sitûnan û regez û unsurên sipehîtî û zerafetê ne. Tesewwuf, ji alîyekî ve van herdu unsuran bi yek dike, li alîyekî din jî wek bi îlawe li ser emelê sipehî û mûkemmelîyeta exlaqî; însanî, Qur'anê û kaînatê eşkere dike. Bi vî awayî ji bo însanî temîn û dabîn dike ku ew berpirsîya xwe bi hikmet û îdrakeke

kûrtir bicih bîne. Li ser vî esasî tesewwuf, di behsa mehebbetûllah û marîfetûllahê de ji bo evdan, wekî pencerekeke manewî ye ku ji dilên wan, ber bi mîracê ve hatiye vekirin.

Naxwe tesewwuf, ji bo rûh û dil îhtiyaceke jêneger e. Dema ew halo be jî, ew rastîyeke ku divê di heyata her mislimanî de -çi hindik çi jî gellek- her hebe. Ya rast, heke însan li cihekî hebe li wir tesewwuf mijara peyvê ye, mewzû-behs e.

Heke mirov vê rastîyê li kenarekî deyne û bibêje *"ma bê tesewwuf nedibû?"* dibe pirseke wekî vê sûalê; *"ma îslam bê îlmên esasîyên xwe yên wekî tefsîr, hedîs, kelam, fiqh û îlmên dîtir nedibû?"* Ne lazim dîtina tesewwufê; ne lazim dîtina îxlas, teqwa, îrfan, tezkîya nefsê û tesfîya qelbî ye..

**Welhasil;** ji Xuda re nelazim dîtina evdînîyeke bi semîmîyeta di meqamê îhsanê de ye. Lewra bi tesewwufê, ev heqîqet têne qesdkirin. Naxwe ew kesê ku van heqîqetan di heyata xwe de dijî, heke ew navê tesewwufê qebûl neke jî, bi nêrîna me, ew jî di heyata xwe de tesewwufê dijî. Lewra teqwa, zuhd, îhsan û tesewwuf peyv û navlêkên ji hev nêzîk in; ew di heqîqet û mûhtewa'ya xwe de di esl û esasê xwe de eynî mane û emancê nîşan didin. Nav li wan kirin sade îsm û nav e. Di merkeza van hemû îfade û navlêkan de, wek tekane nimûneya "mûrşidê kamilê bilindtirîn" ji bo temamê beşerîyetê uswe'yê hesene [nimûneya sipehîtirîn] Hezretê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û ew eshabê kîram hene ku ew di terbîya manewîya wî de rabûne, gihane û her yek ji wan şexsîyeteke bilind û stêra manewîyatê ye..

Li alîyê din bi îtmî'nanê gihana qelb, ji hêla maneyî ve gihiştina wî ji bo hizûr, aramî û seadetê, bi sewîya ku ew gihayê ve bend e. Ji bo vê jî divê evd terbîyekeke manewî wergire. Lewra tijebûna qelb ji îlm û hikmetê, mûttelî û agahdarbûna wî

ji heqîqetên bilind ên dînî û ji bo evd karibe ji hêla maneyî ve kamil bibe, ev bes di netîca hinek emelîyeyan de mûmkin dibe.

Çawa ew pêğemberên ku wek nimûne ji bo beşerîyetê hatine şandin jî, berî ew wehyê wergirin û jê re bibin mûxateb, ew di werçerxeke îstîdad û hazirîyê de hatine derbaskirin. Lewra ji bo qelb were rewşeke wisan ku karibe tecellîyên letîf ên manewî wergire, divê ew ji kesafet û dilsitûrîyê were paqijkirin, ew hessasîyetê qezenc bike û ew bigihîje qiwameke dîyar.

**Resûlûllah** -dirûd û silavên xuda lê bin- berî ew bi pêğembertîyê were wezîfedar-kirin li Şikefta Hîrayê ketibû îtîkafê[338]. **Mûsa** -silavên xuda lê bin- berî mûkalemeya bi cenabê Heq Teala re çil rojan li Tûra Sînayê ketibû cure rîyazatekê. **Yûsuf** -silavên xuda lê bin- berî li Misrê bibe sultan diwazdeh salan di zîndanê de mabû. Ew li wir, di hemû pêvajoyên çîle, jan, rîyazat, mûcahede û meşeqqetan de hatiye derbaskirin. Bi vî awayî, qelbê mûbarekê wî ji hemû palpişt û elaqeyên ji bilî Xuda bi temamî hate temîzkirin.

**Resûlûllah** -dirûd û silavên xuda lê bin- berî hilgere Mîracê, ji bo sirrê “sûretê Înşîrah” bû mezher û xuyageh. Singa wî hate vekirin û qelbê şerîfê wî hate şûştin. Ew bi rûhanîyeta îlm û hikmetê hate tijekirin. Lewra ewê li Mîracê bi hadîseyên ecêb û ğerîb re rûbirû bihata, wî dê ew menzere û dîmenên curecurên letîfên esrarê îlahî temaşe bikira ku ew bi kesafeta beşerî nedihatine dîtin.

Heke ew pêğemberên ku evdên bijarde yên Xuda ne jî, di tesfîya qelbî de hatibin derbaskirin, êdî baş tê fehmkirin ku çi qeder îhtiyaca mirovên dîtir bi temîzî û paqijîya qelbî heye.

338. Îtîkaf: Xwe li cihekî dane gortin û wextê xwe derbaskirina bi îbadetê ye. Nexasim di deh rojên dawîya Remezanê de mirov bikeve mizgeftê û xwe bide îbadetê.

Lewra însan bi qelbê kesîf [sitûr], nikare ji Letîf [ezze wecelle] nêzîk bibe. Ew kesê ku bêhvila wî bêhst bûbe, bêhnan neke, nikare para xwe ji bêhna gul û qerenfîlê wergire. Însan nikare di cameke hilmgirtî de dîmeneke net û sade temaşe bike. Li alîyê din, heke zerreyeke heramîyê, yan jî tişteke bişubhe bikeve nav helalî, eynî wekî ku dilopek necaset bikeve nav sewîlek ava kehnîyê ye ku ew hemû safîyet, meqbûlîyet û feyza wê tine dike.

Bi vê sebebê, ji bo qelb bikeve rewşeke wisan ku karibe hessasîyeta manewî ya xwe zêde bike û sirr û hikmetên îlahî wergire, zerûrî ye ku ew ji kesafetê were temîzkirin û letafetê li xwe bike. Lewra cenabê Heq Teala gotiye:

يَوْمَ لا يَنْفَعُ مَالٌ وَلا بَنُونَ; إِلاَّ مَنْ أَتَى اللَّهَ بِقَلْبٍ سَلِيمٍ.

“**Ew roj, mal û zaro feydê nadin ti kesî. Lêbelê yên ku bi qelbê selîm** [bi dilekî pak] **bên cem Xuda, ew ne têde ne.** ”[339]

Heta qelb selîm bibe jî, divê ew bi terbîya manewî, safîyetê qezenc bike.

Lewra qelb berî perwerdeya manewî, wekî hesinê sar e. Ji bo ew wî şeklê ku tê arzû-kirin, wergire, pêşî divê ew di êgir de were sincirandin, ji jengar û qirêjên xwe were paqijkirin, ji hişkbûnê derkeve, were nermkirin û were lêxistin. Bes ew di piştî van hemû merhelan de kare wî şeklê ku tê arzûkirin wergire. Eynî wekî berî tetbîqkirina van hemû emelîyeyan, kemalata qelbî tehqîq nabe. Piştî kemalata qelbî tehqîq bibe jî, ew alema heqîqetan ya ku bi çavê serî nayê dîtin û bi eql nayê îdrak-kirin, ewê bi zewqê were fehmkirin û bi qelb were hiskirin. Ji bo vê jî divê mirov taqet û dîrayeta qelbî kamil bike.

339. Şûera, 26/88-89

**Mewlana Celaleddînê Rûmî** li ser îzahkirina ehemmîyeta vê gihan û kamilbûnê de, dema ew di Medreseya Selçûqîyan de di zirweya îlmên zahirî de bû di “ders-amekê” [dersa giştî] de halê xwe yê ku têde bû, bi vê “**ez xav bûm**” îfade dike; dema kaînat ji tecellîyatên marîfetûllahê tije, bû kitêbek û sirrên têde meknûz [berhevbûyî] destpê kir, jê re eyan bûn ew wî halê xwe wiha vedibêje; “**ez pijîyam**”; ew halê tinebûna xwe di mûhebbeta zatê Wî de jî wiha vedibêje; “**ez perîtîm**”..

Ev jî şanî dide ku meqbûlîyeta evdî li cem Xuda, ji ber ku zehftir bi înkîşafa qelbî ve bend e, ji bo qelb bi kemalê bigihe, bi serê xwe pêdivî bi terbîye û perwerdeyeke manewî heye. Hezretê Eshabê kîram nimûneyên bêjimar ên nêreber û mûşexxes ji bo vê heqîqetê pêşkêş kirine. Çawa ku gellek ji wan heybereke ew qeder hişkûhola bûn ku keçên xwe bi sağî binax kiribûn, ew di bin terbîya manewîya pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de her yek ji wan bû abîdeyeke şefqet û merhemetê yê welê ku hêstir ji çav û dilên wan dibarîn.. Wan can û malê xwe di ber Xuda û Resûlûllah de dabû.

Bi kurtî ez dixwazim bibêjim ku:

Mislimantî bê tesewwuf dibe, lêbelê ev, dibe mislimantîyeke ji qiwama îhsanê mehrûm. Yanî heyateke îslamî ya ku ji wê tesewwufê hatibe xwerû û tecrîdkirin ku ew perwerdeyeke manewî ye, însanî nagihîne “*qiwama evdînîyeke wekî ku Xuda dibîne wilo jê re îbadet bike*.”

***Altinoluk****: Ez benî, xwendevanên Altinolukê dostên dilî yên zatê ‘alîyê we ne. Ew însanên welê ne ku di hewaya dilî de hevdîtina bi we re bextiyarî dijimêrin. Di dawîyê tu di bara tesewwufê de dixwazî çi ji wan re bibêjî?*

-Bi îlawe li ser tiştên ku me heta bi vir gotin, ez dixwazim ji wan re hinek şîretên ku dostên xuda bi israr li ser wan sekinîne, îfade bikim:

Tesewwuf terbîye û perwerdeyeke manewî ye ku hewldana ji bo qezenckirina exlaqê pêğemberê Xuda ye. Ew, di îbadetê de halê wecdê û di mûamelatan de jî halê fezîletê ye. Ev jî, bi eşq û evîn berê xwe dana Xaliqê kaînatê û Resûlê wî ye. Ji bo vê, ew dostên Heq Teala ku bi evîn û berêxwe-daneke semîmî Mewla û Resûlê wî di merkeza dostanîyê de bicih kirine, ew heta hetayê bûne dostê hemû însanîyetê.

Ulfet û sohbeta bi salihan re mûmînî salih dike. Lewra di karekterên enerjîk [feyzdar] de taybetmendîya sîrayetê heye. Ew salihên ku nîzamê didin rûhan û fetrîma manewî dikin, ew kes in ku nefsa xwe paqij kirine û terka keyfbûrandin û pertalên dinyayê kirine. Xanîyê dilî yê wan, ji feyza îlahî tije ne. Ulfeta bi wan re, evdî dixe rewşeke wisan ku temamê mexlûqatan ji destê wî û zimanê wî îstîfade dikin.

Mehebbet, di navbera du dilan de xeta cereyanê ye. Însan ji bo yê dilê xwe dabiyê dibe meftûn û heyran. Êdî ew, wî teqlîd dike. Li ser vî esasî mûmîn, divê bi her wesîlê di ğeyret û hewldana xwe ya di her qadê de îksîra “mehebbet”ê bikarbîne.

Şexsîyet qezenckirina îlmê û bi îrfanê cih guherandina wî dibe wesîle ji bo cenabê Heq Teala di qelb de were naskirin. Kaînat, mûemmaya hikmet û sirra ye. Zanîn, ne temaşe-kirin e, çavnasbûn û aşînabûna ji bo hikmet û sirra ye.

Xilasbûna qelb ji kesafetê [sitûrîyê] û letafet lixwe-kirina wî, bi qasî nêzîkbûna wî ji Mewla, çêdibe. Mûmînê ku dilê wî sağ dibe, ew digihîje nemirinê. Dijberîya vê jî, ewê ku nefsanîyetê

lixwe dike, bi qasî nefsanîyet lixwe kirina wî, ew sifetê însanîyeta xwe winda dike.

Esasê exlaqê îslamê, bi evîn û îxlas berê xwe-dana Rebb e; tekane nîşana vê berê-xwedanê jî bêşiwar "**xizmet**" e.

Mehebbet wasîteyeke sêhrdartirîn e ku zehmetîyan bi rehmê werdigerîne. Xizmeteke ku bi mehebbetê were edakirin çi qeder giran dibe bila bibe, ew bi hêsankarî û hizûr tê bicihanîn. Di heman demê de nirxê xizmetekê, bi mezinbûna fedakarîya ku di ber wê de hatiye kirin û bicihanîna wê ya bi wecda îbadetê ve bend e. Xizmetên semîmî û rastîn, şehesera gihan û kamilbûna qelbî ye. Ew qelbên ku bi vê kemalê gihabin "**nêrîngeha îlahî**" ye.

Di Qur'anê de navê cenabê Heq Teala "**Rehman** û **Rehîm**" zehf zêde têne zikrkirin û gotin. Ev herdu nav, merhemeta wî îfade dikin. Divê di her mûmînî de merhemet û şefqet bibe «tebîetê eslî» yê wî.

Ew kesê ku ji şefqetê mehrûm be, nizane ka dil-berketin çi ye. Wî, xezîneya mezintirîn û kilîla ku derîyê hemû seadetan vedike, berze û winda kiriye. Divê mirov ji her kesên din bêhtir, dilê xwe bi wan kesên ku ji şefqetê mehrûm in, bişewitîne, li wan were rehmê û bi ber wan bikeve.

Sebeb-bûna ji bo zulmê, mehrûmbûna ji mehebbetê ye. Însanê ku hez nake, her zeman dikare bibe heybereke zalima cenewarane. Fêkîyê evîna heqîqî, şefqet û merhemet e. Li ser erdê hîç ti dil û bajarek nîn e ku bi şefqet û merhemetê neyê fetihkirin. Lewra ji bo taverojê çawa germ-nekirin ne mûmkin be, ji bo rûhên hêzdar û xurt jî bi ber mexlûqatan neketin û rehm li wan nekirin jî wilo ne mûmkin e.

Ew **Xellac**ê ku cihekî cihêwaz û mûstesna yê wî di dilên evîndar de heye, dema kevir li wî dihatin barandin, wî lavlav ji Xuda dikir, îsareke mezin nîşan dida û wiha digot:

"-*Ya Rebbî! Pêşîya min, wan ê ku keviran li min dibarînin, efû bike!*"

Heke em bixwazin sewîya xwe di rêya manewî de bibînin, divê em halê xwe û reftar û bizavên xwe tehlîl û çareser bikin.

"Ezperestî" û "îddîa" penceşêra rêya manewî ye. Îblîs di wextê xwe de di meqamekî bilind de bû, ji bo vê ew li xusranê ket.

**Hezretê Mewlana** dibêje:

"*Ya mûhîm mirov bibe tebîet-gul. Yanî mirov li nav bexçê vê dinyayê, strîyan bibîne, mirov ji wan biêşe û nebe strî, heke çîleyên wekî zivistanê jî bikevin wir, mirov wan bi demsala biharê hemêz bike û ji bo hemû alemê bibe gulek.*"

Ev nesîhetên giranbiha yên ku **Hezretê Ebdûlxaliq Ğucdûvanî** di bara ciwanî û sipehîtahîyên qiwama rûhî û bizavên wî de kirine ku ew di rêya tesewwufê de destûrên qîmetdar ên dil in:

*"Ey Kur! Ez şîret li te dikim ku; di hemû rewşên xwe de li ser îlm, edeb û teqwayê be!.. Eserên mirovên ku derbas bûne û çûne bixwîne, di rêya ehlê beytê û ehlê sunnet û cemaetê de here! Fiqh û hedîsê hîn bibe û li çi cih û mekanî be ji sofîyên cahil bireve!*

*Nimêjên xwe her bi cemaetî eda bike! Heke di dilê te de meyla şohretê hebe, nebe îmam û mûezzin! Heta ji te were, ji şohretê dûr bibe! Di şohretê de afet heye. Bila çavê te di meqaman de jî nebe; tim û daîm xwe li meqamê xwarê bigre!*

*Ji bo karê ji taqeta xwe der, nebe kefîl! Têkilî karên xelkê yên ku te elaqedar nakin, nebe! Bi rêvebirên fasiq re ranebe û nerûne! Di her xusûsê de hevkêşîyê mûhafeze bike! Ji endazê nebûre û zehf zêde li dengê xweş guhdarî neke ku ew rûh reş dike û di dawîyê de nîfaqê diwelidîne. Ku rewş wiha ye, dengê xweş jî înkar neke ku ezan û Qur'ana pê tên xwendin, rûhan sağ dike.*

*Hindik bixwe, hindik biaxive, hindik raze. Wekî ku tu ji ber şêr direvî wilo ji ğafil û ehmeqan jî bireve! Di zemanê fitneyan de tenê-manê tercîh bike. Xwe ji alimên ku bi mûcibê menfîeta xwe fetwa didin û dibin sersebeb ku sivikahî bi dîn were kirin, ji zengînên serxweveçûyî û ji nezanan dûr bike!*

*Helalî bixwe, xwe ji karên bişubhe vede û di zewacê de teqwayê diqqet bike. Heke na, tu yê bi dinyayê ve werî girêdan û tu yê di wê oğirê de dînê xwe xirab bikî…*

*Zehf nekene; ca diqqet bike ku tu bi qehqehe hîç nekenî! Zehf kenîn dil dimirîne. Lêbelê tebessumê jî ji dest bernede. Lewra tebessum sedeqe ye. Bi çavê şefqetê li her kesî binêre û ti kesî biçûçik nebîne!*

*Zahirê xwe zêde tezyîn neke, nexemilîne; cilê sade û zerîf li xwe bike. Lewra zêde giringî-dana bi zahirê xwe, ji wêranîya hundurîn tê.*

*Mûnaqeşe neke, ji ti kesî tiştekî nexwaze, mûsteğnî bimîne, bi qenaetê zengîn bibe û weqûrîya xwe biparêze!*

*Li hemberî mirovên ku keda wan li ser te heye û ewên ku tu terbîye kirine jî weqûr be, bi malê xwe û canê xwe xizmetê ji wan re bike û halê wan ji xwe re bike hal! Ew ğafilên ku wan şermezar dikin, serfiraz nabin.*

*Meyla xwe nede dinyayê û ğafilên ehlê dinyayê! Bila tim û daîm dilê te mehzûn be, bedena te ji evdînîyê re xurt be, çavên te hêstirbar bin û qelbê te reqîq û tenik be.*

*Bila karê te îxlas, dûaya te îltîca, lîbasên te mûtewazî, rêhevalên te salih, sermayê te îlmên zahirî û batinî, mala te mizgeft û nêzîkên te jî dostên Xuda bin!...”*

***Amîn...***

❁

# Ferhengok

### A-a

**Abad**: Ava, tije heyat.

**'Alî**: Bilind, bala, mezin.

**Abid**: Îbadetkar. Taetkar. Xwe binimêjêbexş. Ewê ku Xudaperestî, nimêj û taet ji xwe re kiriye pîşe û meslek.

**Acîl**: Bilez, zûbizû, lezgîn.

**Adîlane**: Bi edaletî, bi dadmendî, bi hiqûqnasî.

**Aferandin**: Xuliqandin. Çêkirin. Anîna wicûdê. Peydakirin.

**Aferîner**: Xaliq. Çêker. Peydaker.

**Agah**: Zana, xeberdar, çav-vekirî, jîr, arif, dinyadîtî.

**Agahdarî**: Pêzanîn, xeberdarî, xwedî-malûmat.

**Agahî**: Xeber, melûmat, pêzanîn.

**Ağa**: Mezinê gund, xwedî-ğulam, rêvebirê êlê.

**Ağatî**: Mezinatîya gund, rêvebirîya êlê.

**Aheng**: Mûtabiq, hevdeng, hevrêz,

**Ajar**: Nîmet, lutf, kerem.

**Alarm**: Hişyarî-dan, fermana amadekarîya ji bo şerr û tiştekî dî ye.

**Alem**: Cîhan. Dinya. Gerdûn.

**Alîcenab**: Comerd, şerefmend, bi heysîyet, serbilind, serberz.

**Aliman**: Geljimareya alim e. Ew zanayên dînê îslamê ne. Ewên ku têr agahî û melûmat in.

**Amade**: Hazir, vebohtî, fermanber.

**Amadekarî**: Hazirî. Karbûnî. Îstîdad. Cahizîyet.

**Amîn**: Peyva ku di piştî dûayan de tê gotin, bi maneya dûaya min û me qebûl bike. Daxwaza me bîne cih.

**An**: Kurt-tirîn dem, bîstik, qasek.

**Anarşî**: Bê-xwedîtî, sêlûbêlî, herc û mercî, berdîberdan, bênîzamî.

**Aqîbet**: Encam, ekam, netîce, paşîk, serencam.

**Arif**: 1. Zana, aşîna. 2. Ewê ku bi awayê layiq Heq Teala û berhemên wî fehm dike, wan dizane, bi îlmê xwe emel dike, bûye xwediyê îrfanê û gihaye zanîna kemal, merîfet û heqîqetê. Ehlê terîqetê.

**Arîfane**: Bizava ku ji arifî re leyiq e.

**Arîsto**: Fîlozofekî navdar e.

**Armanc**: Nîşan, hedef, ğaye, emac.

**Arzû**: Daxwaz, hewes, reğbeta dil, teleba ku ji kûrahîya dil tê.

**Asa**: Kopal. Birhliser. Daberxwe.

**Asî**: Îsyankar, serhildêr, berxwedêr.

**Asîman**: Dijê erdê ye. Banê ser mirovan re ye, jora dinyayê, banê erdê ye.

**Aso**: Ufûq.

**Ast**: Sewîye.

**Astronomî**: Zanista ku bi cismên asîmanî re elaqedar dibe. Hey'et, feleknasî.

**Awa**: Şekl û sûret, wech.

**Axaftin**: Peyv, xeberdan, qise-kirin.

**Axir**: Dawî, paşî, dûvre, piştre.

**Axirzeman**: Serdema dawîya vê dinyayê ye. Dema nêzîkbûna qiyametê ye.

**Axret**: Alema piştî dinyayê, alema din.

**Ayet**: Her cumle, hevok û komikeke Qur'anê ye.

**Aza**: Endam, organ.

**Azad**: Serbest. Riha. Rizgar, felat.

## B-b

**Baliğbûn**: Xamebûn, gihan, kamilbûn, mezinbûna temenî, berpirsbûn.

**Bandor**: Tesîr, kartêkirin.

**Baqî**: 1. Sifetek ji sifetên Xuda ye. 2. Daîmî, mayende, nemir. 3. Yê mayî, ji bilî van, wekî din.

**Bariz**: Eşkere, xuya, bilind, bala, dîyarde, bel.

**Bariztirîn**: Eşkeretirîn, xuyatirîn, bilindtirîn, balatirîn, dîyardetirîn, beltirîn.

**Batil**: 1. Pûç, beyhûde, derew, rizî, nerast, neheq. 2. Ğeyrê heq. 3. Bê hukm, nederbasdar, nemeqbûl. Nerewa

**Batin**: 1. Hinavî, navxwe. 2. Rûyê hinavî. 3. Veşartî, tişta nenêreber. Nexuya, nezahir. Navî, naverû, veşartî, nedîyar, nedîtber.

**Batinî**: Hundurî, nedîtber, tişta ku bi raz û sirr û hikmetan re têkildar e. nexuyahî, nezahirî. Navxweyî, hundirî.

**Bawerî**: Îman, îtîqad, îtîmad.

**Bazar**: Sûk, cihê kirrîn û firotinê, cihê li hev guherandina tiştan.

**Bedbextî**: Bêşensî, şensnebaşî. Bêyomî, bêqudoşî, bêdostî, bêhevaltî.

**Bedra mûnîr**: Heyva ronak, heyva çardeh şevî.

**Belağet**: Zanista rêz û rêçên Edebîyatê. Tekûzîya di peyv û nivîsê de. Îfadeya bi tesîr û bi huner.

**Belîğ**: Fesîh, zelal, tekûz, bibandor, kartêker.

**Bende**: Kole, evd, girtî, bindest, ne azad.

**Beqa**: Nemirin, mayende.

**Berate**: Elamet, remz û nîşan.

**Berbat**: Xirab, berba-ketî, bêkêr.

**Bereket**: 1. Destferehî, nîmet-pirrî. 2. Xêr û seadet. 3. Xêr û

xweşî. Feyz, rêhtina xêran û ferehvanî ye. Xêr û xweşîya ku naqede, t‘em-jê dîtin e.

**Berhem**: Eser, karpêk, tişta pêkanî.

**Berketî**: Hêja, qîmetdar, qedrgiran, nirxdar, bihamend, bihadar.

**Berraq**: Rohnak, berqînok.

**Berz**: Bilind, bala, xuya, liberçav, dîtber, zahir. Winda, ğaib, ne hazir.

**Berze-bûn**: Windabûn, nihan-bûn, xuyanebûn.

**Besîret**: 1. Dîtina bi dilî, dîtina rast û biendaz, jîrîtî, şûmbûn. 2. His, dîtina dûr, dûrebînî. 3. Firsend, fehmkirin, kûrbînî. Pêşebînî, dîtina bi qelb e. Dîtina bi qelbî, dîtina rast û bi endaz, dûrbîn, feraset, fehmkirin.

**Bevken**: Tebessum, kenê bê dev-vekirin e.

**Bextewarî**: Dilşadî, aramî, hizûra dil û wijdanî ye.

**Bextiyarî**: Bextewarî, kamiranî, dilşadî, dilxweşî, keyfxweşî, seadet. şadmanî, dilcoşî.

**Bey‘et**: Danûstana qebûl û tes-dîqkirinê, sozdan, peymandan, ehd-dan.

**Beyhûde**: Bê feyde, bê mûfa, li ber çav nayê girtin,

**Beyt**: Malikê şiêran e.

**Bezl-kirin**: Xerckirina pirr zêde, zehf zehf dan.

**Bezma elest**: Dema Xuda rûh hemû xuliqandibûn û ji wan re gotibû; “Elestû bi Rebbî kum?” «ma ez ne Rebbê we me?!» Ew dîwan, encûmen û meclis e.

**Bêzar**: Reht, gazindker, nerehet, nememnûn.

**Bêrî**: 1. Li derveyê malan dohtina pez. 2. Bêrîya dost û yarê xwe kirin. 3. Bêguneh, bêagah. 4. Pak û paqij, azade, xilasbûyî.

**Bêcan**: Bêrûh, bêgiyan, nesağ, nez-indî.

**Bêçare**: Naçar, heyirî, sergêj, jidest-nehat. Neçar, lawaz, weza, bêhêz, bêmecal, ketî.

**Bêgane**: 1. Bê elaqe. 2. Ne naskirî, biyanî, ecnebî.

**Bider**: Xaric, derve.

**Bijarte**: Neqandî, ji nav gellekan veqetandî, hatî tercîhkirin.

**Bilind**: Bala, ulwî.

**Billûr**: Şefaf, kevirê berqînok, wek elmas binirx, cam, wek camê berqînok.

**Binemal**: Malbat, aîle, ezbet, famîle.

**Bîner**: Ewê ku dibîne, temaşe dike.

**Bîser**: Ewê ku dibihîze û seh dike.

**Bîyo-kîmyewî**: Tevnên zindî û bûyerên kîmyewî yên bi van tevnan re elaqedar.

**Buhran**: Krîz û qeyran e.

**Buhtan**: Îftîra, bêbextî, bi neheqî sûc xistin stûyê yekî.

**Burhan**: Delîl, pêbawerî.

## C-c

**Caliba diqqet**: Balkêş, dêhnkêş,

**Can**: Giyan, rûh.

**Canan**: Hezkirî, sipehî, ciwan, xwedî-bedewî, sahib-cemal, rûhan, gîyanan.

**Candar**: Zindî, rûhber, xwedî rûh, giyanewer.

**Canfeda**: Cangor, giyangor, rûhfeda, fedakar.

**Cansojtirîn**: Derdnaktirîn, canhelêntirîn, fecaetamîz.

**Car**: Neql, sefer.

**Carek**: Neqlek, seferek, yek car.

**Carîye**: Jina kole, qerwaş, jina xizmetkar.

**Cazîbe**: Surdarî, cankêşî, dehfîner.

**Cebrî**: Zor bikaranîn, kotekî-kirin, xurtî-kirin, bi zorê, mecbûrî.

**Cedûl-Heseneyn**: Kalê Hesen û Hûseyn.

**Cefa**: Meşeqqet, ezîyet, rênc, êş û azar.

**Cehalet**: Nezanî, nefehm, tênegiha.

**Cehd**: Hewldan, ğeyret-kirin, karkirin, xebat-kirin, şiğûl-kirin.

**Celadet**: Agîdî, qehremanî, lehengî, nebezî, mêrxasî, çavnetirs.

**Celb**: 1. Anîn, kişandin. 2. Banga nivîskî.

**Celîl**: 1. Sifetekî Xuda ye. 2. Mezin, gewre.

**Cemadat**: Heyberên bêrûh, bêgîyan, bêcan.

**Cemal**: 1. Sipehîtî, xweşikahî, bedewî, delalî. 2. Bedewîya rû. 3. Sipehîtî, ciwanîya hundurîn û derveyî. 4. Bi rehma xwe tecellî-kirina Xuda, lutf, riza, îhsan û sifetên wî yên wekî van. Hemberîya Celal e.

**Cemala bi-kemal**: Sipehîtiyeke bi kemal. Sipehîtîya îlahî.

**Cemala îlahî**: Sipehîtîya Xuda,

**Cemalî**: 1. Tişta ku li sifetên Xuda Teala yên cemalî vedigere. 2. Ewê ku bi mîzaca xwe xwediyê cemalê be, sipehî be, bedew be, lihevhatî be, lutfkar û dilovan be.

**Cemalûllah**: Sipehîtîya bêdawîya Heq Teala.

**Cem-kirin**: Kom-kirin, berhevkirin, anîn-cem-hev.

**Cenab**: 1. Hawîrdora malê, terefên xanî, hewş. 2. Ji bo mezinatî îfade-kirinê, bi meqseda hurmetê tê gotin. Wek Cenabê Heq Xuda, cenabê Resûlê Ekrem.

**Cenewar**: Candar, wehşî, hov, rûhdar, xwedî rûh, ne-însan. Dehbe, dêw, heywanê tirsnak, heybetamîz, sawger.

**Ceng**: Şerr, qal, levdan, bihevketin, pevçûn, li hev xistin.
**Cengewar**: Şervan, qalkar.
**Cenîn**: Zarokê di zikê dêya xwe de.
**Cesamet**: Nehîtî, gizrî, bi bejna xwe mezin.
**Cesîm**: Nehîtî, gizrî, gewde-mezin, bejnmezin.
**Cesûr**: Mêrxas, nebez, gernas, egît, wêrek, çavnetirs.
**Cîhad**: Mûcadeleya bi ziman, mal, can û çekan a di rêya Xuda de. Têkoşer, şûrkêş, mûcadelekar, cîhadvan.
**Cîhan**: Gerdûn, dinya, alem, kaînat.
**Cîhangîr**: Dinyagir, gerdûngir, alemgir, kaînatgir, sultan, padîşah, fetihkar.
**Cîhanîyan**: Însan û cin, alemîn.
**Cîhaz**: 1. Alet, alev. 2. Lazimîyên bûkê. 3. Lazimîyên ji bo definkirina cenaze.
**Cîhet**: Teref, alî, rex.
**Cil**: Berg, kinc, lîbas, poşîn.
**Civak**: Komel, kom, civat, cemîyet.
**Cuda**: Cihê, ne-jê.
**Cudaxwaz**: Cudaparêz, veqetîner, cihêkar.

### Ç-ç

**Çak**: Baş, qenc, rind.
**Çand**: Kultur, rewşenbîrî, ronakbîrî, rewşenfikrî.
**Çar**: Hijmara çaran [4].
**Çarçove**: Dora resman, sînorê tiştekî, çar alîyên tiştekî, hawîrdor.
**Çardeh**: 14, çar û deh.
**Çare**: Derman, çareserî, hel, vekirina asêpirsê.
**Çavnebarî**: Hesûdî, zeğelî, xêrnexwazî, zikreşî, çavbarnegirtî.
**Çawanî**: Bi çi awayî bûn, keyfîyet.
**Çê**: Baş, qenc, çak.
**Çehre**: Rû, sîma, dêm, ruxsar.
**Çêj**: Zewq, te‘m, şamî-kirin.
**Çend**: hinek kes, ji sê kesan heta bi neh kesan e.
**Çendîn**: Gellek, zehf, pirr.
**Çetîn**: Dijwar, tund, nebez.
**Çetînî**: Dijwarî, tundî, zehmetî, cefakêşî, renckêşî.
**Çêtir**: Baştir, qenctir, rindtir.
**Çetr**: Çadir, kon.
**Çewt**: Şaş, ğelet, nerast, nedurust, xeta.
**Çima**: Ji bo çi, çire,
**Çira**: Çirağ, lempe, rohnîk, rohnîker.
**Çire**: Çima, ji ber çi, ji bo çi.
**Çîya**: Şax, kov, ne deşt, bilind-cih.
**Çol**: Cihê ku însan lê najîn, cihê terikandî.
**Çolî**: Însanê ku li çolê dijî.

### D-d

**Dad**: Edalet, heq, hiqûq-tetbîqkirin, mafnasane.

**Debdebe**: Heşmet, mezinatî, gewretî, şanîdana mezin.

**Deccal**: Ew yekçav, elametê qiyametê yê ku di dawîyê de dertê.

**Delalet**: 1. Elamet. 2. Rêşanîderî, rêberîtî, delîl û şanerî ye. 3. Ew di mentiqê de vê îfade dike; divê ji pêzanîna tiştekî, tişteke duduyan were zanîn.

**Delalet**: Jirêderketin, rêşaşî, ji hîdayetê ketin, ji rêya rast ketin, rêya xwehr, serxweveçûn, meyla batilî, heqnenasî.

**Derbû-mesele**: Gotina pêşîyan, wecîze.

**Dersa-am**: Dersa giştî, ewê ku xwedî selahîyet be ji bo dersê bide feqiyên medresan û bide her kesan.

**Derûn**: Nav xwe, alema derûnî, alema nava xwe.

**Derûnî**: Qelbî, dilî, tişta bi qelb bend be, ji dil, ji nava xwe. Hinavî, daxilî.

**Derya**: Behr, nebejî.

**Desîse**: Hîle, leystikên xapandinê, oyûnbazî.

**Destan**: Çîroka qehremanîyê.

**Destanî**: Bi qehremanî, bi agîdî.

**Desthilatî**: Îqtîdar, hukmranî û destbilindî ye.

**Destûr**: Îzn, mûsaede, pêrazîbûn e.

**Dewlet**: Welat, memleket, qismet, şens.

**Dewr**: Rêz û nobet, serdem, zeman, çağ, werçerx.

**Dîger**: Din, dîtir, yê din.

**Dîgerkam**: Dîgerbîn, îsar.

**Dijwar**: Tund, çetîn, sert.

**Dinya**: Gerdûn, cîhan, alem.

**Dinyewî**: Dinyayî, tişta ku xasê dinyayê ye.

**Diqqet**: Bal, dêhn, balkêşî, dêhnkêşî, miqate.

**Dirav**: Pere, zêr û zîv, bankanot.

**Dîrayet**: Zekawet, agahî, tije-fehm, têgihayî, têgihiştin, fehmkirin, zeka, agahî, berketin, jîrîtî, şûmîtî.

**Dirinde**: mûfteris, perçeker, kerkerkar.

**Dirûd**: Selat, şabaş û tebrîk.

**Dîsa**: Careke din, neqleke din, ji nû ve.

**Dîtir**: Dîger, din, dî, yê din.

**Divê**: Gerek e, lazim e. Pêdivê ye.

**Dîyar**: Eşkere, xuya, zahirî, pendî, penî, nexefî.

**Dîyarî**: Hedîye, xelat.

**Doz**: Dewa, boçûn, hedef.

**Dûa**: Xwestin, daxwazkirin, lavlavkirin, bergerîn.

**Dûçar**: Mûbtela, bela-lêketî, pêvedayî, hatî-girtî, pêgirtî.

## E-e

**Ela ‘îllîyyîn**: Bilindtirîn qata cennetê ye.

**E‘zem**: Mezintirîn, gewretirîn.

**Ebedî**: Bêdawî, daîmî, herûher, heta hetayê.

**Ebedîyen**: Heta hetayê, herûher, îlelebed.

**Ebes**: Pûç, bêhavil, bêfeyde, nelazim, kelevajî, li derveyî heqîqetê.

**Ebûs**: Rûtirş, rûqermiçî, bêmad, bêkeyf, nedestevîl.

**Ecdad**: Kal, bapîr, bavê bavan, bavê dêyan.

**Ecnebî**: Biyanî, ğerîb, nenas, nejime, newelatî.

**Eczîyet**: Nekarîn, bêçaretî, bê qewetî.

**Eğyar**: Geljimareya ğeyr e. Dîgeran, biyanîyan, ecnebîyan. Di tesewwufê de; mirovên ne ji terîqetê, dîgerên me.

**Ehd**: Soz, peyman, wa‘d.

**Ehkam**: Geljimareya hukm e. Hukman, darazan. Yanî hukm û ferman.

**Ehlê îman**: Ew kesên ku îman anîne, bawerî anîne.

**Ehwal**: Geljimareya hal e, rewş, wezîyet, dana Xuda, halên manewî.

**Ekam**: Encam, aqîbet, dawî, serencam.

**Ekolojîk**: Zanista hawîrdorê, hawîrnasî, derdorzanî.

**Elem**: 1. Îşaret, elamet, nîşan, şop. 2. Ala, sencaq. 3. Hîlala di serê mînare û sitûnên alayan de ye.

**Elzem**: Lazimtir, pêwîsttir, gerektir, pêdivêtir.

**Embrîyolojî**: Zanista gohnxwarina zindîyan ji pêvajoya hêkkirinê heta bi çêbûna wan û merheleyên ku ew tê re derbas dibin, hûrdikole.

**Emelê salih**: Ew karên xêrê, îbadet û xuyahîyên exlaqê xweş in. Hem jî kirina mûsteheb, wacib, ferz û sunnetan e, îbadetê ku bi îxlas û semîmî ji bo razîkirina cenabê Heq Teala.

**Emelîye**: Ew karê ku ji bo emanceke dîyar û bi awayekî dîyarkirî û bi şertên dîyarkirî tê kirin.

**Enbîya**: Geljimare nebî ye, yanî nebîyan, resûlan, şandeyan, qasidan, pêğemberan.

**Encam**: Aqîbet, ekam, paşîya paşîn, netîce, dawînek, paşîya kar.

**Endam**: Aza, organ û her beşên tiştekî ne.

**Endaz**: Pîvan.

**Enene**: Adet, kevneşopî.

**Eqlê selîm**: Ew eqlê ku gihaye selametîyê, ew hesta rastgîr, ew eqlê ku dikare qerar û biryarên rast û durust bide.

**Eqlî**: Ew tiştên eqlber, meqûl, bi eql re elaqedar.

**Erd**: Ax, dinya. Sererd, serzemîn.

**Erebistan**: Welatê Ereban.

**Erz-kirin**: Eşkere-kirin, rapêşkirin, pêşkêş-kirin.

**Esalet**: Zadeganî, kurebavî, kokdarî.

**Eser**: Berhem, karpêk.

**Esfele safilîn**: Jêra jêrîn, nizma ji hemû nizman nizmtir.

**Esfîya**: Geljimareya safî ye, yanî safîyan, dilpaqijan.

**Eshabê kîram**: Hevalên camêr, ewên ku bi çavên xwe pêğember dîtine, yan jî wî ew dîtine, îman pê anîne û li ser îmanê jî mirine.

**Eshabê Qerye**: Ehlê gund, xelkê gund, xwediyê gund, hevalê gund.

**Eshabê Uxdûd**: Ehlê koncalan, ewê ku ji bo mûmînan cok û koncal kola bûn da ku wan bavêjinê û têde bişewitînin.

**Eslî**: Ne ferîî, ne wekîl, esasî.

**Esrar**: Geljimareya sirra ye. Tiştên ku nayên zanîn, nehanî.

**Esrarengîz**: Sirr-weşîn, razfeşan, nehênîverêj.

**Etqîya**: Geljimareya mûtteqî ye, yanî mûtteqîyan, Xuda-nasan, dînperweran.

**Evd**: Kole, bende, bindest, ne azad, neserbest.

**Evdînî**: Koletî, bendîtî.

**Ewam**: Geljimareya am e, yanî gel, xelk, pirranîya xelkê, ne xewas. Çînîya li jêrê, beşa cahilan.

**Ewlîya**: Geljimareya welî ye, yanî welîyan, nêzîkên Xuda, qencên Xuda.

**Ewrad**: Geljimareya wird e. 1. Zikrê ku bi awayekî xusûsî tê kirin. 2. Ew beşên Qur'anê ku zehf tên xwendin, peyvên li zimanan.

**Exlaq**: Rewîşt, sinçî.

**Exlaqê hemîde**: Exlaqê ku medhê wan têne kirin, exlaqê xweş, xuyên xweş. Rewîştên pak.

**Eyan**: Eşkere, belû, xuya, li meydanê, beyan, bi çavan tê dîtin.

**Ezel**: 1. Bêdestpêkî, serî û berî nebûn. 2. Dema aferandina rûhan.

**Ezemet**: 1. Mezinatî. 2. Kubarî, xwe mezinkirin.

**Ezîz**: 1. Bi qîmet, hêja. 2. Mûhterem, rêzdar. 3. Welî, ewlîya. 4. Nezehf. Xweşdivî.

**Ezmûn**: Îmtîhan, tecrûbe.

## F-f

**Fail**: Kirde, kiryar, ewê ku dike, pêktîne.

**Farîqe**: Cudaker, veqetîner,

**Fasiq**: Ewê ku fermanên Xuda nas û qebûl nake. Ewê jirêderketî, ewê ku gunehan dike. Ewê ku fesadîyê dike. Ewê ku xirabîyê dike. Jirêketî, gunehkar, xirabkar û berbatkar.

**Faş**: Xuya, zahir, eşkere, zelal, nexefî, ne nehan, ne berze.

**Fazil**: Xwedî fezîlet, bêhnpak, serdest, zehf-baş.

**Fehrest**: Naverok, mûhtewa.

**Fêkî**: Meywe, ber.

**Feqet**: Lêbelê, emma, belam, lakin.

**Feraset**: Jîrîtîya zêhnî, qabilîyeta zû fehmkirina tiştekî, ji rûyê wî fehmkirina amadekarî û exlaqê kesekî, hesta çêbûna tiştekî berî hatina wî ye.

**Ferd**: Takekes, bi tena serê xwe, ne kom, ne grûp.

**Fereh-nak**: Dilxweşker, keyfxweşker, sirûrmend.

**Fêrgeh**: Hînbûnxane, cihê fêrbûnê, telîmxane, dersxane.

**Ferheng**: Loğetname, komkara peyvan, embara gotinan, depoya çand û kulturê

**Ferman**: Emr, destûr, talîmat.

**Ferz**: Ew hukmê ku Xuda bi awayekî serîh û eşkere li ser mirovan wacib kiriye ku her divê ew wê bînin cih. Tişta ku her divê were kirin. Heke nebe, nabe.

**Fesahet**: Gotinî, hunerî, fehmberî, sade, xweş, zelal.

**Fesîh**: 1. Ewê ku li gorî qaîde û hûrnuqteyên zimanekî diaxive. 2. Ewê ku bi eşkerehî û zelalî û sadeyî dipeyive.

**Fewqelade**: Der-adet, zêdetirî adetê, mûcîze.

**Fexrê kaînatê**: Şehnazîya cîhanê, îftîxara kaînatê, bînahîya çavan Hezretê Resûlê Ekrem, serkehnîya şehnazîya hebûnê, Hezretê Pêğember.

**Feyz**: 1. Şîrînîya manewî, aramîya dil. 2. Destferehî û bereket. 3. Gihan û pêşveçûn e. 4. Verêhtina xêr û bereketê, zêdebûn. 5. Bereket, zehf nîmet. Ajar û îhsan. Zewqên manewî.

**Fezîlet**: Bêhnpakî, qencîya exlaqxweşî ye.

**Fîlozof**: Hikmethez, zanayê felsefê.

**Fîraq**: Cudabûn, ji hev dûrketin.

**Fîre**: Têçûnî, kêmbûnî.

**Fitret**: Aferandinî, tebîet, xulqîyet, tebîî, xwezayî, cibilîyet.

**Fitrî**: Aferandinî, xulqîyetî.

**Fizûlî**: Zêde, ne lazim, ne gerek, ne pêwîst.

**Fonksîyon**: Wezîfe, erk, peywir, pêsipartî.

## G-g

**Gawir**: Kafir, Xudanenas, heqnenas, heqîveşêr, bêwijdan, bêînsaf, bêrehm, nedilovan, bêşefqet.

**Geda**: Zarok, xizan, parsek, feqîrok, rebenok, perîşan, bêserûber.

**Gelemperî**: Umûmîyet, giştî, tevahî, hemûyî.

**Ger**: 1. Di çem û behran de ew cihê ku av li hev digere û dibe sebeb ku avjen bixeniqe. 2. Îdare, rêvebir. Wekî bajarger, qezager, dozger, dadger, karger, civatger, rojnameger.

**Germxane**: Ew malên naylonî yên ku di bin wan de sebze û şînahî tên çandin û xwedî-kirin.

**Gernas**: Mêrxas, leheng, nebez, qehreman, çavnetirs.

**Gewher**: Cewher, zînet, xişr, rewş.

**Gewr**: Sipî, rûsipî, rûciwan, şoğûşeng,

**Giringî**: Ehemmîyet, tişta ku li pêşîyê tê.

**Girîzok**: Lerzokên ku ji ber heyecanê, yan tirs, yan jî kul û derdan li însên peyda dibe.

**Girse**: Kitle, koma hevcinsan.

**Giyan**: Rûh û can.

**Guhan**: Çiçikên pez û çêlekan e.

**Guhar**: Zêrê ku keç û jin dixin guhên xwe.

**Guhastin**: Neql-kirin, ji cihekî ji bo cihekî din birin.

**Guhdar**: Yê ku guhdarî dike.

**Guhdîk**: Sehkar, bihistok.

**Guhêrber**: Guherok, ne sabit e, ewê ku her diguhere.

**Guhertin**: Teğyîrkirin.

**Guhêzerî**: Neqlîye.

**Gulan**: Geljimareya gul e, meha pêncan e.

**Gulşen**: Bexçê gulan, gulzar, guldehl, şengul.

**Guneh**: Sûc, webal, karê nerewa, sezaber.

**Gûzîde**: Bijarte, bijartî, mûmtaz.

## Ğ-ğ

**Ğafil:** Bêxeber, bêhay.

**Ğafir**: Gunehbexş, efûkar, lêbûr.

**Ğalib:** Serketî.

**Ğalibîyet**: Serkeftin,

**Ğasib:** Ğesbker, ewê ku bi zorê distîne.

**Ğaye**: Hedef, nîşan, emac, meqsed, nîşangeh, boçûn.

**Ğazî**: Şervan, cengawer, cîhadvan.

**Ğebînet**: Heyf lê anîn, berketin, mixabinîya xwe derbirîn.

**Ğeflet**: Bêxeberî, hay ji xwe neman.

**Ğefûr**: Gunehbexş, efûkar, sûcbexş.

**Ğelebet:** Serkeftin.

**Ğelet**: Şaş, çewt, nerast.

**Ğem**: Kul, keder, huzn, şîn.

**Ğemgîn**: Ğemxwar, kuldar, kedermend, şînkêş, hezîn.

**Ğemnak**: Dilbikul, dilbiêş, ğemgîn, hezîn.

**Ğenî**: Zengîn, maldar, têrmal, sermayedar, serwetmend.

**Ğenîme**: Destkeftîyên şerr.

**Ğerez**: Kîn, nefret, dijminahîya bi dizîkahî.

**Ğerîb**: Bîyanî, nenas, nejime, nejimalê, nedost, ne yar.

**Ğerîbî**: Bîyanîtî, nenasî, ji welatê xwe dûrî.

**Ğerq**: Noqbûn, xeniqîn.

**Ğerz**: Darfêkîyên ku nû têne çandin.

**Ğeyb**: Nehazir, ne li ber çavan, ne elenî, nependî, berze.

**Ğeyd**: Nehaşt, jihevçûn, bihevre xebernedan.

**Ğeydok**: Ewê ku zehf zû diğeyide, dilê wî dimîne, diltenik.

**Ğeyr**: Jibilî, yê din, dîger.

**Ğeyret**: Hewldan, cehd û xebata jidil.

**Ğeyy**: Rêşaşî, harbûnî, serxweveçûn.

**Ğeyyûr**: Ğîretmend, ehlê ğîretê, şerefmend, îffetmend.

**Ğezal**: Esk, Ahû, ew heywana navdara naskirî.

**Ğezeb**: Hêrs, ğeyd, enirîn, ne razî bûn.

**Ğezw**: Ceng, herb, qal, şerr.

**Ğibte**: Nîmeta ku li bal yekî din heyî, xwestina wê ji xwe re. Ew berevajîyê hesedê ye.

**Ğirêz**: Kîn, nefret, dijminahî.

**Ğudde**: Toşpî.

**Ğufran**: Efûbûn, biber-efûyê ketin.

**Ğulam**: Xizmetkar, fermanberê ağayê gund.

**Ğunçe**: Kûmikê çîçekan ê hîn bel nebûyî, gûpik.

**Ğurbet**: Ğerîbî, dûrî welatê xwe, ne li nav ehlê xwe.

**Ğuzat**: Geljimareya ğazî ye, ğazîyan, şervanan, cengaweran.

## H-h

**H.w.d**: Her wiha ne, yên din jî.

**Halê xwe**: Rewşa xwe, wezîyeta xwe.

**Haşt**: Li hev-hatî, aşt, ne-ğeydî.

**Hebîb**: Hezkirî, yar.

**Hebs**: Girtin, zîndanî-kirin, destliser-danîn, tewqîf-kirin.

**Hebsxane**: Girtîgeh, bendîxane, zîndan, dîlxane, yexsîrgeh.

**Hedef**: Armanc, ğaye, nîşan, boçûn, emanc.

**Hedîs**: Peyvên Resûlê Xuda.

**Hekîm**: Hikmetzan, doktor.

**Helak**: Neman, jinavçûn, tinebûn.

**Heq**: Maf.

**Herb**: Ceng, şerr, qal.

**Hereket**: Tevger, bizav, liv, lebat, bizûtnewa.

**Herk**: Rewan, herkbarî, rewt.

**Hesed**: Çavnebarî, zeğelî, xêrnexwazî, zikreşî.

**Hesret**: Jana dil, negihiştina miradê.

**Heşmet**: Mezinatî, bidebdebeyîbûn, bi nîzambûn, bi întîzambûn.

**Hêştir**: Deveh, heywanê ku barên giran hildigre.

**Hevdij**: Hevzid, hevdijmin.

**Heya**: Şerm, hesta tengavbûnê, reva ji guneh û bizavên der-exlaqî bi sebeb tirs û hezkirina Xuda.

**Heywanat**: Geljimareya heywan e. Yanî candar e, xwedî-heyat e.

**Hêz**: Qewet, xurtî, desthilat.

**Hezret**: Hazir, îhtîram, sîyanet, rêzdarî ye. Ev peyv di axaftinê de di pêşîya navan de ji bo hurmetê tê bikaranîn. Ji bo mêran Hezretê, ji bo jinan jî Hezreta. Kurtenivîsa wê jî Hz. e.

**Hicran**: Ğeyda yarê, terk-kirina yarê ye.

**Hîdayet**: Rêşanîdana Xuda, rêya heq, wehîya ku ji Mûhemmed re hatî şandin, rêya çûna cennetê, rêya xilasîya rastîn. Rêya rast, rêya heq. Îslamîyet. Rêşanîdan.

**Hikmet**: Zanîna bi hostahî.

**Hindî**: Çi qeder.

**Hişkî**: Ziwahî, ne nermî.

**Hov**: Ne-medenî, neşehreza, nezan, ehmeq, eqilsivik, cahil, tebîetheywan, ne-bajarî.

**Hoz**: Eşîret, êl, qebîle.

**Hubb**: Hezkirin.

**Huccet**: Delîla ku tiştekî îsbat dike.

**Hukema**: Geljimareya hekîm e, yanî hekîman, daweran, hikmetzanan.

**Huner**: Sen‘et, xwedî-pîşeyî, şîyandarî, bikêrhatî, hotsatî, pisporî.

**Husna xatîme**: Dawîya sipehî, aqîbeta li ser xêrê, li ser îmanê can dan.

## I-i

**Israr**: Bi serhişkî li pey çûn, rijdbûn.

## Î-î

**Îcab:** Lazim, divê, gerek, pêwîst.

**Îcad**: Keşfkirin, peydakirin, derxistina holê.

**Îcra**: 1. Çêkirin, bicihanîn, birêvebirin. 2. Kişandin, herikandin û dan herikandin.

**Îctîmaî**: Civakî, komelayîtî, sosyal.

**Îdare**: Rêvebirî, ger.

**Îdrak**: Têgihiştin, fehmkirin.

**Îftîxar**: Şehnazî, pesnê xwe dan, şan û şeref.

**Îhsan**: 1. Qencîya bi rastî û durustî. 2. Karê tekûz, mûkemmel û bêkêmasî. Ajar, nîmet, xweşî, kerem.

**Îhtîmam**: 1. Bi diqqet û bêrî-kirin karkirin, bizav û livîn. 2. Diqqet nîşandan û baş meyzandin.

**Îhtîram**: Xatir-girtin, rêz lê girtin û hurmet-girtin.

**Îhya**: Sağkirin, zindî-kirin, heyatpêdan.

**Îkram**: lutf, kerem, qencî.

**Îlmê mûsbet**: Îlmê tecrîbî, îlmê ku di encama ceribandinê de hatiye îsbatkirin, îlmê pozîtîf e.

**Îltîca**: 1. Xwe avêtin ber sitara yekî. 2. Bawerbûna bi yekî, xwe sipartin. 3. Dûa û bergerîn.

**Îman**: Bawerî, yeqînî, îtîmad.

**Îmana tehqîqî**: Zanîna hemû mesele û mijarên bi îmanê re elaqedar bi delîl û sifet û tefsîlatên wan ve ye. Tesdîqkirin û bêşubhe bawerkirin e.

**Îmtîna**: Astengbûn, lê menbûn, nekirin.

**În'îkas**: Eks-kirin, xuyabûn.

**Înkîşaf**: 1. Vebûn. 2. Mezinbûn, pêşveçûn. 3. Derketina meydanê.

**Însaf**: Edalet, wijdan.

**Înşaellah**: Xuda hez bike, Xuda bixwaze.

**Înşîrah**: Vebûna dil, şadîya dil û keyfxweşî.

**Întîba**: Ew tesîr û şopa ku tiştek, şexsek, yan jî bûyerek li ser mirov dihêle.

**Îqame**: 1. Rûniştin. 2. Rakirin, rabûna li ser pêyan. 3. Derxistina meydanê.

**Îqbal**: Şens, nesîb, qismet, qubal.

**Îqrar**: 1. Bi eşkerehî gotina fikrê xwe. 2. Tesdîq û qebûl. 3. Îtîraf.

**Îqtîsadî**: Ekonomîk, abûrî.

**Îradî**: Tişta ku bi xwestin, bi îrade û vîyan hatiye kirin.

**Îrşad**: 1. Rêya Heq, rêya rast nîşandan, îqazkirin. 2. Di tesewwufê de ew e ku mûrşid rêya Xuda şanî mirîdên xwe bide. Şanî-dana rêya heq, rêya rast û durust, şiyar-kirin.

**Îsar**: Dîgerbînî. Temînkirina îhtiyaca mirovê din li pêşîya îhtiyaca xwe.

**Îsewîtî**: Îsaparêzî, peyrewên Îsa -eleyhisselam, xrîstîyan.

**Îsm**: Nav.

**Îsraf**: Destbelavî, çarcur-kirin.

**Îstîdad**: 1. Meyla tebîî ye ji bo qebûl û qezenckirina tiştekî û qabilîyet e. 2. Eqilmendî ye. 3. Fehmkirin e. Amadehî, hazirî, qabilîyet.

**Îstîdlal**: Delîl-xwestin, xwesipartina delîlê, encam-deranîna ji delîlan.

**Îstiğfar**: Efû-xwestina gunehên xwe ji Xuda Teala ye û bi komika "esteğfîrûllah"ê tobe-kirin e.

**Îstiğna**: Xwe hewce-nedîtin, xwe zengîn jimartin.

**Îstihqaq**: 1. Heq-kirin, heq qezenckirin e. 2. Heqdesta ku ji bo xizmetekê tê xwestin.

**Îstîkan**: Qedeha çayê, şûşa ku têde çay tê vexwarin.

**Îstiqbal**: Paşwext, paşeroj, dahatû, hêtê, ayende.

**Îsyan**: Li ber rabûn, serhildan.

**Îştiyaq**: Zehf arzû-kirin, bêrî-kirin, hesret-kişandin.

**Îttîba**: Peyrewbûn, lipeyçûn, bidûvketin.

**Îz'an**: 1. Têgihiştin, fehmkirin, eql. 2. Îtaet, guhdarî-kirina li xeberdanê, stûxwehr-kirin. 3. Terbîye, edeb. Lê guhdarî-kirin, teslîm-bûn, terbîye, edeb.

**Îzdîwac**: Zewac, jin-anîn, mêr-kirin, cot-bûn, zo-bûn.

**Îzzet**: 1. Bilindahî, balatî, mezinatî. 2. Ezemet û qudret. 3. Hurmet, îkram. 4. Şîyan, rêzgirtin.

## J-j

**Jan:** Êş, cefa, ezîyet, îzdîrab.

**Jar**: Reben, belengaz, feqîr, bêxêrok.

**Jêhatî**: Şûm, bikêrhatî, şîyanmend.

**Jehr**: Zehr û dermanê kuştinê.

**Jêneger**: Heke nebe, nabe. Bivênevê ye.

**Jênetêr**: Têrê nekirin, jê têr nebûn.

**Jêr**: Xwar, nebanî.

**Jêrenot**: Haşîye, nivîsa li binê pelê.

**Jêrîn**: Ewê li jêrê be, li xwarê be.

**Jêrxan**: Binesazî, çêkirina binerdî.

**Jîr**: Jêhatî, şûm, bikêrhatî, zîrek, bîrbir, tijefehm.

**Jîyan**: Heyat, sağî, xweşî.

**Jor**: Banî, ne xwarê.

**Jorîn**: Ewê li jorê ye.

## K-k

**Kafir:** Xudanenas, heqnenas, înkarçî.

**Kaînat**: Cîhan, Gerdûn, alem, kewn.

**Kamranî**: Bi mirada xwe gihiştî, bextiyar, dilşad, bextewar, mesûd,

**Kanî**: Li kuderê, li çi cihî, li kîjan deverê.

**Kar**: Şiğûl, emel, îş, xebat, qezenc.

**Karsaz**: Zilamê kar, xwedî kargeh, fabrîqetor.

**Karûbar**: Kar û bar, ew qezenca ku yek dike û ew berpirsî û

mesûlîyeta ku dikeve ser milê wî. Mijar, xusûs, babet, mewzû.

**Kehnî**: Jêdera avê, cihê ku av jê dertê.

**Kehr**: Çêlîkê bizinê.

**Kelamî**: Mijara ku bi îlmê kelamî re elaqedar e.

**Keleh**: Ew cihê asê, ew dîwarê ku li dora bajarekî yan jî cihekî din hatiye lêkirin.

**Kemal**: Temam, tekûz, nekêm, ne nuqsan.

**Kerem**: Camêrî, merdîtî, semahet.

**Keşf**: Îcadkirin, peydakirin, derxistina holê.

**Ketin**: Ji devereke bilind ketina ser erdê ye.

**Kevir**: Ber, kuç, seng.

**Kewnî**: Kaînatî, cîhanî, gerdûnî, dinyayî.

**Keyfîyet**: 1. Ew qelîte, hal û rewşa ku tiştek li serê çawa çêbûye. 2. Kar û hadîse.

**Kezeb**: Ceger, mêlak.

**Kîfaf**: Têrê-kirin, ne zêdetir, ne kêmtir.

**Kilîl**: Mefteh, anaxtar, vekerok.

**Kirrîn**: Kirrîna bi pere yan bi tiştekî din, dijberê firotinê ye.

**Kirryar**: Ewê ku tiştekî dikirre, mûşterî.

**Kuffar**: Geljimareya kafiran e. Yanî ewê ku zehf Xuda înkar dikin.

**Kulturî**: Çandî, îrfanî, rewşenbirî, ronakbîrî.

## L-l

**Lakin**: Lêbelê, feqet, emma.

**Law**: Kur, pis.

**Lawaz**: Qels, zeîf, weza, ne zexm, ne ji esas.

**Lazim**: Divê, gerek.

**Lebat**: Bizav, hereket, tevger, liv.

**Lêbelê**: Feqet, belam, lakin, emma.

**Lêgerîn**: Gera li tiştekî.

**Leheng**: Qehreman, mêrxas, nebes, agîd, çavnetirs.

**Lerz**: Lerzîn, reerîn, hejîn.

**Letafet**: Xweş, bedew, nezaket, nermî.

**Lewhe**: Rûpelên Tewratê.

**Lewra**: Çimkî, ji ber ku.

**Lezûbez:** Ecele, bilez.

**Liğab**: Ew hesinê ku dixin devê hespî.

**Lîteratur**: 1. Edebîyat, wêje. 2. Berhema di mijarekê de ye.

**Livîn**: Bizav, hereket, tevger.

**Lutf**: Kerem, camêrî, merdî.

**Lûtke**: Zirwe, patika serê tiştekî.

## M-m

**Mahir**: Pispor, zana, hosta, agahdar.

**Mahîyet**: Heqîqet, rasteqîne, kakil.

**Makro**: Mezintirîn, ya mezintir, ya gewretir.

**Malayanî**: Bêmane, bêfeyde, gotina pûç, tişta ku mirov elaqedar nake.

**Malbat**: Binemal, ezbet, aîle.

**Masîwa**: Ji bilî Xuda, ji ğeyrî Xuda,

**Matem**: Şîn, ğemgînî, keder.

**Mawer**: Ava gulê, misk û enber.

**Malûm**: Pêzan, nas, ne mechûl.

**Mamûl**: Hilberan, veberhênan.

**Manedar**: Bimane, biwate.

**Manewîyat**: Rewşa exlaqî, wezîyet û hizûra dilî ye.

**Mecal**: Zeman, taqet, derfet, îmkan.

**Mecazî**: Ne heqîqî, ji manete ve.

**Mechûl**: Nenas, nepêzan, ne malûm.

**Mecnûn**: Dîn, dîwane.

**Mecra**: Cok, rêya çêbûna tiştekî.

**Med-cezîr**: Rabûn û nizmbûna ava behrê.

**Medîtasyon**: Jandarî, ğemnakî, tewasut.

**Mefhûm**: 1. Têgiha, maneya ku peyvek wê îfade dike. 2. Tişta ku hatiye fehmkirin.

**Meftûn**: Dildayî, lêketî, mûbtela, heyran, pêvebest.

**Mehdûd**: Sînordar, tixûbdar.

**Mekan**: Cih, şûn, war.

**Mekarimê Exlaq**: Exlaqê camêrane, exlaqê xweş.

**Meknûz**: Veşartî, tişta ku di erdê de hatî veşartin û depokirin.

**Melahet**: Bedewîtî, şîrîntî, xweşî.

**Melekût**: 1. Seltenet, hukmdarî û padîşahî. 2. Alema rûh û melaîketan. 3. Melaîket û rûh, tiştên asîmanî.

**Melûn**: Lanetlêbar, ji rehmêder.

**Menfez**: Qula ku tiştek lê nifûz dike û tê re diçe.

**Menfî**: Neyênî, ne erênî, nelê, negatîf.

**Meqale**: Gotar, nivîsa li goşeya rojnameyan.

**Meqes**: Alevê qutkirinê ye.

**Meram**: Mebest, ğaye, hedef, emanc, meqsûd,

**Merc**: Şert û hoy.

**Merez**: Nexweşî, êş, bela û rewşa zor.

**Merhele**: Pêvajo, sefhe û qunağ.

**Marîfet**: Naskirin, xwe naskirin.

**Marîfetullah**: Naskirina Xuda Teala ya bi qelb û yeqînî ye.

**Merkez**: Navend, cihê ku însan têne wî.

**Marûf**: Naskirî, hînbûyî, bi adetbûyî,

**Mêrxas**: Leheng, mêrxas, nebez, qehreman, egît.

**Merzûq**: Rizqê wî hatiye dayîn. Rizqber.

**Mescid**: Mizgeft, îbadetxane, nimêjgeh, camî.

**Mesûd**: Dilşad, keyfxweş, şamdan, kamiran, bextiyar.

**Meşîet**: Xwestin, vîyan, îrade.

**Mewcûdat**: Heyber.

**Mewzû-behs**: Mijara axaftinê, babeta mijûlahîyê.

**Mexlûqat**: Aferinde, yên ku hatine xuliqandin.

**Meyl**: Meyla li ser tiştekî.

**Meyyal**: Meylkar.

**Mezîyet**: Xusûsîyeta ku tiştekî ji tiştên din vediqetîne, wî ji wan çêtir dike û xusûsîyetê jê re bexş dike.

**Mezrûf**: Tiştê ku dikeve nava zerfê.

**Mijar**: Babet, mewzû, mijad.

**Mîkro**: Biçûktirîn, ya biçûktir. Ew tişta biçûka ku bes bi mîkroskopê tê dîtin.

**Mîl**: Pîvana dûrbûnê ya ku 1854 metre ye.

**Miweffeqîyet**: Serkeftin, bi mebesta xwe gihayî.

**Mixabin**: Sed heyf, ğebînetê!

**Mizgeft**: Camî, cihê nimêjê, îbadetxaneya mislimanan.

**Molekul**: Ew zerre ye ku biçûktirîn beşa hemû xusûsîyetên ji maddeyên atoman tê meydanê.

**Mûbah**: Serbest, kirin û nekirina wê wekhev e.

**Mûcadele**: Têkoşîn.

**Mûcerred**: Xwerû, tişta ku ne cism e, saf û xalis e.

**Mûcib**: Lazimî.

**Mûdafaa**: Berevanî, bergirî, parastin.

**Mûdğe**: Perçê goşt.

**Mûemma**: Asêpirs, pirsgirêk, korgirêk.

**Mûezzez**: Ezîzbûyî, xweşdivî, xweşewîst.

**Mûezzin**: Ezanxwên, bangdêr.

**Mûflis**: Ewê ku îflas kiriye. Ewê ku malê xwe û sermîyanê xwe jidest daye. Ewê ku nikare deynê xwe bide.

**Mûhal**: Ne mûmkin, bê derfet, bê îmkan.

**Mûharebe**: Bi hev re herb û cengkirin.

**Mûhasib**: Hesabgir. Jimardar.

**Mûhebbet**: Hezkirin, evîn.

**Mûhebbetullah**: Hezkirina ji Xuda Teala.

**Mûkemmel**: Tekûz, temam, ne nuqsan.

**Mûkerrem**: Bi qedr û qîmet. Bi xatir û merîfet.

**Mûlaqat**: Hevpeyvîn, sohbet, roportaj.

**Mûmtaz**: Cuda, veqetandî, biîmtiyaz.

**Mûnacat**: Feryad û bergerîn. Laklak-kirina bi Xuda de.

**Mûnbit**: Berhemdar, şînker, bikêrhatî, giyaderêx.

**Mûnezzeh**: Pak û paqij. Ewê ku îhtiyaca wî bi ti kes û ti tiştî nîn e.

**Mûnkir**: 1. Ewê ku înkar dike, qebûl û tesdîq nake. 2. Ewê ku Xuda înkar dike, bêîman. Bêol. Xudanenas.

**Mûqeddes**: Pîroz û paqij. Mûbarek. Qudsî, ezîz.

**Mûqerreb**: Nêzîk, ewê ku nêzîk dibe.

**Mûqteza**: Lazimî, pêdivêyî.

**Mûrad**: Mirad, meqsûd, daxwaz, mebest.

**Mûseffa**: Safî, xalis, sade.

**Mûsewîtî**: Mûsaparêzî, cihû, yehûdî.

**Mûsexxer**: Stûxwehr, îzndayî, bidestûr.

**Mûsîbetzede**: Karesat-lêketî, bi ber belayê ketî, felaket lêxistî.

**Mûsteğnî**: Xwe zengînbînî, xwe hewce-nebînî.

**Mûsteqîm**: Rêya rast û durust.

**Mûstesna**: Awerte, cihêwaz, veqetandî, îstisna-kirî.

**Mûşahede**: 1. Dîtina tiştekî bi çavan e. 2. Seyira menewî.

**Mûşexxes**: Tişta ku hatiye bişexskirin, bicismkirin, bişeklkirin. 2. Tişta ku bi çavan tê dîtin û bi destan tê destlêxistin.

**Mûteal**: Bilind, bala.

**Mûtealî**: Bilindî, alî.

**Mûtedil**: Navîngir, wesetgir, ne îfratkar, ne tefrîtkar.

**Mûtekamil**: Hevtemamker.

**Mûtekebbir**: Ewê ku xwe mezin dike, ewê ku ser xwe ve diçe.

**Mûtelaa**: Baş fikrîna li ser tiştekî ji bo bikare qerareke rast bide. 2. Mûlaheze.

**Mûtena**: bi îtîna, bi balkêşî.

**Mûtenasib**: Bi pîvan, bi rêje.

**Mûtleq**: Ew tişta ku ne pêbendê şert û mercekî be. 2. Hebûna ku ji bo hebe îhtiyaca wê bi tişteke din nîn e, sebebê hebûna wî di wî bi xwe de ye. 3. Serbest, mûsteqil. 4. Binbirr. 5. Hebûna mûkemmel û tekûz.

**Mûyesser**: 1. Ew tişta hêsan, ewê ku bi sehnayî çêdibe. 2. Nesîb. 3. Tişta ku hatiye hêsankirin.

**Mûzakere**: 1. Di mijarekê de li pêşberî hev beyankirina fikrê xwe ye. 2. Hevdîtina berî qerar û biryar-danê ye.

**Mûzeffer**: Zefer-sitandî, serkeftî, cengqezenckirî.

**Mûzeyyen**: Hatiye tezyînkirin, hatiye xemilandin, hatiye xweşik-kirin, zînetdar, bi xeml û rewş.

## N-n

**Naçîzane**: Ne ti tiştane, ne hêja, hîç.

**Nadîde**: Kêm, giranbiha, biqîmet.

**Naîlîyet**: Gihaştin.

**Navber**: Neqebeyn, mabeyn, valahîya di nav du tiştan de ye.

**Navdewletî**: Nav milletan, Beynelmîlel.

**Navend**: Merkez, cihê ku nîvê tiştekê be.

**Navgîn**: Wasîte, wesîle, aletê gihiştina hedefekê ye.

**Nazenîn**: 1. Nazik, zirav, 2. Narîn, dilovan û bi delalî hatiye perwerdekirin. 3. Bicilwe, destevîl, sempatîk.

**Nebat**: Giya.

**Nebatat**: Geljimareya nebatê ye, ew jî giya ye.

**Nebewî**: Pêğemberî, tişta ku bi pêğember re elaqedar e.

**Nebezî**: Lehengî, mêrxasî, qehremanî, agîdî.

**Nebî**: Pêğember, resûl, peyambir, xeberbir.

**Necat**: Xilasî, rizgarî, azadî, felat.

**Nedamet**: Poşmanî.

**Nefret**: Revîna ji mirovekî, hezneki-rina ji kesekî.

**Nefsanî**: Tişta ku ji nefsê tê, bi nefsê re elaqedar e.

**Nefsanîyet**: Kîn, ğerez, dijminahî, neyartîya veşartî.

**Neğme**: Awazên xweş.

**Nehej**: Sağlem, naheje, nalerize, nariere.

**Neqlek**: Carek, bare.

**Neqlî**: 1. Tişta ku bi neql û guhastinê re elaqedar. 2. Tişta ku ne bi rêya eql, lê bi rêya neql û rîwayetê hatiye fêrkirin.

**Neş û nema**: Gihiştin û mezin bûn, hate ajotin û derket.

**Netêgiha**: Ne fehm, ne berketî, ne jîr.

**Netîce**: Encam, ekam, dawîne, aqîbet.

**Neyartî**: Dijminahî, edawet.

**Nezaket**: Bi nazikî, bi edeb, bi efendîtî.

**Nezergeh**: Cihê nêrînê, meyzandinxane, fekrgeh.

**Nezeriye**: Dîtin-nêrîn, raman û teorî.

**Nezîh**: Paqij, temîz, pak.

**Nezîr**: Şibh û wek û hemta.

**Nibiwwet**: Pêğembertî, resûltî, qasidtî.

**Nîhaî**: Dawîn, paşîn.

**Nîhayet**: Di dawîyê de, di paşîyê de.

**Nîmet**: Ajar, qencî, lutf, kerem, dayîn.

**Nimûne**: Mînak, wekok, mîsal.

**Nîzam**: Sîstem, riste.

**Nûtfe**: 1. Ava mêranî û jinanîyê. 2. Ava zelal û safî.

## P-p

**Par**: 1. Qismet, nesîb, behr, pişk, beş. 2. Par-sal, sala bûrî.

**Parsek**: Gerhok, ewê ku destê xwe li ber xelkê vedigere û arîkarîyê ji wan dixwaze.

**Parsû**: Hestîyê parsûyan.

**Pêğember**: Peyğam ber, peyambir, mesaj-bir, peyv-bir. Qasid.

**Pêhis**: Pê hesîn, şiûr, şîyarî.

**Pehtin**: Pijandin, kelandin, çêkirin, durustkirin.

**Pehtinxane**: Cihê xwarin pijandinê ye.

**Perde**: Tişta ku tiştekî vedişêre, dinixumîne.

**Perestgeh**: Cihê perestinê.

**Perîşan**: Bêserûber, nelihevhatî, netekûz.

**Perperîk**: Perîstank.

**Perwane**: Kêzikên ku li dora lempê digerin, perperîk.

**Perwerde**: Terbîye, talîm, hîndekarî, xwedî-kirin.

**Peyam**: Peyğam, peyv, mesaj.

**Peyda-kirin**: Ji nû anîn meydanê, çêkirin.

**Peyğam**: Peyam, peyv, mesaj.

**Peyman**: Soz, ehd, we‘d, li ser xebera xwe man.

**Peyv**: Bêje, kelîme.

**Peywendî**: Têkilî, îrtîbat, elaqe.

**Pîroz**: Pîroz, paqij, temîzîya mûqeddes.

**Pratîk**: Kiryarî, emelî.

**Pûç**: Vala, rizîyayî, bêkêr.

**Pûtperest**: Senemparêz, pûthebîn, evdê pûtan.

**Pûtxane**: Cihê pût û seneman.

## Q-q

**Qabilîyet**: Karina kirina tiştekê, jêhatin, desthosta.

**Qad**: Meydan, rast, hol.

**Qadir**: 1. Sifetek ji sifetên Xuda Teala ye. Ewê ku xwedîyê karîna mûtleq e. 2. Ewê ku hêza wî têra her tiştî dike. Şîyandar, karedar.

**Qal**: Ceng, şerr, lihevdan.

**Qalê xwe**: Gotina xwe, peyva xwe.

**Qam**: Bejn.

**Qanûn**: Yasa, hiqûq.

**Qebr**: Gor, gorn, mezar, ceban, cihê ku mirî têde tê veşarin.

**Qedeğe**: Mehzûr, menkirî, ne helal, ne mûbah.

**Qedîm**: Kevnar, dêrîn, tişta ku li zemanên zehf kevin vedigere.

**Qelbî**: 1. Tişta ku bi dil re elaqedar e. 2. Tişta ku ne bi zimanî be.

**Qelender**: Ewê ku dest û zendên xwe ji bidûvketina dinyayê kişandiye û li pey qezenckirina axreta xwe û rizamendîya Rebbê xwe ketiye.

**Qels**: Zeîf, lawaz, weza, ne-xurt, ne-qewîn.

**Qerz**: Deyn, wam.

**Qesawet**: Diltengî, ğemgînî.

**Qeswet**: Tengasîya hinavî, ğem û keder, keser, şîn û ğemxwarî.

**Qet'î**: 1. Binbirr, tişta ku têde cihê şubhe û gumanê nîn e. 2. Bi ti awayan, hîç.

**Qewm**: Cemaet, kom, millet, netewe.

**Qeza**: 1. Ew tişta ku Xuda Teala ji ezelî ve bi çêbûna wê qerar daye û diyar kiriye. 2. Îbadetê ku ne di dema xwe ya diyarkirî de hatibe kirin. 3. Ew bûyera ku ne bi daxwaza mirov were meydanê.

**Qinik**: Mirîşkgeh, mirîşkdank.

**Qistas**: Pîvan, endaz.

**Qiwam**: Riste, nîzam, hîm, sitûn.

**Qiyam**: 1. Rabûna ser pêyan, li ser lingan rawestan. 2. Bizavkirina ji bo tiştekî, pêngav-kirin. 3. Serhildan, serî rakirin. 4. Sağbûna piştî mirinê û rabûna ser xwe.

**Qudret**: Şîyan, karîn, jêhatin û hebûna hêz û qewetê ji bo kirina tiştekî ye.

**Qunağ**: Pêvajo, merhele. Di hedefekê de gihiştina her pêpelingekê ye.

**Qure**: Serxweveçû, pesnêxwego.

**Qurmiçî**: Çilmisî, pêşmûrde.

**Qût**: Xwarina ku tê hilanîn.

## R-r

**Radîyellahû enhû**: Xuda jê razî be.

**Radyator**: Ew cîhaz û alet e ku di germkirin û sarkirinê de bikartê, yan jî buxara germ, yan jî sar, ya hewa û avê diweşîne.

**Ram bûn**: Mûtî bûn, teslîm bûn, desteber bûn, ketina bin fermana yekî din, têkçûn, têkşikestin, bezîn, binketina xwe qebûlkirin.

**Ram**: Teslîm, radest, berdest.

**Reaksîyon**: Bertek, berepê.

**Rêbaz**: Rêç, şêwaz, metod.

**Rêber**: Rênas, rêşan, rêzan, lîder, pêşîvan, serok.

**Rehetî**: Aramî, tenahî, xweşî, nezehmetî, netengasî.

**Rehîm**: 1. Sifetek ji sifetên Xuda Teala ye. 2. Birehm, dilovîn, parêzger, berket. 3. Ew sifetê Xuda Teala ye ku li axretê bi kerema xwe bi evdên xwe mûamele dike û gunehên wan dibexşîne.

**Rehm**: Dilovanî, merhemet.

**Rehmeten lîlalemîn:** Ji bo cîhanîy-an rehm.

**Rehmetûllahî eleyh**: Rehma Xuda lê be.

**Remz**: Remz, berate, îşaret, nîşan, elamet.

**Rênas**: Rêzan, rêber.

**Reqîq**: 1. Zehf zirav, nazik, narîn, dilovan, nazenîn, nazdar. 2. Diltenik, hestgerm, hestyar, dilşewat, dilsoj.

**Resûl**: Qasid, şande, hinare.

**Resûlûs-Seqeleyn**: Pêğemberê herdu alemên însan û cinan.

**Rewze**: Mezarê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin].

**Rêzan**: Rêber, rêşan, rêbîn, rênas, lîder, pêşîvan, pêşewa.

**Riba**: Zêdeyî, fayîz.

**Rifq**: Şefqet, dilovanî, diltenikî, berketokî.

**Rihabûn**: Xilasbûn, rizgarbûn, gihiştina felatê.

**Riqqet**: 1. Nazikîtî, ziravî. 2. Nezaket. 3. Di xwebêjîyê de tenikîtî û sernermî. 4. Rehmkirin û dilovanî.

**Rîsalet**: Resûltî, peyamhinêrî.

**Riste**: Sîstem, nîzam, dûzen, rêzebendî.

**Riyazat**: Geljimareya Rîyazetê. Ew jî ev e; mirov hindik bixwe, hindik raze, tim îbadetê bike. Bi vî awayî, nefsa xwe terbîye û perwerde bike, bi xwe karibe, xwe li hemberî heramîyê bigre, destê xwe ji zewq û sefaya dinyayê bikişîne û nefsa xwe bişikîne.

**Rizgarî**: Xilasî, azadî, serbestî, felatî.

**Ronahî**: Bînahî, rewşen.

**Rubûbîyet**: 1. Rebbîtî, ulûhîyet. 2. Xwedîtî, sahibîtî.

**Rûhanî**: Rûhî, canî, giyanî, rewanî, manewî.

**Rûhanîyet**: Tişta ku bi rûh û can re elaqedar e. Tişta manewî. Halên ku rûh xurt dikin. Tişta ku bi paqijkirina rûh û rewan re elaqedar e.

## S-s

**Sadat**: Mezin, pîrên tesewwufê.

**Sadir**: Derketî,

**Sail**: Gerhok, parsek.

**Salih**: Mêrê qenc, mêrê bikêrhatî.

**Salîhe**: Jina qenc, jina bikêrhatî.

**Sazî**: Damûdezgeh, mûessese, teşkîlat.

**Sazkirin**: Tamîrkirin, avakirin, çespandin, damezirandin.

**Seadet**: Bextiyarî, şadmanî, aramî, hizûr.

**Sedaqet**: Sağlemî, durustî, xiyanet nekirin.

**Seddîq**: Rastgo, ewê ku hîç derewan nake, dilsoj, sifetê Ebûbekrê siddîq e.

**Sedeqa cariye**: Ew xêr û hesenat e ku her tim dibe wesîleya ecr û sewabê. Her wekî mizgeft, mekteb, medrese, çeşme, kehnî, bîr, çal, pir, nexweşxane û yên wekî van e.

**Sedr**: Sing, sîne,

**Sefalet**: Nizmîbûn, hejarî, belengazî.

**Sefîh**: Eqlsivik, ehmeq, cahil, nezan.

**Sehabî**: Hevalê Resûlê Xuda.

**Seher**: Wextê dawîya şevê, berbang.

**Sêhr**: Efsûn, sêhrbazî.

**Sêhrbaz**: Cazû, efsûnkar.

**Sekînet**: Sakin-bûn, hizûr, dilaramî.

**Selahîyet**: Karbidestî, peywirdarî.

**Selametî**: 1. Dûrbûna ji derd, tengasî, kêmasî, keser û êşan e. 2. Dawîya bixêr. 3. Xilasî û rizgarî. 4. Rastî û durustî.

**Selaset**: Di îfadê de aheng, zelal, hêsankarî û herkebarî.

**Selîm**: 1. Semîmî, temîz. 2. Mûkemmel, tekûz, sağlem, rast. 2. Bê xeter, bê tehlûke, bê zirar.

**Sellellahû eleyhî we sellem**: Dirûd û silavên Xuda lê bin.

**Seltenet**: Hukmranî, padîşahî, şahînşahî.

**Semawî**: Jêder asîmanî, îlahî, ne beşerî.

**Sena**: Pesn, wesfê bi qencîyê.

**Senîyye**: Bilind, zehf mûhîm, nirxdar, bala.

**Serbaz**: Leşker, servekirî.

**Serdar**: Reîs, serok, serekvan.

**Serdem**: Esr, çağ, serzeman, dewr.

**Sererd**: Serax, cîhan, gerdûn.

**Sermiyan**: Sermaye, malê serekeyî.

**Serwer**: Mezin, lîder, pêşîvan, serok, serek, rêzan.

**Serwet**: Mal, zen.

**Serwetmend**: Sermayedar, zengîn, dewlemend, maldar, têrmal.

**Setr**: Rêza nivîsan û xet.

**Sexawet**: Merdî, camêrî, destvekirî, çavtêrî.

**Seyyah**: Gergîn, gerok, gerkar, tûrîst, seyahetçî.

**Seza**: Ceza, îqab.

**Silav**: Selam.

**Silh**: Haştî, lihevhatin.

**Sîma**: Rû, çehre, dêm.

**Sîne**: Sing.

**Sîqirîn**: Dema diranê mirov ji ber xwarina tirşahîyê lihev dikeve û dengê sîqirînê jê tê.

**Sîrat**: Rê, sîrata mûsteqîm, rêya rast û durust.

**Sîrayet**: Ji yekî diçe yekî din.

**Sîret**: Jînenîgarî, bîyografî.

**Sirişt**: Tebîet, xweza, natûrel.

**Sitûr**: Ne zirav, ne tenik, qalind.

**Soz**: Peyman, ehd.

**Suflî**: 1. Nizm, yê li jêrê, 2. Ewê ku qiyafetê wî pîs be, xirpanî, xirto-pirto.

**Suleha**: Geljimareya salih e, yanî salihan, qencan, bikêrhatîyan.

**Sulte**: Otorîte, desthilat, selahîyet.

**Sûnd**: Yemîn, qesem.

**Sunnet**: Kevneşop, rêc, rêbaz.

**Sunnetûllah**: Ew qanûn, qaîde û rêz û rêçên ku Xuda Teala ew li kaînatê danîne.

**Sunûhat**: Tişta ku tê bîra mirov, diniqute dil, tişta ku di dil de çêdibe.

**Sureyya**: Komika sêwîyan.

**Surprîz**: Ranegihandî, çavnelirêkirî, ji nişka ve, nagihan.

**Sûû-zen**: Zena xirab, fikirîna xirab, guman, şubhe, şiwar, şek.

### Ş-ş

**Şad-bûn**: Keyfxweş-bûn, dilşad-bûn, ğemçûn, kul-çûn, kederneman.

**Şagirt**: Şehgirtî, telebe, çirax, berdestî.

**Şah**: Qral, melik, hukmdar.

**Şahane**: Melîkane, layiqê qralîyetê.

**Şahê Resûlan**: Serdarê pêğemberan.

**Şahê siwaran**: Serdarê siwaran.

**Şahid**: Govan, biçavdîtî, hazir.

**Şair**: Hozan, şiêrgo.

**Şamil**: Tevgir, hemûgirtî.

**Şandin**: Hinartin, birêkirin.

**Şayan**: Layiq, babet.

**Şebnem**: Xwîsîtî, avrêhtî, jale, şevnemî.

**Şehadet**: 1. Şehdeanîn, 2. şehîdketin.

**Şeh-kirî**: Şeh lê xistî, tertîbkirî.

**Şehnazî**: Îftîxar, pesnê xwe pê-dan.

**Şehreza**: Li bajêr ji dêya xwe bûyî, medenî, dîyadîtî.

**Şehrûllah**: Heyva Xuda, meha Xuda.

**Şehwet**: Dilbijênî, arzûya nefsanî.

**Şêr**: Heywanê mêrxas.

**Şerîf**: Pak, qenc, serbilind, pîroz.

**Şerîr**: Neqenc, xirab, fesad.

**Şeva Erûsê**: Şeva bûk û zavatîyê.

**Şêwaz**: Metod, rêbaz, awa.

**Şêwr**: Îstîşare.

**Şîar**: Diruşm, sembol.

**Şibh**: Wek,

**Şiddet**: Tundkarî, dijwarî, hovîtî.

**Şihûd**: Temaşeber, li ber çavan.

**Şîrîn**: Xweş,

**Şirk**: Şirîk ji Xuda re çêkirin.

**Şivan**: Pezvan, çoban.

**Şiwar**: Şubhe, guman, şek.

**Şîyan**: Qudret, karîn, îqtîdar.

**Şuheda**: Geljimareya şehîd e, yanî şehîdan, pakrewanan.

**Şukr**: Spasî, malavayî, memnûnîyet îfade kirin.

### T-t

**T'azîm**: Mezinkirin, hurmetkirin, xatir-girtin.

**Ta'm**: Çêj, şamî.

**Tabîî**: Siriştî, xwezayî, normal, tebîî.

**Tabîîn**: Ewên ku di serdema sehabîyan de jîyane, ew dîtine

û ji wan hedîs û eser rîwayet û neql kirine.

**Takekes**: Ferd.

**Talîm**: Dan-hînkirin, dan fêrkirin, dan-elimandin.

**Taqet**: Mecal, qewet, îmkan, derfet.

**Taristanî**: Cahilîyet, nezanînî, kufristanî.

**Tarîtî**: Tarî, reşahî, nerohn.

**Tarîx**: Mêjû, dîrok, rojbûrî.

**Tave-heyv**: Tava heyvê, mehtav.

**Taveroj**: Tava rojê.

**Taybetmendî**: Xusûsîyet, mezîyet.

**Te'lîf**: Pev-xweşkirin, pev-dan-hezkirin.

**Te'yîd**: Destek, piştevanî, piştgirî, xurtkirin, teqwîye-kirin.

**Teala:** Mezin, bilind.

**Tebdîl**: Guherandin, xistin-şûna hev.

**Teblîğ**: Ragihandin, danezan.

**Tecellî**: Xuyabûn, eyanbûn, beyan-bûn, raçavbûn.

**Tecellîyat**: Xuyabûnan, kufşbûnan.

**Tecessus**: Li xeberên dizî gerîn.

**Tecrîd**: Xwerû-kirin, goşegirî.

**Tecrûbe**: Ezmûn, serpêhatî.

**Tedbîr**: 1. Îdarekirin, birêvebirin, kişandin û wergerandin.2. Hesabkirina dawîya karekî. 3. Berî dest bi kar-kirinê fikirî-na zehmetiyên ku derkevin pêşîya însên e.

**Tedebbur**: Tefekkurkirina dawîya xwe, fikirîna heqîqetê ye.

**Teeqqul**: 1. Eqil-kirin, fehmkirin. 2. Bibîranîn.

**Tefekkur**: Hizrkirin, ramankirin, bîrbirin.

**Tefekkura mewtê**: Fikirîna di mir-inê de.

**Têgiha**: Îstilah, navlêk.

**Tehessus**: Hiskirin, hestpê-kirin.

**Tehewwilat**: Guherîn û veguherîn.

**Tehqîq**: Bicihkirin, cihwarkirin, di cih de danîn.

**Tekamul**: Guhertina ku gav bi gav pêktê, bi kemalê gihan.

**Teksîf**: Himbizkirin, tîrkirin û zehfkirin.

**Tekûz**: Temam, mûkemmel, ne nuqsan.

**Tekzîb**: Derewandin, şaş qebûl-kirin, nerast-zanîn, derew-derxistin, redkirin.

**Telaqet**: Ziman-serbest, xeber-fes-îh, peyv-tekûz.

**Telaqqî**: Fehmkirin, têgihan, wer-girtin.

**Telîmat**: Dîrektîf, ferman, emr.

**Temaşe**: Bi zewq seyrkirin, mey-zandin, nêrîna bi keyf û şahî.

**Temen**: Emr, jîn.

**Tenaqud**: Nakokî.

**Tenik**: Zirav, ne sitûr û ne pehn.

**Tenqîs**: Kêm-kirin, nuqsan-kirin, ne temam-kirin.

**Tenzîh**: Pakdêrîn, temîzdêrîn, ji kêmasîyan dûr zanîn.

**Teorîk**: Nezerî, ramanî, fikrî.

**Teqwa**: Tirsa ji Xuda, ji tirsa Xuda hay ji heramîyan man, xwe parastina ji guneh û sûcên ku dibin sersedemê hêrs û ğezeba Xuda Teala.

**Teqwîm**: Salname, roj-jimêr.

**Terbîye**: Edebkirin, perwerdekirin, bi torekirin, bi exlaqkirin.

**Tercuman**: Wergêr, vegêr, ziman-guhêzî.

**Terennum**: Strana bi hêdî hêdî gotin a ku tesîrê li rûh dike.

**Terkîb**: Sazî, rêzkirin, çêkirin, pêkanîn.

**Tertîl**: Bi ciwanî û tecwîdî Qur'an-xwendin.

**Terwîc**: Bi rewac-kirin, propaganda-kirin.

**Tesbîh**: 1. Tenzîhkirina Xuda ji kêmasîyan. 2. Subhanellah gotin.

**Tescîl**: Qeydkirin, tomarkirin, bi awayekî resmî erêkirin.

**Tesdîq**: Rastdêran, rast zanîn, pejirandin.

**Tesellut**: 1. Siwarbûna li ser stûyê hinek mirovan. 2. Hukmkirina li wan. 3. Kolekirina wan. 4. Standina îradeya wan. 5. Bindestkirina wan.

**Tesewwuf**: 1. Rêbendîya terîqetên sofîyan e. 2. Tezkîyeya nefsê ye. 3. Îrşada ewaman e.

**Tesewwir**: Di zêhnê xwe de zindîkirin, xeyalkirin, anîn ber çavan, fikirîna tişta ku mirov bike.

**Tesfîye**: Safîkirin, temîzkirin.

**Teskîn**: Sakin-kirin, hedan-anîn, rawestandin.

**Teswîr**: Sûret-zindîkirin, anîn ber çavan, şeklê tiştekî anîn bîra xwe.

**Teşbîh**: Şibihandin, qiyaskirin.

**Teşwîq**: Navtêdan.

**Teşyî**: Bi oğirkirin, bi rê-kirin,

**Tevger**: Hereket, bizav, liv, lebat.

**Tewrat**: Kitêba Mûsa pêğember e.

**Tewsîye**: Wesiyet-kirin, şîret-kirin, pend-kirin.

**Texeyyul**: Di xeyalê de sûret pê bexşîn, anîn bîra xwe, di zêhn û mejîyê xwe de candarkirin.

**Texîr**: Dereng-xistin

**Texlît**: Cure, celeb.

**Teyeqquz**: Hişyarî.

**Tezahur**: Xuyabûn, xwe şanîdan, pêşandan.

**Tezekkur**: Bibîranîn, anîn bîra xwe, zehf zikrkirin.

**Tezkîye**: Paqij-kirin, temîzkirin.

**Tezyîn**: Xweşik-kirin, sipehî-kirin, bedew-kirin, ciwan-kirin, keşxe-kirin, bi rewş-kirin, xemilandin.

**Tije**: Mişt, ne vala.

**Tixûb**: Sînor, nîşana di navbera du welatan de, veqetandeka di navbera du tiştan de.

**Tropîkal**: Ew daîreya ku li dehm û parelela Ekvatora gurovera erdê tê qebûlkirin ku yek jê li bakur û ya din jî li başûrê wê dikeve.

## U-u

**Ubûdîyet**: Evdînî, koletî, îbadetkirin.

**Ufûq**: Ew cihê ku di navbera erd û asîmanî, yan jî behrê de xuya dibe ku her wekî ew bi yek dibe. Meydana ku tê dîtin û xuya dibe. Aso. Panorama.

**Ulema**: Geljimareya aliman e. Zana, zanayên dînê îslamê.

**Ulfet**: Hezkirin, mehebbet.

**Ultravîyole**: Ew tîrêjên ku di baqa tavê de ji şînahîyê bi wêdetir in, şînbiwêdetir.

**Ulûhîyet**: Îlahtî, Xudatî.

**Ulwî**: Bilind, jorîn, manewîyat.

**Ummet**: Hevalbend û pêbendê bi pêğemberekî.

**Ummî**: Nexwenda, ewê ku nikare binivîse û bixwîne.

**Unsîyet**: Hogirî, demsazî, sebrpêhatin.

**Uqba**: Axret, di piştî dinyayê.

**Urûc**: Bilindbûn, derketina jorê.

**Uswe'yê hesene**: Nimûneya sipehîtirîn.

**Uzlet**: Dûrbûna ji mirovan. Xwe dan goşeyekê, înzîwa-bûn.

## V-v

**Veger**: Vegerîna dawîyê.

**Vehewandin**: Hewandin, li cem xwe qebûlkirin.

**Vejîn**: Sağbûna ji nû ve.

**Vexwarin**: Vexwarina tiştê rohn, wekî av û meşrûbatan.

## W-w

**Wacîbat**: Tiştên ku wacib in, lazim in, gerek in, bivê-nevê ne.

**Waqif**: Agahdar, pêzana, xeberdar, haydar.

**War**: Cih, welat, niştiman.

**Waris**: Malpêma, mîratxwer.

**Wasil**: Gihayî.

**Webal**: Guneh, sûc, sûnc, tawan.

**Wecd**: Evîn, mehebbet, heyecana bilind. Hezkirina mirov pê ji xwe diçe û pê dikeve heyecanê.

**Wecîze**: Kurt, peyvê kurt û mane dirêj.

**Wefa**: Bi emekbûn, qencînasî, hember-vegerandin.

**Wefadarî**: Bi emekbûnî, qencînasî, hembervegerînerî.

**Wefat**: Mirin, emrbicihanîn.

**Wehm**: Zen, guman, şiwar, şubhe, pûçezen, psîkolojî.

**Wehşet**: Hovîtî, ne mirovî, heywantî.

**Welat**: War, niştîman, cih û şûn, memleket, dewlet, weten.

**Welayet**: Welîtî, dostanî, nêzîkatî, sedaqet.

**Weqaet**: Hadîse, bûyer, rûdan.

**Weqûr**: Sergiran, heddê-xwe-zan, xwenas.

**Wer'e**: Xwe dûrkirina ji tiştên bi şubhe da ku xwe ji gunehan û heramîyan biparêze. Teqwadarî, Xudahezî, dînperwerî, dîndarî.

**Werçerx**: Qunağek, pêvajoyek.

**Wesf**: Sifet, salağ.

**Wesîle**: Navgîn, wasite, pêgeh. Navgîn, wasîte, neqebeyngîn.

**Weswese**: Tevlîhevîya ku nefs û şeytan dixin bîra mirov. Wehm, şubhe, dudilî.

**Wexîm**: Gellek berbat, zehf xirab.

**Wezîfe**: Peywir, erk.

**Wezîyet**: Rewş, hal.

**Wîlayet**: Welîtî, nêzîkê Xuda.

**Winda-kirin**: Berze-kirin, jidestdan, ğayibkirin.

**Wuslet**: Gihiştin, pevgihan.

**Wuslet**: Gihiştin.

## X-x

**Xaliq**: Aferîner, xulqkar, çêker, aferîndox.

**Xalis**: Safî, sade, temîz, yekrû.

**Xapînok**: Xapîner, jirêbir.

**Xapxapok**: Aletên xapandinê.

**Xatûn**: Xanim, stî, banû.

**Xebîs**: Pîs, bi zirar, ne xêr.

**Xelat**: Padaş, perû, hedîye, yadîgar, îkramîye.

**Xellaq**: Ewê ku zehf dixuliqîne, zehf diaferîne.

**Xelwet**: 1. Bi tenê mana li cihekî girtî. 2. Îbadet, rîyazîyat, xwe kişandina înzîwayê ji bo zikr û mûraqebê.

**Xeşîyet**: 1. Tirs, saw, û xewf. 2. Hurmeta li hemberî heybeta manewî.

**Xeter**: Tehlûke.

**Xewas**: Mirovên taybet, mirovên dîyar.

**Xezîne**: Gencîne, cihê serwet û mal.

**Xîtabet**: Axaftin, peyvdan.

**Xoce**: Seyda, mamoste, dersdar.

**Xusran**: Ziyan, zirar, windakirin, jidestdan, kar-nekirin.

**Xusûs**: Mijar, Babet, mewzû, mebhes.

**Xusûsîyet**: Taybetmendî, mezîyet.

**Xuşû**: Tirs. Saw.

**Xwedbînî**: Xwe tenê dîtin, ezperestî, tekebbur.

**Xwendevan**: Xwenda, xwendewar, yê ku dixwîne.

### Y-y

**Yadîgar**: Dîyarî, xelat, perû, hedîye.

**Yar**: Dost, hezkirî, sewda.

**Yek-çav**: Bi çavek, tekçav.

**Yeksan**: Wekhev.

**Yeqîn**: Pêzanîna qet'î, sağlem, rast û ji gumanê rizgarbûyî; qenaeta mûtleq û îtmî'nana temam.

**Yetîm**: Sêwî, bavmirî.

**Yoga**: Felsefeya Hindê ye. Li gorî wê fikrê; mirov dikare di nav rawestin û bêbizavîyê de bi çîlekêşîyê tişta ku dixwaze, bidestxîne.

### Z-z

**Zabit**: Efser, endamê qadrodarê artêşê.

**Zahid**: Ewê ku dilê xwe nexistiye malê dinyayê. Ewê ku ji tiştên bişubhe jî dûr dike.

**Zahidane**: Bi zahidkî, layiqê zahidîtîyê.

**Zahidîtî**: Biha bi dinyayê nedan, reğbet têde nebûn, qenaetkarî, terk-kirina arzûyên nefsanî, ji tirsa Xuda xwe dûrkirina ji heramî û gunehan û xwe bi îbadetê ve berdan e.

**Zahir**: 1. Tişta ku tê dîtin, xuya, elenî, eşkere. 2. Dîmena derveyî. 3. Tabîî, bêguman.

**Zahirî**: Xuyahî, dîtberî, elenî, li ber çavan.

**Zalim**: Sitemkar, zulmkar, neheq, koledar, zordest.

**Zanist**: Îlm,

**Zat**: Kes, şexs, ferd, xwe, nefs, heyberê eslî.

**Zatî**: Kesî, şexsî, ferdî, xweyî.

**Zayî**: Winda, berze.

**Zebûn**: Zeîf, lawaz, weza. Bêhêz, bêqewet, bêmecal, bêçare, reben.

**Zêdetir**: Pirrtir, zehftir, gellektir.

**Zefer**: Serkeftin.

**Zehî**: Çi xweşik e!

**Zekat**: Para feqîran di nav malê zengînan de.

**Zengînî**: Dewlemendî, têrmalî, serwetmendî.

**Zerafet**: Delalî, nazikî, kubarî, dilovanî, destevîlî.

**Zerîf**: Kubar, nazik, dilovan, destevîl.

**Zerûretên dînî**: Ew tiştên dînî yên ku divê werin zanîn.

**Zerûrî**: Mecbûrî, bivê-nevê.

**Zewce**: Jina mehrkirî.

**Zewqa selîm**: Zewqa ku baş û nebaşî ji hev derdixe.

**Zid**: Hevdij.

**Zihûr**: Xuyabûn, dîyarbûn.

**Zikr**: Bîranîn, navê Xuda gotin.

**Zikrûllah**: Navê Xuda gotin, zikrkirin, bibîranîn.

**Zillet**: Perîşanî, rebenî, belengazî, bêqedrî, bê xwedîtî.

**Zimn**: 1. Di nav de, daxil, hundur. 2. Fikra ku bi eşkerehî nayê gotin lê bi îmayê tê fehmkirin.

**Zina**: Têkilîya cinsîya nerewa, ne bi nîkah.

**Zindî**: Candar, gîyandar, nemirî.

**Zînet**: Sipehîtî, bedew-bûn, xweşik-bûn, bixeml-bûn, birewş-bûn, keşxe-bûn.

**Zinhar**: Eman ha,

**Zirav**: Ne sitûr, tenik.

**Zirwe**: Lûtke.

**Zîyan**: Zirar, xisar.

**Zuhd**: Li hemberî her cure zewqa dinyayî derketin û xwe dana îbadetê. Qîmet nedana bi menfîetê, qenaetkar.

**Zuhûr**: Xuyabûn, dîyarbûn, kufşbûn.

**Zulcelal**: Xwediyê mezinatîyê.

**Zulm**: Sitemkarî, neheqî, zordestî.

**Zulmet**: 1. Tarîtî. 2. Mehrûmîyeta ji nûra manewîyatê.

**Zumre**: Çînîyeke mirovan, cemaeteke mirovên xwedî îmtîyaz.

**Zurrîyet**: Kinês, nesl, nifş.